BERGA 3

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad A Zeynep Kınacı

BERGA 3

JIYANA MIN HER TIM ŞER BÛ

SAKÎNE CANSIZ

Weşanên Akademıya Jına Azad

A

Zeynep Kınacı

Çapa Yekemîn:

Çapxaneya Azadî - Cotmehê 2015

Çapa Duyemîn:

Weşanxana Şilêr - Qamişlo 2017

Mîzanpaj û bergê pirtûkê:

Rêvan Mehmûd

weshanashiler@gmail.com

weje.vejin@gmail.com

Sala 88’an weke ne hatiye jiyîn dihesibînim

Di jiyana mirovan de hinek tiştên wisa hene, tevî hemû xisletên neyênî, êş û aliyên tije tufan, mîsoger mirov dîsa jî bibîr tîne, bi aliyên ku di nav wan de werin jiyîn dihese, tiştên ku jiyane parçeyek ji xwe dibîne. Her çendî li hember ‘çarenûsê’ aciz bibe, dijûna jî bike, cardin qebûl dike. Dibêje; “çi dibe bila be, min jiyan kiriye” û xwedî lê derdikeve. Parçeyek ji temenê xwe dibîne.

Min heta roja îro bi hezarê caran ji xwe re gotiye, “xweziya min sala 88’an jiyan nekiribûya.” Hêjî vê tiştê dibêjim. Ezê di hemû jiyana xwe de, heta henaseya xwe ya dawî jî bêjim. Ezê wê salê weke nehatiye jiyîn qebûl bikim. Min ew sal, ji nav çil salên ku jiyan kirine derxistiye. Di heman demê de gelek xemgîn im ku, ez neçar im wê salê binivîsim. Dibe ku herî zêde jî li ser wê salê bi-axivim û ezê neçar bimînim ku bibîr bînim. Ev jî bêşansiyek mezin e!

Tevî ku min protesto kiriye da ku hinek navan, hinek cihan û hinek têgehan nenivîsim, bibîr neyînim, di vir de neçar dimînim ku her carê vê sonda xwe xirab bikim. Hinek kesan ev cuda şîrove kir. Berovajî hizirîn, nirxandin, lê vê nêrînê jî ti caran nekarî rastiya heyî biguherîne. Tişta ku nehatiye jiyîn, tişta ku qet nehatiye hezkirin, nehatiye gerîn û nehatiye bêrîkirine. Êşa kêfxweşiya rewşên mirov bi hezarî caran poşmanî jiyînê jî dike, dixwaze bi mirov re were jibîrkirin û tê binaxkirin.

Çîroka min a min salekê bin ax kiriye, ji nû ve nayê jiyîn! Dema min kêliyên salên din ên herî xirab dinivîsand jî, min hestên wan rojan jiyan kir. Min heman hest hîs kirin û wisa

nivîsandin. Lê ez naxwazim bi ti şêwazî hestên sala 88'an cardin jiyan bikim. Gelo ev redkirina rastiya xwe, an jî rastiya salê ye? NA! Bi kûraniyek mezin dibêjim NA! Tişteke ku red dikim tine ye. Tiştên ku hewce dike were jiyîn bi mirovan re şopê dihêle. Ew nayên jibîrkirin û her tim di bîra mirov de dimînin. Lê ez ne dixwazim bibîr bînim, ne dixwazim binivisînim, ne jî dixwazim li ser bi-axivim! Lê mixabin ezê tevî vê jî binivisînim. Ez nizanim dê navê vê jî çibe.

Me di meha Sibatê de weke hemû girseya girtîgehê dest bi rojiya birçîbûnê kiribû. Hevalan nedixwest hinek ji me beşdar bibin. Hinek mijarên weke; "jixwe berxwedaniyek giştî heye. Em naxwazin hinek hevalên hincirîne û nexweşiyê wan hene beşdar bibin. Guncav nabînin. Lewma em guncav nabînin tu jî beşdar bibî. Ev çalakî kom bi kom tê lidarxistin. Wê dorveger be. Ji ber vê divê mirov di vê mijarê de hestiyar nêzîk nebe. Hatiye gotin ku, "Em di qoxuşa 35'an de Karasu û hinek hevalên din jî beşdar nakin." Dîsa hesabê rastiya me nedihat kirin û hestiyar nêz dibûn.

Min jî li hember vê bertek raber kir û notek nivîsand; "ger hûn min ji dervî çalakiyan bigirin, hûnê wê demê min nexweş bixin. Lê nikarim li hember vê li ber xwe bidim. Dê ev zêdetir min bikuje." Di heman demê de min diyar kir ku, ez vê biryarê rast nabînim û ger ez bizanim ezê di vê mijarê de li dijî biryara Rêxistinê derkevim jî, ezê tevlî vê çalakiyê bibim. Cardin helwesta min rexne kirin û hişyar kirin. Ew jî min bi nêzîkbûna hestiyar ve tewanbar dikin. Tevî vê min devjê berneda. Pirsgirêk ne nêzîkbûna hestiyar e. Ev nêzîkbûn ne exlaqî, ne civakî, ne siyasî û ne jî li gorî ti tiştî ye. Ez qebûl nakim. Ew şêwaza jiyanê bû. Hewce nedikir ku, min an jî yeke din dervî

vê bigirin. Ya rastî ez jî ji xeynî xwe re dibêjim, ‘dibe tevlî nebin.’ Her çendî weke nakokiyê bixuyê jî, qebûl dikim. Lê ya min eleqeder dike qetiyen nabe! Ji ber ez di demên berê de tevlî rojiyên mirinê nebûm, min êşên giran jiyan kir.

Gelo ez dikarim heta dawiya jiyana xwe wê kêmbûna 81 û 14’ê Tîrmehê derbas bikim? Dibe ku di sala 81’ê de agahiya me tine bû. Agahî, an jî biryarek mîsoger tine bû. Lewma me nedikariya em bi serê xwe tevbigerin. An jî çiqas rast e em bikin, an nekin. Gelek sedeman bandor kiribû. Lê dijmin di 14’ê Tîrmehê de bi hinek tiştên din ve mijûl dibû. Ji bona şikandina berxwedaniya heyîn li pey lîstokan ketibû. Dijmin ji bona van lîstokan çalakî ragihandibû û em jî wisa hîn bûn. Me jî xwe amade kir. Dibe ku encama derketî nede guhertin, pêvajoya çalakiyê ya dawî bû. Bes wê bibûya biryarek ketiye meriyetê. Her wiha dibe ku li hember pêşketinên ku pişt re rû bidin, em jî ji hêla wijdanî ve neşkên û xemgîniya vê ya mezin jiyan nekin. Me dikariya em wê bi lez veguherînin hewldana hêzek girîng. Ango tiştek min di vê mijarê de ji xwe re weke rêgez esas digirt hebû: li kuderê dibim bila be, berdêla wê çi dibe bila be, dê şêweza her cure berxwedaniyê bibe şêwaza jiyana min.

Lê êdî laşê kesî jî ne weke berê bû. Rojiya birçîbûnê ya du rojan jî bandor dikir. Heval bi israr ji hevalê M. Emîn Yavuz re dibêjin; “tu tevlî nebe.” Ji ber nexweşiya wî ya mîdê heye. Lê mijar jî hesas e. Her çendî hinek heval pêşniyarên wisa ber çav digirin jî, her kesî nedikariya rake. Axîna pêvajoyên hatine jiyîn, bi her hevalî/ê re dihat jiyîn. Şahadeta wan hevalên hêja û bedew, di dilê her kesî de birînek bû. Çi dibe bila be tola wan girtin, bibû janek wijdanî. M. Emîn li hember hemû pêvajoyên

berê yên zehmet, birçîbûn û êşkenceyên mezin li ber xwe dabû. Lê di berxwedaniya Sibatê de ew jî di roja yanzdemîn de şehîd ket.

Ya rastî ji roja nehemîn û pê ve hevdîtinan destpê kiribû. Lê lihevkirinek çênedibû. Hevalan wê rojê ji bona hevdîtinan bangî min jî kirin. Komek heval qelebalix hatibûn. Cezayê heval Can û Muzaffer zelal bibû. Wê şev ji Amedê derkevin. Destpêkê Can bi navê PKK'ê hevdîtin pêk anî. Tenê nîv danî karî tevlî bibe. Piştî nîvro jî Şener li şûna wî hat. Min yekem car ew di zindanê de wisa ji nêz ve didît. Destpêkê jî min di sala 78'an di Kongreya 1. a Damezirandinê de dîtibû. Wê demê jî dema bi devkî rapora Êlihê da bala min kişandibû. Ciwan bû. Tevî ku biçûk dixwiya, rapora herêmê gelekî berfireh dabû.

Di navberê de hevalên Karasu ew jî tevlê bûn. Min jî ji xwe re digot, nexwe bi Can û yên din re mijûl bûne. Bandora Karasu ya giyanwerî her tim diyarker bû. Bawerî ava dikir. Dost û dijminan jî nas dikir. Ya rastî hinek kesên di nava me de êrîş dikirin. Bes di vê êrîşê de jî rastiya xwe derxistin holê. Dibe em nêzî du salan mijûl kirin. Lê me destûr neda ku encamên cudatir rû bidin. Hêj nayê zanîn ku pirsgirêkên heyîn di kîjan astê de bûn.

Me jî weke qoxuşa jinan, xalek cuda bi ser daxwaznameya Sibatê ve zêde kiribû: me diyar kiribû em di nava girtîgehê de, bi statûya girtîgehek din ve cuda tên girtin, di nava girtiyan giştî de rewşek goşegiriyê jiyan dikin, ew jî helwestek kêfî ye, lewma em dixwazin were rakirin. Lê nehatibû bîra me ku em biçin cihê hewagirtina qoxuşan. Lê di nîqaşan de yekser nûnerên koman jî li dijî vê rewşa goşegiriyê bertek raber kirin. Hejmara me kêm bû. Em çar kes bûn. Tam nayê bîra min, lê

hevalekê got; “heta heval dikarin carê di demên hewagirtinê de jî werin.” Me ev mijar zêde neda pêş. Dema mêvandariya di navbera ‘qoxuşan’ de ket rojevê, ev jî hat destgirtin û di nava wê xalê de hat şîrovekirin. Pirsgirêkên din ên bingehîn girîng bûn. Her carê danazîna giştî dihat ferzkirin. Cih û wextê hevdîtina vekirî dibû pirsgirêk. Di vê mijarê de jî di wextê hewagirtinê de daxwaza hevdîtinan pêş ket. Dihat xwestin ku di rojên cejna, taybet û hemû rojên bêhnvedanê de hevdîtin werin qebûlkirin. Weke din jî her tiştê ku malbat tînin destûr were dayîn ku derbasî hundir bibin. Ji ber pirsgirêkên weke pirtûk û nameyan hebûn. Daxwaz hebû ku çayê di qoxuşan de were çêkirin. Hem ji bona tenduristiyê, hem jî ji hêla madî ve zêde zerar dida me. Ji bona her qoxuşekê ocaxa elektirîkê hatibû xwestin.

Li ser van mijaran nîqaşên dijwar hebûn. Hevdîtinên rojên destpêkê xetimî bûn. Malbatan jî li derve çalakî lidardixistin. Komek çûbû Enqereyê.

Me hêj nedizaniya, M. Emîn şehîd ketiye. ‘Rayedarek’ ji Enqereyê hatibû. Hevdîtin jî rayedarek paya bilind a erkdarê dadgeha Kolorduya 7. û ‘rayedarê’ ku Enqereyê hatibû bi hev re pêk anîn. Di nava nîqaşê de mijar hat ser por û rihên mirovan. Hinek pirsgirêk dirêj dihatin nîqaşkirin. Hem ji bona pirsgirêk evqasî derxistina pêş, hem jî ji bona di danasînê de hatiye destnîşankirin hêj li ser laşê mirovan û îradeya wan nêzîkbûnê serdest hene û cewherê nêzîkbûna yek tîpkirinê baş hat şîrovekirin, min jî dest werda; “xisletên mirovan ên herî xwezayî bûne amûrên çewsandinê. Her tişt bûne made. We di nava danasînan de bicih kiriye. Ev jî pêkanên hov ên dervî mirovahiyê ne. Divê bê nîqaş were rakirin.” Zilaman aciz bûn.

Lê mijar bi henekî bilêv kirin; “belê, xanima Sakîne, parastina mafê por û rihê zilaman jî dike.” Em hemû jî keniyan. Zilam di wir de jî bi zanebûn xîtabî min kiribû û axivî bû. Lê hêj gelek nêzîkbûnên ku tewş dixwiyan, bes di cewherê wan de ferzkirinên gelekî kirêt hebûn. Em bi wan ve mijûl dikirin.

Nîqaşên têkildarî hinek xalan xetimîbûn. Hat gotin ku; “wê bi demê re pêk werin.” Wan bi xwe daxwiyaniya şahadeta M. Emîn dabûn. Bi fêlbazî di dawiya nîqaşên hevdîtinan de gotibûn. Hewl didan her kesî nerim bikin û ti alozî rû nedin. Lewma her tim bi uslubê “em tika (rîca) dikin” di-axivîn. Em hemû ji nişka ve bêdeng bûn. Pişt re me got; “madem şehîdek me heye, ma em çima hêj li ser hinek xalan nîqaş dikin?” Ya rastî zêde kes jî naxwaze hevdîtinek ber bi dawiyê ve çûye, ji nû ve xirab bike. Jixwe dijmin jî zêde ne bi israr e. Nerim dihêle, ji ber wisa dixwiyê. Heta ji ber nîqaşên me yên di navbera me de tirsiyabûn. Di wê navberê de hinek xalên ku zelal bibûn, cardin hatin dubarekirin. Dema xala di mijara ‘mêvanan’ de zelal bû, diyar kirin ku, “jin jî dikarin dem bi dem derkevin cihê hewagirtinê û hevdîtina navxweyî jî wisa pêk were. Ango ev dihat vê wateyê: em jî dikarin bi hevalan re derkevin heman cihê hewagirtinê. Me destpêkê bawer nekir. Herî zêde jî kêfa me ji vê re hat. Lê dîsa jî bûyera şahadeta hatî jiyîn bandor li ser me hemûyan kiribû.

Em destpêkê çûn cihê hewagirtinê ya qoxuşa 35’an. Me encamên derketine ji wan re ragihand. Me hemû girtiyan komî, di heman wextê û demjimêrê de li cihê hewagirtinên qoxuşan bi rêzgirtin û duruşmeyan M. Emîn bibîr anî. Em duruşmeyên “M. Emîn Namire!”, “Bijî Berxwedaniya Me!” diqêrin. Di carekê de li hemû blokan ev duruşme pêl bi pêl deng veda.

Rewşa heyî ji malbatên derve re jî hat ragihandin. Komek malbatên nûner hatin. Daxwazên ku hatine qebûlkirin ji wan re jî hatin ragihandin. Pişt re çûn.

Fîrara mezin pêk nehat, lê sûrgûna mezin hat jiyîn…

Yekem care diçim cihê hewagirtina qoxuşa 35'an. Dîsa jî navê 35'an, her tiştê ayîdê wê Mazluman, Xeyrîyan û Pîran tîne bîra me. Ewder bi wan re bibû yek. Dihat binavkirin. 35…35…35…! Dema me li ser parçeyek naylon, rojnameyekê, bîdonek avê nimreya '35'an' didît, weke ku me tiştek pîroz dîtiye bi dorê di nav destê xwe de dibir, danî û radimûsa. Dema navê qoxuşa 35'an dihat bihîstin, her kes baldar nêz dibû, hewl dida fêm bike û di wê kêliyê de kelecanek belav dibû. Her kesî digot; "teqez tiştek heye." Êdî qoxuşa 35'an wisa di nava jiyana me de cih girtibû, axînên me, sonda me, birîna dilê me, kêfxweşî û hêviya me bû. Warek pîroz û kabeya zindanê bû. Jixwe her kesî jî wisa pênase dikir, di nivîsan de jî kabe dihat gotin.

Karasu ew di qoxuşa 36'an de bûn. 35 û 36 di heman blokê de bûn. Lê di beşên bi korîdoran ji hev cihe dibûn. Xwedî heman rewşê bûn. Ji berê ve heval di qoxuşa 36'an de jî diman. Lê belê, qadroyên me yên pêşeng û şehîdên me di qoxuşa 35'an de bûn. Lewma bandora wir a giyanwerî diyar bû. Ji ber vê ez jî destpêkê çûm serdana qoxuşa 35'an. Min hemû heval hemêz kirin, min gelek ji wan jî yekem car bû didît. Dema dîrokên dadgehan û rûniştinên dozan rastî hev dihatin, me firsend dîtibû û ji dûr ve hev nas kiribû. Bes giştî hejmar zêde bû û min jî nas nedikirin.

Min nedizaniya kî çiye, çi kiriye, çiqasî heval e, çiqas bi me re di peywendiyê de ye, an jî dûr e. Cihêkirinek wisa jî nayê bîra min. Ji bona min her kes heval bû, mirovên ku ew hovîtî jiyan kiribûn û binirx bûn. Me mirovên endamên komên din jî bûn hez dikir. Me ew jî weke rêhevalên zindanê didîtin û nirx dida wan. Ew jî wisa nêzî me dibûn. Herî dawî tenê em çar girtiyên jin mabûn. Di nava hejmarek pir zêde, me derbas dike de, em çar jin bûn. Lewma em 'xwîşkên' wan, 'gulên' wan, 'xwîşka mezin', heta gelek caran 'diya' wan bûm. Hevalê temenê xwe herî mezin jî digot; "xwîşka min." Hezkirinên xwe jî wisa rave dikirin. Vê baldariyê jî em didan şermê. Em hestiyar dibûn û gelek caran digiriyan. Ne zehmet bû em di vê mijarê de hevûdû fêm bikin. Lê dîsa yeqîn nakim ku, yek ji wan tiştên ku em ji bona wan dihizirîn, hîs dikin û çawa bi wan re jiyan dikin, zanibin, fêm kiribin û hîs kiribin.

Birçîbûnek goşegiriya bi salan dayî avakirin hebû. Lewma axaftin, mereq û baldariyên dem dirêj hemû, derbarê salên dirêj ên nedihat zanîn de bûn. Em hînî navê wan bûn. Di kîjan komê de tên darezîn, çiqas ceza girtine û gelek mijarên din hîn bûn. Piştî ku me hemû heval nas kirin, zêdetir hevalê Karasu behsa girîngiya pêşketinan û mijarên hewce dikir. Min jî berfirehî guhdar dikir û pirs jê dikir. Wî jî yek bi yek, hemû qadro, qadroyên berendam, kesên ku pirsgirêkên wan hene, kesên ku divê mirov li ser wan rawest e, kesên hatine cezakirin, heta kesên qaçaxî dikirin, kî çiye, peywendiya me bi kî re, di çi astê de heye, divê çi were kirin vegot. Min jî hewl dida hemûyan hîn bibim.

Kesên ku cezayên wan zelal dibûn vediguhestin cihên din. Dozên giştî bi encam bibûn. Hinek dozên komên din jî encam

bibûn. Lewma di vê manê de hinekê zêde lez nêz dibûm. Min dixwest her tiştî hîn bibim. Dibe ku bê şansiyek, an jî kêmasiyek rû bide. Yekem car bû em wisa dihatin cem hev. Dibe ku beşek mezin û girîng a hevalan ji vir jî biçûya.

Karasu hem vedigot, hem jî navê hinek qadroyan dida û digot; "bila ew jî ji te re bêjin. Bi wan re jî bi-axive û nîqaş bike. Fuat Kav û Hesen Atmaca hene. Ew hemû pêvajoyan dizanin. Ya rastî ger Can, Muzaffer û Riza jî amade bûna dê baştir bûya. Me jî zêde nekarî em bi hev re nîqaş bikin. Diyar bû, hevalên ku bikarin her kesî objektîf binirxînin ew bûn. Yilmaz Uzun, Şamîl, Saît Ûçlû û gelek hevalên din hene. Nirxandinên wan gelekî girîng in. Tu dikarî bi her kesî re baş nîqaş bikî. Wisa baş bû, vê derfet û firsendê baş binirxînin. Heval ji we hez dikin. Hem dê bibe moral, hem jî hûn dikarin pirsgirêkên heyî vekirî nîqaş bikin. Di nava me de hinekê jî her kes bi hev re ser çavê hev de hat. Ev her du salên dawî bi şer û pêvçûnên di navbera kesan de ve derbas bûn. Ger hinekê otorîteya Partiyê tinebûya rewş xeter dibû. Hevûdû guhdarkirin, fêmkirin lewaz e. Bertek zêde ne û hevûdû tewanbarkirin heye. Dibe ku tu xemgîn bibî, lê rastiya me ne weke tu ji dûr ve dizaniye. Dema tu bikevî nav de, dê tu jî baş hîn bibî. Jixwe tu di heman demê de endama rêveberiyê ya rûmet î.

Heta niha ti nivîsandin li gorî dihat xwestin pêş neket. Nexwe te jî dikariya gelek tevkariyê bikî. Tu dikarî niha baş tevlê bibî. Wê tu di asta biryaran de tevlê bibî. Di heman demê de dibe ku tu rasterast nekarî tevlî civînan bibî û bişopînî. Lê belê dê beriya civînê û piştî civînê yekser nêrîn û pêşniyarên te jî werin girtin. Dê ev jî bandor li biryaran bike. Ger dema pêş

derfet çêbin, tu dikarî tevlî civînan jî bibî. Mirov dikare di navberan de li cihê hewagirtinê bi şêwazek zêde bal nekişîne, hinek civînên dem kin lidar bixe. Em dikarin xwe bidin quncikê û bi-axivin. Lê tu niha dikarî bi giştî bigerî, di her qoxuş û blokê de hevalên berpirsyar û nûner hene. Tu dikarî wisa nêrîn û pêşniyarê wan jî berhev bikî. Tu dikarî xwe bigihînî cihên ku em nikarin biçinê û lê tevbigerin. Lewma tu dikarî yekser bi wan re bi-axivî. Êdî not hewce nakin. Dema hewce kir, emê binivisînin…"

Em derketin cihê hewagirtinê. Gelek heval li wir bûn. Ji ber roja yekem bû, bi her hevalî re yek-du xolekan axivîm û me nîqaş kir. Wext zû derbas bû. Tenê me karî em silav bidin hev û rewşa hev bipirsin.

Em wê demê zêdetir diçûn cihê hewagirtina qoxuşa 35'an. Di hevdîtinên me pêk anîn de gotibûn; "hûn dikarin biçin cihê hewagirtina qoxuşên ku xizmên we di nav de hene." Hevalan jî qoxuşa 35'an guncav dîtin. Cihê çûna me ya esasî ewder bû. Hem ji ber navend bû, hem jî ji bona wateyek wê ya giyanwerî hebû. Her wiha bi qoxuşek din re heman cihê hewagirtinê parve dikirin. Ev jî derfetek baş bû. Heval qelebalix bûn. Me niha ji bona cihên din lez nedikir. Me serdanên xwe yên destpêkê pêk anîn. Her carê serdana me ya qoxuşekê danek rojê didomiya û me diqedand. Em diçûn serdana komên din jî. Em di Newrozê de çûn serdana her kesî û me Newroza wan pîroz kir.

Di destpêka meha Adar'ê de gotin ku, dê komek qelebalix Karasu jî di nav de werin veguhestin. Şev duruşme hatin qêrîn: duruşmeyên "Bimire Sûrgûn!" Tarîtiya şevê diqetandin. Karasu û hinek heval ji bona xatirxwestinê li qoxuşan digerin.

Li her qoxuşa ku diçûyê bi duruşmeyan dihat pêşwazîkirin û bi duruşmeyan dihat rêkirin. Hevalan digot; “tam di rewşek merasîmê de bû.”

Hatibû gotin; “ji ber biryara dadgehê ye û dispêrin hinek hecetên ‘zagonî’ tiştek em bikin tine ye.” Hinek ji wan gotiye; “em bişewitînin, xirab bikin her derî.” Lê guncav nehat dîtin. Dihat gotin ku; “rewşên weke îsyanan, ji bona dijmin derfetên provakasyonê ava dikin.”

Roja paştir me li korîdorê hevalên biçin tevê re hevdîtin kir. Heta karên birêxistinê temam bûn em bi hev re man.

Karasu got; “me şevê din li qoxuşa 35’an bi hevalan re civînek lidar xist. Rêveberî hat destnîşankirin. Wê tu jî li gorî derfetên heyîn beşdar bibî. Di serî de Hamilî wan got, ‘em bişewitînin, xirab bikin. Divê em li hember nêzîkbûnên wisa bêdeng nemînin. Ev sûrgûn e. Ger wisa berdewam bike, dê sûrgûn jî berdewam bikin.’ Lê em dijî wan derketin. Belê, gelek armancên dijmin hene. Naxwaze evqas hêza qadro li Amedê bihewîne. Di sala 80’î de her kes li vir kom kir. Niha jî berovajî vê dike. Girseya Amedê, gelê wê welatparêz e. Her pêşketinek ji hundir derdikeve bandor li wan dike. Dixwazin malbatan û hêza wan jî parçe bikin. Di vê mijarê de hinek hêcetên zagonî jî peyda kirine. Lewma bi biryarin ku me bibin. Ger em rabin asteng bikin, dê pêşketinên cuda pêş bikevin. Dibe ku îsyan û hinek helwestên din rê ji windahiyan re vekin.”

Destpêkê min jî got; “nabe em wisa bêdeng bimînin.” Lê dema Karasu ew axivîn, ez qane bûm. Lewma tişta herî girîng fêmkirina cewhera taktîkên dijmin bû. Mirov dikare her derî bike Amed. Jixwe wê rojê duruşmeya; “dê her der bibe Amed!” Hatibû qêrîn.

Dema kom rêket hemû girtiyan bi hev re, “Bimire Sûrgûn!”, “Bijî Berxwedaniya me ya bi Onur!” qêriyan. Heta dengê maşînan winda bû, dengê kesî nesekinî. Carek din soza girêdana bi rêhevaltiya Karasu re û ji bona ew parçeyek ji şehîdên me bû, ew girêdana bedew hat bilêvkirin.

Endama rêveberiyê ya ‘rûmetê’ me…

Piştî berxwedana Sibatê, îdareya girtîgehê sivîl bû. Êdî gardiyan sivîl, mudur sivîl bûn. Du-sê mudur bi hev re hatibûn. Ew jî mudurê cîgirê yekem û duyem bûn. Dema ez li girtîgeha Meletî bûm, mudurê bi navê Mehmet li wir karmend bû. Li girtîgehê gardiyan, an jî nivîskar bû. Niha jî weke mudurê duyem hatibû Amedê. Gardiyan jî taybet hatibûn hilbijartin û qadroyên taybet ên ji girtîgehên din anîbûn. Hêj di roja destpêkê de serkêşê gardiyanan li hember bi serbestî çûna me

ya cihê hewagirtina hevalên xort bertek raber kir. Kumê xwe avêt erdê û got; “mudurê min ez nikarim li ciheke ku jin û zilam bi hev re diçin cihê hewagirtinê de kar bikim. Îstîfa xwe didim.” Wê rojê jî dereng deriyê me vekirin. Dema me pirsî çima deriyê me dereng vekirine, mudur jî derdê xwe ji me re vekir; “gardiyanê min kumê xwe tavêje ber min. Hûn ji me re dibêjin, ‘mudurê faşîst’, yê din jî dibêjin, ‘hûn mudurê nêzî girtiyanin.’ Em jî di navberê de mane. Em çi bikin?”

Hesen Atmaca, Fuat Kav, Sînan Canyak, Faruk, Şener û ez di rêveberiya teng a girtîgehê de bûn. Heta nîvî û ber bi dawiya meha Gulanê rasterast tevlî civînê wan nebûm. Dema mijarek girîng hebûya, em li hewşê diciviyan. Lê esasî di nava pergala kevin a fermî de her tişt dihat meşandin. Min nêrînên xwe digot û me nîqaş dikir. Carê me dikariya du, sê, an jî pênc kes bi hev re nîqaş bikin. Ango pirsgirêkên teknîkî zêde nedibûn asteng. Lê me zêde nedikariya, em nîqaşên dirêj û berfireh wisa bikin.

Pêşî biryar hatibû girtin ku, dê di Newrozê de pêvajoyek nû were destpêkirin. Dê li dadgehan parastina Kurdî û di hundir de jî pêvajoya rexnedanê bihata destpêkirin. Li hemû girtîgehan jî pêvajoya rexnedanê dihat destpêkirin. Pêvajo li ser esasê wateya Newrozê ya giştî û taybet jî bi mebesta girêdana bîranîna Mazlum’an ve dihat destgirtin. Her wiha derbarê pêvajoyê de nivîsek jî hatibû nivîsandin. Ew jî têkildarî wate û girîngiya pêvajoyê û mijarên divê pêvajo çawa were destgirtin de bû. Dê rola qadroyan û zelalbûna giştî jî hinekê di vê pêvajoyê de ronî bibûya. Lewma ew pêvajo wisa dihat destgirtin.

Karê nivîsan piranî Şener dikir. Rojnameya Hawar bi rêk û pêk derdiket. Destpêkê hinek hejmarên wê ji me re dihatin. Nexasim di sala 87'an de nivîsên berfireh derdiketin. Gotûbêjên cur be cur li wir dihatin meşandin. Mijarên herî girîng pêşketinên li sovyetê rû dane û bi gelemperî jî pirsgirêkên pergala sosyalîst jiyan dike bal dikişand. Nivîsên têkildarî tîmên taybet, çetegerî û saziyên şerê taybet de jî derdiketin. Lê belê, pêvajoya Sovyetan, zêdetir pêvajoya Perestroyka û Glastnos a ku bi Gorbaçov re destpê kirî, bi şêwazê Gorbaçovparêz û dijberên Gorbaçov dihat nirxandin. Ew nêrîn heta asta tewanbarkirin û cihêtiyê zêde kûr bûn. Bibû mijarek ku li pêşiya hemû pirsgirêkên weke bêpîvanî, bêsînoriyê û hwd dihat destgirtin. Piştre ez jî pê hesiyam ku kesê herî zêde di bin navê cur be cur de van nivîsan dinivisîne Şener e. Ji ber di her hijmarê de bi nasnavên cuda dihat nivîsandin. Lê belê, hemû nivîs jî heman kesî dinivîsî. Hinek kesên din jî yên dinivîsandin hebûn. Dihat gotin ku di vir de armanca sereke ev pirsgirêkên heyîn werin gotûbêjkirin û bi avakirina nakokiyan ve zêdetir vekirina van mijara ye. Me hemûyan nîqaş dikir. Êdî gihan astek wisa em neçar man pêşniyar bikin gotûbêj û nivîs werin rawestandin. Her kes dikare di navbera xwe de nîqaş bike. Lê dema her kes ji xweber di rojnameyê de binivisîne, dê her kesî rave bike. Lewma nedibû. Ji ber hêj kesî jî baş nedizaniya, nêzîkbûnên partiyê çine. Lewma hewce nedikir her kes van nîqaşan li ser hev ferz bike û bide berdewamkirin. Ti feydeya wê jî tine bû.

Herî dawî nivîsa Rêbertiyê ya di Kovara Rizgarî de derketî ket destên me. Nivîsek bi navê Elî Firat bû. Êdî ew esas hat girtin. Bes heta demekê jî dihat gotin ku; "tiştên min digot rast

bûn. Rêbertiyê jî heman nêrîn nivîsandine. Nêrînên me lihev dikin.” Yê din jî li ser vî esasî dihat tewanbarkirin. Êdî piştî mijûlbûnek mezin em ji gotûbêjên şaş û ti encamê ava nakin dûr man.

Pêşnûme pirsên raporên ku werin nivîsandin jî hatibûn amadekirin. Bi gelemperî pirsên weke, bîrdozî û polîtîkaya partiyê çiye, nêzîkbûn çawa hatin kirin û nirxandina pêvajoya piştî salên 84’an hebû. Hat gotin yê dixwaze dikare pêvajoya lêpirsînan jî binivisîne.

Hedefa pêvajoyê ya esasî zelalkirin bû. Lewma tişta herî girîng şaşî, lewazî û suc derxistina holê û pirsgirêkên hinek kesan werin destgirtin bû. Me dixwest îddîa, tewanbariyên beramber hev, şik û şêlûbûna ku heye derkevin holê. Me hemûyan raporên xwe li ser vî bingehî nivîsandin.

Rapor ji hemû qadroyan re dihatin xwendin. Nêrîn dihatin girtin. Rêveberiyê raporên xwe ji qadroyên di qoxuşa 35’an de dimînin re xwend. Rexne pêş ketin. Şener piştî ku rapora xwe nivîsand, ji min re xwend. Jixwe min piraniya raporan jî dixwend. Lê belê, Şener berî rapora xwe radestî qoxuşa 35’an bike, ji min re xwendibû. Bi gelemperî mijarên ku hatibûn nivîsandin zêdê bal nekişand. Ji ber haya min ji her pêvajoyê tine bû, ji bona min balkêş nedihat. Lewma li gorî ya herî guncav bi encamên raporên din re nirxandin bû. Tenê nirxandina wî ya derbarê pêvajoya berxwedêriya Çile ya 84’an de ez aciz kirim. Dema hevalan beriya niha hinek mijar bi nivîskî ji me re ragihandin, bi heman hestî aciz bibûm. Ma mirov çawa hişê xwe winda dike? Ev jî pirsek di hişê min de mabû. Lê min tengav dikir û dibû sedem ku bêbawerî pêş

bikeve. Acizbûnek wisa bû ku, mirov pir hêsan nekare bibîhîse, bihizire, nekare bêje û erzan ji yê miqabilî xwe re nede der. Min wê demê jî hinek pirs ji xwe kiribûn. Min wê demê gotibû; “ma çawa wisa dibe?” Lê ev rewş jî girêdayî bandorên pêvajoya lewazî, qelsî û teslîmiyetên heyî hatibû nirxandin. Ji ber tiştek din di destê mirov de tine ye û mirov neçar dimîne wê esas bigire. Her çendî di hîsên mirov de nerehetî hebe jî, ev rastî tê jiyîn!

Nizanim wî ez çiqas nasdikirim. Lê belê, herî baş Şener dizaniya ez wisa ji rêzê xwe navêjim nav her tiştî, vekirî me, çi ji dilê min tê dibêjim, tenê li ser bingeha hestiyarî nagirim dest, qet nebe di tespîtkirin, pênasekirin, nîqaşkirin û naskirina nakokiyên bûyer û pirsgirêkan de bêrehim û wêrek im. Heta tiştek ji ber çavên min nareve, an jî ya herî baş ferq dikir jî ez bûm. Naskirina hev, xisletên hev nasînê tiştek ji me her duyan jî kêm nebû!

Piştî ku min rapor xwend tiştek negot. Yek du caran pirsî; “çawa çêbûye?” Her du caran jî min bersiv da; “min xwend, bes dê heval binirxînin.” Ji ber dibe ku piştî min xwend, gumanê ku bi min re avabûyî di rûyê min de xwe dida der, lewma dipirsiya. Ji ber ez di wan mijaran de nejêhatî me ku tiştên di dilê xwe de veşêrim, di awir, çav û dengê min de xwe dide der. Gelek caran vê xisletê ez jî didam dest. Lewma her kesî pir hêsan pirsa; “xêre, çi bûye?” Ji min dikir. An jî dijberî wê yê miqabil a bi xwe re, di dil û mejiyê xwe de digot. Ango ez di wan kêliyan de zêde hesas dibûm û min rewşên ku kesên miqabilî min dijiya hîs dikir. Lewma Şener jî carekê ji min re got; “mirov nikare li hember te tiştekê veşêre. Tu weke ziyaretek, an jî mabetek ku Xiristiyan gunehê xwe lê pak bike

disekinî. Gelo tu di ferqa vê xisleta xwe de yî?" Min jî bersiva wî da û got; "ji ber ez tiştekî naveşêrim, dibe ku çavkaniya xwe ji kesayeta min a vekirî digire."

Rapor hatibû xwendin, di serî de hevalê Gezgor û gelek hevalên din, helwesta Çileya 84'an ji nû ve nirxandin û rexne kirin. Gelekî tengav kirin. Hesen Atmaca ew jî di vê mijarê de nirxandinên di pêvajoya rêveberiya kevin de hatine kirin esas digirtin. Her çendî hinek rexne hebin jî, di vê çarçoveyê de dinirxandin. Heta hinek hevalan xwest ku, rapora xwe ji nû ve binivisîne. Lê Şener dîsa hinek tişt bi devkî ragihand. Serve zêde kir û wisa hat bi encamkirin. Ev nêrîn hemû jî di girtînameyê de hene. Em dihizirîn ku, girtînameyan jî bi raporan re bişînin derve. Hem ji bona fêmkirina pêvajoyê, hem jî asta me ya nîqaş û nirxandina pirsgirêkan ji hêla partiyê ve were zanîn û fêmkirin me bi feyde didît.

Di vê navberê de rapora Hamilî zêde dirêj bû. Sernivîsek ecêb, a weke "Belgeya Şoreşgeriya min a Çardeh Sala ye" nivîsandibû. Ew jî bi heman şêweyî hat xwendin û nirxandin. Avaniya me hemû nedikariya were cem hev. Lewma tenê qadroyên di qoxuşa 35'an de hemû rapor dixwend û dinirxandin. Rexne jî ji yê têkildar re dihatin ragihandin. Weke din jî di qoxuşan de dihatin xwendin. Lê yeke yek dixwendin û nêrîn ji navendê re dihatin ragihandin.

Rapora Hamilî nehat qebûlkirin. Nêrînên hevbeş weke, rexnedana xwe nedaye, rewşa xwe nabîne, bibertek nêz dibe û wisa encaman ava dike, derket holê. Biryar jî hevbeş bû. Cewhera rexneyan rast bû. Nêrîna piranî qadroyan bû. Hamilî cara duyem nivîsandina raporê weke cezayekê nirxand. Ji ber vê jî nivîsandina raporê red kir. Got; "biryar nerast e. Di vir de

derdor tê meşandin û rêvebirin.” Weke bertekên hinek kesan ên taybet dinirxand. Wê nêzîkbûna wî jî her tişt zêdetir tevlîhev dikir.

Bertekên Hamilî piştî sûrgûnan jî zêde bûn. Ji bo rexneyên wî tiştekê nabêjim. Lê min hewl dida bertekên wî fêm bikim. Ji ber dema di wê mijarê de pîvanek nebûya, zerar dida. Diviya li her cihî û di nav her kesî de, ev gotin wisa hêsan nehatiban gotin. Nerast bû ku, pirsgirêkên rêxistinî wisa li naverastan werin nîqaşkirin. Ji ber di nav zindanê de nîqaşên wisa zêde xeternak bûn. Uslubek wî ya gilî û gazinc hebû. Dema dihat pirsîn; “temam wê demê çima nehat sererastkirin” an jî “çima te bi xwe nekir” jî bertek raber dikir.

peywendiyên wî yên bi Şener re jî ecêb bûn. Her duyan jî hev rexne dikir. Gelek caran Hamilî got; “ew kurê kehban ji bo berjewendiya xwe dikare her tiştî bike.” Di vê mijarê de uslubê rexneyan jî dabû aliyekê, bê ku vekirî hinek diyarde û bûyeran destnîşan bike axivî bû. Bes heman Hamilî jî digot; “ji bilî Şener kes nikare vî karî bike.” Bi vê nêrîna xwe ve jî hewl dida di karên herî zêde çalak de cih bigire û pesnê jêhatiyên wî yên di nav rêveberiyê de dida. Ev jî ji bo min ecêb bû. Bêpîvaniyek bû. Her çendî cewhera mijarên ku got û rexne kirî rast bin, bi vî şêwazî girtina dest, li hember her kesî heman uslub bikaranîn, şêlobûbûnek mezin ava dikir. Kîjan ji wan rast bû, an jî kîjan ji wan helwesta Hamilî bû? Henek bû, an jî rastî bûn? Tiştek nediyar bû. Gelo dibe ku nêzîkbûnek karyerîzmê be. Gelo dibe ku nêzîkbûnek hesûdî be? Ez neçar dimam hemûyan jî di nav hev de bihizirim da ku fêm bikim.

Şener di vê mijarê de bi tevdîr di-axivî. Çi pirsgirêkên derbarê giştî de, çi jî pirsgirêkên derbarê kesan de dibe, çi jî

dema em têkildarî Hamilî li ser pirsgirêkekê di-axivîn, em baldar nêzî bertekên wî dibûn. Nexasim dema me di mijara Hamilî de dest bi axaftinê dikir, bi şêwazê, "şaş fêm neke", an jî "em naxwazin tu xirab bandor bibî, lê belê…" dest pê dikir. Carna jî dihizirîm ku; "gelo ev rol dilîzin." Hem dilxwede di mijarên ku hesas im de hişyar nêz dibin, naxwazin xemgîn bibim, lê hem jî nêzîkbûnek ez qet hîn nebûme û min mat dihêlin raber dikin. Şêwaz û uslubên wan ên di vê mijarê de gelekî ji hev cuda bûn. Lewma li gorî min tirsnak bûn.

Nîqaşên me yên bi Hamilî re, bi raporê re zêdetir pêş ketin. Ji ber rapor ji nû ve hat xwestin, bertek raber kir û got; "hinek kes zanebûn wisa nêz dibin û xirab dikin." Bi vî rengî hemû rexneyên heyîn red dikir. Lewma bi her kesî û rêxistinê re rû bi rû dima. Bi gelemperî her tişt bi nêzîkbûnên Şener ve girê dida. Li hember hevalên beriya niha rexne kirine û hevûdû nas dikin bertek raber dikir. Nêzîkbûnek zelal, bi rastî jî pirsgirêkê çareser bike û derbixe holê pêş nediket. Ya rastî wî Şener baş nas dikir. Ji ber pêvajoya berê de kesê herî zêde pê re mayî Şener bû. Heta hinde nêzî hev bûn, her tiştê xwe jî bi hev re parve dikirin. Têkîliyek hevaltiya hucreyê, di asta ehpat-çawiştî de ku, fermiyetê derbas bike, derdê xwe parve bikin pêş diket. Ew şêwaza têkîliyê bi gelemperî jî serwer bû. Hemû lewaziyên hev nas dikin û meylên hev dizanin. Lewma min jî hinekê bi vê ve girê dida, lê dîsa jî tam tênedigihiştim û min çareser nedikir.

Helwesta Hamilî ya li dijî raporê, tam bû pirsgirêka pêvajoyê ya bingehîn. Hinek kesan jî bertekên xwe pir hêsan di nav vê pirsgirêkê de didan der. Gelo li vir çeloxwariyek hebû? Çima nayê fêmkirin, an jî baş nayê dîtin? Li ser hemû îhtîmalan jî difikirîm.

Ji ber nêzîkbûnên rêveberiya kevin ên lîberal, bûrokrat, teng, şêwaza tevgera navendperest, li hember pirsgirêkan nêzîkbûna şêlo û parçebûna di nav xwe de bûn sedem ku, pirsgirêk ser hev kom bibin. Bi gelemperî pirsgirêkên avaniyê û yên di asta rêveberiyê de, pirsgirêkên di asta qadroyên pêşeng de têkilhev bibûn. Pirsgirêka qadroyên di asta rêveberiyê de zêde nedihat diyarkirin û nedidan der. Tenê bi hinek encaman û xetên giştî ve hinek tişt dihat zanîn. Nêzîkbûnek cewhera wê fêm bike, çareseriyê bike malê giştî tine bû. Dema wisa jî dibû, nêzîkbûnên weke; "bila rêveberî çareser bike. Jixwe tenê ew dikin" pêş diket. Di dema pêvajoya nû de pirsgirêkên heyîn hinek din derketin holê, vê carê jî tiştên zelal dîtin û serdeçûnek hebû. Lê mixabin dûrbûnek ji dîtina mijarên esasî hebû.

Ya rastî Hamilî ji destpêkê ve di asta rêveberiyê de taybet û xweser jiyan dikir. Neketibû nav her kesî û jiyanê. Heta dema bi ser Karasu wan diçûn de, her çendî hêceta her yek ji wan hebe, eniyek dijber a hevbeş hatibû avakirin. Bûyera Fuat, helwesta pêşniyaza çaralî û gelek bertekên din ên takekesî û berfireh bibûn yek. Lê kesê di navberê de hêzek bidest dixist jî, Şener bû. Ji ber derbarê pêvajoya ku li hember wî helwest hatibû raberkirin û ceza di pêkanê de bû, zêdetir Karasu ew dihatin rexnekirin. Tevî cezaya di pêkanê de yê ku bandor li rêveberiyê dikir, çalakger û dihat guhdarkirin Şener bû. Lê yê dihat rexnekirin jî, hinek kesên din bûn. Dîsa pişt re yên pêşniyaz dan, li dijî rêveberiyê amadekariyên alternatîf dikir, Şener jî di nav wan de hemû bûn yek. Pêvajoyek tevlîhev bû. Her ku dihat pênasekirin, her tişt zêdetir tevlîhev dibû. Hukumetan jî nedikariyan pirsgirêkan di vê astê de biqelişînin

û ji hev cuda bikin. Hêzên weke koalîsyon, kulîs, komîsyonên lêkolînê û pêşniyazname hatibûn amadekirin! Hişê min nedigirt. Gelo çima her tişt wisa tevlîhev bû?

Min jî hewl dida rewşa heyî fêm bikim. Pirsgirêkên min ên bi Hamilî re ez mijûl dikirim. Min nedixwest wê danim aliyekê. Ji ber ji pirsgirêkên din necuda bû. Nîqaşên hevbeş, bûyerên rû didan, bi tenduristî nirxandina diyardeyan, çi dibe nabe, yekser di daxwaza fêmkirina wî de bandor dikir. Hamilî jî di her nêzîkbûna xwe de ev bertek didan der. Li şûna ku min endamek rêveberiyê bibîne, her axaftin, rexne, pêşniyar û fermana bi navê rêveberiyê dihat kirin, takekesî dinirxand. Digot; "ez dizanim ev nêrîna filan kesî ye. Filan kesî got ne wisa." Li gel vê jî, li gorî dixwest dijûn ji kesan re dikir. An jî gelek pênase hêjayî wan didît. Ango hemû bertek, hêrs û delaliyên xwe jî li hember min raber dikir. Ev aliyek kesayeta wî bû. Aliyê wî yê din zêdetir zehmetî ava dikir. Nîqaşên di navbera me de derbarê têkîliyê de û nêrînên li ser wê mijarê, pêşî li hemû mijarên din digirt. Ji ber Hamilî tam dixeyîdî. Mirov nedikariya bi wî re bi-axive. Pir hêsan red dikir. Guhdar nedikir. Di navberê de fermiyet nedihişt.

Her hevalê di asta rêveberiyê de pir baş di ferqa vê rewşê de bû. Yê herî baş tengezariyên min ên di vê mijarê de ferq kirî Şener bû. Heta hewl dida min qane bike. Digot; "tehemûla te zêde tine ye. Zû biryarê nede." Lê belê, herî zêde jî wî helwestên ku nakokiyên min bi Hamilî re kûr bike raber dikir. Tevî ku di rêveberiyê de bû, notên taybet dişand ji Hamilî re. Vê pêpîvaniya wî derdixist holê. peywendiyên yekser ên bi hevalan re min dimeşand. Min not didan. An jî pirsgirêkek heyî min yekser ji kesê têkildar re digot. Lewma xwezayî ez dibûm

muxatabê nîqaşên destpêkê jî. Hamilî dikariya notên ku ji bona wî hatine nivîsandin biqetîne û bavêje pêşiya min. Gelo çima nêzîkbûnên tehrîkirinê raber dikir? Gelo Hamilî çiqas di ferqa vê de bû? Mixabin ê ku herî zêde rewşa derbarê vê mijarê de wî şêlo dikir. Bertekên wî ferdî bûn. Pîvan nas nedikir. Di vê xalê de gumanên wî yên rêxistinî tinebûn. Ez neçar bûm ku li dijî nêzîkbûna ya ji prosedora kargeriya rêxistinî derkevim. Vê carê jî digot; "bandor li te dikin" û xwe dida aliyekê.

Hevalê Hesen Atmaca jî tam di vê pêvajoyê de hat berdan. Ez di kêliya dawî de gihamê û min jê re got; "ez têkîliya xwe ya bi Hamilî re qut dikim. Tu dikarî ji hevalan re bêjî. Êdî nikarim rakim. Dibe ku derve hatibe bihîstin, tu dikarî bêjî ku rewşek wisa tine ye." Wext tine bû. Lewma min nekarî tiştek din bêjim. Ji ber em jî ne li benda berdana wî bûn. Berdanek ji nişka ve bû. Ji ber derfet nebûn em zêde bi-axivin, ew jî ji ber gotinên min mat ma. Lê tenê got; "temam." Asta nîqaşên me dizaniya. Ya rastî kesê di vê mijarê de herî zêde baldar nêz dibû Şener bû. Ji ber hêj di serî de agahiya wî ji vê têkiliyê hebû, min jî herî zêde bi wî re nîqaş dikir. Ew jî di nava refên partiyê de dergistiyê keçek bi navê Elîf bû. Nîşana xwe jî kiribûn. Min jî wer dizaniya ji ber Hamilî ji nêzîk ve nas dike û ji ber ew jî bi dergistiye lewma wisa nêzîkî Hamilî dibe. Min bi vê yeqîn dikir û şaş nêz nedibûm. Jixwe min xwe rehet vedikir. Weke pirsgirêkek takekesî jî nedinirxand. Heta yeqîn dikim vekirîbûna min a di vê mijarê de zêde pêş diket, di asta bêpîvaniyê de bû. Çi dibe, nabe. Min her tişt jê re digot û li çareseriyê digeriyam.

Piştî ku Hesen çû, diviya alîgirê wî Şener yekser sekreterya bûya. Berê jî li ser hatibû axaftin. Hesen jî dewrî wî kir. Hema Şener yekser pêşniyar kir; "bila yek din be. Ez naxwazim bikim. Fuat Kav dibe. Tu dikarî bikî. Ango bila hevalek din sekreterya be. Ez bi şêwazek din zêdetir bikarim tevkariyê bikim. Nexwe dê zehmetiyan bijîm. Wê heval şaş fêm bikin. Derheqê min de gelek tişt hatin gotin. Peywirek di vê astê de dê di navbera hevalan de bibe sedema bertekan. Min jî di vê mijarê de kêm jiyan nekir. Ji bona tiştek bi rêxistinê neyê, min dem bi dem xwe kir mertal jî." Mijara dibêje, 'min xwe kir mertal' tenê pirsgirêka cilên yek tîp bû. Tevî ku nêrîna her kesî ya hevbeş bû, hat gotin ku, "Şener daye berkirin." Wî jî her tim behsa vê dikir.

Min jî got; "tu pirsgirêkan ferdî dinirxînî. Rêveberî karek ekîbê ye. Ger xebat jî li ser vî bingehî werin meşandin, ma dê kî çi bêje?" Mînaka Hamilî da; "tu dibînî. Her tiştî bi min ve girê dide. Ger peywirek pêş bikeve, dê zêdetir min bike hedef." Li dijî vê hêceta wî jî derketim û min got; "emê hemû li dijî êrîşên bi vî rengî derkevin. Baş e.? Divê mirov ji erk nereve. Ev jî nabin hêcet." Hevalê Fuat Kav wan jî di vê mijarê de gotin bila Şener be. Ji her kesî zêdetir Fuat li hember sekreterya bertek raber kiribû. Ger ji destê wî were, dê ji rêveberiyê jî derkeve. Naxwaze cih bigire. Êdî nizanim ji ber dilnizim bû, an jî ji ber zehmetiyên rêveberiyê hebûn, lewma wisa nêz dibû? Yeqîn dikim ji ber gelek bazar ser karê rêveberiyê dihat kirin, lewma zehmet bû û nedixwest. Nîqaş û rexneyên pêvajoya borî bandor lê kiribûn. Rêveberî 'gomlekek ji agir' bû. Nexasim di zindanê de ji agir zêdetir her tişt bû. Nizanim ji ber asta

pirsgirêkan û rastiya me baş nedizaniya, vî agirî ez neditirsandim. Tişta herî zêde ez ditirsandim, hinek nêzîkbûnên dîn û har bûn.

Ya ku Şener qane kirî yek jê jî, ez bûm. Heta ya herî zêde hewl da ez bûm. Di ferqa asta karên wî de bûm. Sekreter, an jî ne sekreter be, zêde ferq nedikir. Ji ber bibandor bû. Lê berpirsyariya di asta yekem de zêdetir baldarî û berpirsyarî dixwest. Ger mirov bike û neke jî zû tê dîtin û fêmkirin, baş derdikeve holê.

Kesayeta Şener tim di nîqaşê de bû. Ya rastî nîqaşan bi pêvajoya rexnedanê ve ji nû ve destpê kiribûn. Di wateyekê de nêzîkbûna rêxistinê ya berê, niha di pêvajoya nû de fermî bibû. Ango Şener rexnedana xwe dabû û wisa ser pirsgirêkê hatibû girtin. Aliyek din ve Hamilî di rojevê de bû. Dîsa rewşa kesên berê îtîraf kirine û cardin devjê berdane, kesên lewaziyên wan hatine jiyîn, ceza girtine, heta kesên şêweya girtina wan nediyarin, kesên di pêvajoya lêpirsînê de vebûne û axivîne derketibûn pêş, li ser wan dihat sekinîn. Rapor ji wan hatibû xwestin.

Min ji Hesen re gotibû, lê cesaret nedikir ji Hamilî re bêjim. Ji bona ji berê zêdetir bihêrs bû, pirsgirêk jî zêdetir tevlîhev bûn. Ez ji bertekên wî ditirsiyam. Lê her ku me dirêj jî dikir, hevalbendiya di navbera me de jî qels dibû. Min nedixwest ew xirab bibe û bikeve rewşek lewaz de. Ger ew têkîlî nebûya, ezê hêsantir bi ser de biçûma. Heta min dikariya tevkariyek baştir û li ser bingeha alîkariyek mezin nêzî Hamilî bibûma.

Berê wisa bû. Dema em li Elezîzê bûn zêde bêrehim ser de diçûm. Lê bandorek erênî lê dikir. Cuda fêm nedikir. Dizaniya ku ez jî bi gumanên rêxistinî tevdigerim. Lewma baldar nêzî helwestên min dibû. Lê mixabin niha çi bêjim, bi gumana ku hinek din bandor li min dikin, armanca wan ew e ku vê têkîliya me xirab bikin. Bandora nêzîkbûnên ferdperest, li gorî xwe û mûlkiyetê, dibû sedem ku fermiyet, siyaset û rêhevaltiyê nebîne. Hêcetên wî cuda dibûn. Har dibû. Nedizaniya ku ew têkîliya yeqîn nedikir xwe bigihîneyê, lê xwe gihandiyê di rastiyê de siyaset bi xwe ye. Em çiqas bixwazin jî aliyek wê ya taybet pêş nediket û jixwe nedibû. Lê ger em bikarin wê di navenda siyasetê de bidin rûniştandin, em bi hev re rast nîqaş bikin, pirsgirêkan rast tespît bikin, li ser bingeha berjewendiya rêxistinê bigirin dest, emê bikarin ya teybet û ya giştî jî bi hev re, bê ku me evqasî mijûl bike bi hev re bijîn.

Ew ‘têkîliya taybet’ a li ser bingehek hêzdar nehatibû avakirin, ne dibû ku li vê navenda şer û nîqaşan de bidome. Ji ber xisletek xwe ya zêde qels û bêhêz hebû. Ti şansê xwe yê bi siyaset, rêxistin, berxwedanî û têkoşîna çîna navxweyî re nav hevûdû re derbas bike, an jî bi wan re veguherîne hêzê û pêşketinê ava bike tine bû. Lewma her tişt neyênî bandor dikir. Min di wê pêvajoyê de derfetek baş nedît ku, bi Hamilî re bi-axivim. Lê di rastiyê de pêvajoya ku min herî zêde pêdivî pê didît bi-axivim, nîqaş bikim, pirsgirêkên giran em bi hev re çareser bikin ew dem bû. Birçîbûna min jî di vê mijarê de bû. Birçîbûnek bi salan tenê û dûr mayînê ava kirî hebû.

Weke din xwestek jî hebû. Min berpirsyariya xwe didît. Gelek qadroyên hêja hatibûn sûrgûnkirin. Binyata giştî zêde bû. Raperîn jî hebûn. Pirsgirêkên navxweyî hebûn. Min hêj

hemû qadro nas nedikir. Di mijarên bingehîn ên weke bîrdozî, polîtîk û rêxistinî de kûrbûn tine bû. Me her tişt tenê weke pirsgirêkên zindanêne dest digirt. Asta peywendiyên me yên bi derve re, bi tevgera malbatê re sînordar bûn. Mirov dikare bêje asta agahî girtinê jî ji rêzê bû.

Sala 88'ê bû. Yekem car bû Kovara Serxwebûn hatibû. Mijarên weke şopandina partiyê, şer, li hember pirsgirêkan hişyariyek hewcedar raberkirin, ji eniya zindanê jî bersiva hewce dayîn, derbarê mirov dikare çi bike û çi girîng e de, em neçarî xebatek hevpar û tevkar dikirin.

Karên heyîn bi hestan, bêrîkirinan, kelecanan, xeyalan û xwestekên xweş ve nedibûn. Dema em ji hev dûrbûna, me zêde nedikariya eleqeya xwe ji hev bînin. Girêdanek hevalbendiya hestiyar a rewşên hatine jiyîn daye avakirin hebû. Lewma mirov nedixwest yek gotinek neyênî û kêm bêje. Lê bi vê nêzîkbûnê kar jî nedimeşiya. Nêzîkbûnek her tim pevçûnê ava dike, nîqaşên neyênî ava dike, tewanbar û rexne dikir jî çareseriyek ava nedikir. Şêweyek têkîliyek ji seriyekê çûna seriyek din hatibû avakirin.

Min cara dawî li cihê hewagirtinê ji Hamilî re got; "divê em vê têkîliyê qut bikin. Me dihincirîne. Me berê zêdetir ji hev hez dikir." Dîsa bertek raber kir. Yekser neçar mam ku cardin sererast bikim. Lê dixwazim Hamilî bi xwe biryar bigire, ew bêje; "ev têkîlî nabe!" Tenê ev rê hebû ku aqilê wî bîne serê wî. Bila hinek tiştan feda bike, hinek tiştan parçe bike, lê bila hişê wî were serê wî. Ger bihêz be emê nîqaş bikin û biryarê bigirin. Lê ji ber gurura wî ya feodal û bandora mûlkiyetê serwer bû, zehmetî ava dikir.

Şener ji min re got; “mirov ji te ditirse, tu zêde bê rehmî.” Lê dizanim ku ger ez vê têkîliyê qut bikim, ezê hêzek mezin bidest bixim. Ji ber wî ji hêla şaş ve ez mijûl dikirim. Hêz, enerjî û lêhûrbûna min tev diqedand. Hişê min mijûl dikir. Aliyê min ê hest jî hûr û kûr bûn, pirsgirêk ne di vê astê de bin û çareseriyek rast bibîne, ezê zêde bi Hamilî ve werim girêdan. Ewê bibe hêz. Wî ev rastî baş dizaniya. Her du alî jî nedibûn. Ango bi yek gotinê her tişt berovajî dibû. Min dixwest xwe û Hamilî ji wê rewşa mijûl dikir rizgar bikim. Hemû aliyan ve li ser nahizirim, lê baş dizanim ku ji sûdmendî zêdetir, zerarê dide. Nerehetiya min a ji destpêkê ve jî ev mijar bû. Ez bibûm dîla hestên xwe û mantiqê min di wir de têk çûbû.

Di vê navberê de bûyera Hisên Yildirim teqiya. Hisên Yildirim reviya bû û arşîvên me jî desteser kiribû. Dijî partiyê propagande dikir. Hedefa wî Rêbertî bû. Li gorî dibêje ku dê PKK’ya rastî ava bike. PKK’ya demokratîk ava bike! Vê bûyerê di wateyekê de hemû pirsgirêkên din cemidand. Hemû bal li ser vê bûyerê bû. Li gorî tê gotin ji Karasu re name nivîsandiye. Bang li zindana kiriye. Tevgera rizgarkirina PKK’ê daye destpêkirin! Gelo ji kî rizgar dikir? Ji Rêbertiyê rizgar dikir? Belê, ger hedef Rêbertiyê be, bes e! Ne zehmet bû mirov pirsgirêkê fêm bike. Her tişta ku Rêbertî hedef digirt, êrîşî partî û şoreşê dikir, dijminatî bû. Di vê mijarê de tiştek bê nîqaşkirin tine bû. Kesek bi qasî misqalekê PKK fêm kiribe, girêdana xwe bi Rêbertiyê ve hebe, dikare baş fêm bike. Lê dijmin hesaba vê tiştê nekiribû. Bertekên me yên destpêkê di şêwazê; “ev provakasyon e, li dijî partiyê, Rêbertiyê û Têkoşîna me hatiye birêxistinkirin” de bû.

Beriya niha li Îsweçê girtinek pêk hatibû. Têkîliya Kesîre û Hisên Yildirim di çapemeniyê de derketibû holê. Piştre jî bûyera Palme, berî bûyera Palme daxwiyaniyên Hisên Yildirim ên dijwar û provakatîf û gefxwar belav bûn. Ev jî bi helwestek tund a çepgirî ve destnîşan dikir. Rêbertiya partiyê bi rastgirî tewanbar dikir. Dê şerê me jî wisa bi dîmenek çepgirî di pêşengiya Hisên Yildirim de ji aliyê provakasyonekê ve bihata meşandin! Ya rastî her tişt pir vekirî bû û dihat fêmkirin. Nexasim ji aliyê me, yên Hisên Yildirim nas dikirin ve baş dihat zanîn ku, ew tenê piyonek e. Di heman demê de ji bilî vê jî nabe tiştek din.

Min hêj di salên 79 û 80'î de Hisên Yildirim weke zilamê xirab îlan kiribû. Şik jê dibir. Êdî min li Meletî nêrînên xwe fermî bi notekê ji partiyê re ragihandibû. Ji wê demê ve xwe birêxistin dikir. Nexwe ne nû bû. Tevî ku parêzerek ji rêzê û hêsan bû, dosyayên veşartî yên sîxûrên bibandor û rayedar ji dozgerên dadgehên sikiyonetîmê digirt! Mîsoger hêj ji wê demê ve girêdana xwe bi Cahît Aydoxan re hebû. Piştre her du jî hatin Amedê. Hisên Yildirim parêzer bû, piştre jî hat girtin. Cahît Aydoxan jî bû dozger û dadgerê dozên me!

Girtina Hisên Yildirim netesadûf bû. Bi girtina wî re bala me belav kirin û di zindanê de amade kirin û derxistin derve. Ji ber parêzerek ji zindanê derketî zû bi nav û deng dibû. Di wê demê de li hember her kesê ji zindanê derdiket baldariyek hebû. Jixwe dema sax ji zindanê derkeve û li hember zindanê jî girêdanek sixte diyar bike, her tişt temam dibe! Hisên Yildirim derket çû Awrûpa. Bi vegotinên ser Amedê ve li hember xwe baldarî ava kir. Ji ber girêdana bi Mazluman ve girîng bû. Ancex Hisên Yildirim dikariya wê sixtekariyê baş bike. Ji

pêkana lîstokan zêde hez dikir. Pîşeya wî ya sereke jî lîstik bû. Ev jî lîstokên derewkarî û sixtekariyê bûn! Ez jî li hember wan sixtekarî û nêzîkbûnên wî yên rêzdar û girêdanê hêrs dibûm û min şik dibir. Wê demê jî weke ku, zêde xwedî li Mazlum derdikeve xwe dida diyarkirin. Gelek caran dida diyarkirin ku, ji her tiştî zêdetir dixwaze min û Mazlum derve di nav têkoşînê de bibîne. Herî zêde jî ji wê sixtekariya wî ya destpêkê aciz bûm. Min ti caran pê bawer nekir. Wî jî ev nêzîkbûna min baş dizaniya. Ferq dikir û digot; "hewce dike ku tu û Mazlum dervede bin. Ger hûn parastinê nekin, hûnê derkevin." Propagandeyek wisa dikir û ev gihandibû heta malbatan.

Dema di sala '88'an' de bi M. Elî Bîrand re diçe Akademiyê, li wir cardin girêdan û rêzdariyek sixtekar raber dike. Li hember Rêbertiyê çiqas rêzdar dixwiya. Wêneyên wî yên xwe tewandî û destbidestî di rojnameyan de derketibûn. Wê demê jî dilxwede Rêbertiyê ji tengezariyan rizgar dike, xwe dabû diyarkirin. Hewl dida zemînê ku, pêşî lêvekirina demokratîk bixe dewsa têkoşîna şoreşgerî peyda bike. Piyonek reben bû. Rola wî jî heta wir bû. Weke din jî ti hostatiya wî tine bû.

Me ev mijar bi hevalan re jî nîqaş kir. Dema agahiya reva Kesîrê hat, me nivîsek pêşniyarên ku Kesîre were cezakirin ji partiyê re şandibû. Pêşniyarên dijwar bûn. Nivîsên bi vî rengî Şener baş dinivîsand! Lewma her tim wî dinivîsî. Pêşniyara, 'bila Kesîre were cezakirin' pir radîkal bû. Ecêb Şener zêde radîkal bibû! Dema min got; "wê dijmin bikar bîne, kesek herî nêzî Rêbertiyê ye. Wê bêjin 'hevjîna xwe kuşt!' û di rojnameyan de weke sernav belav bikin." Ji min re got; "em heta niha her tim te weke çepgirek radîkal nas dikin. Lê diyar e

tu ne wisa yî.” Dema min pirsî; “temam, ma qey ez rastger im?” Bersivand; “na, tu APO'yiyî.” Ev pênaseyek gelekî girîng bû. Hem kêfa min hat, hem jî min şerim kir. Ez APO’yî me! Çiqas xweş e, her tim bi APO’geriya xwe şahnaz bûm…

Dê ji bona Hisên Yildirim jî nivîs were nivîsandin. Şener ji min re got; “tu wî nas dikî. Lewma tu binivise.” Min jî got; “na, tu baştir dinivisî. Şêweya derketina wê girîng e. Dîmendarek demokratîk e! Dilxwede wê PKK’ya demokratîk ji dîktatoriyê rizgar bike! Lewma divê ev nêzîkbûn baş were nirxandin. Gelo li cem rastiya Rêbertiyê çiye? Rêbertî partî ye. Divê em jî bitaybet vê mijarê baş pênase bikin.”

Tiştek ecêb bû. Di nav wê salê de gelek dost û hemşeriyên ku dihatin serdana me, zêde pesnê Hisên Yildirim didan. Apê Heyder Akyar hatibû serdana me. Hinde pesnê wî dida, nedizaniya çawa xilas bike. Hinde vegot, min jî got; “hûn wisa behsa wî dikin, ma niha divê ez li hember Hisên Yildirim rexnedana xwe bidim? Nêrînên min ên derbarê wî de cuda ne. Ger derfet hebûna piştî ew çûna Awrûpa wê min ji partiyê re bigota baldar nêzî wî bibin. Ya rastî min reşwa wî ji hevalên hundir re gotibû. Lê ti caran jê nerehet bûm. Hûn niha behsa xebatên wî dikin û dibêjin erk peywir girtiye. Bila ew baş kar bike, hewce be ezê rexnedana xwe jî bidim. Tiştek nabe. Jixwe ew jî dizane ez ti caran derheqê wî de tiştên baş nahizirim.” Her wiha min silavên xwe jî ragihandibûn.

Gelo ev nêzîkbûna kesayeta wî di nava zindanê de baş dana nasîn, pêş amadekariyek bû! Dihat gotin ku, Hisên Yildirim bîranînên zindanê ve girêdayî ye. Hisên Yildirim li Awrûpa kar dike. Di xebatan de çalak û baş e…” ango diviya hevalên di zindanê de jî wisa bizaniyan.

Yekser ji Karasu re nameyek nivîsandibû. Min naveroka wê gelekî mereq dikir. Li gorî min, mîsoger dixwest hişê her kesê di zindanê de şêlo û tevlîhev bike. Ango hewldanên wî yên têkildarî zindanê çi dibin bila bin, baş dihat fêmkirin. Ti agahiyên derbarê wî de cidî nedihatin girtin.

Karasu agahî şand; "dibe ku êrîşî wan deran jî bike, hişyar û baldar nêz bibin." Wê ew bi xwe jî bersivê bide. Me beşek heman nivîsa ku nivîsandiye şand ji Ceyhan re jî. Îmze qelebalix in. Navê min, Şener, Muzaffer, Fuat Kav û hwd hebûn…

Şener li ser xwe bû! Nivîsên wî bi rêk û pêk bûn. Em beşên daxwiyaniyan jî dişînin derve. Nexasim daxwiyaniyên bi serenavên "Ji Bona Ciwanên Kurd" jî dişînin. Ew jî daxwiyaniyek naveroka xwe bibandor, ajîte û propagandeyek xurt bû. Şener jêhatî bû û leza wî bandor li min jî dikir. Kêfa min dihat. Me wisa dikariya xwe bigihînin derve. Derfetên xebatek berfireh û xwe gihandina her kesî ava dibû.

Beriya wê hevalê Karasu wan ji bona Awrûpa hinek nav destnîşan kiribûn. Pêdivî û pere bi navê wan dihatin. Di nava cilan û hinek amûrên din de notên pêwîst ji van navan re dihatin şandin. Destpêkê kovarên weke Serxwebûn û Berxwedan bi navê Mistefa Bayik û Faruk Altun hatibûn. Me yek parastibû. Lê ya din neket destê me. Dijmin ferq kiribû û nedabû. Rêya me bikar danî zû eşkere bû.

Di vê pêvajoyê de agahî hatibû dayîn ku dê name û pêdiviyan jî bişînin. Bi koliyekê hinek pêdivî ji Hamilî re hatibûn. Beriya kolî were me agahî jê re şandibû. Ev agahî jî yekser min ragihandibû. Hamilî got; "na, ew kolî ayîdê min e.

Min ji malbatê xwestibû. Ger notek hebe jî ayîdê min e. Notek taybet e. Min beriya niha ji dotmama xwe re hinek tişt gotibûn. Bersiva wê ye." Vê nêzîkbûna wî gumanek ecêb ava kir. Rewşa derket bala min kişand. Min jê re got; neke, nêzîkbûnên te şaş in. Tu bibertek nêz dibî. Kargeriyek rêxistinî heye. Tu dizanî ku, beriya niha jî navê te hatiye dayîn. Ji bona kesek partiyê tiştên taybet nabe. Tu radestî rêveberiyê bike, ger ayîdê te bin, wê dîsa radestî te bikin." Got; "na. Ew not ayîdê min e. Ne rêveberî, xwedê jî bê nadim."

Min jî ev helwesta wî ji rêveberiyê re ragihand. Her kesî bertek raber kir. Şener got;

"Gelo tiştek din heye? Ma dibe ku Hisên Yildirim ji wî re name şandibe? Dibe ku gumanên Hamilî jî ji vê bin." Ji nişka ve em hemû mat man.

Axaftinên xwe zêdetir kir, pêşdarezînek ava kir û got; "mane beriya niha jî Seher xwe nêzî wî kiribû. Wê bixwazin ji aliyê parazvantiya Dêrsimê ve Hamilî bandor bikin. Weke din jî binyata wî baş nas dikin."

Min got; "na. Ez jî wî nas dikim. Bi bertek tevdigere. Cara duyem jî rapora wî nehat qebûlkirin, qadrobûna wî hat nîqaşkirin û ji erk hat girtin. Bandora van tevan çêbû. Weke din jî di têkîliyê min wî de jî pirsgirêk hene. Ji ber ji min re got; 'name ji dotmama min hatiye' diyar dibe ku, dixwaze çi bêje. Beriya niha ji min re gotibû malbatê dotmama wî aniye girtîgehê û xwestine wan bikin dergistiyê hev. Lewma niha jî dixwaze ez bi vê bihesidim. Wisa bersivê dide nêzîkbûnên min." Min ev îhtîmal zêdetir dît. Weke din jî Hisên Yildirim dikariya name jê re binivisîne. Lê di vê mijarê de qebûl nakim ku, li hember Hamilî bêbawerî pêş bikeve. Şener got;

“Divê ji nû ve jê re were gotin û bê hişyarkirin.”

Min jî got; “wê demê bila notek fermî were nivîsandin. Gotinên min ên devkî ferdî digire dest.” Not hat nivîsandin. Cahîdê not bir. Weke din devkî jî dibêje. Hamilî jî vê carê şert datîne û dibêje;

“Ezê notê li cem hevalekê vekim. Ezê serenava wê binêrim. Ger ne ji bona min be, ezê yekser bê ku bixwînim ji rêveberiyê re bişînim.” Ji ber vê nêzîkbûna wî em zêdetir bihêrs bûn. Pişt re min got; “em devjê berdin. Çi dike bila bike. Emê helwesta wî paşê binirxînin. Em li hember hev înad dikin. Ne rast e.” Fuat Kav got; “ev nêzîkbûn baştire. Tevlî vê nêrînê dibim.”

Belê, ev înad zêde xeternak bû. Xwedêyo, em niha li ser kîjan aliyê pirsgirêkê disekinîn! Nêzîkbûnek evqasî teng û tund ti pirsgirêk çareser nedikir. Her wiha Hamilî jî di rêveberiyê de bû. Lewma notek tenê ayîdê navendê dîtin jî şaş bû. Lê ji ber karê rêxistinî diviya ew not destpêkê biçe cem rêveberiya navendê. Derfet nebin hevalek din jî dikare veke bixwîne. Ev xwezayî bû. Lê Hamilî bi zanebûn wisa dikir. Ev jî xirabkirina kargeriya rêxistinî bû. Lewma niha neraste ku her tiştî bibe, vê pirsgirêkê ve girê bide. Di vê mijarê de bertekên her yeke ji me jî, gumanên me xwe dispêrin zemînên ji hev cuda. Rewşa herî ecêb jî di vir de bû. Bi gelemperî îhlalkirina dîsîplînê bû. Lewma em ji ber vê aciz dibûn. Lê em dihizirîn ku çavkaniya xwe ji çi digirt û çima dihat mezinkirin? Çima dihat înadkirin? Di vê mijarê de nêzîkbûnek xwînsar, sebir û polîtîk tine bû. Em bi ecemê û bi şêweyan ve mijûl dibûn.

Hamilî not vekiribû û piştî dibîne ne ayîdê wî ye, şand ji me re. Ango ya xwe kiribû. Ji vê bonê cardin ket rojevê. Hamilî, ji bona Şener hedefek girîng bû. Lewma Şener jî di vê mijarê de li firsendan digeriya. Aliyên şaş û kêmasî ji bona wî dibûn zemînek baş. Bi hostatî nerehetiyên me yên di asta rêveberiyê û bertekên qadroyên din dikir yek û bikar danî. Em jî ne di ferqa vê de bûn. Lê Hamilî ji ber nêzîkbûnên li dijî xwe di ferqa gelek pirsgirêkan de bû. Lê hinde ferdî nêz dibû, em hemû li dijî xwe rakiribûn.

Di vê mijarê de hinek pêşniyar çêbûn. Pêşniyar nivîsandina rapora rexnedanê, di çarçoveya îhlalkirina rêziknameyê de helwestek were raberkirin bû. Ew jî dibêje ku bi bertek tevdigere. Li ser esasê hat diyarkirin bila destnîşan bike gelo çima biryara rêveberiyê bi kesan ve girê dide. Destnîşan kir ku, ti nêzîkbûnek wî taybet li dijî Şener tine ye, lê belê hinek bertek û nêzîkbûnên hevûdû tehrîk dikin, beramber hev tên raberkirin.

Li Awrûpa seferberiyek girtinê hatibû destpêkirin.

Ev jî beşek ji plana li dijî xebatên me yên partiyê bû. Hedefa wan têkoşîn û Rêbertî bû. Me jî got; “girêdana vê bi provakasyonê ve heye.” Bi dehan qadro hatibûn girtin. Tê gotin ku, arşîva me ya partiyê jî hatiye desteserkirin. Me jî di navbera xwe de nîqaş dikir; “ma hevalan tevdîrên çawa girtine. Evqas jî bê tevdîrî nabe.” Girtina hevalê Abbas, hevalê Fuat, Hevala Meral û li pey hev girtina hevalên din netesadûf bû. Vê agahiyê bêhna me hemûyan tengav kir.

Derbarê gerîla de jî nûçeyên berovajî di çapemeniyê de kêm nedibûn. Serdegirtinên gundan bi mehan bernameyên

taybet ve dihat bilêvkirin. Dixwestin dîmenek “gerîlayên ku jin û zarokan dikujin” ava bikin. Dîsa Zagona Poşmaniyê ya bi sala 87’ê re dihat gotin ‘dema wê ji aliyê zagonî ve qediyaye’ ket rojevê. Bangawaziya ji gerîla re ya ‘radest bibin’ hûr û kûr dihat meşandin. Hinek fermandarên gerîla di çapemeniyê de derdixin pêş û neyekser ber bi lihevkirinê ve dikişandin. Dixwazin bi gel bidin bawerkirin ku di nava gerîla de zemînê cihêbûnê heye.

Bi serenavên “PKK parçe bû!” Portreyên îxanetkaran rêz dikin. Ew jî bi navê kesên ‘milê rastê ne’, muxalîfên herî nêz in’, fermandarên efsanewî’ diyar dikirin. Li cem van ji eniya zindanê jî weke, ‘caniyên herî zêde mirov kuştine’, milîtanên îtîrafên dijwar kirine’ ser ve zêde dibûn. Amûrên êrîşên dijber pir vekirî û rêbazên wan baş dihatin fêmkirin.

Xeleka vê ya herî girîng jî dijberiya ku navxweyî dihat jiyîn bû. Gelek kesan dixwest xetê şêlo bikin, zemînê pêşketinan bi lewaziyên xwe yên hundirîn ve mijûl bikin û bêbandor bihêlin. Em jî zêdetir bi aliyên dihat dîtin ve mijûl dibûn. Bûyerên ku rû didan li derdora wan ve dihatin nirxandin.

“Vê têkîliyê diqedînim”

Hamilî qet nedihat qoxuşa 35’an. Wê rojê hat cihê hewagirtina qoxuşa 35’an. Zêde bihêrs bû. Helbestek ji nû ve bibû sedem ku em lihev bikevin. Şener helbestek dirêj nivîsandibû. Berî wê jî helbestên wî yên bi zimanê Kurdî, Tirkî hebûn. Me piranî helbest û nivîsên hevalan dişand derve. Heta hinek hevalan dest bi nivîsandina romanê kiribûn. Beşek Şener nivîsandî hebû. Xwestibû em bixwînin. Em hêj wê demê derneketibûn cihê bêhnvedanê. Goşegiriya me berdewam dikir. Dizaniyan ku qey ez ji romanê fêm dikim. Wê demê ji bona rapora me jî gotin ku, roman e. Lewma tiştên ku dihatin nivîsandin ji me re dişandin. Dixwestin em binirxînin. Me jî xwendibûn û hinek nêrîn û rexneyên xwe jî ragihandibûn.

Zimanek wî cuda hebû. Naveroka wê jî pîvanên me yên dihat zanîn derbas dikir. Gelek rewşên ku di zindanê de hatine jiyîn tev têkilhev nirxandibû. Mijarên weke jin, hezkirin, xisletên şêlokirina evînê, piranî bi şêwaza nêrîna nivîskarên burjuvaziya biçûk, an jî di nav mercên hinek welatên din de dibin rojev re, yek nêrînê de bû. Tişta yekem li ber çavê mirov diket ew xisleta wî bû. Me jî di şîroveyên xwe de got; "ev xeyal û pîvanên wî bi xwe ne." Ango rastiya wî bi xwe bû. Lewma me jî guncav nedît ku were weşandin. Jixwe gotibû ku, 'ceribandineke.' Yeqîn dikim bi gelemperî jî bala kesî nekişandibû û kesî ne ecibandibû. Mijara romanê jî wisa hatibû girtin. Yeqîn dikim êdî nenivîsand. Lê helbestên wî cuda bûn. Gelek helbest dihatin. Lewma me jî nedikariya bi kûranî vekolin, me yekser dişand derve.

Bes rexnekirina helbestan û bi çavek rexnekirinê xwendina wan jî girîng bû. Ev jî girêdayî fêmkirina helbestan bû. Mirov destpêkê aliyên ku bandor dike ve dinirxîne. Bi me re bi gelemperî rêbazek duruşmeyan rave dike pêş keti bû. Zêde çandek helbestan tine bû. Nivîsandina helbestan fêmkirina ziraviya jiyanê, kûraniya wê girtin, bi hostayî li nav wê gerîn bû. Helbest azwerî, kûraniya hestan û herikbarî ye. Daxwazên hundirîn, nepenî, xeyal û hest tev xwe didin der. Her kes bi qasî jiyan dike, helbestan dinivisîne. Ev jî hunermendiyek e! Lewma her tim li hember helbestan baldariyek min hebû. Lê zêde hilbijêr nebûm. An jî bi gştî ji ber hezkirina min a helbestan, bi rexnegiriyê ve ne di hevsengiyê de bû.

Şener ew helbest bi navê min nivîsandibû. An jî weke wî gotî; "hêj nav lê nekiribû." Lê bandorker bû. Dibe tenê hinek aliyên wê bandor kiribû. Ez jî zêde ne di ferqê de bûm ku, di

cewhera giştî de çi rave kiriye. Ez qet nedihizirîm ku, wateyek din rave bike. Lewma min heman rojê helbest ji Hamilî re jî xwend. Ez pê bandor bibûm. Hamilî jî xweş dîtibû. Di wê helbestê de zêde li ser Mazlum rawestiyabû. Behsa qêrînên me, giriyên me, artêşa têk çûyî, giyana kesên artêşa wan têk çûyî tev bikar anîbû… Ango dev ji rexneyan berdin, hestiyariya min berz bibû. Di wir de peyvên weke "xwîşka min î… diya min î… xoşewîsta min…" ti wateyek cuda dernedixist holê. An jî ji ber hestên min ên îsyanên porê min spî kirine, têlek wê veşartin, ji wê hêz girtin û hwd ti tiştî ez mat nebûm. Min şaş nedît.

Min vekirî ji bo hemûyan digot; "hûn evîna min in." Min çavê hemûyan radimûsa. Dest dida destê wan û digirt. Hewceyî ti gotinên helbestan nedikir! Gelek ji wan ez pîroz didîtim. Yek ji van jî, ne bi qasî min ew ji dil û can, vekirî û hûr û kûr pîroz dikir bûn. Lewma ser xwe ve nediçûm. Min ev nêzîkbûn ti caran weke helwestek cuda, eleqeyek taybet, planek û armancek nenirxand. Ji ber ez wisa bihiziriyam, dê ramanek kirêt û xirab bûya. Jixwe hezkirin û baldariyên taybet jî zû dihatin fêmkirin. Min jî ne bi qasî yek ji wan fêm nekim aqilê xwe winda kiribû, ne jî ji hestên rasteqînî dûr bûm. Min nêzîkbûnên kirêt, çors û li ser bingeha ajoyan, ên pir zirav û xwe bi gelek şêweyan didan diyarkirin jî baş fêm dikir. Di heman demê de nêzîkbûnên bi rastî jî hezkirin, baldarî û heyranî ve pêş diket jî ferq dikir. Li gorî xweseriya mirov aliyên xweşik, lewaz, kirêt û heta qelsiyên ku çavkaniya xwe ji mirov jî digirin hene. Mirov dikare van jî baş fêm bike. Her baldarî û heyrantî, heta nêzîkbûnên ku ajoyan jî digire nav xwe mirov nabin ti encamê. Her wiha ev nabin destpêk, an jî xilasbûn!

Dê ji têlek pora min çi bûya? Dê bi gotinên weke “xwîşka me, dayîka me, xoşewîsta me” çi ser û bin bûna? Her ku tê bîra min hişê min ranake. Me her tişt çiqas erzan kiribû!

Min ti wate neda Hamilî ku piştî bertekên xwe yên erênî, çawa yekser hatibû guhertin. Min helbest cardin xwend. Na, li gorî min tiştek tine bû! Lê hinek tiştên ku Hamilî dizaniya hebûn. Şener nas dikir. Lewma tenê bi nêzîkbûnên xwe yên ferdperest û mûlkiyerperest digirt dest. Di vê mijarê de tufan radikir. Bi berpirsyariya kesek partiyê bi ser rewşa Şener de nediçû. Ne bi nêzîkbûnek wisa bû ku, ez jî şêwazê Şener nas bikim. Weke ku hinekan çav berdaye namûsa wî nêzî bûyerê dibû. Di rastiyê de li vir xwe radestî Şener kiribû. Ez jî radestî wî kiribûm. Hamilî bi vî rengî hezkirina xwe jî çiye, yê hezkirin diziye jî, hezkiriya xwe jî bi rêbazek trajî-komîk danîbû holê. Li cihê hewagirtinê bi yek gotinê her tişt qedandibû. Got; “ez vê têkîliyê diqedînim.” Pey re yekser çû. Tenê ev gotin bikar anî. Weke ku tola xwe bigire gotibû. Got; “diqedînim, xilas dikim…!” Lê ger hezkirinek rasteqînî hebe, ti caran wisa nayê xilaskirin û xilas nabe. Divê xilas jî nebe.

Piştî ew çû çend xulekan bi tena xwe cemidî sekinîm. Min li pey wî temaşe dikir. Dema Şener got;

“Ezê pê re bi-axivim.”

Min got; “Na. Êdî dê kesek derbarê vê mijarê de yek gotinê jî neke. Ev ne karê zaroka ye. Hinekê rêzdar bin. Ewqas…”

Piştî çûm li kêlekê sekinîm. Hevalê Fuat Kav hinek tişt ferq kirin. Em jî beramber her kesî aliyê ku kes lê tine ye dimeşiyan. Em li ber dîwar bûn.

Destpêkê got; “çi bû? Çima bêhna te teng bûye?”

Min got; “tiştek tine ye. Weke ku barek giran li ser pişta min daketiye.”

Belê, bi rastî jî barek bû, barek her tim bêhna min teng dikir. Di heman demê de barek di bin navê hezkirinê de bû! Weke kabûsekê, weke çiyayekê, weke xençerekê li ser pişta min bû! Min pêvajoyek dirêj hewl da bi nîqaş, hevûdû fêmkirinê û di çarçoveyek rêzdariyê de vê pirsgirêkê çareser bikim. Lê mixabin nêz nebû. Niha jî bi rêbazê xwe xilas kir! Ew jî bi hêz û gumanên zilamê kevneşop ve pêk anî. Tenê vê nêzîkbûna wî bêhna min teng kir. Lê bi rastî jî gelekî rehet bûm. Weke dojehekê, hema her roj dihat nîqaşkirin. Fuat di mijarekê de li xwe mikur hat û got;

“Min ji destpêkê ve ev rewş qebûl nekir. Min guncav nedidît. Min di civîna Karasu lidarxistî de jî nirxandibû. Ji bo tu bandor nebî, min ji te re negot. Tişt nabe, ez bawerim wisa baştir bû. Lê belê, ma ev zilam dîne. Çima li cem Şener tiştek wisa got? Dikariya tenê ji te re bigota.”

Rojên pey re min rojnivîsa xwe ji cihê veşartî derxist û beşek dîroka xwe kevin ji Fuat re xwend. “yeqîn dikim, min di jiyana xwe de yekem care şaşiyek bi zanebûn kiriye. Ev jî bi navê fedekariyê bû… Lê dema niha dibînim rê ji çi re vedike, pê dihesim ku onura min a şoreşgerî dişkê. Ev jî êşek mezin dide min.”

Min di vê kêliyê de ji Fuat re got;

“Temam bes e. Zêde nexwîne.”

Got; “wê demê te çima pê re nîqaş nekir.”

Min got; “min her tim pê re nîqaş kir.”

Roja paştir agahî hat, gotin; “Hamilî hewl daye xwe bikuje.” Vê zêdetir bêhna min teng kir. Min qet pirs nekir ku, çima û ji bo çi tiştek wisa kiriye. Min got; “li dijî min dide bikaranîn.” Fuat jî got; “cidî cidî hewl daye xwe bikuje. Derman xwariye. Lê beriya wê notek nivîsandiye û daye Elî. Wesiyeta xwe jê re hiştiye.” Şener destwerdana bûyerê kir. Şev çû qoxuşa 36’an. Berfireh di-axivin. Hamilî dibêje ku ji ber bandora qedandina têkîliya heyî helwestek wisa kiriye. Gotiye; “ez bi bertek tevgeriyam.” Ez ne şaş bûm. Ger di xwe kuştinê de cidî bûya, nedihişt ku kes pê bihese. Vekirî ji Elî re dibêje û qotiya dermanan digire û diçe.

Saît got; “ma xwe kuştinek evqasî vekirî dibe?” Naxwazim ti şîroveyê bikim. Lê nabe. Min got; “ez wî baş nas dikim. Ji hêrsên xwe biryarek wisa daye. Êdî fêm kir ku, dê ev rewş weke berê nebe, ji ber vê kir. Vê carê jî xwe bi nêzîkbûna xwe ya xwe kuştinê bal bikişîne ser xwe. Jixwe di pêvajoya dawî de gelek rexne girtin. Ceza girt. Lewma gefan li me dixwe û dibêje; “ser min de neyên.” Hevalek ecêb e. Ma nizane em li kuderê ne. Dijmin pê bihese, dê çawa jê sûd werbigire. Dê heval çi bihizirin. Hesabê tiştekî nake. Rewşa xwe jî bi temamî erzan dike. Li gorî min bila zêdetir Fuat pê re bi-axive. Nêzîkbûna ji wî re cuda dike. Divê mirov bertekên wî kûr neke.” Çi dibe bila be, ji ber vê rewşa wî xemgîn dibûm. Her çendî di nirxandinên min ên derbarê wî de gelek mijarên rast hebin jî, min di van rewşê jiyan dikir de xwe jî berpirsyar didît. Gelo min dikariya cuda çawa nêz bibim? Gelo hinek tiştên ku ez ne di ferqê de hebûn? Diviya di têkîliyê xwe de hişyar nêzî çi bûma?

Hamilî bi vê helwesta xwe kuştinê ve di serî de ez, piştre jî hemû heval di bin tohmetê de hiştibûn. Kesên ku dibihîst bertekên cur be cur raber dikirin. Avaniya qadro ya giştî, di pêşniyara ji endamtiya qadro xistinê de bibûn yek. Lê hinek hevalan jî weke helwestek zêde hişk dinirxand. Min bi Şamîl re nîqaş kir. Şamîl zêde hesas bû, di nirxandina bûyer û diyardeyan de peyva ku divê dawî bêje, lez di serî de nedigot. Baldar nêzî her tiştî dibû. Lê di mijara Hamilî de gumanên wî hebûn. Rexne li min jî kir. Dema me not ji hev re dinivîsand agahiya wî çêbûye. Kêfxweş jî bûye. Di heman demê de diyar kiriye ku dilşadiya me her duyan jî parve dike. Nêzîkbûnek zêde bi niyetek baş û bedew hêvî dikir. Bêguman ev jî nêzîkbûnên kesayeta wî yên mirovî bûn. Nêzîkbûnên wî yên hevalbendî bûn. Lê rastiya heyî em ti caran wisa dilşad û bi hêvî nekirin. Rastiyek hebû, ez jî kamil nêz nedibûm. Dibe min fedekariyek zêde û hişyar jî kir. Lê min şerê vê têkîliyê bi sebrek rast neda meşandin. Ev jî yekser bi rêbazê min ê ji hemû pirsgirêkan ve girêdayî bû.

Berî her tiştî min her nîqaş, bandor û bertekên heyîn li her naverastê dikir rojevê. Dibe haya Şener ji vê têkîliyê hebe. Lê belê, hewce nedikir ku ez her tiştî wisa bêpîvan û bêhesab pê re bi-axivim û nîqaş bikim. Ji vê hemû lewaziyên me, em di kîjan mijaran de bandor dibin, çi esas digirin de me dide dest. Vekirîbûna bêpîvan veşartina bêpîvan a di vê mijarê de heman encamê ava dikin. Mirov nabe çareseriyek rasteqînî. Min hest û bertekên xwe jî wisa didan der. Dema min bêpîvan û bêrêgeziya miqabilî xwe rexne dikir, ez jî bêpîvan û bêrêgez nêz bibûm.

Ferqa me ev bû: Hamilî di serî de jî nevikirî bû. Her carê tiştek digot. Jixwe di peywendiyên xwe yên rêxistinî de jî xwe vedişard. Ti caran nexwest pirsgirêkên heyîn bi min re vekirî nîqaş bike. Ez jî destpêkê de derbarê her mijarê de zêde vekirî nêz bûm. Lê bi taybet ji ber dema dawî de min nekarî bi nîqaş, dana fêmkirin û qanekirinê ve pirsgirêka heyî çareser bikim, min jî nêzîkbûnên ku Hamilî tehrîk bike û wî ber bi qedandina vê têkîliyê ve bibe raber kirin. Wisa tevgeriyam ku ew biqedîne. Min jî di wateyekê de xwe bêpîvan danî holê. Rêzdariya xwe qels kir. Mirov ber bi şaşiyan ve birin, an jî ew xistina nav pirsgirêkan de ne pîvan û rêgezek rast e. Lewma divê ez jî kêmasiya xwe ya di vê mijarê de bibînim. Divê ez bandora hinek din a li ser xwe bibînim.

Gelo, ev şer tenê di navbera min û Hamilî de bû? Na! Rast e, zemînek şer hebû. Lê kî bi kî re şer dikir? Me di eniyan de çawa çeper girtibûn? Di vê lîstoka hezkirin û evînê de kesan rolek çawa lîst? Hezkirin û ev şer çawa dikarin li cem hev bijîn? Bi hestan çawa dihat lîstin?

Xebatên tûnelê ji nû ve hatibûn destpêkirin

İsrara Gezgor zêde bû. Dê ava tûnelê ziwa bikira! Tevî nexweşiya wî ya romatîzma li dilê wî jî xistibû, bi înad kar dikir. Dijmin li derdora girtîgehê xendekên kûr kolabû. Her kêliyê qirêderê cihek dikola. Tûnel ketibû xewna dozgerê girtîgehê. Digot; “em dizanin heye. Lê em tam nizanin li kur çêdikin. Lewma em nabînin.” Bi gelemperî jî li gelek girtîgehan hewldanên revê çêbûn. Ji aliyekê ve firar asayî bibûn. Di her girtîgehê de çend tûnel hatibûn çêkirin û ceribandinên revê pêk hatibûn.

Dihat gotin hêj di salên 81-82’ê de hewldan çêbûne ku girtiyên di zindana Amedê de birevînin. Heta dihat gotin ku plan danîne wan bi firokê birevînin. Di planên me de jî tiştên ecêb hebûn. Lê bi firoka derve reva pêk were ketibû devê me

hemûyan. Her çendî me bi mijara firokê bawer nedikir, em di wê baweriyê de bûn ku teqez partî hinek rewşan dihizire û wê pêk bîne.

Her cara ez derdiketim cihê hewagirtina qoxuşa sêyan hevalê Fîlo, krokiyên li ser esasê çend planan hatiye amadekirin şanî min dikir. Lênûska wî di dest de hêdîka dihat cem min, digot; "deka karê te nebe, ezê hinek tiştan ji te re bêjim." Ji ber vê bala hemû hevalan jî ji nişka ve dizivirî aliyê me. Hinek di bin simbêlê xwe de dikeniyan. Gelo Fîlo cardin bi feylesofî çi kiribû! Hinek kesan texmîn dikir çiye. Asta wî ya plan û xeyal zêde balkêş bû. Lê belê şansê pêkana wan jî an pir zehmet bû, an jî qetiyen nedibû. Li girtîgehê beşa herî bilind a sê bû. Fîlo jî di xeyalê xwe de telefirîk kêşa bû heta malek miqabil. Hesabê demjimêra guhertina leşkerê li ser qulê nobedar û heta hatin çûna wî jî kiribû. Ben jî bi meqerê ve girê dabû, li gorî wî mirov dikariya bi meqereyê zûtir biçe. Ango em hemû di navbera çend xulekan de derdiketin derve. Hinde plana xwe bi qinyat û cidî digot, ji dil digot, min jî herî zêde li hember vê ji dilbûna wî û her tim serê xwe bi hinek tiştan dêşand rêz digirt. Dema min digot; "temam, lê belê…" û hinek astengî û neyêniyên ku planên wî vala derbixe rêz dikir, aciz dibû û bêhna wî teng dibû. Yekser derbasî planek din dibû. Dema ez çûm qoxuşa 35'an, mijara sereke ya rapora qoxuşa sê planên revê yên hevalê Fîlo bûn. Êdî her kes fêr bibû û me henek dikir.

Min cidî pêşniyar kir em bi rêya tûnelê firar bikin. Bi wê re jî planek din jî di rojeva min de hebû. Tenê ji komek hevalên rêveberiya teng re hat gotin. Weke derfetekê hat nirxandin. Derve amadekariyên wê hatin kirin. Ne planek revê ya

xeternak bû. Tenê diviya em derfet û wextê heyî baş binirxînin. Me digot; “ger şansê me hebe, dê pêk were.” Hinekê jî bi şans û tesadûfan ve girêdayî bû. Xisletek wê ya zêde bal bikişîne nebû. Aliyê baş jî ev bû. Yên mijûl dibûn ji hêla xwe ve amadekarî temam kiribûn. Dema ez wê rojê çûm nexweşxaneyê, bi derûniyek dê ev plan ser bikeve çûbûm. Şener wê demê got; “ger ez rast bêjim, ez naxwazim ev plan û kar serbikeve. Jixwe ger pêk were kes bê duaya min jî guhdar nake. Xwedê jî nabihîse. Dibe ku weke xwe fikirandin bê fêmkirin. Lê ez naxwazim pêk were. Min jî got; “mirov ji bona kesek diçe çalakiyê qet nebe serkeftinê dixwaze. Yekem cara dibihîsim yek dibêje bila ‘sernekeve’.”

Hayê hevalê Hesen jî ji vê rewşê hebû. Dê Hesen Atmaca, yên pişt re derketin Sînan Caynak û Hesen Gullu ew jî bi karê reva min re mijûl bûna. Herî zêde jî haya Hesen jê hebû. Lê êdî ji ber agahiyên ku ji wan tên dibêjin venêrîna polîsan zêde ye û hûr û kûr dibe, bêhna min teng dikir. Dîsa jî mijûl dibûn. Gelek kes ji bona tûnelê peywirdar bûn. Her kesê diçû digot; “hesabê mal û sûkê nabe yek.” Hewl dida her tiştî tengav bike û weke qet derfet tine ye derûniyek ava dikir. Kesên ku bi karên min ve mijûl dibûn jî wê rojê nehatibûn nexweşxaneyê. Lewma ez jî têkçûyî vegeriyam. Min hemû hêviya xwe bi wir ve girê nedabûn. Lewma zêde pê bandor nebûm. Lê ji ber her tişt berovajî dibû bêhna min jî teng dibû. Bi salan bû min planê firarê pêş dixist. Yek ji wan jî serneket. Vê jî zêde bandor li min dikir. Tevî vê jî min devjê bernedida. Min ji xwe re digot; “ezê deriyê girtîgehê re dernekevim û neçim!” Ev jî sondek, înadek û îddîayek bû. Jixwe ez jî ne li bendê bûm ku, bi zagonî derkevim, bêm berdan. Dê dijmin teqez dozek din bidîta ku

min bernede. Jixwe rev, firar xeyalek kesê girtî ya herî xweş e. Çalakiya herî xweş e. Kesê girtî her tim planê revê û xeyala vê çêdike. Planên firarê zêde çêdike, bi gelemperî di xeyal û ramanên xwe de firar dike. Her çendî gelek caran nekare bike, an jî bê kuştin jî ev azweriyek xweş bû. Lewma bi min re jî weke azweriyekê jiyan dikir. Zewqa wê cuda dibe. Ma kî dizane min çend caran firar kiriye û derketime derve. Xeyalê wê jî pir xweş e. Lê hêj sonda min a Meletî di dilê min de maye. Min sond xwaribû. Dema min ji dozger re got; "çi kêliya min derfetê wê dît, ezê dîsa birevim. Ez girtiyek şoreşger im. Jixwe ger ez revê nehizirim ne tiştek asayî ye." Zilam mat ma, hinekê jî ji ber min vekirî gotibû, bi rûkeniyekê serê xwe hejandibû. Xeyalê firara girtiyekê ketibû serê wî jî!

Dema ez vegeriyam Şener ne li cihê hewagirtinê bû. Pişt re daketibû. Got; "dema tu dereng mayî min got qey tu çûyî. Dibe ku tu aciz bibî, lê bi rastî jî ez ji ber çûna te aciz bûm. Lewma daneketim cihê hewagirtinê. Dema tu ne amadebî ez dernakevim cihê hewagirtinê." Min jî ecêb lê temaşe kir. Ev jî tê çi wateyê? Ma ez evqasî zêde cih digirim? Min jî got; "baş e, baş e. Ger wisa her kes li min bigere, divê kêfa min were. Lê di vî karî de rewşek berovajî heye. Ew qas amadekarî û mesref hat kirin. Gelo çima nehatin? Dilxwede wan gotibû tu kengê werî nexweşxaneyê were, emê agahiyê bigirin. Di vê mijarê de pirsgirêk dernakeve. Lê ez yeqîn nakim derve di vê mijarê de zêde cidî be. Ma evder ne mala bavê me ye. Her cara em bixwazin derkevin derve. Yeqîn dikim ew vê qasê jî fêm nakin. Ma Hesen wan jî tiştek ji wan re negotiye." Pişt re li ser tûnelê axivîm. "divê ev kar zêde dirêj neke. Nexwe dê xeter be."

Em berê axivîbûn. Pêşniyara min a ez tevlî koma ku birevê bibim, hatibû qebûlkirin. Heta di planên beriya vê planê jî li ser min hizirîne. Lê wê demê zehmet bû ku, mirov ji qoxuşan derkeve. Piştî ku em derketin cihê hewagirtinê derfetên vê zêde bûn. Berî ku Hesen Atmaca ew biçin biryar hatibû girtin. Ne şaş bim, demekê Karasu ew jî rewşa min nîqaş dikin. Ango giştî tevlî dibin ku ez jî di nav koma firarê de cih bigirim.

Me pêşniyar wisa zelal kir. Ezê li qoxuşa 35'an bimam. Dê ji qoxuşa 35'an yek kes şûna min derbasî qoxuşa sê bûya. Mirov dikariya mazgalê re derbasî qoxuşa jina bûya. Ji ber ji aliyê derve de çengela wê hebû. Dema dihat vekirin hevalek zeyîf piçek zehmet jî be dikariya derbas bibe. Hevalê ku were dê kêliya hijmarê de ranebe. Xwe nexweş bide diyarkirin. Tenê bixwiyê laşek li ser cihan nexweş e û hinek cihên wî bixwiyê bes bû. Ango tenê bizanin li nav cihan kesek heye. Gardiyanên zilam zêde li qoxuşên jinan nedisekinîn. Tenê ji derî ve temaşe dikirin û diçûn. Ji ber hejmara me jî kêm bû, zêde bal nedikişand. Ezê jî li qoxuşa 35'an ger zû neçin heman rêbazê xwe nexweş bixim. Em li ser vê planê zêde axivîn. Heta wê kêliyê ti kêmasî jî tine bû. Plana me di asta fikir de pir xweş û newaz bû! Kelecana mirov zêde dikir. Lê ji ber hevalên din ne di navbera me de bûn, vê jî xemgînî ava dikir. Em dilşikestî bûn. Ewqasî hat plankirin û her kesî kar kir. Gelek hevalên di vî karî de cih girtin, niha li girtîgehên din dimînin. Ev jî bextreşiyek bû!

Cezayê Hamilî berdewam dikir. Dixwazin nîqaş bikin ku, ew jî biçe an na. Min jî got, ev nêzîkbûn nerast e. "divê Hamilî dervî vê çûnê neyê hiştin. Wê xirab bandor bibe. Jixwe cezayê wî jî ne asteng e." Mijar anîn ser xala gelo hêjayî vê ye yan na.

Şener got; “gelek heval hene. Dê ew jî pirsgirêk derxînin. Bertekên Hamilî jî hene. Jixwe gotiye ‘ez nayêm.’ Em jî vê erê nakin. Ya rastî min hêj destpêkê de pêşniyar kiribû ku, Hamilî were qoxuşa 35’an. Lê hat gotin ku, pêdivî heye hinek heval li qoxuşa 36’an bimînin. Ewder lewaz e. Hem heval Karasy guncav dîtiye. Dema pêş dibe. Jixwe karê tûnelê jî heye.” Li ser vî esasî Hamilî di qoxuşa 36’an de mabû.

Piştî ku ji endamên rêveberiyê Sînan û Hesen Atmaca hatin berdan, Hisnî û Seît Ûçlû ketibûn dewsa wan. Hisnî Altun û Faruk birayê hev bûn. Hisnî bi hevalê Sabrî Ok re heman salê hatibûn girtin. Dema nêz hatibûn. Şener wan nas dikir, me nas nedikir. Hat gotin; “ger hevalek ji gerîla derve de hatî di rêveberiyê de cih bigire baştire. Dê hevsengiyek ava bibe.” Nexasim piştî 15’ê Tebaxê li çolterê girtin zêde pêş diket. Hem ji gerîla, hem jî ji gel milîs zêde dihatin girtin.

Di sala 88’an de zindan bi temamî makêtek Kurdistanê bû. Ji her herêmê hebûn. Herî zêde jî ji nav gel hatibûn girtin. Hema nivê girseya me hatibû girtin. Ji Kovara Hawar jî Kovarek din ji bo girseya gel hat derxistin. Giranî bi zimanê Kurdî bû. Em bi girîng î li ser perwerdeya wan jî disekinîn. Ji vê bonê bernameyek perwerdeyê ya cuda hatibû amadekirin.

Piştî rapor û pêvajoya rexnedanan qadro, endamê qadro, navend, alîgirê navendê û hwd ji hev hatin cudakirin. Min wê demê ji bilî hinek hevalên ku nas dikir, li ser kesî tiştek negot. Ji ber piranî pîvanên berxwedêriyê esas hatibûn girtin. Asta bîrdozî û polîtîk, şêwazê jiyanê jî weke pîvanên sereke dihatin destnîşankirin. Min ji bo navendê Şamîl û hinek hevalên din pêşniyar kir. Di mijara pêşniyaran de nêrînê min, Fuat û Seît hevbeş derdiket. Ji ber Şener jî sekreterya bû, piranî li meyla

gişti dinêriya û wisa nêrînê xwe dida. Di hinek mijaran de jî destpêkê wî pêşniyar dikir. Di nîqaşan de jî nêrînên xwe ferz dikir. Civînên me bi gelemperî nîqaşên zêde û polemîkan derbas dibûn.

Ez, Fuat û Şener derve re eleqeder dibûn. Em berpirsê rêxistinkirina nivîs, not û kontrolkirinê bûn. Pêwendiya di navbera qoxuşan de jî min saz dikir. Agahiyên heyîn jî yekser min radigihand Şener. Carê em bi hev re li qoxuşên din jî digeriyan. Hinek civîn hatin lidarxistin. Em çend caran di bin navê pîrozkirina cejnê de çûn serdana komên din û kesên qaçaxçî. Qadroyên navendî yên TÎKKO di qoxuşa 35'an de bûn. Pêwendiya bi wan re jî li wir dihat meşandin. Hinek ji wan jî di nav koma firar bikê de bûn. Lewma nediçûn qoxuşên cuda. Pêwendiya bi wan re piranî baş bû. Astek hatibû bidestxistin. Weke berê nêzîkbûnên dijber, tewanbar, nepixandî, tund û helwestên peywendiyan qels bikin pêş nediketin.

Bi Mehdî Zana re hinek pirsgirêk hatibûn jiyîn. Demek dirêj bi hevalan re bû. Li hember berxwedariya wî rêzdarî hebû. Wî jî ji serî ve şehîdên me yên berxwedaniya mezin ji nêz ve dît, ew nas kirin. Dostek ku wateya berxwedêriya PKK'ê ya di wê pêvajoyê de derketî holê û bandor li pêvajoyê kirî nas dikir. peywendiyên bi wî re jî li ser vî bingehî bûn. Lê nexasim piştî sala 87'an, herî zêde jî di sala 88'an peywendiyên heyîn de sarbûn û dûrbûnek pêş ket. Mehdî Zana asta siyaset û koman derbas dike jorê de mîsyonek da xwe. Nêzîkbûna wî ya digot; "ez Mehdî Zanayê serbixwe me" zêde li pêş bû. Dîsa nêzîkbûnên pragmatîst ên komên din û hewldanên wan wî bikişînin ber bi xwe ve bandor li wî kir.

Hem di hundir, hem derve de hewldan hebûn ku, wî ji me veqetînin. Di vê mijarê de di nêzîkbûnên me de jî kêmasî hebûn. Me jî hinek aliyên wî yên xweser berçav negirt. Dîsa bê ku em hesabê hemû pêşketinên rû didin bikin, diketin nav bendewariyan. Di vê mijarê de rexne û hişyarî jî hatin kirin. Lê hinek zêde xirab dilîstin. Em jî vê mijara dana fêmkirinê de teng û kêm man.

Jixwe peywendiyên me yên bi Leyla Zana re acizbûnek dabû avakirin. Tişta herî xwezayî jî malbata Leyla di nav tevgerê de cih digirt. Lê, nêzîkbûnên 'dê Leyla ji te bistînin' bandor lê kiribûn. Di wê demê de hilbijartinên serok şaredariyê jî di rojevê de bûn. Dema me pêşniyar kir Leyla bibe namzet, destpêkê Mehdî li dijî vê derket. Ez ne şaş bim, wê demê Refîk Karakoç û Atalay jî namzet bûn. Lewma me nekarî em Leyla namzet destnîşan bikin. Bêguman Leyla jî, ne Leylaya berê bû. Êrîş û çewsandinên dijmin, gelê me jî polîtîze kiribû. Herî zêde jî malbatên ku xizmên wan di zindanê de bûn, ji van pêşketinan bandor dibûn. Ji ber wan jî yekser di nav bûyeran de cih digirt. Yek ji ya şiyarbûna jina Kurd jiyan dikir, Leyla bû. Leyla Zana, bi hewldana xwe aliyek têkoşînê de cih digirt, bi wê re dimeşiya û dê nasnameya xwe ya jinbûnê bidest bixista.

Paşnavê Zana, ne nasnameya wê ya rasteqînî bû. Guhertina wê jiyan dikir, xwezayî dibû sedem ku Mehdî Zana jî nakokiyan bijî. Her îsyan, her lêgerîn, girêdana weke malbatî û hevjînbûnê bandor dikir. Îtîrafkarî bi giştî jî hebû. Ev rewş bi Zana wan re jî hat jiyîn. Peywendiya nû ya ket dewsa yên heyîn de zêdetir rêzdar bûn. Êşên wan giran bûn. Ji ber şoreşê Leyla ji destê wî digirt. Lê belê, li gorî hinekan PKK'ê ji wî

dizîbû û ev jî xeter bû! Hinekê jî sedema bingeha sarbûna peywendiyên me yên bi Mehdî Zana re, ev pirsgirêk hebû. Ger ev baş bihata fêmkirin, dê pirsgirêk jî bihata çareserkirin.

Şener berî demekê behsa nameyên ku Elîfê jê re şandiye kiribû. Min jê re jî gotibû ez dixwazim wan nameyan bixwînim. Lê ti carî neda min. Ez jî pey neketim. Lê min jê re got ku, min ew di dawiya sala 78'ê de li Elezîzê dîtibû. Jê re digotin Medîha Tirk. Gotinên Xalîdeya ji DDKD'ê bû hatin bîra min. Gotibû; "ev zilamên Kurd pir ecêb in. Her yek ji wan weke şêra ne. Diçin metrepolan li kur keçek Tirk a kor, kêrî tiştekê nayê, nizane bimeşe wan ji xwe re digirin. Di rastiyê de gelek keçen me yên Kurd û bedew hebûn." Wê demê jî hemû jinên ji TKP'ê (Partiya Komînîst a Tirkiyê) yên di qoxuşê de Tirk bûn. Piranî berçavkê wan hebûn û hevjînê wan jî Kurd bûn. Gotina wê hinekê jî ji bona wan bû. Ev henekên Xalîdê yên siyasî ew jî didan kenîn. Jixwe min di rapora ku, nivîsandî de behsa kesayetên wisa jî kiribû. Yên xwendî jî keniyabûn. Min behsa vê ji Şener re jî kiribû û gotibû; "belê, divê mirov Elîf ji yên din cuda bigire dest."

Dema axaftinên me hatin ser Medîhayê, Şener behsa xebatên wê demê yên li Êlihê jî kir. Di mijara Medîhayê de zêde ferz kiriye.

Digot; "niha li Rojhilata Navîn e. Hisnî behsa wê kir. Behsa hinek tiştên din jî kir." Lê zêde venekir. Me li ser hezkirinê nîqaş kir. Mijar anî ser Hamilî. Got; "zêde bandor bûye." Carek din destnîşan kir ku, ez di vê mijarê de zêde bêrehmim. Piştre nêzîkbûna min a ji hezkirinê re nirxand. Got; "APO'geriya bi te re tê jiyîn bandor li her kesî dike. Kesayeta

te zêde xwezayî ye. Kesayeta te, heman weke firçeyek li ser paçê wêneyekê ji xweber biherike û reng derdixe holê ye. Her kes fêm nake ku tiştên ew firçeya jixweber û ji rêzê diherike çi rave dike. Bandor dibe, lê nikare wate bide."

Min got; "tu zêde felsefîk û romantîk axivî." Demekê axaftinên me wisa berdewam kirin. Carekê got;

"Ger dergistiya min nebûya, ezê jî evîndarê te bûma." Ez piştî van axaftinan cidî bûm.

Min got; "evqas jî nabe. Divê giraniyek axaftinên me hebe. Rast e, em her tiştî nîqaş dikin, ev baş e. Lê nabe ku, her tişta bê bîra mirov bêje."

Bersiva min da; "ma tu nikarî li hember hezkirinê embargo danî! Dibe ku ev ji bilî daxwaza mirov pêş bikevin. Ma dê tu li dijî her tiştî derkevî." Dirêj û dubare kir. Ez jî wê kêliyê bêdeng bûm. Ji nişka ve gotinên Hamilî hatin bîra min. Hewl didim helbest, an jî axaftinên wî yên têkildarî hezkirinê şîrove bikim. Ji nişka ve min xwe sucdar dît. Divê hinek din evqasî hêsan nekarin bi-axivin. Gelo vê cesaretê ji kur digirin? L, zora min çû. Çavên min tije bûn û min daqurtand. Ji ber bandorbûna Hamilî êşek dilê min girt. Çi qas xirab e ku, mirov êşê bi hinek din bide jiyîn! Di tevahiya jiyana min de, di vê mijarê de her tim neyênî rû dan. Her tim êş hatin jiyîn. Min jî ev rastî jiyan kir, yê miqabilî min jî jiyan kir. Lê min ti caran ev bi zanebûn nedikir. Gelo li gorî yeke din tevgerîn, an jî hezkirin kirina amûrek meşandina hinek tiştên din bû?

Na! Hezkirin nabe amûrek. Hezkirin yekser çalakiye. Hezkirin jiyan bi xwe ye. Ma dibe ku mirov wê bike amûrek jiyanê û ev jî berovajî bû? Lê di lêgerînên hezkirinan de

seqetiyek hebû. Hezkirin nayê pêşkêşkirin. Hezkirin bi zorê nayê bidestxistin. Mirov nikare hezkirinê bike mijara bazarê. Mirov nikare bi hezkirinê bilîze. Hîle li hezkirinê nayê kirin. Hezkirin nayê veşartin. Lê belê, divê hezkirin wisa zêde dest vekirî jî li her navetastê neyê berbelavkirin.

Axaftinên weke "xetên wêneya li ser paçê jixweber pêş dikevin", an jî "Mona Lîsa ji firçeya Leonardo derketî", nêrgiza di kûraniya çiyan de" gelekî xweş bûn. Lê di hemû gotinan de jî hezkirin zû dişkest. Di heman demê de hezkirin pir kirêt dihat kuştin.

Şener got; "çima çavên te tije rondik bûn." Ji ber çavên wî neçû. Berdewam kir; "misoger tiştên ku min gotin bandor li te kirin."Ez baş nas dikirim. Hatina hezkirin tiştek pir xweş e. Jinekê bandor dike. Lê tam di vir de lewaziya min a di vê mijarê de nas dikir û desteser kiribû. Hestiyarî, lêgerînên min ên hezkirinê û jinbûna min, di nava cewhera wê APO'geriya ku, behs dikir de baş nehatibû rûniştandin. Hezkirin û baldarî ji kur dest pê dikin û li kur xilas dibin. Diviya ez van baş fêm bikim.

Min jê re got; "tu ji rêhevaleke min hez dikî û dergistiyê wê yî. Li gorî min divê tu li hember wê rêz bigirî. Tiştên te gotin bandor li min kir. Lê divê mirov di hezkirinê de durist be." Ji nişka ve ji bandorên hestiyar dûr ketim û min wisa karî van gotinan bêjim. Yekser ji cem wî jî rabûm çûm. Min got; "ezê biçim qoxuşê." Yekem car bû demek zû de ji cihê hewagirtinê derdiketim. Min ji Cahîdê wan re jî got; "ez hinekê nexweş im."

Demekê li qoxuşê hizirîm. Min derbarê vê mijarê de nivîsek nivîsand. Ji ber êdî min cidî dît. Ez hêj nû ji qeyrana têkîliyekê rizgar bibûm. Nexasim Hamilî hêj jî weke mirovek min nêz dibû. Ez jî bandor bibûm. Me salekê li ber hev da. Herî dawî jî êdî me nedikariya em bi hev re bi-axivin. Dema ez diçûm qoxuşa 36'an Hamilî nedihat. Dema ew amadebûya, min nedixwest zêde lê bimînim. Min hewl dida di nav hevalan de nedim der. Ji ber haya her kesî rewşa heyî nebû. Berê di navbera me de hevpeyvînek hebû. Em bi hev re di-axivîn. Niha jî em silavekê nadin hev. Li şûna ku em wisa hev bibînin, em qet liqay hev neyên baştir bû. Ger Hamilî kamil nêz bibe, ezê cardin peywendiya xwe ya hevalbendî bidomînim. Lê ew ti caran nêzî vê pîvanê nebû.

Gerimbûna min a di serî de nêzî Şener, piştre jî nêzî hemû hevalan, peywendiyên min ên xwezayî bi wan re pêş dikeve û gerimbûna min a li hember wan tê zanîn. Min jî destnîşan kir ku, ev rastiya min tê zanîn, lê ev nayê wê wateyê ku her kes, bikare her tiştî pir hêsan ji min re bêje. Dîsa jî ger a ku ji vê re rê vedike ez bim, ezê hişyar tevbigerim. Di heman demê de min diyar kir ku, hêjî dergistiyê Medîhayê ye, tevî hêj ev têkîli didome tiştên ku ji min re gotine cidî dibînim. Lewma divê li hember têkîliya xwe rêzdar be. Min di vê wateyê de nêzîkbûna wî ya ji hezkirinê re rexne kir û jê re nivîsand. Min axaftin û nîqaş guncav nedît. Roja paştir jî not da wî. Piştî ku not xwend hewl da bi-axive. Dema min ev ferq kir, min jî axaftinên xwe yên bi hevalên din re dirêj kir, firsendê nadimê ku bi-axive. Pir vekirî bêjim, ji axaftinê direviyam.

Li gorî min sixtekariyek bû. Di destê wî de gustîlka wî hebû, name ji hev re dinivîsandin û behsa wê ji min re dikir.

Dilxwede weke kesên ku em heman pirsgirêkan jiyan dikin, min hewl dabû pevçûna bi Hamilî re bi nîqaşan bidim derbaskirin û bi wî re çareser bikim. Gelo mirov dikare di kêliyekê de ji yekê zêdetir kesan hez bike û li hember baldar be? Lewma ez hem ji hêla exlaqî ve, hem jî zanistî ve ti wateyê nadimê.

Wî jî bersiva nota min nivîskî da. Uslubek ecêb bikar anîbû. Diyar kiriye ku, qaşo min gotinên wî zêde mezin kirine, li hember Medihayê rêzdar e. Lê hezkirin tiştek cuda ye, girêdana bi kesekî ve û hezkirina wê nabe hezkirin. Ger zemînê wê hatibin guhertin li wir tenê girêdanek exlaqî heye. Li ser bingeha girêdayî quralên civakî hezkirinek tê meşandin. Lewma tiştek xwezayî ye ku mirov bandor bibe, di vir de xapandinek, an jî dûrûtiyek tine ye. Gotibû; "ez li hember Medîhayê durist im. Min heta niha li dijî wê têkîliyê tiştek xirab nekir." Di vê wateyê de rexneyên min qebûl nake û diyar dike ku, ez teng û muhafazakar nêz dibim.

Nîqaşek wisa peywendiyên me yên din bandor nake. Lê navberek û sarbûnek ava kir. Ez jî weke berê nerehet im. Lê qet mijarê venakim. Ew jî baldar tevdigere.

Heval qelebalix in. Lewma bi giştî nikarim bi her kesî re bi-axivim û mijûl bibim. Di vî warî de rexne jî hene. Gelek heval dixwazin bi-axivin. Nexasim hevalên ji berê ve min nas dikin, hinek hevalên pirsgirêkên wan hene pêdiviyên xwe bi axaftinê hebûn. Min jî kêmasiya xwe ya di vê mijarê de ferq dikir û aciz dibûm. Lê ji bîst qoxuşan zêdetir ên ayîdê hevalên me hebûn. Şêwazê têkîliyên heyîn, ji bona em wextê xwe baş binirxînin dibûn asteng. Şêwaza xebatek bûrokratîk hebû. Di her qoxuşê de bîrîmek û ayîdê her blokê bîrîmek hebû. Mirov li

gorî pêdiviyên hiyerarşiya rêxistinî girêdanê xwe bi wan re çêdike. Pirsgirêkên wan guhdarkirin, pirsgirêkên giştî ragihandin û bi hinek hevalan re axaftin wextek mezin digire. Bazdanek heye û qet nasekinim. Nikarim wextek pênc xulekan ji bona xwe veqetînim. Dîsa jî têrê nake.

Êdî ez jî ber bi xilasbûna wextê hewagirtinê encamên kar ji Şener re radigihînim. Di navberê de jî em li ser karên divê rojane werin kirin di-axivin. Ev jî xwezayî sînorekê dixe navbera me. Lê Şener serwer e. Hem di asta rêveberiyê de, hem jî di hemû hêlên jiyanê yên din de serwer e. Di pêvajoya destpêkê de jihev ketî, qirêj, belav, di peywendî û axaftinên wî de bê uslup bû. Tirs nêz dibû û zêde tevlî kar nedibû. Ez jî di vê mijarê de kêmasî, belavbûn û bê uslubiya hem di giştî û hem bi taybet hinekan re dibînim rexne dikim. Di vê xalê de gelek kesên ku wan qebûl nedikir hebûn. Her tiştê wan ji dûr ve bedewbû û dihat hezkirin. Her ku min jiyana wan ji nêz ve didît, min gelek aliyên ku nikarim qebûl bikim û ji min re ecêb dihatin dît. Min her tim di nava jiyan û peywendiyên rojane de rexne û hişyariyên xwe dikir. Şener baldar nêzî rexneyên min dibû. Guhertinek berbiçav ava kir. Hevalan digot; "ji roja hûn hatine ve bi her kesî re guhertinek heye. Her kes baldar nêzî paqijî, deng û nêzîkbûnê xwe dibe. Di nav me de yê herî qirêj Şener bû, wî jî xwe guhert."

Bernameya perwerdeyê berfirehe. Pirtûkên di destên me de weke çavkanî dihatin bikaranîn. Lê em nikarin tevlî bibin. Dema di navberê de li eywanên jêr nîqaşên semîneran tên pêşxistin, di tevlîbûna me de ti xeterî nayê dîtin. Lê em nikarin tevlî perwerdeyên hundir bibin. Di heman demê de ji bilî cihê hewagirtinê, em hewl didin nekevin ti qoxuşê. Carê min cejin û

civîn dikirin hêcet û li hemû qoxuşan digeriyam. Dijmin jî li hember vê helwesta me mat maye. Bi gelemperî li hember me rêzdariyek hebû. Heta gardiyana jin digot; “berê van gardiyanên zilam bi qasî pênc quruşan nirx nedida me. Lê niha ji ber ji peywendiyên we bandor bûne, dema em ji derî ve dikevin hundir li ber me radibin. Kursiyên xwe didin me. Mudur jî wisa nêzî me dibe.” Ev nêrîn gelekî girîng bû. Ev jî nêrîn dîmenek me ya ji aliyê eniya dijmin ve bû. Nexwe baş e em jî wan erênî bandor dikin. Lewma divê em vê nêrînê biparêzin. Her çendî dijmin jî be, li hember wî şêwaza jiyan û peywendiyên me gelekî girîng bûn.



“Bertekên heyîn weke îsyanekê hem me hem jî dijmin ditirsînin...”

Di hefteya destpêkê ya meha Gulanê de îdareyê agahî şand; “bila çar jin hemû tiştê xwe amade bikin, dê biçin girtîgehek din.” Çawa agahî gihişt, me bi hev re barîkat çêkirin. Me duruşmeya “Bimire Sûrgûn” qêriya. Ji nişka ve li hemû girtîgehê pêla van duruşmeyan belav bû. Êdî di navbera qoxuşan de bi dengê bilind axaftinan destpê kir. Heta demekê her kesî ji hev re digot, kî tê sûrgûnkirin, çi dibe, rewş çiye naye fêmkirin. Qoxuşa herî nêz ya sê bû. Me rewş ji wan re got. Di demek kin de her kes pê hesiya ku, emê bên sûrgûnkirin. Gotin; “fermanek ji jor hatiye. Me derbas dike. Dadgehan biryar daye. Dê ji bona we baştir be. Hûnê biçin girtîgeha sivîlan. Dîsa li Amedê ye. We dernaxin dervî vir.

Me bersiv da û got; “na, dozên me yên dadê hêjî didomin. Em dixwazin bi hevalên xwe yên di heman dozê de tên darezîn re bimînin. Ev biryarek kêfî ye. We çima heta niha em neşandin? Em qebûl nakin.”

Dozger got; “jixwe we hemû girtîgeh rakiriye serhildanê. Çawa wisa lez agahî girtin. Em metel mane. Hûn vê girtîgehê birêve dibin. Ma hat fêmkirin.” Li zora wan çûye. Diyar e dê serê wan bi êşe.

Piştî ku, Karasu ew çûn, ew pêvajoya sûrgûnê ji nû ve hat nirxandin. Di vê mijarê de hinek rexne pêş ketin. Bêdeng çûna wan koman cesaret dabû dijmin. Lewma dê ji vir û şûn de yek bi yek, kom bi kom sûrgûnê bidomînin. Di encama nîqaşan de hat gotin ku; “divê em vê polîtîkaya xwe cardin ber çavan re

derbas bikin. Dê ji vir û şûnde ti sûrgûn hêsan pêk neyên. Bê ku ti îsyan rû bidin, emê li dijî derkevin.” Kesî hêvî nedikir ku, sûrgûna nû ji me were destpêkirin. Nedihat texmînkirin. Di vê sûrgûnê de ti hêcetek ‘zagonî’ jî tine bû. Em jî vî alî li hember wan bikar tînin.

Ev xwedîderketina hevalan pir xweş bû! Di şibakan de diyar dikirin ku, dê me bi tenê nehêlin. Dê mîsoger heta kêliya dawî li ber xwe bidin. Heta hinek ji wan zêde hestiyar nêz dibin. Dibêjin; “cesedên me ji vir derbixin, em nahêlin we xwîşkên me ji vir derbixin.” Hevalên di qoxuşa sê de li ber şibakê nobetê digirin. Tevî ku zêde bilind bû, dorê derdiketin her tim bi me re peywendî çêdikirin. Ez qet Hisên Eroxlu jibîr nakim. Ew qet ji şibakê danediket. Gotibû; “ew ketî ji we hesidîn. Jixwe wî bîjiyê faşîzan kumê xwe avêtibû erdê û gotibû ‘ez îstîfaya xwe didim.’ Derketina we ya li cihê hewagirtinê bandora we tê zanîn. Li ti girtîgehê tiştek wisa tine ye. Vê destkeftiyê hezim nakin. Ancex karîn vê qasê qebûl bikin. Lê na, nikarin we ji vê girtîgehê derxin û bibin cihek din. Yeqîn bikin jî, lê ta min li cem min e. Min vekirî ji wan re jî gotiye. Ger sûrgûn werin destpêkirin, emê jî çalakiyên xwe kuştinê bixin meriyetê. Lewma ew zilam jî tirsiyan.”

Ez jî ditirsim. Divê mirov di vê mijarê de texmîna her cure provakasyona bike. Ji ber sûrgûna li Elezîzê destpê kirî, rewşên wisa hatibûn nîqaşkirin. Lê ew der cuda bû. Bertekên heyîn baş xurt nebibûn. Bertekên li Amedê heyîn weke îsyanê ne. Hem dijmin ditirse, hem jî em ditirsin. Heval jî hestiyar û bi bertek nêz dibin.

Gelek kes dibêjin; “baweriya me bi we nayê. Ma em ji kur dizanin ku, hûnê me bişînin ku derê? Na, gavekê jî ji vir navêjin.” Lewma îdare jî ditirse. Murdur digot; “me jî belayek girtiye serê xwe.” Wî jî baş dizaniya ku çûna me ya cihê hewagirtinê ne tenê ji bona serdan, mereq, an jî ji bona mêvandariyê ye. Nexasim, ez diçûm her derî. Ev jî mîsoger girêdayî rêxistinkirin û xebatên me bû. Dijmin jî baş dişopand. Mîsoger ev jî encama rapora dayî bûn. Di heman demê de Fermandariya Kolorduya 7. jî ev rewş nirxandibû!

Dema di meha Sibatê de daxwazên me hatin qebûlkirin, wê demê tenê li ser esasê mêvandarî bû û dê tenê cihê hewagirtina qoxuşekê esas bihata girtin. Wê kêliyê agahiya şehîdekê jî hatibû dayîn. Hinekê jî her tişt di nava wê rewşê de qedandibûn. Piştre jî nekarîn pêşiya wê bigirin. Ji ber yeser qedexe bikiran, dê bertek zêde bûna. Wê di bin navê, “sewkî girtîgehek din were kirin de” pirsgirêka heyî ji bingeh ve bihata çareserkirin.

Weke din jî di plana wan de hebû ku, îtîrafkaran di beşa me de bicih bikin. Beş jî di nava xwe de girtîgehek din e. Cihê hevdîtinê, cihê hewagirtinê, serşok, heta cihê têkîliyên bi derve re jî ji hev cuda bûn. Ger di vê beşê de bûna, diyar nedibû ku yên nû bên kî ne û têkîliyên bi îdareyê re jî nedihatin venêrîn. Weke din jî, dikariyan wan bibin operasyonan û hinek cihên din ên derve. Di vê beşê de ev derfet dida wan. Ev plan û rewşa me ya di nav girtîgehê de, bandora me li cem hev, ji bona dijmin dibû hêcetek girîng a sûrgûnkirinê. Lê belê, qet hesab nekiribûn dê bi berxwedaniyek wisa re rû bi rû bimînin.

Ez nizanim tam çend rojan doma. Lê em di nav hefteyekê de cardin weke berê derketin hewagirtinê. Mudur, dozger û Şener bi hev re hatibûn. Hevdîtin pêk hatibûn û soz hatibûn dayîn. Ji bona bi me bidin bawerkirin me naşînin, weke nûnerê girtîgehê Şener bi xwe re anîbûn. Me jî barîkat rakirin û çalakî bidawî kir.

Lê diviya em ji wir û şûn de zêdetir baldar nêz bûna. Dikariyan ji nû ve bixin rojevê. Diviya em her tim şiyar bin. Dikariyan ji nişka ve ser me de bigirin û me bibin. Ji ber beş jî cuda bû. Lewma bi giştî gumanek hebû û hevalan jî em hişyar kirin.

Ji ber roja dayîkê serdanên destpêkê yên vekirî pêk hatin. Serdan li cihên hewagirtinê û korîdorên jêr pêk dihatin. Dayîkan dixwestin hucreyên Mazluman, Xeyriyan û Pîran bibînin. Em wê sibehê beriya kesên werin serdanê hatibûn. Ez jî yekem car diçûm serdana hucreya Mazlum. Min cihê çalakî lidarxistî dît. Di rewşên asayî de ewder miftekirî ne. Di rojên serdanê de derketina qoxuşan qedexe ye. Lê gardiyana got, tenê dikarin derkevin qeta çaramîn û dê serdan li wir bên pêkanîn. Paşê derketin û çûn.

Min got bila kes neyê û min bi tena serê xwe di beşa tuwaleta hucreyê de, pala xwe da cihê ku hevalê Mazlum xwe daleqandî û îske îsk giriyam. Yek borî hebû. Krawêta xwe jî bi wê boriyê ve girê dabû. Min ew der, dîwarên ku wî destê xwe lê dane tev ramûsan. Min nedixwest ji wir derkevim. Weke ku Hevalê Mazlum li wir bû. Heybeta wî, xweşikbûna wî, kesayeta wî ya bêhempa weke peykerekê li wir ber çavên min bû. Ruhek cuda dida min. Ji serî heta binî ez dihejandim. Ti şahadet bi qasî ya wî bi jiyanê ne dagirtî bû. Min di pêvajoya

girtîgehê de tenê carekê ew ji dûrve dîtibûn. Lê di nava wan de Mazlum tinebû. Wê rojê rûniştinên me yên dozê rastî hev hatibûn. Ez ji jor ve dihatim, ew jî ji jêr ve diketin hundirê avahiyê. Hemû jî serbilind bûn. Hundirê çavên wan dikeniyan. Min jî bê ku guhê xwe bidim heydedanên leşker ên digot; "zû bike, zû bike" gavên xwe giran kir. Min carekê jî hevalê Xeyrî bi komek din re dîtibû. Şansê dîtina cara duyem jî, min di roja rûniştna dozê de dît. Hemû evqas bû. Lê weke min her roj ew didîtin. Ew hêza wan a giyanwerî û bahoza wan a şoreşgerî li me tevan dida û dilê me dişewitandin.

Ez bê ku di ferqê de bim, min dîwar dabû ber kulman. Şener jî bi wî dengî ez hişyar kirim;

"Tu destê xwe li wir nedî dê baş be. Ewder derî ye. Deriyê tûnelê ye."

Min got; "tu rast dibêjî? Ma li vir e?" evqas jî tesadûfî nabe. Li cihê ku dil û mejiyê Mazlum bûyî yek, deriyê tûnelê jî di wê navberê de bû. Min hinekê baldar lê temaşe kir. Pir baş hatibû veşartin. Ji texteyên biçûk qepax hatibû çêkirin. Qepaxek ji kils û alçiyê hatibû çêkirin. Wê demê çi dibû? Xwe ji wir diberdan jêr. Piştî zemînê jêr jî, pênc-şeş metreyan ber bi jêr ve kola bûn. Pişt re jî berê wê dabûn kêlekê. Min got; "temam e." Weke ku dê hinek bibihîsin min got; "em dengê xwe kêm bikin." Em derketin. Êdî malbat jî ketibûn hundir. Gelek kesan dixwest hucreyê bibînin. Bi dorê dihatin. Hucre jî bi rêk û pêk hatibû raxistin. Wêne û al li dîwar hatibûn daleqandin. Ji hucreyên din cudatir bû. Hevalan wir bikar nedanîn. Ewder cihê Mazlum bû.

Min wê rojê xwîşk û diya Şener Salîha ji nêz ve dîtin. Min yekser ew nas kirin. Şener bi xwîşka xwe Fatma re zêde gerim nîqaş dikir. Kêliyekê bangî min jî kirin. Şener gustîlka xwe dabû Fatmayê, Fatmayê jî zêde ti wate nedabû vê û xwestibû bi min re bi-axive. Dibe hinek tiştên din jî jê re gotibe. Lê Fatma aciz bû. Got;

"Sakîne jî kesek berpirsyar e. Ma tiştek bûye? Ma Elîf ne di nava partiyê de ye?"

Min jî got; "belê, di nav partiyê de ye." Diyar kir ku Şener gustîlka xwe daye û gotiye êdî ti têkîliya wî pê re nemaye. Digot; "ev çend sal in dergistî ne. Ev jî ji kur derket?"

Aciz bibû. Gelo Şener çima pirsgirêkên wisa bi malbata xwe re çareser dikir, an jî çima ez têkil van rewşan dikirim. Dibe ku Fatma vê şaş jî fêm bike. An jî bixista serê xwe sedem ez im. Min jî got; "ez nizanim, haya min jê nîne. Niha wî sedema wê ji we re gotiye. Lê ne rast e ku pirsgirêkên xwe ji we re dibêje."

Ew rewş bû sedem ku, piştre nîqaşek tund were jiyîn. Min jê re got; "ne tenê malbata te, wê hemû heval jî ji te bipirsin, te çima gustîlka xwe derxistiye. Sedema wê çiye. Dibe ku ew xelek ji bona te zêde tiştekê rave nake, lê madem te heta roja îro di destê xwe de hiştiye, niha jî nerast e tu derbixî." Wî yekser destnîşan kir ku, ji ber mijarên derheqê Medîhayê de bihîstine derxistiye. Li gorî Hisnî Altun gotiye, di nava partiyê de hinek têkîliyên Elîf ên cuda pêş ketine, di vê mijarê de hinek nav jî dane. Lê Şener derbarê vê mijarê de li ser esasê Medîhayê tewanbar bike, ne di-axivî.

Got; “ez wê nas dikim. Ew ne kesek wisa sivik e. Rehet e. Di têkîliyên xwe de pîvanên kevneşop şikandine. Bênamûsan ew bikar anîn. Mîsoger kesên wisa hene. Ez wê tewanbar nakim. Baweriya min jî pê heye. Pirsgirêk ne tenê ev e. Rast e, ez ji vê bandor bûm. Lê pirsgirêka sereke tu yî. Tu ji bona min pîrozî. Ger ez hestên xwe yên li hember te veşêrim, ezê durûtiyê bikim. Sixtekariya herî mezin jî, di rewşek wisa de ev gustîlîk di destê xwe de gerandine. Tu ji vê re dibêjî, “xapandin.” Ne wisa ye. Ez ji Apo’geriya te hez dikim. Bandora te li ser min çêbûye. Ev bandor jî ne tiştek wisa ji rêzê ye. Te jiyana min guhert. Berê nêrîna min ji jiyanê û ji mirinê re jî cuda bû. Ez ji mirinê ditirsiyam. Di jiyanê de jî, mijarên ku ez ditirsandim hebûn. Lê ez niha ji mirinê hez dikim. An jî mirin ne li xema min e. Ez di jiyanê de jî çi bikim, neçar dimînim ku ji xwe re pîvanan diyar bikim. Ji ber di her tiştî de tu li rastî min tê.”

Diyar dikir ku, dixwaze her tiştî vekirî bi-axive. Her ku di-axivî, axaftinên wî dirêj dibûn. Me bi saetan nîqaş kir. Ez giriyam. Hevalan ferq kir. Min xwest derkevim û biçim. Lê dibe ku dijmin min wisa di korîdorê de bibîne. Ez çûm cihê dest şûştina hevalan, min dest û rûyê xwe şûşt. Kesên ku didîtin çavên min sor bûne, metel mayî li min dinêriyan. Lê kesî tiştek nedipirsî, nedikariyan bipirsin. Ji ber ez jî ne di wê rewşê de bûm ku, bersivê bidim wan.

Ez kiribûm nav pençeyekê de, bi ti şêwazî nedihişt ez henaseyekê bikişînim. Çi analîzên zanistî, civakî û derûnî hene, tev dikir. Ji destpêkê ve di wê ferqê de ye ku, ez jî ji çalakgeriya wî bandor bûme. Di ferqa birçîbûna min ya ji kar re, hişyariya min a li hember pirsgirêkên rêxistinî û hewldana

min de ye. Dizane ez çi dixwazim û li benda çi me jî. Bingeha pevçûnên min ên bi Hamilî re jî baş dizane. Hamilî di çavên min de kesateyek berxwdêr bû. Lê ji ber nedikariya wê li ser bingehek rêxistinî bide avakirin, lewazî û şaşiyên wî hebûn, ez jî neyênî bandor kirim. Me nekarî em hevbeşiya xwe ya karê rêxistinî ava bikin, em di wir de nebûn yek û hewldanên me ber bi hevûdû ve neherikîn. Ev jî bûn sedem ku têkîliya heyî xirab bibe.

Gelo azweriya min li hember çi zêde bû? Min çi dixwest? Vê bi kesayeta min re vekirî xuya dikir. Weke din ez jî ji aliyê xwe ve weke jinekê bibandor bûm. Bandora min a giyanwerî, bi rewşa min a rêxistinî ve hêzek mezin ava dikir. Tişta bi wî re tinebû, dixwest bi min re temam bike. Min bi rastî jî weke mertalekê Şener parastibû. Bi gelemperî jî nêzîkbûna min a ji her hevalî re wisa bû. Lê herî baş Şener ev rastiya min didît. Min jî jêhatiyên bi wî re didît. Vê jî ez ber bi wî ve dibirim. Daxwaz û jêhatiya min a hêza wî rêxistinkirin, dana karkirin û kirina tevgerê de zêde bû. Şev û rojên xwe dikir yek, lewma min jî digot; “tam ez jî li hevalbendiya kar a wisa digerim.”

Hamilî gelek caran digot; “belê, tu me na-ecibînî. Hinek kes li gorî te şoreşgerên herî baş in.” Wisa rexne li min dikir. Rast jî gotibû. Min nedikariya nîv saetê bi Hamilî re nîqaş bikim. Ne ku ew ji min kêmtir bû, an jî kêmtir dizaniya ji ber wê bû. Na, Hamilî di hewldanên axaftin, nîqaş, rêxistinkirin, veguhertina xebatên hevbeş û xwe gihandina encamên hevbeş de kêm dima. Hostatiya wê nedida der. Bi min re jî sebra avakirinê û hostatiya avakirinê tine bû. Tişta bi min re dida gotin; “Şener dikare vê bike” jî ev mijar bû. Ew nêrîn bi her kesî re ava kiribû. Min dixwest kar bikim. Rêzdariya min a

rêxistinî ji ya wî zêdetir bû. Tiştek wisa xwe bişkînim û biçewsînim tine bû. Heta tevî Şener sekreter bû, min ew jî kontrol dikir. Weke din jî her çendî aliyên wî yên dihatin nîqaşkirin ji rojevê derketibin jî, di bi wî re û hem di nav hevalan de bandora wê berdewam dikir. Ji aliyekê ve min li hember Şener baweriyek dabû avakirin. Min erkek hêza avakirina hevsengiyê pêş dixist.

Hem di xala dihat nîqaşkirin de, hem jî di xala asta têgihiştinê de baldariya min, di rastiyê de hişyarbûna min rave dikir. Ez di vê mijarê de ji xwe bawer bûm. Ango zêde axaftin hatibûn kirin. Di sala 84'an de rewşek jiyan kirî hebû. Ji ber van jî bêbaweriyek ava kirî hebû. Ev jî her tim dihat hîskirin. Her çendî dem bi dem di nav yekbûna xebat û peywendiyan de be bêbawerî winda bibe jî, min hest û hîsek ku ti caran acizbûna wê derbas nedikir jiyan dikir. Lê dîsa jî aliyê serwer ê ku dimeşiya bû. Min ji her kesî zêdetir dixwest ku vê hêza bi xwe re derbixe holê, di vê astê de peywir bigire û pêşdarezînên heyîn derbas bike.

Beriya ez Salîhayê bibînim bi min re pêşdarezînek çêbibû. Bi gelemperî nedihat hezkirin, lê bi nav û deng bû! Sedema evqasî derketibû pêş, bêtevdîriya me bû. Me zêde nedişopand kî çawa derdikeve pêş û bi nav û deng dibe. Bi dehan dayîkên bêdeng, sade û ji dil û can kar dikirin û ked didan hebûn. Her çendî êşa wan mezin jî be, li hember kesên di jiyanê de bi dilnizmî kar dikirin, baldariyek nebû û ji wan re nirx nedihat dayîn. Hinek kesên dizokên baldariyan, ji bilî her derî tevlîhev bikin tiştek din nedikirin. Kesên wisa ne kêm bûn. Bi giştî nêzîkbûnek li ser xatiran pêş diket. Salîhayê xwe dikir qurbana her kesî, lê ne ji dil, ne sade û ne kamil bû. Her kes ji xwe dida

revandin. Di derheqê wê de îdîayên gelekî cidî pêş diketin. Me di pêvajoya Karasu de jî nîqaş kiribû. Me zêde nedizaniya ku, derve tevdîrek çawa girtiye. Lê me kesên di nava tevgera malbatan de cih digirt hişyar kiribûn. Me dikariya xwe bigihînin wan.

Şahadeta hevalê M. Emîn Arslan bû çavkanyek Salîha cardin bikeve rojevê. Ji ber ew bi navê rixêstinê û bi navê girtîgehê diçû gelek cihan. Kesî nedikariya venêrînê ser bike. Me got; "em lêkolîn bikin." Me ji Leyla Zana pirsî. Wan jî, Salîha heman rojê li kure, çawa ji wir çûye û çi axivîne tev vegotin. Hinek agahiyên ku bihîstibûn, hinek jî agahiyên zelal bûn. Divê hinek pirs ji Salîhayê jî werin kirin. Ez bi Şener re çûm hevdîtinê. Bi Kurmancî di-axivîn. Şener qîrewîr dikir. Salîha digiriya. Sond dixwar. Di encamê de tiştên dihat gotin û rastiya Salîhayê ji hev cuda diman.

Êdî diviya derve vî karî baş û saxlem bike. Şener ne rehet bû û got; "ev jin ne rast dibêje. Lê tiştên tên gotin jî, zêde hatine mezinkirin. Di vir de lîstokek heye. Ger ev agahî ji partiyê re jî werin ragihandin, dê nebaş be. Divê em hinek mijaran fermî binivisînin. Lê divê em bi bingehên objektîf ve girê bidin. Nexwe dê hinek şaşî werin kirin." Me weke rêveberiyê erê kir ku, notek ji partiyê re were nivîsandin. Me nivîsand û şand. Bi vî rengî ji eniya girtîgehê ve li hember Salîhayê ewlehiyek dihat pêşxistin. Ango mantiqek rast e, di cihê xwe de nasekine, lê dayîk e derket holê.

Giştî jî di derbarê qadroyên navendî de nirxandinek kir. Ji bilî min û Karasu rexne li her kesî kiribû. Aliyên xwe yên neyênî jî nirxandibû. Gotibû; "bizanebûn lewaziyek taybet ne daye diyarkirin. Lê ev û ev kêmasî kirine. Xisletên wî yên

diyarker jî ev in…” weke din jî mijarek me rexne dikir hebû. Di weşanên partiyê de gelek wêneyên derbarê girtîgehê de dihat weşandin. Em hemû jî aciz bibûn. Me got; “divê ji bilî wêneyên hevalên şehîd, wêne neyên bikaranîn. Dikarin carê hinek wêneyên komî bi hev re hatine kêşan werin weşandin.” Wî ez û Karasu jî ser ve kiribûn. Tevî li dijî derketim, hevalên din jî tevlî wî bûn ku, wêneyên me jî werin weşandin.

Dem bi dem rola dida me her duyan, ez aciz dikirim. Hezkirin û baweriya hevalan hebû. Ev tiştek xwezayî bû û pê dilşad dibûm. Lê dema ev zêde derdiket pêş, ez jî zêde aciz dibûm. Ji ber qet nerast bû. Lê Şener di vê mijarê de rexne li min dikir û digot; “tu ne di ferqa mîsyona xwe de yî.” Girêdana vê jî bi kûraniya bîrdozî û polîtîk ve, xwe bi xwezayî di vê qadê de dîtin, xwe sînorkirinê û zêdetir bi hestên xwe tevgerînê ve dida çêkirin. Ev rexneyên wî rast bûn. Rastiya min rave dikir. Rexne û nîqaşên bi vî rengî dibûn sedem, ez zêdetir bi wî ve werim girêdan.

Gelo di xebatan de pêdivî çibûn û mirov dikariya çawa pêk bîne? Bi giştî pirsgirêkên hem derve û hem hundir, ravekirina pêşketinan, nivîsandina wan, an jî di nîqaşkirinê de, ti pirsgirêka Şener tine bû. Li gorî min jî pêkanîna wan girîng bû. Kêfa her kesî jî, jê re dihat. Di rêveberiya giştî de di asta nîqaşê û ronîkirina pirsgirêkan de hêzek hebû. Li ber çavan ji hev cuda, seknên astengî tine ne, yên heyîn jî hatine destgirtin. Tevî vê jî hinek kes acizbûnên wan hebûn. Lê vekirî diyar nedikirin. Bi taybet Hisnî û Faruk nerehet bûn. Nêzîkbûnên wan ên zêde bihesab hebûn. Lê me jî zêde ti wate nedida nêzîkatiyên wan. Me tenê rexne dikir.

Şener, di mijara hezkirinê de gotinên kevnar nedigot û ji wan dûr disekinî. Lê di têkîliyên rojane de, hem di ferqê de bû bi xebatan bandor li min dikir, hem jî li gorî hest, pîvan û daxwazên min guncav tevdigeriya. Dixwest bi vê nêzîkbûnê jî min bandor bike. Bi navê min jî xîtabî min nedikir. Digot dema dibêje, Sakîne gelekî zehmetiyan dijî. Digot xwîşka min, diya min, qurbana te me. Lê ev gotin her tim bikar nedanîn. Min jî li hember hinek hevalan taybet uslubê 'hûn' bikar danî. Min bi navê wan bang nedikir. Min berê jî wisa bang nedikir. Fêrbûnek bû. Ji ber rêzdariya min bû. Lê min di xîtabên xwe yên nivîskî de gotinên weke Hiseynê min, Metoyê min, Şamîlê min, an jî Reşoyê min bikar danî. Ev jî ji ber hestiyarî, bêrîkirinên min jiyan dikir bû. Di wan şert û mercan de bi mirov re uslubê hîskirinê, zêdebûn û tenêbûnê ava dikir.

Dijmin ji her tiştî re sînor datanî, di her tiştî de ferdperestî û ez ezî ferz dikir, mirov di hest, raman û heta xeyalan de bi tenêbûnek dijwar re rû bi rû dihişt. Ev nêzîkbûna me jî li hember van êrîşan bertek bû, girêdanek li dijî wê pêş diket. Bes, ger di van nêzîkbûnan de bêpîvaniyek pêş biketiya, her tişt ber bi xirabûnê ve diçû. Lewma çi dibe bila be, diviya em diyardeyan tevlîhev nekin.

Dijberî hemû nêzîkbûnên heyîn digot, di asta gotin de tiştek nedizanî nemabû. Asta wî ya aktûel dewlemend bû.

Digot; "herî zêde dema tu tine yî, li ser te dihizirim." Heta tevî ku derfet hebû em di cihê hewagirtinê de bigerin û bi-axivin, dema min bangî wî dikir dihat ber şibakeyê. Ew di hundir de li ber şibakê, ez jî li cihê hewagirtinê, bi hev re di-axivîn. Em di saetên kar de li ser van mijaran ne di-axivîn. Me ji demên nîvro, xwarinê û bêhnvedanê de wext cuda dikir û me

nîqaş dikir. Her çiqas min bixwesta vê mijarê vekim û nîqaş bikim, wî digot; "na, ne saeta wê ye." Kêfa min ji wan nêzîkbûnan tevan re jî dihat. Nêzîkbûnên wisa di têkîliyê de navbera rêzdarî ava bike, ferasetên mafê xwe li ser hev dibîne red dike pîvan û nêzîkbûnên kêfa min ji wan re dihatin bû.

Di pêvajoya destpêkê de li hember her tiştî baldariyek tine bû. Me piştî salên dirêj cardin heval dîtin. Lê bi giştî jî belavbûn û jixweberbûnek hebû. Bal dikişand û dihat rexnekirin. Her ku her tişt bi rêk û pêk dibû, nêzîkbûnê her kesî, şêwazên kar, pergala têkîliyan zêdetir zelal dibû. Heta demekê me bi hev re nivîs, dinivîsand, xebatên wisa bi hev re dikir. Lewma bû sedema em zêde bi hev re di-axivîn. Dema wisa dibû bal dikişand û ji hêla hevalan ve dihat rexnekirin. Weke karên duyem hatibûn nirxandin û dabûn diyarkirin ku divê ez ji bona hinek hevalên din jî wextê xwe veqetînim. Ji ber bi rastî jî pêdiviyek wisa hebû. Vê rexneyê zêde bandor li min kir. Lewma êdî min têkîliya di navbera qoxuşan de bi hevalê Fuat Kav re dimeşand. Lê dîsa heman wext digirt, heta wextek zêdetir digirt.

Ango pirsgirêk ne pirsgirêka wextê bû. Ji ber vê bandor bibûm. Lê rastiyek jî hebû, ez ji hêla hestiyarî ve bi Şener ve hatibûm girêdan. Her çendî hinek gumanên min hebin, aliyên ku bandor li ser xebatên min û têkîliyên min dikir hebûn. Di tempoya min a xebatê de, di nêzîkbûna min a ji pirsgirêkan re de, ji hêla hişyariya min ve guhertinek neyênî tine bû. Berovajî wê çarçoveya xebatê berfirehkirinê de, li kuderê derfet hebûya, xwesteka xwe gihandina wir hebû. Lê rêveberî û hostatiyek pirsgirêkan bi kûranî bigire dest, ferasetek rêxistinî ya afirîner şêwaza bîrokratîk bide derbaskirin, di xeta rêxistinê de dike yek û li ser bingehek saxlem bide rûniştandin tine bû.

Di nêzîkbûna me de, li ser têkîliyê axaftin, nav lê kirin, bi şertekê ve girêdan, ji cihekê destpêkirin û di wê çarçoveyê de nirxandin tine bû. Ji ber encamên pratîkên gelekî mezin hebûn. Her tişt li holê bû. Wê demê nexwe mirov dikare bêje, hezkirin avakirina xebatek hevbeş e? Ji bona min jî a girîng ev bû. Lewma li şûna gumanê têkîlî çawa bandor dibe, çi dibe, dê biçe heta kuderê, zêdetir gumana em çawa dikarin van karan hevbeş bimeşînin hebû. Wê di vê mijarê de jî bi nîqaş be nîqaş, bi şer be şer, bi qanekirin be qanekirinê ve, rastî çibin werin ferzkirin. Ango tevkarî û çalakgeriyek hebû, ev aliyê min jî xurt bû. Rewşa min a rêveberiyê jî ji vî alî ve rastiyek wisa hewce dikir.

Weke din ez beriya niha jî demek dirêj di zindanê de, qadên xebatê yên cuda de tenê mabûm. Ji hevalan dûr mabûm. Ev jî bû sedem ku ez bikaribim gelek karan bi tena serê xwe bikim, bimeşînim û biryaran bidim. Ev xisleta min pêş ketibû. Di nava rêvebiriya heyî de jî seknek min a taybet û xweser hebû, bal dikişand. Vê jî carê rolek girîng derdixist holê. Carê jî zehmetî dida avakirin. Ango takekesiya min ji asta teng û ferdperestî wirdetir bû. Ji bona min berjewendiya rêxistinê berî her tiştî bû. Bes bila ez di ferqa hewcedariya wê de bim û di zanebûna wê de bim. Tişta herî girîng jî ev rastî di cih de, di wextê de, bi şêwazek bigihêje hedefa xwe û domdar be. Xisleta hostatî jî dixwest ev alî bû.

Di siyasetê de pîvan bidestxistin, sazûmaniya uslub û nêzîkbûnên wê, bidestxistina aliyên herî girîng bûn. Di zindanê de jî şoreşgerî wisa watedar bû. A-b-c'ya jiyîna bi onur, berxwedaniya bi onur û mirina bi onur bû. Ger ev nebûna, zehmet bû mirov di çarçoveya siyasetê de cih bigire.

Lêgerînên min ên hezkirinê jinbûna min û apo'geriya min

Ez hezkirinê, ji jiyanê û têkoşîna xwe cuda nanirxînim. Dema ez tiştên ku min jiyan jî kirine dinirxînim, ti taybetmendiyek cuda ya ji şoreşgeriyê cihê û weke jiyanek taybet nagirim dest. Jixwe ez di serî de li dijî me ku, nêzîkbûnek taybet jê re were kirin. Her tim li dijî derketime. Ji bona min ti wateya wê tine bû. Di nava şer de hezkirin çawa dibû! Weke şer hezkirin! Lê rastiyek hebû ev xwestek û rastiyên heyîn lihev nehatibûn. Ji aliyê min ve weke keçek ciwan û weke jinekê ez li zilamekê negeriyam ku bibe ayîdê min, min nedît. An jî min xeyalê wê jiyan nekir, di vê mijarê de pîvan ava nekir. Bi rastî jî min ti caran bi wê ramanê li jiyanê nenêrî. Malek biçûk û pergala malbatî ti caran bala min nekêşa

ye. Di têkîliyan de jî herî zêde bandorbûna yê li hember rol lîstiye. Ev jî aliyek rastiya kesayeta min bû. Cewher nehatibû avakirin û pîvan nehatibû bidestxistin. Rewşek lewaz, yek alî, bêhêz, bi deriyên ji her derî ve vekirî derket holê. Rewşek wisa jî her tim ji rastiya herî lewaz, bê tevdîr û windakirinê re vekirî bû. Ger aliyên erênî serde biçin, dê erênî pêş bikeve, lê ger neyênî ser de biçin, dê pir zû bibe hedefa neyêniyan.

Ger enerjiya mirov a jiyan û şer hostatî bi polîtîkayê ve neyê girêdan, li wê qadê ber bi hedefên rast ve neherike, dê bi hestên xwe ve biherike, enerdiya xwe jî ber bi wir ve biherikîne û di wê rewşê de li her tiştî binêre. Di vê rastiyê de jî agirê siyasetê mirov dişewitîne û diçe, roniya çavê kesî nanêre. Hêz û enerjiya mirov weke dîna jî biherike, ger di nava çarçoveya siyaset, rêxistinbûna wê û şerê wê de cihek saxlem nedîtibe, dê çep û rast berbelav bibe. Nikare xwe ji vê belavbûnê rizgar bike.

Nikarim bêjim, min weke jinekê pîvanên azadiyê û pîvanên şoreşgerî bi kesayeta xwe re dane avakirin. Belê, min bi giştî hinek xislet bidest xistibûn. Di astek mezin de jî bibûn beşek jiyana min. Lê belê, di mijarên bingehîn ên weke bîrdozî, polîtîka, rêxistinî avakirin û bikaranînê de, asta dihat xwestin nehatibû avakirin. Lewma pîvanên din jî hemû yekser bi van pîvanan ve girêdayî ne. Di vê manê de ne lîstokvanek baş a lîstokên hezkirin, an jî ne ya lîstokên siyasetê bûm. Min nekarî vê pêk bînim. Tevî hemû lêdan û êrîşên wan, li ser piyan mam. Lê ji ber min şer di hundir de jî bi heman hişyarî û tevdîrê neda meşandin, hesabê her tiştî nekir, bi encamên wisa re rû bi rû mam. Lewma ez di vî şerî de weke texteya lêdanan bûm hedefa lêdanên herî bi bela.

Yekem car bû min şerek wisa siyaset, hezkirin û hest di nav hev de, evqasî bi hevûdû ve girêdayî jiyan dikir. Redkirina zewacê û reva min a ji malê, beşek ji vê ya herî ji rêzê bû. Lê xisletek vê ya şer û siyasetek zêde ecemî, bêtevdîr û amator hebû. Lewma yekser pey wê re di zemînek bihevrebûnek ti bingeha wê tine bû hat ceribandin. Di wir de jî kesayetek siyasî ya pir bihêz tine bû. Lewma derket holê ti lîstokên hezkirinê yên wisa cihê xwe nagirin. Pişt re di zindanê de nizanim jê re bêjim pêkenoka siyasetê, an jî pêkenoka hezkirinê bû, pêkenoka her duyan jî bela xwe li min dan. Min jî ew bi rêbazê bibin belaya serê min girt dest! Min got bila hezkirin qurbana siyasetê be û min xwe jî kir di rewşek qurbanê de.

Belê, feda kirin! Têgehek zêde xeter e. Di siyaset û hezkirinê de têgehek weke fedakirin û fedabûnê tine ye û nabe jî. Ji ber mirov şerê tiştên hatine windakirin, hatine fedakirin û hatine desteserkirin dide. Jixwe êdî tiştek mirov feda bike namîne! Fedakirin, qetilkirine û kuştine. Hezkirin ber bi mirnê ve birin, hezkirin dana kuştine! Bi gotinek din weke fermana qetla wê dayîne. Tişta ku mirov hatiye girtin, tişta hatiye windakirin û qediyaye. Li gel vê tişta bi mirov re were avakirin jî, hezkirine. Ger hêza te ya avakirinê pêş ketibe, mirov hingê dikare behsa hezkirina rasteqînî bike. Ger wê mirov bikare tiştên hatine avakirin mezin bike, ev ji bona yeke din fedakirinê pêk nayê. Ev tê wateya ku mirov bêje; “ha, bila tiştên min ava kirine ji te re bin. Xirab bike û birûxîne.” Ger xisleta herî bingehîn a lîstoka siyasetê avakirine, hezkirin jî karê avakirinê ye. Di vê manê de hezkirin nade windakirin.

Li vir kevanekê vedikim:

Dema mirov dinivisîne, mirov lîstoka jiyana xwe ji nû ve dilîze. Belê, lîstok! Rastî jî lîstok lîstin çiye? Di wateya peyv de her tim mirov dûrî xwe dike. Yekser wateya hîlekarî, fêlbazî û xirabkirinê tîne bîra mirov. Dibe ku ji ber hîlekarî zêde ne, di jiyanê de ji bilî van rê ji tiştek din re nayê dayîn, bi rêbazek xirab di hişê mirov de dimîne.

Lê mixabin, lîstokên zarokan dervî van dimînin. Ji ber lîstokên wan xweşik in, bi safbûnê tên sazkirin û bê hîle ne. Her çendî gelekî mizmizê bikin û ecemî bin, zêde balkêş in. Mirov bê ku di ferqê de be, bi dehan lîstokan ve gav davêje nava rastiya jiyanê. Di wan temenan de xirabkirina lîstokan, bi safî dibin, hêcetên wê yên lewaz mirov qane dikin. Lê dîsa jî xirabûna wan lîstokan jî di hişê mirov de dimînin û ti caran nayên jibîrkirin. Şerê di navbera mirovên lîstok saz kirine û lîstok xirab kirine de, zêde dijwar pêş dikeve. Ji ber mirovê lîstokê xirab dike têk çûye, bi ruhek perçiqî hem bê bandor e, hem jî har dibe! Ango xirabkirina lîstokan bêhêziyê rave dike. Dema hêza kes têrê bike, dikare cardin şansê tevlî lîstokê bibe bidest bixe. Nexwe dê dervî lîstokê bimîne, dê bikeve rewşek kesek ku li lîstokê baş nanêre, xirab pênase dike û bihêrs e. Bi kesayetên wisa re xirabkirina lîstokan dibe ruhek hêsan. Her tim dixwaze lîstokan xirab bike û bê ar dibe.

Belê, dema lîstok tê gotin, bixwazî nexwazî lîstokên zarokan tê bîra mirov. Ev destpêk di lîstoka jiyanê de girîng in. Di heman demê de lîstokên neçar in. Jixwe her tişt hinekê jî di salên destpêkê de kamil dibe û koka xwe ava dike. Ger lîstokên tên sazkirin nêzî rastiyê bin, mirov bi destên xwe ew xirab

nekiribin, mirov bîranînên xwe yên girêdana bi wan ve jibîr nekiribin, tê wê wateyê lîstok berdewam dike. Damezirandin û rûxandina vê rastiyê jî herî baş di nava rastiya têkoşîna me de derdikeve holê. Di vê manê de divê rastiya mirovên di nava lîstoka xwe de mezin dibin û dibin qurbanên lîstoka xwe baş were nasîn.

Hejmarek zêde lîstokên cur be cur hene. Lîstoka jiyanê, lîstoka hezkirin û evînê, lîstoka şer, lîstoka tolhildanê, lîstoka şansê û hwd. Hemû jî di zemînên cuda de hewceyî hev dibin, ji hevûdû gelekî cuda û dûr nînin. Di nav hemûyan de jî girêdana diyalektîka avakirin, sazkirin, xirabkirin, rûxandin û tinekirinê heye. Di vê rewşê de sazkirin û xirabkirina lîstokan jî xeter e. Zehmet e. Hêz û qudretê dixwaze. Jêhatîbûn û hostatiyê dixwaze.

Bûyerên xwezayî zêde dewlemend in. Gelek tiştên ecêb di nav de hene. Hemû jî di heman demê de weke lîstokek xwezayê ne. Di nava alema lawiran de jî lîstok pir in. Lîstokên lawiran ên mirov derhêneriya wan dikin jî nekêm in. Hirçan didin lîstin, meymuna didin lîstin, maran didin lîstin, hêştiran didin lîstin, fîlan didin lîstin, ji wan re muzîkan lêdixin û lîstokên muzîkal û lîstokên tirsê pêş dixin. Gelek cambaziyên cur be cur ên van lîstokan hene.

Pelewaniya ga jî xwedî xisletek lîstokek balkêş e. Ew şerê erjeng ê di arênayê de, cudatire. Mirov û lawir li hember hev şer dikin. Dîmenek hovane dide diyarkirin. Gelek caran ev lîstok ji bo mirovan bê wate ye. Ji ber mirov azwerî û cewhera di vê lîstokê de zû ferq nake. Ji ber ne lîstokek ji rêzê ye! Taktîkên awarte yên balkêş di nav de hene. Ji bo wê jî divê hêz û hostatî hebe. Berdêlek matador ji bona serbixe û bibe xwedî

onur daye ber çavan heye. An dê mirov bi wan dengê mirovan ên weke lehiyê digot; “Bijî” bibe xwedî onur, an jî dê mirov ji ber wan qiloçên di bedenê re çûne têk biçe. Ji bilî vê ti çareya vê lîstokê tine ye. Ji ber êdî mirov daketiye arenayê û di nav lîstokê de ye.

Nexwe lîstokên civakê çawa nin? Mînakên wan ên di dîrokê de zêde balkêş in. Di serdema navîn de lîstoka gladyatoran bi zewqek mezin temaşe dikin, lîstoka şûr e! Dîmenên wan mirovên tên qetilkirin zêde kirêt in! Mirovên bêhêz û kole li hember hev hêza xwe diceribînin. Ango dibe lîstoka kesên hatine lîstokê! Dîsa lîstokên qesra, lîstokên pereyan, lîstokên bazirganiyê, lîstokên komujî yên jenosîd, hemû jî li ser mirovahiyê hatine ceribandin. Hemû lîstokên wan bi berdêlên wan ên giranbiha gelan daye.

Di serdema navîn de lîstokên ecêb ên xweda bi hev re lîstine hebûn. Xwedayên ku ji asîmanan hatibûn daxistin ne kêm bûn. Ezaba lîstokên xwedayan, ma ne evdên xwe pir xirab şewitandibû? Ma dîrok jî ne kombûna van lîstokan bû? Di gelek lîstokan de lîstokvan û kesên xwediyê rolan zêde ji hev nedihatin cudakirin û nasîn. Dikên lîstokan ji destpêkê ve dihatin amadekirin. Trajediya kesên dihatin lîstokan, kesên di lîstokan de xwe dikuştin û kesên dev ji lîstokê berdidan xilas nedibûn. Pergala sazûmaniya lîstokan bi şêwazek newaze hatibûn sazkirin. Xwedî xisletek her carê dubare dide lîstine.

Ez naxwazim hemû lîstokan di vir de lêkolîn bikim. Ne zanebûna min a dîrokî têra vê dike, ne jî hêza min heye ku hemûyan çareser bikim. Armanca min ne ev e. Lîstokên dikevin nava çanda me, hem di wateya xwe ya giştî de, hem jî li gorî xweseriyên xwe, kêm zêde tên zanîn û tên fêmkirin. Lê,

hinek lîstok hene, divê mirov xisletên wan bi hemû ziraviyan ve fêm bike û mirov lîstokvanên wan jî mîsoger baş nas bike.

Qada lîstokê ya bandorkirinê, bi hêza lîstokavanên damezrîner û xisletkar ve rasterast girêdayî ye. Girêdanên lîstokê bi hev re çêkirin, taxmîn avakirin, lîstokvanên navîn, hemû jî di nava mercên xwe de bi demê re xwe rave dikin. Xisleta hey yek ji wan, hêza wan a bandorkirinê û encamên ku ava bikin cuda cuda ne. Dîsa di ti lîstokê de xwestek, xislet û amûr ji yek alî ve nayên destgirtin. Ji ber wê demê xisleta lîstokê dernakeve holê. Di heman demê de her tişt ji bextê kesê senaryo amade kiriye re namîne û di bextê wî de pêş nakeve. Ger wisa bûya, pêdivî bi dika lîstokê, lîstokvan û amûrên din nedima. Dê her tişt senarîst bi xwe bikiriya. Hemû lîstok bi dijberê xwe re yekbûnê neçar rave dikin.

Di lîstokên senaryoyên wan cuda, zemînê wan cuda de, lîstokên tolhildanên mezin ên tên avakirin kesayet pir diyarker derdikevin holê. Ne zehmet e ku mirov kesên lîstokên xirab dike û ava dike ji hev cuda bike. Têkilhev nabin. Bi canbaziya ser ben ve, jêhatiya lîstokvantiya mezin, di van lîstokan de hêza xwe derxistiye holê. Êdî lîstokê, hêza xwe temamkirinê raber kiriye.

Ez li vir hêza lîstokvantiyek nû dernaxim holê. Na! Ez tenê hewl didim, lîstokek nav lê nehatiye kirin de, ziraviyên di pişt perdeyê de, an jî ji eniyek wê ya din ve aliyên ku nehatine dîtin, bi hêza xwe ya lîstokvantiyê û bi xisleta xwe ve derbixim holê. Ez lîstoka tiştên ku min jiyan kirine dilîzim. Kesayet divê cihê xwe yê li qada lîstokê û cewhera wê baş bixislet bike û dane holê. Kesên rola xwe rast nelîzin, nikarin xwe li hember dijwariya quralên lîstokê ji têkçûnê rizgar bikin. Ji ber li ser

perdeyê bi tîpên mezin, “lîstokek tolhildanê ya berovajî hatiye zivirandin” nivîsandiye. Ez her carê heman bandorê dijîm. Dihejim. Her tim bi şansê bawer dikim. Lê ti caran bi qasî vê carê li ber bêşansiya xwe ya di vê lîstokê de neketibûm. Ev qasî dilê min neşewitîbû!

Kevanekê li vir digirim

Ji ber têkîliyên bi Hamilî re ditirsiyam. Tirs û gumanên min têkilhev bibûn. Ji ber di wê têkîliyê de pîvanên ‘hezkirin û evînê’ yên kevneşopiyek muhafazakar hebûn. Di nava baldariya Hamilî nizanim a çend salan de hinek aliyên giyanwerî yên şoreşgerî hebin jî, di asta feraseta namûsa feodal de ketibû rojevê. Rewşên wisa di civakê de zêde hatine jiyîn. Zilamek li hember kîjan jinê baldariyek jiyan kiribe, bandorên wê yên hundirîn salên dirêj didome. Yê beramber pişt re zewicî be û zarokên wî jî çêbin, dev ji wê baldariyê bernade, heta hinek ji wan teqez ji bona xwe bigihînin wê xwînê jî dirijînin. Rastiya di vir de derdikeve holê, şahnaziya zilamê feodal ê çors e. Înada wî û evîndariyek çavsorî ye. Mirov dikare gelek navên din lê bike. Hinek aliyên wê yên din jî hene. Lê belê, Hamilî di heman demê de şoreşger bû. Neçar bû nirx û pîvanên nû esas bigire.

Ji ber di serî de tevî demek dirêj baldariya wî hebû, ev di nav rêhevaltiya me de neda der, min nêzîkbûnek îradî ya mezin, cewhera demokratîk a şoreşgerî fêm kir û bi rastî jî bandor bûm. Hinek baldarî xwezayî ne. Heta xweşik û watedar in. Nabe ku her baldarî bersiva xwe bixwaze, an jî yê beramber xwe neçarî vê bike. Nêzîkbûnek wisa helwestên paşverû û dij demokratîk in. Ti eleqeya vê jî bi şoreşgeriyê re nedibû. Dema

mirov heta vir dinirxîne, li gorî min Hamilî li hember îradeya kesê miqabilî xwe rêzdar bû. Lê pişt re, dema min bêpîvaniya bi kesayeta wî re ferq kir, pîvanên wî yên rastî derketin holê, tirs û gumanên min zêde pêş ketin. Bi rastî jî nêzîkbûnek mulkiyetperest serdest bû. Ev jî helwestek li dijî xwezaya min bû. Ji ber ez ji ferzkirin û daxwazên kesan ên hewl didan ez bibim ayîdê hinek kesên din revîm. Qutbûna min a ji malbatê ne macera bû. Di wir de min xwest xwe ji girêdanên mulkiyetperest rizgar bikim. Di cewhera qutbûnên din de jî ev rastî hebû. Qutbûna min çalakiya lêgerîna şoreşgerî bû. Lê min ev rastî bingehên rêxistinkirî, biplan û bihêz ve girê nedan û ava nekir. Ev rastiyek vekirî bû. Lê çalakiyên qutbûnê bûn.

Berxwedêriya Hamilî, xisletên wî yên şoreşger û biryardariya wî beşek ji kesayeta wî bû, ne hemû bû. Beşa kesayeta wî ya din jî bi ferasetên kevneşop ve xemilandibû. Zilamek kurd ê dihat nasîn bû. Aliyê wî yê din jî di nav pîvanên Elewiyên Dêrsimê de, zilamtiya li hember jinê bi azwerî bû. Lê di heman demê de ji destpêkê ve di şoreşê de bi jinê re dimeşiya. Di vê manê de hinek bertekên erênî yên li hember jinê bidest xistin jî hebûn. Hinek fêrbûnên wî yên jiyanî ava bibûn. Di vê manê de şansê wî hebû. Hevaltiya wî ya şer a bi jinê re xweş bû. Zilam mîsoger ji vê rastiyê bandor dibe, neçarî vê dimîne. Neçar dimîne pîvanên xwe yên çors û fêrbûnên xwe sererast bike.

Hamilî bi jinan re dest bi şoreşgeriyê kir. Çalakiya hevbeş a destpêkê lidar xistî jî, perwerdeya bi jinan re bû. Ev bû sedem ku di qadên jiyanê yên din de jî bi jinan re hêsan tevbigere. Pîvan dida qezenckirin. Weke din jî Hamilî tenê bi jinekê re jiyan kir. Pişt re çi dibe bila be, Ayten di nava vê tevgerê de bû

û endama şoreşgeriyê bû. Dîsa Hamilî pêvajoya xwe ya zindanê bi jinan re derbas kir, bi wan re liber xwe da. Lê mixabin jinek nas nekiribû. Di nava pîvanên xwe de, di çarçoveya mantiqê xwe de, ew jin nas kiribû. Dibe ku ji şoreşgeriya wê bandor bibû, heyrana wê bû, lê di wateya rasteqînî de ti caran nekarî portreya jinê ava bike.

Pîvanên jinê yên bi wî re tevlîhev, sivik û xapînok bûn. Her çendî di asta gotin û nêzîkbûnên wî de wekhevî û azadîxwaz xwe dabe diyarkirin jî, ev rastî di jiyana pratîkî de, nêzîkbûnên jinê bilind dike, jinê azad dike, wê bi civakî dike re, veguherîne girêdanek şoreşgerî nîtelîkê de pêş nediket. Di vê mijarê de nebesiyên cidî jiyan dikir. Baldarî û hewldana wî ya di vê mijarê de ferdî bû. Nêrînek wî ya veguherîne rêxistinbûnê nebû. Mantiqê wî yê; "ez ji bedewê re nabejim tu bedew î, ger ew bedew ne ya min be…", an jî "ya bedew a min e. Ya ayîdê min e" hebû. Baldarî û azweriya Hamilî ya li hember jinê, di encamê de teng û ferdperest bû.

Dema wisa dibû, şerê bi Hamilî re jî, dem dirêj dibû. Bertekên bi wî re dem kin û bi kêliyan pêş diket. Hezkirin û hêrsên wî jî weke mayînên dîn û har bûn. Nediyar bû wê kengê û li kuderê biteqe. Xisletên min jî ne di wê astê bûn ku wan mayînan paqij bikim, bi baldarî bê ku biteqin bêbandor bikim. Min jî pêl wan mayîna dikir û bi xwe de diteqand. Her yek jê parçeyek min bêbandor dikir û ji min qut dikir. Bi vî rêbazî ez jî lewaz dixistim. Ne têkoşînek ku bikare bi lewazî û şaşiyan ve xwe hêzdar bike û bibe encamek dijwar bû. Min xwe bi çavkorî dikir gavek wê lewaziyê, piştî ku zerar jî didît hewl dida sererast bikim. Vê carê jî encama derdiket holê, ruhek xwe her tim bi encaman ve dixetimîne ve min şer dimeşand.

Lê di têkîliya bi Şener re pêş ketî de ji destpêkê ve gumanên min hebûn. Ev jî hîs û gumanên min hundirîn ên derbarê wî de pêş diketin bû. Ez nerehet bûm. Lê ev jî dihişt ku ez bibandor kar bikim, di her mijarê de kar bikim û xebatê bimeşînim. Weke pêşbaziyê bû. Min digot bila ew jî kar bike, ezê jî kar bikim. Min her tişt ji wî re nedihişt. Carê wisa dibû, dema kar nedikir, ditirsiya û xwe dûr dixist, ez aciz dibûm. Di pêvajoya destpêkê de got; "ez nebim sekreter baş e. Ez dikarim derve de alîkariyê bikim." Dema wisa got, herî zêde ez li dijî derketim. Min got; "na, wê tu kar bikî, divê tu ji erk ne revî." Lê îdîayên gelekî cidî hebûn. Rêxistinê ew ceza kiribû. Lê tevî vê bibandor û jêhatî bû. Lewma berpirsyariya di asta yekemîn de nehêsan bû. Ew xebat ji bona kesayetan ezmûna herî baş bû. Di heman demê de ger tiştek hebe, di wan deman de zû derdikeve holê, ger nebe jî ew jêhatî dibe hêz û divê bibe malê rêxistinê. Ango gumanên min ên derbarê wî de, dibû sedem ku zêdetir xwedî li rêxistinê derkevim. Di vê mijarê de hiyşyar tevbigerim. Şener vala nedigot; "tu weke ziyaretê yî. Mirov nikare li hember te gunehekê bike. Mirov nikare bike." Ecêb bû, ev ne tenê pesindan bû, pir vekirî bû, Şener ji min ditirsiya û şerim dikir. Di vê mijarê de ew li xwe mukir hatibû.

Ango min, di têkîliyên xwe yên giştî de meydan ji wî re nehiştibû. Lê wî ji min re got; "tu hêza manewî yî. Ziyaretî û pîrozî." Çalakgeriya min a di rêveberiyê de li ser têgehan pênase dikir. Xwe li gorî min amade dikir. Min jî ev tenê weke nêzîkbûnek hestiyar ji bona min bandor bike nedinirxand. Ger wisa bûya, an jî min wisa hîs bikiriya, dê min pê re şer bikira û pirsgirêk derbixista. Tevî ku destpêkê ji van nêzîkbûnan aciz bûm, min pişt re ev nêzîkbûnên wî yên baldar nedan pêş. Heta

min mijarên derbarê têkîliya xwe û Elîf de digot jî, rasteqînî dinirxand. Dîsa diyar dikir ku, hemû pratîkên zewacê yên di nava me de xirab bi encam bûne. Min jî ev nirxandinek zanistî didît. Digot; "bi hemûyan re pîvanê kevneşop hebû."

Digot, Fatmayê ji destpêkê ve ji Rêbertiyê hez nedikir. Behsa xisletên wê yên çînî û kesayeta wê ya sar dikir. Ji bona têkîliya xwe û Elîf jî digot; "bê ku em zêde bi hev re kar bikin, bi hev re nîqaş bikin û bi hev re şer bikin, me nîşana xwe pêk anî. Pevçûnên me pişt re destpê kirin. Hevalan jî ev têkîlî kirin pirsgirêk. Min jî zêde ferz kir. Herî dawî bû pirsgirêkek înadê." Weke din jî gelek nirxandinên din dikir. Me li ser têkîliyên wî yên berê de jî nîqaş kir. Digot; "neçar bû, ew têkîlî xirab bibin."

Van nêrînan tev ez jî qane dikirim û tevlî nêrînên wî dibûm. Digot; "ger bi jinekê re Apo'gerî hebe, hezkirina wê jî pîroz e." Her tim ji min re digot; "ezê xwe hêjayî te bikim. Ev ji bona min erk e. Mafê te nîne tu xwe têkil vê bikî û li dijî derkevî." Mijarên destnîşan dikir ne tenê pesindan, an jî ji bona ji aliyê hestiyarî ve min bandor bike digot. Min jî wisa nedinirxand. Hinekê jî rastiya min rave dikir. Lewma jê aciz nedibûm. Ji bona min jî hezkirina kesekî, weke hezkirina dozê bû. Çawa qinyata min bi doza min hebû û pê bawer bûm û di vê mijarê de bi her tiştê xwe ve girêdayî bûm, ji kesekê jî wisa yeqîn kirin, bawerkirin û paqij hezkirin jî mijarek girîng bû. Min got; "divê hezkirinek qet gumanê wê tine ye, evînek tirs û xofên wê tine ye pêş bikeve." Her wiha ger wê têkîliyek hezkirinê pêş bikeve, divê têkîliyek wisa mînak be. Nexwe ez ji vê re tine me. Şaşiyek herî biçûk, bêbawerî û gumanan naxwazim. Ji aliyê me her duyan ve jî her tişt wisa dihat îdealîzekirin. Ev aliyên em digihandin hevûdu bûn.

Me piranî ji bona hemû girtîgehan nivîsên di nîtelîkek giştîname û perspektîfan de amade dikir. Tevî ku navend hevalê Karasu ew bûn, karê nivîsên bi derve re û peywendiyên bi girtîgehên din re ji me re hiştibûn. Digot; "hem ji bona rewşa wir û hem ji aliyê nîtelîka wir ve (behsa Amedê dikir) ewder guncavtire." Diviya derbarê polîtîkayên dijmin ên girtîgehan û em dikarin li dijî wan çi bikin de, nivîs bihatan amadekirin. Min û Şener bi hev re amade dikir. Me di civînê de çarçoveya giştî destnîşan dikir, piştre Şener dinivîsand. Me nivîs dişandin ji Karasu re. Me dizaniya ku heta ew erê nekin, nerast bû me bişandan cihên din. Ji ber Karasu zêde dilnizim nêz dibû. Lê heta dawî derfet hebûn, lewma biryara dawî û şêweya nivîsê ya dawî ji wir derxistin nêzîkbûna herî guncav bû. Me jî di vê mijarê de nêrîna xwe jê re dişand û helwesta wî rexne dikir.

Her çendî wateyek giyanwerî ya girtîgeha Amedê hebû, diviya ji hêla rêxistinî ve rola navendî Karasu bilîsta. Ew nêzîkbûna hevalê Karasu nerast bû. Me jî rexneyên xwe yên di vê mijarê de jê re gotibûn. Aciziya me, ne ji bona çima berpirsyarî ranedikir bû. Karasu, ji bona ewlehiya rêxistinî bû. Nûnertiya berxwedaniya zindanê girîng bû. Her çendî li gorî xweseriya Amedê Şener di asta yekê de berpirsyar bû, me ti caran qebûl nekir ku, rolê hevalê Karasu jî bigire ser xwe. Me ti caran rast nedît.

Me gumanên xwe yên di vê mijarê de bi hinek hevalan re nîqaş dikir. Fuat Kav digot; "Karasu ji berê ve wisa ye. Lê me fêm nekir gelo ji ber dilnizme, an jî ji saftiya wî ye. Di mijarên herî girîng de jî, dibeje 'heval dizanin.' Bertekê hinek hevalan jî ji ber van nêzîkbûnên wî bûn. Lê ne di ferqê de bû." Min jî ji Fuat Kav re got; "dilnizmiya çi! Dilnizmiya wisa nabe. Ev kar

rêveberiya rêxistinî û partîbûna xwezayî ve nabin. Ger beriya niha ev karê rêveberiyê hişk di dest de bihata girtin, pirsgirêka hinek hevalan jî kûr nedibû. Hamilî jî 'rêvebirek xwezayî bû.' li mîsyonek jorî rêxistinê dabû xwe. Lewma ne rêxistin cidî girt, ne jî wî karî rêveberiyê bike. Jixwe min jî fêm nedikir. Kî rêveberiya jor bû, kî nebû, ne diyar bû. Min demek dirêj jî hûn hemû weke rêveberî dizaniyan." Me hinek tişt nirxandin. Lê me nekarî em hinek mijaran çareser bikin.

Şener baş dizaniya ku wateya rexneyên me çine. Fêm dikir. Wî jî digot ew jî nerehet e, xwe kiriye bin berpirsyariyek giran de, lewma ev jî ji aliyê pîvanên rêxistinî ve nerast e. Ev nêzîkbûna me dibû sedem hem Karasu baş kar bike û li her derî serwer be, hem Şener hinek din bi tevdîr tevbigere.

Em çiqas rast bûn, an jî şaş bûn nediyar bû. Em ne di wê ferqê de bûn. Em piranî ji bona parastina rêzdariya partiyê tevdigerin. Mantikê me ev e. Ger em gumanên xwe yên derbarê Şener de zelal nekin û li ser hinek bingehên rast nedin diyarkirin jî, hesasiyeta me ya di vê mijarê de ba bû, gumana rêxistinî ruhek aramî dida me.

Karê tûnelê em hemû xistine nav bendawariyek girîng. Hevalê Hesen Atmaca ji derve de agahî ji me re şand; "ez nikarim gava xwe bavêjim. Neçarim her roj biçim qereqolê îmze bidim." Kesê ku me yeqîn dikir her karî herî baş ew bike, ev agahî ji me re şandibû.

Li navenda bajêr gelek kes hatin girtin. Sîmon ew hatibûn girtin. Mala ku lê diman nesaxlem bû. Demek dirêj li wê malê mabûn. Weke din jî dihat gotin ku Salîha diçe û tê. Dîsa şik hemû li ser Salîhayê bûn! Agahiya hatî em hemû hêrs kirin. Ev

jin li ti cihî nedisekinî. Em demekê hizirîn; “gelo em nikarin vê derbêxin dervî welat.” Ji ber tam belaya serî bû. Bêhna me jî teng dikir.

Di wan rojan de serdana vekirî hebû. Serdana cejnê bû. Dê bi riya Elî Kiliç not were. Lê ji notê re gotine, “Pusula ye.” Vê şaşiyê her tişt tevlîhev kir, her kesî fêm kir ku pusula ye. Derdora malbata wa jî tevlîheve. Li hember birayek wan guman hebûn. Zavayek Cahîdê pasavan bû. Wî behsa hinek tiştan dikir. Li gorî wî digot ew û kesek din bi polîsan re hevkariyê dikin. Me beriya niha jî ev bihîstibûn. Heta me agahî dabû hevalan jî. Tevî wê hişyar tevnegeriyabûn. Dijmin pir baş dest avêtibû derdora malbatê. Gelek ji wan kiribûn sîxûr. Diviya ew bihatan zelalkirin, lê tişta herî zehmet jî ji hundir ve xwe gihandina derve bû. Kesên dihatin serdana me û karê me yên herî girîng ve mijûl dibûn ew bûn. Lê gelo girêdana wan a malbatî hebû, an jî girêdana wan bi dijmin re hebû, ew jî nediyar bû.

Di roja serdana vekirî de zilamek xwe birayê Kiliç wan dayî nasîn pusulaya bi xwe re da girtin. Tişta tê zanîn pusula wisa vekirî nayên şandin. Yekser serdan hatin rawestandin. Koma yekê derbasî hundir bû û ew kes jî di nava wê komê de hebû. Yekser hat qoxuşa me. Di nava şokê de digot; “em yekser duruşmeyan biqîrin. Malbatan bernadin. Derve leşker zêde ne. Hevalên derve em şandin. Hesen Gullu jî hatibû. Dema tevlîhevî derket ew çû.”

Me duruşme neqêrîn. Me yekser fêm kir ku, provakasyonek heye. Min ew girt yekser bir qoxuşa 35’ê. Kesên ku çûne wir jî heman tişt gotine; “de zû bikin em duruşmeyan biqîrin.” Gumanên min zêde dibûn. Belê, li

naverastê provakasyonek hebû. Min ji hevalan re got; “divê em baldar bin.” Di heman demê de min diyar kir ku, teqez kes duruşmeyan naqîre. Me giştî heval hişyar kirin; “bila duruşme neyên qêrîn.” Agahî ji her kesî re hat dayîn. Min pirsî; “kê pusula xwestiye?” Hinekan got; “tiştek wisa tine ye. Hêj dema Karasu ew li vir bûn, not hatibû xwestin. Dibe ku ji bona notê gotibin pusula. Me gotibû, ‘ger not dan te, ji me re bîne.’” Di vir de pirsgirêka ‘pusula’ û ‘notê’ hat fêmkirin. Bes ev zilam kî bû. Divê ew were fêmkirin. Dijmin cardin hewl dida tehrîk bike. Leşker derketibûn ser ban. Ji nişka ve dengê çekan bilind bû. Qîrê malbatan dihatin. Hevalên li qata jor bûn dişopandin. Me jî hewl dida bi sebir pirsgirêka heyî fêm bikin. Dema ji aliyê hundir tiştekê rû neda, rewşa derve jî asayî bû. Kesên hatibûn serdanê her çendî taloqkirin, cardin derbasî hundir kirin.

Me nîqaş dikir armanc çibû. Tiştek zelal di dest me de tine bû. Tenê texmîn hebûn. Me got; “îhtîmalek mezin karê tûnelê hatiye fêmkirin.” Ji ber tişta destpêkê dihat bîra me ew bû. Ji ber mirov dikare weke din çi bi pusulayê bike? Em ne di deryayê de bûn. Ma di tûnelê de pusula çiqas hewce dikir. Me ew jî tam fêm nedikir. Bes di kolana tûnelê de dibe ku ji bona rêya xwe bibîne kêrî were. Ma tenê ew bû? An jî hinek tiştên din ên nedihat zanîn hebûn. Ez pir cidî dihizirîm.

Di rojên pey re me bersivên pirsên xwe hemûyan girt. Sîmon ew hatibûn girtin. Salîha hatibû girtin. Hesen Gullu û Sînan jî hatibûn girtin. Vê agahiyê em xistin nav gumanan. Xebatê tûnelê jî ber bi xilasbûnê ve diçûn. Dihat gotin karê rojek, du rojan maye.

Gumanên min zêde dibûn. Ew girtin ne rewşek asayî bûn. Divê tiştek bi tûnelê neyê. Me ewqas ked da. Ewqas hêvî hebûn. Piştî demek dirêj yekem car bû nexweş ketim. Serûm girêdan. Pêşketinên xirab ên rû didan êş dixist mîdeya min. Pirsgirêk zêde bûn, lê yek ji wan jî bi qasî valaderketina tûnelê bandor li min nedikir. Hêj tiştek li holê tine bû. Lê baweriyek bi min re hebû, min tenê ew hîs dikir.

Gezgor weke dîna, ji hêrsa dijûn dikir. Got; "kêrî karekê nayên, çûn ketin destên dijmin. Baweriya me bi van zilaman nedihat. Ma me çima hêviya xwe bi wan ve girê da." Ji bo Hesen Atmaca agir ji devê wî derdiket; "ew jî çû li malê rûnişt. Nizanim dilxwede nikare ji gund derkeve!" Çi tê ber devê wî dibêje. Ji ber hêrsa wî kes nikare pê re bi-axive. Bi hêrsek mezin tê û diçe. Cixarê û bi cixarê ve dikir û dikêşa.

Birayê Şener Îhsan, xwîşka wî Fatma û xwîşka Cahîdê Nevîn ji qadê hatin dûrxistin. Bi vî rengî xebatên tevgera malbatê hatin rawestandin. Weke din jî dihat gotin ku, haya Îhsan ji tûnelê hebûye. Piştî demek kin Îhsan derbasî Yunanîstanê bû. Nevîn demekê li metrepolan dimîne. Ji wan re tê gotin ku, heta her der bêdeng dibe, divê qet li naverastan negirin. Ji bona Sîmon wan dibêjin; "ew ji koma ku derbasî bakur bibin qut bûne, ti eleqeya wan bi tûnelê re tine ye." Me jî şîrove kir; "ger ti eleqeya wan yekser bi tûnelê re nebûya, qet dernediket holê."

“Sûrgûna ber bi yassiada ve!”

Dawiya Cotmehê bû. Bendewariyek nediyar hebû. Me tenê dikariya bêjin; “ger em vê jî derbas bikin temam e.”

Em li cihê hewagirtina qoxuşa 35’a nin. Hêj demjimêrên sibehê yên destpêkê ne. Ji nişka ve hemû derî li ser me hatin girtin. Me nedikariya biçin ti cihî. Yekîneyên taybet bi lez û bez derbasî qoxuşa 35’ê bûn. Dengê duruşmeyan dihat. Piştre me jî duruşme qêriyan. Me duruşmeya, “êdî bese êrîş!” Diqêriya. Ji hemû gertîgehê dengê duruşmeyan hat. Saît di hundir de bû û ew jî nûner bû. Lê zilaman lêgerîna asayî nedikirin. Êrîşek dijwar dikirin û biplan bû. Me demekê di navbera xwe de nîqaş kir.

Yekîneyên taybet û polîsên hatibûn rola îdareyê jê girtibûn. Ev jî dihat wê wateyê ku, operasyon cidî bû. Li qoxuşên din jixweber geriyabûn. Êrîşa esasî li dijî qoxuşa 35’ê bû. Jixwe çawa ketin hundir dengê taqozan hat. Dîwar dihilweşandin. Zemînê tuwaletan dişkandin. Diyar bû li tiştekê digeriyan. Me hewl dida em di şibakê de bi hevalan re bi-axivin. Texmînên me rast derketin. Hevalan digot; “tuwaletên jêrê dişkînin. Dîwaran dihilweşînin.” Êdî pir vekirî bû ji bona tûnelê hatibûn. Me jî got; “em duruşmeyan nedin rawestînin, bila bal nakişîne. Lê divê em li hember nêzîkbûnên provakasyonan jî hişyar bin. Nêzîkbûnên zêdegavî û tehrîk dike hewce nakin.” Ji ber hevalên di qoxuşên din de bi şîfre digotin; “ma em hinek tiştan bikin, da ku bala wan were ser me?” Me jî got; “na.”

Operasyona destpêkê heta nîvro domand. Tiştek derneket. Jixwe di wan deman de hêrs û ruhê me hemûyan jiyan dikir besî me bû. Me xwe bêhal xistibû. Gezgor cixare bi cixarê ve

dikêşa. Haya her kesî ji tûnelê tine ye. Lewma divê em bal nekişînin. Em hewl didin bertekên xwe nedin der. Bes me nedizaniya ku ji mêjve ji dijmin re hatiye gotin. Fuat got; "Sînan û Hesen dizaniyan ku di qoxuşa 35'ê de tûnel heye. Lê cihê wê mîsoger nizanin." Vê jî hinekê hêvî da me.

Di vê navberê de çi tiştek nivîskî heyî destser kirin, her tişt desteser kirin. Pirtûkên me hatin girtin. Jixwe zêde negirîng bûn. Bila tûnel eşkere nebe bes e. Gezgor digot; "ger vê carê jî dernekeve temam e. Êdî çi dibe bila be, emê derkevin. Dixwazin bila kes ji derve de neyê pêşiya me, ezê dîsa bi serê xwe derkevim û biçim." Pir bihêrs digot. Dema cixare dikêşa tiliyên wî direcifîn. Dema min lê dinêriya jê ditirsiyam. Kêliyek wisa bû, mirov dikariya dîn bibe.

Demekê navber dan lêgerînê. Em kêfxweş bûn, me got; "nexwe nedîtin." Lê leşker hêj li girtîgehê bûn. Tenê lêgerîn dabûn rawestîn. Rayedarê operasyon birêve dibir, bi şêwazek hêrs, dijûn ji leşkeran re dikir û wisa ji qoxuşa 35'ê derket. Gelek dijûn kirin û got; "derbasî vir bibin! Wê dane wir! Tu çima wisa weke ehmeqan sekiniyî?" Ji her kesî re dijûn dikir. Dema har dibûn kêfa me dihat. Me got; "ketiyo tiştek nedît. Ji ber wê jî har bûye."

Çûn îdareyê. Hevalên nûner jî çûn. Saît got; "tiştên ku hatine girtin binivisînin. Hinek nivîs û pirtûkên me hebûn. Bila tiştek ji wan neyê. Em berpirsyariya wan ranakin." Di hundir de hevdîtinek telefonê hat kirin. Deng dihat hevalan. Yê vî alî digot; "me nedît… Divê hûn mîsoger hîn bibin. Teqez cihê wê dizane. Bila terîf bike. Wî bidin axaftin. Heta ku ez nebînim, ez ji vir dernakevim." Dengê wî di odeyê de vedida. Belê, zilam bi israr bû bibîne.

Piştî demekê cardin hatin lêgerîn berdewam kirin. Bi balyozan li dîwaran dixistin. Ji cihekê ax hilweşiya. Axa ku ji qelîştekan dihilweşe, axa ku ji tûnelê hatibû derxistin bû. Ango tûnel dîtibûn. Dema me ferq kir, her kesî duruşme qêriyan. Ev deng giştî belav bû. Bes êdî çi feyda xwe hebû? Me got; "ji bona em pêşiya êrîşên dijmin bigirin, duruşme baş in." Xema min ne axaftin û ne jî duruşme bûn. Dengê yek ji wan jî nedihat guhên min. Weke ku qerisîme, li kêlekê disekinîm. Min cixare ji hevalan xwest. Fuat got; "tu nekêşîne." Min li Gezgor dinêriya, gumanên min çêdibûn. Di cihê xwe de nedisekinî. Dîwar dida ber kulman. Pehîn li dîwar dida.

Ma ewqas ked kêm bû? Di nava wê avê de çi jiyan kiribûn? Hesen Atmaca beriya bê berdan rojnivîsa derbarê tûnelê de nivîsandî, ji me re şandibû. Em hêj wê demê nehatibûn cem hev. Her roja kar nivîsandibû. Pir xweş bû. Her tişt di nav de hebû. Zêde xwezayî û balkêş nivîsandibû. Dema min dixwend weke filmekê temaşe bikim, kelecanê ez digirtim. Wan rojan di televîzyonê de jî filma Firara Mezin derketibû. Kelecanek ji wê filmê pir cudatir bi min re ava dikir. Ji ber kedek mezin, veşartinek mezin û sebrek mezin dixwest. Tûnela ti cihê cîhanê, ne weke tûnela Amedê bû. Dijmin jî mat mabû. Tûnelek ji qeta çaremîn ber bi jêr ve hatibû çêkirin. Belê, tûnelek wisa çawa tê çêkirin? Ew dîwar û ew beton çawa hatibûn şikandin? Belê, ji bona vê jî lîstokek aqil hewce dikir.

Hucre çar qet bûn. Aliyê pêş derabeyên hesin ên bi camekan bûn. Hemû hucreyan li valahiyek mezin dinêriyan. Hucreyên hundir ên bi dîwar û hesinan hatibûn dorpêçkirin. Di navbera her hucreyê de, valahiyek bilind hebû. Hêj avahî nû dihat çêkirin. Ji bona hewa bigirin hewce dikir şibakeyên biçûk

jî werin çêkirin. Lê dijmin bi gumana dibe ku xeter bin, ew şibake dabûn girtin. Lewma xwezayî avahîsaziya wê jî hatibû guhertin. Belê, hevalan jî di wê valahiya bilind de tûnel vekiribûn. Ji wir jî daketibûn jêr. Di bin re pênc-şeş metreyan kûr kiribûn. Piştre jî tûnel ber bi kolana Baxlarê ve, bi qasî derbasî nav malekê bibe, kola bûn. Axa wê jî li valahiyên hewayê yên di navbera hucreyan û ser ban de vala kiribûn. Ya rastî planek hişê mirovan nagire, lê pir xweş bû. Lê mixabin lenet be!

Em wê şevê heta êvarî li cihê hewagirtinê bûn. Pêdiviya yek ji me nehat pêkanîn. Hewa sar e, her kes bê navber diçe û tê. Dê çi bibe û çi bihata kirin? Diviya em di vê mijarê de amadebûna. Ji ber êdî xirabûna moral, xemgînî û jan kêrî tiştekê nedihat. Gelo dê qoxuşa 35'an vala bikiran, an jî hemû girtîgeh? Ne zehmet bû em di vê mijarê de şîroveyan bikin. Dê mîsoger me sûrgûn bikin. Piranî her kesî digot; "dê vir bi temamî vala bikin."

Gezgor hinde bi hêrs bûye, şûr lê bikeve xwîn jê nayê. Kî ev îxanet kiriye? Kîjan ketî bû, kîjan bê wijdan bû, kîjan minafikê ketiyê ketiyan bû? Ne sir bû, hinek kes hatibûn girtin û axivîbûn. Dibe ku îxanetek veşartî be. Lê ev rewş bi geloya fêm nedibû. Divê mîsoger em hîn bibin. Tola tûnelê jî bigirin. Ew encama kedê, keda gelekan, hêviyan, di nava wê avê de, kêliyên ji bê hewayî xeteriya mirinê jiyîn, romatîzmayên li dilê Gezgor didan, ew şevên bê xew, serdegirtinên nîvê şevê, hemû her yekê birînek bû. Divê tola hemûyan were girtin…

Mixabin, me çiqas xeyalê firarê xweş dikir. Dema wextê hejmarê de hevalên ku şûna min xwe li nav cihê min dirêj dikirin ji bona nekenin çawa lêvên xwe gez dikirin, çawa min

xwe di qoxuşa 35'an de vedişart, xeyalê derketina çiyan û bêrîkirina Rêbertiyê û xwe gihandina wan… Hemû vala derketibûn. Min çend caran ev di xeyalên xwe de jiyan kirin. Min çend caran di xewnên xwe de dîtin. Çiqas xweş bû, mirov piştî salan xwe bigihîne partî û Rêbertiyê! Her tişt weke rêwîtiya xeyalan ma. Lê rastiya heyî jî ber bi îxanetê ve çûbû.

Meşên me bêdeng in. Keserên me kûr in. Dijûn û pirsên me zêde ne. Her kes di-axive. Şev û roj bûne yek. Ger mirov baş û baldar li asîmana binêre, dê mirov stêrkan bibîne. Wexta BBC ye. Ji qoxuşên kêlekê qelebalixek ne asayî dihat, dengê heydedanê dihat. Dengek bilind û tije digot; "hevalno, hevalno! Mizginiya min ji we re, Esad Oktay hatiye kuştin! Ma we fêm kir?"

Dengê çepikan, fîtkan û govendê bilind bû… xwedêyo, hem jî di rojek wisa de! Ma çi dibû ev firara me jî pêk bihata. Bila her du heman rojê pêk bihatan. Bila agahiya ji girtîgeha Amedê çil kes revî ne û Esad Oktay hatiye kuştin belav bibûya! Dê van her du nûçeyan çiqas xweş hevûdû temam bikiran. Bextreşî bû, xwedê bela xwe bide! Belê, bila hezar carî xwedê bela xwe bide… Xwedê bela xwe bide… Xwedê bela xwe bide…

Dîsa jî dilxweşiyek bû. Esad hatibû kuştin ev jî bes bû! Belê, tol wisa tê rakirin! Partiyê tol hildabû. Ew cellat neda jiyîn. Tola Mazluman, Xeyriyan û Pîran bû. Wê hêj tolê bigire. Ax xweziya me Şahîn jî bikuşta. Bênamûsên weke Yildirim jî hebûn. Ew lenetên li ser rûyê erdê bûn. Diviya ew kêliyekê jî nebûna ayîdê rûyê erdê.

Ev agahî ji bona me moralek mezin bû. Çi dibe bila be, ne di xema kesî de bû. Lê hêj êşa Gazgor nû bû û dilê wî dagirtî bû. Digot; “ger tûnel derneketibûya holê, dê mîsoger di nava yek-du rojan de firar pêk bihatiya!” Heman tişt bi dehê caran dubare dikir. Axîn û nalînên wî, keserên wî kêm nedibûn. Dema keser dikişand, mirov digot qey dê singa wî biteqe.

Şev derî vebûn. Gotin dê her kes biçe qoxuşa xwe. Li ber derî di bin dorpêça leşkeran de ser me geriyan. Piştî lêgerînê em derbasî hundir dikirin. Min li her kesî dinêrî, xemgîniyek mezin li dilê min danîbû. Hîsek wisa di dilê min de hebû, weke em carek din hevûdû nabînin. Min dîsa jî digot emê hevûdû bibînin. Korîdor tije leşker bûne. Cilên wan cuda bûn. Hemû jî yekîneyên teybet bûn. Gardiyanên sivîl û personelên din biguman bûn. Kom bi kom di navbera xwe di di-axivîn. Heta me korîdor derbas kir, her kesî li me dinêriya. Leşkeran her du aliyên korîdorê girtibûn û em çar jinên girtî jî di navbera wan re derbas dibûn, çûn qoxuşa xwe.

Qoxuş tam bûye qada şer. Hemû pirtûk û nivîsên me hatine girtin. Belgefilma ku Gezgor nivîsandibû jî hatibû girtin. Herî zêde ji bona wê xemgîn bûm. Kovara Hawar û yên din jî hatibûn girtin. Gezgor ji hezar rûpelî zêdetir nivîsandibû. Belgefilmek watedar û zêde xweş bû, hemû pêvajo nivîsandibû. Di nav de hevpeyvîn jî hebûn. Hevpeyvînên mirovên ji komên din jî hatibûn çêkirin. Ma wî bi vê nivîsa xwe ya bizmar ve çi nenivîsandibû? Cahîdê derbasî Daktîloyê dikir. Dê me derxista derve. Me plan kiribû em her carê beşekê derxin derve. Heta me beşek kêm derxistibû. Bextreşî bû! Hêj agahiya Gezgor jê nebû. Ger bibihîse dê zêde aciz bibe. Reşnivîsên wê yên cuda jî tine bûn. Ya rastî me hinek

veşartibû. Bes emê wan çawa derbixin? Nediyar bû emê biçin kuderê. Kedek din jî wisa vala derketibû. Agahiyên wisa bi êş li ser hev ji bona me zêde giran bûn.

Îdareyê, ji hevalên nûner re gotiye; "hûnê werin veguhestin." Lê vekirî nabêje emê biçin kuderê. Dihat fêmkirin, dê girtîgehê vala bikin. Lê hatibû gotin her kes naçe. Dîsa jî dê beşek hejmara zêde bê sûrgûnkirin. Me jî xwe li gorî wê amade kiribû.

Roja paştir derî cardin girtîbûn. Kes dernexistin hewagirtinê. Lîsteya kesên werin sûrgûnkirin hatiye amadekirin. Li gorî dihat gotin; "kesên ku biçin ji sedî zêdetirin." Ne hejmarek kêm bû. Me ber bi êvarî xwe tam amade kir. Li gorî fermana hatî dê kesên ku navê wan were dayîn biçin, pirsgirêka derxînin, zehmetiyan ava bikin, nav neyê dayîn, her kes milê hev bigire, heta ku ew bi xwe werin derxin, dê kes bi dilê xwe neçe. Hejmara zêde ya rêveberiyê biryarek wisa digire. Min herî dawî di malzgalê de bi Şener re hevdîtinek kir. Wî ev ferman ji me re got. Jixwe em çar kes bûn. Dema got hûnê mil bidin hev, em keniyan. Me got; "di qoxuşek wisa mezin de çar jinên mil dane hev, çar jinên girtî. Tam mijara pêkenînê ye." Dîsa jî me zêde cil li ber xwe kirine. Ji ber em nizanin dê me bibin kuderê. Hinek hevalên din jî dema firsendê dibînin, tên ber mazgalê xatirê xwe dixwazin, em ji hevûdû re serkeftinê dixwazin…

Şev saet dehan bi ser hemû qoxuşan de girtin. Dengê duruşme, qîr, cop, kalas, zincîr û kelepçeyan bilind dibû û zêde dirêj kir. Tam heta çarê berbangê berdewam kir. Bihîstina wan qêrînan bi serê xwe êşkence bû. Me jî li mazgalan dida, duruşme qêrîn û bangî hevalan dikir. Kesî dengê me nedibihîst. Em di cihê xwe de nedisekinîn.

Herî dawî dor hat me. Çawa polîsan derî vekirin, me dest bi duruşmeyan kir û xwe bi hev ve girê da. Yên hatîn ne leşker, tîmên taybet û polîs bûn. Kesekî xwe weke mudurê emniyetê da nasîn. Bi copan li me xistin. Me demekê bi hev re şer kir. Çar-pênc kesan ez girtim. Êdî darbeyên copan bedena min puç kiribûn. Min jî her ku firsend didît pehîn li wan dida. Ji bona dengê min qut bikin, desmala serê min ve girêdayî dixistin devê min.

Ez wisa birim heta ber maşînê. Dikarim bêjim ku bi qasî hejmara hemû salan cop li min dan. Piştre em yek bi yek li wesayîta sergirtî ya leşkerî û taybet siwar kirin. Ji bilî me kes li holê tine bûn. Berbang bû. Derxistina ji qoxuşan jî herî kêm saetekê domiyabû. Piştî em li maşînê siwar kirin, destê me ji pişt ve kelepçe kirin. Di wê kêliyê de jî li me xistin û cop li me dan. Me jî bê navber duruşme diqêriya. Kesê li ber derî digot mudurê emniyetê ye got;

"Zû van bêdeng bikin."

Min jî got; "dê dawiya we jî weke dawiya Esad be. Ma we dawiya Esad bihîstiye?" Zêde li zora wî çû, hat hundirê maşînê û rûyê min da ber kulman. Kulmên xwe zêdetir li difina min dixist.

Digot; "ezê wê difina te bişkînim.

Di wê kêliyê de weke ku çavên min ji cihê xwe derketin. Hestiyên min dêşan. Ji difina min xwîn dihat. Min got qey şikest. Ketiyê Faşîst û kuçik! Tola Leyla Akbaş digirt. Bes me difina wê neşikandibû. Ev lêdan jî bibû birîna ser her dilî. Min jî cardin got; "dawiya Esad jibîr nekin." Mudurê emniyetê yê li ber derî got; "ma te jî Hisên Yildirim bihîstiye? Hemşeriyê te

ye. Ji Dêrsimê ye. Hûn parçe bûn. Agahiya te jî ji vê heye?" Min jî got; "ji destpêkê ve ew zilamê we bû. Me dizaniya. Jixwe ne PKK'yî bû. Tenê pîyonek lîstoka we ya erzan bû. Dê ew jî bimire. Jixwe tirsoneke. Ew ji niha ve ji tirsan miriye. Mizgîniya te cihê xwe negirt. Ne bi qasî agahiya Esad bibandor bû." Armanca min ew bû ku ez wî ji hêla derûnî ve bişkînim. Ji ber min di wî halî de nedikariya ji bilî wê tiştek din jî bikim.

Em rê ketin. Dozgerê girtîgehê li ber derî bû. Herî dawî min got; "faşîstno, ev bi yek were namîne, dê tola vê were rakirin." Me duruşme qêriyan. Dema maşîn rê ketin, bi giştî li girtîgehê dengê duruşmeyan bilind bû. Heta em dûr ketîn jî dengê hevalan dihat. Me jî heta ku em ji bajêr derketin duruşme qêrîn. Ji ber dengê maşînan qelebalix bû. Tam karwanê wesayîta sûrgûnê bû! Em pê dihesiyan ku hejmarek zêde karwanek wesayîtên leşkerî bi me re bû.

Maşîna em lê siwar bûne bi deriyekê û derabên hesin ve weke du beşane. Beşa pêş leşker dimînin. Me li derî xist; "zû kelepçeyên me sist bikin, destên me werimîne." Venekirin. Gotin; "qedexe ye." Ji ber kelepçe zêde hatibûn şidandin, xwîna destên me nedigeriya. Zehmetiyek çêdikir. Em hinekê pê ve mijûl bûn û me hewl da ji destên xwe derxin. Me herî dawî bi tokayên serê xwe kelepçe sist kirin. Heta em dikarin kelepçeyan ji yek destê xwe derbixin. Vê rehetiyek bi me re ava kir.

Em li ser pelên lênûskan bi qasî pelên biçûk nivîsên cur be cur û duruşmeyan dinivisînin. Me hemû pelên lênûsk û qaxidên vala yên heyî wisa amade kirin. Li cihên ku me texmîn dikir, cihên nişteciha ne, bi kunên jora maşînê re, an jî di navbera hesinan re me davêt derve. Me derdor nedidît. Tenê di kunên

jorê re banê avahiyan dixuya. Me şêwazê sûrgûnê û êrîşên dijmin dinivîsand û davêt derve. Me digot; “em nekarin tiştekê jî bikin, em dikarin wisa bala gel bikişînin. Me bi pelên biçûk pêkanên dijmin eşkere dikir.

Piştî wê lêdanê di rêyek dirêj û maşînek sergirtî de rêwîtiya me kir, bê ku ti pêdiviyên me werin pêkanîn, em ji hal xistibûn. Lê me dîsa jî ji dev xwe berneda. Tenê em cihê ku biçinê mereq dikin. Carekê beriya em rê bikevin dema me pirsî; “hûn me dibin kuderê?” Polîsan bersiv da; “hûn diçin Yassiadayê.” Gelo dibe me bibin wir? Me got; “Ma çima nebe? Ji ber berê jî ewder ji bona mehkûman hatibû bikaranîn. Doza 49’an hebû, ronakbîrên me yên Kurd ên kevin li wir hatibûn darizandin.” Em mîsoger nizanin. Lê me dizaniya ku Celal Bayar û Menderes ew li wir mabûn. Darvekirin jî li wir pêk hatibûn. Tişt nabe emê têra xwe masiyan bixwin. Ger me melevanî bizaniya, dê firara bi behrê re baştir bûya.

Dîsa Kelebek hat bîra min. Min behsa wî ji hevalan re dikir. Ji qalikê gûzên hindê kelekekê ji xwe re çêdike û firar dike. Ji ber torbe bi qalikan dagirtibû, demek dirêj li ser deryayê xwe girtibû. Rêwîtiya xwe bi wan torbeyan temam kiribû. Bes hevalê wî yê pê re miribû. Rêwîtiya li ser deryayê xeter bû. Me got; “dê êdî ev zilam me bixin cihek wisa, ti cinek li wan deran nebe, kes jî nekare were serdana me. Dê girêdana me ya bi cîhanê re qut bikin. Lê tişt nabe rojiyên me yên birçîbûnê û rojiyên me yên mirinê hene! Emê ji wir cihek din ji bona xwe bixwazin.” Me çi dikir êşa tûnelê derbas nedibû. Me jibîr nedikir. Êşa ewqas lêdanan derbas bibû. Her çendî rûyê me hatibe guhertin jî, werim, şîn û reşbûna canê me, difinên şikestî, yek ji wan jî êşa me kêm nedikir. Mirov nikare îxaneta

di vê astê de qebûl bike. Gelo ew xayîn kî bû, kî bû, kî bû? Ew kesê evqasî ketî kî bû û bi rastî jî kî bûn? Maşîn li cihekê rawestiya. Me tenê dîwarê nivîsandina Girtîgeha Girtî ya Sêwasê dît. Gelo dê me bixin girtîgeha Sêwasê? Em demekê li wir dan rawestandin. Me ji leşker re got derî veke, bila hundir hinekê hewa bigire, rêwîtiya maşîna me nexweş dixe. Çû ji jorê xwe re got, mezinê wî gotibû; "na, nabe." Me jî li derî xist. Me duruşme qêrîn, "Bimire Sûrgûn, Bijî Berxwedaniya Me!", "Bimire Êşkence!", "Bila Sûrgûn Dawî Bin!" Em dixwazin bi duruşmeyan bala wan bikişînin ser xwe. Em ji xwe ecêb diman, ewqas deng çawa ji me derdiketin. Dîmenên me, halê me weke yê rebenan bû. Em ji hal ketibûn. Lê dîsa jî duruşmeyên me zindî bûn. Em ji nişka ve zindî bibûn. Ji derve hinek dengê qelebalix hatin. Lê dengê hevalan nedihat me. Gelo ew dûrî me dabûn rawestandin? Me nedizaniya gelo li Sêwasê girtîgehek din jî heye, an na. Ji ber duruşmeyên me ew aciz kirin, yekser rê ketin. Me pirsa hevalan ji leşkeran kir;

"Ma hevalên me li Sêwasê hiştin. Dengê maşînan kêm bû." Leşkeran got;

"Ew ji Meletî ve ne li pey me ne. Li wir cuda bûn. Tenê hûn hene." Em hemû di wê kêliyê de cemidîn. Nexwe em ji hev veqetandin. Ketîno. Em bi tenê hiştin. Mane derdê wan jî ev bû. Nekarîn di meha Gulanê dê bi serbixin, niha firsendek dîtin û em ji hev cuda kirin. Me hemûyan bi yek dengî dijûn ji wan re kir.

Weke ku hinek tişt ji dilê min qetiyabûn. Ew dilşikestina veqetîna ji Amedê bi min re kûr bû. Min ew kêlî hîs kiribû. Dema ez bi hevalan re bûm, min ew veqetîn hîs nekiribû. Me digot; "em li kur bin, emê wir bikin Amed." Di vê veqetînê de

dilxweşiyek hebû. Piştî saetên dirêj em pê hesiyan ku heval tine ne! Gelo dê me tenê bibin 'Yassiadayê'? Ma kî dizane dibe ku tenê hevalên xort biribin. Me cardin bi israr ji leşker pirsî; "ma heval li Meletî man?" Got; "na. Ew jî rê ketin. Lê dibe ku ew çûbin Eskîşehîrê. Ji ber dema me herî dawî ew dîtin ketin wê rê." Belê, Eskîşehîr! Wê demê em diçûn kuderê? Bersiva wê nedan, leşkeran got; "em jî nizanin." Weke din dihat gotin ku, gelek ew pelên me nivîsandî û belav kirîn ji aliyê serbazên wan ve hatine komkirin û gelek ji wan jî ji ber bayê firîne, lewma nekarîne kom bikin. Nexwe dê kom bikin û wan jî weke delîl li dijî me bikar bînin. Ehmeq in! Mantiqê wan hemû li ser esasê dê me çawa ceza bikin, kar dikir. Em dîsa jî kêfxweş dibûn. Mijûlkirina wan, ew acizkirin û teqandin tiştek xweş bû. Wê dijmin rehet nebe û emê rehet bernedin. Ev jî weke sondekê di dilê me de ye...

Rêwîtiya me tam bîst û çar demjimêran domand. Li deriyê derve nivîsandiye Girtîgeha Girtiya ya Amasya. Nexwe em anîbûn Amasyayê. Bes, ev Amasya jî ji kur derketibû? Amasya cihek bi nav û deng ê sûrgûnê bû.

Kesek çakêtê wî li ser milan, temenê wî nîv îxtiyar kesek weke axa em pêşwazî kirin. Gotina wî ya destpêkê;

"gelo Cinawirên Amedê ev in?" Weke serxweşan dikeniya. Got; "ka li wan binêrin, çi ji wan hatiye, ev çi hale. Her cihê wan xwehir bûye. Belê ger hûn Amedê bikin bane (çiftlik) dê wisa li web ê. Evder Amasya ye. We qet evder bihîstiye. Ewder me eleqeder nakin. Quralên vir hene. Ez jin û mina guhdar nakim." Em birin odeyekê.

Me got; “hişyar nêzî tiştên me bibin. Hinek tiştên bişkên di nav de hene. Têkilhev nekin. Heta ku em ne amade bin, li wan negerin. Ew axayê ku mudur bû dîsa ket navberê û got;

“De vê carê li van binêre. Hêj di derî re neketine hundir fermanan didin me. Tişta dixuyê evê me bidin mijûlkirin. We ev belayên serî ji kur anîne? Bila sed zilam bin, lê ne ev bin.” Rûyê xwe diqermiçand, weke me biçûk bixe ev axaftin dikir. Lê diyar bû ku, ew jî zêde ne rehet bû. Êdî min jî nekarî xwe û got;

“Hûn kî ne û çi ne?”

Bersiva min da; “te xêre, ji te re çiye? Ma tu me bi lêpirsînê re derbas dikî?Berî her tiştî tu kiyî?”

Piştî van axaftinan ez jî bê hemdî xwe keniyam. Zilamek ecêb bû. Faşîstek xwedî kompleks bû. Ne di ferqê de bû, min çi û ji bona çi dipirsî. Xwe berê de amade kiribû. Dilxwede dê bi vî halê xwe bandor li ser me bike. Lê mixabin ji tirsa xwe dikir. Her wiha ji bona em jin bûn, em biçûk didîtin. Lê em PKK’yî bûn û ji girtîgeha Amedê hatibûn. Dizaniya ku em ne mehkumê wisa bêdeng û nerim bûn. Texmîna vê rastiyê jî dikir.

Min got; “ger hûn dosyayên li pêşiya xwe binêrin, hûnê hîn bibin em kî ne. Navê min Sakîne Polat e. Ez PKK’yî me. Ji Amedê hatim sûrgûnkirin. Deh sal in di girtîgehê de me.” Radeya dengê min zêde tund bû. Min axaftinên xwe berdewam kirin; “ma hat fêmkirin? Em niha li vir in. Jixwe emê hevûdû baş nas bikin. Lê me hûn baş naskirin. Bi ketina derî re her nêzîkbûna we, axaftina we hûn dan naskirin û da fêmkirin ku hûn kî ne. Em jî girtiyên siyasî ne. Hûn nikarin nêzîkbûna girtiyên edlî li me bikin. Em yeqîn dikin li vir girtiyên edlî

zêdetirin. Ne ku ez wan biçûk dibînim. Lê hûn hînî vê bûne. Em PKK'yî ne. Em Şoreşger in. Em ji aliyê dadgehên we ve hatine darizandin. Ceza dane me. Hûn jî hîn bibin. Lê hinek tişt hene, ew jî nêzîkbûnên mirovî yên hewce dike werin kirinin. Di wê mijarê de jî rêzdar bin. Hûnê cem me li tiştên me bigerin. Dê gardiyana jin li tiştê me bigere. Weke din êşkence li me hemûyan kirin. Em birîndar bûne. Lewma em doxtor dixwazin. Em vê jî niha û lez dixwazin. Hûn jî dikarin berpirsyariya vê negirin. Ji ber emê vê rewşê ji raya giştî re ragihînin. Hûn bi xwe halê me dibînin. We em di çi halî de girtibin, divê hûn jî vê rewşê destnîşan bikin. Nexwe dê berpirsyarî li ser we bimîne." Wan gotinên min ên dawiyê ew tirdsandin. Hinek din nerim dixuya. Lê wî cardin em sucdar kirin û got;

"Hûn çawa ketin hundir fermana didin. Ez mudurê vir im. Navê min Hesen Can e. Quralên vir hene. Ger hinek tiştên qedexe hebin em nadin. Mînak em nikarin pirtûk, tv û radyo yek ji wan jî bidin. Li vir qedexe ne. Di hundir de tv heye. Ya girtiyên edlî ye. Hinek demjimêrên diyar de temaşe dikin." Ango tiştê em dibêjin ser guhê xwe re davêje. Hesen Can bi quralê xwe re dilîst. Piştî hinekê fikirî got;

"Temam. Wê doxtor were. Lê ne di vê demjimêrê de. Dê di saeta xwe ya kar de were. Wê demê dê we jî kontrol bike."

Wê şevê em li cihek weke hucreyê de girtin. Sibehê doxtor em kontrol kirin. Hestiyê difina min derizî bû. Me cihê hemû derbên laşê xwe şanî wî kir. Me nexwest hinek cihan şanî wî bikin. Hewce nedikir. Armanca me, em wan jî neçarî hinek helwestan bikin. An jî qet nebe em bikarin pêşiya êrîşên bi vî rengî bigirin. Me got; "emê bêdeng nemînin." Em dixwazin zextekê li ser wan ava bikin.

Doxtor metel bû û bandor bibû. Serê xwe dihejand. Me jî behsa bûyeran dikir;

“Di beşa hevalên zilam de tûnel derketibû holê. Ew kirin hêcet. Ya rastî ji bona Esad Oktay Yildiranê li Amedê kar dikir û qatilê dehan hevalê me bû hat cezakirin, har bibûn. Lê em jî nasekinin, li kur dibin bila bin, emê hesabê kesê destên wan di xwîna hevalên me de hebin û êşkencekar bipirsin. Hûn doxtor in. Ger hûn bi sonda hîpokratê ve girêdayî ne, hûnê jî di vê mijarê de ya rast çibe, wê bikin. Doxtor ne êşkencekar in. An jî kesên êşkenceyê dikin naveşêrin. Wan rewa nabînin.”

Got;”belê, belê, min şaş fêm nekin. Ez doxtor im. Ne êşkencekar im.”

Rapor nivîsand, raporek heftane da. Ev baş bû. Me xwest reşnivîsek wê bigirin. Derman dan û jêhatîbûna me bandor lê kir. Gardiyanan jî ecêb li me temaşe dikir. Nêrînên hinekan tam ên faşîzan bûn. Mirov nêrînên wan yekser fêm dikirin.

Çar girtiyên jin ên siyasî jî li girtîgehê hebûn. Hesen Can got; “ew jî ji refê we ne.” Çi zilamek ecêb bû! Axaftin û xoyên wî mirov dida kenîn.

Jinên ku behsa wan dikirin, jinên ji doza TÎKB hatî girtinbûn. Yek ji wan xwîşka Aysel Zehîr a di Rojiya Mirinê ya Metrîsê de seqet mayî bû. Di girtîgehên Tîpa E de beşên jin lê dimînin tev dişibin hev. Beş bi şêweya tîpa L de ye. Em birin qoxuşa aliyê bloka yekem. Tevî ku heman beş bû, weke du qoxuşan ji hev cuda kirin. Lê cihên weke xwaringehê, cihê hewagirtinê, tuwalet û serşokê hevbeş in. Weke din jinên girtiyên edlî jî hene. Ew hemû bi hev re li qoxuşekê diman.

Dihat gotin; “du roj maye ji serdanan re.” Me ji bona hişyarî du rojan rojiya birçîbûnê lidarxist. Dema yên din jî derkevin serdanan, dê rewşa me jî ragihînin. Me yekser telgrafek ji girtîgehên din re şand ku, bizanibin em li Amasya ne. Weke din me bi rêya malbatên din jî agahî şand.

Plana çalakiya hemwext a rojiya birçîbûnê ya beriya niha hatibû kirin jî di rojevê de bû. Amasya jî wisa yekser dest bi çalakiyê dikir. Çalakiyê hemû girtîgehên weke Amed, Ceyhan, Dîlok, Eskîşehîr, Meletî û yên heval lê dimînin destpê kiribû. Endamên TÎKB’ê jî her tim tevlî dibûn. Didan diyarkirin ku biryara koma wan e. Divê qadroyên xwe biparêzin. Lewma dê demdirêj nekarin tevlî çalakiya rojiya birçîbûnê bibin. Berxwedaniya yeke yek esas digirtin. Nîqaşa di vê mijarê de jî zêde nebaş bû. Lê me dîsa jî diyar kir ku, planek hevbeş hatiye amadekirin, ji hemû koman re hatiye gotin û dê her kes li gorî wê tevbigere.

Yekem car bû em bi helwestek wisa re rû bi rû dihatin. Belê, dixwestin “Qadroyên xwe Biparêzin!” Nêzîkbûnên wisa qet nedihatin bîra me. Di nava me de berî her kesî qadroyan xwe dida ber her tiştî û tevlê dikir. Belê, mantiqê me yê parastina qadroyan çiqas ji hev cuda bû. Ger me carê ji bo hinek hevalên diyarker ev mijar nîqaş bikiriya jî, ne di cih de bû û pêk nedihat. Ji ber bertek û bandorên cuda pêş diket. Gelo em zêde hişk bûn, me girîngiya wan nedizaniya?

Di pêvajoya rojiya birçîbûnê de tiştên weke name û telgraf nedidan. Malbata Mevlûdê ji berê ve nedihat. Malbata Emînê jî dûr bû. Zehmet bû heta ji Mêrdînê werin. Malbata min jî li Awrûpayê bûn. Tenê ya Cahîdê dima. Ew rewşa heyî hîn bûn û hatin. Cahîde bi armanca hinek pêşketinan hîn bibe, çû serdana

wan. Sed û bîst heval biribûn Eskîşehîrê. Şener li Amedê bû. Weke din Fethî, Mahmud Tanrikulu û Cewdet jî li wir bûn. Baş bû hinek heval li wir mabûn. Ji ber giranî hêza ku nû hatibû girtin li wir mabû. Mayîna hinek qadroyên nas ji bona wan baş bû. Lê dîsa ji aliyê din ve ez ji bona mayîna Şener aciz dibûm. Min û Şener herî dawî di mazgalê re hevdîtin kiribû. Wî jî gelek cil li ber xwe kiribû. Gelo dizaniya di lîsteyê de navê wî tinebû? Gelo çima negotibû? Dîsa jî mayîna wî ez aciz dikirim. Ew jî li qoxuşa 35'an dima û mîsoger dijmin hîn bibû ku ew jî di nav koma firar bike de ye. Gelo bi zanebûn hiştibûn? Ji bona doza wan berdewam dikir lewma? Bes doza gelek ji wan didomiya. Gelo helwestek dijmin a bi zanebûn bû. Vê fikirê hişê min biribû. Min got; "dijmin dîsa hemû balan li ser Şener kom dike."

Nêzî mehekê çalakiyê berdewam kir. Me hem giştî polîtîkayên dijmin ên sûrgûnkirinê, êşkenceyên dawî li Amedê bi êrîşan pêk hatin, her kêliyê ferzkirina giştînameyê protesto kiribû, hem jî ji ber li herêma Amasya ti mafê me nayên dayîn me hemû daxwazên xwe rêz kiribûn. Mafên ku beriya niha bi salan li girtîgehên din hatine bidestxistin, li Amasya nû diket rojevê. Rojnameya Cumhuriyetê nedihat dayîn. Kovara 'Nokta' jî di bin navê qedexe ye de, nedihat kirîn. Hemû amûrên weke derzî û meqes qedexe bûn. Ango mercên jiyanê zêde xirab bûn. Mafê jiyanê qet tine ye! Hêj hucreyên bin erd hene. Fikriyê Terzî di wan hucreyan de hatibû qetilkirin. Lewma daxwazên me berfireh bûn. Lê armanca çalakiyê zêdetir ji bo derve, êrîşên giştî û bûyerên ku li Amedê rû didan bû.

Ji ber hemû çalakî di heman wextê de bûn û hemû girtîgehên din tevlî bibûn, ji derve de jî bandorek mezin li malbat û derdorên cuda kiribû. Wan jî bi çalakiyên cur be cur piştewaniya girtîgehan dikir. Vê jî xwezayî li ser dewletê hêzek pêkanê dida avakirin.

Piştî demekê çalakî li hinek girtîgehan bi dawî bû. Cihên çalakiyê hêj didomandin Amed, Ceyhan, Meletî, Erzirom, Elezîz bû, Weke din jî em hene. Ji berê ve li hember girtîgehên Erzirom, Meletî û Elezîzê êrîş giran tên meşandin. Ewder hinekê dikevin çepê me. Ji pêşketinên giştî jî dûr dikevin. Kesî baş nedikariya xwe bigihîne wan deran. Cihên ku herî zêde rojiyên birçîbûnê lidar dixistin jî, ewder bûn. Lê pirsgirêkên wan jî xilas nedibûn. Polîtîkaya dijmin a giştî bi gelemperî li Amedê zelal di meriyetê de bû. Lê polîtîkayên cihên din ên herêmî jî dema serve dibû, li girtîgehên wisa, ji hal ketin zêde pêş diket.

Em hêj çalakiyê didomînin. Ji ber emê bi hev re encam bikin, em jî li gorî rewşa gitşî xwe amade dikin. Di vê navberê de rojnameya destnîşan dikir ku, rewşa Karasu zêde nebaş e. Kesên rewşa wan xeternak in, navê wan di rojnameyan de hatibûn rêzkirin. Piştewaniya raya giştî jî didome. Malbat jî di rojiya birçîbûnê de ne. Hinek kesan xwestiye xwe di meclîsê de bişewitîne.

Yên li Eskîşehîrê, di rojiya mirinê de ne. Dema girtî di wî halî de ne, wan sewkî Aydinê dikin. Di kêliya rêwitiyê de Hisên û Mehmet şehîd dikevin. Vê nûçeyê pêşveçûna çalakiyê jî bandor kir. Çawa agahî hat bihîstin, her kesî duruşme qêriyan. “Mehmed Namir e! Hisên Namir e! Bîjî Berxwedaniya Me! Bimire Êşkence!” Me jî çalakiya xwe

veguherand rojiya mirinê. Ji ber mirinên rû didan li ser dijmin jî çewsîneriyek didan avakirin. Destnîşan kirin ku, daxwazên me qebûl kirine.

Li Amasya yekem car bû çalakiya rojiya mirinê wisa dem dirêj pêk dihat. Li derve jî protesto zêde ne. Ji bona hinek mirinên nû cardin neyên jiyîn bangawazî hat kirin û rojiyên birçîbûnê berfireh bûn.

Herî dawî ji girtîgeha Amedê bi îmzeya Şener telgrafek hat, digot; "çalakiyê bidawî bikin." Bi giştî jî çalakî bi dawî bibûn. Me jî bidawî kir.

Nameyek dirêj a weke rojnivîsê min demek kin de nivîsandî hebû. Bi giranî hestên veqetîna min a ji Amedê hatine nivîsandin. Piştî ji Amedê derketim, her tiştê rû dan min nivîsandine. Ji berê de her cara dema derketina ji Amedê diket rojevê bandor dibûm. Min ji Amedê hez dikir. Mirov ji zindanê jî hez dike? Belê, pir kes ji vê metel dima. Di zindanê de rewşên zêde hovane hatibûn jiyîn. Li wir gelek tişt ji me girtin û birin. Hevalên me yên herî hêja li wir şehîd ketibûn. Ji vê hêlê ve qehbeyek mezin bû. Zêde bêrehim bû û zêde bilenet bû. Lê ji hêlek din ve jî min ji bîranîna wan, êşa rewşên hatine jiyîn hez dikir. Girêdanek giyanwerî hebû. Ma kî dizane min ev rastî çawa bilêv kiribûn? Ji ber dema hinek hevalan pişt re xwendin, rexne li min kirin û gotin; "te zêde hestiyar nivîsandiye." Yek ji van jî Şêx Mehmud bû.

Piştî çalakî bi dawî bû, gera nameyan destpê kir. Min ji her derê re dinivîsand. Nameyek jî ji Şener re şand. Wî jî yek şandibû. Wî jî rewşa xwe ya piştî sûrgûnê û rewşa giştî nivîsandibû. Di heman demê de helbestek jî nivîsandibû…

Piştî demek kin komek heval Fethî Yildiz û hinek hevalên din jî di nav de sûrgûnî girtîgeha Elezîzê, komek jî sûrgûnî girtîgeha Eskîşehîrê kirin. Hejmar kêm e. Lê tişta dixwiya girtiyên kevin dihatin ‘paqijkirin!’

Meha salê ya dawiyê bû. Telgrafek hat. Digot; “Şener û Mahmud Tanrikulu hatine berdan.” Agahiyek sûprîz bû. Ez destpê kê şoke bûm. Min got; “tiştek wisa negengaz e.” Çiqas tiştên ecêb dibûn. Her carê agahiyek diihat. Weke agahiya tûnelê, kuştina Esad, sûrgûn, şahadetên nû, sûrgûnên nû û niha jî berdana hinek kesan. Şener hatibû berdan. Biqasî em şoke bûne, ew qas jî kêfxweş dibin.

Nizanim rewşa dadgehan çiye, çiqas ceza girtine, doz di çi rewşê de ne. Girîngiya rewşa dadgeha ti hevalî û cezayê wan nemabû. Jixwe jixweber dihat pirsîn. Ev zêde kesî eleqeder nedikir. Ji ber bêhna me zêde teng dikir û zêde bê wate bûn. Êdî zagon, dadgeh, doz, ceza, ji beşên jiyanê yên din negirîngtir bûn. Tenê dîroka dadgehan û parazname em eleqeder dikirin. Em li ser wan lêhûr dibûn. Ji ber cihê serek a em agahiyê ji hev bigirin ewder bûn. Di heman demê de bawerî, hêvî û girêdana me li wir her tişt darezand.

Piştî metel mayîna me ya agahiya berdanê, vê carê jî gumanên me yên weke; “gelo dikarin xwe bigihînin hevalan? Dibe ku pirsgirêka leşkeriyê derkeve holê?” Pêş ketibû. Ji ber kesên derdiketin piranî dibirin navendên leşkeriyê. Zêde firsend nedihat dayîn. Kesên ku malbatên wan mijûl dibûn hebûna, çend rojan destûr digirtin, wisa dikariyan wext bidest bixin. Ya rastî niha ne weke berê bû. Êdî xwe gihandina partiyê hêsan bû. Lê dîsa jî dijmin bi zanebûn leşkertî ferz dikir. Vê jî em tengav dikirin.

Piştî demekê Şener bi navek cuda nameyek şand. Li ser pula wê navnîşana Stenbûlê hebû. Ez rehet bûm. Diyar dikir ku, ji ber pirsgirêka leşkeriyê heye, ew jî hişyar tevdigere. Ji ber nexasim fermanek me li Amedê weşandî hebû. Hejmara kesên beriya niha ji girtîgehê derketin û paşê çûn leşkerî kirin, ne kêm bûn. Dijmin jî leşkertî bi zanebûn ferz dikir, lê mixabin ên diçûn jî nedibûn xwedî helwestên ku bikarin van pêkanên dijmin vala derbixin. Tevdîr pêş nedixistin. Dema yekser derdiketin û nedikariyan xwe bigihînin partiyê, tenê leşkertî dima. Ev jî ji bona mirovan da ku neçin cem partiyê dibû, hêcetek bingehîn. Tişta ecêb evqasî di zindanê de bimîne, di bin zilm û êşkenceya leşkerê dijminê xwe de bijî û bimîne û pişt re biçe ji bona wan leşkeriyê bike. Ev bi serê xwe leşkeriya rojekê jî be suc bû. Îxanet bû. Ez li hember kesên ev rewş jiyan dikirin zêde hêrs dibûm.

Me di derbarê vê mijarê de bi nivîsek berfireh nivîsî û hinek biryar girtin. Di beşa hêcetan de zêdetir polîtîkaya dijmin a zindanan hatiye şîrovekirin. Weke berdewamiya wê jî me armanca dijmin a mirovan ji xeyal û rastiyên wan dûr bixe, di bin venêrînê de bigire, ji nasname û kesayeta wî dûr bixe û vala bike û ji bona vê jî çi hewce dike pêk tîne nivîsîn. Lewma divê li dijî vê, hişyariyek şoreşgerî hebe û li dijî vê derketin jî erka şoreşgerî bû. Weke din nivîsê de hatibû destnîşankirin ku, divê rêhevalên di zindanê de bi salan tevî hemû zilma dijmin baweriya xwe parastine, li dadgehan parastina xwe kirine, xwedî li partiyê derketine, berdêla wê çi dibe bila be, saziya mêtîngeriya faşîst a bingehîn li artêşê leşkertiyê nekin, ferzkirinên bi zorê werin valaderxistin. Bi kurtasî naveroka wê wisa bû:

“li gorî me bihîstiye gelek hevalên ji vir derdikevin, dijmin wan dibe leşkeriyê. Divê her kes di vê mijarê de bi qasî dikare dijmin mijûl bike, çend roj, an jî çend demjimêran bidest bixin, da ku her kes xwe bigihîne partiyê. Divê hedefa her kesî ya sereke ev be. Ger ev neyê kirin jî, bê ferzkirin yekser derbasî navenda leşkeriyê bibe, divê firar bike. Divê her kes ji bona xwe derfetên firarê ava bike, ev gengaz e. Kes nikare di vê mijarê de astengiyên dijmin weke hêcet destnîşan bike. Hevalên ku nasnameya wan a siyasî ji hêla dijmin ve tê zanîn, qadroyên di vê astê de, divê quralên dijmin pêk neyînin. Helwestên xwe li dijî leşkeriyê vekirî rave bikin.”

Ji bona her kesî bangawazî, ferman hebû. Lê biryarên derbarê qadroyan de zêdetir zelal û dijwar bûn. Dihat gotin; “ger tevî van kes leşkeriyê bike, dê ew xayîn were îlankirin.” Ev nivîs di nav girseyên hemû girtîgehan de hatibû xwendin û li ser wê hatibû nîqaşkirin.

Şener dabû diyarkirin ku li cihek saxlem e. Lê hêj bi hevalan re peywendî pêş nexistiye. Dibêje; “kesên ez li cem wan dimînim, tu jî wan nas dikî. Hûn demekê bi hev re mane.” Min nas nekir kî ne. Ger ne hevalên me bin, mîsoger kesên ji çepên Tirk, an jî Kurd bûn. Demekê di kovara TKP’ê de nivîsek wî derketibû. Ji naveroka nivîsê zêdetir, bertekên min li hember nêzîkbûna wî çêbûn. Çima ji kovara TKP’ê (Partiya Komînîst a Tirkiyê) re nivîsandibû. Naveroka wê jî ecêb bû. Ruhê me zêde nedaye diyarkirin. Ne balkêş bû. Lê ez dizanim asta nêrîna Şener baş bû. Parçe parçe, bi zorakî, uslubek wan dilşad bike hatibû nivîsandin. Ger ji ber di girtîgehê de bi wan re mabû, ji ber ehpap-çawuşiyek di navbera wan de pêş ketibû? Min zêde wate nedayê. Lê min jê re nivîsand ku, tişta dike

nerast e. Ma qet hewceyî wan bibû? Em jî texmînan dikin. Ma dibe li cem wan be? Ma dibe ku ji bona derkeve dervî welat wan bikar bîne? Ev jî çiqas rast e? Dibe ku weke kes hinek ji wan nas bike. Bes, ma em ewqas bê çare mabûn? Ez hinekê jî weke pirsgirêka rûmetê digirim dest. Min jê re diyar kiribû, ez çil salan jî li vir bimînim, bi kesên TKP'ê re karek wisa nameşînim.

Bê ku wext ser ve biçe, em cardin li Amasya ketin rojiya birçîbûnê. Tenê mehek di navberê re derbas bibû. Îdareyê ti tişta ku gotibû; "temam" pêk ne anîbû. Pêkhateya girtîgehê jî hatibû guhertin. Ji Acîlê, Dev-Solê û hinek komên din mirov hatibûn. Hinek hevalên me yên cezayê darvekirinê girtibûn û ji ber vê biribûn Sînopê cardin vegeriyabûn. Ji aliyekê ve zêdebûna girtiyên siyasî em kêfxweş jî kiribûn. Ji ber em li cem hev bûn.

Ji ber me cardin ji bona heman daxwazan dest bi rojiya birçîbûnê ya bêdem kiribû, bala raya gştî tev hatibû ser Amasya. Navenda Amasya ji aliyê siyasî û civakî ve girtî bû. Li gorî xweseriya xwe zêde paşketî bû. Sazîbûnek xwe ya faşîzan hebû. Amasya tam cihê sûrgûnê bû! Girtiyên siyasî yên beriya me hatibûn, heta kesên ji ber sucên qaçaxiyê hatibûn girtin, her kes çalakiya rojiya birçîbûnê ji bona biçin girtîgehek din lidardixistin. Daxwaza çûnê, ya bingehîn bû. Ji ber vê jî li Amasya rêveberên zindanan serdestiya xwe ya her dayîm meşandine.

Axatiya parazvanên zindanê pir ecêb bû. Di serî de Hesen Can bûye axa. Weke din jî axa û paşayên zindanê zêde bûn. Her serkêşê gardiyanan û gardiyan bi serê xwe axa bûn. Gardiyanên jin jî xanim axa bûn. Tevî ku ciwan bûn, zû bibûn

xanim axa. Hemû jî dergistiyên polîsan, xwîşkên leşkeran û keçên ku dostikên serbaza bûn. Kesayetên ji rêzê tinebûn. An dê di nava wê çerxê de bijiyan, an jî karmendiyek wisa ji rêzê nedibû. Çerxa parazvanên zindanê di cihên wisa de bi rastî jî ecêb bû. Me ji nû ve dest bi her tiştî kiribû. Şert û mercên niha ji yên pêvajoya ku em sala 79'an de li girtîgeha Elezîzê xiraptir bûn. Şûnve bûn. Di heman demê rêbazên zêde çors û hovane dihatin bikaranîn.

Hesen Can digot; "girtîgeha me baş e. Ev keçên PKK'yî hatin xirab kirin. Anarşîzm ava kirin." Amasya bajarek biçûk a Anatoliyê bû. Rewşên li vir rû didan zû dihat bîhîstin. Girtîgeh li gundê Helwaciyan hatibû çêkirin. Li çepê diket. Tevî ji navenda bajêr dûr bû, dîsa dihat bîhîstin. Rewşa li Amedê hinek din cuda bû. Malbatan yekser bi rojiyên birçîbûnê û meşan piştewaniya me dikir. Mixabin gelê Amasya nû rojiyên birçîbûnê yên girtiyan didît.

Amasya cihê çîroka Ferhad û Şirîn bû. Ferhat, ser xatirê Şirîn çiyayê Amasya kola bû. Lutkeya çiyayê gorên wan li ser bûn di şibakeya girtîgehê re dixuya. Di rojên diyar de gel dihat serdana wan goran. Kesên ewder dîtin digotin; "li cihê gora Ferhad û Şirîn lê ye du gul hene. Di navbera wan de jî sitiriyek mezin heye. Cihek pir xweş e." Çîroka navê gundê Helwacî ya girtîgeh jî lê hebû. Kî dizaniya min bi wan dida gotin. Li gorî digotin; "belav dikin ku Ferhad miriye. Ji bona bidin bawerkirin helawa wî çêdikin û belav dikin. Bavê Şirîn jî bi zanebûn vê tiştê dike. Lê Ferhad nemiriye. Çawa Şirîn vê dibihîse, xwe dikuje. Ferhad jî mirina Şirîn raneke, ew jî xwe dikuje. Bi vî rengî helawa her duyan bi hev re tê belavkirin. Gund jî wisa navê Helwaciyan digire.

Çiyayên wê derê kun bûn, weke ku zanebûn bi mekîneyê hatine çêkirin. Di hemû şikêran de kunên wisa mezin hene. Ji wan re dibêjin çiyayên ku Ferhad kun kirine. Tevî wê nikare xwe bigihîne Şirînê. Ecêb, ma dawiya hemû evînên mezin wisa ne? An jî bi zanebûn dikirin destan, da ku ratiya wan neyê zanîn? Ev çîrok jî efsane bû, lê belê ez didam fikirandin. Me carê li ser nîqaş jî dikir. Nexwe berdêla her hevgihînê û hevdîtinê giranbiha bû. Ferhad çiyan kun dike, dixwaze bi serxistina ya herî zehmet ve xwe bigihîne hezkirina xwe. Nexwe mirov nikare xwe hêsan bigihîne hezkirinê. Lê nabe ku mirov bihizire, mirov qet nagihije, wê ber bi rewşên nediyar ve biherikîne, an jî derxîne asîmanan. Her du jî nerast in.

Teza "Evîna Pîroz" tiştek nemenem bû. Şener di hemû nameyan de behsa pîrozbûnê dikir. Têgeha pîroziyê xweşik bû. Lê her çendî bi wî re tiştek veşartî, nav û deng nebe jî, divê şik û guman nebe. Min digot; "hezkirn şer e." Wî digot; "hezkirin pîroz e."

Temam, ma şer bi xwe jî ne tiştek pîroz bû? Nameyên min ên bi şer, hezkirinên min ên bi şer, meşên min ên bi şer, axaftinên min ên bi şer, salên min ên bi şer… Belê, bi rastî jî di hemûyan de şer hebû. Lê cewher, şêwe, sedem, encam û xisletên van şerên min girîng bûn. Şer çi dide destxistin, çi dide windakirin? Jixwe wateya şer jî di bersiva vê pirsê de ye.

Dê çalakiya rojiya birçîbûnê di rojên pêş me de destpê bike. Tam di wan rojan de hevalê Muzaffer Ayata hat. Ji endamê Dev-Solê Celalettîn Can jî hatibû. Ecêb ji Eskîşehîrê dihatin. Girtî destpêkê sûrgûnê wir dikirin, niha jî ji wir sûrgûnê destpê dikir. Êdî dijmin jî nedizaniya çi bike. Metel mabû. An jî ev sûrgûn parçeya planek nû bû? Dixwestin hêza

girtiyan parçe bikin, di bin venêrînê de bigirin, li her girtîgehê her çendî wek hev jî bin, pêkanên cuda dihatin ferzkirin. Dixwestin girtiyan mijûl bikin, di vir de rêbazên dewlemend bikar danîn. Polîtîkayek dihat pêkan a xwe ferzkirinê bû.

Me not ji hev re nivîsand. Hêjî hêza me heye ku, em bi ser ban re gokan bavêjin. Ji ber gihandina notan dibe pirsgirêk. Heval li qoxuşek wisa ne, ne hêsan e mirov ji ser ban re tam cih bigire û bavêje. Carê hinek notên me li ser ban dimînin û dikevin dest. Lê me dîsa jî pêşketinên heyîn li hember hev ji hevûdû re radigihand.

Dema pêkhate berfireh bû û nîtelîk zêde bû, îdare tirsiya. Weke din di rê de xwîn ji mîdeya Muzaffer hatibû. Rêwîtiya wan xirab derbas bibû. Vê jî bandor dikir. Ji qoxuşa jinan Cahîde hevdîtinan dimeşîne. Ji hevalan jî Saît Korkmaz hat. Ji hevdîtina destpêkê ti encam derneket. Hevdîtin di hinek daxwazan de xetimî.

Hevalan digot, rewşa tendustiya Muzaffet wan ne baş e. Gumanê me hebûn. Ne çalakiyek giştî bû. Ti xisleta wê ya girtîgehên din, an jî polîtîkaya me ya giştî neyênî bandor bike jî nebû. Ti rolek wê ya diyarker jî nebû. Lewma min di lihevkirina hinek xalan de înada pêş diket bêwate didît. Nexasim ji bona daxwazin wisa windahiyek dayîn, an jî şahadeta Muzaffet wan, ne rewşek bihata qebûlkirin bû. Ger derfetê çareseriya pirsgirêkên bingehîn hene, xisletek wê ya rê ji encamên girîng û dîrokî re veke hebe, mirov dikare ji bona vê gelek berdêlan bide. Lê ti xisleta wê ya wisa diyarker û fonksiyonek wê ya neyênî jî bandor bike tine bû. Ev nêzîkbûn bi zanebûn xwe ber bi mirinê ve birin bû. Şaşiya vê jî li holê bû. Her çendî berpirsyariya vê cuda jî be, min girt ser xwe.

Dev-Solê ferz dikir, heta dihiştin em bi biryarên xwe re nakokiyê bijîn! Di vê mijarê de nêzîkbûnek tund û hişk raber dikirin. Ya rastî hevalên ku di hevdîtinan de amade bûn pirsgirêk destnîşan kiribûn, lê ji ber şêwazê nêzîkbûna wan, li hember dijmin hişyar tevnegeriya bûn, nêzîkbûnek hostayiyek polîtîk raber nekiribûn, ev rewş dihat jiyîn. Mijara girîng di vir de bû. Di vê mijarê de hêza nûnertiya Cahîdê û Saît lewaz bû. Dijmin mijûl dikir û helwestek qet tawîzan nade destnîşan kiribû. Ango zêde bibandor nebûn. Lê bi giştî girtîgehên din bêdeng bûn. Ditirsiyan ku çalakiya li Amasyayê bi şahadetê ve encam bibe. Weke din jî rewşa Muzaffer dihat zanîn.

Ez bi xwe çûm hevdîtinê. Me hevalê Muzaffer xwest. Hat. Rewşa wî ya tenduristî nebaş bû. Min jê re got emê çalakiyê bidawî bikin. Her wiha min diyar kir; "bes emê cardin daxwazên xwe ferz bikin. Emê ji bona çareseriya xalên ku xetimîne heta dawî tevbigerin û çalakiyê bidawî bikin." Muzaffer li dijî derket. Me bi îdareyê re nîqaş kir, bi giştî me gihand asta ku me dixwest. Me got; "yek-du xalên zêde ne esasî mane. Emê wan jî di pratîkê de bixin meriyetê." Me çalakî wisa bidawî kir. Di pêvajoya pey wê de TÎKB û dev-Solê em rexne kirin. Dixwestin vê mijarê li dijî me bikar bînin. Lê me dîsa jî bi nîqaşê bi wan da fêmkirin. Carê di nêzîkbûnên dijwar ên çepgirî de ferz dikirin. Wan mafê parastina qadroyan bi xwe re didît. Lê bi heman baldariyê nêzî qadroyên me nedibûn. Ev jî di siyasetê de fêlbaziyek cuda bû!

Girtîgeha Amasya, yek-du caran bi navber em neçarî çalakiyan kiribûn. Her carê çalakiyên rojiya birçîbûnê û rojiyên mirinê yên ji mehekê kêmtir nebûn, taqet bi me re nedihişt. Hêj em ser xwe ve nehatin êrîşek nû, seferberiya girtinên nû dihat

destpêkirin. Qadek zêde di raya giştî de nehatibû bihîstin. Weke din jî derve nav gel, di nav sazî û dezgehên demokratîk de rêxistinbûn jî tine bû, nû bi nû berxwedaniya girtiyan a li Amasya dihat axaftin. Ev jî hêmanek girîng bû. Ji ber malbat jî dûrbûn, nedikariyan werin cem hev û hêza çewsandinê ava bikin. Şert û mercên vê kêm bûn.

Muzaffer di navberê de nîqaş dikir û aciz dibû, digot; "gelo em nikarin ji bilî vî rêbazê rojiya birçîbûnê hinek çalakiyên din pêş bixin?" Me jî cidî nîqaş dikir. Digot; "her carê şêweyên yekser ên berxwedaniyê jî nabin. Nexasim dema vediguherin îsyanê, xeteriya wê zêdetir dibe. Dijmin jî bi xwînê jî be hewl dide biçewsîne û wê îsyanê bifetisîne. Ji bilî wê bi duruşme û bertekan jî nabe. Ger mirov personelan jî rehîn bigire, ew jî çareser nake. Di vê mijarê de hinek şaşî hene. Gelo em nikarin afirîner bin."

Belê, dijmin hewl dida me di zemînê wî ava kiriye de bi hev bide şerkirin. Ev jî ji bona wî polîtîkayek girîng bû. Di zindanê de tevî hemû êrîş û çewsandina dijmin, mekanîzmaya venêrîna ava kiriye, tevî hemû bêderfetiyan, jiyana civakî û siyasî birêxistin kirin, şikandina bandorên dijmin, kêmkirin, polîtîkayek zindanê ya li gorî têkoşîna derve, di xizmeta wê de, hêjayî wê avakirin û serwerkirin, xala herî girîng bû.

Ne rast bû mirov her tiştî bi mercên zindanê û rewşên li wir dihatin ferzkirin ve girê bide. Di heman demê de çareserkirina van jî bi wan ve sînorkirin ne rast bû. Me dizaniya dijmin êrîşên xwe yên li dijî zindanê de, dewl dida rojevê berovajî bike, dixwest enerjî û meyla girtiyan bêbandor bike, di nav hewldana fetisandinê de ye. Kêm zêde em di vê ferqê de bûn. Hem dixwest bi pêkanên çewsîner ve em nefes negirin, girtî di

nava pirsgirêkên xwe de bifetisin, hevûdû ve mijûl bibin, lê hem jî armanca wî ew bû bi vî rengî çalakgeriya girseya ji têkoşîna me bandor bûye bişkîne. Her tim li naverastên êrîşan de bigire, da ku wan di astek bilind de bixe.

Ya rastî taktîkek zêde xeternak û gelek hedef di nav xwe de dihewand bû. Di nameyên me ji hev re dinivîsan û heta nivîsên me ji hevalên derve re dinivîsand de lêgerînek hebû. Daxwazek hebû ku em vê kûrtir û bi şêwazek guncav rave bikin. Lê mijarek hesas bû, berxwedêrî hinek din ji hêla çors ve dihat fêmkirin. Li ser çekên herî bandor rojiya mirinê û rojiya birçîbûnê nîqaşkirin, dibe ku di serî de li nav avaniya me şaş bihatiya fêmkirin. Lê dema her tim qedexeyên herî biçûk li ser hev pêş diketin, yekser rojiya birçîbûnê, an jî çalakiyên dem dirêj ên her kes ji hal dixist dihat esas girtin. Nexasim li hember cihên çep diketin, biçûk, pêkhateyên dijminatî lewaz bûna, êrîşên bi vî rengî zêde pêk dihatin.

Niha jî întîfadayên fîlîstînê li Kurdistanê ne…

Bi riyên cur be cur hinek hejmarên kovara Serxwebûn dihatin ji me re. Me jî ew weke çavkaniyên perwerdeyê bikar danîn. Dîsa ji hinek dahûrînan hinek beş dihatin ji me re. Me bi birçîbûnek mezin ew dixwendin.

Pêşketina serhildanan moralek mezin ava dikir. Ji ber şerê me girseyî bibû, êdî girseya mezra, gund û bajaran di serhildanan de bûn, hêza dijmin a êrîşên li hember zindanan jî dişkandin. Bala her kesî li serhildanan bû…

Niha jî întîfadayên Fîlîstînê li Kurdistanê bûn. Ev jî di astek bêhempa de pêş diket. Kovara 2000'e Dogru jî tam di vê demê de pêşketinên heyîn weke ku berhemên wan e dida nîşan. Nedixwestin pêşketinên ku gerîla ava dike û bandora gerîlayên me ya di vê pêşketinê de bibînin. Dixwazin valahiya di vê eniyê de ew dagirin. Şerê me bibû zemîn ku, Doxu Perînçek

bikaribe biçe Cizîrê û li wan deran mitîngan lidar bixe. Demên din nedikariyan gavekê jî bavêjin. Navend û naverastên ku têkoşîna me ava kirîn pêş diketin. Di eniya siyasî de girse dihat birêxistinkirin, liv û tevger avakirin, di nava girêdanek kûr de hevgihîna bi gerîla re û hewldanên gihandina hev bêhempa bûn. Doxu jî, di ferqa vê zemînê de bû.

Serhildana girseyê û kombûna wan a li qada mitîngê bi çend axaftinên xwe ve girê dida. Dema digot; "me ew rakirin serhildanê" sixtekariya herî mezin dijiya. Baş bû ku pêşketinên heyîn di kovaran de diweşînin. Jixwe ji bona vê li hinek cihên Kurdistanê bihurdar jî be dikariyan xwe bigirin û bidin jiyîn. Li qadên legal tevkariya kovarên wisa, dibû şansek ku ew jî bikarin xwe rave bikin.

Kovarên Aydinlik'ê demekê bibûn nameyên îxbarê. Ew bûn sedem bi dehan mirov werin girtin, ceza bigirin û êşkenceyan bibînin. Kesên ji PDK'ê (Proleter Devrîmçî Aydinlik) li eywanên dadgehan ji bo şahidiyê bikin kêm nedibûn. Ew li hember gelê Kurdistanê sucdar bûn. Li hember doza Kurdistanê bi dijmin re li heman eniyê cih digirtin. Lê ger îro pêşketinên li qada şer dibin nûçe, daxwazên gel tên bilêvkirin, dikariya vê bikin rexnedanek pratîkî. Dikariyan bikin gavên ku êdî dev ji sucan diberdin. Dema me wisa digirt dest, me jî erênî dinirxand. Lê di vir de nêzîkbûnek wan a samimî, bingehê dostaniyê, çiqas esas tê girtin nediyar bû. Dê her rastiyên heyîn bi demê re bihatan zelalkirin.

Weke din jî hinek hêzên ku serhildan weke 'tevgerên jixweber' dinirxandin, an jî bi mitîngên Doxu ve girê didan di radeyek mezin de xwe dixapandin. Ewqas nirxên bi ked û xwînê dihatin avakirin, hezim nedikirin.

Dostaniya me ya bi hevalên Acîl'ê re kamil û bedew bû. Hevalên xort jî bi wan re li heman qoxuşê diman. Pêşketinên li derve hêvî dida wan jî. Kêfxweşî, serkeftin û şahnaziya şoreşa Kurdistanê jiyîn, bi serê xwe bes e ku mirov xwe li ser piyan bigire. Wan hevalan jî hewl didan van bandoran di nava hevalên koma xwe de jî bidin diyarkirin. Di nivîsên xwe yên dişandin derve de bi rexne û pêşniyarên xwe ve gelek rastî radixistin ber çavan.

Nîqaşên me yên gerim ku di sala 88'an de dimeşiyan, li Amasya hinekê jî bi rêbazên cuda de didomiyan. Min got; "sala 90'î sala Rizgariyê ye. Dê veguhere raperînên gelemperî. Li Kurdistan û Tirkiyê mercên raperînan pêş dikeve." Hevalan jî tiştek zêde xeyalperest dinirxand. Bêguman di nav de xeyal jî hebûn. Lê bi qasî pêşketinên rû didan hêvî û hîsên mezin dida avakirin. Dema serhildan jî girêdayî gerîla pêş diketin, ev hêvî zêde dibû. Heman weke pêşketinên ku piştî 15'ê Tebaxê, me weke pêvajoya êrîşên stratejîk dinirxand niyetek baş a zêde nepixandî pêş diket. Serhildanên ku pêş diketin, vê carê jî bi min re nêrînek ku dê serhildanên çekdarî pêş bikevin ava dikir. Ev jî ne mijarên dervî rastiyê bûn, lê ne pênaseyek rast a rastiya heyî bû.

Yekem car bû girtîgeh wisa ji min re teng dibû û min nedikariya li zindanê rawestim. Di nava wê herikbariyê de cih girtin, daxwaza coşa wê jiyîn, dibû sedem ku ez her roj plansaziya firarek nû bihizirim. Min riyên gelekî xeternak jî diceribandin. Çend caran ser ban li riyên revê geriyam. Me ji paçan sêlim çêdikir, di wextek çirkan de dihilkişiyan û dadiketin. Vê jî kelecanek ava dikir. Ev ceribandinên bi armanca keşifkirina cihê quluban û derdor dihat kirin, her tim

bi hinek kêmasiyan ve encam dibû. Her carê min digot; “divê mîsoger vê serbixim.” Lê me her carê dawî qehra binkeftina xwe jiyan dikir. Ew sebra Muzaffer a mezin jî kêrî tiştekê nedihat. Ceribandin, planên bi lezginî dihat kirin didomiyan.

Gelo hezkirina belayan hezkirina qetla xwe ye?

Ji aliyê Şener ve her tişt tevlîhev bû. Sûprîzek em ne li bendê bûn pêş ket! Şener hatibû girtin û biribûn leşkeriyê. Di kêliya em li bendê bûn derkeve derve de, vê agahiyê bandor li min û me tevan kir. Ma mirov ewqas li Stenbûlê namîne! Hem malên lê dima çawa bûn, kî bûn, ew jî nediyar bûn. Me hinek texmîn dikir û baweriya xwe bi wan nedaniya. Lê dema me hevdîtin bi hevalan re kir, dihat gotin ku dema çûye randewiya hevdîtinê hatiye girtin. M. Eksen û hinek kesên li cem hebûne. Em wan nas nakin. Weke biwêjek tirkî, ‘Mihemed hezar mihemed!’ (“sarı çizmeli Mehmet Ağa” Me digot; “dibe ku, kesên hatine randewiya wî ne heval bin.” Şîroveyên me yên derbarê vê mijarê de, zêde nebaş in. Pişt re telgrafek şand. Hevalên li girtîgeha Amedê derbarê girtina wî de hinek tişt nivîsandibûn. Agahî şandibûn ku red kiriye cilên leşkerî li ber xwe bike û quralan pêk bîne. Van agahiyan jî em kêfxweş kirin. Min got; “ger dê hinek tişt pêk werin jixwe divê wisa be. Divê kesek PKK’yî teqez wan cilan li ber xwe neke! Me têkildarî vê mijarê nivîs jî nivîsandibû. Hinek fermanên me hebûn. Lewma divê di serî de jî em pêk bînin. Divê Şener jî mîsoger vê gavê bavêje.” Ji ber dijî wê qet nahizirim. Leşkerî suc bû.

Beriya wê Heyderê ji Qisleyê nameyek şandibû. Ji ber ji leşkeriyê şandibû em metel mabûn. Di nameya xwe de dabû diyarkirin ku; “Dîlawer jî hatiye girtin. Lê ew dixwaze biçe serdanê. Diyar kir ku dê min jî bi xwe re bibe. Ez jî li bendê me. Mirov nikare rojek tenê jî li vir bimîne.” Hinek tişt veşartî bi zimanê ku îdare fêm neke nivîsandibûn. Lê me fêm dikir. Nexwe Dîlawer jî hatibû berdan û yekser birine leşkeriyê. Ew jî hewl dide destûra serdanê bigire, da ku bikare derkeve dervî welat. Malbata wî berfireh bû, dikariyan karên wî yên bîrokratîk çareser bikin. Hinek mirovên wî yên polîs jî hebûn. Me got; “ger bikare baş birêxistin bike, dikare zû derkeve dere.”

Pişt re li gorî em hîn bûn derketibû. Lê haya me zêde ji wê pêvajoyê nebû. Lê heman salê di sala 88’an de me agahî girt ku, xwe kuştiye. Me ti wate neda wê rastiyê. Gelo ji ber biribûn leşkeriyê nekarîbû qebûl bike. An jî çûna wî ya leşkeriyê şaş hatibû fêmkirin? Me jî nedikariya ti şîroveyê bikin. Ji bo parêzer Mehmud jî dihat gotin, weke cîgirê serbaz leşkertî kiriye û pişt re derketiye dervî welat. Dihat gotin ku ew hatiye kuştin. Mijarên hesas bûn. Partî şaşiyan nake, baweriya her kesî jî bi vê hebû. Lê me ti wate nedida miroveke piştî salan xwe digihîne partiyê û xwe dikuje. Fêmkirina vê gelekî zehmet bû.

Nexasim kesên di qoxuşa qaçaxçiyan de zêde bandor bibûn. Cantûrk jî li Mamakê pê re mabû, çavên wî jî tije rondik pirsî bû; “xwîşka min çi bêje ezê bawer bikim. Tika dikim bêje. Partiyê ew kuştiye an na? Ji ber ew ne kesek wisa bû, xwe bikuje. Ez wî nas dikim.” Dema min got; “mîsoger dizanim partiyê ew nekuştiye, yeqîn bike.” Rondikên wî di hinarkên

rûyê wî de herikîn. Got; “bila ne fîşeka partiyê be, çi dibe bila be! Ji ber ew pir zehmet e.” Ez dihizirîm; “gelo wî çi qebûl nekiribû?” Ew pirs di serê me hemûyan de hebû.

Me yên ku ew nas dikir zêde ser nîqaş kir. Min Dîlawer li Elezîzê nas kir. Hamilî jî ji nêz ve nas dikir. Gelo dibe ku Mamakê Dîlawer guhertibe? An jî ew dema kin a leşkeriyê bandor lê kiribû? Her tişt weke girêka kor bû. Dema tiştek zelal di destên mirov de nebe, ti feydeya nîqaş û şîroveyan jî tine bû.

Dema leşkertiya Şener jî ket rojevê, gumanên me yên bi vî rengî pêş ketin. Dê dijmin çi ji kesek weke endamê PKK’yî darezandî bike? Birina leşkeriyê, leşkertî kirin, ji aliyê rêgez ve çep diket. Ger bi zorê jî bibin, bandora ku ev rewş bi kesayet re ava bike girîng bû. Encamên wê rû didan û dê pêş jî biketa. Girtîbûn rewşek cuda bû. Girtîbûn dijminatiyek rû bi rû bû. Dijmin diranê xwe laşê mirov re dike. Tevî vê rastiyê dil û mejiyê xwe saxlem girtin û xwe kêrhatî dana jiyîn gelekî girîng bû.

Leşkertî qada herî girîng a dijmin polîtîkayên xwe yekser bi amûrên çalak ve jîndar dikir bû. Hêza di eniya xwe de bi destê vê saziyê derdixist holê. Di vê rêbazî de ji emîr-komuta bi zorê li zindanê pêk danî, zêdetir armancek mezin hebû. Lewma diviya an mirov yekser firar bike, an jî mirov cilan li ber xwe neke, quralan pêk neyîne, çeka dijmin negire û li ber xwe bide. Ji bilî vê ti rê nebûn. Ya yekem êdî zehmet bû ku, mirov di nav wan mercan de bijî. Ji ya duyê destpê kiribû. Me digot; “dê bi wan rêbazan di bin venêrînek tund de bigirin, da ku derfetên revê nebînin.” Ango, dîsa di girtîgehê de bûn. Jixwe agahiyên dihatin jî bi vî rengî bûn. Min yekser rewşa heyî ji Muzaffer wan re ragihand; “divê em ji raya gştî re

ragihînin. Nexwe dê mîsoger bikujin.” Ji ber dijmin hezim nedikir. Di KT de li dijî leşkeriyê derketin, nedihat efûkirin. Gumanên min jî ev bûn!

Me bi nameyan ji parêzeran re ragihand. Heta me ji hinek rojnameyan re nivîs şandin. Îlhan Selçûk di qunçika xwe de cih dabû nivîsa me. Parêzer jî naveroka nameyê heta radeyekê di çapemeniyê de diyar kiribû.

Karasu ew jî ketine navberê kar dikin. Lê ew ji Şener re agahî dişînin, dibêjin; “helwestek wisa pir vekirî li pêşiya firaran digire, ne rast e, bila cilên xwe li ber xwe kin û firsendekê bibînin, yekser birevin. Nêzîkbûna herî rast ev e.” Agahiya me jî ji vê nebû. Ez jî bê navber ji gelek cihan re name dinivisînim. Min got; “divê mirov malbatan hişyar bike.”

Ya rastî di bin vê hengamê de gumanek hebû. Helwesta Şener a di berxwedaniya Çileya 84’an de, deriyek bû û qelsiyek jiyan kiribû. Kesayetên hatine ceribandin, ezmûnan re derbas bûne, wisa bi mirovan re guman, heyhedanê ava nakin. Guman û heyhedana wan cuda ye. Hinek hevalên wisa hene, hemû lîstokên dijmin li ser wan were lîstin, hemû hovîtî werin ceribandin, tenê êş û tirsa windakirinek fîzîkî bi mirov re pêş dikeve. Aliyê din hêz dide. Kîn û hêrsa mirov birêxistin dike. Baweriyê naşkîne. Ji ber vî aliyê Şener ê qels, her tim bi min re bertekên wî biparêzim, rizgar bikim pêş dixist. Ji ber min hêviyek bikare xwe derbas bike, bihêz bike û wî derî bigire pê re didît. Weke ku min ew ji binê bîrek kûr derdixist. Hatibû heta cihekê. Ger bikare ji wir jî derkeve, dê tirsa wî ya ‘ketinê’ jî xilas bibe. Di nêrînên min ên derbarê wî de, ev niyeta baş jî hebû.

Salîha hat Amasya. Dê ji wir biçe Tokatê serdana Şener. Dibêje ji Ceyhanê, ji cem Karasu hatiye. Karasu ji bo Şener gotibû; "bila biaqil tevbigere." Agahî jê re şandibû. Zêde baweriya min bi Salîhayê nedihat. Lê min texmîn dikir ku, dibe Karasu weke nêzîkbûnek taktîkî westibe wisa tevbigere. Dîsa jî min not nivîsand; "wê tu cilan li ber xwe nekî. Ger te helwestek wisa raber kiriye, gav paşve ne avêje. Em jî raya gştî ava dikin." Notek biçûk bû, lê min ji Salîhayê bawer nedikir. Ji ber wê sibehê hatina Salîhayê bi serê xwe bû bûyerek. Kesên werin serdanê hatibûn. Dê saeta serdanê destpê bike, agahî hat ku Salîha bi neviya xwe re hatiye binçavkirin. Ev jî bû sedem em helwest raber bikin.

Em bi gelemperî li hember nêzîkbûnên dijî kesên dihatin serdanê hesas bûn. Dema dihatin serdanê helwestek wisa li beramber wan dihat pêkanîn, me asayî nedidît. Ji ber gefek li hember malbatên din jî bû. Helwestek dixwestin vîna wan bişkînin bû. Me jî şîrove dikir; "mîsoger Salîha dîsa notên bi xwe re dane girtin." Ger hêj hinek kesên bi rêya Salîhê not dişandin hebin, ehmeqiyek mezin dikin. Em aciz bûn. Ji ber kesên hatin serdanê derbasî hundir nekirin, me jî protesto kir. Me duruşme qêriyan. "bila dawiya çewsîneriya li ser malbata bê!" Roja cejnê serdana vekirî pêk tê. Ji gelek cihan malbat hatibûn. Dema dijmin nedixwest serdan pêk werin, hêcetên cuda derdixist pêş. Wê demê pirsgirêk çibû? Me dîsa got; "mîsoger provakasyon e." Lê ev li dijî çi bû, me baş fêm nedikir.

Ger xwesteka wan Salîhê baş bi navûdeng bikin be, jixwe têra xwe bi navûdeng bibû. Lewma me got; "mîsoger not hatiye girtin." Çalakiya me ya protestoyê kin domiya. Îdareyê

bi hevalên nûner re hevdîtinek pêk anî. Gotibû; “pirsgirêkek me derbas dike. Ne bi me ve eleqeder e. Polîsên sivîl ew girtine. Birine qereqolê. Lê gerîne û berdane. Salîha bi neviyek xwe kêmendam ve tê. Salîha li benda hewayek cuda bû. Lê ez û Muzaffer bi hev re pê re axivîn. Dîsa bi nêzîkbûnek xwe dikir qurban heygameyek derxistibû. Xwedêyo, dayîkek çawa bû? Ji aliyekê ve nedikariya aciz bibe, lê ew hengame û heyhedana wê û xisletên wê yên bûyeran ava dike em tengav dikirin.

Digot; “serî heta binî ser min geriyan.” Dawa xwe rakir û şanî me kir. Digot; “heta dirûnê cilên min jî temaşe kirin. Ji min pirsîn, ‘tu diçî kuderê? Tu çima hatî? Wê tu hevdîtinê bi kî re bikî?’ ew ne polîsên vir bûn. Polîsên Amedê bûn. Ez wan nas dikim, ji wir pey min ketibûn.” Ev axaftinên xwe bi israr dubare dikir. Me jî got; “carek din newe. Tu pîr bûyî. Nexweşî. Ger te di rê de bigirin, agahiya kesê jî çênabe.” Lê wê bi israr got; “ezê ji vir biçim Aydin û Çanakkaleyê.” Me bi zorê qane kir. Lewma min not nedayê. Lê min wêneyek biçûk dayê. Li pişt wê jî çend gotin nivîsand; “ez te bê ku taxima cil û bergan li ber te be silav dikim. Xwe baş binêre. Bila tenduristiya te jî baş be.” Salîha çû. Her çendî nivîsa min û Karasu bi nakok jî be, min nedikariya cuda binivisînim. Lê dîsa jî ya diyarker helwesta Karasu wan bû. Li gorî rewşa heyî ji aliyê mantiqî ve rast e, ev kar nehêsan bûn. Lê dîsa jî em kevneşopiyek nû bidin destpêkirin. Daxwaza min a bila Şener vê bike, xwe ispat bike hebû. Ez bawerim ev daxwaz jî ji ber nerehetiya min a hundirîn pêş diket. Ya rastî min dixwest qelsiya di sala 84’an de hatiye jiyîn berovajî bikim û min ev ferz dikir. Her çendî vê pir bi zanebûn û vekirî nekim jî, hîsên min ez ber bi vê ve dibirim.

Min pêdivî didît ku bi Muzaffer re bi-axivim. Min jê re behsa têkîliya di navbera xwe û Şener de kir. Min behsa rewşa têkîliya bi Hamilî re jî kir. Her tişt çawa pêk hatiye, weke heyî vegot. Muzaffer li miqabilî min rûniştibû, ez jî bêguman di-axivîm. Bi rêhevalekî xwe re di-axivîm. Bi hemû kêm û kurtî, nebesî û şaşiyên heyîn ve çi pêş ketibû min hemû vegot. Ya rastî dema ez bi Şener re axivîm, gotibû; "dê ev têkîlî di pratîkê de mîsoger bibe. Pratîka me ya têkoşînê ewlekariya yekemîn a vê têkîliya me ye. Kî ji me destpêkê xwe bigihîne partiyê, dê ji Rêbertiyê re bêje. Dê ew jî bibe erêkirin û biryardariyek." Me wisa soz dabû hev. Lê min dîsa jî hewce dît ku, ji Muzaffer re vebêjim. Gelek sedemên vê hebûn. Çi dibe bila be, asta sozek di navbera du kesan de, divê veşartî nemîne. Ji ber vê jî ez aciz dikirim. Min li Amedê xwest bi Fuat re bi-axivim. Min xwest bi Şamîl re bi-axivim. Lê mixabin her carê Şener ez qane kirim û got; "heval ranakin. Dê girêdana wê bi xirabûna têkîliya te ya bi Hamilî ve çêbikin. Bertek raber bikin. Weke din jî kes naxwaze te ayîdê kesî bibîne. Min jî nexwest wisa bibînim. Ez ji helwesta xwe dizanim."

Belê, ma ne herî zêde jî min qebûl nedikir ayîdê kesî bim. Gelo mirov çawa dibû ayîdê yeke din? Ma mine ew di jiyana xwe de red nekiribû? Duruşmeya min a herî mezin jî "na, ev têkîlî cuda ye!" bû. "na, cuda ye, ev têkîlî cuda ye!" Yê herî baş ev dizaniya jî, Şener bû. Ji ber ez ji hezkirinê neditirsiyam. Yê ku ji hezkirina min ditirsiya Şener bû. Ev jî vekirî digot. Min jî her tim digot; "nabe mirov ji hezkirinê bitirse." Hezkirin nade tirsîn. Wê demê tu çima ditirsî? Hem zêde pîroz dikir, hem jî ditirsiya. Ev nakokî bû. Ev nizanim… çi bû, nikarim dawiya vê pênaseyê bînim. Ji ber ew îhtîmal pir kûraniyê de

bû. Lewaz bû, tenê di asta hîskirinê de bû. Di hezkirinê de xapandin û durûtî nedibû. Em dev ji van berdin, min digot; "divê kêmasiyek herî biçûk jî çênebe." Ez jî çiqas xeyalperest bûm. Ûtopya min a hezkirinê çiqas ecêb bû…

Min ji nakokî û şer hez dikir. Kêliyek bê şer jiyîn, weke êşkenceyê bû. Şer xweş bû, şer dihişt ku mirov bijî. Şer hêz dida mirov.

Gelo çima çavên Muzaffer ên şîn, an jî ber bi rengê kesk ve şil bûn? Gelo wî jî nedixwest ez ayîdê yeke din bim? Mîsoger di wan çavên wî yên watedar de ev mijar hebû. Ji dil bûn, zêde dilnizim bûn. Di bertekên wî de hesûdiyek watedar hebû. Tiştên diyar dibûn ne erzan, fersperest û bihêrs bûn. Weke guman û hîsên rêhevaltiyek kûr ên lê didan xwe dida der. Lê hinde ew rêhevaltiya me ecêb bû, weke ku ger em rastiyan bêjin, dê hinek bişkên. Xweziya ew rastî di berdêla şikestina hinek tiştan de, bi dengê bilind ji min re vegota. Dema min behs dikir, destê min di nav her du destê wî de bûn. Piştre serê min xist navbera her du destê xwe, ber xwe ve kêşa û serê xwe li serê min da. Çend caran dubare kir. Got; "ez tiştekê nabêjim. Di çavên şîn de tiştên ku mirov dixwaze diyar nabin û nayê nivîsandin. Çavên min jî şîn in. Em çi bikin?" Van nêzîkbûnên min bi min da hîskirin ku, Muzaffer vê têkîliyê erê nake. Min ev hîs kir. Piştre me bi hev re demek dirêj volta avêt.

Ez ne ayîdê hinek din bûm. Lê ez mîsoger bi hinekan re tiştên ayîdê xwe, an jî me digeriyam. Min ew zêde diparastin, ji xwe zêdetir xwedî li wan derdiketim û diparast. Belê, di hezkirinê de xeternakî, di hezkirinê de xumar, di hezkirinê de bidestxistin û windakirin hebû! Ez qet li ser van hemûyan bi hev re nehizirîm. Lê min tiştên xeter û bela hez dikir. Gelo ji belayê hezkirin, weke tiştek ji qetlê xwe hezkirinekê bû?

Piştî demekê Şener nameyek dirêj şand. Ji Tokatê, dabûn girtîgeha Bayburdê. Dirêj nivîsandibû. Daye diyarkirin ku, destpêkê cil li ber xwe nekiriye, ji ber pişt re hewce kiriye lewma li ber xwe kiriye. Ev jî li zora wî çûye. Li cihekê nivîsandiye; "ez neçarim lewaziyek xwe jî ji xwîşka xwe re binivisînim. Tu dizanî ku tiştekê naveşêrim. Ez li hemberî bînbaşiyekî bûm. Min xwe negirt giriyam. Nebaş bû, rondikên çavên min dît. Ev jî binkeftin û bêçaretiya min bû." Me di nameyan de nîqaş dikir. Ez jî dişînim navnîşana ku li Awrûpa destnîşan kiribû. Ango ne rasterast diçû. Nav nanivisînim, tenê li binê wê 'xwîşka te' dinivisînim.

Dema ji Tokatê ber bi Bayburdê ve diçe, bi Amasya re, ber girtîgeha me re derbas bûne. Belê, zindan û leşkerî! Nikarim qebûl bikim. Ger agahiya mirina wî bihata bi qasî vê bandor nedikir. Me bavê Cahîdê kir navberê. Em bi Koç Elî re vekirî axivîn. Maşîn û pereyên wî jî hebûn. Me jî hinek pere danê. Me got; "biçe hevdîtinê bi Şener re bike. Paşnavê we yek e. Weke xizmê wî biçe. Mîsoger wî bibîne û li hev bikin. Bila firar bike. Divê rojekê jî li wir nemîne." Me ji Koç Elî re jî got; "dibe ku dijmin bikuje. Lîstokê bîne serê wî. Dikarin bêjin dema firar kir hat kuştin." Em van tiştan jê re dibêjin, da ku cidî bigire û pêk bîne. Koç Elî soz da û got; "temam."

Demek kin derbas bû, telgrafek Şener hat. Dibêje; "em niha bi zavayê xwe re li xwaringehekê xwarinê dixwin. Tam hewayek bêhnvedanê ye…" name ji Antakya hatiye şandin. Nexwe Şener firar kiribû. Min yekser telgraf ji Muzaffer re şand. Em kêfxweş bûn. Şener xendekek din derbas kiribû, bila vê carê neyê girtin. Nameyek wî ya din jî hat, lê vê carê zêde bibertek nivîsandibû. Diyar dikir ku, bi Yildiz Durmuş re

hevdîtinek telefonê kiriye, nîqaş kirine, li şûna hewl bide wî fêm bike, jê re gotiye; “uslubê xwe rast bikar bîne.” Rexne lê kiriye. Ger ev nêzîkbûn wisa berdewam bike, ezê li şûna biçim cihên dojehê, biçim mirinê baştire. Min neçarî vê rastiyê dikin.”

Ev jî ji kur derketibû? Dixwest çi bêje? Çima evqasî bêçare û û di nav telaşê de ye? Mirov dema derve be, dikare mîsoger rêyek xwe bibîne û derkeve derve. Ya rastî dema min jî li Meletî firar kirî, çareyek ji xwe re nedîtibû. Lê wê demê cuda bû. Jixwe zavayê wî jî li cem bû. Na, nêzîkbûna wî ya dîna ye. Ev heyhedan ji lewaziya wî derdiket pêş. Fikira mirin û gorê rebentî bû. Ez jî di vê mijarê de hêrs dibûm. Aliyekê ve jî gumanê min pêş diket. Gelo dibe ku tiştekê bîne serê xwe. Giriyam. Ji Yildiz wan aciz bûm. Qet nebe bila ew hinekê kamil û çareser nêz bibin. Gumanên min tam dijwar bûne ku, dibe belayekê bîne serê xwe. Muzaffer ez rexne kirim; “ez wî nas dikim. Heyhedanê derdixe. Waswas e. Dema tiştek nekeve serê wî, hengamê derdixe. Gumanên te vala ne. Tiştekê nake. Ma zarok e?”

Dema ez hedirîm rûniştim û min jî nameyek dirêj nivîsand û şand navnîşana wî ya Awrûpa. Min tund rexne kir û got; “ew çiye hema piçekê tengav dibe û zehmetiyan dijî yekser mirinê dixwazî? Ma ev gef in? Ger wê tu biçî biçe, heta dojehê pêşiya te vekiriye.” Min yekem car bû bi uslubek wisa dinivîsand. Ji ber weke din hişê wî ne dihat serê wî. Nizanim name ketibû destê wî yan na. Em hîn bûn ku, derbasî Yunanîstanê bûye. Bi telgrafê agahî şandibû. Pişt re jî nameyên wî hatin. Behsa Akropolîs û deryayê dikir. Pişt re jî diyar dikir ku li bendê ye biçe Akademiyê. Êdî hinekê rehet bûm.

Hinek hevalên li Acîlê (cihê rewşa lezgîn) ji Samsunê bûn. Me ji wan rewşa nexweşxaneya dewletê ya Samsunê pirsî. Li Amasyayê derfet kêm in. Zêde kes li qadê tine ye. Dibêjin; "Samsun di vê mijarê de baştire." Binyata wê ya civakî cuda ye. Ger ew jî hinekê alîkarî bikin, mirov dikare ji wir bireve. Hevalên derve jî, dikarin alîkariyê bikin. Ew jî bi dil û can qebûl dikin. Piştewaniyek baş a mînak hebû. Dê bê gotin; "şoreşgerên ji Tirkiyê, şoreşgera ji Kurdistanê ji nexweşxaneyê revandin e!" Fikira vê jî xweş e. Dihat gotin, "derfetên rê jî hene." Ya girîng jî mirov van derfetan hemûyan bîne cem hev û encamekê ava bike.

Berî her tiştî sewka xwe dana pêkanîn bi serê xwe pirsgirêke. Doxtorê cerrah ên erzingê (çene) li her derê tine bûn. Min dikariya erzinga xwe ya xwe ya li Amedê xwehir bûye, li Samsunê rast bikim. Doxtorên nexweşxaneya leşkerî ya Amedê gotin; "nabe." Hinekan gotibû; "divê demek dirêj di nava alçiyê de bimîne." Wê demê Amasya bajarek biçûk bû, min dikariya vê bikim hêcet û sewka xwe ji bo Samsunê bixwazim.

Bes, di wê navberê de planek din hat bîra me. Dibê ku ev rê neyê hişê kesî. Mala ku mudurê girtîgehê lê dima, bi qoxuşa me ve bû. Şibakeyên mala wî raserî cihê hewagirtina me bûn. Lê ti girêdana wan bi hundir re tine bû. Deriyê ji aliyê derve de vedibû. Girtiyên adlî yên di qoxuşa me de jî, biribûn qoxuşek din a beşa jinan. Korîdora wan cuda û hinekê jî dûrî me bû. Di çûnûhatinên serdanan de, dîsa di çûnûhatinên cem îdareyê de, korîdora jêr a qeta em lê diman bikar danîn. Aliyên din ji bona me bûn. Vê jî derfetek mezin dida me.

Gardiyanên jin neçarin her du aliyan jî binêrin. Jixwe piranî li cem wan diman. Ji ber wir zêdetir rehet tevdigeriyan. Weke din jî me ji wan re gotibû, ji bilî rojên lêgerînê, divê ti caran bê destûr nekevin qoxuşa me. Di peywendiyên xwe de jî hişyar nêzî vî quralê me dibin. Em destûrê nadin ku tevlî her qada jiyana me bibin. Ev jî bi demê re hatibû bidestxistin. Destpêkê her kêliyê diketin hundir û derdiketin. Ji ber vê gelek caran şerên me çêbûn. Carê me bi zorê pevçûn derdixistin. Nexasim diviya rêyên peywendiyên me yên bi hevalan re qet nezanibin. Bes paşê hîn bibûn. Carê dema gilokên me ji nava nan çêdikirin ji me re dihatin, ji ber her tim di kemînê de amadebûn, dixwestin xwe bavêjin wan û bigirin. Piştî me şerek dijwar dikir, bi zorê ji destê wan derdixist. Hinek notên me jî diket destên wan. Dibûn sedema dozên nû.

Me dikariya em ji dîwarê qoxuşa piştê, ber bi valahiya bin merdîwena mala mudur ve, di dîwar de kunekê vekin. Me hesabê her tiştî dikir. Bi qasî tam di zîvroneka valahiya merdîwenê de vebê, em tespîta dikin. Me xetek bi qasî em bikevinê destnîşan kir. Me li cihê dîwanê tam cihê em doşekê datînin û dema betaniyê serde diberdin, bi şêwazek nexwiyê me qepaxek vekir. Me qasî cihê vebûye texteyek anî. Me çend parçe texte kirîn. Ji bona bal nekişîne çend alavên weke paçê wêne, boyax, qarton û alavên wêneyan kirîn. Hunera Cahîdê ya ji vê hêlê ve di wir de jî kêrî vî karî dihat. Wêne çêdikir û neqiş dikir. Vî karî bala gardiyanên jin dikişand. Hemûyan jî cihazên xwe çêdikirin. Qenewîç û dantêl di destên hemûyan de hebûn.

Me destpêkê beşa siwaxa bi dîwar ve derxist. Hişyariyek mezin dixwaze. Dengek herî biçûk a ji dîwar derkeve, diçû heta mala mudur û odeya binya wê ya gardiyanan. Gardiyan hînî

rêbazên me bibûn. Ji bona bizanin tûnel tên kolan an na, wan jî erd û dîwar guhdar dikir. Me zêdetir di demjimêrên rojê de kar dikir. Şev nedibû. Bal jî nedikişand. Şev jî dema di tev de filmên balkêş û girîng hebûna me kar dikir. Di wê demê de filma herî balkêş 'Marîa' bû. Hemû gardiyan di wê demjimêrê de li ber tv diman. Min jî ji bilî nûçeyan televîzyon temaşe nedikir. Lewma tinebûna min zêde bala wan nedikişand. Tv li qata jêr, di beşa xwaringehê de bû. Qoxuşa me karê kolanê jî lê dikir, ji wir pir dûrbû.

Di xercê de radeya beton, çîmentoyê zêde bû. Navbera û hundirê blokan tev çîmento bû. Spir saxlem û taybet hatibû çêkirin. Mîsoger hemû çîmentoya cîhanê ji bona wir bikar anîbûn. Bist û destikê kevçiyên di destê me de jî baş bûn. Lê ya me jî weke em bi neynokên xwe çiya kon bikin, encamek bû. Ger me derfetên helandina betonê nedîtiba, dê gelekî wextê me bigire. Emê madeyek helandinê ji kur peyda bikin? Mirov çawa dikariya hesin, heta betonê bihelîne? Em ji Muzaffer wan hîn bûn. Me bi şiringayê asîd diberda ser. Lê dîsa jî weke me dixwest lez çênedibû. Karê me zû pêk nedihat.

Hevdîtinek vekirî yek din pêk hat. Me ji partiyê re jî ragihand ku, nêrînek me ya firarê heye. J bo me nasname hewce dikir. Her wiha hinek wêneyên guncav. Zehmet bû em mekîneya wêneyan derbasî hundir bikin. Me hinek kirin navberê. Tenê me pozên wêneyan derxistan derve, besî me bû. Me porên xwe bi şêwazên cuda çêkirin. Weke din jixwe dikariyan li ser wêneyên ku hatine şandin hinek din bi montajan rast bikin. Yilmaz Daxli hat serdana me ya vekirî. Ji qada Akademiyê hatibû. Nameyek biçûk û kin a Şener jî anîbû. Dibêje; "min lez nivîsandiye." Dilxwede dê di reva me de

Yilmaz alîkariya me bike. Em berî wî li ser bavê Cahîdê dihizirîn. Baweriya me bi wî zilamî nedihat. Lê mîsoger keça xwe jî nedixist nav xeteriyê! Em di vê mijarê de bi xumarê dilîstin. Ya rastî hemû karê me dikir xumar bû! Wê Yilmaz karê nasnameyên me pêk bîne. Me hesab dikir texmînî dê çiqas wextê de amade be. Me got; "divê bê ku dereng bikeve, nasnameyên me werin."

Di wan rojan de tûnela Dev-Sol'ê derket holê. Em şevekê bi duruşmeyan hişyar bûn. Ser wan de digirin û tûnel derdikeve holê. Bextreşiyek bû. Roja paştir li her derî geriyan. Ji ber bala wan li ser tûnelê bû, zêdetir li qatên jêr, beşên tuwalet, cihên nû û bin erdê digeriyan. Cihê me gelekî saxlem e. Me deriyê wê bi alçi û kilsê siwax kiriye. Me dermanê zeliqandinê lê daye. Lewma em dikarin yekser deriyê wê bigirin.

Em rojnivîs, nivîsên cur be cur, notên me tevan ên ser hev kom bûne parçe parçe dişînin Awrûpayê. Em hemû nameyan jî dişînin. Ji ber em carê nivîsên weke nameyan jî dişînin, zêde balê nakişîne. Em hinek nivîs û rojnivîsan jî yekser bi dest dişînin. Hevalê Hesen Atmaca û Yildiz li Awrûpayê ne. Heman demê hevalê Cuma jî li wir bû. Dema me bihîst li Awrûpayê ye, em metel man. Em carê ji hev re dinivisînin. Carê Hesen henek dikir digot; "posta ji bona we kar dike." Zerfên mezin ên zer tije diçin ji wan re. Êdî postaxaneya Amasyayê têra me nake. Ji bona bal nekişîne, em postexaneyên qezayên biçûk jî bikar tînin. Bes agahiya me nebû çawa diçe. Em pişt re pê hesiyan ku dijmin yek bi yek vedike, bi mekîneyê jiber digire, cardin pakêt dike û dişîne. Ji bona saxlem digihiştin cihê xwe, me jî ti şik nedibir.

Min bi sedan name nivîsandin. Her roj navnîşan û navên ku min name ji bo wan dinivîsî, zêde dibûn. Tenêbûn û birçîbûna salên derbasbûyî wisa temam dikim. Ez bikarim xwe bigihînim kî û kuderê ji wan re dinivisînim. Bi nivîsê xwe digihînim wan. Ger firsendek wisa heye, bi rêya nivîsê jî be, behsa têkoşîna me kirin, danasîn û bi vî rengî girêdanek xwe ava kirin, tişta herî xweş bû. Zêdekirina tenêbûnê jî wisa pêk dihat. Di vê mijarê de girîngiya tenêbûnê zêde bi qîmet dibe. Çawa min di cihê hewagirtinê de qase, tabûre datanîn erdê û her yek bendavê re navek çiya lê dikir, weke ku dihilkişim çiyan bi saetan baz dida û bêrîkirina xwe wisa derbas dikir, di bin baranê de heta hemû bedena min şil bibe dimeşiyam, di berf û sermayê de, cihê hewagirtina qerisî de dimeşiyam, min dixwest bi vî rêbazî girêdanekê bi jiyan û gerîlayê çiyê re bijîm, çawa hest, bêrîkirin, xeyalên wê weke pêdiviyekê derdiket holê û min jiyan dikir, nivîsandin jî rêyek cuda ya gihandina her kesî û her derê bû.

Min rojnivîs bi navê Şener dinivîsandin. Ya rastî weke rojnivîs min hemû kêliyên jiyanê dinivîsandin. Nivîsandina rojnivîsan fêrbûnek bû. Bibû parçeyek jiyana min. Min li Amedê jî dinivîsand. Her kêliya ku derfetê nivîsandinê hebûna, min ji dest bernedida. Dema hevalan li ser pelek biçûk not dinivîsandin û dişandin, ez ecêb dimam. Ger derfet nebûna, an jî xeternak bûna, li ser qaxidek biçûk nivîsandin têrê dikir. Ev asayî bû. Min jî gelek caran li ser qaxidên biçûk nivîsandiye. Lê dema derfetên baştir ava dibûn, her tiştê dihat jiyîn berfirehî nivîsandin zewqek cuda dida min. Weke peywirekê bû. Lê ew nivîs piranî bi tiştên hatine jiyîn ve girêdayî bûn. An jî bi hestan barkirî bûn. Bala min li hember nivîsên nirxandinên

siyasî û lêkolîn û vekolînê kêm bû. Ji bo nivîsandina wan mijaran lêhûrbûnek kûr hewce dikir. Hêj pirtûkên me dixwestin nehatibûn. Salên dirêj bê xwedin derbas bibûn. Pêvajoyên rojiyên birçîbûnê jî xwendina me bandor dikir. Lê dîsa jî xisleta nivîsandin û nirxandina pêvajoyên ku hatine jiyîn hebû. Ew rewş parvekirin û dana nasîn pêdiviyek mezin bû.

Dema min jiyana zindanê weke hatiye jiyîn di rojnivîsan de destnîşan dikir, ez rehet dibûm. Me yek renga heyî, jiyana her tim wek hev wisa derbas dikir. Me di wan rojnivîsan de nîqaşên xwe, hestên xwe, bertekên xwe pir vekirî rave dikir û bê ku ti sînoran nas bike datanî holê. Ev jî fêrbûnek bû. Çawa dihizirîm, min çawa xeyal dikir, xewnên min çawa bin, li hember bûyerên rojane, li hember dijmin bertek û sekna min çawa be, hemû dinivîsand. Dijmin mirov bi cihekê ve sînor dike. Dixwest li wir ji her tiştî re sînor dane. Lê tevî vê me ev kar dikir. Ji ber her tişta ku dihat nivîsandin girîng bû. Parçeyek nivîs tişta herî binirx bû. Qetandin û tinekirina notan, weke tinekirina organîzmayek zindî bû. Min nedikariya wan tine bikim. Yên ku hewce dikir tine bikim, min dida yeke din, bi destê wê dida tinekirin. Min komkirin û veşartina wan hez dikir. Dema ez li Amasya bûm, min hemû not û nivîsên ji Muzaffer hatibûn dişand derve. Muzaffer jî zêde dinivîsand. Wî jî weke rojnivîsê çi tişta dihat jiyîn, rojane dinivîsand. Min ji wan re dinivîsand. Dîsa ji derve û hemû girtîgehan re jî dinivîsand. Dîsa jî ji nivîsandinê têr nedibûm. Ev jî dibû sedem ku ez zêdetir rojnivîsê bigirim. Enerjiyek balkêş hebû û min jî ew di vê qada xebatê de bikar danî. Dema mirov ji hêla fîzîkî ve girtî be, ev yek mirovan teng dike. Mirov dixwaze hêzek balkêş a xeyal û xwe berfirehkirina qadek mezin pêş bixe.

“Em Kurdistanê bidin Sakînê dê dîsa ji xwe re derdan peyda bike…”

Em weşanên rojane, kovarên heftane û mehane ji bilî pêvajoyên taybet ên qedexe rêk û pêk digirin û dişopînin. Di kovara Serxwebûnê yên wê demê dihatin de di bin navê “îtîrafên sîxûran” de rêze nivîsên dihatin weşandin hebûn. Navê yek ji van sîxûra jî Cîhangîrê pişt re li Dêrsimê şehîd ketibû. Berî demekê jî hinek nivîs bi wêneyên wî ve di kovara 2000’e Dogru de cih girtibûn. Heman wêne dîsa heye, di rûpela kovarê ya destpêkê de bû. Li binya wê jî; “dîmenek ji dadgeha M. Şener!”, an jî hevokek mîna vê hebû. Dihat gotin; “îdîayên Pêşengekî ye” û name weke heyî weşandibûn! Digot; “Şener hatiye cezakirin.” Hevokek weke, ‘Xwîşka Mehmed Cahîd Şener, Cahîde Şener jî di girtîgehê de ye.’ nivîsandine.

Hem naveroka nameyê û hem ji bo wêne beriya niha ji aliyê yeke din ve hatibû weşandin, diyar bû nûçeyek bi armancekê hatibû çêkirin e. Nexwe zêde negirîng bû ku, Cahîde xwîşka Şener e yan na, an jî ew wêne ne Şener Cîhangîr e. Di vir de ya girîng rewşa Şener bû. Ji ber wisa xirab ji raya gişti re didan diyarkirin. Ya girîng gelo kovara 2000’e Dogru çima nêzîkbûnek wisa kiribû? Armanca wan çibû? Êdî aciz dibûm. Me agahiya di kovarê de ji Muzaffer wan re jî ragihand. Min got; “ketîno, rêbazek nû ya serê her kesî tevlîhev û şêlo bikin dîtine, derdixin pêş.” Di girtîgehê de jî propagandeya reşkirinê pêş xistin û di rojevê de girtin. Gelo ev jî bi armanca gumanan ava bikin û bêbaweriyê pêş bixin dihatin kirin?

Di sala 88'an de kesek di qoxuşa 35'an de bi karê nivîs û daktîloyê ve mijûl dibû, ji nişka ve çûbû radestî îdareyê bibû. Piştî ku demekê di qoxuşa îtîrafkaran de ma, derket cardin xwe sipart hevalan. Diyar dikir ku, xetimiye, lewma reviye û gelekî poşman bûye. Piştî hat jî gotibû; "îdareyê min re got M. Şener zilamê me ye." Me wê demê jî digot; "dijmin bi zanebûn gotinên wisa yên derheqê Şener de belav dike. Jixwe rexne li ser hene. Kesên ku ji me veqetiyane, nexasim ên komên din nirxandinên ku Şener hedef digirin dikin. Dijmin jî ev bi rêbazên cur be cur bihîstine. Hinek nivîsên ketîn dest hebûn. Dîsa bi rêya îtîrafkaran pirsgirêkên me yên hundirîn jî hîn dibûn. Dixwazin vê gumanê zêde kûr bikin. Nexwe nabêjin; "biçe bêje, Şener zilamê me ye."

Ev kes di ti navenda êşkenceyê de ne reviya. Ango di kêliyek herî rehet, herî zêde derfet heyî de reviyabû û paşê jî poşmanî jiya û vegeriya. Weke tenê ji bona wê peyamê bide hatibû. Em jî di vê wateyê de zêde ser nerawestiyan. Em zêdetir li ser kesayeta wî disekinîn. Dîsa jî bêhna min teng dikir. Axafinek bibû sedem dilê min lê bide. Abdullah Kahirman ê sitvan her gotinên xwe yekser digot. Carekê ji Cahîde Şener re gotibû; "te jî îtîraf kiribû ne wisa?" Dîsa pirsî bû, gelo xizmê Mehmed Şener e, yan na. Ya rastî rewşa ku Cahîdê di pêvajoya lêpirsînê û girtîgehê de jiyan kirî, lewaziya dijiya, ji rewşa îtîrafkarekê cudatir nebû. Ji ber ew ruhê wê yê têkçûyî demek dirêj em mijûl kiribûn. Dijmin jî her carê ew eyba wê li rûyê wê dida. Bi vî rengî dawetî îxanetê dikir. Dijmin dixwest bêje; "tu lewaz ketî. Ma tu hêj parastina PKK'ê dikî? Tu hêj xwe PKK'yî diyar dikî?" Hewl dida bi vî rengî

cardin xelekê bavêjin kesayeta wê û ber bi xwe ve bikişînin. Nêzîkbûnek bizanebûn û armanc pêk danîn. Nexwe Abdullah Kahirman ne tenê ji bona bi-axive, di-axivî.

Dibe dihizirî ku em rewşa heyî nizanin. Lewma dixwest em jî bibihîsin û haya me jê hebe. Ji ber rewşên di nav wan de dihat jiyîn ne kêm bûn û gelekî xirab bûn. Gelek caran polîsan girtîgeh birêve dibirin. Nediyar bû kî tê û diçe. Gelo ew zilamên veşartî kî bûn? Ekîba jê re polîsên sivîl dihat gotin, ji rêveberiya girtîgehê zêdetir bibandor û diyarker bû. Yên ku îtîrafkar birêve dibirin polîs bûn. Lêpirsînên taybet jî polîsan dikir. Abdullah Kahirman digot; "ezê rojekê mîsoger bîranînên xwe binivisînim." Ji ber em qane nekiribûn ku ne sitvanek faşîst e, bi kesereke kûr ev axaftin dikir.

Ji nîqaşê hez dikir. Di nîqaşên derbarê Kurdistanê de digot; "dê pişt re bela werin serê min" û qut dikir. Gelo rol dilîst, an jî rastî wisa nêz dibû ne diyar bû. Lê ya girîng ne ew bû. Bes rastiyek hebû wî û hinek din jî bê ku di ferqê de bin rastiya heyî destnîşan dikirin. Me tenê giranî dida aliyekê. Me digot; "ev dijmin e. Her tiştî bi armancên dijminatiyê ve dike." Ev jî rast bû. Lê em jî zêde li ser îhtîmalek din nedihizirîn. Şîroveyên me yên di wê mijarê de zêde hesas bûn. Lê her carê jî rewşa heyî weke kurmekê hîsê me hişyar dikir.

Muxaffer yekser notek nivîsand. Dihizire ku ezê serê xwe bi tiştên hatine nivîsandin bêşînim. Dibêje; "ev bênamûs bi zanebûn hinek tiştan dinivisînin. Teqez serê xwe pê ne êşîne…" xoyên min dizane, her carê ji min re digot; "ez te nas dikim. Tu rehet nasekinî. Wê tu mîsoger hinek tişt ji xwe re bibînî ku serê xwe pê bêşînî." Heta carê digot; "ew Kurdistana ku ji her tiştî zêdetir dixwaze mirov bide Sakînê jî, serxwebûna

wê jî bibîne, dîsa jî rehet nabe, dê ji xwe re derdekê bibîne.” Bi vê rastiya min rave dikir. Ya rastî min jî digot hûn zêde rewşa min dinepixînin û digot, “ne ew qas e.” Lê min her kêliyê her tişt dikir derd û kul. Vê bandora zêde, di fêmkirina cewhera pirsgirêkan û çareserkirina wan de derdek ava bikiriya, di wê mijarê de neyênî bandor dikir. Min xwe di nava hestên xwe de difetisand. Ez jî di ferqa vê de bûm.

Di hevdîtinên hundir ên heftane de, min cardin mijar ji Muzaffer re got. Ma dibe çi hebe, kovara 2000’e Dogru çima nûçeyek wisa nivîsandibû. Ecêb bû. Qîmet dana nameya kesek ji endamên rêxistina Peşeng, bala min dikişand. Gelo ew name jî senaryoyek bû? Şener derket û xwe gihand partiyê. Ji ber vê gelo dixwestin bi vî rengî bixin rojevê û li hember wî bêbaweriyê pêş bixin? Gelo dixwestin bêjin; “ti kesê ji girtîgehê derdikeve ne saxlem e.” An jî “nabe malê partiyê, em nahêlin.” Gelek tişt dihatin hişê min. Min hemû jî bi dengê bilind digot. Di wan kêliyan de Muzaffer jî nedigot; “tu zêde ji xwe re dikî derd.” Hewl dida wate bide gumanên min. Ew bêdeng dihizirî.

Min di nameyek ji Şamil re nivîsandî de jî diyar kiribû; “ bila tiştek ji yek we neyê. Ger tiştek bibe sedema mirina min jî ev e.” Min diyar kiribû ku agahiya derbarê Şener de çiqasî bandor li min kiriye. Dibe ku min ev bertek gelek caran nivîsandibûn û dabûn der. Lê di cewhera xwe de tiştên ku ez tengav dikirim, wisa xwe didan der. Bê ku di ferqê de bim, min gumanên xwe dabûn der. Di vir de Şamîl jî hestiyariya min rexne kiribû. Dixwest ku ez hestiyariya xwe û hinek rastiyên ku min bidest xistine, hem bi xwe re, hem derve li ser bingeha ramanek polîtîk bidim avakirin, wê bi pergal bikim. Lê gelo çi bû evqasî li pêşiya vê dibû asteng?

Zêde derbas nebû. Vê carê gotinên; “kî tûnel eşkere kir?” Li holê degeriyan. Me jî şik û gumanên xwe di nameyên xwe yên em ji hev re dinivisînin de parve kirin. . Em hinek navan veşartî ji hev re dibêjin. Herî zêde li hember Sînan û Hesen şik hene. An jî axaftin wisa ne. Ji ber tenê wan dizaniya. An jî ger haya wan ji revê hebûya jî, nedizaniyan dê kure pêk were û bi kîjan rêbazî pêk were.

Lê kesên hatibûn serdanê navê Şener jî ser ve kiribûn û nav zêde kiribûn. Di nava axaftinên derve de Şener jî hebû. Min jî rewşa heyî ji Karasu wan re nivîsand. Min nivîsek pêvajoya piştî sûrgûnê jî rave dike bi rêyek veşartî şand ji wan re. Min di wê nivîsê de têkîliyên Hisnî, Faruk, nakokiyên wan ên bi Şener re, çavdêriya xwe ya giştî derbarê wan de tev nivîsandibû. Di heman demê de min diyar kiribû ku, axaftinên li ser Şener ji kevin de hene, ger ev neyên ronîkirin dê kêmasiyek cidî rû bide. Ger wisa belav bibe, dê bandor li wî jî bike. Lewma min pêşniyar kir, baldar nêzî van mijaran bibe û ji partiyê re ragihîne.

Min ji Karasu re got; “herî baş hûn nas dikin. Hûn dizanin, hinek xisletên wî yên ecêb hene. Her tiştî li gorî xwe nîqaş dike û şîrove dike. Ger bêje, ‘ger baweriya wan bi min tine ye, ez jî nakim.’ Dê ne baş be… Hûn dikarin jê re binivisînin. Ez jî dinivisînim. Lê têrê nake.”Min wisa gumanên xwe jî ji Karasu re gotin. Lê di hemû gumanên min de parastin, rizgarkirina Şener û ji bona ti şaşiyan neke, wî asteng bikim rastiyek hebû. Dixwazim rastiyek din derkeve holê. Nêzîkbûna min jî encama hest û ruhê tevlîhev bû!

Tûnel û Şener! Ji bona min erjeng e! Naxwazim ser bihizirim. Cardin li ser hev difikirim ku ew tûnel wê rojê çawa derket holê. Min ji yê kêleka xwe pirsî, hemûyan bi hev re ew roj anî bîra xwe. Ew jî mereq dikin ku, ez çima cardin her kêliyê dubare pirsa wê rojê dikim, heman tiştan dipirsim û ew qasî zirav li ser radiwestim. Lê tiştekî jî nabêjin.

Dema ketin qoxuşa 35' ma destpêkê ji jêr ve dest bi kolanê kirin? Ger cihê wê tam bihatiya zanîn, wê yekser derketan jor, ji qeta çaran dest bi lêgerînê bikiriyan. Hesen Gullu û Sînan Canyak cihê wê tam nedizaniyan. Heta nîvro geriyan nedîtin. Axa ku ji dîwarê derizî derketî şopandibûn û wisa dîtibûn. Ji vê hêlê ve ez rehet bûm. Ma îxanetek navxweyî hebûya, dê zilaman ewqasî rol bilîstiyan? Dê ew jî diyar bibûya. Dibe ku Salîhê bigota, ji ber ew jin tam weke pîrebokan bû. Me hemûyan jê re digot, 'dayê.' Lê ruhê wê yê pîreboktiyê jî diyar bû.

Dibe ku em baldar nêz dibûn, jê re digot dayê, hemêz dikir, wêne dikêşa, di-axivîn, lê ji roja destpêkê ve qinyata min bi Salîhayê nedihat! Min ji dil jê hez nekir. Me peywendî û girêdana xwe jî ji bona Şener berdewam dikir. Lê Şener pê ve girêdayî bû. Heta min bihîstibû nifrînan lê dike, dijûnan jê re dike, lê dema me rewşa wê dixist rojevê û gumanên xwe digot, bandor dibû. Di nivîsek ji bo derve nivîsandî de derbarê wê de gotibû; "nabe ku mirov guhê xwe bide hinek axaftinan û wisa nêz bibe. Lê dizanim bêpîvan û zimandirêje."

Şener nameyek şandibû. Diyar dikir ku, dixwaze li ser hinek mijaran nîqaş bike. Yekser destpêkê destnîşan kiribû Rêbertî hem wî rexne dike, hem jî hêz didiyê. Dibêje; "Apê me hêz û alîkariyek mezin dide min. Lê pirsgirêk ne ev e. Hinek

tişt hene, zehmet e ku mirov hem wan vebêje, hem jî fêm bike. Ez hêj ne rehet im. Nikarim bi-axivim, girtî dimînim. Nexasim ji ber min hêj sonda xwe pêk ne aniye xemgîn im. Firsenda wê çênebû. Min ne xwest di nava ewqas karî de behsa wê ji Apê me re bikim. Lê yeqîn bike, ezê di firsenda destpêkê de jê re bêjim. Sonda behs dikir jî, diviya têkîliya me ji Rêbertiyê re bigota.

Her wiha li ser jiyînê dinivisîne. Bi nivîsek "ma jiyîn çiye?" Destpê dike. Ew bi xwe bersiva pirsa xwe dide. Behsa Pavelê di nav pirtûka Tûtûnê de behsa wî dihat kirin dike. Dibêje; "ger wisa berdewam bike, ezê bibim Pavel. Tenê Pavelbûn dimîne di destên min de. Hinek min zêde tengav dikin. Pirsgirêk ne avakirin, an jî ne avakirina ahengê ye. Ji bona weke ji odeyekê, çûna odeyek din e. Bes weke min gotî hinek tişt mirov ji qehra dikujin. Ger Apo nebe ezê dîn bibim. Alîkariya herî mezin ew dide."

Uslubê Şener ê nîqaşa her demî ye. Mijarekê davêje holê, wê ji gelek aliyên weke civaknasî, derûnî, hunerî, estetîk û gelek hêlan ve dinirxîne û dide nîqaşkirin. Di her nameya wî de mijarên wisa ecêb hebûn. Lê di vir de destnîşan dike ku, zehmetiyan jî dijî. An jî behsa Pavelbûnê dike. Hevalan jî xwend. Min ji wan pirsî; "we çi fêm kir?" Heval Muzaffer got; "ma tu Şener nas nakî? Ew di van mijaran de zêde bi hostane dinivisîne. Mîsoger cardin xwe hişk kiriye û wisa tevlî bûye. Bes ên derve wî nas nakin. Dibe ku vê xisleta wî jî berovajî şîrove bikin. Jixwe ew jî pir hez dike xwe wisa bide nasîn û diyarkirn. Hez dike xwe bixe rojevê."

Di nava rêxistinê de bi Pavel bawer nakin. Hinek tiştên wî dijî rêxistinê ne. Weke dijberê partiyê tê dîtin û dûr dixin. Binyata malbata wî cuda ye. Birayê wî yê bi navê Borîs xwediyê kargeha tûtûnê ye. Bi gelek dewletên emperyal re hevkariyê dike. Peywendiyên wî bi faşîstên Alman re heye. Birayek wî yê din di lêpirsînê de tê qetilkirin. Pişt re Borîs jî ji aliyê hêzên şoreşger ve tê kuştin. Pavel tevlî şerê Îspanya yê navxweyî dibe. Demekê li eniyê şer dike. Pişt re vedigere Bulgarîstanê. Cardin di eniya şer de cih digire. Rolek vala dilîze. Gelo Şener dixwest çi bêje? Moralê min xirab dibû. Mij ji xwe re digot; "mîsoger hinek pirsgirêk hene." Lê min di vê mijarê de rexne dikir. Min nivîsand; "Pavelbûn jî çi wateyê dide? Tu çima xwe tînî wî halî ku nayê fêmkirin? Tu dikarî vê derbas bikî, di destên te de ye. Ger Apo evqasî alîkariyê dide te, divê tu jî wî esas bigirî. Ne hinek kesên din." Weke din jî min diyar kiribû ku, bila carek din mijarên wisa nenivisîne. Ez li benda pêşketinên cudatirim.

Her carê diyar dike ku, pêdiviya wî bi nameyên min heye. Jixwe dinivisînim. Gelo bandora nameyên min û Karasu çiqas dibe? Yê herî zêde nêzî partiyê ew bû. Divê ew bi xwe Pavelbûnek rast bijî. Çima her tim pêvajoyên pevçûn, şik, cihêkariyê jiyan dike? Gelo rexne û hişyariyên me yên di vê mijarê de çiqas cihê xwe digirt? Wer dixwiya dê ew nerehetî berdewam bike. Kesayeta wî di her pêvajoyê de hat nîqaşkirin, her carê weke bûyerekê derdiket holê. Min jî dest avêtibû karek wisa bela û hewl dida çareser bikim. Hem ev alî, hem jî hêz û jêhatiya wî ya min didît, ez ber bi xwe ve dikişandim. Ev nakokiyek bû. Lê mixabin nakokiyê bi xwe ez ber bi xwe ve dikişandim.

Hevgihîna min a bi Şener re ti caran li ser bingeha pîvanên hestan pêk nehat. Ez qet vê nehizirîm. Ango mijarên destpêkê bandor li min kir, ez kişandim xwe û baldar kirim ne hest û ajo bûn. Hişyarî, hîs, guman û pêdiviya bandor li min kir û ev yek diyarker bûn. Bandorên din jî bi van re pêş ketin. Çi demê pêş ket, ji kur destpê kir, çû kuderê hemû van aliyên jiyan û têkîliyê ve girêdayî bûn. Hêjî nakokî, pevçûn, guman, hişyarî û hîsên min didomiyan. Hêza bandora van hebû. Ya rastî nakokî tev jî di nava vê têkîliyê de veşartîbûn. Ronîkirina nakokiyan û di mijara şerên bi wan re de ya girîng mirov bi destkeftiyên zelal ve tevbigere. Ji aliyekê ve dixwest cîhana têkîliyek hatiye îdealîzekirin, pak, bênakokî, bi her tiştê xwe ve cuda ava bike, aliyê din ve jî, têkîliyek bi nakokiyan ve dagirtî, her kêliya wê di nav şer de, her carê belayek derdixe, mozaîkek hebû. Di aliyê ku guman derdiketin pêş de, ne ku pirsa; "dê ev têkîlî ber bi kur ve biçe?" Zêdetir, "dê çi li Şener were?" pêş diket. Pir vekirî bû, Şener ev têkîlî ji xwe re weke ewlekariyekê digirt dest. Ji ber vê têkîliyê ew diparast, ji nîqaşkirinê dûr dixist, dihişt ku wî di nava rêxistinê de bibandor bike. Xwedî xisletek wisa girîng bû. Di vê têkîliyê de mîsogeriya van dît. Di serî de di zanebûna vê de bû. Pêdiviya xwe pê didît. Lewma min pîroz dinirxand, hezkirin di çarçoveya pîvanên min dixwest de pêk danî. Jixwe vê jî bandor dikir.

Ew bi xwe hem di nav nêvenga pirsgirêkên heyî de hêzek bû, di nava performansek bikaribe xwe çalak bike de, bi qasî bandor li hestên min bike di nav çarçoveya baldariya min de ye. Ev hemû bi hevûdû ve girêdayî pêş ketin. Rewşa min bi gelemperî erênî ye. Bandor li hemû hevalan dikim, an jî bala wan dikişînim. Lê Şener zêdetir bi min re mijûl dibe. Xwe di

her mijarê de li gorî min amade dike. Bi min re jî birçîbûnek karkirinê heye. Dixwazim bi qasî dikarim xwe bigihînim her qadê. Daxwaz û enerjiyek balkêş a karkirinê heye. Wî jî di pêkanan de jêhatiyek mezin raber dikir. Dibêje; "tu çi dixwazî ezê wê bikim." Dike jî. Bi min dişêwire, ti karek ku erê nekim nake. Her tim digot; "ez qurbana te, çi dibêjî ez bikim." Êdî peyva "ez qurbana te" bû xîtaba jiyana rojane. Wî destên min radimûsa, min çavên wî, eniya wî, serê wî radimûsa. Hevalan jî nameyên me dixwendin. Kesên ku têkîliya me dizaniya û nedizaniya jî fêrî vê usluba min a di zindanê de bibûn.

Min ji Hesen û Yildiz pirsî; "ma hûn rojnivîsan dixwînin?" Min bi israr ji wan re digot; "bixwînin." Dixwazin jiyana me ji her hêlê ve baş bizanin. Hesen nebiyanî ye. Lê belê, Yildiz digot zêde dirêj hatine nivîsandin û ji ber wê nedixwend. Min jî ecêb didît. Min taybet dixwest ku, nameyên min bigihînin Şener. Ji ber li gorî texmîna min, pêwîstiya wî pê hebû.

Piştî Şener hat berdan, nexasim piştî giha partiyê min zêdetir ew şopand. Min dixwest hêza xwe têkil a partiyê bike û di nav partiyê de çalak be. Ji ber gelek kesên ku ji girtîgehê derdiketin, xeyalê her kesî vala derdixist. Hinek ji wan hêj li malê ne, hinek jî bi karên ji rêzê ve mijûl dibin. Lewma dema me dibihîst yên derketine xwe gihandine partiyê û çalak tevlî dibin, ji bona me girtiyan dibû agahiya herî baş û xweş. Nexasim dema min ji bona kesek ku hêviya xwe pê girê daye û dixwazim ser bixe bendewariyên min zêdetir mezin dibû.

Hinek qazakên me ji bo derve û Rêbertiyê hunandî û şandî hebûn. Ev parçeyek kûraniya hezkirinê û bêrîkirinekê bû. Me nedikariya bi şêwazek din xwe bigihînin Rêbertiyê, ji ber zehmet bû. Min wê demê ji bona Şener jî qazaxek hunandibû.

Nameyek jî nivîsandibû û kiribû nav şandibû. Ez yeqîn dikim min yekem car nameyek ji hemû gumanan dûr nivîsandibû. Di wê nameyê de wateya ku dida wê têkîliyê rave dikir.

Tevî pratîkên min jiyan kirîn, min lêgerînên xwe yên hezkirinê negirtin. Dibe ku qet nehizirî bim. Xeyal nekir, lê min dizaniya ku jiyan û şer bi xwe jî hezkirine. Jiyana wê ya bihêz, hûr û kûr jiyîn, dibe sedem ku qet jê poşman nebim. Di vê mijarê de qinyatek heye. Min diyar dikir ku, gumanên min zêde ne, zêde zehmetiyê dijîm, lê min zehmetiyên xwe radeyek girîng de jî derbas kirine. Ev jî di wateyekê de di qanebûnê de li xwe mikur hatinek bû.

Ango ez ji eniya xwe ve hinek din vê têkîliyê qebûl dikim. Dibe ku ji bona xwe gihandibû partiyê, tevî ku gelek kêmasî û pirsgirêkên wî hebûn, yekser girêdana xwe bi partiyê re hebû baweriya min li hember hebû. Êdî pirsgirêka esasî Şener bi xwe bû. Ew û partî li holê bûn. Pêvajoyên beriya wê her tim hêmanên guman û şik ava dikirin. Lê niha her çendî guman hebin, li hember partiyê û hêza wê ya çareseriyê baweriyek hebû. Berpirsyariya min jî zêdetir li ser bingeha bi mebesta têkîliya heyî hêz bidim û bandor li asta morala heyî bikim bû. Nêzîkbûnên min ên ji ber rastiya heyî û niyeta min a baş têkilhev dijîn. Dem bi dem xetek pir erênî û niyetek baş dijîm. Carna jî dema tiştek herî biçûk dibihîsim, agahiya hatî jî diberde ser wê rewşa erênî û paşde dihêle. Ev jî ne bi îstîkrar û demdirêje. Ji hêlekê ve bêsînor û bêdawî dinirxînim. Ji hêlekê ve jîdibe ku her kêliyê ji cihekê ve qut bibe, ew qasî bertek û hestên ku bandor dikin hene. Lê her du jî girêdanek ecêb ava dikin. Ji ber li naverastên herî zêde şer û nakokî lê hene, herî zêde girêdan jî li wir pêş dikevin.

“Doza kunveşêrkê (zula)”

Karê kunkirina dîwar gihaye astekê. Nasnameyên me jî hatin. Qusura wan jî tine ye. Me cil û berg jî amade kirine. Ji ber Muzaffer wan ji derve pirtûka modelan xwestibû û hinek cil ecibandibûn, belayek din hatibû serê me. Yên bihîstin wer dizaniyan ku em modeya demê ji nêz ve dişopînin, an jî em xwe amade dikin ku di zindanê de derkevin podyomê. Jixwe gelek axaftin hatibûn belavkirin. Muzaffer pir rehet digot; “çi dibêjin bila bêjin.” Ez jî tam berovajî wî, di nav tengezariyek mezin de bûm, ji ber bêhna min zêde teng dibû.

Hinek mêvan tên mala mudur û diçûn. Roja xwe derbas dikin. Em jî wan dişopînin. Em dişopînin rojên ku mêvan zêdene kîjanin. Çûna xwe li gorî wan rojan destnîşankirin baştir bû. Bala laşkeran jî nedikişand. Ez û Cahîde, emê weke du jinên xweşik derketan. Nasnameyên me jî hene. Me û bavê Cahîdê lihev kiriye. Dê li ser rêya Samsunê raweste, me şîfre jî dane hev. Piştî ku em bi telgrafê wê şîfrê bişînin jê re, dê li benda me be. Me baş şîret kiribû; “divê tu mîsoger bal nekişînî ser xwe.” Me bi zanebûn Samsun hilbijartiye. Dibêjin ew alî baştire. Derfetên ku mirov xwe li Behra Reş veşêre zêdetire. Hevalên li Acîlê dimînin ev pêşniyar kiribûn. Ger hewce bike, dê alîkariya me jî bikin.

Karê me yê nexweşxaneyê vala derket. Îdare naxwaze bişîne. Li Amasya dişînin cem doxtor. Lê nahêlin kes biçe dervî sînorê bajêr. Hesen Can jî di vê mijarê de tam weke gurekê ye! Hemû fêlbazî li cem wî civiyane. Ji her tiştî şik dibe. Tam kesek paranoyake! Li hember me nerehete. Her tim lêgerînê pêk tînin. Pir vekirî digot; “min ewqas girtîgeh birêve

birine. Li hemûyan jî bi dehan jin hebûn. Lê ez ti caran ji evqas jinan netirsiyame." Vê carê jî em ketin şikê. Gelo ketibû ferqa hinek tiştan?" Me derdora bloka dawî dikola. Divê tiştek ji siwaxa derve neyê. Lewma em pir zirav kar dikin. Di heman demê de sebra me jî namîne…

Me radeyek mezin name û nivîsên girîng şandine derve. Lê hêj hinek mane. Min di vê navberê de Têkîliya xwe ya bi Şener re ji Cahîdê re got. Metel ma û got; "ya rastî min ji nêzîkbûnên wî hinek tişt fêm kiribûn. Lê min qet ji te hêvî nedikir." Me zêde li ser nîqaş nekir. Lê min jê re got; "ev têkîlî cuda ye." Ew jî di vê mijarê de qane nebû. Got; "çawa dibe têkîliyek cuda ye?" Ew jî deh sal zêdetir bû dergistiya Silêman bû. Ew nîşana wan jî zêde bibû pirsgirêk. Nêzîkbûna hevalên wê herêmê, pîvanên wê, helwesta dijmin a bikaranîna wê têkîliyê, hemû bibûn sedem ku tengezariyek mezin bijî. Piştî sala 83'ê xetek rast û erênî ava kir. Ew ruhê xwe yê kevin di astek girîng de derbas kiribû. Li dadgehê di asta welatparêzî de parastina xwe kiribû. Bi nîqaş û nivîsan pirsgirêkên ku berê jiyan kirî derbas kiribû. Yilmaz Uzun jî digot; "ji ber nêzîkbûnên teng û feodalî pêk hat." Wisa rexnedana xwe dida. Yilmaz hevalê ku li Sîwerekê herî zêde pê re şer dikir bû. Asta têkîliya Cahîdê ya siyasî jî fermî bibû. Ango rewşa demdirêj a nediyar û ceza rabibû.

Di sala 88'ê de derfetên me çêbûn ez bi Silêman re nîqaş bikim. Lê Cahîdê destnîşan dikir ku, têkîliya wan wê paşve dixe. Di rojên êşkenceyê de ji asta moralê wî bandor dibû. Ji xwe re weke palpiştekê didît. Bertekên wê yên li dijî partiyê, li vê têkîliya wê ya bi Silêman re diket. Li her du aliyan jî ferasetek namûsa kevneşop hebû. Silêman durist nêzî têkîliya

xwe dibû. Pak bû. Lê ruhê Cahîdê û tiştên ku jê bandor dibûn cuda bûn. Dema Cahîde li Amasyayê bû, nivîsên wê hemû renxegir bûn. Di nameyên xwe de heta radeyekê nîqaş jî dikir. Guhertina bi xwe re jî bi vê ve girê dida. Ne dixwest vê têkîliyê weke çarenûsekê binirxîne, têkîliyek heta dawiya temenê xwe pê ve girêdayî bimîne û muhafazakariya di vê mijarê de rast nedidît. Çawa dibe deh salan bi xelekekê ve girêdayî bimîne! Gelo ev evînek mezin bû? Asta wê ya hezkirinê çibû û pîvan çibû? Me li ser van nîqaş dikir. Cahîde jî heta radeyekê mafdar bû! Lê tiştek nedixist dewsa mijarên ku rexne dikir û ne di-eciband. Ji xisletên burjuvaziya biçûk a bi kesayeta xwe re zêde hez dikir. Ma ev jî ne xeternak bûn? Fêrbûnên jiyana burjuvaziya biçûk û ruhê wê bi Cahîdê re zêde bû û veşartî jiyan dikir. Aliyên xwe yên proleter di nav sazûmaniya malbatê de, hinekê ji diya xwe cudatir bû. Ew jî xistibûn xizmeta bêrîkirinên jiyana burjuvaziya biçûk. Di naskirina PKK'ê û pêvajoya meşandina xebatan de jî aliyên wê yên burjuvaziya biçûk li pêş bûn. Ji hêla îradeyê ve jî heman tevlîhevî jiyan dikir. Ruhek hesabê her tiştî dike di kesayeta wê de serdest bû. Ev jî yekser bi şêweya mezinbûn, zarokatî, têkîliyên wê yên bi malbatê re, asta malbatê ya bazirganî, aborî ve girêdayî bû. Bavê wê serbaziya çandiniyê kiriye. Weke navbeynkariya karkerên demsalî ye. Wan jî kar kiriye. Lê hesabê bavê wê yên di van karan de, asta têkîliya wî ya bi karsazan re, herî zêde jî bandor li Cahîdê kiriye. Herî zêde ew nêzî bavê xwe bû. Diya wê jî şirînî difirot. Dîsa malbatê karên kaçax jî dikir. Şêwazê jiyana bavê wê berdoşî bû, mey vedixwar, xumar dilîst, derewker û bi dek û dolap bû.

Ger Cahîde bibûya şoreşger baştir bû, ji ber gelekî jêhatî bû. Çalak bû. Hemû fêlbazî jî pê re hebûn. Ger ji bona rêxistin û têkoşînê bikar baniya dê feydeyek xwe mezintir hebûya. Jixwe di pêvajoya têkoşîna Sîwerekê de zêde çalak bû. Fîşek û çek ji Qeymeqam û endamên saziyên dewletê yên herî pêşeng distand û birêxistin dikir. Karê sewqkirina hinek mirovan pêk danî. Mal bikar danî û kariyera wan bikar danî. Mirov dikuşt, nexasim endamên Bucakan dikuşt. Lewma Bucakan jî ji bona dîtin û girtina wê fîdye destnîşan kiribûn. Ango ew qasî bibandor û çalak bû.

Pêvajoyên pey wê re Cahîde ne ber bi serkeftinê, ber bi binkeftinê ve dibir. Demek dirêj bandora wê jiyan kir. Kes nikare bêje ku binkeftin nayên jiyîn. Lê mixabin ger mirov bê ku şer bike binkeftibe, ew têkçûn mirov xilas dike. Mirovên gav bi gav şer kirine, ji bona vê darbe xwarine, binkeftine, pişt re karîne xwe komî serhev bikin û şansê ji nû ve serkeftinê bidest bixin. Nexasim têkçînên mirov di giyan, hest, raman, bawerî û îradeyê de jiyan dike, her çiqas bisînor jî be, wextek kin jî be gelekî xeter e û kesayeta mirov ber bi îxanetê ve dibe.

Cahîdê jî sedemên vê têkçûna xwe dizaniya. Aliyek jê ev pîvanên têkîliyên wê bûn, ferdperestî û ez eziya bi wê re bû. Ji ber wê têkşliyê hinek tişt hatibûn serê wê. Bibû sedem ku bikeve tecrîdê û were girtin. Dîsa di lêpirsînê de axivî bû û heta radeyekê teslîm bibû. Piştî ku ev derbas kirin, nêzîkbûna wê ya ji vê têkîliyê re jî hatibû guhertin. Ji ber sedema windakirin û têkçûna wê bû. Di bin navê wê biparêze û girêdayî bimîne de, her tişt hatibû serê wê. Wê demê rewşek berovajî vê nedibûya? Daxwaza qedandina vê têkîliyê û ji bandorê wê rizgarbûn hebû. Di vê mijarê de bi min re nîqaş dikir. Ya rastî tişta dixuya

nêzîkbûnek wê rastî hebe jî, min zêdetir bertek û xwesteka tolhildanê pê re didît. Wê qebûl nedikir, lê ev rastî mîsoger bû. Ev rastî bi Gonûl re jî hebû. Di bin navê girêdana zêde û baweriya zêde de, bertek û dûritiyek mezin hebû. Hinde çavsoriyek tolhildanê pê re hebû, kêmek mabû wê têkîliyê bi rêbazek kirêt bifiroşe dijmin. Rewşa Cahîdê hinek din cuda bû. Rewşa bi Gonûl re hinek din kirêt, di serî de jî ne durist bû. Ev jî yekser bi girêdana wê ya şoreşê re têkildar bû. Xeyal û armancên wê yên şoreşê tine bûn. Bandora lêgerînên macerayên burjuvaziya biçûk zêde pê re hebûn.

Ayselê jî her tişt weke qederê digirt dest. Nêzîkbûnek wê zêde kevneşop hebû. Ew rihê wê yê bi axîn û nalîn, ruhek koletiyê bû. Feraseta wê ya hezkirina pir girêdayî, pir kûr û pir hezkirî, zêde rebentî bû. Weke azweriya kesek sêwî ya dema hinek din baldar nêz dibin dijî û ji xwe re weke hêviyekê didît. Ruhek wê perçiqî, êş jiyan dikir û serê wê tewandî bû. Di rewşek wisa de hezkirin miriye. Hezkirinek di xeta mirinê de dijî û dramek evînê derketiye holê!

Werem, nexweşiyek zirav e. Di nav gel de jê re dibêjin êşa zirav. Mirov di nav mercên zindanê de zû nexweş dikeve, ne zehmet e. Dijmin jî di zindanê de bi zanebûn mîkroba weremê belav dikir. Ev jî bi rêya xwarinên ku belxem dikir nav pêk danî. Qirêjî, tinebûna zewad, bêhewayî û hwd hemû sedemên pêşketina nexweşiyan bûn. Lê belê, îradeya me ya bedena xwe ji nexweşiyan biparêze hebû. Ma ew îrade çi derbas nake? Nexweşiya Aysel werem bû. Nexweşî ne suc bû. Lê mixavbin ruhê Aysel ne yek, çavkaniya deh nexweşiyan bû. Keserên wê, axîn û giriyên wê qet xilas nedibûn. Aysel bi wî halê xwe ve pir reben bû. Lewma min her tim bi wê nêzîkbûna wê re şer

dikir. Dema em bi hev re çûn mirinê jî, min pê re şer dikir. Ji ber hezkirin, nexweşiyê ava nake. Hezkirin mirov sax dike, zindî dihêle û moral dide. Lê hezkirina Aysel bi nexweşî bû. Di heman demê de nexweşiya zirav bû!

Ez bi Muzaffer re rojên dawî jiyan dikim. Her çendî çûna me ji aliyê her kesî ve neyê zanîn, diyar e dê hinek tişt bibin. Em li cihê serdanê bûn. Muzaffer digot; "ger hûn derkevin me jî bifikirin. Êdî mirov nikare li van cihên bi lenet bisekine. Divê mirov hevalan di vê mijarê de tengav bike. Ma nikarin bi qasî Dev-Sol'ê jî bibin? Divê mirov çend faşîstan ji holê rake. Kesên êşkencekar hene. Ger li dijî wan çend çalakî werin lidarxistin, nikarin gavên xwe evqasî dirêj bikin." Jixwe hinek ji wan em hemû nas dikin. Muzaffer hem kêfxweşe, hem jî dilê wî şikestiye. Qinyata me hemûyan a serxistinê heye. Lewma em kelecana wê zêde jiyan dikin.

Dema em di kêliya serdanê de bûn, gardiyana jin hat got; "hinek hatine serdana te." Ne roja serdanên derve bû. Gelo kîye wisa taybet hatiye? Diviya ji dozgeriyê destûr bê girtin. Her wiha ger ji dûr hatibe, hêcetek berketî hebûya destûra hevdîtinê didan. Nexwe hevdîtinên derve re qedexebûn. Kelecanê ez girtim. Li cihê serdanan bûm. Ji nişka ve ji kabîna miqabilî min Baqî derket hat. Metel mam. Lê di heman demê de bêhna min jî tengav bû.

Got; "Merheba, tu çawayî Sakîne? Demek dirêj e me hev nedîtiye."

Min jî got; "baş im. Tu çima hatî? Ti mafê te tine ye tu werî serdana min. Ma te destûr ji min girtiye, heta tu tê vir?"

Baqî; “ma çi hewce ye tu wisa nêzîk dibî? Em xizmên hev in. Dotmama minî. Mafê min heye ez bêm pirsa rewşa te bikim. Ev jî mafek xwezayî ye.”

Min got; “na, bila dê û bavê min jî bin, kesek ku ez nexwazim nikarin werin vir. Weke din jî tu çima her tim nameyan dinivisînî? Tişta herî ecêb jî, tevî ez bersiva te nadim tu dîsa dinivisînî. Ez jî bê ku bixwînim wan nameyên te diqetînim. Bila haya te jê hebe. Ji ber ji bona min ti nirxên xwe tine ne. Min nameya te ya destpêkê xwend. Bi te re bûye rik, bê navber heman mijaran dubare dikî. Ti girêdana me bi hev re nemaye. Ji bona min ti girêdana xizimtiyê jî tine ye. Yekser derkeve û biçe! Tiştek ku ez bi te re bi-axivim tine ye.”

Giriya û got; “ez ewqasî rêya dirêj hatime. Em hinekê bi-axivin. Dibe ku li cem te ti qîmeta min tine be. Li hember te rêz digirim.” Min cardin jê xwest ku biçe. Lê naçe. Vê carê ez derketim. Min herî dawî got;

“Bila hinek namûs û hinek şahnazî bi te re hebe. Tevî ku naxwazim bi te re hevdîtinê bikim, tu çima wisa xwe reben dikî? Ez naxwazim di nava dijmin de xwe bi te re aciz bikim. Lê tu înad dikî.” Cardin çûm cem hevalan. Dema Muzaffer bihîst bihêrs bû û got;

“Ew zilamek zîro ye. Ez ji te aciz dibim. Ji kerema xwe te ew ji kur dît? Bi salane weke belayekê dimîne.”

Belê, min ji kur peyda kiribû? Ev çend care çîroka wî vedibêjim. Cahîdê got; “êdî ez jî bê ku nameyan şanî wê bikim tine dikim. Pir xirab dinivisîne. Her wiha zewiciye. Zarokên wî çêbûne. Lê hêj li pey te ye. Çi kesek ecêb e.!”

Ger asayî were axaftin, dixwaze bila di çarçoveya xizimtî de be, bê ku hinek rewşên din têkil bike, peywendî pêş bixe, ezê jî xwe bidim ber. Ezê nîqaş bikim û bi-axivim. Her cure alîkariyê jî bikim. Ez têkîliyek kevin û derbas bûyî nakim hêceta xeyîdandin û helwestên xirab. Lê xweziya ew hêza wî hebûya. Weke ku hemû cîhana wî winda bûye. Jixwe ji bona xwe cîhanek din ava kiriye! Her tiştî di wê xalê de dide destpêkirin. Weke belaeyek feodal dijî û ev jî min aciz dike. Min weke mirovekê, an jî şoreşgerekê nabîne, weke jinek beriya niha çend salan pê re jiyan kiriye dibîne. Li wê jinbûnê digere. Hewl dide wê bi min re bide jiyîn. Hemû nêzîkbûnên wî vê rastiyê destnîşan dikin. Ev jî min zêde aciz dike û dibin sedem zêdetir jê dûr bikevim. Hewldana min a hevpeyvînê encam nade. Jixwe ti feydeya ceribandina wê jî tinebû. Baqî hevdîtina me jî xirab kiribû. Tişta herî xirab mirov reben be. Ez hez nakim dilê xwe bi kesî bişewitînim. Lewma min her tim lenet lê anî.

Şevekê, dema her kesî rêze filma Marîa temaşe dikir, min dîsa li ser qaba kovarê kar dikir. Bi hemû leza xwe ve kar dikim. Ji ber ger zêde dirêj bikira, dê xeter bûya. Emîne li korîdorê diçe û tê. Ew nobedar e. Lê gardiyanên jin lîstokan tînin serê wê. Wê dibin beşa xwaringehê. Çawa ew dikeve hundir li pey wê deriyê xwaringehê mifte dikin. Gardiyanê din jî hişyar amade ye. Bangî gardiyanên li korîdorê kom bûne kir. Ji nişka ve li ser merdîwenan qelebalix derket. Dengê lingan zêde bû. Hemû heval li xwaringehê bi hev re diqêriyan; “bila êdî çewsandin bidawî bin!” Ji bona ez bibihîsim duruşme diqêriyan û li deriyan didan. Min jî yekser dev ji xebatê berda. Qepax rakir, alavên di destê xwe de jî bi lez û bez veşartin. Hêj

min her der rast nekirî, bi sedan gardiyan weke keriyên kuçikan ketin hundir. Hemû hêza xwe kom kiribûn. Ji bona ez li ser xebatê qepaxê negirtibûm, zêde liber ketibûn. Lê yekser dîwane kişandin, bi pehîn û kumlan ve qepax tespît kirin û derxistin. Li ser kursî rûniştime û hewl didim bi sebir bim. Panîka wan zêde bû. Mudur got;

"Ne wisa, nexwe hûnê bireviyan! Em sê roj e li derve li benda derketina we ne. Dema hûn derketan û me jî hûn di wê kêliyê de bigirta baştir dibû." Weke êrîşî derdor bikin, li her derî digerin. Çend gardiyana quncika dîwar temaşe kirin.

Yekê got; "mudurê min ka lê binêre. Wêneyên APO daleqandine. Bi wêneyên terorîstan dagirtine. Ev qedexe ne." Destên xwe avêtê wan jê bike. Ez ji nişka ve ji cihê xwe rabûm û min got;

"Dev ji wir berdin. Ger destên xwe bidinê ezê tufanê rakim. Dest nedin wir. Temam, we ser me de girt û we tiştên me yên veşartî jî dîtin. Ma çima hûn evqasî teşqeleyê derdixin? Em mirovên şoreşger in. Em di zindanê de jî bin, afirîner in. Emê bikolin, kun bikin û bifirin jî. Erka we jî astengkirine. Hûn hatin û we dît. Bila ti teşqeleyek din neyê kirin." Min mudur hişyar kir. Mudur got;

"Tu hem sucdarî, hem jî hêzdar î. Me tiştek nekiriye. Tu gef li personelê min dikî." li zora wî diçû.

Lê baş bû. Hişyar nêz dibin. Hinek alavên kolanê jî dîtin. Dolaba ku me hinek nivîsên xwe tê de vedişart jî digeriyan. Ez di wê kêliyê de tirsiyam. Lê min hewl dida bi axaftinê bala wan belav bikim. Ji qata jêr bangî min kirin;

"Sakîne çi bû? Ma tiştekê li te dikin? Rewşa te çawa ye?"

Min jî bersiva wan da; “mereq nekin, rewşa min baş e.” Di wê kêliyê de ji bloka paş deng bilind bûn. Muzaffer wan mereq kirine. Min bersiva wan neda. Bila hinekê mereq bikin. Dixwazim îdareyê tengav bikin. Jixwe ti halê min nebû ku, dengê xwe jî bigihînim wan. Her çendî hewl bidim li hember dijmin xwe cuda bidim diyarkirin jî, dilê min xwîn digirî, em dîsa binkeftibûn. Gelo çawa ferq kiribûn? Mudur gotibû; “em sê roj e li benda we ne.” Ger rast be, çawa hîn bûn? Gelo deng bihîstibûn? Belê, ji mala mudur deng dihat bihîstin. Ger pir baldar dîwar guhdar bikin, dê deng jî bibihîsin. Girtîgeh cihek wisa ye, mirov guhê xwe bide kur, weke ku li mahzenê bi sedan kes jiyan dikin, dengên ecêb tên.

Yekser girtîname anîn nivîsandin. “me tûnel dît.” Ji ber deriyê xwaringehê girtibûn, heval jî diqêriyan; “derî vekin, nexwe emê vir bişewitînin.” Duruşme qet kêm nebûn. Zilaman piştî karê xwe xilas kirin, derî vekirin.

Me ji Muzaffer ji wan re agahî şand ku, rewş baş e. Êdî her kesî not ji hev re dinivîsand. Bersiva notê hat, xemgîn dibin, lê herî zêde jî şîret dikirin. Dixwazin ku em zêde xirab bandor nebin.

Li dadgehê dozek nû vebû: “doza firarê!” Jixwe qet ji dozan rizgar nebûm. Herî dawî dema ji Amedê hatim sûrgûnkirin, ji ber pulên ku min di rêde avêtîn dozek din hatibû vekirin. Ew kiribûn daxwiyanî. Her pulek weke daxwiyaniyekê nirxandibûn û gotibûn; “yên yekbûna dewletê xirab dikin, parçe dikin, hekeretê li saziyên wê dikin, biçûk dixin… Propagandeya reşkirinê dikin û gel har dikin hedef digirin…” îdîanemeyek bi van nêrînan destpê dikir û didomiya amade kiribûn. Hêj ew ne qediyabû, niha doza tûnelê destpê kiribû!

Dadgeh li girtîgehê vekiribûn. Ji tirsan nedikariyan me derxin dervî girtîgehê. Em çar kes di wê qoxuşê de bûn. Îfadeya me her çaran jî girtin. Dîsa min girt ser xwe û got; “cihê tiştên me yên veşartî bû. Min çêkiriye.” Zilam keniyan. Gotin; “wê tu çi ji cihek evqasî mezin bikî?” Min jî got; “dê min nivîsên xwe lê veşartan. Ji ber ez dem dirêj difikirîm, min çêkir. Mirov dikare pirtûkan jî li vir bicih bike.” Min îfadeya xwe wisa domand. Hewl didim bikim “doza kunveşêrkê” û hevalên me jî pir pê keniyan. Ji ber min digot cihê veşartinêye her kesî henek dikir. Jixwe zilaman jî bawer nekir…

Gelo dijmin çawa bi vê plana revê hesiyabû? An Koç Elî îxbar kiribû, an jî yeke din. Lê naxwazim yekser Yilmaz tewanbar bikim. Şaşiya me ew bû ku, me ji Koç Elî re gotin bû. Xweziya me ew qet têkil vî karî nekiribûya. Êdî her tişt bû. Divê mirov xweziyan pêşî bihizire.

“Nekarîn me di zindanan de jî bigirin…”

Dema dawiya salê ye.

Salek çêbû ku em ji Amedê sûrgûn bûne.

Dengê duruşmeyan dihat. Pişt re jî bi gokê not avêtin hundir. Dihat gotin ku, ‘Muzaffet hatiye sûrgûnkirin.’ Duruşme jî “Êdî Sûrgûn Bes e!” bû. Nizanim em vê duruşmeyê jî çend care diqîrin. Zindan û di zindanê de sûrgûn pêk dihat! Êdî nedikariyan me di zindanê jî bicih bikin. Tam şereke! Li zindanan bi hemû hêza xwe ve venêrînê dimeşînin. Dijmin di vê astê de aciz bûye! Çiqas pêkenok bû! Me xwest em hevdîtinê bikin. Tevî hemû israrên me dijmin hevdîtina me pêk ne anî. Li korîdoran tenê dengê qêrînên Muzaffer ên bang dikir, “Sakîne” dihat. Tenê karîbû ji kuna mazgalê qîr bike. Gardiyana ji digot; “dilê şewitî. Heyf. Wî zarokê çav şîn çawa qêriyabû.” Lê me ew jî nebihîstibû. Bê ku em hevdîtinê bikin biribûn.

Ev jî dihat wê wateyê ku dê li pey hev sûrgûn pêş bikevin. Hîsek bû. Hêceta dijmin a tûnelê hebû. Texmînên min rast bûn. Piştî çend roj din jî bangî min kirin. Sûrgûnî Çanakkaleyê kirim! Muzaffer çûbû Kurdistanê, Dîlokê. Ez jî çûbûm aliyê Rojavayê Tirkiyê Çanakkaleyê. Hêrsa wan neqediyabû. Di sûrgûnê de jî wisa bêrehim nêz dibûn. Tolhildanek sînorê xwe derbas dikir, dihat meşandin.

Min Amasya li pey xwe hişt. Dihizirîm ku ger di rê de firsendekê bibînim, ezê birevim. Min planê vê çêdikir. Min nasnameya sixte jî bi xwe re biriye. Vedişêrim. Dibe ku ew nasname û pere kêrî min werin. Lê mixabin bê ku min ji maşînê daxin, yekser birim Çanakkaleyê. Rêwîtiyek dirêj bû.

Ez ji hal ketibûm. Heval li Çanakkaleyê hebûn. Me carê ji hev re dinivîsand. Beşa jinan têkilheve. Girtiyên adlî jî hebûn. Ji me jî Zûbeyde hebû. Nêzî deh girtiyên jin ên ji siyaseta çepên Tirk hebûn.

Min heman rojê bi hevalan re hevdîtin pêk anî. Behsa rewşa heyî ji wan re kir. Ew jî pê kêfxweş bûn. Gotin; "tiştek nabe. Hinekê jî li cem me bimîne." Hinek jî li min dikirin. Rastî jî hinekê wisa bû. Gelo me çima hinek tişt ew qasî hişt û dijwar dinirxand û digirt dest? Her cih girtîgeh bû û li her derî hevalên me hebûn. Lewma divê mirov kêfa sûrgûnê jî bijî.

Pêkhateya girtîgeha Çanakkaleyê ecêbû. Mirovên ji her siyasetê hebûn. Ji sihî zêdetir hevalên me hebûn. Hevalên bi navê Celal Ozalp (Numan), Cemal Şerîk, Burhan, Mehmet Çinar (Resul), Deza (Hamît Kankiliç), D. Elî Kûçûk, Sadrettîn û gelek hevalên din hebûn.

Herî dawî min û D. Elî di sala 77'an de hevûdû dîtibû. Ew di girtîgeha Agirî de bû. Çûbûm serdana wî. Pişt re jî derbasî girtîgehên Erzîngan, Nîxde û Çanakkaleyê bibû. Ji seriyekê, ber bi seriyek din hema li hemû erdnîgariyê geriyabû. Em jî xêra girtîgehan diçûn hemû cihên Tirkiyê û Kurdistanê. Me bela xwe li hev dida, henekê xwe li hev dikir, gelo kê rekor şikandiye? Mixabin ê herî qidemdar D. Elî bû. Lê min di hejmara girtîgehan de her kes derbas dikir. Ez û Can jî herî dawî di hevdîtinên dawîkirina berxwedaniya Sibatê ya 88'an de liqay hev hatibûn. Ya rastî liqay hevhatina yekem û ya dawî bû. Min her tim mereq dikir. Bi hevalê Pîr re hatibû girtin. Tenê hevalê Mahsum Korkmaz (Egîd) rizgar bibû. Xwe ji qamyonê davêjin, ji bona nekevin cihê kontrolê ya leşker lê dimînin, hêj maşîn bi lez diçe, xwe jê davêjin û direvin. Lê

nekarîbûn xwe xilas bikin. Nexweşiya Can hebû. Serê wî di pêvajoya rojiya mirinê de werîmî bû. Derman dikir. Hevalan jî her tim digot, rewşa wî xeter e. Lê dema min dîtî zindî bû.

D. Elî qet nehatibû guhertin. Min Numan, ango Celal Ozalp jî û nas dikir. Di pêvajoya hevalê Sabrî de hatibû girtin. Min ew kom ji nêz ve nas nedikir. Dadgehên wan lez pêk hatin û şandibûn girtîgehên din. Cemal Şerîk û Burhan weke teqawîdên Çanakkaleyê bûn. Ji kevin de li wir dimînin. Weke xwe li Çanakkaleyê bicih kiribûn! Hesen Şerîk jî li Dîlokê dima. Cemal di temenek biçûk de peywendiyên xwe bi hevalan re çêkiriye. PKK'yiyê herî ciwan ê Tuzluçayirê bû! Dema ez çûm mala wan a li Tuzluçayirê, min tenê xwîkên wî dîtibûn. Min Hesen jî li Elezîzê bi mebesta xebatên çapemeniyê nas kir. Cemal bi bejna xwe ya gir ve, biçûkbûna xwe dabû jibîrkirin. Burhan jî neviyê Bakil axa bû. Bakil axa bi îdîaya sîxûr e, li Dêrsimê hatibû cezakirin. Rast bû, peywendiya xwe bi dewletê re hebû. Lê dibêje; "ne li ser bingeha sîxûrtiyê ye. Lewma mirinek wisa heq nekiribû, lê em çi bikin kuştine." Hevalê Burhan kesayetek sakîn, kamil û kûr bû.

Hêj li girtîgehê ti hevdîtinek navxweyî tine ye. Dema min behsa hevdîtinên me yên li Amasya û Amedê dikir, kêfxweş dibûn. Min got; "em dikarin li vir jî pêş bixin." Can got; "navbera te û Hamilî çawa ye?" Min diyar kir ku, ne baş e. "em dikarin pişt re bi-axivin."

Zûbeyde piştî demek kin hat berdan. Lê qabadayîtiya xwe ya berê derbas nekiribû. Heta zêdetir derketibû pêş. Demekê li Dîlokê jî mabû. Li Dîlokê ew û Mûrveta ji TÎKB'ê hebûn, pişt re hatibûn Çanakkaleyê. Dema derket jê re hat gotin ku, dê peywendiyên xwe çawa bi Partiyê re çêke. Lê destpêkê diçe

cem Yilmaz Daxli. Her du jî kêfî ne, her tiştî li gorî xwe amade dikin. Dema me ev nêzîkbûna wan bihîst, agahî şand ji wan re. Piştî demekê li heman qadê ji malbatan hinek kes din jî hatin girtin. Lewma nivîsa pêwîst bû lez were hundir, negiha destê me. Li her girtîgehê li ser malbatan helwestên çewsîner hebûn.

Di peywendiyên di navbera girtîgehan de qutbûn heye. Em hewl didin bi nivîsên cur be cur ve vê astengiyê derbas bikin. Lê têrê nake. Nexasim cewhera polîtîkayên me yên berxwedaniya girtîgehan û li ser şêweya pêkanîna wan, hinek nîqaş dihatin meşandin. Dema em li Amasya bûn mijara Muzaffer digot; "ma hinek rêbazên din tine ne? Ma em nikarin afirîneriyê pêş bixin?" Di vê xalê de bû. Can jî, di vê mijarê de zêdetir xwedî hewldan, çalak û pêşdîtinê bû. Dijmin cardin Eskîşehîr kiribû rojeva xwe. Me beriya wê jî du şehîd dabûn. Dîsa pergala goşegiriyê ferz dikirin. Ev jî ne tesadûfî bû. Me nîqaşa derbarê vê de destpêkê di navbera xwe de meşand. Pişt re me weke nêrîn û pêşniyarên hevbeş ji hevalê Karasu wan û ji girtîgehên din re şand.

Polîtîkaya me ya li dijî êrîşên dijmin diyar bû. Dê qetiyên destûr ji êrîşên li hember rêgezên me yên bingehîn û destkeftiyên me nehatibûna dayîn. Kesî jî nedikariya vê destûrê bide. Lê dijmin jî her carê hewl dida rojiya birçîbûnê, rojiyên mirinê û îsyanan ser me ferz bike û me jî bikişîne wan zemînan. Lewma hewce dikir em di vê mijarê de dijmin vala derbixin û wê çekê ji destê wan derbixin. Diviya em berxwedaniyên xwe di însiyatîfa xwe de, bi têkoşîn û şerê me yê derve ve girêdayî guncav ji nû ve sererast bikin. Mijarek hesas bû. Dikariyan pir hêsan tewanbariyên weke 'rastgir in' pêş bixistan. Lê tevî vê asta nîqaşek ku giştî bigire nava xwe

avakirin, afirîner, saxlem, bernameyek li gorî demê, plansaziyek berxwedaniyê, avakirina sazûmaniyek jiyanê ji her tiştî zêdetir hewce dikir.

Ji van nîqaşan re bersiva herî tund ji girtîgeha Aydinê hat. Em weke kesên ku ji siyaseta çepgirên Tirk bandor bûne nirxandibûn. Dihat gotin ku, ne rast e ji bona her tiştî rojiya birçîbûnê û rojiya mirinê yên demdirêj pêk werin. Ji ber dema hinek girtîgeh bi helwest, qedexeyek herî biçûk ve rû bi rû dihatin, yekser dest bi rojiya birçîbûnê, rojiya mirinê dikirin. Xwezayî girtîgehên din jî ber bi wê ve dikişandin. Mijarên ku hewce dikir werin rexnekirin, an jî bihatan sererastkirin ew bûn. Her çiqas polîtîkayek me ya giştî nebû, me nedikariya em nêzîkbûn, helwestên cuda yên cihên cuda rû bidin pêşî bigirin. Lê girtîgeha Aydinê ji ber vê rexneyên zêde dijwar pêş xistibûn. Girtîgeha Ceyhanê bi giştî erênî nirxandibû. Lê diyar kiribûn ku, çi dibe bila be, divê Eskîşehîr were astengkirin. Dîlok zêdetir erênî nêz bibû. Nêrîn, nirxandin û pêşniyarên xwe zelal kiribûn. Me jî li ser bingehan tiştek ji hev cuda nedigot.

Ji ber cewhera pirsgirêka heyî baş nehatibû fêmkirin, nîqaş û pênase diçûn gelek seriyan. Li hinek cihan ji ber van nirxandinên me, meylên ku bêjin; “xêre hûn her kêliyê rojiya birçîbûnê didin destpêkirin” û berxwedaniyê hewce nebînin derketibûn pêş. Berxwedanî tenê bi hinek çalakiyên rojiyên birçîbûnê ve girêdan, ji bilî wê berxwedanî weke şêweyek jiyanê nedîtin û weteya wê ya divê mirov devjê bernedê tine bû. Ya rastî yên xwedî meylên wisa kêm bûn. Bi gelemperî ti însanên me ne li dijî vê berxwedaniyê bûn. Welatparêz û dilxwazek me yê herî ji rêzê jî, dizaniya ku nabe mirov bê

berxwedanî bijî. Berxwedaniya PKK'ê bi giştî jî ev giyan ava kiribû. Jixwe bandorên giyanweriya berxwedaniya mezin dihatin jiyîn û zindî bûn. Lê dema ew polîtîka bi şêweyek afirîner û ji her alî ve nedihat destgirtin, nedihat zanîn ku divê berxwedanî di kîjan mercan û li hember kîjan hedefan were meşandin. Di heman demê de tespîtek rast di derbarê encamên ku ava bikin de jî nedihat kirin.

Nîqaş û nivîsên me yên derbarê rêbazên pêkana polîtîkaya me berxwedaniyê de wê di pratîkê de çawa bin, didomiyan. Di demek wisa de ji hêla Rêbertiyê û Partiyê ve di derbarê girtîgehan de perspektîf û giştîname hatin. Bi vî rengî peyama sala me ya nû derbasî hundir bû. Ji ber girtinên dawî û sedemên din dereng jî mabe, nirxandinek di vê astê de derbasî hundir kirin gelekî watedar û girîng bû.

Di nivîsa bi îmzeya Rêbertiyê hatibû nivîsandin de;

Sernivîsê "ji bona hemû rêhevalên di girtîgehan de li ber xwe didin!" destpê dikir. Her wiha; "me deh salên girîng ên gelek pêvajoyên têkoşînê di nav de hatin jiyîn, li paş xwe hiştin. Lewma kin jî be nirxandina hinek pêşketinan û bi ketina sala nû re silavkirina we hevalên girtî ya herî rast e…" nivîsê wisa berdewam dikir. Di beşên dawî de behsa polîtîkayên dijmin ên derbarê girtîgehan de dikir. Dida diyarkirin ku divê em di van mijaran de zêdetir hişyar û baldar nêz bibin. Ne rast e ku her tim çalakiyên rojiya birçîbûnê û rojiyên mirinê werin lidarxistin. Êrîşên bingehîn diyar in, lewma divê em li hember van amade bin. Her wiha ya girîng em giraniyê bidin karên ku piştewaniya derve bikin. Diyar dikir, nexasim divê di karên nivîsê de, xebatên huner û wêjeya şoreşgerî werin pêşxistin. Ji ber di ragihandina berxwedaniyê de karê herî girîng ev e. Dîsa

divê tevkariyek baş ji kovar û rojnameyên weşanên partiyê yên li qadên legal derdikevin re were kirin. Her kes di vê mijarê de rolek çalak bilîze. Li gel van hewce dike xwe gihandinek sazî û dezgehên demokratîk pêk were û bi derdorên legal re peywendî werin pêşxistin. Ew derdor werin birêxistinkirin û bikevin nav liv û tevgerê. Ji bona vê jî yên bikaribin zemîn û mercên vê herî hêsan ava bikin em in. Rêbertiyê ev mijarên girîng bi hemû ziraviyan ve rave dikir.

Her wiha destnîşan dikir, dibe ku hinek avabûnên nû bikevin rojevê. Ango polîtîkaya partiya me ya di vê mijarê de pir zelal e. Dixwaze eniya siyasî ji bin venêrîna dijmin derbixe û têkoşînê di nava her derdorê de berfireh bike. Ev jî weke hewcedariya nêrînên giştî derdikeve holê. Di vê çarçoveyê de di her mijarê de însiyatîfa me heyî diyar dikir. Herî dawî jî digot; "serkeftinê ji we re dixwazim. Hezkirinên xwe dişînim"

Me di kovarên Serxwebûn û Berxwedanê de hinek dahûrînên cur be cur dixwend. Her çendî bi sînor jî bin, weşanên partiyê diketin destên me. Lê dema nivîsek wisa yekser ji destên Rêbertiyê dihat tiştek cuda bû. Kêfxweşiya me tevan bilind bû. Nexasim dema me dît hinek nirxandinên me bi perspektîfên Rêbertiyê re hevûdû digirin û dibin yek, vê zêdetir bawerî û dilşadiyek mezin da me. Me jî ev rastî di nameyên ku me ji girtîgehên em tund rexne dikirin re şandîn de rave dikir. Me di firsenda destpêkê de perspektîfên Rêbertiyê ji girtîgehên din re jî şandin. Hinek cihan demek kin de girtin, lê li hinek cihan dereng ma. Tevî vê me mercên heyîn pêşde birin û çarçoveya perspektîfê ji her kesî re ragihand.

Ji bilî nivîsa Rêbertiyê, Şener jî nivîsek ji min re şandibû. Di vê nivîsê de piranî pêşketinên derve û erkên me yên di zindanê de hatibûn nivîsandin. Rexne û nêrînên Rêbertiyê yên derbarê pirsgirêkên şer û partîbûnê de, hem jî taybet ên derbarê zindanê de zelal û berfireh nivîsandibûn. Ango nivîsek li ser esasê perspektîfên Rêbertiyê hatibûn nivîsandin bû. Lewma min got; "mîsoger Rêbertiyê daye nivîsandin. Nexwe ew jî dizane ku hundir hesas e. Kes nivîsek wisa bi îmzeya Şener qebûl nake û ti qîmetê jî nade. Jixwe rast jî nayê dîtin." Ji ber bi perspektîfa Rêbertiyê nivîsandî re hatibû. Naveroka wan jî ji hev nedûr bû. Herî zêde jî kêfa min ji vê re jî hat. Meşa bi partiyê re, qet nebe li ser bingeha rastiyên partiyê xwe têkil pirsgirêkan kirin mijara herî girîng bû. Me jî ev nêzîkbûn wisa nirxand. Weke din Şener jî di kêliya hevpeyvîna Rêbertiyê ya bi Doxu Perînçek re amade dibe. Bi wêneyek wisa ve di kovara 2000'e Dogru de hatibû weşandin. Bandora nûçe û gotinên destpêkê dişikand. Can got; "wer yeqîn dikim dê stêrka Şener bibiriqe. Baş e… ger kar bike û xwe tevlî bike dê feydeya wî zêde be." Di ferqê de bû ez pir kêfxweş bûme. Di heman demê de kêfxweşiya min jî bi min re parve dikir.

Lê ti caran baweriya min li hember Doxu Perînçek çênedibû. Nêzîkbûna wî ez ji wî dûr dixistim. Çavên wî yên polîtîk zêde ecêb bûn. Di pêvajoyên wisa de derdiket holê, tam weke şovmenekê bû. Wisa jî piştî Bîrand (Mehmet Alî Bîrand Rojnamevan) polîtîkavanê herî wêrek ê bi Rêbertiyê re hevdîtin kiriye derdiket holê. Çepê Tirk jî ji ber hevdîtinên wî yên bi me re aciz dibû. Ew jî ecêb bûn. Weke ku hevdîtina bi Doxu re her tiştî rave dike, digirtan dest. Lê di rastiyê de heman weke

hevdîtina bi Bîrand re bû. Tufan radikirin û digotin; “ma Doxu kî ye? Oportînîstê herî mezin e. Hûn nikarin kesek wisa derbixin pêş û şaş e hûn wî muxatap digirin.”

Ya rastî ne tenê ji bo peywendiyên bi Doxu re bertek raber dikirin. Li hember nêzîkbûnên me yên ji Yalçin Kûçûk û Îsmaîl Beşîkçî re bertek raber dikirin. Hinek kesên ji çepên Kurd zêde xirab êrîşî Beşîkçî dikirin. Cewhera van nêzîkbûnan rastiya li hember Kurdistan û şoreşê rave dikir. Di heman demê de carek din rastiya xwe jî derdixistin holê. Bextreşiyek bû! Bi qasî nedikariyan şoreşa Kurdistanê re îtîfak ava bikin, zemînê hevbeş ên têkoşîna bi wê re ji eniya xwe ve ava bikin, li hember peywendiyên hinek komên din herî xwezayî jî bertek didan nîşan. Yeqîn dikim ev nêzîkbûn jî tenê ayîdê çepgirên Tirk û Kurd bûn. Di heman demê de beredayîbûnek dîrokî bû.

Berî her tiştî, cihê her kesî cuda bû. Mamoste Îsmaîl, dilê herî pak û gerim ê gel bû. Nêzîkbûna wî ya ji gelê Kurdistanê, şerê me û Rêbertiyê re bi zanistî bû, rasteqîn bû, bi dostanî û biratî bû. Kesî nedikariya vê peywendiyê di bin navê şoreşgeriyê de qut bike û li pêşiyê bendan ava bike. Nexasim hinek komên Kurd bi zanebûn yekser dijûn jê re dikirin. Mamoste Yalçin, weke mirovê kes nikare pê re bijî îlan kiribûn. Dibê qey ew pir xweş dikarin bi mirovan re bijîn!

Lê Doxu cudatir bû. Peywendî û baldariya wî ne ji ber dûrbûna ji polîtîkayên heyî bû. Xisleta çîna wî û xeta nûnertiya wê dikir, herî zêde jî ji aliyê PKK’ê ve dihat zanîn. Mijara ku komên din jibîr dikir, an jî nedixwestin fêm bikin jî ev xal bû. Ji ber nêzîkbûnên teng û dogmatîk, dikariyan tewanbariyên zêde erzan pêş bixin. Digotin; “weke ku, yên îxbara we kirine,

hatine li dadgehan li dijî we şahidî kirine ne kesên ji PDA ne, her tişt hatiye jibîrkirin.” Ev jî nêzîkbûnên xwezayî bûn. Nabe mirov jî her tim li benda nirxandinên cuda be. Ji ber bi salane heman, guman, şaşî serwer in, ji ber vê nikarin di navbera xwe de jî îtîfaqek rast û durist ava bikin û yekîtiyê saz bikin. Xweziya hemû pirsgirêka me Doxu bûya. An jî her tişt weke oportonîzma wî bûya!

Tişta bingehîn a bala me dikişand cuda bû. Di kovarê de nivîsên di bin navê; “di hevpeyvîna bi fermandarê wargehê Metîn re hatiye pêkanîn de, fermandar Metîn wisa dibêje" de mijarên zêde ecêb hatibûn nivîsandin. Jixwe me jî nedizaniya ku Şahîn Balîç e. Nexasim hinek mijar em metel hiştibûn û didan hizirandin. Ev jî dibûn bingehek ku kêm jî be, em hinek pirsgirêkan fêm bikin. Lê ne bes bûn. Me nedikariya em bi wan nêrînên biçûk nirxandinên berfireh û pênaseyan bikin. Ev zehmet bû. Tiştek din jî di destên me de tine bû. An jî me nedikariya em, pirsgirêkan di wê astê de binirxînin. Ev xalên bingehîn tev jî hebûn.

Di beşek hevpeyvîna Doxu de pirsek weke; “ma li wargeha we êşkence heye?” dihat kirin. Bêguman, ev pirs pir bi zanebûn hatibû kirin. Metîn jî bi gotinên; “na, êşkence tine ye. Lê carê ji bona em hinek tiştan bigirin, wisa kulmekê li zikê wan didin” bersiv dabû. Em hemû metel mabûn. Can, ew beş cardin bi dengê bilind xwend. Hêrs bibû. Ji hêrsa xwe dijûn dikir. Digot; “fermandarê wargehê çawa wisa dibe? Bersivek tam beredayî ye. Mîsoger vî zilamî êşkence kirine û dike. Ev bersiva wî, ne bersiva fermandarek şoreşger û fermandarek PKK’ê ye. Çawa dikare bêje, ‘em wisa kulmekê li zikê wan didin!’, bersivek kesek tam ehmeq e. Zimanê wî jî tam çeloxwarî ye! Tam

zimanê kesên beredayî ye. Divê mirov van binivisîne. Emê rexneyên xwe ji partiyê re ragihînin. Êdî ser disekinin an na, ew dizanin. Lê divê kesên wisa di çapemeniyê de dernekevin. Mijarên zêde hesas in. Jixwe Doxu jî van pirsan bi zanebûn dike. Zilamek weke gura ye. Mîsoger hinek tiştan dizane. Jixwe di kovarê de nûçeyên weke, 'PKK sîxûrên di nava xwe de dadgeh dike û dikuje' hatibûn nivîsandin. Ew çîroka sîxûrê di kovara Serxwebûnê de derketî jî di hişê me de mabû. Bal bidin ser gelo îfadeya hemûya ne, rapor e, an jî her çi be di encamê de hemû axaftin gotin bi gotin xwedî heman naverokê ne. Piştî ku min ew nivîs xwend, êdî gumanê min hene ku wî nêrînê xwe li ser bingehek rast diyar kirine an na. Êşkence li wan jî hatine kirin. Gotinên dibêjin, 'poşman im, afûya xwe dixwazim' ayîdê kî ne? Di vir de fesadiyek xirab heye. Lê em nizanin."

Em jî texmîn dikin ku di çalakiyên li dijî cerdevanan de, di qadên pratîkî de hinek pêkan ji xetê derketine. Şêwazê çalakiyan û encamên wan feraseta partiya me rave nedikirin. Dijmin zêdetir bikar danî û rê ji pêşketina çetegeriyê re vedikir. Me jî digot; "sedema evqas çetegerî pêş dikeve bandora şêwaza çalakiya ne." Beriya niha demekê jî gelek çalakî bi navê ne yê me ne, kesî negirtibûn ser xwe. Heta me li dadgehan şermezar kiribûn. Lê pişt re derdiket holê ku, çalakî yê me ne. Mixabin çalakiyên di şêwazên pratîka kontra de bû. Vê jî partî tengav dikir.

Dema di sala 88'an de provakasyona Hisên Yildirim derket holê, me di vê mijarê de ji bona ti fersadî dernekevin, belgeyek bi navê "yên di zindanê de cuda difikirin, ev jî nivîsên rexneya ne", ji bona bikar bînin amade kiribû. Ji bona me agahî girtibû

ku, arşîva me ya li Awrûpa di destên provakasyonan de ye, me ji partiyê re nivîsek rexnedanê nivîsandibû; "çi dibe bila be, heta ku pêşketinên derve neyên şopandin, bê ku li benda daxuyaniyên partiyê yên fermî bimînin, ne rast e ku em li dadgehan lez bikin û helwest raber bikin. Em jî didin diyarkirin ku em rexneyên xwe dubare dikin."

Di pêvajoya derbasbûyî de şaşiyên bi vî rengî dihatin dubarekirin. Di hinek dahûrînên Rêbertiyê yên di destên me de jî rexneyên cidî hebûn. Lewaziya afirîneriya taktîkî, pirsgirêkên qadro yên partîbûnê û rexneyên derbarê xebatên gelek qadên pratîkî de, perspektîfan em jî dixistin nav lêhûrbûnan. Em jî şandina rexneyên xwe ji bona partiyê, erka xwe dibînin. Ger hinek şaşiyên me hebin jî, dê partî me di van mijaran de hişyar û rexne bike.

Li kêleka van pêşketinan tevan, mijarên min dawiyê di derheqê Şener de bihîstin û nivîsa wî, bi min re rehetiyek ava kir. Em ji hev re dinivisînin. Rojnivîsa xwe jî berdewam dikim. Lê Cahîdê em hişyar kirin ku, her tiştê ji Amasya derdikeve di bin venêrîna dijmin de ye. Ev jî mîsoger bû. Gelo dibe ku gardiyan ji bona her du aliyan kar dikir? Ji ber me nivîsên xwe dixist nav zarfê û dida, wî dida posteyê. Temam, ma zarf werin vekirin, nayê ferqkirin? Wê jî bi hostatî dikin. Teknîk pêş ketiye. Nexwe li Çanakkaleyê jî heman tişt dibûn. Me dikariya em wan asayî bi rêya îdareyê jî bişînin. Bes îdarê nivîsên weke name û rojane bi rêk û pêk nedişand. Her carê hêcetek derdixist. Me carê ji aliyê xwe ve bi şifre û sergirtî dinivîsand. Lê me carê bê ku di ferqê de bin hinek derî jî vekirî dihişt û şaşî didan der. Ger dijmin her tim bişopanda, dê hinek tişt fêm bikiran. Jixwe me notên girîng nedidan. Lê belê, rojnivîs

bêsînor dihatin nivîsandin, dikariyan wan lêkolîn bikin, xisletên kesayetên me nas bikin, aliyên me yên lewaz û bihêz derbixin holê. Ji ber dijmin bû, dixwest heta şaneyên me yên herî biçûk me nas bike.

Karasu di nameyekê de destnîşan kiribû ku, divê ez hinek din baldar nêzî zimanê xwe yê rojnivîsê bibim. Digot; "em te û hestên te dizanin û nas dikin. Lê dibe ku derve cuda binirxîne. Tu pir aramî, vekiriyî, hestiyarî, lê ji bîr neke xweseriya her naverastê heye, ew jî di nav mercên xwe de wateyekê rave dike. Dibe ku bi hinek xweseriyên din re nebin yek. Lewma divê em jî hişyar nêzî vê bibin. Ango şaş fêm neke, ji aliyê me ve ti pirsgirêk tine ye. Lê heval dibêjin, 'zêde hestiyar nêz dibe. Tu dikarî nivîsên zêdetir bihêz û naveroka wan siyasî binivisînî. Heval jî li benda nirxandinên wisa ne…"

Diyar e, wisa bi zehmetî nivîsandiye, dibê qey ezê yekser bişkêm. Ji ber ez dixwînim vê baş dihesim. Min şaş fêm nekir, lê bandor bûm. Ev rexneyek bû derve û hevalan kiribû. Berî wê min her tim ji Yildiz û Hesen re digot; "bixwînin." An jî min dixwest nêrîna wan jî bigirim. Yildiz jî nirxandinek kiribû; "tiştên ku te nivîsandine weke nivîsên Rosa Luksemburg a 'nameyên ji hezkiriyê min re' hatine nivîsandinin. Te çav li wê kiriye…" di nameya xwe de nêrînên wisa nivîsandibû. Min jî ev nêrîn û rexneyek zêde çors û teng nirxandibû. Nameyên hemû bi heman rêbazî dihatin nivîsandin. Nameyên min ji bona wê jî dinivîsandin bi heman rêbazî bûn. Ji yên din ne cuda bûn. Hemû jî bi rêbazê zimanê rojnivîsê dihatin nivîsandin. Dikare naveroka wan rexne bike, lê ew nirxandina çav li hinek din dike zora min çûbû. Lewma min jî qebûl nekiribû. Ji ber bi rastî jî tişta ku bi min re qet tine bû, ew jî çavlêkirin bû. Ji ber

çavlêkirin ne li gorî xwezaya min bû. Gelek xisletên kesan ên ez bandor kirîm hebûn. Gelek mirov û xisletên ku heyrana wan bûm hebûn. Bedewî û xweşiyên bi hinek kesan re, bi min re jî hêz û enerjiyek ava kiriye. Min enerjiyek bikaribim li şûna xwe jî, şûna hinek din jî û şûna kesên ku bikaribin heman enerjiyê bihesin jî, enerjî û hêzek kombûyî bijîm. Ez parvekirina bi vê mijarê re zêde vekirîbûm. Ez gelek mijarên ku di-ecibînim, pesnê wan didim bi deng rave dikim. Lê min ti caran nêzîkbûna çavlêkirinê hez nekir. Nêzîkbûna çavlêkirinê, xisletek ku herî zêde jê dûr disekinim bû.

Na, divê mirov evqasî jî erzan her tiştî nebêje. Gelo ev nêrîn li ser kîjan bingehan digot. Ji kur derdixist? Gelo ji bona min xîtabê hinekan dinivîsand ji ber wê wisa dinirxand, an jî naveroka wê zêde xweser û taybet dihat dîtin ji ber wê bû? Min nedikariya vê qebûl bikim. Nabe ku xwezayîbûna bi kesayeta min re bişibînin yeke din, an jî weke çavlêkirinê were nirxandin! Dibe ku li gorî hinekan zêde cuda, cihê, hinek xisletên pir taybet hebûn, ji ber di kesayeta min de zêde ahengek tine bû û min di vir de înad dikir. Her çendî ji Şener re jî binivisînim, wê nêrîna çav li nivîsên Rosa yên ‘nameyên ji hezkiriyê min re’ kirinê zêde bêhna min teng kiribû. Min wate dida ku Karasu çima hestiyariya min rexne dike. Di heman demê de baweriya min pê hebû ku, divê ez baldar û hişyar nêzî vê rexneyê bibim. Lê ev rexneya çavlêkirinê giran bû. Dihat wê wateyê ku rastiya mirov nizane, ew bi zorê li gorî hinek qaliban nirxandin bû. Min wisa şîrove dikir. Lê li gorî cewhera wê jî ji hemû rexneyan zêdetir jî cidî digirim. Herî zêde dihizirim ku çima ez ji encamên wisa re rê vedikim, ji ber ez zemîn didim. Di vê mijarê de jî ji xwe aciz dibim.

Min dev ji nivîsandina rojnivîsê berda. Êdî qet nenivîsand. Yên heyîn jî min ne şandin derve. Lê mixabin ji bona min, rastiyek nivîsandî tinekirin, weke qetilkirina tiştek zindî bû. Min rojnivîsên xwe dabûn Can û jê re gotibû; bigirin hûn tine bikin. Ez naxwazim bibim qatilê nivîsan. Ger êdî rojnivîs jî dibin mijarên nîqaş û rexneyan, bi burjuvaziya biçûk û teqlîtkirina Rosa ve têm tewanbarkirin, ez jî êdî nanivîsim. Teqez êdî nikarim binivisînim. Di wir de her kêliya jiyana me heye. Dibe bu nirxandinên siyasî yên gelek bihêz tinebûn; dewsên bûyerên hêsan, ji rêzê û hatine jiyîn hebûn. Dîsa jî ne pir bê wate û zêde nedûrbûn. Rastiyên me bi xwe bûn. Jiyan, hest û hîsên wê rastiyê bûn. Xwedê dizane niha ev aliyê wê qet mereq nekirine. Tenê bela xwe li hinek peyv û hinek pênaseyan dane û kirine serê xwe.

Dizanim, heman wisa ye. Min bi bertek got; “ez ji bona her kesî weke ‘Yildiza min, ‘Hesenê min xîtap dikim. Ji wan re dibêjim çavên we radimûsim û we hemêz dikim. Ev jî di hundir de xwezayî bûn, xirab nedihatin dîtin. Lê derve nexasim ji ber ferasetên me yên teng û muhafazakar, dibe ku ji bo hevala me Yildiz têgehên ku pîvanên wê yên exlaqî bixin nav zehmetiyê bin.” Pey re jî rojnivîs kir destê wan. Wî jî xwendin û got; “rexneyên te hemû ne rast in. Ne weke burjuvaziya biçûk û teqlîtkirinê, lê di bertek û hestan de hinek bêpîvanî û bêsînorî heye. Weke din jî ez di pênase û nirxandinên te de hinekê nêzîkbûnek subjektîf dibînim. Mînak dema te nêzîkbûna min a malbatî nirxandiye de nêrînek subjektîf heye. Nirxandin û şîroveyên te zêdetir girêdayî ziravî û diyardeyan pêş ketine. Ev jî dibe sedem ku, tu yekbûna rastiyan bi hev re û rewşa siyasî

nebînî. Lewma tu pir hêsan dikarî ber bi xwe xapandinê ve bibî. An dê dibin sedem ku tu encamên tê xwestin negirî. Ji ber bandor dike.”

Belê, rast bû. Ez zêde bi diyardeyan ve asê dimam. Bandorbûnên destpêkê, çavdêriyên destpêkê, xelekên ku hevûdû eleqeder dikin, girêdanên wan rast, di wext û cih de avakirin, bi hevsengiyek hundirîn ve sebrek mezin raberkirinê de lewazî tên jiyîn. Lewma nêzîkbûnên li şûna çareser bikin, lez, bêsebir, bêtevdîr û bêhesab pêş dikevin. Min nedikariya rastiyên di dest, temamkirina tiştên nîvî de mane domdar bimeşînim. Min hewldanên xwe ber bi encamên xirab ve dibir. Ev jî xwezayî aliyên ku mijarên esasî, cewherî rave dikin, aliyên erênî yên hatine bidestxistin winda bibin, rolek berovajî bilîzin û bibin sedem ku nirxên heyîn pir hêsan werin windakirin. Ev bêpîvaniya di şêweya dîmenên min de derdiket holê, di serî de jî aliyên min ên erênî dixist, dikuşt û sî danî ser.

Her çendî hinek tişt zora min biçin jî, dema mijarên dihatin rexnekirin, bi nîqaşan dihat vekirin ji bo min baş dibû. Her ku dihat nîqaşkirin, min jî diyardeyên heyîn di nava yekbûna jiyanê de, di nav rastiya peywendiyan de, min encamên ava kirine baştir didît û têdigihiştim. Ger fêrbûnên peywendiyên jiyana salan, mercên ew dorpêç kirine, xisleta guhertin û veguhertina şoreşgerî ya di nav xwe de nedin jiyîn û bidest nexin, dê rewşek paşverû derbixin holê û cihê bimînin. Ew dûrbûn, qutbûn û tenêbûna navendên bi tufan ava kirine, hestiyariyek mezin û kûr ava dikin. Li aliyekê seriyek tam dûr, ji qinyat, bawerî û hestan valabûn, xwe xilaskirin, aliyek din ve jî, bi hêza baweriya xwe ve girêdan û hemêzkirina wê dihat jiyîn. Di xala duyan de tişta herî girîng bê ku mirov dev ji şerê

hundir berde, bikaribe quralên wê hostane bimeşîne û girêdanê esas bigire ye. Gelek caran me dil nedida em hevûdû rexne bikin. Me bertek, hêrs, hestên xwe yên tolhildanê, îsyanên xwe li hember dijminê xwe yê hevbeş bikar danî. Em her roj bi wî dijminî ve rû bi rû bûn. Me berê tîrên xwe dabûn wir. Di heman demê de şerê me jî yekane bû. Rastiyek me ya di çarçoveya bawerî, girêdan û rêxistinê de, bi pîvanên giştî yên hevalbendiya şer, bandora wê ya manevî ku bi salan hatiye jiyîn hebû.

Bes êdî nedibû ku, mirov xwe ber bi wext, jiyan û tufanên wisa bi salan dirêj dibin û diçin ve berde! Divê mirov xwe di nav hemûyan de belav bike, lê nehêle mirov parçe bike, mirov bigire bibe û ber bi xeternakiyan ve biherikîne. Divê mirov li ser wan serwer be, qet nebe hêza mirov zora wan bibe, hêza mirov têra wan bike, xwe ava bike, da ku mirov bikare li hember darbeyên wan bendan çêke. Di vir de mîsoger pêdivî bi tevdîran heye. Ger wisa be, dê wateya xeyalên bedew, bêrîkirinên xweşik, hestên ku di cihê xwe de nasekinin jî hebin. Ger mirov di cihê xwe de biherike, dê derfetê xwe xwedîkirinê jî bibîne. Nexwe weke din mirov nikare di nav derya mirov ber bi azadiya mezin ve dibe de, xwe ji pêlên dijwar ku baskê mirov bişkîne rizgar bike…

Pêşketinên derve çêdibin hêz û moralek mezin didin. Roj tine ne rojname û tv behsa PKK'ê û şerê me nekin. Tevî her cure hewldanên reşkirin û berovajîkirinê, encamên çalakiyên gerîlayên çiyê û serhildanan ava kirine dihatin texmînkirin. Gerîla di nava gel de bersiv dîtibû. Li Cizîrê, Nisêbînê, Kerboranê û gelek cihên din serhildanên heta ber bi bajarên mezin ve diçûn, bandor li metrepolan jî dikir. Me jî agahiyên heyîn ji kesên ku dihatin serdanên me digirt.

Eniya Tirkiyê hêj jî bêdeng bû. Her çendî li girtîgehan nîqaşên li ser bingeha 'Yekîtî' bên meşandin, ew zêde nediketin meriyetê. Gelek koman bernameya Yekîtiyê ava dikir, daxwiyanî belav dikir, lê mixabin bê ku gavên pratîkî werin avêtin, yekser xirab dibûn. Li pey wê jî nîqaşên nû diketin rojevê. Şêwazên xwe dubare dikir û kevneşopiyek muhafazakar hebû! Her çendî em hewl bidin bêhêvî û niyetek baş nêz bibin, ji ber me rastiya pêşketinek berbiçav nedidît, me tenê dikariya guman û rexneyên xwe yên şoreşgerî diyar bikin. Lê pêşketinên li Kurdistanê bandor li wan jî dikir. Ji ber têkoşîna me bê navber dimeşiya, her ku diçû digiha astek bilind, di astek girîng de nêrînên wan ên kevin jî vala derdixist. Peywendiyên me li ser bingeha rêzdariyê, rexnegiriyê, pêşxistina zemînên yekîtî û dostaniyê, hatina cem hev, di asta herî kêm de jî, li ser bingeha avakirina berxwedaniyek hevbeş a li dijî dijmin e. Armanca me ya sereke ev bû.

Têkiliyên me yên derve jî didomiyan. Çalakiyên weke rojiyên birçîbûnê jî di nava van girtîgehan de ji bona tevgera hevbeş di astek girîng de hatibûn rûniştandin. Her çendî nêzîkbûnê hinek koman ên teng û gurub hebin jî, êdî giştî bandor nedikir. Tenê Dev-sol weke qotiyek girtîbû. Rêxistinek wan hundir ecêb bû û şêwazek cuda derve xwe dida der hebû. Bi gelemperî xwe di ser hemû koman re didîtin. Xwe cuda, herî şoreşger, taybet em biçûk didîtin, tevî 'netewperestiya me ya burjuvaziya biçûk' li gorî yên din em muxatab dihatin girtin. Lê dîsa jî dûrî me disekînin. Piştî reva D. Karataş derve di nav komê de di bin navê ' Pêvajoya Nû' de dana destpêkirin, di zindanan de pir xeter derdiket holê. Her çendî ez zêde ji gotina ' hesabxwestina navxweyî' hez nekim, neçarim ji bona wan

bikar bînim. Belê, hesabxwestinek hebû, her çiqas astên vê neyên zanîn, tenê rewşa di girtîgeha Çanakkaleyê de derdiket holê, bes bû ku mirov xeternakiya wê bizane.

Elî Akgûn, ango Elî'yê Gawur ê Elezîzê zêde hatibû guhertin. Demek dirêj bû min nedîtibû. Me di di erheqê wî de gelek agahiyên spekûlatîf bihîstibûn. Ya rastî Gawur ji berê ve 'zilamê bûyeran' bû. Di pêvajoya Elezîzê de îmaja bi me re dayî avakirin zêde nebaş bû. Lê pêvajoyek dirêj a zindanê hatibû jiyîn. Negengaz bû di nêvengek mirov bi dijmin re rû bi rû jiyan dike de, rastiya kesan dernekeve holê. Yên bi wî re jiyan kirîn, ew baş nas dikirin. Ew jî di pêvajoya dawî de li ser pirsgirêka Kurdistanê lêhûr dibû. Tiştek xwezayî bû ku her kom û her kesê dibêje ez, "Şoreşger im" xwe li hember rastiya Kurdistanê bi lêpirsînê re derbas bike. Hem hewce bû, hem jî rewşek neçar bû.

Elî'yê Gawur jî weke kesek Kurdistanî nedikariya li hember pêşketinên heyîn bêdeng bisekine. Di heman demê de qadroyek pêşeng ê rêxistinê bû. Lê Dev-Sol'ê nîqaşên wisa di navbera xwe de di astek paşverû de digirt dest. Elî'yê Gawur jî dixwest nîqaşan hem bi xwe re, hem jî bike malê hemû qadroyan û wisa bimeşîne. Nedixwest di kêliya yekem de derveyî komê bide nîqaşkirin. Guncav nedidît. Diviya zemînên veqetînê baş rave bike û dane holê, nexwe dê pir zû weke 'xayîn' bihata îlankirin. Helwestên wisa jî ne zehmet bûn, zû pêş diketin.

Em hevdîtinên xwe bi komên din re jî didomînin. Carê hevdîtinên me bi Elî'yê Gawur re jî çêdibin. Me di çend hevdîtinên dawiyê de li ser Kurdistanê pê re nîqaş kiribû. Bi taybet digot ku, li ser Kemalîzmê dinivisîne, girêdana xwe ya

nêrîna li ser Kurdistanê jî lêkolîn dike. Hinek gumanên xwe jî vekirî digot; “ezê nehêlim li pey min hinek tiştên cuda werin gotin. Ezê destûrê nedim vê. Ger niha veqetînên rêgezî bixim rojevê, dê yekser duvik bi min ve bikin. Ez vê dizanim. Di vê mijarê de jî hinek îdîayên ku rastiyan diyar nakin li holê belav dibin. Hinek ji derve hatine. Hinek nîqaş tên meşandin. Min nêrînên xwe fermî ragihandine derve. Lê hêj bersiv nehatiye. Dibêjin ku wê dema hevdîtinek pêk were…”

Em jî, Elî’yê Gawur jî di ferqa rewşa heyî de bûn. Can gumanên xwe pir vekirî jê re got; “pirsgirêka te bi rêxistinê re ye. Tu dixwazî di çarçoveyek fermî de çareser bikî, em ji bo vê helwesta te tiştekê nabêjin. Rêz digirin. Lê dîsa jî vekirî bêjim, tişta diyar dibe mijûlkirinek heye. Hinek şikên min hene. Ger tu guncav bibînî, dikarî werî qoxuşa me. Hewce nake tu li wir bimînî.” Gawur got; “na, her çendî berdêla vê giran jî be, ezê li wir bimînim.” Hevdîtina me ya dawî bi vî rengî bû. Xizmên wî ji Awrûpa hatibûn. Bi rêya wan diyar kiribû ku, neçar e li hember şoreşa Kurdistanê xwedî helwestek rast be û dereng jî maye. Ew jî peyamek bû.

Elî weke navê xwe dizaniya ku, dê were kuştin. Lê şahnaz bû. Nexwest navek din li pey xwe bixe. Di girtîgeha Çanakkaleyê de ji pişt ve ji yanzdeh cihan ve li Gawur dabûn û kuştibûn. Wê rojê tev li ser Elî’yê Gawur hat axaftin. Wê rojê em hemû li ser dawiya Elî’yê Gawur a trajîk hizirîn. Em cardin bibûn şahidê hesabxwestinek navxweyî û şêwazek hovane. Elî’yê Gawur li cihê herî zêde jê hez dikir, Elezîzê hat veşartin…

Pêşketinên derve zêde berfireh bûne. Girêdayî wê pirsgirêkên me jî mezin bûne. Em jî mijarên ku di weşanên me de derdikevin nîqaş dikin. Dahûrînên Rêbertiyê yên derbarê pêvajoya piştî 15'ê Tebaxê yên girîng hebûn. Digot; "ger pêşketinên di sala 85'an de baş bihatan nirxandin, me dikariya em mercên raperînek gelemperî ava bikin. Me dikariya em li Tirkiyê û Kurdistanê şoreşê ber bi serkeftinê ve bibin û pêk bînin." Di nivîsên xwe de ji rast nirxandina pêvajoyê, heta nêzîkbûnên qadro yên tengezariyan ava dikin gelek xalan dinirxîne. Rexne û perspektîf gelekî zelalbûn û pêşî vedikir. Lewma nîqaşên me jî li ser wan salan pêş diketin. Me jî hewl dida wan pêvajoyan fêm bikin. Di heman demê de em li ber diketin ku, çima çavkaniyên heyîn zûtir negihane destên me. Ji ber dema em dereng diman, me pirsgirêk û pêşketinên heyîn paşve dişopand.

Tişta herî baş heval li cem hev bûn. Lewma me dikariya em hûr û kûr nîqaş bikin. Min carê dikariya hevdîtinan bikim, lê me gelek pirsgirêk bi hev re dinirxandin. Nêvenga heyî zêde ne berhemdar bû, di asta dihat xwestin de nedibû. Di vê wateyê de ya ku rewşa bêşans ez bûm.

Piştî mijûlbûnek baş, me ancex karî em hinek dahûrînên derbarê pêvajoyên cur be cur derbasî hundir bikin. Hevpeyvînên Rêbertiyê yên bi hevalan re, xebata dimeşand, pirsgirêkên qadên şer ên di pratîkê de derdiketin holê hem bala me dikişand, hem jî dibû sedem ku em pirsgirêkên giştî baştir fêm bikin, wateya hewldanên di mijara çareseriyan de têbigihijin. Rêbertî bi her pirsgirêkê re mijûl dibû. Dahûrîna her qadê û kesî/ê dikir.

Ti rastiya Rêbertiyek wisa evqasî di nav de dijî, bi şêwazek afirîner yek bi yek çareseriya hemûyan ava dike tine bû. Gelek kesan nedikariya vê rastiyê fêm bike û ji watedariya wê jî dûr bûn. Em hinek pirtûkan didin hinek hevalên komên din jî, da ku bixwînin. Ji ber em dihizirîn ku dê mîsoger ji bona wan jî feyde be. Dixwendin, lê metel diman û giran didîtin. Digotin; "ger em wisa rexne li hev bikin, ser hev de biçin, yek ji me di nav tevgerê de namîne."

Belê, hevpeyvîn dijwar derbas dibûn. Rexne cidî û berfireh bûn. Me ji bona hinek gotin û nifrînan digot; "xweziya hevalan hinekê redekte bikiran û evqas tişt nenivîsandibûna. Hewce nedikir ku di bin navê axaftinên Rêbertiyê dene heta dûjînan jî binivisînin." Diyar e di vê mijarê de muhafazakariyek heye. Gumana me ew e, dibe ku hinek din, an jî dijmin bikar bîne. Em jî di nava xwe de zêdetir hewl didin pêvajoyê, erkan, pirsgirêkên hatine jiyîn û encamên wan fêm bikin. Nexasim mijarên Rêbertiyê tengav dikin, pêşketinên rû didin û şêwazên pêvajoyan neyênî bandor dikin hene. Dîsa jî em hewl didin van mijaran di çarçoveya dahûrînên di destê me de hene ve fêm bikin. Pirsgirêk cidî ne, rexneyên li hember vê jî cidî û giran bûn. Em dijûnên heyîn jî tenê weke dijûnînan fêm nakin, lê dîsa jî xemgîn dibin. Em ji ber rewşên ku Rêbertiyê tînin wê astê xemgîn dibûn. Ango me digot; "nexwe Rêbertiyê di vê astê de tengav dikin." Dîsa me digot; "xweziya nehatibûna gotin. Dê ji bilî me jî gelek mirov van nivîsan bixwînin. Ji ber rastiya me jî baş fêm nakin û nas nakin, dê herî zêde jî vê uslubê derxin pêş." Em wisa dihizirîn. Jixwe bi demê re jî wisa nirxandin.

Me şêwazên şaş ên di çalakiyên gerîla de jî di astek girîng de dikir mijarên nîqaşên xwe û dinirxandin. Di vê mijarê de nîqaşek girîng pêş ketibû. Di serdegirtinên gundan û êrîşên li dijî cerdevanan de zêdegavî hebûn, gelek xisletên ku ti eleqeya xwe bi şêwaza şerê me re tine ne derdikevin holê. Zerar didan têkoşîna me. Li şûna ku êrîş li dijî sipartek û navendên dijmin ên girîng werin kirin, zêdetir bi derdor û yên hêsan ve mijûlbûnek hebû. Em jî di nîqaşan de gihan vê encamê. Zemînê çetegeriyê jî wisa pêş diket. Ango rewşek berovajî dimeşiya hebû. Vê partî dixist nav zehmetiyan. Dijmin jî herî zêde di vê xalê de dij propagande dikir. Ev jî berfireh dimeşand.

Me notên xwe yên rexne û pêşniyarên têkildarî wan mijaran ji partiyê re dişand. Lê me nêrîn û pêşniyarên xwe yên derbarê dahûrînan de bi tevdîr dinivîsandin. Ji ber rexneyên me netêkildarî naveroka wan bûn. Piranî derbarê şêweya pirtûk, redektê de mijarên ku hewce dikir heval hişyar nêz bibin de bûn. Me li ser notê nivîsand; "bila neyê vekirin û bigihînin apê me" nivîsandibû. Em naxwazin li her derê were xwendin. Ji ber kesek din dikariya pir hêsan cuda binirxîne û bikar bîne. Ti ne mabû li hember Rêbertiyê bikar ne anîn. Di êrîşên xwe de her tişt bikar danîn!

Daxwaz û meyla nivîsandinê bi hemû hevalan re hebû. Piştî ferman û perspektîfên Rêbertiyê, her kes zêdetir cidî li ser karê nivîsandinê rawestiya. Ji ber êdî seferberiyek nivîsandinê ya wisa destpê kir, êdî kes nikare pêşî lê bigire. Xebatên weke roman, çîrok, helbest, ceribandin, lêkolîn û vekolînan hatin meşandin. Gezgor bi her kesê derdikeve derve re agahî dişîne, dipirse ku mijarên li girtîgeha Amedê nivîsandine çi bûye ji wan, gelo li guderê ne. Hêjî li pey wan nivîsa ye. Dixwaze teqez wê xebata xwe bi encam bike.

Muzaffer jî li Dîlokê hevpeyvînek bi qasî hezar rûpelî nivîsandiye. Kesek ji Dev-Yol'ê Muzaffer baş daye axaftin. Beşek wê nivîsandinê hat Çanakkale, me jî xwend. Me jî nivîsek dirêj a nirxandin, rexne, pêşniyar û sererastkirinê ji Muzaffer re şand. Ew jî baş bû. Her kes nikare Amedê binivisîne. Ger binivisîne jî, ancex dikare parçeyek biçûk a rastiya hatiye jiyîn binivisîne. Bi salan were vegotin û nivîsandin, dê hêj gelek mijarên ku nehatine gotin û nivîsandin derkevin holê. Weke din jî berpirsyariya wê giran bû. Mirov pêvajoyan, bûyeran û kesan dinirxîne. Nirxandinek şaş û kêm tenê bi kesê nivîsandî ve were girêdan jî, ji aliyekê ve dibû malê raya gştî. Lewma bi baldarî vegotin û nivîsandin gelekî girîng bû. Dibe ku aliyê nivîskar dixist nav zehmetiyan jî ev mijar bû. Lewma dema ev guman zêde dibin, mirov nikare mijarên ku dixwaze baş jî binivisîne.

Dîsa gumanek din jî wisa hebû: tê nivîsandin, xêzkirin, lê gelo çiqas tê venêrîn? Her kes, her tişta dinivisîne dişîne derve û dibêje; "biweşînin." Lê her nivîsa ji hundir derdiket, girêdayî me tevan bû. Her çendî nêrînên takekesî jî hebin, gelek pêvajo û bûyerên hevbeş hatine jiyîn dihat nirxandin. Weke din jî di kîjan mijarê de dibe bila be, ne dibû ku xeta gştî, aliyê şoreşgerî, wêje û xebata hunerê ji rêzê ve bihata nivîsandin. Me dikariya em pergalek di şêwaza şoreşgerî de tevkariya gştî bike saz bikin. Di encamê de pêwîstiya komîteyek van nivîsan venêrîne hewce dikir. Her kes di vê mijarê de hemfikir bû. Dê weke desteya venêrîn û sererastkirina nivîsan kar bimeşanda.

Mehmed Çîmen li Çanakkaleyê kesê ber biçav ê 'nivîskarê reşnivîsan' bû. Xwe weke nivîskarekî îlan kiribû. Mixabin li holê ti kar û encamek ber biçav jî tinebû. Weke cihên din li

Çanakkaleyê jî, di encama berxwedaniyan de beşên hucreyan hatibûn valakirin. Hêj di niha de hinek dilxwaz derketibûn ku biçin wan deran. Kesên dixwestin bi tenê bimînin û tenê binivisînin dixwestin biçin wir. Mehmed Çîmen jî rihên xwe dirêj kiribûn, dîmenek 'entel' belav dikir û pêşniyar dikir ku ji bona binivisîne, dikare di wan hucreyan de bimîne. Eleqeya vê yekser bi şêwaza jiyan û rewşa giyana wî ve hebû. Bi hevalan re nedibû yek. Her tim di nav hewayek nepeniyê de bû. Cîhana mirovê bi hunder û wêjeyê ve mijûl dibin, bedew, dewlemend, afirîner, rakêşwer û zindî ye. Lê xisletên kesayeta Mehmed Çîmen zêde ecêb bûn, dihat rexnekirin, hinek nirxandin jî dihatin kirin. Lê ew di nav fikirekê de fetisîbû. Berdêlek giranbiha, bi hezar êşan û şahadetan ve hatibû dayîn hebû. Hucre jî di encama van berdêlan de hatibûn girtin. Niha jî em nikarin wan hucreyan weke cihên jiyana ferdî bikar bînin. Ew nêrîn û pêşniyar bi serê xwe sosret bûn û em metel hiştin. Ango pêşniyara qutbûna ji jiyanê bû. Ferzkirina wê bû. Tişta baş hatibû astengkirin.

Li girtîgehan kesên xirabûnek wisa jiyan dikirin hebûn. Hinek kesan ji hinek amûrên cur be cur meyên (îçkî) herî eslî çêdikirin, hinekan pêşniyar dikir di girtîgehan de zarokan çêkin, hinek kesan li şûna rêxistinbûnê takekesiya xwe ferz dikir, ên ev jî weke şêweya jiyanê dijiyan hebûn. Hinek kes li hember siyaset û rêxistinê xeyîdîbûn. Hêviyên xwe winda kiribûn. Ev jî rastiya zindanên Tirkiyê ya trajîk bû. Her ketina di şêweya jiyanê de, her bêpîvanî, yekser di hebûna rêxistinî û asta wê de xwe dida der. Her du jî zêde ji hev ne cuda bûn.

Kesên ku di jiyanê de li hember daxwazên xwe yên ferdî têk çûne, di siyasetê de jî xirab winda dikirin. Mehmed Çîmen jî di kesayeta xwe de bandora vê rastiyê zêde hûr û kûr jiyan dikir. Ketîbûna di kesayeta wî de zêde diyarker dibû. Nêrîna me hebû, em wî di nav xwe de bigirin û biguherînin û veguherînin. Ev nêrîn ne şaş bû. Lê me jî heta cihekê dikariya dest bavêjinê. Şêwaza me ya çareserkirina pirsgirêkan, ne xwedî xisletek bingehîn, şoreşgerî û radîkal bû. Bi fikira dê dijmin bigire ji xwe re bikar bîne, bi kesên wisa re jiyan li ser bingeha nêzîkbûna 'îdarekirinê' zêdetir kûr dibû. Di avakirina hevsengiya rêveberiyê, lê teqez gihandina çareseriya şoreşgerî de pîvanên bingehîn serwerkirinê de bi gelemperî kêmasiyên me yên cidî hebûn.

Me gelek caran pirsa; "divê em li hember pêşketinan bersivek çawa bidin?" ji xwe dikir. Her kesê wijdana wî/ê heyî dizaniya ku tiştên tên kirin têrê nake û nabin bersiv. Belê, tatmîn nedikir! Êdî hundir, ango zindan ji vê hêlê ve nedihat tehemûlkirin! Min ti caran bi qasî wê demê nexwestibû werim berdan û derkevim derve. Çiyan, serhildanan, dahûrîn, parçeyên wêneyan ez ber bi xwe ve dikişandim. Her tiştek biçûk balkêş û dijwar bû. Baweriya ku, "dê şoreş me di girtîgehan de bigire" gelekî xweş bû. Ev jî dihat wê wateyê ku emê şoreş û serkeftinê di demek nêz de bibînin. Lê me dixwest em di kêliya wan pêşketinên coşên mezin de li qadên bêhempa bin. Min dixwest pêl axê bikim. Li wan zemînên hêja bêrîkirinên xwe yên dîn û har bûne bi hevgihînê re pêk bînim. Lewma min nedikariya li hember vê daxwaza xwe bisekinim.

Ji ber vê sedemê daxwaza firarê, revê, plan û xeyalên wê xilas nedibûn. Zêdetir kûr dibûn. Di navberê de hinek gilî û

gazincên me jî pêş diketin. Me digot; “hevalên me derve zêde biryaran digirin, lê dev ji revandina me berdin, hêj weşanên me derbasî hundir nabin. Rêbazên vê jî me di hundir de destnîşan dikir. Derve de afirîneriya wê ava kirin, rêbazên pratîkî yên afirîner nayên pêşxistin. Gelek tişt tenê di asta gotinê de dimînin. Asta biryarên ku di kongre û konferansan de dihatin girtin derbas nakin.”

Em jî herî zêde ji kesên ku derdikevin xwe digihînin partiyê aciz dibin. Ji ber dema ew jî di hundir de bûn heman gilîyê xwe dikirin. Rewşa heyî didît û dizaniyan, çi hewce ye ku divê ji derve de werin. Wan jî pêdiviyên hewce pêk ne anîn. Ji ber heta ku piştewaniya derve nebe, zehmet bû rev pêk bihatan. Ceribandinên pêk hatin jî neçûn serî. Hemû jî têk çûn. Dîsa jî bê ku pişta xwe bidim derve, li derfetên revê digerim.

Me rewşa giyan û derûniya personelên ku di zindanê de kar dikir dizaniya. Her yek hêmanek ji pergalê bûn. Tirs jî hêzek bibandor a vê pergalê ye. Li ser hemû girtiyan jî yek nêrîn heye. Tevî ku gumanên weke peywir berdan, mûçeyên xwe windakirin, heta ketina heman rewşî heye, dikarin di nav pergalê de pergalek din ava bikin. Pîşeya sîpekulatorî (vurgunculuk) pêş dikeve. Di vê mijarê de bê wijdan in û natirsin. Li hember tiştek herî biçûk madiyatê li ser mirov ferz dikin. Hinek ji wan baş dizanin ku, li girtîgehan kar çawa tê meşandin. Pere û madiyatê hez dikin. Mercên jiyanê zehmet in. Pirsgirêkê xwe xwedîkirinê hene. Mûçe têra mirovan nake. Di vê manê de hinek lîstokên ku, tên kirin van mirovan jî dikişînin xwe. Lê hinek jî nikarin para mezin bigirin. Di serî de bi hinek karên biçûk destpê dikin. Zemînê her cure lîstokên weke bazirganî, bertîl (rûşwet) û hwd heye. Weke deriyek parçeyek

feydeyek zêde ye. Ango girtîgeh her tim bi êşkence, zext û qedexeyan ve tê nasîn, lê pişt perdê jî pergalek din a tê behskirin heye.

Li girtîgehên ku girtiyên siyasî lê ne, desteserkirin vekirî û zêde tê kirin. Di salên destpêkê yên êşkence zêde bûn de, ne diyar bû ku tiştên ji me re dihat kî dibe, an jî diçe ji kî re. Ji bona boyaxên li ser dîwaran bixin, nivîs, al û wêneyên Atatûrk pere ji girtiyan dihatin girtin. Ev desteserkirina di nava pergala sivîl de dihat kirin, li vir jî zêde necuda bû. Bes li gorî şert û mercên girtîgehê pêk tê. Ji vê hêlê ve weke cîhanek cuda ye. Kesayetên ecêb ava dibin. Beşek vî karî dimeşîne, hemû karên heyî îdare dike. Dema tê xwestin dibe êşkencekarek dijwar, dema tê xwestin dibe perexwerek, dema tê xwestin xwe dixe çavan, heta dibe çepgir û xwe Kurdparêz jî dide nasîn. Bêbext e, giliyê hevalê xwe yê herî nêz dike. Hew mirov dinêre bi hezar lîstokan dilîze. Hem zilamê îdarê yê girîng e. Hem jî zilamê girtiyan personel, an jî gardiyanê herî baş e.

Ne zehmet e ku mirov van binase. Ji hezarî yek xwe bi temamî winda nake. Weke karmendek pergalê kar dike. Lê durûtî û lîstokên du alî tam çandekî zindanê ye. Ez piranî li ser peywirdarek bi navê N. radiwestim. Dizanim ku, zêde ji pereyan hez dike. Ji ber hevjîna wî Kurd bû û zêde li hember rewşên zindanê ne biyanî bû, min hinek din lêkolîn kir. Aliyê zindanê yê giyanwerî ne bi bandore. Li gorî wî berjewendiyên rojane girîng in. Weke ku bi salan tim karê dîzîve kiriye, hemû bertekên wî li gorî vê pêş dikevin. Bê ku bi-axive diyare ku ji çi tiştan re vekiriye. Her tim ditirsiya. Karên weke name, not û pêkanîna hinek pêdiviyên biçûk pêk tanî. Lê ew jî ne ji bona alîkarî bike, ji bona berjewendiyên xwe dikir. Ji ber min jî ew

qelsiya wî dizaniya, dema min pere şanî wî dikir, piştre vekirî di-axivîm; “pêdiviya me bi hinek tiştan heye. Tu dikarî wan pêk bînî. Ti zehmetiya wê çênabe.” Got ku zêde ditirse û, “wê şûna te min bigirin.” Min demekê ev mijar girt. Tenê wî diceribînim. Hewl didim neyekser bandor bikim. Herî dawî qane bû. Lê ji ber pere heye qebûl dike. Ya rastî karê ku bike jî, ne xeter e. Tenê pêdiviya min bi perûk û nasnameyekê heye. Tiştek din jî hewce dike, lê min yekser behsa wê jê re nekir.

Di wê navberê de Leyla Zana hat. Dema li Amasya bûm, dîsa hatibû. Vê carê got; “em ê derkevin. Em dixwazin dakevin jêrê.” Ez mat mam. Bi zavayê xwe re hatibû. Min got; “nabe.” Ji ber di navbera wê û Mehdî Zana de pirsgirêk hebûn û ne rast bû ku wan di nîvê rê de bi tenê bihêle. Hem ne wext, hem jî ne demê tiştê ku ferz dikir bû. Em nikarin destwerdana îradeya wê bikin, lê divê tiştê were kirin jî rast û bi mantik bin û xizmeta hinek tiştan bike. Gelo ji pirsgirêkan direviya, an jî ji hinek rastiyan direviya? Me tam fêm nekir ku, pirsgirêka esasî çiye. Li dijî me agir ji devê Mehdî dibariya. Jixwe berî wê jî digot; “we hevjîna min ji destên min derxist.” Me jî gotibû; “ne em, şoreşê ji destên te girtiye.” Bi rastî jî êdî li Kurdistanê jin ber bi şoreşê ve diherikî. Êdî şiyarbûn û vejîn lez pêş diket. Leyla jî yek ji van jinan bû. Di heman demê de ew nedihat windakirin. Lê Xalo kiribû serê xwe. Kêmasî û şaşiyên li holê tev para me didît. Hinek derdoran ew tehrîk dikir û diberda ser me. Gotinên ecêb dihatin belavkirin. Lê Xalo em baş nas dikirin.

‘kes jixweber danediket jêr. Ez jî hewl didim vê bidim fêmkirin; “heta ku agahiya hevalan nebê nabe. Rawestin. Em ê piştre bi-axivin.” Min heval dîtin û tiştên ku hatin gotin tev ragihand. Hevalan bertek raber kir. Min, çûna wan jî da rawestandin.

Ez bi mekîneya ku dizîve derbasî hundir kirî ji her eniyê ve wêne dikişînim. Wan ji bona nasnameyan amade dikim. Lê baweriya hevalan bi ya min nayê. Min jî bawer nedikir. Hewldana min weke ku mirov xumarê bilîze ye. Li Meletî jî bê ku alîkariya derve çêbe xumarek wisa lîstim. Ew zêdetir xeternak bû. Lê di encama hewldana min de, min tenê karî du saetan ji der ve bimînim. Min sê mehan kar kir, sê mehan jî ser xwe ve nehatim. Nedikariya ji bandora wê rizgar bibim. Ger min qet destpê nekiribûya, ez wisa jî bandor nedibûm. Lê min beşa herî zehmet derbas kiribû û derketibûm derve. Mixabin serkeftina min temam nebû. Ji ber di hewldan, şer, çalakî û mijarên hatin plankirin de tevdîrên domdar nehatin girtin, tengezariyek mezin ava bû. Lewma dibe ku mirov di van mijaran de dîn bibe.

Hevalan jî her carê hişyarî dikir; "baldar bin, bila lîstokan nekin. Naşibe kesek saxlem. Heta ku tu pê bawer nebî, tevnegere."

Em jî bi kelecanek mezin li benda temambûna amadekariya nin. Min hinek name, nivîs û pirtûk parçe parçe şand ji hevalan re. Hinek jî şandin derve. Min ji xwe re digot; "divê êdî vê carê ev kar pêk were." Dema em bi hevalan re di-axivîn jî, piranî ev têkildarî derve de bû. Her çendî baweriya wan ji bona derketina min nebe jî, weke îhtîmalekî dinirxandin û ji ber vê jî axaftinên me hemû li ser vê mijarê pêş diketin.

Di vê pêvajoyê de hinek dozên mînak ên li dadgeha makezagonî xirab bûne, di rojnameyan de derdikevin. Hemû jî dozên ku weke, 'eybek biçûk a huquqî ye' tên destnîşankirin. Hem ji ber endamtiya rêxistinê ceza hatiye dayîn, hem jî ji ber paraznameyan cuda ceza hatine dayîn. Ji ber vê şaşiya huquqî

ku dişibin hev, ew jî di liv û tevgerê de bûn. Her kes parêzerên xwe dixe tevgerê ku, dosyayên dozên ku zelal nebûne ji nû ve berçav werin bigirin. Di heman demê de nîqaşên guhertina xalên 141-142 û ji bona rakirina van xalan pêşnûme di rojevê de ne.

Bûyera Sargin û Kutlu ne tesadûf bû. Partîbûn û çepgiriya bidestûr, ji kevin de bi destên dewletê dihat plankirin. Ev jî xisletek Kemalîzmê ya berbiçav bû. Her tişt li gorî daxwazên xwe û bê ku ti xweseriya wan bihêle ji nû ve ava dikir. Ya rastî hinek pirsgirêkên din jî hebûn. Di bin navê sixtekariya demokratîkbûnê de li dijî şoreşgeriya Kurdistanê û pêşketinên ku li Tirkiyê rû bidin, tevdîrên nû digirt. Ji bona kesayet û rêxistinên fermî têkil polîtîkayên dewletê bûne, pêvajoya rewakirinê dabûn destpêkirin. Dewletê jî plan dikir, li eniya çepgir pêşketinên şoreşgerî wisa bimeşîne û asteng bike!

Eniya şerê şoreşgerî li Kurdistanê di pêşengiya partiya me û xwe sipartina hêza xwe ya cewherî ve lez û zelal pêşketinan ava dike. Qadên ku gerîla lê bandor in, her roj berfireh dibin. Gelek derdor di bin vê bandorê de ne. Dijmin jî nikare vê berfirehbûna şoreşgerî asteng bike. Her cure amûrên xwe yên zorê bikar aniye. Dîsa jî nekariye berfirehbûna gerîla ya li Kurdistanê asteng bike. Hemû amûrên şerê taybet ên sivîl û leşkerî û saziyên xwe yên tîmên taybet, walîtiya taybet û çetegerî li Kurdistanê di liv û tevgerê de ye! Pirsgirêka Kurd û Kurdistanê hem di hundir, hem derve di asta nav-neteweyî de di rojevê de ye. Polîtîka jî li gorî wê tên destnîşankirin.

Dewlet li Tirkiyê, polîtîkayên Kemalîst ên hatine ceribandin bi şêweyên nû ve cardin, lewaziyên tevgerên şoreşger û demokratîk dibîne û bikar tîne. Deriyên ku ji xwe re

vekirine re dikeve nav wan û polîtîkayên xwe dike meriyetê. Me jî hinek aliyên van polîtîkayan ên diyar dibûn û encamên ku ava bikin didît û nîqaş dikir. TKP (Partiya Komînîst a Tirkiyê) kiribû dûvikê xwe. Ev jî ne tiştek nû bû. Heftî sal bû ev lîstok berdewam dikir. Jixwe pirsgirêka heyî jî ne tenê bi TKP'ê ve girêdayî bû.

Zêdetir plan li ser Kurdistanê bûn û li muxatabekê digeriyan. Gelo ev muxattab kî bûn? Di vê mijarê de jî, hinek texmîn hebûn. Nexasim di pêvajoya dawî de gerên dervî welat ên hinek wekîlên gel ên eslê xwe Kurd in, gotinên wan ên di çapemeniyê de derdikevin pêş balkêş bûn. Behsa partiya Kurd dihat kirin. Lewma ev gerin pêş ketîn û vexwandinên heyîn ne asayî û vala bûn. Êdî wisa diyar dibe ku baldariya li hember pirsgirêka Kurd ji qonaxekê derketiye! Polîtîkayên di bin navê hezkirina Kurd de pêş dikevin û îdîaya wan a nûnertiya Kurdewarî ji çavkaniyên nêzî hev derdiketin. Ji hev ne dûrbûn. Di zemînên têkoşîn lê gerim tê meşandin û ava kiriye de wisa polîtîka meşandin ne hêsan e. Gelo polîtîkayên dijmin ên wisa derbarê mijara Kurdistanê de çiqas dikare xwe bigire? Ev girîng bû. Lewma divê mirov polîtîkayek xwe dispêre zemînek rasteqînî û saxlem bimeşîne. Derfetê vê û yê durist dagirtina valahiyan jî hebû. Herî zêde jî dikariya ev were pêşxistin. Nexwe ji bilî vê ti miradê pêşketinek din tine bû.

Bi qasî em ji pêşketinan fêm dikin lêgerînên emperyalîzmê û KT ne bi şêweya xwesteka 'çareseriya navberê' jî be, zelal dibûn. Derfetên xebatek partiyek legal a cuda hebûn. Wekîlên ku eslê xwe Kurd in, xwe dabûn ber vî karî! Ji ber polîtîkayên bi vî rengî li Kurdistanê diyar dibûn, em jî neçar diman ku li ser van mijaran nîqaşan bimeşînin. Nivîs û nirxandinên

destpêkê zelal in: ev plana çareseriya navberê ya emperyalîzmê ferz dike ye! Dixwazin pirsgirêka Kurdistanê bi çareseriyên wisa yên navberê de bifetisînin. Hêza çareseriyê û asta 'alternatîfa' şoreşgerî jî li holê bû.

Em jî Partiya Kedê ya Gel HEP'ê jî di vê çarçoveyê de dinirxînin. Dîsa jî em bi sebrek mezin li benda nirxandinên Rêbertiya partiyê û Partiyê ne. Jixwe Rêbertiyê jî di nirxandinên dawî de diyar kiribû ku, dê emperyalîzm di bin navê 'Partiya Kurd' de hinek avabûnên sunî bikar bîne. Lewma divê em jî li eniya siyasî derfetên legal bi şêwazek herî baş binirxînin. Heta ger hewce bike em ê partiyên legal ava bikin û yekser bikevin navê û wisa kar bikin. Ev tespît jî yek bi yek derdiketin holê. Nêrînên Rêbertiyê piştrast dibûn.

Pir zû rastî û hedefa naveroka 'pakêta demokratîk' ya KT derdiket holê. Jixwe ji bona me jî tiştek veşartî nemabû.

Parêzerên me jî li ser mînakên dozên ku xirab bûne radiwestin. Ji ber valabûnên zagonî, bêpîvaniya di biryarên dadgehan de, nelihevkirin, li ser hev sererastkirinên zagonî, dibû sedem ku parêzerên me jî di nav liv û tevgerê de bin. Hinek jî di rewşên wisa de dibin 'şêr'! Nexwe weke din nikarin bikevin nav dadgehên KT. Nexasim ger dozên PKK'ê bin, ev wekîltî jî dikeve nav xeteriyê.

Hemû dozên PKK'ê li ser esasê xalên 125. tên darezîn. Ango hinek xalên weke 168'an a dikeve çarçoveya darvekirinê de hene. Xalên weke 141-142 jî zêdetir dosyayên dozên din digere nava xwe. Hinek dozên parastinên pêvek jî di vê berfirehiyê de tên destgirtin. Lewma gelek hevalên ku parastina xwe kirine, ji bona vê parastinê jî cuda ceza girtine. Her wiha ji

bona hinek nivîsên ku ji bo kovaran hatine nivîsandin jî, doz hatine vekirin. Ji ber dikariyan van bi sererastkirinên nû re bidin guhertin.

Dosya min a doza giştî hêj li cem dadgeha bilind bû. Ji ber dadgehan lihev nedikir, encambûna dozê jî dereng mabû. Vale vale ji dadgeha bilind diçe cem dadgehên jêrê û di navbera wan de digere. Em ji aliyê xwe ve kar dimeşînin. Di navberê de hinek nivîsên biryaran ên ji bona me tên şandin jî hene. Hinek dozên kêlekê hene. Hemû jî bi cezayên giran encam bûne. Hinek dozên ku hêj didomin hene. Cezayê endamtiya rêxistinê, li gorî zagonên wan jî xilas bibû. Lê ji ber dozên kêlekê didin rawestîn. Dihat gotin; "ger edamên rêxistinê yên parastina xwe kirine, ceza girtibin, nabe ku ji parastinên xwedî heman naverokê ceza bigirin." Wisa hinek dozên mînak hatibûn xirabkirin. Ger endamê/a rêxistinê be, jixwe dê parastina xwe bike. Parastina mijarên ku parazvanê wê ye dike. Di vir de ev biryarên bi nakok ji bona min jî feydeyek mezin ava dikir. Parazvanên min bi gelemperî diyar dikin ku, "dê ev kar baş encam bibe." Dîsa jî aliyekê ve amadekariyên revê dikim. Derfetên ku dibe ev doz were xirabkirin jî berçav digirim. Çi dibe bila be, dev ji revê bernadim.

N. Dizane ku parêzer bi dosyan ve mijûl dibin. Ew jî dibêje ku, "xwezî dosya te xirab bibe" û niyazan dike. Tirsa wî heye, naxwaze têkil tiştên xeter bibe. Lê ji ber her du aliyan jî dilize, lewma ditirse û gumanan jiyan dike. Tiştên ku tên xwestin dereng dixe, heta nayîne.

N. Xirab dilîst. Em jî vê ferq dikin. Pereyên me jî xwar, lê rewşa heyî ji îdareyê re jî digot. Êdî her roja hevdîtinê venêrînek tund hebû. Piştî hevdîtinan yekser hejmar digirtin.

Dixwestin hîn bibin hejmara me temame yan na. Hevalan jî kena xwe bi hêrsên min dikir.

Digotin; “ev kar wisa ne. Divê tu hesabê tiştên xirab jî bikî. Tu di hinek tiştan de xwe zêde qane dikî. Dema pêk jî nayê, aciz dibî û mehfa xwe tînî. Wisa nabe! Divê tu xwînsar bî.”

Numan got; “jixwe min di serî de jî pê bawer nekir. Lê min nedixwest ku bêhna te jî tengav bikim.”

Cemal jî keniya û got; “helal be ji N. re. Kêmek mabû xwe ji her tiştî rizgar bike.”

Deza jî destpê dikir û digot; “gotinek me ya Sîwerekiyan heye…” û çîrokek dirêj vedigot. Ne ser xêrê her kesî derbarê firara pêk nehatî de tiştek digot.

Wisa hewldana firarek din jî têk çû. Êdî ez jî nabêjim bê şansiye. Rewşa heyî em ne jêhatî bûn û me jî hesabê her tiştî baş nekiribû.

Kevneşopiya 27’ê mijdarê ya li çanakkaleyê…

Li girtîgehan pêvajoyên rexnedanê li hinek cihan di Newrozê de, li hinek cihan di roja salvegera damezirandina Partiyê 27’ê Mijdarê tên destpêkirin. Li Çanakkaleyê jî weke ‘kevneşopiya Mijdarê’ hatibû rûniştandin.

Me di bin navê, “em ê parastina hevbeş bikin de” hevpeyvînek dabû destpêkirin. Dihat gotin ku, Aysel Çûrûkkaya li Dêrsimê şehîd ketiye. Mijara vê hevpeyvînê 'Li Kurdistanê Jin' bû. Dê rastiya jina di nav têkoşînê de û pirsgirêkên dihatin jiyîn, zêdetir di çarçoveya pratîka jiyana min de were destgirtin. Heval jî di navberê de di-axivin. Em komek pênc-şeş kes in. Can, Numan, Cemal û Dr. Elî jî hene. Carna bi komî, dem bi dem jî hemû pirsan ji min dikin û me hevpeyvînên xwe didomand. Ji pêncî zêdetir qaset hatin dagirtin. Weke panoramaya jinekê bû. Lê pirsgirêkên ji eniya zilam ve jî gelekî hatin vekirin û niqaşkirin. Heta ku ew derbasî nivîsê kirin, min jî di navberê de li ser pêşniyara Can têkildarî

jinê xebatek cuda plan kir. Min pêşnûmeyek giştî derxist. Gelek pirtûk û kovar kom kirin. Min ji xwe re got; “lenet be, madem karê revê vala derket, ezê jî van karê nivîsandina nameyan kêm bikim û xebatek mayînde bimeşînim.” Jixwe di pêvajoya rexnedanê de jî ez hatibûm rexnekirin. Rexneyên weke ne di ferqa mîsyona xwe de ye, di bîrdozî û polîtîkayê de kûr nabe, xwe nagihîne berfirehiyek li gor rewşa xwe, hestiyar, teng û seresere nêz dibe û divê demek zû xwe di vê çarçoveyê de bigirim dest û xwe derbas bikim, pêş ketin.

Hem ji bona xebatên nivîsê amadekariyê dikim, hem jî planên revê yên nû pêş dixim. Qetiyen devjê bernadim. Tişta herî zêde jî min dikişîne xwe û mijûl dike ev alî ye. Lê her ceribandina me ya revê vala derdiket. Ev jî ne çarenûsek bû. Mîsoger tiştek berovajî hebû, lê me nedizaniya. Em bi dehan rê û rêbazan dibînin û ji derve re radigihînin. Cidî nêzî yek ji wan jî nabin. Derfetên ku hewce dikin ji eniya derve de nayên dayîn. Nayên birêxistin kirin. Me di notên dawî de rexneyên xwe yên derbarê vê mijarê de jî diyar kiribûn. Me ji bona Hesen Atmaca notek pêşniyarê şandibû. Dema ew tên girtin, not jî dikeve destên polîsan. Tevî vê bûyera ku hatiye jiyîn jî, ji me re na ragihînin. Agahiya me ji tiştekê tine ye, em jî bi hêviyek mezin li bendê ne. Hinekê jî ji ber vê notê di dema dawî de vênîrînek tund dihat meşandin.

Me kir nekir, me nekarî em li Amasyayê sewqa xwe ya li nexweşxaneyê pêk bînin. Lê diyar e dê li vir pêk were. Piştî mijûlbûnek dirêj min karî xwe sewqî nexweşxaneyê bikim. Çûna min a Îzmîr, an jî Bursayê mîsoger bû. Nexweşiya min a xwînê hebû. Ango kêm bû. Heta hinek doxtorên me yên dost ev nexweşiya min derve de ji raya giştî re jî ragihandin. Baş bû

me di vê mijarê de yekser dest werda, ji ber ‘reklamgeriya’ bi vî rengî her tim dijî me encamek ava dikir, xeternakiya wê jî pir bû, ji ber me jî naveroka wê dizaniya me xwe jê dûr kir.

Me dikariya vê planê bikin derfetek pir baş. Wê demê hêj Hesen nehatibû girtin. Piştî not girtin bersivek erênî jî dabûn. Lewma hêviya me zêde bû. Zehmet e ku mirov hewl bide tiştek pê bawer neke bike. Lewma her carê jî min bawer dikir. Bawerim sedema vê jî, ji ber niyeta baş a zêde bû. Lê înadek balkêş bû.

Dema ez çûm Bursayê jî, heman xeyal û hêvî hebûn. Min ji hevalan re got; “ger derfet hebe, ezê birevim.” Du serbaz û du leşkeran ez biribûm. Rê bêdeng û nav çiyan re derbas dibû. Ango kesek çekdar hebûya bes bû, ez bikarim birevim. Ji ber ez ji bona maşînê nexweş diketim, ew jî neçar diman ku, her kêliyê rawestin. Lewma kelepçe jî derdixistin. Ev jî firsendek mezin bû. Ne zehmet bû ku ez wan bê bandor bikim. Di rê de ji bona xwarinê zêde navber jî dihat dayîn. Lê dîsa jî di nexweşxaneyê de nedan razandin. Not ketibû destê dijmin û agahiya me jî ji vê nebû.

Ji ber wê tehlîlên min wext bigirtan ez birim Girtîgeha Bursayê. Bi hêceta ku beşa siyasî lê dimînin de, “beşa jinan tine ye”, ez birim cihê sivîl lê dimînin. Hema bêje cihek zêde bela ye. Çawa ez ketim hundir min dît ku alek mezin a Tirkan bi dîwar ve daleqandiye. Min yekser ew ji wir daxist. Ji ber vê jî wê rojê jin û zilam hemû gardiyan bi ser qoxuşê de girtin. Li hember hev bi kumlan û lingan em li hev dixin. Duruşmeyên yek kesî jî kêrî tiştekê nayên. Lê dîsa jî duruşmeyên xwe diqîrim û nahêlim dengê min qut bikin. Dibêjim; “Bimire ev êşkencekarî! Bimire ev Çewsandin! Bimire îdareya Faşîst!” Hema çi tê ber devê min dibêjim.

Dozek din jî li Bursayê vebû. Ev jî bû, ‘Doza Alê!’ Hêcetên weke heqaret li ala Tirkan hatiye kirin, hatiye qetandin, êrîşî peywirdaran hatiye kirin û gelek tişt hatibûn rêzkirin. Min jî got; “ev lîstokek îdareyê ya bi zanebûn bû. Ji bona min tedavî bikin anim nexweşxaneyê. Lê bi zanebûn li girtîgeha Bursayê gardiyanê Faşîst berdan ku êrîşî min bikin. Min al neqetand. Lê ez naxwazim li cihek ku al lê daleqandiye bimînim. Ez şoreşger im, PKK’yî me. We jî ji ber vê ez darezandim û ceza da min. Ev qebûlkirina nasnameya min e. Wê demê hûn çima wê alê ser serê min ve girê didin? Mafê min ê xwezayî ye ku ez jî vê red bikim.” Îdareyê ev rewş jî bi zanebûn ava kiribû.

Rûniştinên dozê didomin. Zilaman mat mane. Belê, ji bona kesek ku tê nexweşxaneyê doz tê vekirin! Lêpirsîna dosya min kirin, cezayê bi salan hatiye dayîn. Min jî diyar kir ku, bila min cardin vegerînin Çanakkaleyê, naxwazim tedawî bibim, dixwazim dosyayên min ên dadgehê bişînin wir. Di heman demê de min hişyar kir ku, ger dereng bihêlin ezê du rojan rojiya birçîbûnê destpê bikim. Ev jî dibû protestokirina êrîşên wan. Piştî demekê ez vegerandim cihê min.

Di notên ku hatibûn girtin de, ji bona hinek hevalan jî pêşniyar hebûn û vekirî hatibûn nivîsandin. Lewma venêrînê zêde berfireh dikin. Jixwe tûnel jî derketiye holê. Ya rastî êdî pirsgirêka tûnelê asayî bûye. Li her girtîgehê ceribandinên bi vî rengî tên kirin. Heta li hinek cihan çend tûnel bi hev re derxistine holê. Dijmin nikare pêşî lê bigire. Lê belê, bi rêbazên lêgerîn û hinek tevdîrên din ve hewl dide pêşî li revan bigire. Her tim lêgerîn dikir. Dema dengek herî biçûk dihat, an jî girtiyekê cihê xwe diguhert, yekser şik dibirin.

Dema ez ji bona hevpeyvînê çûbûm cem hevalan şik biribûn û daxwaznameyek îxbarê dabûn. Dozek pir ecêb jî li Çanakkaleyê vebû. Min jî got qey rûniştina dozên dinin û wisa çûm. Şandeya dadgehê daxwaznameya îxbarê weke hêmana tewanê qebûl kiriye û doz vekiriye. Hêcetek dozê ya tam pêkenoke. Ez jî keniyam û weke şandeya dadgehê biçûk bixim min got; "ti caran dozek wisa bê cidiyet nehatiye dîtin. Kêmek maye hûn hemû kêliyên jiyana min bikim mijara dozan. Ez vekirî bêjim, kêfa min ji vê tirs û xofa bi we re tê. Yeqîn dikim, ezê herî dawî neçar bimînim ku birevim." Weke din jî min diyar kir ku, ezê ti îfadeyek din jî nedim.

Rast bû daxwaznameya îxbarê hatibû şandin. Jixwe ne girîng bû ku, kî nivîsandiye. Piştî ku di nav personelan de jî kesên giliyê hevûdû dikin derketin, tiştek xwezayî ye ku giliyê me jî bikin. Ger dijmin ji aliyê me ve rehet bûya, şik nebiribûya û ne li bendêbûya ku dê hinek ji me jî birevin tiştek ne xwezayî dibû û dê me şik xwe bibira. Lê her carê jî ji ber vê derûniyê dozên ku ji bona me vedikin û mijûlkirin rewşek nedihat qebûlkirin bû. Çûnûhatinên dadgehan ji ber hêcetên beredayî çêdibûn, em dibûn muxatabên wan, her carê jî em neçar diman wan eşkerekere û teşîr bikin. Ev jî bi serê xwe êşkence bû. Ya ku herî zêde jî para xwe ji vê êşkenceyê digirt ez bûm.

Weke din jî tişta herî nebaş, bala wan her tim li ser qoxuşên hevalan bû. Ji ber wan jî dixwest rêyên cuda biceribînin. Dîsa jî me tevî van astengiyan tevan hevpeyvînên xwe qedandin û em derbasî pêvajoya rexnedanê bibûn. Yekser tevlî hinek beşên girîng jî bûm. Beşên din jî ji girtînameyan, di hevdîtinên em heftiyê carekê dikin de dixwînim. Heval jî min bi tenê nahêlin. Dema rewşên lezgîn, an jî hewce dihat dîtin de

me di mazgalan de hevdîtin dikir, not didan hev. Ango me qutbûna di navbera xwe de wisa derbas dikir.

Min piranî wextê xwe dida nameyan. Ji girtîgehên Tirkiyê, Kurdistanê, ji Awrûpa heta Awustrulya ji gelek welatan re dinivisînim. Bi sedan mirovên dost û baldar hebûn. Ji xebatkarên Rêxistina Efûyê ya Dêrê hata, gelek saziyên din dixwestin ji min re binivisînin. Ev dibû sedem ku, ez jî baldar nêz bibim û binivisînim. Ji bona min her nameyek pêwendiyek bû. Ne tenê daxwaza nivîsandin, an jî wextê xwe dagirtin bû. Li dijî vê min ji bo wextê heyî her tim gilî dikir. Dibe ku me nedikariya em li gorî tê xwestin wextê xwe dagirin. Lê bi rastî jî wextê me teng bû.

Belê, di zindanê de wextê me têrê nedikir! Dema mirov wextê xwe baş û rast binirxîne, nirxê wextê mirov heye. Lewma nerehetiya me ya di mijarê de ji her tiştî zêdetir bû. Na, ez ji hêla wijdanî ve ti caran rehet nebûm. Ji ber gelek tiştên min pêk baniya hebûn û min nedikariya bikim. Carna jî daxwaza kirin û tevlîbûnê giyanek ecêb ava dikir. Weke rewşek ku, mirov enerjiya xwe vala bikar bîne. Min carê xebatên xwe yên lêkolîn û lêgerînê jî dikir. Di vê manê de lêhûrbûnên min baş bûn. Lê nameyan jî weke pêdiviyekê her carê xwe ferz dikir. Ev jî girêdanek bi derve re bû. Her çendî min xwe sînordar dikir, neçar dimam ku bersiva sedan nameyên ku dihatin bidim. Dilê min nedigirt ku, wan nameyan bê bersiv bihêlim.

Helhela salên borî zêde bû. Me nekarî bû pirtûkan bixwînin. Ji bona em bikarin pirtûkekê derbasî hundir bikin, gelekî mijûl dibûn. Ji ber piştî me derbas dikir gelek mijarên qedexe û nêzîkbûnên çewsandinê diketin navberê. Nexasim me

ti caran nekarî em wexta xwe ya li Amasya binirxînin. Her çend mehan carekê rojiya birçîbûnê dihat destpêkirin. Dikarim bêjim ku, nivê salê bi bandora wê ve derbas dibû. Her wiha me wext jî baş destnîşan nedikir. Xebatek bi plan û bername, girêdayî pêdiviyên wê yên giştî jîndarkirinê de lewazî hebûn. Dema tiştek ji me bihata xwestin, me dinivîsand. Xebatên nivîsên mayînde û xîtabî giştî bikin kêm bûn. Ne di asta dihat xwestin de bûn. Lê li Çanakkaleyê hinek din xebat bi plan û bername dihatin meşandin. Ez jî di hinek mijaran de lêhûr dibûm. Min hewce didît ku hinek din kûranî lêkolîn û lêgerînekê bikim. Pêdiviya min zêde bi vê hebû. Ji ber zêde li ser firarê hizirîbûm, min karî xebatek sazûmankirî bimeşînim. Ji ber bandor dikir, min nedikarî ez xwe ji hizra wê rizgar bikim.

Lêgerîn, derxistina hêza avakirinê ye

Dema ez nû hatîm, Can pirsa Hamilî kir; “navbera we çawa ye?” Dema Can ji Amedê çûyî asta têkîliya me jî wî re gotibû. Tevî hemû hişyariyên min kirine, Hamilî ne veşartibû, li gorî xwe ji hinek hevalan re gotibû. Lewma dema Can got; “navbera we çawa ye?” Min nekarî bersivekê bidim. Min got; “ez pişt re bêjim.” Jixwe ev bersiva min dida diyarkirin ku, navbera me nebaş e. Bes wisa yeqîn dikim ku, Can qet ne li bendê bû ezê hinek tiştên din bêjim.

Min di hevdîtinek din de ji serî heta dawiyê jê re got. Can jî bi sebreke mezin li min guhdar kir. Carê jî dikeniya. Dema min bertekên xwe yên destpêkê vegot, wî jî got; “ma qey çi heye tu wisa di nav helhelê de yî? Temam tu bêje, pişt re ez jî tiştên ku wî ji min re gotine vebêjim.” Min dizaniya ku ji gelek

hevalan re cuda gotiye. Selîm jî got; “min tiştek ji we fêm nekir. Te cuda, Hamilî jî tiştên cuda gotin. Ma ezê ji kîjan we yeqîn bikim?” Di heman demê de got ku, ez hestên xwe neçarî vê dikim û li gorî rastiyan nêz nabim. Ev jî rastiyek bû got.

Can fêm dikir ez çima evqasî pêdivî dibînim bi ziraviyan ve bêjim. Dibe ku evqas jî nehewce be. Lê dixwest baş fêm bike. Piştî demekê ket navberê û got;

“Hamilî cuda ji min re got. Di kêlî û hewayek wisa de got, ez jî wê kêliyê ne li bendê bûm. Roja em werin got. Ger beriya wê gotibûya, dibe ku me hinekê nîqaş bikira. Wî jî digot ku, baldariya te çêbûye, te jê re vekiriye û dilxwede ew jî neçarî vê tiştê maye. Got; ‘bi xwedê Sakînê xwest.’ Heman ev axaftin kir. Bes min jî tiştek xwezayî dît û cuda nenirxand.”

Jixwe dema min bê pîvaniya wî dît, pê hesiyam ku min şaşiyek kiriye. Heta vê rojê gelek şaşî, kêmasî û nebesiyên min çêbûn. Lê ez bawerim şaşiya min a herî zêde bi zanebûn hat kirin ev bû. Belê, şaşiyek bi zanebûn! Hem jî şaşiyek bi navê fedekariyê! Aciz bûm. Nexwe min Hamilî baş nas nedikir. Ya rastî min hinekê texmîn dikir ku, wê çawa bide diyarkirin. Dema mijar ji min re vekir jî heman nêzîkbûn raber kir. Mirov durist û rêzdar nêzî hestên xwe dibe. Hezkirina çi? Hezkirin wisa nabe, ji her kesî re cuda vegotiye.

Tiştên ku Can gotin bandor li min kir. Min jî nêrînên xwe yên di vê mijarê de berdewam kirin; “weke min da diyarkirin. Her carê ji min re tiştek cuda digot. Geh bûm diya wî, geh bûm xwîşka wî. Hem jî nizanim çiya wî ya çend salan! Dîsa jî ez wan deman zêde li ser nesekinîm. Ji bilî vê rewşa wî, min nedixwest zêde xirab bandor bibe. Çi nabe, ez dixwazim

pêvajoya pey wê re jî vebêjim. Dixwazin tiştên ku hatine jiyîn weke rastiya heyî were zanîn. Hem pirsgirêk ne xwestina min, an jî ferzkirina wî ye. Li vir sixtekariyek derdikeve holê. Li gorî min divê ev baş were fêmkirin. Vekirî bêjim, ger hest û baldariyek min a wisa bi salan dirêj hebûya, dê min mîsoger bida hîskirin. Ne vedişart. Dev ji salan berdin, ger di pêvajoya pey wê re pêş ketibûya û min ji wî re jî vekira, ezê her tim xwedî lê derketam. Çi dibe bila be, mirov hevalê xwe di vê mijarê de naxapîne. Ma neneçarî vê bû! Lê niha baştir tê fêmkirin. Min ferq kir, lê dereng bû. Hestiyariya min derketibû pêş."

Can got; "Ma wê tu niha jî vê ji xwe re bikî derd? Ez te nas dikim, wê tu niha serê xwe bi vî alî bêşînî. Hinekê jî bûyerên kûr û daneyan bi xwînsarî binirxîne. Jixwe te nas kiriye. Pirsgirêk çareser bûye." Bes hêj nizane ezê behsa çi bikim, ji ber ew jî ne li bendê bû.

Gelo, mirovên welatên din jî weke me bûn? Hest û hezkirinên me her tim pirsgirêk in. Her tim tevlîheviyê ava dike, mijûl dike, tiştên digire dibe, hinek tiştan winda dike, hêz û enerjiya mirov û wextên herî xweşik ser û bin dike, dihincirîne, diperçiqîne, taqet bi mirov re nahêle. Mirov tîne rewşek wisa hezar carî poşman dibe. Ma qey me pir zêdegavî dikir, ma qey me zêde ji rastiya jiyanê qut dikir? An jî me di nava wê rastiya jiyanê de zêde ji rêzê dida jiyîn û bê wate dikir? Gelek pirsên din tên bîra mirov.

Peywendî û pîvanên civak, malbat û pergalê diyar bûn. Em di nava refên şoreşê de bûn. Me di nava şert û mercek şerê herî dijwar de jiyan dikir. Di wateya giştî de jî be, rastiya têkoşîna me dihat zanîn. Dihat dîtin ku, xwe dispêre çi, rê ji çi re vedike

û dê veke. Ma jiyana şoreşgerî jî, ne jiyana civakî ya herî berfireh bû? Peywendiya herî zehmet û bêhempa, peywendiya rêhevaltiyê bû. Me gava xwe ber bi hevalbendiya dozek mezin ve avêtibû. Di vir de biryar û daxwaza meşê hebû. Me dizaniya ku ev jiyan ne hêsan e. Me ev jî ji nêz ve bi nasîna dijmin re dît û nas kir. Wê demê ma çima asta vê ya hest û hezkirinê evqasî bênirx bû? Çima dihincirand? Çima ev têkîliyên gerim û hişk bi hevûdû ve girêdayî, di rêyek berovajî de diçûn? Gelo ev nakokiyek xwezayî bû, an jî ew girêdana di navberê de rast nehatibû sazkirin û ji ber vê jî hinek tiştên din diketin navberê?

Ger domdariya lêgerînan nirxên bihêz dernaxin holê, wê demê armanc, hedef û zemînê ku bide avakirin baş nehatine hesabkirin. Tê wê wateyê ku di navbera van de ahengek tine ye. Ji ber lêgerîn bi bazdanekê, bi dîtina hinek tiştan ve, an jî xwe gihadina hinek xwestekan ve ne sînordare. Lêgerîn, pêşketina hêza avakirinê ye. Dewlemendiya wê ye û jêhatiya ew veguhertina civakbûnê ye. Ev hemû jî peywendiyek mirov a balkêş ava dikin û derdixin holê. Hêza jiyanê ya peywendiyê, bi van nirxên ku ava dike ve girêdayî ye. Ne wisa be, mirov nikare wateyek şoreşgerî bide van lêgerînan.

Min pêvajoya ew ji Amedê derketin tev bi xalên giştî ve ji wan re vegot. Ger têkîliyên heyîn li ser esasê mercên wan xebatan neyê vegotin, zêde nedihat fêmkirin. An jî dibe ku ez ji ber gumana dibe ku neyêm fêmkirin dibêjim. Min têkîliya bi Şener re jî weke heyî diyar kir. Nexasim min diyar kir ku, piştî em derketin jî me hewl da em rewşa heyî bi rêya nivîsan bidomînin. Di heman demê de çawa ji Rêbertiyê re negotiye, li gorî wî gotiye derfet nedîtiye ku jê re bêje jî, serve dikim. Axaftina me dirêj bû. Can beşa dawî jî bi heman sebrê guhdar

kir û keniya; “ez çi bêjim? Ger te bi xwe biryar dabe temam e. Vekirî bêjim kêfxweş bûm.” Me axaftinên xwe li wir qut kir.

Em hest û baldariyên bi hev re nehatine parvekirin, bi hevalên partiyê re parve dikin, ev jî tiştek tenê li gorî xweseriya me bû. Belê, bertekên wisa pirsgirêkan hevbeş parve dikin hebûn. Dibe ku bi her kesî re ne di vê astê de be, lê hevalên ku wisa hîn bûne û pêş ketine di van mijaran de zêdetir hesas bûn. Dema kêliyek û bîranînek ji rêxistin û partiyê veşartî û sergirtî nemîne, ew bûyer û nêzîkbûn ji hêla exlaqî ve dibe ya herî bedew. Tişta herî baş dibe şêwaza jiyanê. Lê gelek caran di nava me de jî, weke bêçaretî xwe dide der, ev jî zêde mijûl dike. Kesayetên bi xwe re hêza çareseriya şoreşgerî ava nekirine, di pirsgirêkên rêxistinî de û têkîliyên hestan de jî nikarin xwe ji pirsgirêkan û binkeftinê rizgar bikin. Ji ber di bingeha wan de ev rastî heye.

Yekem car ji ber nameya nivîsandî Şener bala min kişand. Dibêje; “îro apê me bangî min kir û nameya te da min. Kêfa min zêde ji nameyê re hat. Ji bona min pir baş bû.” Her wiha behsa pîvanên di nava hestan de dikir. Didomîne; “weke Zapê dîn û har herikîn jî xweşike. Lê dema hewce kir divê mirov weke Dîcle di qiraxên xwe de kûr û tebitî biherike.” Min Zap jî, Dîcle jî nedîtibû. Dem bi dem dema di tv de behsa operasyonan dihat kirin, hinek dîmen ji erdnîgariya Kurdistanê didan diyarkirin. Dibe ku min ji wan dîmenan Zap, an jî Dîcle dîtibe. Weke din jî ji ber hinde hevalan behs kiriye, dibe ku ji wan nêrînan xeyal bikim.

Hewl didim mijara esasî fêm bikim. Rast e, gelek caran hewstên xwe weke dînan diherikînim. Lê gelo sedema vê nivîsên ji bona Şener hatibûn nivîsandin bûn, tişta şaş çi bû û

mijara berovajî çi bû? An jî Şener weke nêzîkbûna di mijarên din de raber dikir, niha jî nîqaşa ‘hestan’ pêş dixist? Me carekê li ser ji hev cudabûnê nîqaş kir. Min her tim digot, ez ji hev veqetînê hez nakim û nikarim fêrî vê tiştê bibim. Wî hinek din girêdayî vê têkîliyê şîrove dikir. Di nameyên xwe de diyar dikir ku, dûrbûn û ji hev qutbûna vê têkîliyê gelekî xweşîktire û hêza esasî ya wê ava dike jî hezkirine. Dijberî min digot; “ez ji hev qutbûnê hez dikim.” Dihizirim ku gelo, girêdana wî bi rojnivîs û eleqederiya wî bi rexneyên ji vê hêlê ve tên kirin hene an na.

Pîvanên ku bi kesayetê re didin der civakîbûn ava nekiribe, her tim cihê diyar dibin. Xwezayîbûn û sadebûn bi şaneyên zanistî ve wateyê rave dikin. Pîvanên têkîliyên di zindanê de asayî bûne, hinekê jî ji ber şert û mercên li gorî xwezaya wir bûn. Li heman navendê, lê di nav mercên bi salan ji hev cuda û dûr digirê de tê jiyîn. Ji bona dîtin, temaşekirin, axaftin û dest dana hev hesretek mezin pêş ket. Berdêla nêrînekê, kenekê û silavekê jî gelekî giran bû. Lê belê, tê zanîn ku ev jî nêzîkbûnên xwezayî yên ayîdê mirovin. Pêdiviyên bingehîn ên ji bona peywendiyên mirov in. Ji ber demek dirêj ev hatin qedexekirin, bi zorê hatin astengkirin, hişt ku daxwazên berovajî pêş bikevin. Dibe ku ji ber bandora vê jî be ku, evqas giraniyek kûr a hest û baldariyan pêş ketibe. Helbet ev xisletên ji bona mirov in, lê ne xisletên herî zêde bihêz bûn. Bi tena serê xwe ji mirov re tiştekê nadin qezenckirin. Ev ancex dikarin bi hebûna hêzdar a siyasî ve, bi rêgezên jiyana wê ve, nav hevûdû de bijîn bedew bin. Berxwedêriya zindanê, hêza pîvanên ku ew hewce dikin, bedewiya giyana ku bi mirov re ava dike bi temamî nedê der, dê meylek yek alî, bi niyetên pir xwezayî û bedew jî bin, nikare bandora tê xwestin ava bike. Hestên ku

sînorên xwe winda kirine, dîsîplîne nekirine, hestên xwe terbiye nekirine. Di siyasetê de terbiye, exlaq; nêzîkbûna li gorî çîna wê guncav, yekbûna jiyanê ye. Rêxistinbûna wê, şêwaza tevgerê û encama pratîka afirîneriyê ye.

Evder qadek şer a pir dijwar e. Her tiştê li vir tê kirin di bin xizmeta siyaset û şer de ye. Lewma divê xwedî wê xisletê be da ku, hêz bide. Divê hestên heyîn ji siyasetmedariyek balkêş re rê veke. Ger hest, baldarî, hîs, xeyal, daxwaz û bêrîkirin di mezinkirin û pêşxistina têkoşînê de rolek girîng bilîzin, dê şansê pêkhatin û mezinbûnê bibînin. Nexwe dê jêdera xwe jî birizînin û ziwa bikin.

Di derve de partiya me wekî pêngavekî ya nûhkirina rêxistinî, berfirehkirina şer û teyîsandina vê ya li ser her qadê xwe ji kongrê re amade dikir. Em vê ji 2. Konferansa Netewî ya hatî pêkanîn û encamên wê derdixin. Em texmîn dikin. Kongreya 1. di 78'ê de hatibû lidarxistin. Di 82'yê de kongreya 2. û kongreya 3. jî di 86'ê de çêbûbû. Ketina sala konreya nû çêbibû. Bi veşartî derbazkirina hundir a beşek belgeyên di derbarê konferansê de çêbibû. Em wan bi hesasiyetek mezin ve dixwînin, di hinek mijaren de bi dorfirehî nîqaş dikin. Sedemên biryaran jî di vî alî de gelek nîqaşan dafirînin.

Nexasim dema di dahûrînên Rêbertiyê de pirsgirêkên qadên pratîkê tên nirxandin û rexnekirin, bi taybet derbarê mijarên weke di nav me de suc û ceza çiye û çawa zelal pêk tê de, fikir pêş dikevin. Em hewl didin mijarên di beşa hêcetan de şêlû mane û zêde nehatine vekirin fêm bikin. Ji ber di nav şert û mercên şer de edaleta şoreşgerî gelekî girîng e. Em jî di nava xwe de di-axivin ku, mantiqê "şer e, hinek tişt dibin" keyfiyet û bêpîvaniyê pêş dixe. Lewma divê di van mijaran de quralên şer

hem li hember dijmin, hem jî di hundir de hesas bi şêwazek zanistî û rasteqînî werin pêkan. Di heman demê de divê ev pêkan weke çandekê were rûniştandin. Dibe ku, kesên herî zêde pêkanên dijmin ên dervî mirovahiyê jiyan kirî û bûye şahidê wan bûn, ji ber wê jî em herî zêde li ser quralên şer û edaleta şoreşgerî rawestiyan. Hinekê jî ji ber nezelaliya di beşa naverokê de, an jî rexneyên di nav de bandor kiribûn.

Nexwe zêdegavî jî dibûn, an jî hinek meyil û encamên cuda hebûn. Lewma negengaz bû, em van, şêwazên partiyê, edaleta wê hemûyan li cem hev bihizirin.

Bêguman ev mijar bibûn biryar. Diviya em jî di vê mijarê de hesas nêz bibin. Ya rastî tişta herî girîng divê em cewhera wê baş fêm bikin, em bizanin kîjan biryar ji bona çi hatiye girtin, kîjan pêdiviya bingehîn hedef dike, derfetên pêkanê ji kur derdikevin û dê encamên vê çawa bin, baş werin fêmkirin û dawerivînin.

Daxwazên me yên rexnedanên me yên meha Mijdarê û encamên wan ji partiyê re werin ragihandin, ji eniya zindanê ve têr nebe jî, tevkariyek girîng a ji pêvajoya derve re bû. Bi temamî fêmkirina pêvajoyê, ji bona şerê me yê zelal tê kirin, her çendî em bi temamî asta xebatên me yên partiyê nezanin, hinek agahiyên sînordar ên di destên me de û hinek mijarên giştî yên digihin me re, gengaz e ku mirov xwe bigihîne hinek encaman. Dîsa jî kêm dimîne. Weke din jî gumana ku tine ye ev e; gelo çibû, pirsgirêk tên çareserkirin, gelo zehmetiyên ku şer ferz dike, di kîjan pîvanan de dikarin derbas bikin? Baweriya li hember partî û Rêbertiyê, baweriya li hember hevalên derve, ji aliyê xwe ve tevkariya ku hewce dike kirin, baş şopandina pirsgirêkên derve û bidestxistina nêzîkbûna

çareserkirinê bandor dikir. Nêzîkbûnên me yên weke; "jixwe her tiştî partî dike. Jixwe Rêbertî her tiştî dike.." Û van jixwe'yên me her tişt destnîşan kir. Heta gelek caran gumanên weke gelo em vê bêjin rast e, gelo mafê me heye ku em bêjin û destwerdin, wisa nêzîkbûnên dudilî dihatin jiyîn.

Ev jî dide diyarkirin ku, me çiqasî xwe bi zindanê ve sînordar kiriye. Di heman demê de tiştên ku me dikariya bikin jî, sînordar kiribû. Jixwe derfetên xwe gihandina her derê û şert û merc tine bû. Her wiha diviya mirov di vî warî de baş hesabê pîvanan bike. Carna dîmenek ku mafê xwe dibîne her tiştî bike were dîtin jî, carna jî nikare bide diyarkirin ku, nikare xwe bigihîne cihê divê xwe bigihîneyê. Ango rewşek niyeta baş, jixweber û jirêzê derbas nekir.

Agahiya her pêşketina ku derve çêdibû dihat, bi me re hejandinek ava dikir. Her çendî di asta hest û raman de be, navber, qutbûn û valahiya heyî dîtin, nerehetiya wê jiyîn û lêgerînên bi vî rengî xwezayî pêş diketin. Van nêvengên bi nakok, rê ji moral re jî vedikir. Salên dirêj li hember dijmin li ber xwe dayîn, heta çûna mirinê, mirin, rêya hebûn û li ser piyan mayînê bû. Êdî digiha qonaxek wisa, ger mirov nezane rast bijî, nekare xelekên veguherînê nirxan bidest bixe, mirin bû û jiyana herî xirab wisa ji xwe re zemîn didît. Dema di kesayetê de xirabûn, ji nirxan qutbûn û binesaziya vê ya giyanî, li ser vî zemînî zêde dijwar dibû. Ji ber ev zemîn dibûn bêdengî, reva veşartî, lêgerînên wê, ajoyên wê û qutbûna girêdanên xwe yên bi pêşerojê re.

Kesên ku şerê bi dijmin re, weke zora ku dijmin ferz dike û berxwedaniyek çors a li dijî wî dibîne, piştî qonaxekê wî şerî radiwestînin. Dema daxwaziya derketina derve, tola pêvajoya

borî bi şerek berfirehtir girtin, xwe jî li gorî wê plankirin, di hemû şaneyên xwe de pêwîstiyên wê hesîn, wateyek derdiket holê. Nexwe kesên dibêjin; “min evqasî êş jiyan kir, jiyankirin jî mafê min e.” Kesên vê xeyal dikin, pir zû zindan jibîr kiribûn. Êş û êşkenceyên heyîn jibîr kiribûn. Bi qasî şopên bi wan re mane jî nebînin, kor û nerehetiya wê bi qasî misqalekê jî jiyan nekin, îxanet li xwe kiribûn. Wijdanên xwe di zindanê de veşartibûn û çûbûn.

Em jî di vê mijarê de nîqaş dikin. Ne zehmet bû ku mirov sedemên evqasî jiyanê erzan dikin fêm bike. Lê dîsa jî zehmet bû ku, em nav lê bikin. Hinek kesên ku derketin çûbûn cem malbata xwe. Hinek ji wan zewicîbûn. Hinek ji wan ji xwe re dikan vekiribûn, an jî weke hemwelatiyê pergalê bêdeng çûbûn leşkeriyê. Leşkertiya dijminê xwe dikirin. Dibe ku ev kit û mat bin. Lê dîsa jî mirov nediwest bawer bike.

Hevalên ku cezayê wan kêm maye xilas bibe, perwerdeya xweser didîtin. Ji ber rewşa kesên ku derketine jî berçav dihat girtin, ji bona kes rast tevlî partiyê bibe, ji hêla teorî ve fêmkirin û têgihiştina gelo çi hewce dike ne zehmet bû. Lê vekiriye, pir di jor de û subjektîf nêzî bûyer û pêşketinan dibin. Ji ber bi salan çawa hatiye jiyîn, kîjan xislet ber biçavin, wê derve de jî heman tişt xwe di jiyanê de bide der. Kes nikare ji vê rastiyê bireve. Xwe sipartina rewşa rastiya şerê me û hêz dana vê girîng bû. Lê belê, ya girîng jî ma şansê vê ya serkeftinê jî ji kur derdiket, ew hêz û jêhatîbûn hebû? Wê çawa ev baniyan cem hev û bi çi bihatan bidestxistin? Hemû jî hêmanên diyarker bûn û ti xeyal û daxwazên xwe nespêrine vê nikarin pêk werin!

“Çavên te ronî!

Em ji te, tu jî ji me xilas bûyî”

Dosya koma Elezîzê li Dadgeha Makezagonî bû. Hêj zelal nebibû. Her wiha ji komê jî kêm heval mabûn. Parêzer û hinek dost jî li nav liv û tevgerê bûn. Rewşên weke di navbera dadgehan de lihev nekirin, hinek dozên mînak ên xirab bûne û valahiya di encama nîqaşên xalên 141-142 ava bûyî hebûn. Mirov dikariya hemûyan jî bikar bîne. Tevî ku min ji aliyê xwe ve weke mijûlbûnek vala lê dinêriya, dîsa jî helwdana wan bandor nekir. Dostek me înad dikir, digot; “berdêla wê çi dibe bila be, ezê xwîşka xwe ji vir derbixim.” Lê înadek bi berdêl bû.

Wê rojê bangî nûnerên îdareyê kiribûn. Bangî min jî kiribûn. Hinek hevalan digot; “çavên te ronî.” Lê min hêj fêm nekiribû. Min digot qey henekan dikin. Ji ber di qoxuşa jinan de hinek hevalên din weke nûneran bi îdareyê re hevdîtin pêk danîn. Bi navê me jî D. Elî bes bû. Min got qey ji ber ez hatibûm, wer zanîne ku ez nûner im. Lewma ji min re dibêjin çavên te ronî. Min got; “ez van karan hez nakim. Ez nizanim ev jî ji kur derket.” Lê belê, D. Elî dizaniya. Ji bona agahiyê bidin min bangî min kirine. Mudur got; “de çavên te ronî be! Em ji te, tu jî ji me xilas bûyî.” Min dîsa fêm nekir. Min got; “hûn nikarin ji min xilas bibin. Ev ne karek wisa hêsane. Ger şoreş ser jî bikeve, ezê dîsa bi zindanan re mijûl bibim.” Hemû keniyan. D. Elî got; “Sakîne dosya te xirab bûye. Dewlet sê salan deyndarê te ye. Sê salan zêde tu di zindanê de hiştine.” Ez jî matmayî li wan dinêrim. Cardin got; “ger tu bawer nakî, ha ji te re li belgeyê binêre.”

Min lê nêrî û got; “wê demê we çima beriya niha agahî ne da min? Ma çawa dibe? Ezê niha derkevim? Hûn pir ecêb in. Ma mirov wisa dibêje? Kes weke we rehet nîne. Hûn pir bi aram in. Ger ez bûma min niha hemû naverast tevlîhev kiribû. Bila berdana min jî bi hengame be. De, ez diçim cem dilên xwe. Ez îşev heta sibehê li wir im. Sibehê min bişînin.”

Mudur got; “dîsa Sakînê ya xwe pêk anî.” Yekser çûm cem hevalan. Min destpêkê ji mazgalê bangî wan kir. Agahî da wan. Lê kesî bawer nekir. Dibêjin ku ez henekan dikim. Dema gardiyan derî vekir, yeqîn kirin. Her kesî bangî hev kir û agahî da hev. Her kes kêfxweş bû. Lê belê, ez piştî agahiya berdanê bêdeng bûm, weke ku hinek tişt ji dilê min qut bibûn. Hêj bawer nakim ku, ezê ji wan veqetim. Em demek dirêj axivîn. Piştre çûm serdana giştî qoxuşan û min xatirê xwe ji wan xwest. Her kesî ji min re serkeftin xwest û gotin; “em ê hevûdû bibînin.”

Ew şeva min a zindanê û ya Çanakkaleyê ya dawî bû. Her kesî hest û ramanên xwe bilêv kir. Rexne û pêşniyarên xwe pêşkêş kirin. Di heman demê de mijarên ku hewce dike baldar nêz bibim jî, destnîşan kirin.

Roja paştir Can, Numan, D. Elî û Cemal ew ez heta ber deriyê korîdara derve birêkirim. Heta wê kêliyê ti veqetînê zora min ne biribû. Min nedikariya ji wan veqetim. Bi îske îsk digiriyam. Herî dawî min têr ew hemêz kirin û hevalbendiya wan li nav dilê xwe de şidand. Numan çavên xwe paqij dikir û got; de biçe, bes e êdî! Te em jî dan girî.” Heval zêde bêdeng û aram bûn. Lê dawiyê me hemûyan bi hev re hevûdû hemêz kir û bi hev re giriyan. Gardiyan û her kesê li derdor mat mabûn û ecêb li me temaşe dikirin. Ew jî bandor bûn.

Belê, min hevalên xwe di hundir de hiştibûn! Ev rewş jî mirov parçe parçe dike. Dilê mirov li wir dimîne, mirov nikare jê veqete. Min yekem car êş û xemginiyek wisa yên hestên veqetînê jiyan dikir. Min ji wan re got; "em ê li derve, li çiyayên me hevûdû bibînin. Lê xwe baş binêrin." Piştre ji wan veqetiyam û rê ketim.

Can bi telefonê agahî dabû Besra, wê ez pêşwazî bikiram. Agahî şandiye ku wê li rawesgeha maşînan li banda min be. Min herî dawî li nîzamiyê şerê xwe yê dawî jî bi serbaz re kir. Bi hêceta kontrolê demek dirêj ez dam rawestandin. Piştre dev ji polîsa jin, an jî gardiyan berdan, gotin ewê li valîzan binêrin. Min jî destwerda. "di hundir de kontrol kirin, we xêre." Got ku, qural e, dê li wir jî lê bigerin. Me jî bi vê sedemê nîqaş kir. Herî dawî gardiyana jin hat. Wê jî got, di hundir de lê geriyaye. Hewce nake ku cara duyem were kontrolkirin. Lê serbaz înad kiriye, wê lê bigere. Tam faşîstek bû! Wê mîsoger mijûl bike! Min jê re got; "min çiqas dixwest di şert û mercên cuda de ez û tu liqay hev werin. Awirên tûj dan min. Got; "ma tu gefan li min dikî?" Min j bersivand; "êdî tu çawa fêm dikî bike." Min xwe berda ser cadê. Bi taksiyê çûm rawestgehê. Weke ku bi sala ne li Çanakkaleyê jiyan dikim, ti şêwazî biyanîbûnê jiyan nakim. Hişê li min li ser hevala ye. Agir ketiye dilê min. Min ew di zindanê hiştin û ez diçim.

Dîrok 26'ê Kanuna 1990'î ye.

Di 17'ê Gulana 1979'an de, di berbanga sibehê de li Elezîzê ji malê girtim û birim. Nija jî ji zindana Çanakkaleyê derdikevim. Ji kur, ber bi kur ve… şînbûna derdayê pir xweşike! Tîrêjên rojê li ser deryayê diteysin. Ev jî li ser deryayê dîmenek gelekî bedew ava dike. Hewa xweş e. Piştî ku

me bi çend dostên Besra wan nas dikir re hevdîtin pêk anî, em bi otobûsê ber bi Stenbûlê ve rê ketin. Di tevahiya rê de li ser roja dawî ya min bi hevalan re jiyan kir, gerimbûn û nêzîkbûna wê rojê ya berdêla hemû salan jiyan kirî hizirîm… ez ti caran ji hevalbendiya wan rojan a bedew têr nebûm…

Gavek wêdetir a qutbûna 13 salan…

Bi gelek valîz û zêran ve li balefirgehê li firokê siwar bûm. Welî ji bona pasaportê got; “yekem care, em evqas pere didin gumrukê. 500 DM dane! Me agahî daye. Wê te jibalefirgehê bigirin. Tenê bi zimanê Tirkî ne-axive. Tu dikarî pereyan hûr bikî. Weke din jî tiştên min gotine jibîr neke…” yek bi yek hişyar kirim. Me xatirê xwe ji hev xwest.

Zêde kes di firokê de tine ye. Gelek cihên vala hene. Li cem min jî kes tine ye. Ev jî baş bû. Bi tenê me, lê hinde xeyal û kelecana min zêde ye, di cihê xwe de nahedirim. Weke ku wext derbas nabe. Tevger rawestiya ye. Yekem care diçim welatek Rojhilata Navîn. Gelo Şam warek çawa bû? Her derî Libnan û Akademiyê jî mereq dikim. Hinde min li wêneyan temaşe kiriye, min her dîmenek akademiyê jiber kiriye. Dîwarê me yê girtîgehê zêde dewlemend bû. Wêneyê Rêbertiyê,

şehîdan, tabloya akademiyê di zindanê de cihê her xweş bûn. Lê min bihara wê nedît. Kêm maye meha Gulanê xilas bibe. Mîsoger niha li wan deran wextê mehên Adar û Nîsanê pir xweş in. Xweziya çawa ji girtîgehê derketim bihatam.

Belê, ev pênc meh e ji zindanê derketime. 22 Roj in jî ji Tirkiyê derketime. Tam di 1'ê Gulanêde li Stenbolê balefirgeha Yeşîl Koy li firokek Yewnanê siwar bûm. Ji ber welat welat tê ragihandin hinek tevlîhevî derketibû. Heval li Shtutgard'ê li benda min bûn, ez jî li Kolnê bûm. Li cem min ti navnîşanek jî tine ye. Tenê dolar li cem min hene. Pereyên hûr jî tine ne. Ez nikarim jetonekê jî bikirim. Tenê nimreya bîro ya Ferda di bîra min de ye. Min hewl da bi zimanê Almanî yê nîv bi nîv dizanim ji du kesan re rewşa heyî rave bikim. Hinekê rewşa min fêm kirin û bi qasî heqê jetonekê pere dan min. Min spasiya wan kir. Min di telefonê de rewşa xwe ji Ferda re diyar kir. Min nimreyên Komîtê û Berxwedan girtin.

Weke din li ser dîwarê balefirgehê navnşanên otêlan nivîsandine. Min ji wê lîsteyê navnîşanek girt û bi taksiyê çûm otelê. Pişt re min dît min taxa herî dîrokî ya Koln'ê hilbijartiye! Avahiyên kevnar hene. Otêl du qet e. Cihek bêdeng û aram e. Yekser li Komîteyê geriyam. Yê pê re axivîm got; "navê min Hisên e. Ez niha têm cem we." Hinekê rehet bûm.

Ez bi pasaporta sixte ji Stenbolê derketibûm. Tevî ku ez çawa ji zindanê derketibûm min wêneyê xwe şandibû, piştî mehan pasaport hat. Ya rastî min di nava wê pêvajoyê de gelek derfetên derketinê dîtibûn. Lê hevalan got; "dibe ku ew rê ne baş bin, hinekê bi sebir be!" Wisa ez asteng kirim. Ger mijar ne Rêbertî bûya, wê min dîsa israra derketinê bida pêş. Piştî ku ez ji zindanê derketim roja duyem, min bi Rêbertiyê re hevdîtinek

bi telefonê pêk anî. Rêbertiyê got; “çend mehan rewşa xwe ya legalîte bikar bîne. Hinek dost hene. Tu dikarî biçî serdana wan. Malavahiya serdanan bike. Heta cihek wisa bigirin, bila dost werin wir. Lez neke. Wê tu werî…” Ger ev tişt ji min re negotibûya, qetiyen min nedikariya evqasî li ber xwe bidim.

Weke ku ez û Hisên ji mêjve hev nas dikin, pêşwaziyek wisa gerim çêbû. Hêj derve bû ez li cihê rawestgehê rabûm ser xwe. Çavên me keniyan. Em hevûdû hîs dikin. Me bi van hîsan hevûdû nas kir. Min got; “mirov PKK’yî be bes e. Me bi van hîsan hev nas kir, ne wisa. Wî jî erê kir û got; “lê min wêneyên te dîtibûn. Bes tu niha hinek din hatî guhertin.” Belê ez hinekê hatibûm guhertin. Heta ne hindek, weke Elî Îhsan gotî, zêde hatime guhertin.

Beriya rê bikevim min li cem berber porê xwe rast kiribû. Ji ber diviya ez bişibim wêneyê li ser pasaportê. Weke din jî min kêmek mekyaj li xwe dabû. Ti bermahiyê wê jî nemabûn. Tenê li ser neynokên min ojeyek sedef heye. Divê wan jî bi ava taybet jê bibim. Ma min wê çawa nîvê şevê li otelê ew ava peyda bikira. Jixwe ez jî ne di wê ferqê de bûm. Her kesî dizaniya ku ji nav wan zilaman, bi pasaporta sixte û firoka wan û rêya zagonî derketime derve. Dibe ku hinek tiştan qet hewce nekiribe. Belê ev ji tevdîrek li hember şikbirinê ye. Bi gumana; “haj ji xwe hebe tu neyê girtin” baldar nêzî dîmenê xwe jî dibûm. Heta ew gerden û bazinê zîv a bi morikên şîn ku Ferda û Sara ji min re kirîbûn jî, min kiribû situyê xwe. Bazinê min di firokê de ketibû. Bawerim ji ber baş girê nedabûn ket. Ya rastî li ber ketim. Min gerden jî da Yeter a keçmama xwe. Ew demek dirêj bû me hevûdû nedîtibû, tenê carekê bi Yasemîn re çûbûm cem wê. Min jê re got; “bîranîna wê heye. Baş biparêze!”

Cilên min ên bi xeta reş û sor jî zêde balkêş in. Cantûrkan kirîbû. Bi hevjîna xwe re çûbûn mixazeyek ku taxa lê diman kirîbûn. Min wê rojê xatirê xwe ji Elî Îhsan, Ferda û Cantûrkan xwestibû. Hemû jî zêde hestiyar bûn. Silavên xwe yên gerim, girêdanê rave dikin ji Rêbertiyê re şandin. Piştku min û Elî Îhsan hev dît li ser notek biçûk bi çend gotinan soza xwe ya girêdanê nivîsandibû û xwest ji Rêbertiyê re ragihînim. Min jî ew ji ber kiribûn. Min diyar kir ku ezê mîsoger ragihînim. Hevjna Cantûrk got; "xwezî min jî bikariya bihatam û min Rêbertî bidîta." Şeva me qaseta Newrozê temaşe kirî, eywan tije mirov bûn. Gelek dostên me, kesên ji Rêbertiyê hez dikirin hatibûn. Dostên eslê xwe Ermenî û ji Lîcê bûn, dema temaşe kirin bi dengê bilind duruşmeya, 'Bîjî Rêber APO' qêriyan. Di wê kêliyê de rûyê her kesî dikeniya. Hinek kes jî ji kêfxweşiyan digiriya.

Belê, niha jî diçûm heman akademiyê.

Bêrkirinên li gel min jî mane bi xwe re dibim…

Ez yekser bi Hisên Çelebî re ji otelê derketim. Hisên bi henekî got; "gelo, te ev otêla antîka kevnar ji kur peyda kir? Min bi zorê peyda kir." Di wê kêliyê de ev zewqên min tev ên cuda asayî, tesadûfî û ji neçarî pêk dihatin. Bibûn mijara henekan jî. Lê belê, wê min ji kur bizaniya dê ev mijar tev pişt re weke 'bêrîkirinên burjuvaziya biçûk' an jî ferasetên cuda werin binavkirin! Lê yek ji wan jî ne di xema min de bû. Di wê kêliyê de kurkên cîhanê yên herî biha, mal û otêlên herî xweş, nizanim bêrîkirin û zewqên herî xweş jî, derdora min dorpêş bikiran, tiştek ne di xema min de bû. Bala min nedikişand.

Ji ber bêrkirinên min cuda bûn. Ji ber ew hestên min xweş bûn, di carekê de ew qutbûn û dûrbûna 13 salan ji holê rakiribû. Ji bona xwe bigihînim wê hesreta 13 hezar salî ya gavek wirde, dilê min lê dida. Dilê min bi xwezayî hemêzkirina wê ve dişewitî. Ez di nava bêhedariya wê de bûm. Her hevdîtinek û her gavek ez ber bi wir ve dibirim. Nêzî wir dikirim. Min ji xwe re digot, xweziya rê evqasî nedûrbûna. Ev jî bi sîtemek zaroktî dihat gotin…

Em çûn mala dostek ku keçên wan jî di nava kar de ne. Min cilên li ser xwe guhertin û hinek ên rehet kirin ber xwe. Min ji keça malê aseton (ava ku mirov pê ojeya li ser neynokan pak dike.) Xwest. Dema min got; "ka bidin min ez van jê bibim, nexwe dê heval bela xwe li min bidin û bikenin" hemû keniyan. Pişt re em çûn Vîpertalê cem Meral wan.

Ez û Meral destpêka 79'an de ji hev veqetiyan. Her çendî di nivîsên me de kêliyên zêde hestiyar hebin jî, me di gelek mejaran de nîqaş dikir. Muhasebeyek pêvajoya derbasbûyî hebû. 'Hûrika' ma nehatibû guhertin. Zindî û kamil bû. Her çendî bi hêrêsek mezin digot; "ez li wê hovîtiya girtîgeha Amedê digerim", wê dîsa di girtîgeha bi nav û deng a Almanya de lêhûrbûnek baş kiribû û vala nesekinî bû.

Li mala Vîpertalê ew û Ronahî bi hev re di nava karên nivîsê de fetisî bûn. Xebatkarên wan ên Kovar û Rojnameyê kêm bûn. Mat mam, tenê çend hevalan ew qas kar dimeşandin. Tenê şêwaza karê wan mirov tengav dikir. Nexasim Ronahî bibû girtiya maseyê. Bi kursî ve dima û heta êvarî nedikariya rabe ser xwe. Zêde çay vedixwarin û zêde cixare dikêşan. Vê xebatê û rewşê hinek kesên di girtîgehê de danîn bîra min.

Dîlekê di nava qoxuşê de derdora dîwanê bi paçan dorpêç kiribû û ji xwe re cîhanek cuda ava kiribû. Çay gelek vedixwar û cixare jî zêde dikêşa. Di heman demê de zêde dinivîsand. Li derdor zêde nivîsên reşkirî û qaxedên qetandî hebûn. Jixwe ew xwelîdanka tije qunkê cixareyan, desmalên bikar anîne û li derdor belav kirine û bi 'jiyana xwe ya şevê' ve her tim cuda bû. Jiyana wê şev bû. Kûrbû, tarîbû, mij bû, dû bû û çaya tarî bû. Min her tim ji bona Ronahî Dîlek mînak dida. Lê min dîsa jî nedikariya wê ji bona pênc-deh xulekan derxim derve, bibim ser wî girê daristan û xwedî şînkahiyek bedew. Bi zorê qebûl kir ku, xebatek yek alî û bêberheme.

Dîsa jî axaftin û nîqaşên me dewlemend bûn. Em jî bi gelemperî di nîqaşên xwe de diçûn zindanê û zindanan. Dema behsa kesên nas û hinek pêvajoyan dihat kirin, sohbetên me kûr dibûn. Ne pirsên me xilas dibûn û ne jî bersivên me têrê dikirin. Hem gelek salên bênavber hatine jiyîn, bûyerên ku vegotina bîranînan têra wan nakin, hem jî ew bîranînên bi êş û axînan ve giran hatine jiyîn.

Min belgeyên Kongreya 4. Ddxwendin. Ez kûr çûbûm. Ji Kongreya 1. gelekî cuda bûn. Pirsgirêk û asta nîqaşên wî demî û piştî yên 12 salan gelekî ji hev cuda bûn. Mirov li hember gelek raporên eyaletan, rexnedanan û biryaran mat dimîne. Yeqîn nake. Mirov ji xwe re dibêje; "ma çawa dibe?" Ji ber wê lêhûrbûna giran her roj êşa serê min a mîgrenê digirt. Dema ev êş giran dibû derdiketim derve û dimeşiyam. Min nedikariya nêzîkbûnên ji hevalan, gel re û rewşên di vê mijarê de hatine jiyîn qebûl bikim. Serê min giran bûye. Her wiha bûyerên weke "rûmeta wan cardin hatiye dayîn.." Gelek tiştên din.

Min ev peyv tenê di hinek roman, an jî filman de dibîhîst. Rexne û biryarên di asta kesan de pêş ketine gelekî giran in. Ez jî hewl didim rastiya şerê me û pirsgirêkên me fêm bikim. Dema em li girtîgeha Çanakkaleyê bûn Rojnameya Serxwebûnê dihat. Piştre derfetên me yên xwendina yek-du dahûrînan çêbû. Nirxandin û rexneyên Rêbertiyê di wan rojnameyan de hebûn. Me jî hewl dida em wan pirsgirêkan fêm bikin û sedemên pirsgirêkên heyîn têbigihêjin. Ji ber gelek tişt ne zelal bûn.

Di nava raporan de rapora Şener jî hebû. Dirêj bû. Ji rapora ku di Adara 88'an de nivîsandibû hinek din berfirehtire. Hewl didim nirxandinên wî yên wê demê bînim bîra xwe. Ez naxwazim di hinek mijaran de bideng bi-axivim û nîqaş bikim. Asta nirxandin û rexneyên hevalan jî ez têr nedikirim. Ji ber pirsgirêk ne nirxandina zêde û rexnekirin bû. Mantiqê bûyera dibû sedema rexneyan ez eleqeder dikirim. Bi ti şêwazî aqilê min nedigirt. Her carê heman tişt dihat hişê min. Gelo şoreşgerek çawa dibe ku hişê xwe winda bike. An jî dema hişê xwe winda jî dike, ti caran nikare sonda Tirkan bixwîne! Sû'ya di çîroka Kizil Kayalar'an (pirtûkek li ser şoreşa Mao ye.) de hat bîra min. Êşkenceyek giran lê tê kirin, dîsa jî encamê nagirin. Herî dawî bi derziyekê diceribînin, hewl didin bandor li hişê wê bikin. Tenê tiştek di bin hişê wê de dimîne, ev jî, "nizanim" e. Tenê hinek tiştên ku dijmin bixapîne dibêje. Min her tim di axaftinên me de ev mînak didan. Bes min ev mijar jî bi her kesî re nîqaş nedikir. Hemû heval jî muhafazakar in, ev pîvanên veşartinê ya dema koma destpêkê heye. Bandora nêzîkbûna ku, rewşa qadro li her derê nayê nîqaşkirin serwer e.

Ji ber di zindanê de nîqaşên bi vî rengî xeter bûn. Di zindanê de ji bona kesan her tişta dihat gotin û nîqaşkirin, dihat bikaranîn.

Min her tiştên xwe yekser li holê digotin, her kesî jî ez wisa nas dikirim. Dema derfetên nivîsandinê yên herî biçûk jî heban, ez bê helwest nedimam. Di asta fikir de jî be min rexne û pêşniyarên xwe pêşkêş dikirin. Qet nebe ev aliyê min dihat zanîn. Dema min heval ji nêz ve didîtin em di-axivîn û me nîqaş dikir. Tiştê ku di serê min de asê mane ji wan dipirsim, baş e ku hinek tiştan hîs dikim, ne xirab e. Ev jî hişyarbûne. Nexasim li hember quralên rêxistinê yên bingehîn û pîvanên nirxên şoreşgerî, kûrbûnek polîtîk nebe jî, hest, bertek û baldarî zindîne, çalak in û hesas in. Kêmasiyek herî biçûk jî ji mirov re dibe derdek mezin. Bandor dibûm. Kêfxweşiyên min jî wisa bûn. Lê aliyên wê yên kêfxweş dikirin û xemgîn dikirin, bandorek neyênî ava dikir diyarbûn, bertekên min vekirîbûn. Min nedikariya wan veşêrim.

Lê di heman pêvajoyê de piştî min rapor xwend bêbertek mam, an jî bertekên min xwe veşartibûn. Weke janek kûr bû. An jî weke pirsek bêdeng ku mirov tengav bike bû. Ew Sakîneya ku her bertek, hest, heta gelek tiştên ku hewce nedikir were gotin, carekê de li naverastê vedigot û derdixist derve, di wê kêliyê de bêdeng û melûl bû. Ev jî ji ber çavên Şener neçûbû.

Belê, wê demê zêde li ser nerawestiyabûn. Dihat gotin ku bandorên pêvajoya lewazî, qelsî û teslîmiyetê ye. Gelek lewazî û qelsiyên weke vê hebûn. Jixwe hemû jî hatibûn jiyîn. Encam heman rewş bû! Nedihat bîra mirov ku ji hêlek din ve binirxîne. Ya rastî di rapora xwe ya kongreyê de ev lewazî û qelsiyên xwe baştir nirxandibû. Lê min heman acizbûn cardin

jiyan dikir. Berî ku raporê bi dawî bikim, min dev jê berda. Dîsa derketim derve û meşiyam. Min di nameyek xwe ya nivîsandî de gotibû; “ez di vê têkîliyê de ti aloziyê naxwazim. Ger kêmasiyek herî biçûk derkeve dê xirab bibe.” Lê wî pirsgirêk cuda şîrove kiribû, heta digot ku bi Elîf re nîqaş kiriye û lê heytandiye. Hinek tiştên weke; “bi mirov ve dizeliqe. Hêj li benda girêdanek kevneşop e. Min jê re diyar kir ku pirsgirêk ji aliyê min ve hatiye çareserkirin, lê ew naxwaze fêm bike. Ez dixwazim gumanên te ji aliyê min ve rehet bin. Ezê ji rebenê wisa re destnîşan bikim ku têkîliya pîroz çawa pêş dikeve.” Ez bi êşek giran ve bi vê fêmkirina wî keniya bûm. Ji ber derdê min ne ew bû ku, hinek din dikevin navberê. Ev jî tiştek zêde berovajî ye. Di hişê min re jî derbas nabe. Jixwe ger ez ji yekê hez bikim, kes nikare bikeve navberê! Dibe ku bala hinek din li ser min hebe. Ev jî xwezayî ye. Ger hezkirin bihêz be, durist be û bingeha wê saxlem be, ma kî dikare xirab bike. Ji bona min rewşek pêkenok e. Gelo çima hewce dît ku şîroveyek wisa bike. Min zêde wate nedayê.

Lê dema hevdîtina min bi Rêbertiyê re di telefonê pêk anî de, Rêbertiyê behsa Salîhê û Nîno kiribû. Min ew malbat tev nas nedikir. Xwîşk û bira pir bûn. Rêbertiyê behsa broşûreke Nîno kiribû. Gotibû ku ew broşûr hemû endamên malbatê pênase dike. Gotibû; “divê mirov di serî de ji bona rewşa Salîhê û piştre ya hemû malbatê Şener berpirsyar bigire. Ew malbat çima wisa bû? Çima rast nekir? Malbatek tam belaya serî ne. Divê Şener hesabê vê bide.”

Her çendî min baş fêm nekiribe bûyer çawa pêş ketine û naveroka wan çiye, min kêm zêde Salîha nas dikir. Min got; “Rêberê min gumanê me li hember Salîhayê hebûn. Jinek

ziman dirêj bû. Zêde baweriya me pê nedihat. Peywendiyên me piştî salên 87'an sînordar bûn. Tenê em wê dizanin. Rêberê min Şener çawa ye?" Ji ber beriya ku derkevim nivîsek bi destê wî û ya Rêbertiyê hatibû girtgeha Çanakkaleyê. Em gelekî kêfxweş bûn. Me digot; "Kesên ku derdiketin derve kêrî tiştekî nedihatin. Lewma qet nebe bila Şener kêr were. Ger bixwaze wê tevkariyek mezin bike." Ev nêrîn û daxwaza me tevan bû.

Pişt re me bihîst ku di kongreyê de ji bona rêveberiya navendî hatiye hilbijartin. Em bi Elî Îhsan re axivîbûn. Behsa pêvajoya 89'an dema bi hev re bûn dikir. Hinek xisletên wî yên ecêb rexne dikir. Di heman demê de diyar dikir ku, ecêb bû. Tiştên diyar dikir neşaş bûn. Şener tevlî Kongreyê bibû û ji bona navendê hatibû hilbijartin. Ez hîn bûm ku li Botanê ye. Jixwe Rêbertiyê jî got; "niha ne li cem min e. Di nava xebatan de ye. Salekê li cem me ma. Baş bû, kar dikir, ger bike kapasîteya wî heye. Ka em lê binêrin, hêviya me heye." Vê jî ez kêfxweş kirim. Lê dîsa jî di hundirê min de nerehetiyek hebû. Bi raporê re vê gumanê cardin xwe nû kir!

Min bi Meral re li ser mijarên dijî partiyê yên di pratîkê de derdikevin holê nîqaş kiribû. Bi taybet îdîayên weke hevalê xwe ne rast tewanbarkirin, darizandin, cezakirin û êşkence kirinê de, ez mat kirim. Ez jî bê navber pirsên 'ma çawa dibe' ji xwe dikim. Hevalê Cemal jî amade bû. Di vê mijarê de got; "nabe êşkence were kirin, lê dikare şeqamekî lê bide." Bi tundî li dijî vê jî derketim. Ji min re got; "tu di girtîgehê de zêde hestiyar bûyî. Rastiya şer cuda ye. Tu zêde humanîst nêz dibî."

Min diyar kir ku, tevlî nêrînên wî nabim. Rast bû, mirov di girtîgehê de zêde hestiyar dibe. Lê tiştên ku min li wir dîtin û jiyan kirî jî rastiyek bû. Dijmin di asta herî ketî de êrîşî mirov

dike. Tevî van hezkirin û parastina her tiştê ku ayîdê mirov e û li hember wan nêzîkbûnek hesas kirin, gelekî girîng bû. Ger ev bi min re pêş neketibin û nebin, ezê berî her tiştî ji mirovbûna xwe guman bikim. Neçarin ku bi min re pêş bikevin. Ti nêzîkbûnek dijî mirovahiyê nabin hêcetek rastiya şer. Dijmin dikare bike, ji ber ev xisleta wî ye. Lê, şoreşger û PKK vê nake. Xisleta PKK'ê ya herî bingehîn, nirxê ku dide mirov e. Hezkirina mirovê mezin e. Rêhevaltiya bedew a tê jiyîne. Min got; "na, na, hûn nikarin bi ti şêwazî min qane bikin."

Min di navberê de pirsa Şener ji hevalê Cemal kir. Beriya niha diyar kiribû ku li Botanê ye. Min pirsî; "gelo hêj li wê qadê ye?" Hevalê Cemal jî got; "rast e. Li wir e." Kêfa min xweş bû. Piştre min hemû xebatên qada legal li Hollandayê li mala Meto wan jê re vegot. Min hinek nimreyên telefonê jî danê. Hinek dostên ku peywendiyên me bi wan re hene. Weke din min hinek xisletên hevalên ku li wê qadê kar dikin jî parve kir. Wî jî gelek kes nas dikir. Ji ber me her peywendî û her xebat bi rêk û pêk jê re radigihand. Hevpeyvînên me bitaybet di pêvajoya HEP'ê de zêdetir bûn. Min bername û rêziknameya Komaleya Jinên Welatparêz jî dayê. Min got; "ez namînim vekirina wê. Lê ger baş kar bike, dikare zêde bandor bibe." Min hinek pereyên ku dostan jî dayî radestî wî kirin. Di heman demê de min tiştên ku ji bona akademiya Rojhilata Navîn kirîn jî şanî dan. Dostan, malbat û derdorên nas ji bona Rêbertiyê hinek xelat kirîbûn. Gelek tiştên ku pêdivî bi wan çêbe kirîbûn. Heta Yasemînê got;

"Rêbertî diçe cem dostan, zarokên wan hene, weke din jî zarok tên serdana Rêbertiyê, lewma em dikarin hinek tiştan ji bona wê jî bikirin. Ji ber carê Rêbertî jî diyariyan dide. Ew jî

pê kêfxweş dibin.” Çawa kesên li malê ev bihîstin, yekser ketin nav liv û tevgerê, çi amûrên lîstokan ên baş hene hemû kom kirin. Weke din ji bona zarokên temenê wan pênc heta deh hinek cil jî amade kirin. Çenteyek biçûk jî ji bona wan amade kirin. Ez jî li dijî yekê derneketim. Min ji xwe re jî hinek cilên baş kirîn. Hizirîm dibe ku ez jî demekê li cem Rêbertiyê bimînim, lewma min girîngî da cilên baş. Heta min cilê bi rengê leşkerî yê dema ez biçim akademiyê li ber xwe bikim jî, kiriye.

Min dixwest tevlî rûniştina doza hevalê Fuat û Abbas bibim. Hevalan destpêkê got, “temam, dibe.” Lê pişt re dev jê berdan. Gotin, “em nizanin çi dibe, çi nabe. Li Tirkiyê û Kurdistanê diyardeyên weke polîs û dadgehan xeterbûn. Lê dibe ku li Almanya jî wisa be? Diyar bû, zêde dihat nepixandin. Lê belê hevalan li Tirkiyê di rojên dawî de ez hişyar kirim. Elî Îhsan got; “zêde negere, wê polîs te bigire.” Mafdar bû. Ji ber ez diçûm gelek cihên legal. Li wan deran pir zû dihat fêmkirin ku, kî çi karî dike. Ji aliyekê ve baş bû ez wisa vekirî digeriyam û bi qadên legal ve sinordar dimam. Li ber çavên dijmin bûm. Di vê manê de hinek xeternakî hebin jî, min karê xwe berdewam dikir. Lê xebatên min dikir jî, ne ji rêzê bûn. Di heman demê de dijmin li hember ti hewldana ku xizmetê ji vê re bike tehemul nedikir.

Ger xwîşka Aytekîn bi şaşî şûna min negirtibûna, min jî tevdîrên xwe nedigirt. Rojên dawî bûn. Xebatên Komeleya Jinên Welatparêz (YKD) gihabûn astek girîng. Nekarîn pêşiyê lê bigirin. Weke din ger venêrînê bikin jî, nedizaniyan ez çi dikim û dê çi bikim. Min û Elî Îhsan her heftiyê hevûdû didît. Carna jî di rewşên lezgîn de ev hevdîtin zêde dibûn. Di vê

mijarê de jî rê ji ti xirabûyan re nehat vekirin. Dîsa ez diçûm cem gelek peywendiyên nû pêş ketine û dostan. Dikariyan tenê heta cihekê min bişopînin. Heta carê em bi hev re li heman otobûsê, heman xwaringeh, heman kovar û rojnameyê, an jî heman rawestgehê bûn. Polîsan jî wisa vekirî û berbiçav dişopand. Min jî gelek caran digot; "parazvanên min in." Lewma heval bi vê heneka min dikeniyan, lê gumanê xwe jî danîn ziman. Tam di pêvajoyek wisa de dema em li cem mala Aytekîn bûn, xwestin vî karê xwe jî bi dawî bikin. Dema ez ji malê derketim, li rawestgehê, li koçeya destpêkê bigirtam. Ez wê sibehê pênc-deh xulekan dereng derketim. Li şûna min Aysel girtibûn.

Pişt re fêm dikin ku şaş girtine. Şibandine min. Pirsa min jê kirine, wê jî gotiye; "nizanim, ez parêzera wê me, tevlî doza wê bûme. Pê re mijûl nabim ku li kur dimîne." Min jî ji wê rojê pê ve xwe veşart. Jixwe pasaporta min jî hatibû. Min di rojekê de amadekarî kirin û derketim.

Çiqasî bi çavkorî têkil her karî bibûm. Li hember karan birçîbûnek mezin hebû. Dibe ku ez hişyar tevdigeriyam, lê dijmin nedisekinî. Dikariyan min di kêliyên herî rehet de bigirin. Ji ber di vê mijarê de ji xwe bawerbûnek zêde û tevdîrên heyîn jî têr dîtinek hebû. An jî bi înad serî rakirin bû.

Hişê min hêj jî li ser wan xebata ye. Roja dawî dema min li Hollanda bi Leyla re hevdîtinek telefonê pêk anî, dengê merasîma vekirina amadekariyên Komaleya Jinên Welatparêz bi min dabû guhdarkirin. Ango xebat hêj jî didomiyan. Tişta herî girîng jî ew xebat bi demdirêjî mayînde kirin bûn. Her çendî hinek gumanên min ên di vê mijarê de hebin jî, bi dilxweşî lê dinêrim.

Hêj di wê demê de di nava Partiya Kedê ya Gel (HEP) de lîstokên cur be cur dihatin jiyîn. Lewma divê mirov li qada vê xebatê jî pir bihêz û hişyar tevbigere. Ger ziraviyên polîtîkayên neyên zanîn, dê gelek lîstokên ber lingan ked û hewldana hatiye dayîn vala derbixe. Hinek kesên ku di destpêkê de nêzîkbûnên me yên ji HEP'ê re şaş dîtin, heta kesên gotin; "hûn ketin nav lîstoka emperyalîzmê", piştre jî bê navber dest bi kar kirin. Hinek qadroyên wê ji Awrûpa jî hatibûn. Her kesî dixwest parsêlekê ji xwe re bistîne. Girseya me ya welatparêz jî ji me digirtin. Hinek guruban polîtîkgeriya burjuvaziyê baş pêk danîn. Ew jî destpêkê li dijî PKK'ê bikar danîn. Gelek kesên bi navê me de kar dikirin, hêj destpêka kar de xwe winda kirin. Kesên ku nirxan dixwin derketibûn holê. Ger nêzîkbûnek baldar nehatiba kirin, dê potansiyela ku têkoşîna me ava kiriye, li dijî têkoşîna me bihata bikaranîn. Hewl didan bibin darkê hewdelê û fesadiyê bikin. Min ev rewşên heyîn tev ji hevalê Cemal re vegot. Gelo hinek tiştên min neragihandî mabûn?

Ji hêlekê ve dixwazim rêwîtiya min zû biqede. Ji hêla din ve jî nikarim ji xebat û bazdana dihat kirin veqetim. Gelek tiştên ku ez ji Rêbertiyê re bêjim hene. Divê ez hemû çavdêriyên xwe vebêjim. Bi taybet li Awrûpa bi ser telefonê ve meşandina xebatên metrepolan nabe û têrê nake. Ji ber carê gelek tiştên şaş û xapînok derdiketin holê. Hinekê jî her kesî her bûyerek li gorî xwe dinirxand. Kesên ku bi fêlbazî vedigotin û dixwestin xwe bidin qebûlkirin jî ne kêm bûn. Lewma diviya hişyariyek kûrtir û tevdîrên nû werin avakirin. Min ev bi hevalê Cemal re jî parve kirin. Ez di firokê de cardin li ser van tevan hizirîm. Ezê hemûyan bi tevahî ziraviyan ve ji Rêbertiyê re vebêjim. Hêj gelek tişt hene ku ji Rêbertiyê re bêjim.

Kefenê xwe diqetînim û ber bi çavkaniya xwe ya jiyanê ve diçim…

Em daketin balefirgeha Şamê. Dengê dilê xwe dibihîsim. Kelecanek wisa bi min re heye, weke ku ezê yekser Rêbertiyê bibînim. Valîzên me bi asansorê birin. Ez ketim malîkaneya hûrkirina dovûzan. (dovûz bozdurma gîşesî.) Zêrên li ser min giraniyê çêdikin. Dê zilamên van deran min weke jinek karsaz, dewlemend û mûcewheran pir hez dike binasin. Ez jî bi xwe dikenim. Bazin jî di bin zendê çakêt de ne, naxwiyên. Kêm dixwiyên. Lê zincîrên di gerdana min de û pelkên pêncanî baş dixwiyên. Gustîlîk jî heman wisa dixwiyên. Min her tiliyek xwe gustîlkek kiriyê.

Carê jî bê ku bidim ferqkirin li derdor dinêrim. Ez kesekî ku bişibin ên me nabînim. Çûm ber bi cihê ku valîz lê tên kontrolkirin. Min di wê kêliyê de çavên min bi çend kesên ku di şibakeya beşa hundir de li min dinêrin ket. Baldar temaşe dikin. Ez jî li wan dinêrim. Min got; “dibe ku ev bin.”

Pir zirav li tiştan nagerin. Jixwe hemû cil in. Hinek weşan hene, me ew jî kirine navbera tiştan de. Tam di wê kêliyê de du kes hatin. Bi rûkenî gotin; “tu bi xêr hatî.” Orhan û Ahmet bûn. Pişt re em ber bi maşînê ve çûn. Du jin hebûn. Navê wan Bêrîvan û Rengîn bûn. Di destê wan de gul hebûn. Gotin; “Rêbertiyê şandine. Wî nekarî were, lê gul şandin. Lê, malê li benda we ye.” Min ew gul girtin kir hemêza xwe. Zêde hestiyar bûm. Ma ne diviya min jî gul bibira ji Rêbertiyê re? Gulên Rêbertiyê çiqas watedar bûn. Ez dihizirîm ku ma dikare were heta balefirgehê. Dikare bi nasnameyên cuda tevbigere, ma çima nabe? Min bi hevalan re sohbetek biçûk kir. Gotin; “çawa me tu dîtî, me yekser tu nas kirî.” Dibêjin ku hinek wêneyên min li malê hene. Weke din jî hevalên li Awrûpa hinekê terîf kirine.

Dixwazim demek ji beriya demekê bigihim malê, weke din jî tiştekê naxwazim. Baş e ku rêwîtiya me zû qediya. Em bi asansorê re derketin. Me pêl li ser nivîsa ‘10’ kir. Asansor rawestiya û li zengila derî xistin. Kêmek maye dilê min bisekine. Çawa derî vebû Rêbertî li hember min bû. Min hemêz kir… Hemêz kir… Hemêz kir… Ev rastiyek bû. Rastiya ku min bi salan xeyal dikir, min ti caran hêviyên xwe winda nekirî, ew kêliya ku min digot; “emê liqay hev werin, ezê Rêbertiyê bibînim û ezê wê mezinbûna wî hemêz bikim” pêk hatibû. Lê min nekarî daxwazên wan hevalan ên gotin; “şûna me jî hemêz bike, eniya wî û çavên wî ramûse” pêk bînim. Min hemû di yek hemêzkirinê de pêk anîn. Ew hemêzkirina min şûna hemûyan bû. Bêrîkirina hemûyan bû. Hezkirina hemûyan bû. Her çendî min di navberê de digot; “ez bawer nakim” jî, di wê kêliyê de her tişta ku pêk dihat rasteqînî bû.

Min got; “Rêberê min we ev gul ji min re şandine, ez jî didim we. Ji ber min nekarî bikirim.” Pir rehet im. Her tim min digot, ger dema ez bibînim û bigirîm, ez nekarim xwe û bigirîm dê çi bibe? Lê her çendî çavên min ji kêfxweşî û şahnazî tije rondik jî bin, min xwe girt û bideng negiriyam. Dema ez ji Çanakkale ji hevalan veqetiyam bi îske îsk giriyabûm. Qutbûna ji wan nehêsan bû. Çawa dibû min ew di girtîgehê de hiştin û ez derketim! Nivê dilê min li wir mabû. Awirên min bi çavên wan û dilê wan ve girêdayî mabûn.

Lê hevdîtina bi Rêbertiyê û hevdîtina bi partiyê re pir cuda bû. Min Rêbertî herî dawî di Kongreya gundê Fîsê de dîtibû. Em bi hev re vegeriyabûn avahiya Gûnaydin û piştî rojekê jî ji hev veqetiyabûn. 13 Sal derbas bibûn. Piştî salên zindanê yên ketîn navberê, bi qetandana kefenan ve ez hatibûm cem çavkaniya xwe ya jiyanê ya herî bedew. Di pêvajoya derbasbûyî de gelek tişt hatibûn guhertin. Wê ez jî van gav bi gav, bi ketin û rabûn, şerê bi nakokiyan re hîn bibûma. Lê Rêbertî zêde nehatibû guhertin. Dema pirsî; “te ez çawa dîtim?” Min got; “Rêberê min, hûn hêj ciwan in, zindî mane, ez pir kêfxweş bûm.

Wî jî ji bona min got; “tu jî zêde ne xirabî. Ciwan mayî. Te porê xwe jî spî nekiriye. Baş e, ez bawerim temenê te jî hêj ciwan e. Hêj ji nîvê rê re pir maye.” Li ser piyan jî tê û diçe. Ez sih û du salî me. Ji nîvê rê, ango sih û pêncan re sê sal mane. Ne dûr bû. Lê ez kêfxweş bûm ku Rêbertiyê ez ciwan dîtibûm. Rast bû, zindî bûm, yeqîn dikim hêj ciwan bûm û ne hilhilî (yipranma) bûm.

Rêbertiyê got;

“Lê belê, Cumayê me porê xwe spî kiriye. Fuat spî kiriye, Abbas keçel bûye. Min jî porê xwe spî nekiriye. Ne weşandiye. Têkîliya vê yekser bi jiyanê re heye. Min ti caran weke wan jiyan nekir.” Di navberê de jî dikeniya. Bi rastî jî zêde bedew û bi jiyanê dagirtî dikeniya. Diranên wî yên spî dixuyan. Diranê Rêbertiyê bala her kesî dikişand. Dema em li Amasya bûn, gardiyanên jin jî dema li wêneyê Rêbertiyê yê bi dîwar ve daleqandî dinêriyan digotin; “Rêberê we zilamek gelekî lewend e. Diranên wî pir xweşik in û sp ne.” Dema digotin APO, em aciz dibûn. Me ji wan re digot; “bêjin Rêber.” Êdî bi rastî wan bikaranîna peyva Rêber qebûl kiribûn. Her çendî nexwazin jî bandor bibûn.

Êdî ez jî ji wan cilên xwe yên zêde bedew aciz dibûm. Ne ji ber bedew bûn. Dema ez rûdiniştim dawa min dikişiya jorê, kin dibûn û li ser min jî teng disekinîn. Lê ez dixwazim beriya her tiştî wan zêran derxînim. Min bi dorê bazin, gustîlîk, gerden û zincîr derxistin. Min ên di çente de jî hemû derxistin danîn ser maseyê. Herî dawî jî kontrol kir, tiştek nemabû. Jixwe ez yeqîn dikim ku, divê hevalan ragihandibe çend parçe hatine şandin. Herî dawî gustîlka xelekê ya zirav di destê min de ma. Çavên Rêbertiyê li wê ket. Ji ber wan awiran ez neçar mam ku bi dengek hêdî bêjim.

“Ev beriya niha jî hebû. Ji berê ve di destê min de ye.”

Min ew jî rehet got. Lê ez ji nişka ve li hember awirên Rêbertiyê ecêb bûm û min şerim kir. Lê ne şerimbûnek xirab û kirêt bû. Min ji xwe re digot Şener mîsoger ji Rêbertiyê re gotiye. Ji ber di nameyek xwe de gotibû; “firsenda min çênebû ku bêjim. Lê soz didim ezê bêjim.” Gelo jê re gotibû? Di hundirê min de acizbûnek pêş ket.

Min cilên xwe guhertin. Cardin hatim, rûniştim. Her nêzîkbûna min jî xwezayî ye. Yê li hemberî min Rêbertî bû. Ez jî di zanebûna wê de bûm. Bes hevalek ji rêzê jî be, ez ne kesek wisa bêhed û bê pîvan bûm. Lê dîsa jî her gotin û her nêzîkbûnek ku bê kirin, girîng e. Min wisa ber biçav nêzîkbûnek cudatir nedît. Ez jî Rêbertiyê naxim nava ti qaliban. Lewma nêzîkbûnên xwe jî naxim nava ti qaliban. Ez nêzî wî jî bim, bi salan dûrî bim jî, ew ji bona min Rêber APO bû.

Dema me carekê bi Elî Îhsan re sohbet kirî, behsa akademiyê kiribû. Digot; “di dema dahûrînan de kes li derdora xwe nanêre. Rast disekine û guhdar dike. Carê mirov bi saetan li ser piyan disekine. Kes nakuxe. Yên dikuxin derdikevin derve. Nabe mirov pênûsa xwe li erdê bixe. Rêbertî ji ber van nêzîkbûnan pir aciz dibe. Ji ber hem lêhûrbûna wî xirab dibe, hem konsantrebûna wî xirab dibe. Baldariya wî belav dikin. Di heman demê de tê wateya kesayet li ser xwe serwer be û xwe di bin kontrolê de bigire. Ji ber Rêbertiyê nirxandinek weke; ‘yê li vir li ser pênûsa xwe ne serwer be, li çiyê jî nikare li ser çeka xwe serwer be” dikir.

Min wate dida hemûyan. Bes mirov çawa dikare kuxika xwe asteng bike? Ji ber dervî îrada mirov pêş dikeve, ew zehmet bû. Ji ber ji aliyê zanistî ve jî bêhnijîn û kuxik tê pênasekirin û zanîn. Mînak carê îsk tên mirov. Ev jî ji ber zexta diyaframê çêdibe û peqilkê (kabarcik) hewayê bi mirov re çêdibin. Me jî di navbera xwe de dirêj dirêj nîqaş kir. Ez zêde di wê mijarê de qane nebûm. Ma di vir de zêde zorî li îradeyê nake, an jî nabe sedema bertekên dijber? Ez jî li ser van

dihizirim. Lê divê xistina pênûsan, an jî nêzîkbûnek din werin kontrolkirin. Ji ber bêbaldarî û neserweriya di van mijaran de, çavkaniya xwe ji nebesiyên binyata mirov digirin.

Ev mijar destpêkê baş nayên fêmkirin. Mirov dema jiyan dike, baştir fêm dike. Ezê jî bibûma şagirtek ku dahûrînan heta dawî baldar, bê kuxik, bê bêhnijîn, bê qeza guhdar dike. Belê, bi rastî jî mirov dikare li ser kuxikê serwerbûna xwe ava bike. Dema mirov carekê de nefesa xwe digire, nakişîne nava xwe, daqurtînî hevsengiyek çêdibe û ew tê astengkirin. Her axaftin û gotinek Rêbertiyê ji bona mirov hişyariyek bû. Dil û mejiyê mirov vedikir. Dema mirov bi rastî jî bi baldarî û girîngî guhdar dike, wê berpirsyariyê di hemû şaneyên xwe de dihese, mirov ti caran bi xew ve naçe.

Hevalên jin ên li malê ne, ecêb in. Rêbertî cixareyê nakişîne. Dema li malê tê kêşan ji bêhna wê tê fêmkirin. Ez jî ji duyê cixareyê aciz dibûm. Lewma me jî di girtîgehê de ji ber vê kêm nîqaş nekiriye. Dema li cihek girtî cixare dihat kêşan, mirov ti caran tehemûl nedikir. Ji Rêbertiyê re jî dibêjin ku; “cixareyê nakêşin.” Lê, dema li cihê xwaringeh û odeyan dikêşan, gelek caran Rêbertiyê bi ser wan de digirt. Dîsa dema dengek herî biçûk dihat, digotin; “Ha, Rêbertî hat!” Û panîk jiyan dikirin. Tevî ku hewce dikir her kêliyê bi rêk û pêk bin û amade bin, ev nedikirin. Çep û rast dirazan. Derdor belav dibû. Bal nedidan dengê xwe. Lê dema dengê Rêbertiyê dibihîstin, nêzîkbûnên ecêb raber dikirin. Ev jî li zora min diçû.

Rêzdariya li hember Rêbertiyê, di heman malê de bi Rêbertiyê re jiyîn, dihat wateya ku mirov her tim hişyar, baldar be û bi rêk û pêk be. Lewma divê hinek xislet bibin şêweya

jiyanê. Nexwe tiştên din tev ji rêzê, sixte, nebes, seresere ne û ti xwezabûn, sadebûn û pîvanên wan tine ye. Ji min re jî wisa dixwiya. Dema min çend caran nêzîkbûnên wisa dîtin, min hewce dît ku wan hişyar bikim. Dibe ku min pir dirêj ji wan re negot. Lê min diyar kir ku divê tiştên hewce dike bikin û divê werin kirin, neyên berovajîkirin. Min ji wan re diyar kir ku, rêzdariya rasteqînî ne wisa ye.

Pişt re dema hinek guhertin û pêşketinan rû dan, hinek hevalan jî nêzîkbûnên xwe û para xwe ya di van mijaran de diyar kirin! Ji Rêbertiyê re gotine; "Sara ji me re gotiye, hûn çima li hember Rêbertiyê radiwestin? Asayî bisekinin. Ma hûn ji tirsan dikin? Hewceyî vê nake." Xwedeyo, ev çi dibe? Ev çi kar e? Ma di navbera hevaltiyê de tiştên wisa dibin? Ma mirov bi navê yeke din derewan dike? Ez mat mam. Temam, wê demê divê mirov çawa bike? Çima wisa hat fêmkirin? Bi rastî jî min baş nedabû fêmkirin, an jî hinek din xwestibûn wisa fêm bikin? Na, nabe. Ev tenê ziravî ne. Tişta girîng ên esasî bûn. Ger mijarên esasî neyên çareserkirin, wê tiştên din jî teqez çavkaniya xwe ji hinek tiştan bigirtan. Ma ji vê xwezayîtir çi hebû?

Di heman rojan de Hêvî (Şafak) hatibû. Xwîşka hevalê Elî Toprak bû. Hevalek ciwan û por kin bû. Rêbertiyê got; "ev jî hevalek kevne. Deh sal in di nava refên me de ye. Li nav gel kar dikir. Lê hêj nekarî seknek saxlem ku bikare karê xwe rast bimeşîne bidest bixe." Me wê rojê xwarina nîvro bi Rêbertiyê re xwar. Hevalan ecîn jî (çîx kofte) çêkiribûn. Her carê Rêbertiyê digot; "bixwe, bixwe." Min bi serê çetel piçek xwar. Weke jehrê bû. Rondik ji çavên min barîn. Rêbertiyê dîsa weke berê ji dil û bi îştah dixwar. Weke ku şer bike, dixwar. Girêk

girêk tavêt devê xwe. Min jî bi zorê ya di lalîka xwe de xilas kir. Ew jî ji bona ku Rêbertiyê got min xwar. Li ser xwarinê di-axivî û pirs dikir.

Kêliyekê li ser Hisnî Altun wa axivî. Ji wan destpêkê Faruk derketibû. Hisnî jî piştî min derketibû. Tevî ku gelekî pê ve mijûl bûm, her carê bi derewekê, sixtekarî û hêcetan ve nehatin. Faruk zewicî bû. Weke din jî firina nan vekiribûn. Ew jî bi qrediya ku dewletê dayî wan vekiribûn. Hêj dema Hisnî li Aydinê bû name ji min re şandibû. Digot; "divê teqez tu Faruk bikişînî xwe û bibî." Heta dema di rojiya mirinê de bû, ji ber rewşa Faruk helbestek ku dilê xwe jê girtî û qehiriye nivîsandibû. Ew sixtekar jî çawa derket, ji Faruk xirabtir kir. Nehat û mijûl kirin. Min di telefonê de dîrok û saet jî da wan. Herî dawî got; "ezê hinek din li qada legal bimînim. Pêşniyara min ev e." Durûtî û ketîbûn dibe, bes ne evqas jî.

Min jî ev ji Rêbertiyê re gotin;

"Di girtîgehê de jî pirsgirêkên wî hebûn. Her tim bertekên Fuat hebûn. Kar nedikir. Xwe tevlî nedikir. Hisnî jî ji ber pêvajoya ji devrede hatî hinek eleqederî dît. Ji ber ku me derbarê pêvajoyê de gelek agahî ji her hevalê ku nû dihatin digirt. Pişt re jî her tim xwest bibe seriyek din û zêde kariyerîst bû. Carekê hevdîtinek bi eyaleta Mêrdînê re kiribû. Milîsek şandibû eyaletê. Lê ji me re negot, çibû û ji bona çi bû, çi hat axaftin. Ev jî dibû sedema nîqaşan. Nakokiyên wî jî her tim bi Şener re hebûn. Destpêkê zêde nêzî hev bûn. Heta dema di rêvebiriyê de valahî çêbû, Hisnî ji bona rêvebiriyê pêşniyar kir. Lê paşê her tim nîqaşên dijberî hev kirin. Me hemûyan jî nîqaş dikir. Têkîliya Faruk û Hisnî jî ecêb bû. Dema ez li Amasya bûn, min derbarê van mijaran de ji Karasu re nivîsandibû.

Rêbertiyê hişk axivî; “nexwe bi qrediyên dewletê ji xwe re cihên kar vedikin. De ka zilamên ku bi navê qadroyên PKK’ê jiyan dikin binêrin. Ma ev ne ketîbûne? Çawa van ferq nakin?” Min cardin dubare kir û got; “Rêberê min, ji hinek hêlan ve dihat dîtin û nasîn. Haya Şener jî ji van mijaran hebû. Hewce dikir ku, ev ragihandibin.” Dema min wisa got, Rêbertî aciz bû, bi mîmîkên rûyê xwe got; “çi Şener e? Hiii…”di çavên wî de awirek watedar hebû. Ez jî wê demê kêmekê bêdeng bûm.

Her nêzîkbûn, tevgerên mîmîkên wî, her bertekên wî tiştek rave dikir. Lê min yekser ti wate nedayê. Tenê bala min kişandibû. Gelo çima dema min navê Şener bikar anî, Rêbertiyê yekser helwestek raber kir? Ez heta demekê di bin bandora vê de hizirîm.

Rêbertiyê xwest ez li odeya pirtûkxaneyê bicih bibim. Êvarî doşeka min ji destê hevalan girt, wî bi xwe danî erdê. Ez li hember vê nêzîkbûna wî zêde hestiyar bûm. Got; “pirtûk zêde ne. Dahûrîn jî hene. Tu dikarî partiyê baş lêkolîn bikî. Me bi salan şerên mezin meşandin. Tiştên hatin avakirin û derketin holê nekêm in. Em bi çi û çawa gihan vê astê. Çi ked hat dayîn. Lewma divê mirov van baş bizane.”

Aliyê dîwarek sax ê odeyê manzareyek xweşik dixwiyê. Çiyayên bilind û ser bi berf hene. Jêra wan jî şînkahî û gelî ne. Dema mirov lê dinêre, bi mirov çar demsalan dide jiyîn. Ew manzara û xwezaya bedew, netenê çav dadigire, di heman demê de dilê mirov jî tije dike. Mirov ji nişkê ve xwe li çiyayên welat ên xweşik û bêhempa dihese. Li eywanê jî heman manzara heye. Eywana ku Rêbertî lê dima mezintir bû. Dema mirov li wêneya bi dîwar ve dinêriya, weke ku mirov li Agirî, Cudî, Cîlo, çiyayên Colemêrgê yên hişk û Munzurê dinêriya.

Nexwe Rêbertiyê bêrîkirina xwe wisa bedew û watedar dikir. Bi her tiştê xwe ve li welat jiyan dikir. Rêbertiyê ti caran dûrbûn jiyan nedikir.

Rêbertiyê perdeya li ser masê ku bi dest hatiye hunan şanî min kir û got; "dema hûn di hundir de bûn, we ev hunandibû û şandibû. Karê me jî wisa bi neqiş neqiş e. Zehmet e, hewldanê dixwaze, lê me ber bi encamên girîng ve dibe, her tim pêş dixe û vediguherîne. Em her tiştî ji nû ve dikin. Ne hêsane ku em mirovan ji nû ve çêkin. Dijmin salên we girt. Belê, niha jî wextê wê ye ku, hûn tola wan salan bigirin. Dibê girêdana bi şehîdan û bersiva ji wan re were dayîn di astek bilind de be. We ew êş baş jiyan kir. Lewma yên herî zêde jî divê mezin û zêde jibîr neke hûn in. Lê baş bişopînin. Me ev şer çawa anî vê astê, baş lêbikolin." Di her firsendê de hewl dida hinek tiştan bide me.

Di roja du, an jî sê bû, dahûrînek Sibat-Çilê di destê min de bû. Di van de tiştên ecêb hatibûn nivîsandin. Di beşa hevpeyvînan de behsa Girtîgehê, Şener û Salîha dihat kirin. Dibêjin; "cilên yek tîp da liberkirin. Sond jî wî xwend… Bi Fehmî Altinok re hevdîtin pêk anî… Tûnel Şener eşkere kir û da dest… Şener xayîne… Şenerê provakator…" Li cihekê jî behsa reva Şener dihat kirin. Çavên min li peyva "hat cezakirin ket." Hemû li pey hev in, her ku rûpelan dizivirînim navê Şener derdikeve pêş. Min pirtûk girt. Bêdeng û bê ku bihizirim sekinîm.

Ji nişkê ve cemidîm. Weke ku laşê min pûç bûye. Min cardin vekir. Heman peyv didomin. Min cardin girt. Ka ma Şener ne li Botanê bû? Ka ji bona komîteya navendî hatibû hilbijartin? Tişta destpêkê hat bîra min, bertekên Rêbertiyê yên

rojek beriya niha li xwarinê raber kiribûn. Ez tenê dikarim bêjim, temam, lê çima? Weke din jî nikarim tiştekê bihizirim. Hat fêmkirin. Dema em li Awrûpa jî me zêde behs kiribû. Heta min wêneyên me yên komî şanî Meral kiribû. Pirtûka wî ya helbestên girtîgehê hebû. Min bi deng helbesta wî jê re xwendibû. Nexwe ji bona wê zêde nehiştibûn ez bigerim. Ma çi wateya wê hebû ku, derheqê Şener de tiştek ji min re negotibûn? Hew dikarim bisekinim. Dahûrîn di destê min de, çûm min li deriyê eywana ku Rêbertî lê dima da.

Min got; "Rêberê min ez dikarim werim? Dixwazim li ser hinek mijaran bi-axivim."

Rêbertiyê got; "belê, were. Were rûne Sakîne."

Dahûrîn di destê min de ye. Hem mat mame, hem jî morala min xirab e. Rewşek min ecêb heye.

Min got; "Rêberê min, min dahûrîn xwendin. Hinek tişt hatine nivîsandin. Lê min tam fêm nekir. Behsa Şener dike. Her kesî tiştek gotiye. Li cihekê jî tê gotin ku…" Min nekarî gotinên xwe temam bikim. Qut qutî di-axivim, digirîm û bi astek dengê bilind bi acizbûn di-axivim, lê gotinên xwe temam nakim. Rêbertiyê got:

"Haaa, tu behsa Şener dikî? Belê, me jî zêde wate nedayê. Em hêj lêkolîn dikin. Salekê li cem me ma. Demekê dixwest hinek tiştan bêje. Lê direcifiya, ti carî nekarî bêje. Gelo ditirsiya, çi bû, me jî nezanî. Niha reviye, li cem KDP'ê ye. Hêj tam nediyare. Ka em ê lê binêrin, em jî hewl didin fêm bikin."

Min got; "temam. Lê çima nehat gotin? Dema min ji hevalê Cemal pirsî gotibû 'li Botanê ye.' Hevalê Elî Îhsan jî got, 'ji bona komîteya navendî hatiye hilbijartin.' We jî di

hevdîtina me ya telefonê de gotibû ku, ‘baş e.’ ma çawa dibe, ez fêm nakim. Ma tevlî Kongreyê nebû? Wê demê çima ev rewş derketin.” Dema ez di-axivim bere jî digiriyam. Rêbertiyê got;

“Ecêb e, xêre tu çima digirî?”

Min jî got; “Rêberê min, em bi salan zindanê bi hev re bûn. Em li navêndên hevalan ên herî nêz de bi hev re bûn. Ne li benda tiştek wisa bûm. Dema min bihîst zêde bandor bûm. Ji ber dema derket, yekser hat cem partiyê em hemû gelekî pê kêfxweş bûn. Nivîsek bi îmzeya wî jî hat hundir girtîgehê. Em gelek tiştan dibîhîsin. Niha jî tê gotin ku, ‘revî ye.’ Vê jî bandor li min kir. Qane nabim. Ger nêrînên wî yên cuda hebin jî, li cem me demokrasî heye. Dikariya bi-axive, nîqaş bike û çareser bike. Lê rev çawa dibe. Her çendî KDP jî be, îxanet e…” Rêbertî hêrs bû û got;

“Ne me Şener ava kir. We ava kir, pêş xist û şand. Rêberê web û. Digot, ‘ez rêberê girtîgehê me.’ We çima ew nas nekir? Ma ji bona bela serê min be, we ji min re şand? Diya wî jî di sala 82’an de hesab ji min dipirsiya, digot, ‘were lawê min xilas bike.’ Niha jî tu dibêjî, ‘çima wisa bû?’ Temam, wê demê ezê kî berpirsyar bibînim?”

Ez zêdetir giriyam. Tiştên dihatin gotin zêde giranbûn. Me çawa pêş xistibû û şandibû? Min jî di navbera axaftinên Rêbertiyê de got;

“Na, Rêberê min, ne me ew şand. Ew ne rêberê me bû. Rêberê me hevalên şehîd bûn. Ger di nava yên jiyan dikir de jî, rêberê me yê berxwedaniyê tê behskirin hebe, ew jî Karasu bû. Na Şener bû.” Ez jî serê xwe bi gotina, ‘we şandiye’ dêşînim.

Ji ber tewanbariyek giran bû. Wê demê em çibûn? Ma em jî ne ji partiyê bûn? Ango, weke ku me bizanebûn şandibû. Na! Nabe! Ez hêj digirîm.

Lê Rêbertî zêdetir bi aramî di-axivî. Ez bawerim ew rewşa min a weke dîna, her tişt dida der ku ez çiqasî ji rastiya bûyerê, cidiyeta wê dûrim û tênegihiştime. Rêbertiyê got;

"Binêre, min jî salekê sebir kir. Min hewl da fêm bikim. Ne eybe, ez jî xapandim. Li hember min weke putekê disekinî, lê dema dizivirîm tiştek din bû. Ew tirsa wî çibû. Min zêde fêm nekir. Piştre me şand Rojava. Li wir jî hinek tiştên neyênî çêbûn. Pêvajoya hilbijartinê bû, me nekarî em qet encamekê bidest bixin. Bandor li hinek keçan kiribû. Me şand Kongreyê jî. Me tevî her tiştî xwest ku wî fêm bikin. Dema ez dijênim, 'we şand', ne ji bona we tewanbar bikim dibêjim. Lê belê, li ber serê we bû, we nekarî hûn nas bikin. Çawa bû, ma dê hevalên li girtîgehê bandor bibin?"

Min got; "na Rêberê min. Girtîgeh bi Rêbertiyê û Partiyê ve girêdayî ye. Kî bireve bila bireve, bi kîjan hêcetan dibe bila be, dê weke îxanetê binirxînin. Ez ji vê bawer im." Rêbertiyê got;

"Ne wisa? Jixwe ya tê hêvîkirin jî ev e. We ew qas êş jiyan kir. Hinek kesn jî xwest li ser wan êşên we rûne. Ma Hisên Yildirim jî wisa nekir? Ger hûn hişyar tevneger in, wê bilîzin û îxanetê jî bi navê we ferz bikin. Hem me jî hêj baş fêm nekiriye. Divê em lewaziyên di vê mijarê de baş tespît bikin. Di nava me de hinek kesên ku hêj jî pirsgirêk fêm nekirine hene. Nikarin bibin hêz hene. Binkeftin û nêzîkbûnên dijî partiyê me didin mijûlkirin. Hinek kes van rewşan derdixin û bi cureyek din didin bikaranîn. Ma ez sucdar im? Ma min ev ava kirin û dan jiyîn?"

Êdî ez jî hêdî hêdî dihedirim. Bertekên min ên destpêkê derbas bûne. Rastî xemginiya min ji bona çiye? Ez vê xemginiyê çawa rave bikim? Gelo kî şahidê xemgînî û kêfxweşiyên min bûn? Xwedê bela xwe bidê! Ma hinek kesan bizaniya û dîtibin jî çi feydeya xwe hebû? Ya girîng di wan kêliyan de tiştên dihat diyarkirin bû. Rastiyek rave dikir, ew jî ne her tişt bû.

Serê min giran bûye. Singa min dişewite. Dema mirov ji bona tiştekê hewl dide, di rewşeke ku nekare bike de be, lê tevî vê dixwaze bigihîne cihekê, vê ji xwe re dike hedef, di her kêliyê de jî bê ku mirov di ferqê de be tirsa wê bijî û herî dawî jî tişta mirov jê bitirse were serê mirov! Niha jî ez di rewşek wisa de bûm.

Ma ger niha li şûna Şener Elî, an jî Welî bûya, ezê dîsa pir bisebir bûma? An jî gelo min wisa nebihîstiba, dê çi bûya?

Ez ne îdealîst im. Lê bila hemû xwedayên baş şahidê min bin, ger kî bûya, heta kêliya dawî jî baş û erênî behsa wî bihata kirin, ger bihata gotin di nava partiyê de peywirdar û xwedî raye ye, pişt re jî min reva wî bibîhîsta, wê dîsa jî pirsên min û asta fêmkirina bûyerê heman şêwazî ba û ti ferq nedikir. Lê tevî vê jî ji ber ê reviyayî û îxanet kirî Şener bû, bandora wî jî cuda bû. Ev jî rastiyek bû.

Min gelek tiştên weke; "Ma hezkirin çi bû? Ma hezkirinek ji têkoşîn û doza min cuda hebû? Girêdana min a bi hezkirinê ve, girêdana min a bi têkoşînê ve bû. Çawa bê ku, dudilî û guman bijîm bi partiya xwe ve girêdayî me, qinyata min bi vî şerî heye, belê wisa neçar im ku bi hezkirinê yeqîn bikim. Di hezkirinê de ti kêmasî nabe, nexwe ew nabe hezkirin! Aloziyên

kesê min jê hez dikir ên bi partiyê re jiyan dikir, pirsgirêkek wî ya herî biçûk bi partiyê re dijî, dihat wateya xilasbûna vê hezkirinê jî. Min gotibû; ger pirsgirêkek herî biçûk a bi partiyê re bibîhîsim, ezê vê têkîliyê bêguman yekser biqedînim…" Di mijarên hatine nivîsandin û gotin de jî, evqasî zelalî û mîsogerî hebû. Lewma Şener jî ji vî aliyê min zêde ditirsiya. Hinek tirsên min jî hebûn. Lê ew kûrbûn, min tam zelal nekiribûn, hêj bi qasî derkevin û bideqin nepijiyabûn. Bêpîvaniya di hestên min de heye, ew nêzîkbûnên min ên bê navber razber dike dike, ew cîhana xeyalan a min bi niyetek baş ava kiriye, ew xeyalên min ên weke ku pêk hatine min hemêz kirîn, ew azadîxwaziya min a bêsînor 'ez kor' kiribûm, an jî aliyê min ê herî yeman a di têkoşînê de dorpêç kiribû.

Lewma ez di serî de herî zêde jî ji bona vê giriyam. Ji ber min ti caran kesê ku bi vî rengî îxanet li têkoşîna min û hezkirina min jî kirî, nas nekir. Ji ber ku min dizaniya ev îxanet wisa di carekê de û di rojekê de dernakeve holê û pêş nakeve. Ma rastiya îxaneta di zindanê de herî zêde jî ev hînî me nekiribû? Me di wan nivîs, nirxandin û paraznaemyên li dijî rûyên dijmin qêriyayî de ev rastî pir baş bikar danî û rave dikir. Ma me ew bingeha ketîbûnê xwe dispartê baş destnîşan nedikir? Gelo îxanet ji kuderê, çi wextê destpê dike û dibe kuderê? Ma ez li hember van tevan nebiyanî bûm! Wê demê min çima Şener nas nekiribû? Gelo ev revek cuda bû? Di nameyek xwe de behsa Pavel'ê di romana Tûtûn de derbas dibe, kiribû.

Pirsiye, "ma jiyîn çiye?" Hinekê jî sergirtî behsa pirsgirêkên tên jiyîn kiribû. Digot; "ger apê me nebe nayê jiyîn. Ez dizanim wê tu dîsa rexne bikî… apê me jî aciz bû, lê hêz jî

da. Dibe ku min jî zêde nekarîbe ku pirsgirêkan rave bikim. Lê hinde bi hinek tiştan tê lîstin, negengaz e ku mirov nebe Pavel, ne di destê mirov de ye…" Wê demê ew tiştên ku pey re hatin jiyîn ji kur derketibûn?

Dema ez bi tenê dimam, min cardin li mijarên ku di nameyan de hatine nivîsandin dinêriya û dihizirîm ku me çawa şîrove kirine. Me nedikariya em tiştên ku hatine gotin, bi şêwazeyek din binirxînin. Me heta wê rojê her tişt çawa nirxandibe, her tişt dîsa wisa dinirxand. Tişta yekser hat bîra min ev bû ku, mîsoger dîsa weke girtîgehê derheqê wî de hinek tişt hatine gotin. Di girtîgehê de hinek komên dervî me, hinek kesên di nava me de jî, derheqê wî de hinek tiştên nebaş digotin. Helwesta wî ya di berxwedaniya meha Çileyê de, her tim şik û bêbaweriyek ava kir. Gelek spekûlasyon dihatin kirin. Dibe ku heman tişt jî li derve hatibûn gotin. Bi taybet hinek qadro hatibûn nirxandin. Derheqê wan de jî hinek biryarên dijwar ên darezandinê hatibûn girtin. Ev jî hatibûn nivîsandin.

Lê min dizaniya û texmîn dikir. Dema tûnel eşkere bûyî jî, her kesî navê wî rave dikir û li ser wî radiwestin. Behsa Şener, Sînan û Hesen dikirin. Min wê demê jî ji Karasu re nivîsandibû; "ezê bibim Pavel." Di romana Tûtûnê de di navbera Pavel û kesên partiyê yên din de nakokî hene, bêbawerî heye. Şik û gumanan ji Pavel dibin. Weke dijberê Paertiyê dinirxînin. Di nava malbata wî de jî hinek kesên ku hevkarên dijmin jî hene. Birayê wî yê biçûk Boris kargeha Tekela Tûtûnê dimeşîne. Têkîliyên wî hem bi Almanan, hem jî bi hevkarên xwecihî re heye. Ti rezaletek ku jiyan nake namîne. Lewma herî dawî tê kuştin.

Pavel demekê tê dûrkirin. Di vê navberê de diçe hinek welatên din. Demekê bi şoreşgerên Îspanî re tevdigere. Di şerê navxweyî de cih digire. Pişt re cardin pêwendiya xwe bi partiyê re çêdike. Çîrokek pir dirêje. Lê ez ji ber nameyê dixwazim rastiya Pavel a di pirtûkê de baş bizanim. Min nîqaş kir. Min jî jê re nivîsand. Helwesta wî rexne kir û got; "tu hem dibêjî apê me hêz da min, hem jî dibêjî ezê bibim Pavel." Ev çi kar e? Di heman demê min diyar kir ku, ez carek din naxwazim tiştên wisa bibînim û ne li benda van rewşa me. Min jî hinekê rewşa Pavel vekir.

Lê na, ez vala li nav wan mijaran digeriyam. Şener reviyabû cem KDP'ê. Ev zelal bû. Ma çiqas rast e ku, ez wî bi hinekan ve bînim ber hev? Ma di heman demê de kesayet, şert û merc û sedemên heyîn ji hev jî necuda ne? Dîsa jî weke ku, Rêbertiyê gotiye divê mirov fêm bike. Ji ber Rêbertiyê got; "em hêj hewl didin fêm bikin."

Dixwazim li vir kevanekê vekim:

Niha ez li heman malê me. Her ku li ser wî koltixê bin diwarê xwedî manzareyek xweş û mezin ê li eywanê min bi Rêbertiyê re nîqaş kirî rûdinim, Rêbertî, heman weke wê rojê çawa li ser piyan sekinî bû, bi yek-du gavan diçû û dihat, di-axivî li ber çavên min e. Weke ku ez ji nû ve dibînim. Bîranînên me zîndî ne. Dikarim bêjim, tevî ew qas salên dirêj beriya niha hatine jiyîn, hatina min weke, "gavek ji veqetînê wirdetir" bû. Daxwezaya vê ji jiyanê veqetînê tine bû. Bi vê hevgihînê ve hemû veqetîn tine bibûn. Rastiyek mirov digirt, dikir yek û heta şaneyên mirov dorpêç dikir hebû. Weke din jî rastiyek din a ez qet ne li bendê bûm, min hesaba wê nekiribû û

ji nişka ve rû bi rû hatim hebû. Îxanetek, li jiyan, têkoşîn û bi kurtasî li ser hemû sedemên hebûna me hatiye ferzkirin hebû! Di heman demê de li herî nêzî min ev hatibû kirin. Ev îxanetek kesek min, hezkirin, baldarî û bendewariyên xwe li ser zêde dayî ava kirin bû…

Mirov nedikariya pêvajoyan û salan ji hev veqetîne û bêveje. Aliyek min li vir, aliyê din jî li paşeroj û salên borî ye. Ez bi sedemên hebûna xwe ve li cem wan im, lê nivî me. Aliyek min di çavkaniya xwe de, aliyê din jî li ber herikbûna lehiya hemû hestan ketiye. Geh li wir, geh li vir e. Dîn û hare, di cihê xwe de nasekine. Hemû nakokî, tevlîhevî, cihêtî, bêpîvanî, bedewiyên hatine bêrîkirin, niyetên baş, bertek û hêrs li nav hev in. Evqas tişt çawa li cem hev diman? Ma zêde ecêb bû? Tişta ku dihat gotin li dijî rasteqîniyê ye, çiye? Ma ne tiştek ku nehatî jiyîn nebû! Ma her diyardeyek ne parçeyek tiştên ku hatine jiyîn bûn? Ma hemûyan jî bi hev re rastiyek balkêş rave nedikir? Ji bona mirov rastiyan û şaşiyan ji hev cihê bike û nakokiyên evqasî tevlîhev çareser bike, pêwîstî bi hêz heye. Sebir û hewldanek rast dixwaze.

Gelo tiştek wisa bû ku, ez ne li bendê bûm, qet jê re ne amade bûm û min nedikariya giraniya wê rakim? An jî janek kûr a binkeftinê dabû avakirin bû? Ya rastî hemû jî hebûn. Gelek caran li ber diketim ku, xweziya min li cihek din û di wextek din de bibihîsta. Wê demê jî dibe ku her tişt cuda pêş biketa…

Belê, min her tim digot; “ bes ez biçim, xwe bigihînim partiyê, Rêbertiyê û çiyan, ezê wê demê tufanê rakim. Ezê wê demê tola salan rakim.” Her carê min ji yên derdiketin derve re digot; “ li şûna min, li şûna min jî pêl tetîkê bikin! Mezinbûna

Rêbertiyê hemêz bikin û wan çavên Rêbertiyê yên tije hêviyên serkeftinê ramûs in. Li şûna min jî derkevin lutkeyên çiyayên bilind qîr bidin. Li şûna min jî van bikin…”

Dema ez derketim, hevalan heman tişt ji min re jî gotin.

Ev xwestek û soz girîng bûn, watedar bûn, barê berpirsyariyek giran dida ser mil û dilê mirov. Ev gotin ji rêzê nehatibûn gotin. Jixwe ji her kesî re jî nedihat gotin. Jixwe min ji Şener re jî gotibû; “ne şûna min, wê tu li şûna me hemûyan biçî û bi qasî me tevan bikî.” Lê mixabin, dema ez giham partiyê, tişta destpêkê min bihîst jî, “Şener revî ye.” Ev agahî weke xençerekê bû! Hest, bêrîkirin û xeyalên min weke xençerekê ji hev parçe bûn. Lewma dê min her yek ji wan, di kîjan astê de bijiya?

Kevanekê digirim.

Rêbertî hem hewl dide fêm bike, hem jî hewl dide vebêje. Her çendî carê li hember bertekên min mat bimîne, hêrs bibe, rexne bike, dîsa jî bi dijnizmî, peyvên xwe jî baş hildibijêre wisa hewl dide qane bike, bide fêmkirin û min têbigihîne.

Ez ji odeyê derketim. Ez ji ber axaftinên hatin kirin hedirîbûm, lê dilê min şikestî bû. Ez hatim li odeya ku ji bona min hatiye cihêkirin rûniştim. Demekê cemidî û bêhizir rûniştim. Pişt re min wêneyên di çente de derxistin û qetandin. Hinek beşên helbestên ayîdê Şener hebûn. Min ew jî qetandin. Min nedixwest tiştek ayîdê wî li cem min bimîne. Pişt re jî min gustîlka di tiliya xwe de derxist, lê cardin kir tiliya xwe. Çi wateya wê hebû? Jixwe haya wî jî ji gustîlkê tine bû. Dema ez li Çanakkaleyê bûm, min di derheqê wî de hinek agahiyên

erênî bihîstin, piştî wê min jî ev têkîlî ji aliyê xwe ve erê kir û ew wisa xelat kir û ev gustîlk da kirîn. Ev jî 'diyariya' hevalan bû. Dema Ayhan derketî, min xeleka gustîlkê ya din jî dabû wî. Bi notek biçûk ve gotibû; "dema tu çûyî bide Şener." Ya rastî azweriyek min wisa ya gustîlkek taybet tine bû. An jî min di têkîliyan de zêde tiştên wisa nedidan pêş. Ma bandorek wê ya giyanwerî hebû? Ew jî wisa bandorker nebû. Ango di nava pergala civakê de xeleka girêdan û ewlekirina hinek tiştan bû. Ev tê zanîn. Ez bawerim hinekê jî ji bona ev mijar fermî bibe nêz bûm. Jixwe ji bilî hevalekê, kesî nedizaniya ku min bi çi armancê kiriye tiliya xwe.

Carek din ew awirên Rêbertiyê yên dema ez nû ji hatîm, min ew zêrên ji Awrûpa anîbûn li ser xwe danîn li min dinêriya hat bîra min. Dibe ku ji Rêbertiyê re negotibin. Min ji xwe re got, na bila ev gustîlik bimîne. Dema min behsa vê têkîliyê kir, ezê derbêxim û bavêjim. Lewma min cardin kir tiliya xwe. Li gorî min ger ez wê gustilkê derbixim, tê wateya ku ez vê têkîliyê vedişêrim. Di wê kêliyê de ti wateya wê xeleka gustîlkê tine bû. Ez jî bi êşek giran li halê xwe dikenim. Ecêb, min çiqas wate dabû vê têkîliyê.

Min digot; "ev hezkirin û sewdayek cuda ye. Ezê hezkirinek heman di şêwaza ku Rêbertî dixwaze de ava bikim." Min tim ji xwe re digot, ezê tevî hemû pratîkên hatine jiyîn, hemû hezkirinên ji hêz dixin, dibin benê nav lingan û diçin îxanetê ser bixim. Hezkirina min jê re digot 'cuda ye', wisa zû û di demek nêz de bi îxanetê encam bibû. Min dikir, nedikir wate nedidayê. Serê min tevlîheve. Hem naxwazim li ser tiştekê bihizirim, hem jî hemû pêvajo, guman, waswasî, tirs, pirsên di bingeha hemûyan de ne, hemû mijarên ku min tengav

dikin bi ser min de tên. Dema bi hevûdû ve tên girêdan, tînim cem hev, bi min "nabe" dide gotin. Gelo min çawa ev rastî fêm nekiribû?

Ka ez di zindanê de bibûm şahidê ewqas îxanetan? Ma di rojên lêpirsînê yên herî dijwar de, îxanet li ber serê me derneketibû holê? Ma kî li benda îxaneta Şahîn bû, kî jê re amade bû? Dîsa bi dehan weke wî derketin. Agahiyên îxanetê ku dihatin hundir û rev hebûn. Piştî ku min agahî girt, êdî hezkirin, girêdan, hevalbendî, nêzî hev bûyîn, hev nasîn, yek ji wan jî bi qasî misqalekê jî wateya xwe tine bûn û qîmeta wan nebû. Navê îxanetê, xwe firotin û revoktiyê bes bû ku, van diyardeyan berovajî bikin. Kîn û nefret zêdetir mezin dibû. Wê jî hêz dida min. Ez nedigiriyam û nedihejiyam. Min yek kêliyê jî negot; "ma çawa wisa dibe?" Ji ber ti hêceta encamek wisa nedibû û nabe jî. Herî zêde jî salên zindanê ev rastî hînî min kirin. Min ji derdor û rûyê dijminê xwe re behsa rûyê gemar ê îxanetê dikir. Min bi şahnazî dida diyarkirin ku, ez li hember bûyerên îxanetê zêdetir û mezintir bi şoreşê yeqîn dikim û pê ve têm girêdan.

Rêbertî jî tevî karê xwe her cara ku firsend didît, di-axivî. Ew helwest û bertekên min ên destpêkê rawestiyabûn, nerimtir bûbûn û bisebrim. Rêbertiyê got; "ger tu dixwazî ji hevalên girtîgeha Çanakkale re nameyekê binivisîne." Min jî nivîsand. Min ji Ferda Çetîn re nivîsand. Xîtabî wî kir. Min bi peyva "xwarî" destpê kir û îmzeya "xaltîk" bikar anî. Rêbertî hat odeyê, min got nameyê dinivisînim. "lê min dirêj nenivîsand, min nekarî." Rêbertiyê çav lê gerand. Pirsî; "ma xwarziyê te ye?" "Na Rêberê min, piştî ku derketim me demekê li qada legal bi hev re kar kir. Dema em bi hev re çûn malekê, gotibû

“ev xaltîka min e.” Wisa jî ma û berdewam kir. Êdî em bibûn xwarzî û xaltîk.” Min navê xwe bikar ne anî. Ji bona fêm bike min ev şêwaza xîtabê guncavtir dît.

Rêbertî hem di-axive, hem jî dimeşe.

Got; “li cem min bû. Min jî xwest vî zilamî fêm bikim. Pir ecêb bû. Carekê bi girî ji dersê derket. Gotiye; “ez peyhatiyê Mazlum im.” Belê, ma bûna peyhatiyê (ardıl)Mazlum wisa dibe? Me demekê ew şand Rojava, ewder jî xirab kir, kar nekir û hêza xwe bikar ne anî. Heta min digot; “ger vê hêza xwe bikar bîne, dikare bibe zilamê duyem.”

Carê jî perdeya masê rast dikir. Cihê xwelîdankê diguherîne. Navberekê ew tayek porê ya li nav xwelîdankê girt û bi çeqmeqê şewitand. Min wê kêliyê şerim kir. Ji ber tayê pora min bû. Dema min şeh kirî, avêtibû wir û jibîr kiribû. Min bê hemdî xwe got;

“Min danî wir, lê jibîr kir rakim.” Rêberiyê got;

“Tu dizanî. Tu zêde paqij î. Ew qeta binî ya mala Elezîzê tê bîra min. Paqij bû. Ez wisa me, piçek toz min nexweş dixe.” Axaftinên xwe dîsa anî ser Şener û got; “ bê serober bû. Ne cil û berg, ne sekn û ne jî nêzîkbûnên wî tinebûn… di yek ji wan de pergal û dîsîplîn tine bû. Belav û kêfî bû. Ew keçik digirtin, bi saetan di quncikan de bi wan re leqeleq di-axivî. Lê bi karê esasî ve jî mijûl nedibû. Xwe nedida kar.”

Axaftinên Elî Îhsan hatin bîra min. Wî jî heman tişt gotibûn. Min jî dema di girtîgehê de yekem car dît, gotibû pir mat mame û napejirînim. Min got; “ez têkil neynokên hevalan jî dibûm. Şener zêde belav bû, qirêj bû. Lê di vê mijarê de xwe

pişt re guhert. Ecêb, nexwe li akademiyê heman rewş cardin jiyan kiribû.” Elî Îhsan gotibû;

“Carekê Rêbertî hat cihê çapemeniyê, em jî li wir bûn, me li wir kar dikir. Diyar bû, Rêbertî di hinek mijaran de aciz bibû. Lê, xwe bi ser min de aciz kir û tund rexne kir. Min fêm kiribû. Min dizaniya ku ji Şener re dibêje. Kêm zêde ez hînî şêwazê Rêbertiyê bibûm. Dema Rêbertiyê cuda Şener bi kulman li dîwar xist. Ez jî bandor bibûm, got, ‘ez dizanim, ew gotin ji bona min gotin.’ Jîr bû, yekser fêm kir. Lê hişê wî tevlîhev bû. Nizanim gelo di ahengê de zehmetî dijiya, an jî tiştek din hebû.”

Ya rastî dema Elî Îhsan behsa van mijaran dikir, Şener reviyabû. Gelo ji ber min pirs dikir, an jî ji bona dizaniya ku reviya ye, her cara me hev didît mijar dibû Şener. Min wê demê ev weke axaftinên xwezayî û nîqaş dihesiband û tevlî gotinê wî jî dibûm. Tespîtên wî zêde objektîf bûn. Lê pişt re dema min şîrove kir, min zanî ku mîsoger haya xwe ji têkîliya me heye. Lewma min tenê digot bi tevdîr tevdigeriya ew qas. Belê, hevalê Cemal, Meral û dibe ku Metîn wan jî dizaniya. Lê belê, yek ji wan jî negotibû. Jixwe destpêkê vê nêzîkbûnê bandor li min kir. Dema ez hînî vê rewşê bûm, li hember Rêbertiyê giriyam û min got; “wê demê çima ji min re negotin? Heval Cemal, Meral û hemûyan dizaniyan. Ma baweriya wan bi min nayê?” Herî zêde jî vê bandor li min kiribû. Ez jî hemû nêzîkbûnan bi hev ve girê didim.

Min nîqaş û girtînameyên Kongreyê nexwendibûn. Min zêdetir raporên eyaletan û hinek raporên takekesî xwendibûn. Diviya min fêm bikira çi bibû, pirsgirêka esasî çibû. Tenê peyva “reviye, îxanet e” gotin jî bi serê xwe têrê nake.

Rêbertiyê jî gelek caran digot; “em jî hêj hewl didin fêm bikin.”

Rêbertiyê di heman rojan de bi hevalê Cemal re li ser telefonê hevdîtinek kir. Xwest ez jî guhdar bikim û bişopînim. Doxu (Doxu Perînçek) agahî şandibû. Nivîsek Mehmet Şener ketiye destê wan, dixwazin biweşînin. Dilxwede di bin navê zêde haya wan ji pirsgirêkên heyî tine ye dipirse. Ya rastî zêde fenek nêz dibû, weke ku agahiya wî ji tiştekê tine ye nêz dibû, an jî nedixwest xeta Kovara (2000 dogru) wan bikeve bin tohmetê de. Gelo vî zilamî bi çi dilîst û bi kî re dilîst.

Dema ez derketim, em çûn serdana Kovarê jî. Meşa Enqerê ya karkerên Zonguldakê hebû. Pêşketinek balkêş bû. Duruşmeya “Zonguldak û Cudî dest bidin hev” pir biwate û xweş bû. Me di hundir de her çendî bi sembolîk jî be ji bona alîkariyê hinek pere kom kiribûn. Me jî bi îlan û hinek nivîsên cur be cur ve alîkariya karkerên Zonguldakê kiribû. Doxu di rewşek wisa de bû hewaya, “her tişt me kir û me pêş xist” jiyan dikir. Lê gumanên me hebûn. Me digot; “dê wê pêşketina bêhempa ji xeta wê derbixin.” Her çendî hinek nêzîkbûnên me yên bi niyeta baş hebin jî, ji ber me pirsgirêka pêşengiyê ya Tirkiyê baş dizaniya, lewma me jî Doxu kesek wisa berxwedaniyê bi şêwazek desthilatdariya siyasî bike hedef, li ser bingeha daxwazên şoreşgerî rêxistin bike û wê bi muxalefetên din re ber bi cihek din ve bibe, weke ‘destek sihrê’ ya xwedî hêza nûnertî nedidît. Lê belê wî digot; “werin em we jî bibin, ji nêz ve bibînin. Me ev berxwedanî ava kir û em pêşengiyê dikin.”

Partiya Sosyalîst mîtîngan lidar dixe. Girse bi coşe. Dibêje; “li Rojhilat muxalefeta Kurdên gundî heye. Li ser bingeha daxwazên netewî têdikoşe. Li vir jî di pêşengiya proleterya de berxwedaniyên karkerên şoreşger û têkoşîna desthilatdariya çîna karkeran heye.” Me nîqaş kir û nêrînên xwe gotin. Hêj ji bona şoreşa li Kurdistnê dibêjin; “muxalefeta Kurd a gunduyan. Weke mutefîkên şoreşê dibîne. Ji bona pêşketinên li Tirkiyê jî weke şoreşa di pêşengiya çîna karkeran de pêş ketî rave dike. Ango em tevgerek ji rêzê ya gunduyanin. Ew jî baş e ku, me muteffîk dibînin.” Doxu evqasî xwe di nav de dibîne û dike yê xwe. Dilxwede, jixwe wê muxalefeta Kurd a gundiyan jî bi mîtîng û meşên wan ve destpê kiribû. Ango wan gur kiribû!

Carekê bi xwe hesiyam ku, weke ez di nava nîqaşên pêvajoya salên 75-76’an de me. Nîqaşên me ber bi mijarên nebes ve diçin. Lê nabe ku mirov li ser hinek mijaran ne axive. Şeva sala nû agahiyek din belav kirin. “Cunta tê!” Qaşo endamek ji MÎT’ê agahî daye wan. Ango li Çankaya amadekarî heye, dê wî bixwe û hinek kesên Partiya Sosyalîst bikujin, lewma ji bona baldar nêz bibe hatiye hişyarkirin. Ez, Remezan, Îlek Variz û Ragip Duran çûbûn serdana Kovarê. Digot ku, van agahiyan ji cihên saxlem digire. Gelo kesek ji MÎT’ê çawa saxlem dibe?Ji min re ecêb bû. Di heman demê de dîmenek komîk bû. Evqas fikar ji bona çi bû? Bi rastî jî bawer kiribû?

Di heman demê de diyar dikir ku, ji bona bi Rêbertiyê re hevdîtinê bike dê were Beka’yê. Ji me pirsî ma tiştek em bêjin heye an na. Em vexwandin mala xwe. Me hevjîna wî jî li cihê Kovarê nas kiribû. Bes wesweseyek wisa ya hatina Cuntayê kiribû, em jî di vê rewşê de neçar man taloq bikin. Lê me

bawer nedikir. Ji berê ve dema hinek pêşketinên xeternak rû didan, agahiyên gotina Cunta belav dikirin, da ku girse bitirse. Ev jî bibû weke xisletek polîtîk. Tirsa Cuntayê hebû, ew derûnî her tim zindî dihiştin. Doxu zêde bi îdîa bû. Digot; "dê mîsoger îşev darbe pêk were." Em jî li dijî wî bi îdîa bûn. Me pişt re hev dît û zêde nexwest li ser vê mijarê raweste. Lê dema nîqaşên me yên li ser HEP'ê (Partiya Kedê ya Gel) de, her tişt qut bû. Nîqaşek zêde tund çêbû. Digot; "PKK diçe kuderê? Ma bi destên Emperyalîzmê çi dike? Hem bi helwesta me ya di şerê Kendavê û hem bi nêzîkbûnên me yê ji HEP'ê re, em weke piyonek emperyalîzma DYE'yê dinirxandin. Ango li gorî wî emperyalîzmê em wisa birêve dibirin!

Nîqaşa me ya wê demê bi Doxu re, di heman demê de dawî anîna têkîliya nû hatibû destpêkirin bû. Min ji xwe re got; "ma carek din jî?" Me ji ber wan nêzîkbûnên wî, peywendiya xwe ya bi hinek dostên me yên li Kovarê kar dikir re jî qut kir. Carê di derbarê hinek mijaran de li cihê Kovarê karê me çêdibû. Ji ber van nêzîkbûnan jî me got; "hema bila xêra ku ji wir were tine be." Lê polîtîkgerî, nasname û xeta salan dihat fêmkirin. Di wê mijarê de pirsgirêk tine bû. Ti rewşek ku em zêde hewceyî wan bibin û pêdiviya me bi wan çêbe tine bû. Jixwe têkîliyên dihatin meşandin jî, li ser esasê xebatên xweseriya qadên legal bû. Ew jî di çarçoveya yên neçar û ji rêzê bûn. Lê mirov nikare wisa ji rêzê jî li eniya Doxu ya paş binêre. An jî bikeve navê. Ew jî tam karê polîtîkayê ye.

Tiştek ecêb bû. Her tim li qadên qrîtîk û pêvajoyên bûyerên cuda rû didan de, Doxu diyar dibû û li meydanê bû. Netesadûf bû. Xet, meyla wî bi kî, bi çi û kuderê ve dibe yek, dixwest wê derê bikişîne xwe. Weke hewşa paş, şibakeya paş, destên paş,

zimanê paş bû. An jî dibû wergervanê hinek kesayetên diyar, xet, meylan. Ev kar dikir. Ev jî wisa ji rêzê û vekirî nedikir. Bi hostatî dikir.

TKP'ya (Partiya Komînîst a Tirkiyê) Şener, 2000'e dogru'aya (Kovar) Şener! Belê, her du jî xwedî lê derdiketin. Rêbertiyê ji hevalê Cemal re got; "gelo naveroka wê çawa ne, bila wê nivîsê ji we re bişînin." Ez tam fêm nakim ku, hevalê Cemal tam çi dibêje. Rêbertî dibeje; "bêjin bila neweşînin." Ji min jî pirsî bê ka nêrînên min çine. Min got; "Rêberê min, dibe ku bi rêya Kovarê bangawaziyekê bike. Dibe ku navê min jî bikar bîne. Dikare jê re were gotin ku ez li qadê me. Bila were teslîmî partiyê bibe û em pirsgirêkên heyîn nîqaş bikin û bi şêweyên cuda çareser bikin. Mîsoger Kovar navnîşana wî dizane, an jî dikare jê re ragihîne. Doxu dikare navbeynkariyek wisa bike." Rêbertî; "ne wisa? Gelo wê bandor bike? Ango dê baldar nêz bibe? Dibe, de em ji Cemal re bêjin." Pişt re ji hevalê Cemal re got; "bila were Rojhilata Navîn. Sakîne jî li vir e. Ger tiştek, rewşek hebe, dikare vekirî bêje û were çareserkirin." Her wiha hinek tiştên din jî gotin.

Ez bi vê kêfxweş bûm. Min digot, 'dibe ku cardin li partiyê vegere. Teslîm bibe. Dibe ku, bê ku reva xwe bigihîne asta îxanetê vegere.' Her çendî îhtîmalek pir kêm jî be dihizirîm. Pirsgirêk ne têkîliya me bû. Ez amade bûm ku, her tiştî ji bona çareserkirina vê mijarê feda bikim. Bes bila îxanetek wisa pêşnekeve. Çi ecêb e, ez hêj li pey xilaskirina kesek çûye îxanetê me. Ez dîsa amade me ku, xwe feda bikim! Belê, feda kirin! Ji partiyê revî bû, ji refên me revî bû. Îxanet li ewqas nirxan kiribû. Ez hêj 'Sakîne'bûna xwe feda dikim.

Xwedêyo, ez çiqas bi niyetên baş nêz dibûm. Min bi xwe re nîqaş dikir. Di heman demê de min bi nêzîkbûnên ku bi giraniyek mezin xwe li ser niyeta baş daye avakirin û rastiyek erjeng derketiye holê nîqaş dikir. Geh yek, geh yê din giraniya xwe dide çêkirin. Min êdî nav lê kir: "REV. Biçe kuderê bila be, îxanet e." Dema ez bi gumanên xwe yên min beriya niha hîs kirine ve digirim dest, dibêjim ku; "na, ez vala hêvî dikim. Ew xayînek e." Lê mixabin, ji aliyek din ve jî dibêjim ku; "Şener vê partiyê baş nas dike. Ger xayîntiyek wî ya ji berê ve nebe, dê vegere. Nexwe weke din qetiyen nikare xwe xilas bike."

Her ku ez xwînsar, kûr û berfireh dihizirim, fêm dikim ku ev ne revek ji rêzê ye. Di heman demê de wê tenê bi revê re jî sînordar nemîne. Ew ê bi nivisên cur be cur û nêzîkbûnên cuda ve êrîşên xwe berdewam bike. Li ser vê îhtîmalê jî dihizirim. Ger ji Kovara 2000'e Dogru re nivîsandiye, vekirî şer îlan kiribû. Her ku diçû, min jî êdî asta pirsgirêka heyî cidî digirt. Şener pir dinivîsî. Hostayê nivîsandinê bû. Min got; "ger ji bona hinek sedemên din revî bûya, dê her tişt ji dijmin re diyar nekiribûya." Êdî ez di vê mijarê de bawer bûm. Temam, wê demê çawa çêbû û çi wextê çêbû? Ma wisa ji nişka ve derketibû holê? Rêbertiyê got; "we xwedî kir, pêş xist û şand." Gelo bi gotina "we xwedî kir" ve dixwest çi bêje?

Na, pirsgirêka esasî di mijara hêza min a têgihiştina bûyeran de bû. Lewma niyet jî evqasî derdiketin pêş. Dibe ku min hinekê jî, bi pêvajoyên me jiyan kirine ve têkilhev dikir. Ji ber me di wan deman de ji bona kesên ber bi îxanetê ve diçin rizgar bikin, zêde li ber xwe dida. Em bi çend kesan ve mijûl bûn, me xwest em xwe bigihînin çend kesan? Hinek ji wan

vegeriyan jî. Lê ev cuda bû. Wisa ne dişibiya çûna Pavel jî. Rêxistinê Pavel ji xwe dûr kiribû û Pavel ji eniya şoreşê veqetiyabû. Her çendî axa welatek din jî be, bi lehengî li hember dijmin şer kiribû. Gelo Şener destpêkê plan kiribû ku, biçe cem PDK'ê. Ji ber digot; "ezê bibim Pavel." Xwestibû PDK'ê weke paravan (rêxistin, şîrket an jî kesê ku ji hêza wî sûd tê wergirtin) bikar bîne.

Rêbertiyê got ku, li akademiyê gurubek hevalên ji girtîgehê derketine heye, heta xebatên broşûrê dimeşînin. Got; "broşûrê bixwîne. Hûn dikarin nîqaş bikin. Hûn dikarin bi endamên rêveberiyê re jî nîqaş bikin. Em dikarin dema pêş platformek nîqaşê bidin destpêkirin. Emê li wir hewl bidin ku, rastiya zindanê baştir bigirin dest û binirxînin. Bes hewl bide tu fêm bikî. Hûn demek dirêj ji partiyê dûr man. Jixwe rastiya şer jî ji vê cudatire. Agir e, dişewitîne! Bûyer û pêşketinan baş lêkolîn bike. Me partî çawa anî heta roja îro? Me li derve li dijî KT, di hundir de jî têkoşînek çawa meşand? Me ev roj çawa bidest xistin? Wê tu hînî van bibî. Ger girêdanek li hember berxwedaniya zindanê hebe, we jî di vê mijarê de kêm êş jiyan nekiriye. Hûn dikarin çawa nûnertiya wê ya rast bikin, bi çiya û partiyê re bikin yek, li ser rawestin û hûnê vê di asta herî balkêş de pêk bînin. Em ancex wisa dikarin hesabên wan ên li ser zindanê vala derbixin…" Piştre gurubek heval ber bi Akademiya Mahsum Korkmaz ve rêkir.

Kanî li Barlîes'ê em pêşwazî kirin. Em bi hev re çûn akademiyê. Nizamiya wê, meydana wê ya mezin, ew mêvanxaneya wêneyê hevalê Egîd ê bêhempa li ser dîwarê wê û hinek avahiyên ku ji dûrve dixwiyên hene. Dr. Baran em li ser rê pêşwazî kirin. Dr. Baran kesek rihên wî dirêj, weke

fermandarê efsaneyî Dr. Baranê ku di rojname û kovaran de dihat diyarkirin bû. Berçavka wî hebû, lamên wî daketîbûn û kal xwiya dikir. Pişt re em çûn avahiya rêveberiyê. Serhed, ango Xidir Yalçinê me yê Elezîzê, Xozatê jî li vir e. Min li Elezîzê ew nas dikir. Lê hinekê hatiye guhertin. Ew jî belangaz bûye. Tevî ku biçûk bû, ji temenê xwe mezintir dixwiya. Weke din Aysel Çûrûkkaya jî li vir e. Me hevûdû hemêz kir. Ez li Awrûpa pê hesiyam ku Aysel şehîd neketiye. Nasnavê wê Medya ye. Lê zêde sar e û negerme. Bêdenge, weke ku xemgîn e, an jî di rewşa jandar a berê de ye. Ez bawerim ew jî pê re bûye xisletek. Ecêb, ew çend sal bû ji girtîgehê derketibû, diviya zêde zindî bûya. Çav, çerim, sekn, awir, nêrîn, axaftin û meşa wê jî, weke ya miriyan bû. Du gotin ji devê wê dernakeve. Dema di-axive jî nayê fêmkirin. Weke ku dûjîna ji mirov re bike, di-axive.

Li meydanê merasîm hatiye amadekirin. Zêde bêhempa ye. Ew sekna hevalan û qelebalix besî min bû. Me bi salan tiştên ku di wêneyan de ditiye ve xwe têr kir. An jî me gerîla di xeyalên xwe de jiyan kir. Niha jî bi sedan heval li hemberî min bûn. Cilên leşkerî li ber wan û çek didestên wan de bûn. Dema me destpêkê HRK bihîst, em zêde şahnaz bûn. Hinek heval bi cilên leşkerî hatibûn girtin. Tiştên weke cilên leşkerî, rozet û apolet gelekî girîng bûn. Watedariyek ayîdê me û ayîdê Kurdistanê hebû. Ew jî nirxên me yên cewherî bûn. Di salên dawî de digot; “gelo em jî di hundir de li ber xwe bikin, dê çi bibe?” Heta me li Çanakkaleyê ji malbatan re gotibû ku, pirsyar bikin. Ji ber her çendî em di zindanê de bin, berî her tiştî em gerîla bûn. Leşker bûn. Ya rastî hevalên ku pişt re ketin

girtîgehê, di henekên xwe de xwe weke endamê ARGK'ê, em jî APO'yî ji hev cihê dikirin. Lê, APO'gerî di heman demê de dihat wateya leşkerê herî baş.

Di zindanê de li hember rengê keskê tarî bertek pêş ketibûn. Xwezayî ez ji rengê kesk zêde hez dikim. Min her tim rengê kesk, weke rengê jiyanê fêm dikir. Me tevî zuhabûnek mezin a şaxek kesk ku, bidest xistibû bi sedan gul mezin kirin. Dema tiştek tine be, me pîvaz di nava pembû de şîn kir. Me tovên tivran di nava lalîkê de şîn kirin. Me di nava kunek biçûk de, bi çavên xwe şînkahiya xwezayê zêde kir. Lê mixabin ew formên kesk ên li ser leşkeran her tim qatil bûn. Dijminê jiyanê bû. Dibe ku bertekek li hember cilên ku wan keriyên qatilan li ber xwe dikir bû. An jî hesûdiya keskê bû. Cilên akademiyê pir xweşik in. Kêfa min ji wan re hat. Min yekser taximek li gorî xwe amade kir. Min delingên pantorê kir qurmîçik. Dixwazim şêweyek xwe çêkim.

Nêvengek ayîdê me bû. Sekna leşkerî, dîsîplîna leşkerî, hemû jî balkêş bûn. Feraseta dîsîplîna zindanê, dîsa di nava artêşa Tirk de û xisletên wan pir cuda bûn. Dîsîplîna artêşek faşîzan jî, zordarî, çewsandin û talankirina xisletên mirovahiyê rave dikir. Quralên dîsîplîna êşkenceyî ya bi salan li ser me ferz kirîn, emir û komuta tev bilenet bûn. Dibe ku em di pêvajoya binkeftinê de heta demekê neçar man ku, wan pêk bînin. Lê belê, wan quralan ti caran giyan, hiş, zanebûn, qinyat, dil û hêviya me ya pêşerojê ne şikand, nekarî vê bike û nekarî reş bike.

Dema em bi vî rengî bi dijmin re rû bi rû diman, ev mijar tev di cewhera xwe de dibin pola. Ji ber ev şerek dijwar ê li hember hev bû. Mirov di her kêliyê û her çirkê de dizane ku, yê li hember mirov dijmin e. Di heman demê de mirov dizane ku, dijminê herî ketiye û mirov wisa jiyan dike. Mirov vê rastiyê di şandeyên xwe de dihese. Cihê mirov herî baş dijminê xwe nas bike, zindan e. Ger mirov bêje; "dijmin dikare di zindanê de her tiştî bike, her tiştî tine bike û hukum dike" jixwe mirov di serî de binkeftin qebûl kiriye. Ev rewşa di giyana mirov de jî jiyan dike, gelekî xeter e. Na, dijmin tenê dikare vê bike: dikare mirov ji aliyê fîzîkî ve tine bike. Ji bona vê hêza wî heye. Xwedî jêhatiyek her cure kuştinê ye. Dest û lingên mirov girê dide. Dest tavêje mirov. Copan dixe mirov. Diranên mirov dişkîne. Falakayê ve girê dide. Têlan bi mirov ve girê dide. Dadileqîne û dide ber fîşekan. Mejiyê mirov belav dike. Lê belê, ger vîna mirov a şoreşgerî hebe, qinyata mirov bihêz be, mirov wî weke dijmin bibîne, li dijî kînê bijî, girêdanên mirov bi mirovahiyê û gel ve hebe, baweriya mirov bi şoreşê hebe, ûtopya mirov a sosyalîzmê zindî be, wê demê dijmin ti caran nikare dilê xwe ji te bigire. Ji ber hêza wî têra vê nake!

Ma cihê herî baş ê dijmin, bi îrade û qinyata mirov tîne rê, ditewîne ne zindan e? Dijmin li hember wan abîdeyên berxwedaniya mezin a meşa bêhempa ya ber bi mirinê ve, reben û perîşan mabû. Her gotina di dadgehan de dihat qêrîn, her duruşmeyek, pêşeroj rave dikir. Belê, wan jî demekê pêvajoyek binkeftinê jiyan kir. Berxwedaniyên me ya dijwar û dorhêl, li hember êrîşên hovane binkeftibû. Wan jî demekê ew quralên leşkerî pêk anîn. Ev jî aliyên lewaz bûn. Ji aliyekê ve ev rewş di nava wan mercan de ji neçarî hatin jiyîn. Ji ber

mercên me ne wekhev bûn. Lê ev jî bû bingeha binkeftina mezin. Di kêliya herî zêde lewaz dihat dîtin de, berxwedanî bilind bûn.

Bêguman, dema mirov zindanê li ser bingeha van rastiyan digire dest, wê îxanet û berxwedaniyên heyîn jî baş werin fêmkirin. Her kesê di zindanê de rast li ber xwe neda. Rast jiyan nekir û rast jî nemir. Mercên jiyan û mirinê dikin vebijêrk gelekî girîng in. Ger di sala 82'an de pênc xulekan dereng dest werdana Cahîde Şener bihata kirin, dê weke şehîd bihata qebûlkirin û em ê ji neçarî xwedî lê derketan. Dê wê demê ew mirin jî hinekê biwate bûya. Ji ber vebijêrka mirin û îxanetê hebû. Aliyên wê yên binkeftî ku, wê ber bi îxanetê ve bibe zêde bûn. Lewaziyek kûr a tê jiyîn, çûnûhatin û dudilî mirov berbelav dike û ti caran rê nade mirov. Ji ber dema dijmin bi wan re lewaziyek herî biçûk bibîne, êdî bela xwe ji wan venake. Dê heta dawî li ser wan kesan ferz bike. Heta ku kes bikaribe rêya xwe ya wê cesaretê bişkîne û rêya derketinê bibîne û rewşek heta dawî li ber xwe bide bibîne.

Gelek girtiyên ji ber dijmin tedawiya wan nekir, jiyana xwe ji dest dan çêbûn. Hinek kes jî bi yek darbeyê qetil kirin. Ev jî mirinên bi destên dijmin bûn. Di heman demê de ew mirov jî nûnerên nirxekê bûn. Di vê manê de mirina wan gelekî girîng e. Divê mirov xwedî lê derkeve. Bîranîn, berxwedanî û wesiyetên wan nayên jibîrkirin. Em ê bilind bikin. Bêguman biçûk nayê dîtin. Lê hinek mirin hene; mercan ser û bin dikin, hevsengiyan diguherînin, pêvajoyek nû didin avakirin, dihejînin, radikin ser piyan, ji serî heta binî bawerî û qinyatê mezin û bilind dikin. Mirina Mazluman, Pîran, Xeyrîyan û Ferhatan wisa bû. Dîsa li Metrîsê çar çalakvanên din hebûn. Mirina wan jî bi lehengî bû.

Ma ne hinek jî li sêdaran hejandin… Erdal Eren hêj hijde salî bû. Xidir Aslan, Necdet Adali, Serdar Soyergînler û li girtîgeha Ta Maze şehîdê rojiya mirinê ya mezin, mirina Babby Sands gelekî bêhempa bûn. Ma ew jî kêm bûn? Ew mirinên serî li dijî emperyalîzmê rakirîbûn. Xwedî li kevneşopiya rojiya mirinê ya gelê Îrlanda û berxwedêriya wê ya bibiryar derketin. Hêviyên serxwebûnê mezin kirin.

Hinek kesên ku bêdeng û veşartî mirin jiyan kir jî hebûn. Ev jî kesên ku hejandina berxwedanî û îxanetê jiyan kirine, nekarîne xwe ji lêdanan rizgar bikin. Hinek kesên berxwedaniyê dane meşandin, bi zorê xwe li ser piyan girtine hebûn. Ew jî di eniya berxwedaniyê de bûn. Nav girtiye, nav berxwedêr derketiye, lê her tim revok ber xwe daye, her tim ji mirinê tirsiyaye, lê dîsa jî jiyan kiriye û hatiye heta roja îro. Belê ev kes çawa ku di hundir de rûdiniştin, dûjîn ji şoreşgeriyê, PKK û ji bona ew anîne ser rûyê jiyanê ji dûjîn ji dê û bavê xwe re dikirin, niyaz dikirin, piştî ku derketin jî, xwe weke kesên herî zêde li ber xwe dane, salên xwe yên zindanê ji xwe re kirin sermiyan. Min jî herî zêde hem di hundir de, hem jî li derve dûjîn ji van kesan re kir.

Dema ez li Amasya bûm, min ji bona Awrûpa nameyek nivîsand. Min di wê nameyê de diyar kiribû; "ne rast e, mirov her kesê ku ji zindanê derdikeve li ser destan bigire. Êş, berxwedanî û hovîtiya mezin a hat jiyîn, xwezayî bi gel û hevalan re baldarî, sempatî, hezkirin û rêzdariyê ava dike. Divê ev nêzîkbûn hebin jî. Lê tevî ku hinek kesan ev heq nekirine, xwe cuda bidin diyarkirin, an jî jiyîn dê herî zêde li zora me biçe. Jixwe divê di eleqederî, peywirdarî, hezkirin û rêzdariyê de jî, rastiya ku kesayetê jiyan kiriye, neyê piştguhkirin. Berî

her tiştî weke mirov li ber xwe dayîn, erka me bû. Lê yek ji me jî nabêje hêjayî dihat xwestin li ber xwe daye, divê ev neyê gotin jî. Bila ev nêrîn kesekî mat neke. Dibe ku weke nakokiyê were fêmkirin, lê rastiyeke…" Min li gel vê hinek mînak jî dabûn.

Me di wê pêvajoyê de, di derheqê Gonûl û hinek kesên din de bi şêwazên notan, rapor ji partiyê re şandibû. Jixwe Gonûl Atay herî dawî, çûbû cihê ku biçiyê. Carna ji xwe re dibêjim, xweziya me ewqasî qehrên wê jiyan nekiribûya. Bila biçûya dojehê. Ji ber bi rastî jî çav û dilê Gonûl ne bi me, PKK'ê, şoreş, Kurdistanê û Riza re bû. Min ev rastî hêj di sala 84'an ji hevalan û Riza bi xwe re jî gotibû. Gonûl jî tevlî girevên birçîbûnê û rojiya mirinê bû. Gonûl jî di nava refên berxwedaniyê de bû. Lê dema ew di refê de bû, beşek giyana wê ji zû ve winda bibû. Ji aliyê fîzîkî ve jî, ji qada Rojhilata Navîn çûbû cem dijmin.

Ji bona mirov dawiya van kesan jiyan kiriye baş fêm bike, divê mirov berê xwe bide wan salên berê. Dibe ku mirov pir hêsan bêje; "ew jî ji zindanê derketibû. Lê îxanet kir." Di heman demê de ger mirov rast nenirxîne dê mirov bêje; "dê mîsoger her kesê ku ji zindanê derketiye îxanetê bike. An jî ev potansiyel heye. Kêrî me nayê…" Ev jî nêzîkbûnek zêde xeter û pêşdarezînek bêmafdariye. Ev jî gelek caran pir hêsan pêş dikeve.

Em nêzî hinek van kesan bûn. Bi wan re li heman qoxuşê, me heman henase bi hev re digirt. Me pêvajoyên herî zehmet, xulekên mirinê yên herî dawî bi hev re jiyan kirin. Heta me wesiyetên xwe ji hev re gotibûn. Kesayet bi hemû xisletên xwe ve vekirîbûn. Ti aliyek were veşartin nemabûn. Gelek aliyên

weke yên veşartî dihatin pênasekirin jî, li holê bûn. Lê ger dîsa jî yekser îxanet nekiribe, hêjî li cem mirov be, derdor û heman nêvengê bi mirov re be, tişta hewce dikir herî dawî were gotin, mirov yekser nabêje. Di rastiyê de mirov pê bawer nake. Lê di heman demê de mirov bi hev re diçe mirinê. Ev jî nakokî ye, lê rastiyeke. Kesên di vê meşê de tirsên xwe derbas dikin, ji lewaziyên xwe xilas dibin û baş zelal dibin, derdikevin holê. Berxwedanî hinekê rêya jiyankirinê û weke mirov li ser piyan rawestîn bû. Her çendî bi hemû kirêtiya xwe jî be, ew beşa gavekê jiyan dike, dibe beşa ayîdê mirov a xweser. Kesayetên wisa dema di nava wê berxwedaniya dide jiyîn de jiyan dikin jî, di nava giyana xwe de ketîbûnê jiyan dikin. Asta wan çi dibe bila be, di quncikek dil û mejiyê xwe de li revê digerin. Hêmanên wê didin jiyîn. Kêliya ew digihêjin, li kur dibe bila be, kîjan dijmin dibe bila be, dê bireviyan cem wî.

Di wê mala kevin a li ser Rêya NATO ku tije bîranîn bû, dema ez bi dayîka Xetîce re li ser Gonûl di-axivîm, min hewl dabû van bidim fêmkirin. Li wan geriyabû û ji bona Riza jî nameyek şandibû Dîlokê. Ecêb bû. Gonûl a ku îxanet kiribû, hêj 'girêdaniya xwe ya dildarî' bikar danî. Bêşansiye, xweziya mirov kesên wisa ji serî ve baş nas bike. Dayîka Xetîce dibêje; "bila ew hezkirin û baldariya me ya li hember wê heram be. Ger ez bibînim, ezê bi destên xwe wê bênamûsê bikujim. Belê, xweziya mirov destpêkê nas bike! Bes, êdî tenê naskirin jî têrê nake.

Her çendî bi navber jî be çend salan ser hev di partiyê de provakasyon hat ferzkirin. Dîroka partiya me jî di vê mijarê de tije mînakên ecêb in. Di vê dîrokê de Semîr, Seher, Dawut, Silêman, Hogir, Kor Cemal, Metîn, herî dawî jî Şener û Baranê

Zer derketibûn. Ez jî hewl didim bi xwendina pêvajoyên hatine jiyîn fêm bikim. Li akademiyê dersa dîroka partiyê tê dayîn. Her pêvajoyek gelekî baş û girîng tê pênasekirin. Mezinbûna partiyê, rola Rêbertiyê ya di avakirin û meşandina şoreşê de, mirov başirtir fêm dike. Di hundir de ev asta têgihiştin û baweriyê hebû: heta ku Rêbertiya partiyê hebe, dê ev partî her astengiyê derbas bike û serkefinê bidest bixe. Dîsa me digot; "Rêber APO, PKK ye, Kurdistan e. Sosyalîzm e. Azadî ye. Pêşeroj e." Me her tim di nivîs û paraznameyên xwe de, bi qasî me fêm kirine, ev rastî rave dikir. Ji ber zêde girîng bû. Rastiya Rêbertiyê ji kîjan hêlê ve dibe bila be ger neyê fêmkirin, wê pêvajoyên me yên şoreşê, pirsgirêkên hatine jiyîn, encamên ji ber wan ava bûne û çareseriyên dihatin ferzkirin jî nehatiban fêmkirin.

Li akademiyê pênc sed heval zêdetir hene. Ez ji zindanê derketime û bendewariyên wan hene. Provakator jî ji zindanê derketiye. Her kes pêvajo û rastiya zindanê mereq dike. Rojevek girîng tê nîqaşkirin.

Hêj bandora tiştên ku min bihîstine hene. Lê bi giştî rehet im. Biyanîbûnê najîm. Jixwe jiyana dibistanê û pergala perwerdeyê mirov tevlî dike. Mirov nikare dervî wê bimîne. Ji werzîşê heta dersên wê, heta sazûmaniya qoxuşan her tişt bi rêk û pêk e. Ez roja duyem tevlî werzîşa sibehê bûm. Zindî me. Em baz didin, hereketên werzîşê dikin, ez qet şûnde namînim. Ji aliyê fîzîkî ve jî zêde zindî me. Ev jî bala hevalan dikişîne. Bi salan di girtîgehê de mabûm. Lê hêj fîzîka min saxlem bû. Tevî êşkenceyan, êş û zehmetiyan, ti derê min neseqet bû, an jî xwehir nebibû. Heta dikarim bêjim ku, ji her kesî zêdetir rast, bê ku xwe xwehir bikim dimeşiyam. Rast rûdiniştim.

Rêbertiyê gotibû; “hûn dikarin bi rêveberiyê re nîqaş bikin.” Min destpêkê broşûra zindanê ya hatî nivîsandin xwest. Min destpêkê hema çav gerand. Li pişt gelek nav hatine rêzkirin. Hesen Gullu, Sari Osman, Aysel Çûrûkkaya, Ahmet Bayik, Brahîm Yildirim, Faysel Dumlayici. Wisa berdewam dike. Hinek nav bala min dikişînin. Navê hinek kesên ku di pêvajoya girtîgehê de peywendî bi wan re tine bû, di tecrîdê de bûn, an jî bi îspiyonkariyê û îtîrafkariyê dihatin tewanbarkirin hebûn.

Min xwend. Lê belê, dijberî hemû mijarên ku me beriya niha li zindanê nirxandine û girtîgehê nîqaş kirine û hemû tiştên ku hatine jiyîn bû. Her tiştên rast û şaş têkilhev kirine. Her tişt bi Şener û Salîhê ve girêdane û pênase kirine. Ango li gorî destnîşan kirine ji serî ve heta dawî van em bi rêve birine. Dijmin li ser me her tişt pêk aniye û encam girtiye! Veciniqîm. Her nirxandinek zêde tirsnak e. Ji bona her berxwedaniyê gotine; “her çalakiyek ji bona jiyanek rehet, ji bo xwarin û ji bona daxwazên aborî hatine lidarxistin.” Daxwazên wê pêvajoyê tev ji derv re hatibûn ragihandin. Di weşanên me yên partiyê de jî derketibûn. Ma çawa dibe? Temam, Şener provakator bû. Lê wî çawa dikariya li ser polîtîkayên me yên hundir evqasî diyarker be? Kes nikare berxwedaniya girtîgehê wisa berovajî bike. Şaşî, kêmasî û suc hebûn, lê nabe ku evqasî were berovajîkirin.

Yekser çûm rêveberiyê. Min got; “min broşûr xwend. Lê ez tevlî yek hevokê jî nabim. Ne yek, deh xayîn jî derkevin, kes nikare hêcetan evqasî erzan bike. Ez vekirî bêjim, tam senaryoyeke.” Min hinek mînak jê dan. Di rêveberiyê de Aysel jî heye, Brahîm û çend kesên din jî hene. Min got; “hûn jî di

girtîgehê de bûn. Em bi hev re bûn. Ma bûyer wisa pêş ketin? Ma weke we nivîsandiye çêbûn? Mirov partiyê naxapîne. Me jî jiyan kir, ma wê hinek kesên din jî behsa van nekin? Dê wê demê çi derkeve holê? Ma em ê wisa kesên derve di mijara rastiya girtîgehê de nexapînin? Çi heqê wê heye? Ma ne dê her kes bûyerê bi Şener rave bike, dê nikaribe xwe pir rehet veşêre?

Ya rastî tam vekirî nebe jî, min dixwest ji hinek kesan re bêjim; "ma hûn di hundir de çibûn, we çawa li ber xwe da û hûn çawa hatin tewanbarkirin? Madem hûn xwe venakin, xwe evqas jî berxwedêr nedin nîşan. An jî hûn zindanê nedarezînin." Hêrs, acizbûn û bertekên min zêde bilind bûne. Dr. Baran û Serhed jî dibêjin; "kesekî li ser te tiştek ne nivîsandiye, tu çima evqasî bertek raber dikî. Tu parastina çi dikî?"

Min got; "pirsgirêk ne ez im. Dost jî, dijmin jî min baş nas dike. Ez bi nêrînek ferdî, an jî gumanek ferdî lê nanêrim. Di girtîgehê de şehîdên me hene, hevalên me hene. Pêvajoyek hat jiyîn. Wê rexneyên partiyê hebin. Lê em nikarin wisa her tiştî înkar bikin! Wê demê ma em hemû xayînin? Ger Şener bandor li me tevan kiribe, me çawa jiyan kir? Ev tewanbarî ne, qebûl nakim." Nîqaş gerim bû, hişk bû. Êdî hatiye qonaxek wisa, kes kesî guhdar nake, dor nade hev.

Belê, nîqaşa herî gerim û şerê li dibistanê yê destpêkê wisa bû. Hêj dibêjim, ez tevlî yek hevoka wê biroşûrê nabim. Ji ber gelek tişt têkilhev kirine. Nivîsek tevlîheve, lez kirine û weke ku bi zorê nivîsandine. Cewhera provakasyonê nehatiye destnîşankirin, dîsa pêvajo li gorî xweseriyan ne hatine nirxandin. Dibe ku her tişt hebe, lê kûrbûn û pergalek ku

naveroka rexneyên partiyê dagire û rave bike tine ye. Nexasim bi destên hinek kesên ku bi îmzeya wan ev belge hatiye amadekirin jî, weke bêşandiyekê dinirxînim.

Lê ji ber min jî pirsgirêk ji qonaxek wisa berovajî, cihek berovajî û wextek berovajî de nîqaş dikir, a min jî tam korbûnek siyasî bû! Tam ehmeqiyek bû! Min hêj di serî de her kes li dijî xwe rakiribû. Her kes şaş jî bi-axiviya, pirsgirêk berovajî jî bikiran, nîqaşek bi vî rengî ji hêla objektîf ve ez dikirim rewşek parazvanê Şener û kesek di bin bandora wî de. Jixwe di heman kêliyê de jî ev tişt hat gotin; "ma tu kî diparêzî?" Min jî got; "kesekî naparêzim. Rastiya diparêzim. Ez di wê baweriyê de me ku, divê em rastiyên hatine jiyîn ji partiyê re ragihînin…" Lê ev gotinên min jî kêrî pênc quruşan nehatın. Ji ber pirsgirêka heyî zindan derbas dikir.

Dîsa di heman rojan dersê de pêvajoya zindanê hat vegotin. Komîsyona dersê heye, zêdetir Metîn Uluca behsa zindanê dike. Ew bixwe li Adana maye. Rastiya Amedê qet jiyan nekiriye. Lê ji serî heta dawî behsa Amedê dike. Her wiha ji broşûra heyî xirabtir tevlîhev dike.

Vekirîbû, provakator ji zindanê derketibû pêş û gef li partiyê dixwar. Bangawaziya zindanê kiriye, name nivîsandine, Rêbertî weke Plehanov, xwe jî weke Lenîn pênase kiriye. Her çendî ez hêj ne di zanebûna van de bim, min dizaniya ku êrîşa miqabil ne ji rêzê ye. Di vê manê de parastina rastiyên partiyê û vala derxistina êrîşan gelekî girîng bû. Lê belê, asta nîqaşan, şêwaza destgirtina pirsgirêkan, dibû sedem ku ez her tim li ser heman mijaran lêhûr bibim. Tenê bi diyardeyan ve girêdayî dimam. Bertekên min ên di vê mijarê de jî zêde çalak in. Weke ku hinek tişt ji dest diçin, hinek tişt tên tinekirin. Ewqas lezgîn,

bêhedar, bêsebir tevdigerim. Gumanên min û ev nêzîkbûnên ên apolîtîk û bibertek, hem min dixin nav tengezariyan, hem jî hevalan tengav dikin. Lê ez hêj ne di ferqa vê rastiyê de me.

Min mafê axaftinê girt; “zindan jî qadek me ya têkoşînê ye. Ez nizanim pêvajoyên din çawa hatin destgirtin û nirxandin. Ez nû tevlî dersan dibim. Lê belê, ger hemû wisa hatibin pênasekirin, wê gelek tevlîhevî derkeve holê. Heval li Amedê jiyan nekiriye, tenê bi hinek mijarên ku bihîstiye ve bûyeran şîrove dike. Ev jî xwezayî rastiya rave nake. Bêguman, polîtîkayên li giştî zindanan dihat pêkan heman wek hev bûn. Lê pêkana li Amedê di meriyetê de bû, zêdetir berfireh bû. Ez naxwazim ji vî alî ve binirxînim. Ya rastî ez dudilî bûm ku, bi-axivim an na. Lê vê mijarê girîng dibînim. Bi sedan heval li vir hene. Lewma wê dîroka zindanê jî wisa hîn bibin, ev jî ne rast e. Rêbertiyê got; “em ê platformek nîqaşê vekin.” Ez pêşniyar dikim zêdetir li wir were nîqaşkirin. Divê aliyên ku nayên zanîn, bi hinek vegotinên zorakî ve neyên pênasekirin. Ger ez niha dijberî tiştên ku heval gotine, hinek tiştan bêjim, dê rewşek polemîk derkeve holê. Lewma naxwazim wisa nêz bibim.” Ez rûniştim. Hevalê Serhed di-axive. Jixwe ew dersê birêve dibe.

“Hevala Sara platforma me di bin zextê de digire. Komîsyonê biçûk dibîne. Tiştên li vir tên gotin, nirxandinên partiyê ne. Hevala Sara nikare bêje, ‘rastiyê min hene, wan qebûl bikin.’ divê heval vê helwesta xwe ber bi çavan re derbas bike.”

Ji bilî van hinek tiştên din jî got. Lê ez tiştên ku tên gotin fêm nakim. Mat mame, weke ku li mejiyê min xistine. Ev çi gotinin? Ma ez wisa ne-axivîm! Gelo çima wisa dinirxand?

Min çawa biçûk didît, an jî rastyên min çibûn? Gelo dixwest çi bêje? Yekem car di destpêka dersê de bi nêzîkbûnek wisa re rû bi rû dimam. Lê min dîsa yekser mafê axaftinê xwest.

"Ez bawerim tiştên ku min xwest bêjim, nehatin fêmkirin. Heval zêde giran di-axive. Min bi baldarî diyar kir ku, ez naxwazim polemîkê jiyan bikim û wisa axivîm. Jixwe ders û platformên me cihên nîqaşanin. Nîqaşên demokratîk jî ancex li van deran dibin. Ma em ê cuda li kur nîqaş bikin? Lewma dema ez li vir şaş dibînim û dibêjim, nayê wê wateyê ku platformê di bin zextê de digirim. Îradeya hevalan heye, ma ez çawa dikarim wan di bin zextê de bigirim? Lewma vê rexneyê qebûl nakim. Ne rast e. Jixwe min tenê pêşniyarek kir. Ez pêşniyara xwe dubare dikim." Rûniştim. Hinekê bi dengek şikestî û aciz axivîm. Zêde li zora min çû, kêm mabû bigirîm. Min bi zorê xwe girt. Min axaftinên pey wê re guhdar jî nekir. Moralê min xirab bû.

Ez di navbera dersê de axivîm. Lê nerehet im. Xwesteka min a nîqaşê şikestiye. Uslubê min ê nîqaşê hêj di dersa destpêkê de pileyên min kêm kiribû. Dema mirov ji bingeha pirsgirêkê destpê neke, mirov her çendî tişta herî rast jî bêje, bi şêweya herî xweş jî bêje ti feyde nake. Belê, hewce dikir ez ji bingeha pirsgirêkê ve bigirim. Ji ber her roj hinek din nêzîkbûnên hevalan dihatin guhertin. Ji ber nîqaşên min ên bi endamên rêveberiyê re wisa yekser derdiketin, xwezayî guman û pêşdarezîn jî zêde dibûn. Ez hêj ne di ferqê de me. Ji xwe re dibêjim; "ma çima min fêm nakin?" Dema wisa dibû min zêdetir dixwest ku nîqaş bikim. Pêdiviya min bi vê çêdibû. Zêdetir bi heman mijaran ve asê dimam. Vê carê jî neçar dimam bêjim ku, "na, min wisa negot. Rastiya wê ev e… Na

we şaş fêm kir… na ne wisa .” Lewma bi mijarên talî ve asê dimam. Ez di nava îzahan de fetisî bûm. Weke ku pirsgirêk şaş axaftina min, an jî şaş hatina fêmkirin bû. Min li cem xwe wisa dizaniya.

Dema ez destpêkê çûyîm heval dihatin cem min, li derdora min xelek çêdikirin. Lê belê, her ku roj derbas dibûn encama nîqaşên rû didan, ji ber sedemên nîqaş, şîrove û pêşdarezînên navxweyî dihatin jiyîn, nêzîkbûnên dûr, sar, tirsnak, nêrînên şikbar û helwest pêş ketin. Ez jî li hember her rexne, her gotin, her nêrîn, her nêzîkbûnê diheliyam. Matmayîn û kabûsek xemgîniyê bi ser min de dibariya. Ya rastî ez jî hêj nizanim çi dibe, ev rewş tê çi wateyê, lê dihesim ku bêbaweriyek heye. Dîsa jî, hewl didim dev ji xwe bernedim. Dixwazim nîqaş bikim. Gelo kesek min fêm bike tine bû? Lê digerim. Yên ji girtîgehê derketine nas dikin, lê ew jî dûr disekinin. Em bi Aysel re pênc sal û nîvê bi hev re man. Herî baş wê nas dikir. Lê mixabin ew jî ji her kesî dûrtir disekinî û bi min re nedi-axivî.

Yekser pey vê nîqaşê re, bi şev Dr. Baran hat bangî min kir û got; “wê heval bi te re bi-axive.” Em çûn odeya ku telsiz lê bû. Di rê de hinekê kelecanê ez girtim. Ez hizirîm ku, gelo Rêbertî hatibû, lê min pirs nekir. Em ketin hundir. Dr. Baran got; “ezê biçim.” Bi yê hundir re kesek bi navê Ahmet Tekne heye. Me li wargeha perwerdeyê ya nîv saetê ji wargeha me dûr hevûdû dîtibû. Dema ez hatîm yek-du rojan hevalan ez birim wir. Li wir jî bi merasîmê pêşwaziya min kiribûn. Di heman demê de min teqandina çekê destpêkê li wir pêk anî. Ew jî kesek di nava wê komê de bû. Lê min nav û berpirsyariya wî nedizaniya. Ger gotibe jî, ji ber qelebalixa li wir di hişê min de nemaye. Jixwe em jî zêde li wir nemabûn û vegeriyabûn.

Ango ji min re xerîb nehat. Lewma bangî min kirinê, li odeyek wisa bi tenê hevdîtin kirin û her tiştên din asayî û xwezayî dibînim. Ango, mijarên weke ‘gelo dê çi be’ nayê bîra min.

Got; “me got em hinekê bi-axivin” û dest bi axaftina xwe kir. Lê bi rêbazê dengek wisa di-axive, beriya ew bi-axive, min hîs kir ku, “wê tiştên baş pêş nekevin.” Min jî got; “ez nizanim li ser çiye, lê em bi-axivin.” Ez naxwazim wî bê bersiv bihêlim. Min jî bi rûkeniyek bi êş ev jê re gotin. Yê li hemberî min got;

“Tu rêveberî û komîsyona dersê na-ecibînî. Tu hevalan biçûk dibînî. Evder akademî ye. Kes nikare wisa nêz bibe. Em destûrê nadin vê.” Hêj berdewam dikir. Lê bi dengek ecêb ve di-axivî. Min ji nişka ve hîs kir ku, li odeya lêpirsînê me. Wisa yê miqabilî xwe girtiye beramber û di-axive. Weke din jî rabûye ser xwe volta digere. Destên xwe dane pişt xwe û di-axive. Dihizirim ku, gelo ev ne hevalê me ye? Ji ber hevalên me ne wisa nin.

Êdî min nekarî xwe û min got; “ka raweste. Tu wisa ji xwe re tewanbar dikî û pê de diçî. Min jî qet guhdar nakî. Xêre, çi dibe, ma ez li kuderê me? Biborîne, dibe ku zêde giran were, ez dihesim ku li odeya lêpirsînê me. Ez we nas nakim. Lê, hûn kîjan heval dibin bila be, hûn nikarin min bi vî rêbazî tewanbar bikin. Nerast e. Ez nizanim çi ji we re ragihadine. Ez bawerim behsa nîqaşên di dersê de dikin. Li heman wisa pêş ket…”, min pey re yek bi yek hemû tiştên hatine axaftin ragihand. Dengê min jî bilind e. Zêde hêrs bûme. Min got; “ger em hevalê hev in, divê em li hember hev rêzdar bin. Wisa bi bihîstina tiştên ne rast ve rexne nayên kirin.”

Piştî van axaftinên li hember hev, vê carê jî zêde nerim û narîn dibe! Êdî tam şik dibim. Çiqas dişibûyê. Polîs jî carna hişk, carna jî bi şêwazê baviktî nêz dibûn. Ji nişka ve ji xwe aciz bûm, nebaş bû ku hevalek xwe bişibînim polîsan. Lê rêbaz heman tişt bû. Ez bi gelek nêzîkbûnên hevalan ên min qebûl nedikir û nedi-eciband re rû bi rû dimam. Lê dîsa jî min wisa ji wan re nedigot. Ne evqas mirov ji xwe dûr dikirin. Her çendî acizbûn bidin avakirin jî, mirov pê bawer e ku yê li hember heval e.

Got; "ez Omer im. Ji eyaleta Başûrê-Rojava (Gûneybati. Roavayê Bakurê Kurdistanê ye. Berê li gorî stratejiya şerê gerîla weke eyaleta Tolhildanê dihat binavkirin.) me. Ez jî di girtîgehê de mam. Tu me nas nakî, lê em Sakîne Cansiz nas dikin. Belê, min jî nedixwest ku, wisa bi-axivim. Nexeme, nîqaş şaş hatine ragihandin. Nepirsgirêke. Lê yeqîn dikim tu hinek tiştan qebûl nakî. Mînak weke reva Şener qebûl nakî." Min got; "na, nerast e. Ez ne li vir, li cem Rêbertiyê bi reva wî hesiyam. Ma qebûlkirin û nekirina vê dibe? Reviye. Ez dizanim. Pirsgirêka me ne ev e! Nîqaşên me derbarê pêvajoya zindanê de ne."

Pişt re min ev nîqaşa me ji Gezgor re got; "ev kesê bi navê Omer ji min re ecêb e. Ew çi bû,ma rêveberî xwedî rolek herî jorê ne? Çima Dr. Baran ew ne-axivîn? Omer çima hem hişk, hem nerim û rêbazek sînsî nêz bû. Baweriya min bi wî kesî nayê. Nêzîkbûnên wî naşibin ên me." Gezgor jî li ser nêrînên min zêde kir û got; "ma kîjan ji wan dişibe me, heta ew bişibe. Sakîne, ez li APOyiyan digerim. Dê ev min dîn bikin." Wî jî bertekên xwe wisa dida der.

Min tim di rewşên wisa de helwestên Gezgor zêdegavî dinirxand û ew dihedirand. Dema ez weke dîna di-axivîm vê carê jî wî hewl dida min bihedirîne. Çiqas tiştek ecêb e!

Dihat gotin; “wê kesên ku ji zindanê derketine neyên cem hev.” Ev jî dibû tirs û tehliya matbûn, ecemîtî, apolîtîkbûn û bê uslubûna me. Evder nêvenga me ye, nêvenga partiyê bû. Di heman demê de Akademiya Mahsum Korkmaz bû. Ji bona me zêde pîroz bû. Me salan bi xeyalê wê jiyan kir. Îro jî em li wir bûn. Çima evqas li hember ên ji zindanê derketine bertek pêş diket? Ji bona vê min ji xwe re digot; “xweziya ez derneketibûma. Bila wan ketiyan ez dernexistibûma. Dibe ku bi zanebûn jî derxistibin.” Tevlîheviyek wisa, van tewanbariyan, bêçaretiyek ava kiribûn. Çiqas sehimkar bû! Dijmin bi salan xwest li heman qoxuşê, heman blokê, heman hucrê û heman girtîgehê peywendiyên me yên bi hev re qut bike. Digot; “ne-axivin.” Her wiha berdêla wan axaftinan jî êşkence bû. Lê ew dijmin bûn û bi armanc dikirin. Bes çima li vir dihat kirin, çima di Akademiyê de dihat kirin? Min nedikariya wate bidim vê nêzîkbûnê. Li aliyê hevalên jin lê diman neqebek hebû, ez diçûm, nav daristanê û digiriyam. Li nav ciyan bi saetan bêdeng digiriyam.

Rêbertiyê got; “bi-axivin, nîqaş bikin, pirsgirêkan fêm bikin û dîroka me fêm bikin. Em çawa hatin heta van rojan, çi hat kirin, wê fêm bikin.” Lê em jî bi çi ve mijûl dibûn?

Pêvajoyek zêde hesas bû. Provakasyonê di Kongreya 4. de êrîşî nirxên me yên herî bingehîn kiribû. Pêvajoyek ku emperyalîzmê û KT di dema nîqaşên xweseriya çandî û rêveberiyên me di rojevê de ne, her wiha hewl dida pirsgirêka Kurd bikişîne vê eksenê, nêzîkbûn û feraserên ku dibêje rola

gerîla di plana duyem de ye, di bin navê pirsgirêk li eniya siyasî were çareserkirin, hewl dida xeta bingehîn reformîze bike. Li zemînê vê digeriya. Tenê bi vê re jî nedima. Li hember Rêbertiya ku xeta wê dimeşîne û deqa xwe lê daye êrîşek hebû. Ya esasî jî, bi navek din û planek din ve 'PKK'yek bê APO' kirina meriyetê bû! Di vê mijarê de li hember Rêbertiyê êrîş zêde û sînsî ne.

Li derdor hewldanên girêdana bi Rêbertiyê ve dide diyarkirin. Di hemû provakasyonan de ev nêzîkbûn hebû. Ji ber hêza wan a yekser, rasterast Rêbertiyê hedef bigire tine ye. Kesekî jêhatiya vê ya avakirina bingeha bîrdozî, polîtîk û rêxistinî jî saz nekir. Nexwe wê demê navê dibû hizipkarî, an jî meyla kîjan çînî bi xwe re dide jiyîn wê navê lê dike. Lê na, di nava me de weke îxanetek ku benê xwe qetandiye.

Di vir de ji bona me jî erka bingehîn di vê manê de nîqaşkirina pirsgirêkan, fêmkirina xisleta êrîşa heyî û bersiva herî baş li nêvenga partiyê bi yekîtî, aheng, dilnizim, bi şopdarî, çavdêrî, sebir û kamilbûnek mezin ve dayîn bû. Her çendî di asta raman de ev hebin jî, nêzîkbûnên di pratîkê de derdiketin tev cihêbûn û tevlî pergalê nedibû. Gelek pirsên hêcetên wan ên weke, "çima vê ji min re dibêjin? Çima berovajî dike? Çima bawer nake?" Zêde dihatin rêzkirin. Em hem di nava xwe de li hember hev nîqaşê dimeşînin, hem jî giştî bi hemû hevalan re nîqaş dikin. Her yek ji me tîpek rave dikir.

Her axaftin, her nêzîkbûna Selîm cuda, ya Gezgor cuda, ya min cuda, ya yê din cuda bû. Em hemû li gorî xisletên xwe û nêrîna xwe ya ji bûyeran re nirxandinan dikin. Xalên me yên nîqaşê, guman, bertekên me, binyata kesayeta me rave dike.

Hinde me şêwaza nîqaşê bi pîvanên xwe ve şêlo dikir, di encamê de em hemû jî li nav heman pênaseyan dihatin bicihkirin.

Selîm li hember her kesî muxalîf bû. Li hember kesên ji girtîgehê jî derketîn û li hember kesên derve jî wisa bû. Tenê aliyek wî yê birêzgez hebû, ew jî muxalîftiya wî bû.

Bi şêweya şerek, weke komedyenekî, weke lîstikvanê naverastê û weke birokratekê nêz dibû… Ango bi rûniştin, meş, axaftin û henekên wî ve tam tenê Selîm bû. Selîmê di hundir de jî heman kes bû. Ev xisletên xwe yên muxalîfiyê ji xwe re dikir mertal. Ew jixwe li hember Karasu jî muxalîf bû. Li hember Şener jî muxalîf bû. Li hember Fuat Çavgun jî muxalîf bû. Ango kî zêde hatibe rexnekirin, kî bûye mijara nîqaşê, îro kî li dijî partiyê be, Selîm beriya her kesî û ji mêj ve li dijî wan bûye!

Roja destpêkê di nîqaşan de platform gur dikir. Di hevpeyvînên xwe yên bi Rêbertiyê re, bi gotinên felsefîk destpê dikir, bi mînakên bûyerên mîtolîjiyê ve rû bi rû danî, wisa wer dizaniya ku, di nîqaşan de peyvên pir xweş û baş dizane. Piştre jî têra xwe rexne digirt. Rêbertiyê xwe xapandinên wî, berovajîbûnên wî, çeloxwariya wî di carekê de derdixist holê. Rêbertiyê zindan zêdetir bi zanistî û zêdetir bi kûraniyek siyasî ve dinirxand. Yek bi yek ji nirxandina bûyer û diyardeyan zêdetir, aliyên ku deqa xwe li pêvajoyê xistine û xisletên wan destnîşan dikir. Li pey vê roja paştir Selîm, tifa xwe dalast!

"Rêberê min, ez baş hizirîm. Min axaftinên me yên doh ji nû ve pîvan, min dît ku hûn mafdar in. Bi rastî jî ji bona zikê me têr bibe, me rojiya birçîbûnê lidardixist. Wisa bû. Me digot,

bila xwarin baş be û zêde be. Bi daxwazên aborî bûn, an jî ji bona parastina bi Kurdî bû. Weke din jî me di mijarên em derbas dikirin de, bazar bi dewletê re dikir. Êdî ez van baş fêm dikim." Lê Selîm rojek din û bi şovek din ve nêveng dîsa tevlîhev dikir. Vê nêzîkbûnê em jî tengav dikirin. Ew nirxandin û uslubê nîqaşê, dibûn sedem ku em jî neçar bimînin û di heman xalan de nîqaş bikin.

Em yekser amade bûn. Her çendî hinek xisletên me lihev nekin jî, uslubê me yên nîqaşan û nêzîkbûnên me yên ji bûyeran re hevûdû temam dikin. Dema pêvajo û bûyer bi vî rengî berovajî werin nîqaşkirin, nefêmkirina wan kûrtir dibû. Hevalên din jî bi mafdarî li hember vê rewşa me îsyan dikirin.

Em hem di nava xwe de, hem di nava giştî de şêwe û cewhera vê nîqaşa me ya bi hemû hevalan re ji rastiyê dûr bû. Li holê rastiyek hebû û me jî bi rewşa xwe ya heyî ve pirsgirêkek nû dabû avakirin. Rêbertiyê dixwest bi dahûrînan lêhûrbûna me kûr bike. Yekser tenê pirsgirêkek nedigirt dest. Berfireh datanî holê, ji dîroka me mînak dida. Dema behsa zindanê dikir, digot; "cihê berxwedaniya 82'an gelekî girîng e." Şêwaz û encamên wê ava kirine, bi rêbazek balkêş destnîşan dikir.

Di kêliya dahûrînekê de got; "hinek hêj naxwazin fêm bikin." Behsa rehabîlîta dijmin, provakasyona ku ji zindanê destpê kiriye û derketiye û çawa em bikaranîne dikir. Got; "dibêjin ku, me li ber xwe daye û serxistiye. Berxwedaniya çi? Serxistina çi? Xwe dixapînin. Ger wê behsa berxwedaniyê bê kirin, ew jî berxwedaniya 82'ya ne. Gelo armanc û daxwazên wan çibûn? Kesên ku vê fêm nekin, nikarin rastiya berxwedaniyê jî rast binirxînin. Divê mirov hinek xwedî

wijdan be. Ma ev bi sala ne ev şer bi çi hat meşandin? Em berpirsyarê evqas karan bûn. Em jî hewl didin hinek tişt bikin, lê em dîsa jî nabêjin; “me kir, em wisa ne, me ev kir.”

Rêbertiyê hem bi perspektîfan em ber bi cewhera pirsgirêkê ve dibirin û dihişt ku em xalên bingehîn ên mijarê bibînin, hem jî bi renxeyan hewl dida em şaşî û kêmasiyên xwe bibînin. Di heman demê de bi kûrkirin û kamilkirina nakokiyan ve, dixwaze me veke û dahûrîne. Hedara min nedihat. Mîsoger hinek tiştên şaş ji Rêbertiyê re hatiye gotin. Kesekê negot; “me li ber xwe da û ser xist.” Wê demê Rêbertiyê ji bona çi wisa digot. Dîsa rêhabîlîtasyon û provakator bandor li min nekir. Gelo, ji ber vê têkîliyê wisa digot? Wê demê ez rabim bi-axivim. Dibe ku di berxwedaniyan de kêmasiyan rû dabin. Dibe ku me li gorî tê xwestin nûnertiya polîtîkayê nekiribe. Lê di berxwedaniyên din de şehîdên me çêbûn. Jixwe ew hemû jî ji berxwedaniya mezin a Mazluman, Pîran û Xeyrîyan bandor bibûn. Hemû berxwedaniyên di encama wan de hatibûn avakirin. Mîsoger hinek kesên din cuda vegotine. Ger şaşiyek heye, divê mirov sererast bike. Ger her tişt weke hatiye jiyîn ji partiyê re neyê ragihandin, nabe. Lewma min yekser destê xwe rakir û diyar kir ku dixwazim bi-axivim. Rêbertiyê got;

“Madem tu dixwazî were. Ma tu dikarî hêza fêmkirinê şanî me bikî? Tu dikarî yekbûnek rast saz bikî? Tu dikarî soza vê bidî? Jixwe yeqîn dikim, te soz jî nedaye. Ji ber wisa gotin.” Divê tu biryardariya soza tevlîbûnek bihêz bi xwe re ava bikî.” Van gotinên dawî zêdetir bandor li min kir. Soza çi, ma min çawa soza xwe nedabû?

“Na Rêberê min. Neku min soza xwe nedaye. Rast e, ez quralên vir zêde nizanim. Lê weke ku nû tevlî bûme nêzî min dibin. Min dabû diyarkirin ku, li şûna wan sozên dijwar ezê bi pratîka xwe bidim diyarkirin. Dibe ku ez ne endamek baş a partûbûyî bim. Lê ez di nav partiyê de me. Nizanim, gelo di vê mijarê de gumanên hinek kesan hene. Jixwe gelek tişt tên gotin. Her axaftin û nîqaşên min cuda tên nirxandin. Ger tiştek heye, bila vekirî bêjin. Lewma ez rexne û nirxandinên wisa neyekser rast nabînim. Ti gumanên min ên takekesî tine ne. Dost jî, dijmin jî min baş nas dike. Baweriya min bi min heye. Ez ne weke Sakîne, ez bi partiyê re heme. Ji bona ez endama vê partiyê bûm, di zindanê de bûm, dijmin ez kirim hedef. Lê tiştên wisa tên gotin… Ez vekirî bêjim, ez Partîbûna xwe nadim nîqaşkirin.”

Dema ez di-axivîm, agir ji devê min diçû. Weke şer bikim di-axivîm. Ez li ser piya me û berê min jî li hevala ye. Rêbertî jî li ber maseyê rûniştiye. Sakîn li min guhdar dike. Piştre min li wêneyekê temaşe kir. Wêneyê wê rojê bû. Ez bi dest û milê xwe, mîmîkên min û bi her tiştê xwe ve hêrsê dibarînim. Tevî vê Rêbertiyê bi dilxweşî li min temaşe dikir, hinekê jî ji ber wê rewşa min a dîn bûye metel maye, dişopîne. Min keserek kûr kişand. Ez bawerim hevalên min jî ji bona lê binêrim û êşa wê jiyan bikim kêşa bûn. Belê, çiqas bi êş bû!

Rêbertiyê got; “min di axaftinên xwe de behsa ti kesî nekir. Min hevpeyvîn zû dît. Lê ger te xwest tu bi-axivî, wê demê em jî hinek din vekin. Temam, wê tu bikarî rakî?” Min dîsa bi heman hêrsê û dilşikestinê bersiv da;

“Belê, dikarim rakim. Ma çima ranekim? Jiyana min vekiriye. Dibe ku partî bi hemû ziraviyan ve nizane min di hundir de çawa jiyan kiriye. Lê ez amade me ku bi hemû ziraviyan ve vekim, vebêjim û hesabê her tiştî bidim. Ez di vê mijarê de rehet im.”

Rêbertî; “tu behsa baweriyê dikî. Na, kes nabêje nêzîkbûnên te yên subjektîf hene. Lê binêre, ezê bêjim, di gotina vê de ti gumanên min tine ne. Hevalek te not nivîsandiye. Kesê ku hatiye jî bi tundî hişyar kiriye. Gotiye; “em şik ji Sakîne dibin. Dema hevdîtin bi dozger re dikir, min ew dît.” Ragihandina vê jî ji xwe re erk dibîne. Ji bona min ne pirsgirêk e. Dema tu bi xwe jî destpêkê hatî malê, te behs kir. Belê, te pir saftî jî got. Navê kesê ku tûnel eşkere kiriye dibêje. Wê jî bi dozgerê dewletê bawer kiriye. Niha berî her tiştî kesek PKK’yî naçe bi dozgerê Ddgeha Ewlekarî ya Dewletê (DGM) re hevdîtinê nake. Di heman demê de nizanim li xwaringehekê, li parkekê ev tişt nabin. Ma ev nayê wateya rûniştina bi dewletê re? Tu bi kîjan mejî ve hewl didî mijara tûnelê ji dozger hîn bibî?

Rêbertî ne-axivî. Lê hinek tiştan ji nû ve di serê min de lê didan. Ya rastî min her tişt ji Rêbertiyê re gotibû. Nixwe min hevdîtinek taybet bi dozger re nekiriye. Dozger, dozgerê dewletê bû. Min ew dizaniya. Lê ez jî PKK’yî bûm! Yên ku bi salan di zindana dewletê de em bûn. Li derdora me her tim dozger, polîs, leşker û karmendên wê saziyê hebûn. Em neçar bûn hevûdû muxatab bigirin. Lê di heman demê de em dijminên hev bûn. Ev jî pir vekirî bû.

Min got; “min beriya niha jî ji Rêbertiya partiyê re gotibû. Lê dixwazim dîsa bêjim. Di encamê de min hevdîtinek bi dozgerê dewletê re kir. Lê heta niha jî di vê astê de nehizirîbûm. Lê niha bi rast jî hejandinekê jiyan dikim. Ji ber ku min ferq kir tiştek cidî ye, lewma hejiyam. Min hinekê jî li gorî peywendiyên di nava zindanê de li mijarê nêrî. Dibe tiştek ku min ji destpêkê ve plan nekiribû. Di encama tesadûfekê de pêk hat. Lê dîsa jî diviya baldar nêz bûma. Dijmin dikare bikar bîne. Hevdîtinek di însiyatîfa min de pêk hatibû. Lê dîsa jî dikarin bê ku naveroka hevdîtina min binêrin û lêkolîn bikin, ji xwe re bikar bînin. Ez qet ji vê hêlê ve nehizirîm. Hevalê Gezgor li Amedê xebatek belgfilmekê dabû meşandin. Me jî di beşa em tê de bûn sererast dikir û derdixist derve. Beşek gelekî kêm derket, ya mayî jî di êrîşa 88’an a mezin de desteser kirin. Êrîşa piştî eşkerebûna tûnelê bû. Hemû nivîsên me û kovarên hatibûn derxistin desteser kirin. Dema ez derketim jî, Gezgor bi israr xwest ku, ez encama wan nivîsan bizanim. Xwestibû ez teqez wan peyda bikim. Vekirî bêjim, min jî pir dixwest wan nivîsan peyda bikim. Ji ber xebatek zêde berfireh bû. Di nîtelîkek hemû rewşa zindanê, pêvajoyên wê ji her hêlê ve hatîn jiyîn rave bike de bû. Min jî neyekser lêpirsî. Herî zêde jî min parêzer weke navbeykar bikar danî.

Dema ez çûyîm Amedê, min parêzerê me Fewzî û hevjna wî dîtin. Dozger jê re dibêje; “min Sakîne li kêleka te dît.” Ew jî dibeje; “rast e, weke hûn jî dizanin muwekîlê min e. Hinek karê wê heye. Hinek nivîsên ku ji qoxuşa wan hatine girtin hene. Ji bona wan bigire hatiye.” Ew jî dibêje; “bila were emê lê binêrin.” Heta dibêje ku; “em hêvîdarin planên wê yên kuştina me nîne û ji bona vê nehatiye.” Dijmin her tim ez weke

Sakîneya PKK'yî nas kirim. Wan pir cuda li min dinêriya û dihizirîn. Wan jî bawer nedikir ku ezê ji bona nivîsekê biçim cem wan. Gumanên wan ên ji bona planên cuda jî ji ber vê bûn. Dema Fewzî got, ez jî kêfxweş bûm. Min got; "te baş kiriye." Ya rastî ji ber ez li cem wan disekinim, ger em bi hev re werin dîtin dibe ku şaş were fêmkirin. Ji ber wê wisa dibêje. Ji ber dê yekser ew bi nivîsan ve eleqeder bibûna. Em bi hev re çûn Dadgeha Ewlekariya Dewletê. Em ketin hundirê odeya dozgerê DED'ê (DGM). Weke ku mirov li girtîgehê biçe îdareyê. Hem weke dîtbarî û hem ji bona kesên ku ez bi wan re hevdîtinê bikin, ji bona min ti wateya wan tine bû. Fewzî jî parêzer bû û her tim diçû. Heta demekê em bêdeng û sar rûniştin. Piştre min mijar anî ser nivîsan û destpê kir. Got; "ew nivîs sewqî Dozgeriya Komarê hatine kirin." Navê dozger jî da me. Ew jî dozgerê girtîgeha ye. Derbasî şûna wî bûye. Got; "we ez bi faşîzanî tewanbar dikirim. Bes ka binêrin ez sûrgûnê Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê (DGM) kirim." Diyar kir ku pîrika wî jî Kurd e. Got; "ez j ji demokratên kevin im." Tenê mabû bêje ku 'ez PKK'yî me!' Beriya niha di gertîgehê de jî dîmenek demokratbûnê dida nîşan. Di peywendiyên xwe de baldar nêz dibû. Di rastiya cureya dozgeriya Abdullah Kahirman de bû.

Mijar anî ser tûnelê. Got; "we her tim ji min re digot êşkencekar e. Min xwe têkil nekir. Jixwe dest werdanek me derbas dikir." Ji min re got; 'ez bawer im wê tu jî bireviya.' Diyar bû agahî girtibû. Min jî jê re got, 'ger agahî derneketibûya rast e.' got, 'tûnelek ecêb bû. We çawa wisa çêkir? Girtîgeh bi tûnelên xwe ve bi nav û deng e. Dibe ku hûn bawer nekin, lê bi rastî agahiya min tine bû. Tûnel hatiye dîtin, her tişt desteser kirine, lê ez tine bûm. Piştre hîn bûm, lewma

sûrgûn kirin. Hûn dizanin kî got, ne wisa. Ez bawerim Sakîne jî hatiye wî bikuje.' Min jî firsendek dît û pirsî, 'we lêpirsîna wan kir ne wisa? Kî û kî bûn?!'

Dema dozgerê din derket derve min dubare pirsî, 'ma kî bû mîsoger hûn dizanin?" Kêliyekê kêm mabû bêje. Pişt re got, 'serê min nexin belayê.' Min got, 'na, jixwe tiştên tên zanînin. Ez weke kes mereq dikim ku, kî ew tûnel eşkere kir. Esasî kî got? Bi vê gotinê tiştek nabe. Ti xeternakiya wê jî tine ye. Jixwe hûn jî ji xwe re dibêjin 'demokrat im.'qet nebe hûn dikarin ji aliyê exlaqî ve li dijî van nêzîkbûnan rawestin. Ewqas ked hat dayîn û yeke din îxanet li wê kedê kir. Vê pirsgirêkê weke ya PKK'ê, an jî ya dewletê nenirxînin.' Nerim bû û got, 'ger hûn bixwazin em dikarin li cihek din bi-axivin.' Min bersivand, 'li cem Fewzî dibe, parezerê min e. Ger destûrê bidin dibe.' Dozger got, 'nabe. Ger derve min li cem te bibînin, wê bêjin zilamê PKK'ê ye. Pişt re jî nediyare çi bikin. Em dikarin li xwaringehekê hev bibînin.' Destpêkê qane bû. Me li cihek dervî bajêr wext destnîşan kir. Lê cardin ji biryara xwe vegeriya.

Ev jî helwestek nerimbûnê bû. Ji bona min firsendek bû. Dema em li Amasya bûn, gotinên wisa ji bona Şener dihat kirin. Ya rastî pişt re diyar kirin gotinên vala ne û ser girtin. Lê dîsa jî tevgezariyek ava kir. Van gumanên min ez birim heta cem dozger, ku pê re bi-axivim. Li gorî min diviya teqez bihata zelalkirin. Ev gumana li dijî Şener, dibû sedem ku bi her gotinê re cardin min tengav bike. Ez evqasî xwedî li Şener derketibûm. Min ew parastibû. Xwe jê re kiribû mertal. Lewma pirsên, 'ger bi rastî jî kesayetek din be?' Serê min dêşand. Her

çendî ez nav lê nekim û encamek mîsoger xayîn e pejirînim jî, bandorên vê di asta hîs, texmîn û gumanan de berdewam dikirin.”

Her çendî ez van wisa bi hevûdû ve girêdayî rave nekim, min sedema ketina pey rastiya tûnelê dirêj û berfireh vekir.

Rêbertiyê asta hest û hezkirinê vekir. Got; “min jî jiyan kir. Ne eybe.” Ji ber nêzîkbûnên min zehmetiyan dijîm, fêm nakim, hêj ji aliyê xwe ve parastina pîrozbahiya hezkirin û duristbûnê, pirsgirêkên heyîn bi niyeta xwe şîrovekirin, hesasiyeta min a zêde, bertekên min ên li hember nêzîkbûnên ku cuda tên fêmkirin hemûyan, mijarê berfirehtir û cuda vedike û dinirxîne.

Bi gelemperî avaniya hevalan dev ji nîtelîk û hedefa provakasyonê berdabûn, nîqaş û rexneyên xwe di çarçoveya têkîliya bi min re pêş ketiye de dimeşandin. Dema ev jî çewtiyên bi min re dibûn yek, ez di nava wî zemînî de diketim nav pozîsyonek parastinê. Ango li şûna ku, li dijî êrîşa provakasyon li hember partiya me meşandî bi ramanek bingehîn ve rawestim, ji hêla objektîf ve eniyek cuda jî min vekiribû. Min got; “na, nêzîkbûna min hezkirin bû, hestên min durist bûn. Dibe ew bi xayîntî hizirîbe û planên wî hebin. Lê ger min ev ferq bikiran, jixwe min asta têkîliyek wisa pêş nedixist. Ji ber armanca nêzîkbûnên min cuda ne. Rast e, Şener dihat nîqaşkirin. Bes weke aliyên wî yên lewaz û qels dihatin nirxandin. Kesekî ti nirxandinek cuda nekir. Lewma hem ji bona evqas di nîqaşê de bû, tevî vê hem çalak bû, zêdetir bala min kişand. Ez neketim bin bandora wî. Berovajî vê ger bi rastî bikaranîn be, min hêza wî bikar anî. Ango jêhatî bû, em bi hev re di rêveberiyê de bûn. Di vir de wî jî rewşa min bikar anî. Ango ez di hinek rewşan de dibûm parazvana wî. Wî jî di vê mijarê de ez bikaranîm. Min hestên xwe nedan bikaranîn.”

Min di mijara hest û hezkirinê de tufan rakir. Di astekê de cewhera rexneyên Rêbertiyê fêm dikim. Ger hinekê di wê mijarê de bihizirim, ezê pirsgirêkê zûtir çareser bikim. Lê ji ber heval di asta namûsê ya teng û pirsgirêka exlaqî de fêm dikin, di vê çarçoveyê de rexneyan pêş dixin, bandor li min dike. Nikarim qebûl bikim. Ma çawa dibe ku werim xapandin? Mirov çawa dikare gotinekê, nîqaşekê û baldariyekê bixe şûna her tiştî? Min bi Şener re dest bi şoreşgeriyê nekir, heta dema ew îxanet bike ez jî pê re bikevim. Min têkîliyek di pîvanên ketîbûnê de pêş nexist. Wê demê çima rexneyên evqasî giran tên kirin û têm tewanbarkirin? Nexwe baweriya wan bi min tine ye. Ew qas heval di girtîgehê de hebûn. Her kes ji min zêdetir nêzî Şener bû. Dikarim bêjim ku, ya herî dûr ez bûm. Ev têkîlî kirina dewsa her tiştî mantiqek çawa bû? Ma Partî min nas nake? Min ti caran ji bona zilamekî, ji bona hest û hezkirinekê dev ji doza xwe berneda. Min di pêvajoyên xwe yên zaroktî de jî, têkîliyên ku bi doza min re nebûne yek, red kirine. Lez û bez ji wan qutbûm. Ger Şener îxanet kiribe, ev têkîlî jî xilas bûye. Niha jî ji bona min têkoşîn û zêdetir girêdana bi têkoşînê ve dimîne.

Tişta ez esas digirim ev e. Pirsgirêkên pê ve asê mayîm û min nekarî xwe ji xetimandina wan rizgar bikim ev bûn. Ez di astek wisa de li van asê mabûm, ne di ferqê de bûm ku, lîstokên pir xeter tên lîstin, ev lîstok di kesayeta min û me de li ser partiyê tên ferzkirin. Min nedikariya cîdî ji hev cuda bikim. Tevî ku her roj diketim ferqa hinek tiştan, lê bi pratîka ku min raber dikir re nedibû yek.

Di zindanê de herî zêde di salên 88 û pey wê re yekser pirsgirêkên giştî ve mijûl bûm û min rêveberî kir. Em heta wê demê her tim bi tenê û cuda bûn. Rewşa me giştî destnîşan nedikir. Em hem di nava bûyeran de bûn, lê di heman demê de dûrî wan bûn. Me nedizaniya bi gelemperî kar çawa tê meşandin û pêvajo çawa diborin? Me her tişt di çarçoveya xweseriya xwe de dinirxadn. Pênase dikirin.

Niha jî ji her hêlê ve polîtîkaya zindanê û rastiya zindanê dihat vekirin. Pratîka zindanê, bi gelemperî bandora wê ya bi Şerê me yê Rizgariya Netewî re derket pêş, xisletên qadê hemû ji nû ve dihatin nirxandin. Ji ber dijmin hemû polîtîkayên xwe di zindanê de ceribandibûn. Lewma hewce dikir mirov destpêkê baş guhdar bike û têbigihêje. Her çendî me zindan jiyan kiribe, dê herî rast partiyê binirxanda. Her dahûrînek Rêbertiyê, her nirxandinek wî, rexneyên wî aramiyek ava dikir. Lê min di van mijaran de jî dema hevpeyvînan de bêpîvaniyek mezin dida diyarkirin. Uslubek min a polemîk serwer e. Dixwazim her mijarê rave bikim, ziraviyan vekim, weke ku neçar im bersivê bidim di-axivim û nîqaş dikim. Ji bona yekê gotinek tê kirin, ez mafê axaftinê digirim û wê rewşê zelal dikim. Bûyerek tê vegotin, ez yekser ji cihê xwe radibim. Dibêjim; “na, ne wisa ye, weke dine. Divê zindan evqasî erzan neyên nirxandin û her kes li gorî nêrîna xwe şîrove neke.” Ez jî bi vî şêwazî xwe dikim berpirsyara her tiştî. Ev jî berpirsyariyek ku hêza min derbas dikir bû. Lewma min wisa xwe dida ber hemû rexneyên têkildarî giştî û yên ji bona min pêş diketin. Min bi wê niyeta baş hewl dida rastiya zindanê bi rasteqînî ji partiyê û hevalan re bêjim, min bi destên xwe berovajî dikir. Ji ber ez bi hestên xwe tevdigerim.

Hemû nêzîkbûnên min ên şaş û xirab têkil xaneya provakasyonê dibû. Girêdanên min bi vê mijarê re pir hêsan dihatin kirin. Rexneyên li ser vî esasî dibûn sedem ku helwestên min xirabtir derkevin pêş. Carna yan qet nedi-axivîm, min nedikariya bi-axivim. Di bin giranya wê de difetisîm. Bê taqet dimam. Carna jî bê ku wext û cihê wê hilbijêrim zêde tenê bi ziraviyan ve dimam.

Dema Rêbertî li akademiyê bûya, pir cuda dibû. Dahûrînên ku pêş diketin, dihişt ku kesayet xwe bixe nav lêpirsînê. Tevî hemû rexneyan bawerî û hêz pêş diket. Lê dema Rêbertî ne amadebûya bêbawerî, nêzîkbûnên tûj û bûyerên navendê tengev bikin zêde dihatin jiyîn.

Hevalên di rêveberiyê de ji nîqaşên di nava dersan de her bi pirsan her tişt birêve dibirin, ango dibûn rênas. Vê şêwaza rêvebirinê yekbûn ava nedikir, pirsgirêk çareser nedikir û tiştek nedida fêmkirin. Bi gelemperî pêşdarezînên ku hene, gur dikirin, mezin dikirin. Her vegotina me ya derbarê dersê de, bê ku binêrin rast e, an jî şaş e weke bandorên zindanê dihatin nirxandin. Em bi her tiştê xwe ve reformîst bûn, dijberê xetê bûn, kesayetên ku rehabîlîtasyonê qedandibûn! Nêrînên wan ev bûn. Ev pênase dibûn sedem kû ferdperestiyê zêde bilind bike. Nîqaşên me berovajî dibûn. Lewma nîqaşan armanca ku dixwest bidest nedixist. Dîsa di vê mijarê de raporên zêde subjektîf ji Rêbertiyê re dihatin şandin. Heta ev di nava platforman de jî çêdibûn. Nirxandinên weke; "Rêberê min, gurub ava kirine, li dijî Rêbertiya partiyê di-axivin. Di pirsgirêka jinê de wisa axivîn, çek wisa girtin, bi hevûdû re wisa geriyan…" dihatin kirin!

Rêya pêşîgirtina van a herî baş û rast avakirina pîvanên partiyê, bi wan tevgerîn û li gorî vê kargeriyê dana diyarkirin bû. Di vir de jî divê mirov jêhatî be. Lê ev bi me re tine ye. Ji ber em bi fêrbûnên salan, pîvanên partîbûna xwezayî ve, bê ku hesabê naverastê bikin, seresere, apolîtîk, li gorî xwe nêz dibûn. Ango me zemînek ji her cure şîroveyan re amade dikir. Jixwe rastiya me bixwe, bi şêwazî û dijberiyên partiyê ve dagirtîbûn.

Ez li akademiyê bûm. Di nava koma hevalan de bûm. Lê bi tenê bûm. Min xwe bi rêbazên xwe tenê dihişt. Xemgînî, girî û xwe li erdê dayîn jî ne çare bûn. Ji aliyekê ve min ji xwe re ev rewş qebûl nedikir. Ji ber rewşek zêde bêçare ye. Ji aliyê din ve jî li gorî hevalan teqez peywendiya min bi provakasyona, dewletê re heye, kesî na-ecibîne, li dijî rêveberiyan serî radike, li dijî Rêbertiyê serî radike û kesek armancên wê cuda bûm. Min dişopînin, heval didan pey min, axaftinên min didin gundarkirin, nêzîkbûnên min dişopînin. Ji cilên ez li ber xwe dikim, heta her tiştên min re li şopek provakasyonê digerin. Ez di komîsyona dersê de me. Hevalên min ên ku em bi hev re di heman komîsyonê de ne, mijarên ku min ji pirtûkên Rêbertiyê berhev kirine, weke gotinên ayîdê Şener nirxandin û bi min re nîqaş dikirin.

Ez di dersa Jin û Malbatê de di komîsyonê de bûm. Ez, Serhed, Şerîf û Meral di komîsyonê de ne. Me li ser bingeha dahûrînên Rêbertiyê amadekariyên xwe kirin. Pêşnûme derxist. Ji ber vê xebatê lêhûrbûnên min kûr kir, pir kêfxweş bûm. Di heman demê de bawerî jî pêş xist. Berpirsyariya mirov dest bide hevalan bi mirov re hişyarî, baldarî û tevdîran pêş dixe. Mirov zêdegaviyên xwe dibîne. Neçar dimîne ku xwe rêk û pêk

bike. Di vê manê de aramiyek hundirîn dijîm. Lewma baş dibînim ku min xwe bisînorkirinê ve çiqasî şaşî kiriye. Lê mixabin heval mijarên ku min ji ramanên Rêbertiyê berhev kirine re dibêjin; “tu nêrînên Şener ên derbarê jinê li ser hevalan ferz dikî.” Wisa hewl didan azweriya min bişkînin. Pişt re neçar dimam ku bi saetan bidim fêmkirin ku, ne wisa ye û min ji pirtûkê şanî wan dikir. Lê dîsa jî pirsgirêk çareser nedibû. Ji ber pirsgirêk ne ew bû tiştên ez dibêjim ayîdê kî ne. Ez rehet nîqaş dikim. Bêguman, bê ku bihizirim dê her tiştên min bi provakator ve girê bidin rehet di-axivim.

Di wê pêvajoyê de dersa Jin û Malbatê weke tabûyekê bû. Dema Rêbertiyê pirsgirêka jinê, pirsgirêka hezkirin û hestan vedikir digot; “ez zehmetiyê dijîm, hûn fêm nakin. Hûn weke qotiyek girtî ne. We pîvanên jin û zilamê kevneşop derbas nekirine. Ji ber hûn pirsgirêka heyî weke pirsgirêka siyaset, şer û jiyanê nanirxînin, hûn evqasî hov û paşketî nêz dibin. Li gorî we her tişt kirête. Hûn nizanin çi kirêt, çi bedew û mirov dikare çi bijî.” Rêbertiyê nêzîkbûnên me yên paşverû weke “çanda govê” pênase dikir.

Lewma hewce dikir zêde baldar nêz bibin. Tevî ku ders bû, dema mijar hinekê li ser jinê vedibû, mirov jî dixwest her alî ve li ser nîqaş bike, yekser hemû dest radibûn. Digotin; “ma ev mijar çima evqasî tê nîqaşkirin? Bila heval li ser şer nîqaş bike, ser tiştên din bi-axive. Ma dixwaze serê me tevlîhev bike?” Bi vî rengî axaftinên min dihatin qutkirin. Ango min nedikariya baş û hostatî vebêjim.

Lîstokvanên ecêb, cuda yên vê dersê jî hebûn. Ez li şûna pênaseyan, zêdetir bi tiştên hatine gotin, şîrove û bersivan re mijûl dibûm. Hewl didim yên “şaş hatine fêmkirin” sererast

bikim. Di vê wateyê de zêde nikarim karê lîstokvantiyê bilîzîm. Lê Selîm û Aysel rolek zêde sixte lîstibûn. Bi nakokiyên vala û bêbingeh ve, dilxwede çiqas encam ji têkîliyên xwe derxistine vedibêjin û ezmûnên (!) Xwe didan. Aysel tam weke sîtila pîrasêrê bû. Ji aliyê teşe ve jî weke pîresêran bû. Ji ber pîresêr rolê xwe zêde nepenî û balkêş bikin, xwe dixin cihê her cure şêweyên ecêb. Lê ew giyana Aysel a pîresêr di rûyê wê de diyar dibû. Aysela ku min pênc sal û nîvan ji ber nexweşiya wê qehra wê jiyan kiribû. Ji şûştina cilên wê, heta şûştina dest û rûyê wê, min ji Aysel re xizmet kiribû. Belê Aysela ku dema min bihîst şehîd ketiye ez giriyam, min bi navê wê pirtûkek nivîsandibû.

Ger Selîm dûrûtiyê neke, Aysel ew jî weke "şoreşger, milîtan, hevjîn û dergistî" îlan kiribû. Selîm jî dema şahadeta wê dibîhîse li ser helbest û nivîsan dinivisîne. Piştî agahiya şahadeta Aysel nameyek weke romanekê dinivisîne. Çiqas nakeve serê mirov.

Aysel jî di dersan de pir xwe diyar dike ku koleyek çawa ye, zewaca xwe ya bi Selîm re kîjan xelekên koletiyê rave dike, çiqasî rezîl e, ketiye, nizanim çiqas karên kirêt û gemar in pênase dike. Di heman demê de ev jî bi xwepêşandanek 'milîtanî' ve digot. Selîm jî, dide diyarkirin ku, Aysel pêvajo û wextê zêde şûnve dişopîne, hêza wê ya têgihiştina pirsgirêkan tine ye, têra fêmkirinê nake, paşverû û hov maye û wisa jî dilxwede aqil dida. Di heman demê de diyar dikir ku, têkîliya wan wisa nekirêt û gemar e û hewl dida 'namûsa' xwe xilas bike. Her wisa diyar dikir ku, nû Aysel nas dike. Ango rastiyek Aysel ya bi mirov bide gotin, " nexwe ez bi kerekî re zewicîme!" dîtibû.

Ev şovên di platformê de li hember hev dikin, nakokiyên şerên jinû zilamên kevneşop ji derdor, nas û dostan û malbatan re didin diyarkirin rave dikin. Lewma min bi van nêzîkbûnan ti caran bawer nekir.

Dema Aysel di girtîgehê de bû, hêza moralê ya vê têkîliyê bi pesindanek mezin ve pênase dikir û xilas nedikir. Me jî jê re li çepika dida. Me digot, ger evqas moral û hêz dide, temam e, nexwe zewacek bi hezkirina şoreşgerî ye. Lê mixabin dema Aysel derket derve hem ji xwe re çavkaniya moralê yeke din dîtibû, hem jî li çiyan, li xetên weke agir de, 'hêzek' ku heta bibe qatilê hevalên xwe bidest xistibû. Gelo ev jî harbûnek wan pêvajoyên jiyan kiribû? Ti hevsengiya wê nemabû. Birastî jî ti xisletên wê yên mirovahiyê nemabûn. Dema ez carekê bi Rêbertiyê re axivîm jî, min ev rastî jê re vegotin. Dema min got;

"Rêberê min ji mirovahiyê derketiye. Yek peyvê bi me re na-axive." Got; "ger şansê we hebûya, hûn liqayî rêveberiyek wisa re nedihatin. Ma em çi bikin. Dr. Baran, Serhed û Medya ne. Jixwe her yek ji wan li çiyê bûne cinawir. Gelek aliyên wan ên paşverû û hovane hene. Ev jî encamek ku, şêwaza şerê wan derxistiye holê ye. Ma ezê çi bikim? Temam, de êdî rûne û binivisîne.!" Min jî got;

"Ezê binivisînim Rêberê min."

Belê, dema Dr. Baran ji rêveberiyê derdiket ser berçavkê xwe re li derdor dinêriya, bi awirên xwe yên mirov aciz dikir ve dihat. Li ber şibakeyên qoxuşan, di konê xebatê de, li me guhdar dikir û dida guhdarkirin. Me ti caran ev nêzîkbûn hêjayî wî nedidît. Dîsa jî me jê re digot; "wisa nekin, ev ne

nêzîkbûnek hevalbendiyê ye." Wê min û Gezgor bi hev re xebatek bimeşanda. Li ser rastiya Rêbertiyê bû. Kapasîteya Gezgor hebû. Lêkolînvan û lêgerînvanek baş bû. Bi zewqek mezin dikir. Rêbertiyê got;

"Wê kî binivisîne? Ma hûn min fêm dikin? Ev hêza we heye?" Nirxandinên Geezgor ên felsefîk baş vedikir, hem aliyê ku xwe tê de dixapand çareser dikir, hem jî asta nirxandin û dahûrîna wî dewlemend dikir û vekirinek ava dikir. Ev berfirehiya bi Rêbertiyê re zêde bandor dikir. Berê de jî wisa bû, lê niha dewlemendiya wî zêdetir bû. Me digot; "qada wî ya bandorkirinê berfireh bûye, hêza wî ya avakirin, çareserkirin û encamkirinê bileztire." Apo'geriya Gezgor û Apo'geriya min di vê mijarê de dibû yek. Me digot; "xweziya her tişt wisa xweş bûya." Lê belê, hêj em tênegihiştibûn ew bedewî têkoşîn e, têkoşeriya heyî jî cuda ye, sebra wê, hêza wê ya qanekirinê û xisleta wê ya yekpare dike fêm nekiribû. Karên heyîn bi nêzîkbûnên rasterast, teng, li gorî niyetan, li gorî rastiyên giştî, tenê bi qinyatê û li gorî girêdanan nedihat meşandin. Me hevûdû dişikand. Me Apo'geriya xwe di şêwazek îsyankarî de dida der.

Lewma di vê mijarê de nivîsandin, lêhûrbûna me jî kûr dikir. Dibe ku hêj zû be, me hêj di nav wê debdebê de xwe nas nekiribû. Encamên ku derketibûn holê baş fêm nekiribûn. Lê dîsa jî, Gezgor xwe ji bona nivîsandinê endam dabû destnîşankirin. Di heman demê de zêde bi îdîa bû. Dema Rêbertiyê got; "cuda kî dikare binivisîne? Tu û yeke din bi hev re binivisînin. Ma Sara dikare?" Zamanî got; "dibe Rêberê min." Yekser erê kir!

Me di bin kon de dest bi xebatên derxistina pêşnûmeyê, berhevkirina pirtûkan kiribû. Zamanî zêde lez bû. Ew ji min, ez jî ji wî bêsebirtir bûm. Lê belê, hevalên di rêveberiyê de ‘venêrînek’ zêde ecêb dimeşandin. Ez hêj ne di ferqê de bûm. Dema Gezgor yek-du caran heman nêzîkbûn ferq kir, serê wî lê da! Min dît ji nişka ve hinek dûjîn kirin û axaftinên qet eleqeya xwe tine ye kirin. Ev jî bi dengê bilind dikir. Min destpêkê wate nedayê. Piştre min jî ferq kir ku, hinek derve tevdigerin.

Min dev ji wan berda û bi Gezgor re nîqaş kir; “ma tişta tu dikî kar e? Jixwe pêşdarezînek heye, tu jî bi wan axaftinên xwe yên xirab ve, agir zêdetir gur dikî. Te yekser dûjîn kir. Niha wê heval çawa fêm bikin? Ma dê nebêjin, ‘temam, jixwe wisa ne’ û bi-axivin.” Gezgor got; “min baş kir. Hevaltiya çi? Ma hevalbendiya PKK’ê wisa ye? Ma ev rêbazên kî ne û li dijî kî bikar tînin? Kesên nekarîne li hember leşkerên Tirk ên kêrî pênc quruşan nayên li ber xwe bidin, nikarin werin li vir min guhdar bikin. Ma ez xayînek im? Kes nikare li ser min venêrînê bike.” Nîqaşên me tam dijwar bûn. Min got; “ev xebat wisa nayê meşandin. Ez xwe paşve dikişînim.”

Min Gezgor rexne kir. Lê di wê kêliyê de tişta ku min kir, ji ya wî xirabtir bû. Ya rastî sedema ku min xwe bi ser Gezgor de aciz kir jî, heman pirsgirêk bû. Ez jî nikarim rakim. Dixwazim bi sebir, kamil, bawerî dayîn, dûrî nîqaş û pevçûnên lewaz kar bikim. Lê mixabin li şûna ku vî karî wisa bi encam bikim, ez hatibûm tehrîkan, dîsa bi hest û bertekên xwe tevgeriyabûm, şêwazê bê ku dest bi kar bikim qedandin jî, pirsgirêkên heyîn mayînde dikir.

Gelo çavkaniya pirsgirêkan çibû, hevalan xwe disparta çi, diviya têkoşînek çawa bihata meşandin? Bê ku vê baş fêm bikim, bi gotinên; "çima wisa dibe? Mafê kesî tine ye… Ma baweriya wan bi me tine ye?" Nêzîkbûn raberkirin, tenê bêbawerî zêde kûr dikir.

Xala baweriyê girîng bû. Min nirxandinên pêvajoya destpêkê bê ku bigihînim vê qonaxê dest digirt. Asta bandorbûnê jî cuda bû. Lê her ku min nêzîkbûnên bi vî rengî didît, ez ji qehran dimirim. Peyvên nerasterast jî mirov vekirî diperçiqandin. Birîndar dikir. Rojan di bin bandora wê de dimam. Çi bê gotin bila be, lê ez di mijara baweriyê de ti gotinê ranakim. Ma jiyana min a zindanê ne li holê bû? Wê demê çima hinek nêzîkbûnên şikbar dihatin avakirin? Her tişta di vê mijarê de dihat gotin, weke janek giran li ser dilê min disekinî. Hemû ramanên min di wê navendê de asê diman. Carê min dikariya ji bin bandora wê derkevim. Di pêvajoyên wan nîqaş û pevçûnan de zêde li ser van nedihizirîm. Ya rastî her çendî bê rêbaz jî bim, di nava şerekê de me. Ez mîsoger nakevim nava rewşên weke bêdeng, bi xwe re mayîn û gumanên ferdî. Ti caran giyanek wisa najîm. Lê dema nîqaş û nirxandin di heman mijarê de dihatin dubarekirin, tiştên ku qet eleqeya xwe tine ne, hêjayî min dihatin dîtin, min nedikarî hêza tehemulê raber bikim.

Belê, wê demê hizirîm ku 'harakîrî (di nav Japonan de bi kêrê qelaştina zik û xwe pê kuştin)' bikim. Dibe ku, ez ji hêla teknîkî ve nehizirîm ku wê Harakîrî çawa be, ezê çawa bikim. Lê min dizaniya ku, tiştên Harakîrî dide kirin çibûn, pêkhatina wê dihat çi wateyê, hest û ramanên wê bi min re gihabûn qonaxek wisa, min digot; "ezê mîsoger bikim." Heta min di

raporek ji Rêbertiyê re nivîsandî de jî hinek pêşketinên heyîn nivîsandibû. Min rexneyên xwe jî nivîsandibûn. Piştre jî gotibû; “di encamê de tenê Harakîrî dimîne bikim.” Min vekirî got ku, êdî nikarim rakim.

Ya rastî vê jî asta bandora pirsgirêkan destnîşan dikir. Min jî xwe di encamên derketin holê de didît. Çi dibe bila be, divê ez xwe neyînim vê rewşê. Lê min digot; “Madem vê têkîliyê ji vê re rê vekir, min di vê mijarê de şaşî kir, wê demê ezê cezayê wê jî di serî de bidim xwe.

Dema ez ji zindanê derketîm, ez çi hizirîbûm, min xeyalê çi kiribû û niha jî çi dihat jiyîn. Ez di nava hevalên xwe de tenêbûnê û biyanîbûnê dijîm. Di heman demê de niha min rewşek ku peywendiya min bi provakator re heye ya tewanbar dijiya. Kesê nas dikir, nas nedikir, bûyerê dizane, nizane, her kes di-axive, tiştina dibêje, navan li min dikin. Xwedêyo, min çawa xwe anî vê asta ku êdî ez jî xwe nas nakim? Qaşo yên ji zindanê derketibûn, ên herî baş ez nas dikirim bûn. Lê mixabin, gelek ji wan tiştên ku qet nehatine bihîstin û nehatine gotin dibêjin. Rexneyên herî tûj dikin. Kesayetên herî lewaz û qelsî jiya ne, niha xwe berxwedêrên herî mezin didin diyarkirin. Her kes her tiştî didarezîne! Kesên ku di hundir de lîberal mane, lihev kirine, prisgirêkên cur be cur jiyane, pirsgirêkên wan bi Şener re çêbûne, hêrs û kîna xwe bi serê min de diteqînin û her kesî berê xwe daye min.

Tişta ecêb jî, kesên wisa di jiyana asayî de cuda ne, di platform, ders, ango nêvengên fermî de helwestên cuda raber dikin. Evqasî erş û ezman bi gumanên wan ên kesane hesiyane! Bêguman di vir de rola nefêmkirina pirsgirêkan zêde ye. Lê hemû jî diçûn nêzîkbûnên zêdetir neyênî. Di encamê de her

tiştê dihat şikandin û tinekirin, dibûn êş û kederên hevbeş ên hevaltiyê. Hêz û enerjiya me ji bona şikandina bandora provakasyonê û li dijî wî şerek dijwar bimeşîne nedihat bikaranîn. Me li hember hev dida meşandin. Tişta herî zêde êş dida jiyîn jî ev bû.

Li hember van hemûyan nêzîkbûna min jî weke ya li hember derve, li hember xwe jî serdeçûnek bêpîvan derdiket holê. Weke ku tolê ji xwe bigirim, bi ser xwe de diçûm. Pirsa; "ma min ji vê encamê re rê vekir", ez çawa dikarim dem dirêj pirsgirêkên heyîn çareser bikim, nêzîkbûnên xwe yên rojane çawa dikarim rast bikim, ez çawa dikarim xalên hevbeş ên hevgihînê bibînim de lêhûrbûnên min bandor dikir.

Ma ez dikarim serdeçûna kes a bi vî rengî bêpîvan û giyana wê çawa vebêjim? Berî her tiştî mirov di nav êş û bêçaretiyê de dinale. Mirov hewl dide jê derkeve, lê mixabin nikare. Nejêhatiye. Hest, bertek, hêrs, acizbûn û hwd hemû di îsyanê de ne. Dema bi ser rewşa giyana bi înad, bêhedar, lezgîn ve, seresertî û tengbûn jî zêde dibe û bi wan re dibe yek, bê ku mirov di ferqê de be, şaşî ser şaşiyê dike. Ji ber bêrêbaziyên ku derdikevin, li cihê qet hewce nake de, bertek tev li mirov vedigerin. Mirov vê ferq dike û hêj bandora wê neşikandiye, bêrêbaziyek nû xwe dide der. An jî mirov tehrîk dibe, li hember şaşiyan, şaş tevdigere. Vê carê jî mirov dibêje; "ma berê jî wisa bû? Ma di zindanê de jî wisa dihat kirin? Her wiha mirov gelek tiştan tîne berhev û dikeve nav lêgerînan. Lê belê, çareseriya pirsgirêkê jî mirov bi xwe ye. Şoreşgerî û PKK'yîbûn jî tam di vê xalê de pir girîng derdikeve pêş. Ev jî di vir de bi bûyîna hêza çareseriyê ve diyar dibe.

Dema ez nikarim tevlîheviya pirsgirêkê çareser bikim, hêrsa heyî bi xwe de diteqînim. Li xwe vedigerim wê rewşa di nav êşan de dinale dixim. Lewma her tim ev liberketin û giriyên min cuda dihatin şîrovekirin. Wer dihizirîn, ez îsyan dikim ku dibêjim; "hezkirina min çû, cîhana min xirab bû."

NA! Bi hezarê caran na! Tam di vê mijarê de ji bona wisa dihat hizirîn û şîroveyên erzan dihatin kirin, min xwe dixwar. Ma cîhana min li ser vê têkîliyê nehatibû sazkirin. Min bi vê têkîliyê dest bi şoreşgeriyê nekir. Min ti caran, bi ti rêbazî ev têkîli neda pêşiya doza xwe. Min digot, ma çawa dikarin wisa şîrove bikin û feryadên min bilind dibûn. Lewma min gelek caran digot; "hûn min fêm nakin."

Dema hezkirin ber bi cihek rast ve neçe, hezkirin hevgihîna xwe ya bi dozê re pêk neyîne, ti nirxa wê tine ye. Min jî yeqîn dikir ku, dê vê hevgihînê pêk bîne. Min ew têkîlî di nava yekbûna jiyana xwe de girt dest û min bawer kir ku, dê hêz bide têkoşîna min. Ger ev hezkirin ber bi evîna min a têkoşîna mezin ve neherike, ez ti caran ji wê re nabêjim têkîlî, hezkirin û evîn e. Ez pê bawer bûm ku bi qasî ezê bikarim wê jêkim, bavêjim bibiryar û înatkar im. Wisa jî nêz bûm. Bi qasî ezê li hezkirin, nizanim têkîliya kesê ku îxanet li partiyê kiriye bigerim û bikevim bin bandora wî, ji rastiya xwe dûr neketime. Min aqilê xwe nexwaribû. Herî kêm min dizaniya ku, kesek wisa îxanet li partiyê kiriye, di heman demê de îxanet li hezkirina min jî kiriye. Di vê mijarê de jî hişê min li serê min bû. Min dil, mejî û wijdana xwe nedabû, wê îxanetê.

Min di pêvajoyek dijwar a bi hezaran lîstokên dijmin li ser me dihat lîstin de jiyan kiribû. Min nedikariya kesayeta xwe ya li wir cuda û li vir jî cuda bidim diyarkirin. Min xwe xapandin,

şaşî , lewazî û kêmasiyên cidî jiyan dikir. Van tevan jî di wê nêvengê de zerar didan û xeter bûn. Gelek mijarên ku mirov gerim dike, gur dike, har dike hene, lê ya min jî TÊKOŞÎNA min a mezin ku, ezê di rêya wê de her tiştî bidim ber xwe, pê ve girêdayî me, bawer kiriye, li ber serê min bi dehan îxanet derkevin jî, qetiyen nikarin min ji rêya min dûr bixin, a bêhempa heye. Qinyata bi vê mîsoger mirov li ser piyan dihêle. Berî her tiştî ez li navenda partiyê bûm. Hêza min têrê nedikir ku, ez şêwazê Rêbertiyê bi temamî fêm bikim û têbigihêjim. Lê Rêbertiyê hêzek mezin da min, aliyên min ên bi min re jiyan dikin, zindîne girt û rakir. Ti têkîliya evîn, hezkirin û evîdariyê û hêza îxanetê nedikariya wî.

Ez mat mabûm, bêtevdîr bûm, kûraniya heyî negirtibû û min nedikariya hostatiya vê lîstokê vala derbixim bigirim. Ev hemû hebûn, lê min kesayeta xwe bi qasî vê têkîliyê bidim her tiştî winda nekiribû. Ez weke tiştek ji rêzê jî li vê têkîliyê nanêrim. Jixwe ji ber min her tim bersiva hevalan dida, ji bona şîroveyên weke, ji ber pirsgirêkek ajoyî ya erzan, an jî ji ber demek dirêj di zindanê de maye, di bin bandora hestiyariya xwe de ber bi Şener ve çûye re rastî rave dikirin, hinekê jî min xwe şaş da nasîn û fêmkirin. Nêzîkbûnek weke ez zêde bi ferdperestî li pey tiştên ayîdê min e û ji dest min çûye ketime, weke kesayetek ketîme dana raberkirin, bi min re bertekên mezin ava dikir. Heta hinek kesan tiştên dervî rastiyan, ên weke nizanim odeyên taybet hatine avakirin û gotinên wisa nepixandî belav kiribûn. Dijmin cesaret nedikir, min di vê astê de binirxîne. Tam parazvantiya namûsa feodalî li pêş e. An bertekên wê bûn, an jî gotinên bi niyetên xirab û bizanebûn dihatin berovajîkirin bûn. Tevî ku min ti caran qebûl nedikir,

yek rastî hebû, rastiyek ku, tevî hemû niyetên min ên baş pêş ketibû. Hest û hezkirinên min zêde girîngî dida û zêde watedar didît, hevgihîna xwe bi provakatorekê re pêk anîbû! Şener jî ev aliyê min ji xwe re kiribû sipartekek. Ji ber aliyê min ê herî lewaz û bê tevdîr bû.

Ya rastî tevlîheviya pêvajoyê û nakokiyên heyîn ji neçarî bûn. Ji ber em di naverastek şer de bûn. Dibe ku, şêwaza şerek ku kes pê cesaret nake di astekê de dihat meşandin. Jixwe em ên ku tevlê jî dibûn, her kes mat mabû. Tevî gelek kêmasî, nebesî, bêrêbazî û nêzîkbûnên li dijî partiyê yên cîdî hebûn, tiştên ku dihatin jiyîn jî di rastiyê de pirsgirêka peşketin û yekbûnê bû. Hem yek bi yek ji bona kesan, hem jî ji bona pêvajoya giştî û têkoşîna me ya giştî şert û mercên girîng ên pêngavî, yekbûn û nûbûnê ava dikir. Di heman demê de ezmûnên dihatin nasîn û zemînê yekbûna wan ava dibû.

Wê pirsgirêkên me yên partîbûnê, li gora rewşa xweseriya her qadê çawa bihatan çareserkirin? Bi taybet di kesayeta me de dahûrandina zindanê, encamên wan ji zindanê re ragihandin, li wir jî avakirina pêvajoyên ku tên xwestin û hedefkirina vê, vala derxistina gelek lîstokên dijmin bû. Êdî dijmin dixwest polîtîkaya bi salan di zindanan de meşandiye, ji eniya xwe ve temam bike. An jî dixwest partiya me bi vê eniyê, bikaranîna vî zemînî ve bixe nav tengezariyê û zehmetiyan. Bi kurtasî dixwest hemû zemînên ku provakator xwe bispêrinê bikar bîne.

Belê, hestên min li xwe vegeriyabûn, ji aliyê herî zêde jiyan dike ve, li min xistibûn. Provakator jî xwe sipartibû vî aliyê min û deriyek vekiribû. Asta bandorbûnê ya di van mijaran de jî dihat zanîn. Di pêşxistin û şikandina vê têkîliyê de, herî zêde bû şahidê min ez çiqasî mijûl kirime, min enerjiya

xwe çawa ji bona wî xerc kiriye, bi êşên wî ve çawa nalîme, yek jê jî Şener bû. Aliyê min ê girêdanê û hestên xwe bêpîvan dana pêş jî dîtibû. Ango ez baş nas dikirim. Gelek caran dîtibû ku min gotiye "çima wisa bû?" Û bi mehan serê xwe pê êşandiye, xwe jî pê re tine kiriye. Dîsa dizaniya ku ev têkîlî di nava me de çawa tên nirxandin, nêrîna giştî çiye, bertekên li dijî vê çine û partî di van mijaran de çiqasî zehmetiyan dijî.

Her wiha tiştek din jî dizaniya û jê bawer bû: çi dibe bila be, bila min 'çavkorî' jê hez jî kiribe, ez ti caran doza xwe nafiroşim. Ev rastî jî baş dizaniya. Baş dizaniya ku ezê di kêmasiyek herî biçûk de vê têkîliyê bigirim û bavêjim û di vê mijarê de jî zêde bêrehmim. Kesê herî zêde jî çavdêriya vê jî kirî ew bû. Dikariya min û partiyê mijûl bike. Texmîn dikir ku, wê hinek xisletên min, bi navend, partî û Rêbertiyê re rû bi rû bîne û li benda vê bû. Lê weke ku, min gotî; tiştek rast digot hebû: ez APO'yî bûm, Sakîneya wî bûm, wî xwe di nava giyan, dil, mejî û şaneyên min de bicih kiribû. Ji ber ku dijmin jî ev baş dizaniya, pir bi plan ji vî alî ve êrîşî min kiribû. Ji bona demek dirêj şik li ser min hebin û di nîqaşê de bimînim, hedefa ku dabû pêş xwe di radeyek girîng de jî biser xistibû.

Gelek caran min bi êş û şewat digot; "xweziya hevalên min jî bi qasî dijminê min bizaniyan, ezê ti caran doza xwe ji bona têkîliyekê nefiroşim." Lê mixabin, bi qasî ezê vê jî bihizirim di nav tengezariyê de bûm. Lê derdê min ne ew bû ku hestên wisa ber bi îxanetê ve çûye, an jî ji aliyê provakator ve hatiye bikaranîn bû. Her kesî texmîn dikir ku, dê ev rewş heta dawiya jiyana min bandor li min bike. Ji ber ku di name, rojnivîsên min de hest, xeyal û xewnên min jî hebûn. Hemû xisletên min vekirî di wan nivîsande diyar dibûn. Lê mixabin, ew nivîs tev ketibûn destên dijmin.

Ango dijmin ji rêzê, bêplan û bêhesab bi ser min de nedihat. Ne êrîşek jir rêzê bû. Ji her alî ve nebe jî, min ev rastî fêm dikir. Min her tim hewl dida bêjim û bidim fêmkirin; "dijmin bi zanebûn dike, bizanebûn ez hilbijartim, di propagandeyan de navê min bikar anîn û xîtabê Karasu kirin ne tesadûfî ye." Lê min nedikariya naveroka van dagirim û baş rave bikim. Gelek caran jî min digot; "ma ezê çi bêjim, çi girîngiya xwe heye?" Min jî xwe di wê mijarê de sînordar dikir. Dema carê nîqaşan ez tehrîk dikirim, min digot; "dijmin bizanebûn li ser navê min spekûlasyona dike. Qet nebe hûn vê tiştê nekin û nebêjin. Jixwe dijmin jî dixwaze şik û gumanan ava bike." Gelek caran min bi qîr û hewar hewl dida vê bêjim, lê qêrîn û hawarên min jî, bi min re diman. Min nedikariya bigihînim kesî. Tiştên ku min dida der jî zêdetir, bertek û acizbûnên ku êşên min dabûn avakirin bûn. Ew jî encama ji mantiq dûrketinê bû. Tişta herî xirab jî, min hêrsên xwe bi ser xwe de diteqandin. Min jî hal bi xwe re nedihişt.

Rêbertiyê di hevdîtinek xwe de, pir baş behsa min ji min re kir. Ez pênase kirim. Her du destên xwe li kêlekê de vekirin û got; "aha, tu singa xwe wisa vedikî û dibêjî, 'de li min bixin û min bikujin.' Lewma her kes tîrên xwe davêje te û tu jî di nava gola xwînê de dimînî. Pişt re jî tu destên xwe dibî ser çavên xwe, diferikînî û dibêjî, 'ma ev hevalên min çima wisa li min dikin' û digirî. Wisa nabe! De ka binêre, min jî gelek pêvajoyên zehmet jiyan kirin. Hinek caran giriyam jî. Lê min nehişt kes bibîne. Min zanî ku hestên xwe bi xwe re bihêlim. Siyaset hest û mestan guhdar nake. Wê tu êdî bi aqil tevbigerî. Her tiştî li her naverastê nede der. Pişt re jî nêbeje, 'çima wisa bû, çima felankesê/î ev tişt got.' Ev ne rêbazên siyasetmedarek aqilmendin."

Belê, min heman wisa dikir. Li gorî min ziraviya her tiştî vekirin, ketina nava hemû bûyeran û vegotinek durist, wê pirsgirêkan çareser bike. Ez wisa nêz dibûm. Şêweyek bû, uslubek bû, xisletek li gorî xwe înatkar û muhafazakar dihat jiyîn. Siyaset bi vî, bi van nedihat meşandin. Rêxistin vi, bi van nedihat avakirin. Min jî nedikariya xwe bi van birêxistn bikim.

Ez di navenda hevalên xwe bûm. Ez di navenda partiyê ya girîng de bûm. Hewce nedikir hirde-wirde biparêzim, xwe bi vî alî, an jî wî alî ve girê bidim. Ev nêzîkbûn ti pirsgirêkê jî çareser nake. Jixwe ne rêbazek parastinê ya rast bû. Ji ber rastî û pîvanên rêxistinê hebûn. Ger carê hewce nekê ku, mirov her tiştî bi wan binirxîne, bê ku mirov yek gotinê jî bêje bizane bêdeng raweste ya herî rast e. Tişta ku tê hevîkirin jî ev e. Nexwe tiştên din di serî de mirov pê xwe tengav dikin, ber bi şaşî û xwe xapandinên mezin ve dibe.

Dema yekê ji bona Karasu, an jî yeke din digot, berî her kesî ez li dijî derdiketim. Weke ku hewce dike têkildarî zindanê ez daxwiyaniya her tiştî bidim û pêwîst e rastiyan bêjim, min weke ku peywireke fêm dikir û hedara min nedihat. Helwestên min ên di vê mijarê de zêde bûn. Tam pêvajoyek ku provakatoran nameyek bi navê me nivîsandibû. Ji ber bangawaziya wî Karasu hatibû rexnekirin. Dîsa nêzîkbûnên ji pêvajoya HEP'ê re (Partiya Kedê ya Gel) hatine nîqaşkirin û di vê mijarê de jî rexne pêş ketine. Di kêliyek wisa de dema yek rabû got; "Rêberê min, Karasu ji bona xwe dibêje, 'ez Apo'yê girtîgehê me' û axivî", ez zêde tehrîk bûm. Ez jî yekser rabûm ser xwe, min parastin kir. Min got; "ne wisa ye Rêberê min. Rast nabêje. Ew bi xwe di tecrîdê de bû. Bi bertek di-axive. Dibe ku her kes wisa bêje û wê şaşiyê bike. Lê belê, Karasu

dilnizme û bi Rêbertiyê ve girêdayî ye. Qetiyen wê gotinê bikar nayîne. Rast e, ew rêberê me yê ji bermahiyê berxwedaniya girtîgehê yê jiyan dikir bû. Ev jî bi jiyana xwe ava kir. Bandorek wî wisa ya giyanwerî heye. Jixwe Şener jî lewma bi zanebûn navê wî bikar tîne…"

Ev şêwaza min a dibêje; "kes nikare gotinekê ji Karasu re bêje, mafê xwe tine ye" ji aliyê objektîf ve jî dida fêmkirin ku, ez ji Rêbertiyê re jî dibêjim; "hûn nikarin rexne bikin." Lewma ne zehmet bû ku min weke parazvana şaşî û kêmasiyên Karasu jî îlan bikin. Ev şêwaza min bû her carê jî bi min dida windakirin. Rast e, her çendî aliyên xwe yên mafdar hebe, mirov bi vî rengî hinek kesan li hember rêxistinê diparêze. Ev jî rewşek nebaş e.

Gelo tişta bihata parastin çi bû? Tiştên ku mirov xwedî lê derketan çibûn? Ma diyardeyên ku berjewendiya şerê me esas bigire, ne vekirî bûn? Ew jî ne ayîdê kesan bûn. An jî kes nirxên partiyê bûn. Lewma hewce nedikir mirov aliyên ayîdê partiyê ne biparêze. Dibe ku hemû jî bertekek li dijî nêzîkbûn û gotinên ku her tiştî bi şaşî û kêmasiyan ve rave dike, digire dest û tine dihesibîne bûn. Lê ne helwestek rast a rêxistinî bû.

Her ku nîtelîka provakasyonê derdiket holê, her hedefên wî dihat fêmkirin, asta min a xwe lêpirsînê jî dihat guhertin. Her çendî di hinek nirxandin, pênase û rexneyan de qane nebim jî, bi gumana ku berjewendiyên rêxistinê esas bigirim, min jî biyar û helwestên hevbeş pêk danîn. Lê di nava jiyanê de rojane û kêlî bi kêl yekbûnek rast avakirin, aliyên cihê û cuda yên di nava jiyanê de derbaskirin gelek girîng bûn. Di pêkanîna kargeriya giştî û karên rojane yên pratîkî de, ti pirsgirêk derneketin. Na, her tişt zewq dida min û min hemû jî bi hezkirinek mezin dikir.

Asta moralê min di peywendiyên min de diyar dibe. Halê xwe yê şikestî nikarim derbas bikim. Di hundirê xwe de dihelim. Tehemula min tine kes bi navê Sakîne bangî min bike. Ji ber Sakînebûna min PKK'bûna min bû. APO'geriya min bû. Min bûyer û encam, ji rewşa xwe ya heyî cuda dinirxand. Dema min digot; "ez Sara me, ne Sakîne ne me", min xwe dikir du beş. Lê ev jî çiqas bi rasteqînî bû? Min ji xwe re kiribû mijareke gururê.

Belê gurura min a şoreşgerî şikestibû, birîndar bibû û sî daketibû ser. Ez bawerim ti şoreşger vê ji bona xwe qebûl nake. Lê min jî şaş dikir. Ji bona min jî ne zehmet bû ez, di mijarên şikestî, hincirî, perçiqî û heta xwestin qirêj bikin de, wan mijarên neyênî berovajî bikim û bibim xwediya rewşek zêdetir bi onur û watedar. Dema mirov zêde xwe dike nava xirabiyan de, her tim wan derdixe pêş, êdî mirov firsend nabîne wan veguherîne erêniyan. Ew firsendên heyîn jî ji dest mirov diçin. Weke Rêbertiyê jî gotî, ger mirov hinekê bi aqil be, hinekê hewl bide fêm bike û bi hinek sebrê ve, mirov dikare pir zû hemûyan berovajî bike. Lê vekirî bû min zêde ji xwe re dikir derd û kul. Min hêza xwe di wir de tine dikir.

Rêbertiyê yekem car di astek cuda de û berfireh pirsgirêka jinê vedikir. Xisleta têkîliya xwe ya bi Kesîrê re, bi wê têkîliyê çi hatin avakirin, bidestxistin, çawa bi sebir şer kiriye, avakirina rêxistinê, bi ewlekirina wê û heta hostaniya şoreşgerî ya ji nû ve avakirina jinê tev vegot.

Her dahûrînek Rêbertiyê di mijarekê de mirov dihejand. Dahûrînek di vê nîtelîkê de, di heman demê de dîroka partiyê bû. Dîroka têkoşîna me bû. Rastiya Rêbertiyê gelekî cuda bû. Me rastiya Rêbertiyê bi hinek pênaseyên giştî ve şîrove dikir.

Me diyarkeriya wî ya di şoreşa me de jî, bi hinek diyardeyên berbiçav ve rave dikir. Lê ew zêde giştî û kêm diman. Kêlî bi kêlî şêwazê şer, di heman kêliyê de alternatîfa her tiştî avakirin, serwerbûna li ser jiyan û pêşketinan, bi hesabê hemû tiştên ku rû bidin ve her cure tevdîr girtin, bi xwe jî di nava wê liv û tevgerê de cihgirtin, çalakiya wê pêk anîn gelekî girîng bû. Êdî mirov baş dizaniya ku, pêngavên bi cesaret, saxlem, xwe dispêrin hizirandinek rast, plansaziyek guncav û teqez hêza pêkanê.

Mijarên ku hêj di sala 77'an di de derbarê têkîliyên xwe û Kesîrê de gotîn tê bîra min. Digot; "malbatek Kemalîst e. Tişta herî girîng mirov hevkariyê bi destên jinê bişkîne. Em dikarin bi şoreşgerî û welatparêzkirina keça wan ve, tolê bigirin. Ev jî ne şaş e. Rast e, gelek tişt tên gotin. Ev jî me neçarî tevdîran dikin. Ez têkîliyên kole ferz nakim."

Rêbertiyê got; "Ne eybe. Hestên me jî hebûn. Lê min hestên xwe veguhertin siyasetek balkêş. Min kir amûrek şer ê balkêş. Lê min şer jî di serî de bi xwe re kir. Ya miqabilî min jî rêbereke. Ger rast bikar bîne, dikare bibe rêberek jin. Lê wê çav berdaye Kurdistanê. Kesayeta wê bi temamî her tiştê Kemalîzmê ve hatiye terbiyekirin, plankirin û bernamekirin… Pirsgirêk ne ew e, sîxûr e an na. Destpêkê xwest min ji hêla zilamê Kurd ê kevnar ve bişkîne. Min diceribîne ka ez jî wisa me an na. Bes, na ev rastî bi min re nedît. Mat ma. Weke bêje, 'ev çi Kurd e? Ev çi zilam e? Ev çi rêbere e? Dixwestin min bi mal, jin û pereyan ve girê bidin. Dixwestin ez çalakiyek ne di wextê de, zû bikim. Tim digotin; "em bikujin." An jî "em malê bigirin û rêk û pêk bikin.

Yên me yek jî ne di ferqê de ne ku, ez van karan çawa demşînim. Cuma û Pîrê me her carê ji bona Fatmayê digotin, ‘em vê jinê bikujin.’ Lê min bi salan hem dijmin xapand. Hem jî gav bi gav rêxistin ava kir. Ez nebûm esîrê hestên xwe. Min ew ne firotin. Niha divê mirov vê baş fêm bike. Ez nabêjim hestên te xirab in, an jî ketî ne. An jî tu bi niyetek xirab têkil van karan bûyî. Lê bizane yê miqabilî cinawir e! KT tol radike. Lê tu vê fêm nakî. Min rê neda keçên KT û xilas kir. Hem jî ne bi rêbazên wisa Cuma wan digot.

KT jî, keçek PKK’ê ya li ber xwe dayî hedef girt. Şener jî bi lîstoka xwe ve ev kir. Tu di dewsa Fatmayê de girtîn û bikaranîn. Hest û girêdanên te bê pîvan in. Tu ne polîtîk î. Zilam weke gura ye, tiştên wî yên wisa hezkirin û meskirn jî tine ye. Derew e, tam biketîbûnek mezin dilîst. Li vir gelek keç weke kuçikan girê dabû. Me tu jî wisa girê nedabû? Dema te bihîst tu îske îsk giriyayî. Belê, girîngiya siyasetê jî di vir de derdikeve holê. Hezkirin, lîstokek siyasetê ye. Lîstoka şer e. Divê tu li vir fêm bikî ku, wî provakatorî çawa bi hestên te lîstiye. Ez vekirî bêjim, ew gotinên weke, ‘hezkirina min, evîna min’ tev ketîbûne? Ka ew hezkirin û ew hest çûn kuderê? Ma tu hêj ji wan re dibêjî hezkirine?”

Ez bi rojan li ser van mijaran hizirîm. Lîstoka KT a tolhildanê. Lîstoka tolhildanê ya hatiye berevajîkirin. Hest û ramanên min di mengeneyekê de dizivirin û disekinin. Serê min lê dide. Ango her tişt ji serî ve hatibû plankirin. Ez di vê planê de hatibûm bikaranîn. Aqilê min nagire. Temam, heta cihekê gelek kêmasî, şaşî û lewaziyên min bikar aniye. Ji xwe bawer kiribû û wisa pêk anîbû. Ez ji xwe re kiribûm zirhek mezin. Min jî ev fêm dikir. Wî hestên min û xisletên min ên

girêdayî vê mijarê nas kiribûn. Lê ev pişt re derketin holê. Ger min wê demê bi qasî misqalekê jî fêm bikira, ma min dihişt wisa bibe? Ma min çawa dikariya kesek li pey tolhildanê ye hez bikim?

Ez di vir de ketim tengezariyê. Dahûrînên ku Rêbertiyê pêş xistin, hemû şîrove, pêvajoyek dirêj, polîtîkayên dijmin, çawa pêk aniye, çi bikaraniye, her rewş û bûyerên ku rû bidin rave dikir. Rêbertiyê di heman demê de digot; "min jî salekê li cem xwe xwedî kir û girt. Min her tim bi çavê zilamê duyem lê nêrî. Ez jî xapandim." Ez jî hewl didim şêwaza dahûrînên Rêbertiyê, girêdanên wan ên bi hev re û encamên ku hatine bidestxistin fêm bikim. Her ku min ev rastî guhdar dikir, min paşvekişandin, nêzîkbûnên teng û dihincirîne yên asta nîqaşên di navbera me de baş derdiket holê û min jî baştir didît.

Min Di Çepera Xwe De, Li Xwe Dida…

Salvegera 15’ê Tebaxê ye. Min yekem car bû girseyek ewqas qelebalix wisa ji nêz ve zindî didît. Ez di Newroza 91’ê merasîma bi navê HEP’ê hatî lidarxistin de jî, wisa bandor bûm. Girseyek ji bîst hezarî zêdetir li eywana werzîşê ya Abdî Îpekçî civiyabû. Ew bêdengiya ku Cuntayê demek dirêj ava kiribû, vê girseyê xirab kiribû. Her çendî ne di asta kamil û dihat xwestin de be, zêde bandorker bû.

Me di kasetên vîdeo de hinek tiştên heman weke wan temaşe kiribûn. Lê belê zindî jiyîn watedar bû, kelecanek bi me re ava dikir. Mirovên me bi kal û pîr, ciwan û zarokên xwe yên di pêçekê de, bi rêk û pêk, di nava hêviyekê de hatibûn. Dê wê rojê Rêbertiyê bi-axiviya. Rojek balkêş bû. Jiyan, hêvî, daxwaz û girêdanên gelê Kurdistanê hatibûn guhertin. Şoreş jî ev bû.

Rastiya Rêbertiyê jî ev bû. Hêz û hewldana bi gel re evqas guhertin ava kirî, cardin ji vê girêdan û baweriya gel hêz digirt. Rêbertî bibû çavkaniya jiyanek hêza her tim ava dike, bi wê re ji nû ve mezin dibe, dewlemend dibe û dev jê nayê berdan. Dema min ev di kêfxweşiya gel de jî didît, ji serî heta binî bandor li min dikir. Ev gel hêjayî serkeftinên herî mezin bû û nedûrî dîtina vê jî bû. Ew sal jî bin vê baweriyê pêş ketibûn. Înada min zêde bû. Min digot ezê bibînim û min dît jî. Gelo nêzîkbûnek zêde ferdperest bû. Her tiştên ku min digot; "ezê mîsoger bibînim" yek bi yek pêk dihat. Min Rêbertî dît, nîv bi nîv Kurdistan dît û min azweriya gelê me ya ber bi azadiyê ve dimeşe dît. Niha biçim çiyayên me, ez bigihim wê gêrîlatiya min gelek caran xeyala wê kiriye, weke ku dijiyam heza wê hîs dikir. Her tişt temam bû."

Xebatên amadekariya Konferansa Berxwedaniya Zindanê ya di konê Şehîd Hesen de dihat kirin, ber bi xilasbûnê ve diçû. Wê Konferans fermî destpê bike. Wê piştî pîrozbahiyên 15'ê Tebaxê destpê bike. Em jî wê rojê hatina gel pêşwazî dikin. Lê pişt re em jî ji bona temamkirina xebatan derbasî kon bûn. Rêbertiyê ferman da; "navberê bidin xebatê, bikevin nava gel." Em jî çûn. Her der tije mirov in. Heval jî di konan, li cihên ku hatine destnîşankirin de gel pêşwazî dikin û eleqeder dibin. Bi jinan re jî, herî zêde hevalên jin eleqeder dibin.

Ew jî qada em lê dimînin cih digirin. Piranî hevalên jin ên di dewrê de cih digirin, hevalên ji Rojava ne. Min jî bi gel didin nasîn. Dibêjin; "Sakîne Cansiz e." Êdî hinde em hevûdû hemêz dikin, ez ji hal ketim û westiyam. Her kesê ku tê hemêz dike û radimûse. Tişta herî xirab jî mirov bi zimanê Kurdî nezane. Ji bilî çend peyvan tiştekê nizanim. Ev jî dibe sedem

ku ez zêde nekarim hevpeyvîn û peywendiyê pêş bixim. Ji bona Kurdî jî nizanim her kes aciz dibe, rexne dike û bertek raber dikin. Dibêjin; "ma wisa dibe? Evqas sal e tu di nava partiyê de yî, ma çawa tu bi Kurdî nizanî? Em dixwazin bi te re bi-axivin." Ez jî pir şerim dikim. Ji ber nikarim peywendiyê pêş bixim, ez jî ji xwe aciz dibim. Min jî tengav dike. Hinek neçar dimînin ku, wergerînin. Lê ti xwezaya axaftina bi navbeynkaran re tine ye. Ne ez tiştên ku dixwazim dikarim bêjim, ne jî yên miqabilî min baş fêm dikin. Her çendî ez bêjim; "tenê zaravayê dimilkî dizanim" jî, tiştekê çareser nake. Ger kesek Dimilkî bizane hebe jî, ez nikarim wê jî serbixim. Ji ber ez ne axivî me, min a heyî jî jibîr kiriye.

Dema me hevûdû hemêz dikir, keçek ciwan tiştek kir destê min de. Min destpêkê mereq kir ku çiye. Min got qey gel e, dibe ku şekirek kiribe destê min, an jî xelatek dabe. Dema min lê nêrî, dişibiya notekê. Pişt re min baş li wê keçê temaşe kir. Min baş li xeml û şemala wê nêrî. Ev ne tiştek asayî, bû. Gelo ev keçik kî bû? Divê beriya ku bibe şevreş li notê binêrim. Gelo ez yekser biçim rêveberiyê, li wir jî şewq hebû, min dikariya baştir bixwînim. Pişt re çûm cihê çapemeniyê, min li wir xwend. Not li ser qaxidek biçûk hatiye nivîsandin. Bi gotina "Sakîne" destpê kiriye. Min li binê nivîsê nêrî, îmzeya "Şener" hebû. Min li şêwazê nivîsê nêrî, hinekê dişibiyê. Min got na, nabe! Heta demekê wisa di destê mi de sekinî mam.

Ew keç kî bû, çi bû, ne hevalek bû û ne welatparêz jî bû. Ji ber heman weke malbatan di girtîgehê de bi çi şêwazî not didan me, wê jî wisa kiribû. Dema em hemêz kirin û ramûsandin yekser ji cihekê derdixistin û dixistin destên me de. Bi hostane dikirin. Ji bona dijmin jî nebîne gelek fêlbazî dihatin kirin. Ji

ber şik dibirin li ser me digeriyan. Vê keçê jî wisa dîzîve dabû min. Kiribû destê min de. Hinek tişt bi Kurdî jî got. Lê min fêm nekir. Min not xwend. Notek biçûk e dibêje:

"Ez dizanim derheqê min de gelek tiştên cuda hatine gotin. Lê ne weke hatiye gotine. Dê wext jî vê diyar bike. Ez neçûm cihekê. Li Kurdistanê me. Min çi gotibe, vekirî got. Hinek kesan cihê xwe li serê rêxistinê çêkiriye. Wê tu jî bibînî ku rêxistin anîne çi rewşê. Ez nabêjim heq bide min. Ez dizanim ku tu tişta min kiriye jî qebûl nakî. Lê qet nebe, hewl bide min fêm bike. Piştî wê tu çi dibêjî bêje. Ezê têkoşîna xwe berdewam bikim. Çavên te radimûsim. Şener."

Hewa zêde ne sar e. Lê direcifim. Qirika min ziwa dibe. Di wê kêliyê de ser û çavên min weke agir dişewitîn. Ger ne tarîbûya, dê her tişt di rûyê min de diyar bibûya. Lamên min weke agir in. Weke tiştek pir asayî ye nivîsandiye. Çiqas rehet e. Lê tenê tişta min dizaniya, Şener min baş nas dike. Helwesta min a li dijî rev û îxanetek wisa ji her kesî baştir dizane. Ji ber di nîqaşek herî biçûk de, dema nêrînên me ji hev cudabûna, min tufan radikir. Ti hêceta rev û îxanetê tine ye. Nabe jî. Gelo hinek kesên din not nivîsandiye? Min cardin li şêwaza nivîsê nêrî.

Gelo dibe ku bixwaze peywendiyê çêke. Gelo dibe poşman bibe? Dizane ku ezê notek wisa mîsoger bixim rojevê. Lewma ma dibe ku bi riya min bixwaze vegera xwe cardin bixe rojevê? Min kêliyekê dev ji naveroka nivîsê berda, ser wî hizirîm. Pişt re min xwe komî ser hev kir. Min got na! Ev bangawaziyek ji bona min bû. Ji ber dibêje; "wê tu jî pişt re fêm bikî." Hêcet ji reva xwe re dîtiye. Îxaneta xwe jî weke domandina têkoşînê rave dike. Dibêje, "hinek kesan xwe kirine xwediyê rêxistinê."

Ma ew kî ne? Pir vekiriye ku hedefa wî Rêbertî ye. Di nivîsek xwe de gotibû Plehanov. Lê dema gotî xwe jî dixe dewsa Lenîn. Bi zanebûn nav nade. Weke din rast e, pirsgirêkên me hebûn. Lê weke ku wî xwestiye çareser bike de, kesî rê nedaye, astengî hatine avakirin. Ango dilxwede mijûl bûye, lê çareser nekiriye û bêçare maye! Diyar e, dixwaze îxaneta xwe giranbiha bike!

Tişta min destpêkê hîs kir; "ev min nas dike. Çima xwest notek wisa binivisîne? Ji ber ev zêdetir wî dide dest." Dîsa jî bi giranî li ser îhtîmalên din rawestiyam. Ev bangawaziyeik îxanetê bû. Her çendî ez li ser kîjan îhtîmalê bihizirim bila be, di encamê de ji bilî vê pênaseyê tiştek nedihat bîra min.

Ez qet ne li bendê bûm. Min xwest notê bigihînim Rêbertiyê. Dixwazim ez bi xwe bidim. Guncav nabînim ku, di heman kêliyê de rewşê ji rêveberiyê re vekim. Ji ber dê cardin komek spekûlasyona ava bikin. Ma kî dizane dê çi bêjin û nebêjin? Min got wan lezgîn dixwazim bi Rêbertiyê re hevdîtinê bikim. Mat man, gotin; "ma çibû?" Min jî got; "karê min heye." Ji min re gotin; "her cara tê xwestin em nikarin bi Rêbertiyê re hevdîtinê bidin pêkanîn. Dibe ku karên wî hebe." Dixwestin tengezariyekê ava bikin. Min jî got notê ji Rêbertiyê re ragihînin. Ez hizirîm ku ger notê bixwîne, dibe ku bangî min jî bike. Herî dawî wisa jî pêk hat. Piştî demekê Rêbertiyê bangî min kir. Me hev dît. Rêbertî weke her car li ser piyan dihat û diçû. Her tim di nava liv û tevgerê de ye. Got;

"Sakîne, te çi ji vê notê fêm kir? Ev zilam bela xwe ji xwe venake. Bi kî re şandiye?" Min jî got; Rêberê min, dema keçek ciwan ez hemêz kirim, kir destê min. Ez jî bi wî şêwazê dana wê aciz bûm. Lewma min jî baş li wê keçê temaşe kir. Ez

dikarim nas bikim. Weke din jî naveroka notê, Rêberê min, Şener min baş nas dike. Herî kêm baş texmîn dike ku, ezê vê revê çawa binirxînim. Lewma dibe ku nivîsandina vê notê bi serê xwe lîstokek be. Bi zanebûn dixwaze min bixe nîqaşê. Dibe ku gumanek gelo girêdanek maye an na, bide avakirin. Ya duyem jî, bangawaziyeke. Ji reva xwe re hêceta ava dike, dixwaze bide bawerkirin ku, neheqî lê hatiye kirin. Dixwaze ez jî li ser vî bingehî xwedî lê derkevim. Lê dîsa jî îhtîmalek mezin, naveroka vê bangawaziyek sînsî ye. Ger tiştekê jî neke, dixwaze serê her kesî tevlîhev bike. Baş dizane ku ezê vê rewşê bixim rojevê û nîqaş bikim. Nêzîkbûnên min ên rasterast, xisleta min a nîqaşkirinê, bêsebriya min nas dike û dizane ku ez bi hest û bertekên xwe tevdigerim. Rêberê min, dibe ku dixwaze van bikar bîne. Li ser navê min û Karasu lîstokan dike. Me her duyan jî baş nas dike. Tevî ku em her du jî li cihên cuda bûn, me bangawaziya vegerê li Şener kiribû. Em yekser xwedî lê derketin. Ev jî şêwazê nêzîkbûnekê bû. Wî jî di girtîgehê de ev nêzîkbûna me zêde bikaranî. Bi salan ev xisleta Karasu bikar aniye. Di pêvajoya dawî de jî ya min bikar tîne. Di heman demê de dixwaze me bi vî rengî bixe rojevê û bihincirîne. Hewl dide me û partiyê rû bi rû bîne."

Mijara esasî ya Rêbertiyê jî rexne dikir, ev xal bû. Lewma gelek caran digot, "hûn bikaranîn." Ez zêde bandor bûm. Rexneyek pir giran û pir zehmet bû. Min nedikariya qebûl bikim. Ma Şener çawa dikare min bikar bîne? Ew peyva "bikaranînê" weke fîşekê bû. Peyvek bi lenet bû. Ma ez çawa xwe didim bikaranîn? Belê, gurura min di vê mijarê de îsyan dike. Na, min xwe neda bikaranîn. Dibe ku wî xwestibe bikar bîne, dibe ku plana vê jî çêkiribe. Lê îradeya min hebû, aqilê min hebû. Min ewqas jî aqilê xwe winda nekiribû.

Min herî zêde di vê mijarê de zehmetî dijiya. Bertek raber dikir û înad digirt. Lewma ez hewl didim di vê hevdîtinê de jî vebêjim. Min got; "Rêberê min, bi zanebûn min dikin hedef." Lê min nekarî berdewamiya wê bînim û temam bikim. Dijmin bi zanebûn min wisa dixe rojevê û dixwaze cuda bide diyarkirin. Dixwaze ji vir encam bigire. Ji rojnivîs û nameyên min ez nas kirime. Dizane ku ezê ji bandor bibim. Gotinek bes e ku, derheqê min de bêje. Ji ber ez dikarim demek dirêj ji xwe re bikim derd û kul. Ez xwe bi xwe dihincirînim.

Aliyê esasî jî ev e. Lê dixwaze di mijara têkîliya bi Şener re min bişkîne. Girêdanek bi hestan re di nav hev de, pêvajoyek xebatê hatiye jiyîn. Ji xwe peywendiyên min ên rêxistinî yên bi hevalan re, bi hestiyariyek kûr pêş diketin. Lewma têkîliyek wisa hestan zêdetir girê dide. Ger di vê girêdanê de hevsengî û pîvan tine be, ev têkilhev bibin, zehmet e ku mirov şaşî û rastiyan ji hev cihê bike, xalên bingehîn bi xetên mîsoger ve ji hev cuda bike û di vê mijarê de şerek bihêz bide. Yeqîn dikim ku, dijmin dizaniya ezê di vî şerî de zehmetiyê bijîm, ezê her carê vegerim li xwe bidim, ezê têkoşîna xwe ya bêrêbaz li hember hevalan, partî û Rêbertiyê bimeşînim.

Dema Rêbertiyê ji min re digot, bersivekê binivisîne, destpêkê aciz dibûm. Min digot, ez nikarim û ezê tengav bikim. Lê berjewendiya rêxistinê li holê bû. Rêbertî naxwaze Şener ji qada Rojava derkeve. Ji bona wî li qada Rojava bigire, dibe ku bandora tiştên min binivîsandan hebe. Got; "hinekê bi uslubek asayî û guncav binivisîne. Tu dikarî bêjî ku bandor bûme. Nizanim ezê piştî vê dewrê ji bo xebatan bimeşînim derbasî Rojava bibim. Emê bikarin li wir derfetê hevdîtinê bibînin. Ango divê bawer bike ku hûnê hevûdû bibînin. Tu dikarî wê hêviyê bidî. Ger bawer bike baş e!"

Piştî Rêbertî axavî, demekê bêdeng mam. Min nekarî tiştekê bêjim. Piştre min got; “temam Rêberê min. Çawa guncav tê dîtin, ezê wisa bikim.” Ez derketim. Min wê şevê notek nivîsand. Lê dikim, nakim nikarim destpê bikim. Pênûs di destê min de ye. Demek dirêj wisa sekinîm. Êş dide min. Ev jî ji bona sûdmendiya partiyê bikaranînek bû. Lê dîsa jî ji hêla exlaqî ve nikarim qebûl bikim. Ez dixwazim rasterast jê re bêjim; “ te îxanet kir! Tu revî! Tu nikarî xwe veşêrî. Min niha tu baş nas kirî…” Weke din jî dixwazim çi tê ber devê min bêjim. Ma ezê niha bertek û helwestên xwe bi şêweyek cuda çawa diyar bikim û binivisînim? Min nedikariya bibim Sakîneyek din. Ger vê bikar bîne? Bêje; “ev e Sakîne not şandiye” û biweşîne. Ez nikarim rakim. Ez giriyam.

Ez nikarim rewşa di navê de dijîm qebûl bikim. Ez çawa ketim nava evqas pirsgirêkên cidî? Weke geravekê ye. Ez ji hêlekê ve hinek henase digirim. Rêbertî hewl dide aram û hedar bim. Kêm jî be rehet dibim. Hewl didim baweriya li hember xwe winda nekim. Lê belê, ji aliyê din ve jî şer berdewam dike! Êrîş di kêliyên ku qet hêvî nakim de pêş dikevin. Weke ku di nav de dixeniqim.

Baş bû Rêbertî li akademiyê bû. Nexwe dê min şaşiyek din bikira. Ger kesek ji rêveberiyê ji min re bigota notek wisa binivisîne, dê min mîsoger weke lîstokekê binirxanda. Ya Rêbertiyê jî lîstok bû. Lê mirov berjewendiya partiyê didît. Di kêliyekê de gelek tişt bi hev re dihizirî û wisa lîstok ava dikir. Dihişt ku mirov bi xwe re, yê miqabilî xwe re bikeve nava şerek rast û li ser bingeha armancên xwe çeper bigire. Weke din jî li ser mirov dima. Ger mirov bikare çepera xwe rast

bigire, dê mirov bikare şer bimeşîne û şansê serkeftinê jî bidest bixe. Lê mixabin, min pirî caran di çepera xwe de, li xwe dida.

Min bi navê Mehmet xîtap kir. Navê Şener di nava me de bikar danî. Min her tim bi wî navî xîtap dikir. Ez di nîqaşek me ya berê de bandor bibûm û heta demekê min navê Şener bikar ne anî. Min jê re gotibû; "tu Mehmet î." Ango min di vir de wateyek bi ser navê Şener ve zêde kiribû. Min di serê notê de bi hevokekê ev got; "te ti nirxa ku min dayî Şener nezanî. Lewma min bikar ne anî." Tê zanîn ku, pirsgirêkên hundirê partiyê çawa tên çereserkirin û bi kîjan rêbazan tên destgirtin. Lê te rêyek din hilbijart. Ji vê re jî hêcetan rêz dikî. Ti caran hêcetek vê ya mafdar nabe. Dibe ku li gorî te hinek tişt şaş bin. Te dikariya tu wan qebûl nekî. Lê hewce nake ku ji bona te wateya li şûna ku tu van pirsgirêkan bi rêbazên partiyê çareser bikî, ji nav rêxistinê birevî bêjim. Ez zêde pê bandor bûm. Ez jî nîqaş dikim. Pevçûnên min ên bi nêvenga me re hene. Heta baweriya xwe bi min jî nayînin. Ez vê jî hîs dikim. Lê ez di wê baweriyê de me ku, dê ev jî bi demê re çareser bibin.

"Ez vê dewrê li vir im. Rêbertiyê got, wê dewreya bê de min bişîne xebatê. Ezê hem hînî ziman bibim, hem jî xebatê di nava gel de baş e. Dê ji bona min jî baş be. Dibe ku derbasî Cizîrê, ango Qamişlo bibim. Îhtîmalek mezin wisa ye. Dê wê demê derfetên me yên hevdîtinê çêbin. Ez hêvîdar im wê tu nêzîkbûnek cudatir nekî. Silav Sakîne."

Ji bona bixwîne min not bir ji Rêbertiyê re. Got; "hewce nake." Tevî wê min naveroka wê ji Rêbertiyê re vegot, got; "temam." Lê ez dîsa jî nerehet bûm. Min xwest beşekê ji ber derxim. Bila weke belge li cem min bimîne. Ger sibe dusbe rewşek cuda derkeve holê, ez êdî nikarim rakim. Her der

qelebalixe. Gelek kes li min digerin û dixwazin bi min re bi-axivin. Min heta cihekê nivîsand. Piştre bê ku xilas bikim, neçar mam rabûm. Dema kesên ku ji Rojava hatine dixwazin bi min re bi-axivin, xof dikeve dilê min. Bê dilê xwe hevdîtinê bi wan re dikim. Ger ez vekirî bêjim, hinekê jî nerehet im û hedara min nayê. Kêliyekê du ciwan hatin cem min. Gotin ku dixwazin bi min re bi-axivin. Cihek bêdeng geriyan û rawestiyan. Min bi hêceta ku Kurdî nizanim ew mijûl kirin. Min got; "bila hevalek din were da ku, axaftinên me wergerîne." Gotin; "hewce nake, emê ji hev fêm bikin." Min tevî vê qebûl nekir. Piştre li ber çavên min winda bûn. Heta ku min hevalek anî, ew çûbûn. Vê jî guman bi min re ava kir. Piştre min ew dîtin, axaftinek pir ji rêzê û asayî kirin. Diyar kirin ku min ji berxwedaniya zindanê nas dikin. Nivîsên min ên di kovaran de xwendine. Lewma mereq kirine. Gelek kesên weke van li min digeriyan û dipirsîn.

Roja paştir li keçika ku not dayî min geriyam. Ya rastî ez ketin nava jinan de lê geriyam. Min jî hewl da ku, were min bibîne û bi-axive. Hat, min not dayê. Got; "ger tu dixwazî, ez dikarim telefonê bidim te." Min numareya telefonê girt. Lê pirsek pir ecêb ji min kir. Got; "ma tu cixareyê dikişînî?" Wê nedizaniya ku ez cixarê dikişînim an na. Vekirîbû, Şener xwestibû ku pirs bike. Min piştî sala 84'an cixare berda. Min ji bilî roja tunel eşkerebûyî, cixare nekêşa. Ji ber bandora tunelê zêde li ser min çêbû. Min tiştên gelekî bi êş bihîstin. Lê yek ji wan jî bandor li min nekir ku, ez cixareyê bikişînim. Ya min biryardariyek bû û ez lewaz neketim. Tiştek girîng bû ku, Şener dixwest hîn bibe ez cixarê dikişînim an na. Min çiqasî li ber xwe dabû! Ji nû ve kêşana cixareyê di wateya xirabkirina

biryarekê, binkeftinek, kêliya qelsiyekê, bêçaretî, reşbîniyekê û hwd bû. Ji her şîroveyê re vekirîbû. Lê min ew cixare nekêşa. Belê, min heta wê kêliyê jî karî xwe ku nekêşim. İsrara min a di vê mijarê de baş bû.

Nexwe tevî her tiştî min dev ji xwe bernedabû. Dibe ku weke mijarên pir ji rêzê were dîtin, lê cihek jê ya ku kesayet dikare baş biceribîne jî cixare ye. Ger dikare girêdana bi cixareyê ve bişkîne, kes dikare xwe ji wê fêrbûnê xilas bike, ev ê giyanek erênî ava bike. Dê bandor li ser nêzîkbûnên mirov ên din jî bike. An jî wê mirov weke encama wan xwe bigihîne biryara pratîkek erênî. Lewma min ew pirsa derbarê cixareyê de paşguh nekir. Li ser hizirîm. Min got; "na, ezê nekevim. Ji ber ez ne bêçare me." Her çendî min hewl da xwe qane jî bikim, bûyerên ku rû didan, bandor li min dikir.

Lê ez vê tenê weke helwestekê nanirxînim. Li dijî Şener şêwazek şer dihat meşandin. Her çendî not pir diyarker nebe jî, dê rolek girîng bilîsta. Ji hêlekê ve partiyê neyekser, an jî yekser venêrîn dikir. Ji ber li qada em lê bûn zemînê vê hebû. Lewma mîsoger ferqkirina van mijaran, pirsgirêk ji qonaxên teng û ferdî derxistinê de, bi helwesta rêxistinê ya giştî ve di nava yekbûnê de çareserkirin, pêşiya guman û hincirînên ne dicih de jî digirt. Ger şaş jî bûya, dê bibûya malê rêxistinê. Mirov dikariya li hember encamên şaş û rast jî berpirsyariyek hevbeş bersiv bide. Nexwe weke din kesayet bi tena serê xwe hest û niyetên pir xweş jî bijî, zêde ti encamê nagire.

Di navberekê de gotin; "dikare hevdîtinek telefonê were kirin." Diyar kirin ku ez dikarim bi hevalê Kanî re biçim Barlîes'ê. Lê pişt re devjê berdan.

Pîrozbahiyên 15’ê Tebaxê guhertinek ava kir. Gel bi gurubên sedan kesî ve berê xwe dide konê Konferansê. Em jî bi axaftinên kin ve armancên Konferansa Berxwedaniya Zindanê, nîtelîka provakasyona heyî ji wan re vedibêjin. Dîsa weke her carê Rêbertî dixwaze şert û mercên heyîn baş binirxîne. Me jî bi vê mebestê dide lêhûrkirin. Di heman demê de dihêle ku em jî li hember gel muhasebeyek rast bikin. Hewl dida pêvajo baştir were fêmkirin û were dahûrandin, da ku çareser bibe.

Înadek ku mirov nikare bi kesayeta xwe re bişkîne, li hember gel, çalakiyek pratîk û girêdanekê ava dike, dikare bişkîne. Mirov dikare berpirsyar, bitevdîr, bipîvan û bê ku ferdperestiyê bijî, bi xwe re pêşketinek erênî pêk bîne.

Civînên di bin kon de bandor li gel jî kiribûn. Weke din jî ji ber Kurdî jî nedihat zanîn wê jî zehmetiyek ava kir. Bi rêya wergervanan xîtabê gel kirin, di cîhanê de karê herî zehmet e. Ji ber min nedikariya hest û ramanên xwe yekser parve bikim, gelekî xemgîn dibûm. Jixwe gel jî rexneyên xwe yên derbarê vê mijarê de yekser kir. Ji me re gotin; “ger we bizaniya hûn Kurdî bi-axivin wê baştir ba.” Her gurubê heman tişt digot. Bi taybet ji gelê me yê Rojava re di mijara zindanê de gelek propagande hatibû kirin. Bi salan di kovar û xebatên xwe de behsa zindanê kirine. Bandorbûnek heye. Baldarî û rêzgirtinek xwezayî heye. Lê belê, ji ber provakasyona dawî, asta vê bandorê jî hatibû guhertin. Zindan kirine sermiyan û hatiye bikaranîn. Navê şehîdan hatiye bikaranîn. Nêzîkbûnên gel ên hestiyar, teng û seresere ji xwe re kirine gavên bi xwe ve dana girêdanê. Di vir de jî xwestine girêdanek ecêb ava bikin.

Tiştek ecêb bû. Her kesî destpêkê pirsa Mazlum û pişt re jî ya Şener dikir. Pirsa berxwedanî, kesayet û xisletên Mazlum

dikirin. Pişt re jî pirsên; “Şener di girtîgehê de çawa bû? Çima derket?” Dihatin kirin. Diyar bû, Şener, navê Mazlum zêde bikaranîbû. Di heman demê de zêde bi sixtekarî kiribû! Ji ber di helbesta ji bona min nivîsandî de jî gotibû; “min weke ji Mazlum hez kirî, ji te hez kir.” Kesek weke Mazlum heznekiribû. Tenê ji min di wê astê de hez kiribû! Belê, niha jî ew îxaneta di bin sixtekariyek mezin de, lîstoka siyasî ancex wisa dibe û pêk tê.

Belê, erka herî girîng jî, rûyê rastî yê îxanetê baş fêmkirin û ji gel re vegotin bû. Tevlîhevî û giraniya nakokiyan, teqez rola guhertinê derdixist holê. Qanuna jiyanê ya diyalektîk, sedem û encamên bûyerên ku rû dane ji niyetên kesan serbixwe, balkêş derdixist holê. Dema kesayetê jî ev qanuna çareseriyê bi xwe re rast zelal û rave dikir, tevlîheviya heyî derbas dikir. Nexwe ji bilî vê nedikariya xwe rizgar bike.

Her ku nîtelîka provakasyona heyî derdiket holê, hedefên wan dihat fêmkirin, asta min a xwe lêpirsînê jî, hinek dihat guhertin. Her çendî ez di van nirxandin û rexneyan de qane nebim jî, min berjewendiya rêxistinê esas digirt. Bes ya girîng jî yekbûna rojane rast pêk anîn, cudabûnên di nava jiyanê de derbaskirin û asta têgihiştinê kirina meriyetê bû. Ya rastî ez bi aheng tevlî kargeriya giştî û sazûmaniya pratîka rojana dibûm. Di vir de ti pirsgirêk tine bû. Min tev jî bi hezkirinek mezin dikir. Ji ber her tiştê vir zewq dida min. Lê belê, asta moralê min, bi kûranî nîqaşkirina pirsgirêkan, xwe gihandina encamên bihêz, bidestxistina pîvanên wê yên polîtîk de, nebesiyên min ên cidî û xwe xapandinek hebû.

Di heman demê de xebatên Konferansa Berxwedaniya Zindanê, bi serê xwe berpirsyariyek mezin dabû min. Min jî giraniya wê hîs dikir. Min dixwest hêzdarî bi encam bibe. Ji vê hêlê ve lêhûrbûnek jî hebû, me xebatek amadekariya çil rojan zêdetir meşand. Rêbertî jî her tim di derbarê xebatê de perspektîfan dide. Dahûrîn, hevpeyvîn û nîqaşan pêş dixe. Cardin em jî di navbera xwe de nîqaşên gelekî bêrêbaz dikin. Hemû pêvajoyan ber çavan re derbas dikin. Polîtîkaya me ya berxwedaniya zindanê çibû? Me çiqasî nûnertiya wê kir? Asta naveroka çalakiyan çawa bû? Nêrîna me ya li hember derve çawa bû? Em jî di hemû mijaran de lêpirsîna xwe dikin. Me raporên hem derbarê gişti, hem jî takekesî nivîsandine. Em rapora gişti ya ji bona Konferansê û pêşnûmeya biryaran li ser bingeha dabeşkirina kar dinivisînin. Aliyên me yên di van mijaran de bi hev re şer dikin, baş derdikevin holê.

Bi taybet nêrînên ji hev cuda li ser bingeha pêvajoyan nirxandina çalakiyan, dîsa nîtelîka gurubên ku ava bûne, encamên ku ava kirine û mijarên din de derdikevin holê. Ez jî di pênaseyên xwe yên derbarê bûyera Fuat Çavgun û bandora ku ava kiriye de bi israr im. Min got; "binyata me ya rêxistinî çi dibe bila be, bûyera Fuat darbeyek rêxistinî bû." Di radeyek wisa de bû, demek dirêj binyata me ya zindanê mijûl kir û kir nava zehmetiyan.

Fuat, hewl da xwe di pêvajoya Konferansê de jî veşêre. Derdor ji bona xwe eyar dikir. Ev jî pir vekirî bû. Ne pêvajoya di hundir de jiyan kirî, ne jî pêvajoya piştî derketî jiyan kirî rast şîrove nedikir. Durist nêz nedibû. Dema Rêbertiyê, armanca êrîşa Şener a li dijî berxwedaniya Hilwan-Sîwerekê û çawa xwestiye avaniyê ji bona xwe bikar bîne dinirxand, ji xwe re

firsendek dît û hewl da xwe pak bide diyarkirin. Ji ber min jî bi israr rexneyên xwe berdewam dikir, bal hemû hatibû ser me. Ew jî ji bona rexneyên min vala derbixe, zêde êrîş dikir. Dida diyarkirin ku, dilxwede ez çiqas Şenerperestiyê dikim. Ev jî binre binre dikir. Pêşdarezîn û bertekên heyîn gur dikir û dixwest wan bikar bîne.

Di rapora xwe ya rexnedanê de, xwe kiribû navenda her tiştî. Ji şahadeta hevalê Xelîl Çavgun, heta seqetiya xwe ya fîzîkî, her tişt bikar anîbû. Xwe weke xwediyê PKK'ê yê herî rast, yên din jî weke dijberê partşyê îlan dikir. Rewş pir dirû destnîşan dikir. Nexweşiya xwe ya fîzîkî dida pêş, xwe belengaz dida nîşan û wisa li pêşiya rexneyan digirt. Lê Rêbertî jî di ferqa rewşa heyî de bû. Dixwest her tiştî baş fêm bike. Ji ber rewşa tenduristî û moral berçav digirt, nedixwest ku zêde bi ser de biçe. Lê belê, Rêbertiyê nirxandinên wî yên di rapora rexnedanê de, nêzîkbûnên wî yên ji wî re, rexne kir. Jixwe bê ku wext serve biçe, rastiya Fuat jî derket holê.

Platformên me yên rexnedanê zêde giran derbas dibûn. Rêbertî jî tevlî platformên hinek ji me bû. Rapora min zêde dirêj bû. Min rapora xwe jî bi uslubê her carê nivîsandibû. Ziravî zêde bûn, heta min xalên herî biçûk nivîsandibûn. Min heta wê rojê gelek rapor, nameyên ragihandina hinek pêvajoyan û raporên rexnedanê dabûn Rêbertiyê. Hemû jî dirêj û berfireh bûn. Weke rojnivîsê bûn. Mi dixwest her roja ku jiyan kiriye û dijîm ragirhînim. Min pêvajoya piştî derketina ji zindanê jî berfireh nivîsandibû. Bi taybet hewldanên provakasyon ên ferzkirinên legalîte, hewldanên wan dixwestin xetê bikişînin navendek reformîze û xebatên me yên li qadên legal kirina nîqaşê, tev ragihandibû. Ji ber ez yekser tevlî

xebatên gelek qadan bûm û min ew qad birêxistin kirin, bala wan zêde hat ser min. Min bi vê derûniya xwe silav dabe kî, min bi kî re xebat dabe meşandin, hemû di rapora xwe de diyar kiribûn. Bi heman rêbazî min rapora xwe ya Konferansê jî bi peywendiyên malbatî, derdor, xizimên xwe re destpê kir û heta pêvajoya akademiyê, hemû salên derbasbûyî nivîsandibûn. Hevalan jî rexneyên weke; "roman nivîsandiye, weke ku çîroka xwe nivîsandiye. Heman weke senaryoyekê nivîsandiye…" pêş xistin.

Ev tenê rexneyên giştî yên derbarê raporê de bûn. Lê belê, hêj di serî de ji bona raporê nirxandinên wisa, ji bona gelek mijaran jî têrê dikir. Jixwe hêj min xwendina raporên xilas nekirî, mafê axaftinê girtin û rexne kirin. Dema Rêbertiyê got; "bila beşa mayî bi devkî vebêje." Min jî bi devkî berdewam kir. Lê mixabin! Ez têra xwe ji dest werdanek wisa bandor bûm. Min got; weke din çi vekim, wê min heman tişt bi devkî jî vegotan. Ez tiştek cuda nabêjim." Bi min re jî pêşdarezînek wisa pêş ket. Min got jixwe, ez çi vebêjim, dê heval dîsa jî bi heman hukmî bi-axivin û şîroveyan bikin. Tevî vê gumanê min hewl da hinek tişt bi devkî binirxînim. Bi rêk û pêk ne-axivîm. Belav bû, li şûna ku mijarên esasî vebêjim, min her tişt bi bûyer û diyardeyan ve nirxandin.

Dema rojevên Konferansê yên din hatin nîqaşkirin jî, pirsgirêk derket. Di kêliya xwendina rapora giştî de, min rexneyên xwe fermî jî ragihand. Min got; "ez di vê mijarê de ne qane me. Lê ji bona berjewendiya partî dengê xwe didim." Ji ber ev helwesta min derbarê gelek mijaran de diyar bû, bertek jî zêde bûn. Çil hevalî/ê zêdetir rexne li min kirin. Nêzî heşt demjimêran li ser piyan mam û platforma min çêbû.

Hinek rexneyên rast û bi gumanên rêxistinî jî hatin pêşxistin hebûn. Van ez zêde hejandim. Lê nedihincirandin. Lê bi rastî jî hinek rexne, hal bi mirov re nedihişt. Zêde ecêb û zêde subjektîf bûn. Gelek rexne li gorî bihîstin, bertek û hesaban dihat kirin. Nêrînên weke;

"Di girtîgehê de evîna qesra jiyan kir."

"Hêj ne hatiye derve, zindanê jiyan dike."

"...Mirov ji kesekê hez dike, Sara di heman wextê de çar-pênc kes hezkirine. Bila vê rewşê veke!"

"Me li qada legal demekê bi hev re kar kir. Kêm mabû ez bikevim nava xefka legalîteyê. Min zorê xwe xilas kir."

"Çima dev ji Hamîlî berda, ji Şener hez kir?"

"Di zindanê de cuda bû, lê dema derket derve cudatir bû. Kesên ku li ber girtîgeha Ceyhanê dîtibûn, digotin cilên weke burjuvaziyan li ber xwe kiribû."

"Dema min li Awrûpa dît, tam cilên weke burjuvaziya biçûk li ber xwe kiribûn. Bi cilên taxim digeriya. Xeyalên min vala derxist."

"Bertekên wê li gorî wê ne. Divê helwestên PKK'ê bi xwe re ava bike."

"Şêwazê birokratan bi wê re heye, nikare dakeve nav hevalan."

"Arîstokrate, hevdîtinên wê her tim bi kesên di rêveberiyê re bûn. Bêvla wê li hewa bû."

"Xwe weke xwîşka mezin, an jî diya PKK'ê dibîne. Lewma ji ser xwe diçû."

Her wiha gelek rexne û pênase pêş ketin. Hevalek ji van rexneyan hemûyan bandor bû û got; “ez tenê dibêjim, xwedê bela xwe bidê. Çima xwe anî heta vê rewşê? Çima xwe anî vî halî ku ev jê re werin gotin?” Piştre jî tiştek negot û rûnişt.

Ma ez di çi halî de bûm? Min çiqas li ber xwe dida, da ku nekevim erdê. Min her kêliyê dadiqurtand. Min gelekî xwe êşand, da ku îske îsk negirîm. Weke din jî Rêbertî amade bû. Li hember min bû. Di rêza pêşî de rûniştibû. Bi rastî jî pir zehmet bû. Min yekem car bû rewşek wisa jiyan dikir. Rexneyên Rêbertiyê girantir û berfirehtir bûn. Lê yek ji wan jî evqasî ez ne êşandim û perçiqandim. Hemû hevalan tevahî hêrsên xwe bi ser min de barandin. Ez jî li hember xwe bihêrs bûm. Her tiştên hatin gotin encamek bûn. Çima ez ketim vê rewşê? Belê, çima, çima, çima? Min berê vê îsyanê destpêkê da xwe. Min dikariya hêj bihêztir pêvajoya heyî pêşwazî bikim. Li şûna ku li hember binkeftina heyî bigirîm û binalim, min dikariya her yek ji wan bikim gavên serkeftinê. Herî zêde jî divê ez xwe bikim hêz. Ji ber kesê provakator bi navê min êrîş dikir û disparta navê min. Di heman demê de yekser êrîşî min kiribû.

Di çapemeniya dijmin de nûçe ser nûçeyan tên belavkirin. Diyar dikin ku, partiyê ez kuştime, propagandeya ku ez ji holê rakirime tê kirin. Ger hemû pirsgirêk kuştina min bûya, dikariyan hêj di zindanê de min bikujin. Dê di wir de jî kuştina min bibûya bela serê wan. Bes bi vî şêwazî kirina bela serê partiyê û ji holê rakirin hêsantir bû. Dijmin jî li benda vê bû.

Rêbertiyê di pêvajoya platformê tevê de her tişt şopand. Bi sebreke mezin her tişt guhdar kir. Herî dawî mafê axaftinê ji dîwanê girt û dest bi axaftinê kir. Berdevkê dîwanê hevalê

Nûman sor bû. Rêbertiyê jî weke her hevalî/ê destê xwe rakiribû û mafê axaftinê xwestibû. Li hember vîna dîwanê rêzdar bû û bi dilnizmiyek balkêş tevgeriyabû.

Berî her tiştî di vê astê pêşketina rexneyan hem weke bêşansiyekê nirxand, hem jî diyar kir ku di heman demê de gelek rastî balkêş destnîşan kirine. Pey re jî dest bi axaftina xwe kir.

Dema Rêbertiyê dest bi axaftina xwe kir, atmosferek cuda ava bû. Lêhûrbûna nakokî û pevçûnên ku bi saetan berdewam kirine, hatibûn qonaxek wisa ku, ji cihekê ve girtin, yek bi yek çareserkirin û rast dana bicihkirin girîng bû. Lewma rêbaz û amûrên vê gelek girîng û cuda bûn. Guhertin jî di vir de derdiket holê. Her tiştî di nav xwe de kûr dike, dadikeve çavkaniya wê, ji wir digire û gelek girêdanên wan bi hev re ava dike û tîne heta roja me. Rexneyên ku pêş dikevin hem dihejînin û hwm hêz didin. Hem jî pir tûj û bêrehmin. Lê mirovan naşikîne û belav nake. Her çendî mirov êşa wan pir ji kûr ve bihese jî, mirov hêz û moralê derketina ji wir bi xwe re dibîne. Lewma mirov narûxe.

Rêbertî, behsa mirov ji mirov re dike. Wisa dike ku mirov li xwe mukur were. Hemû nebesî, şaşî û xwe xapandinên bi mirov re hene, bi erdê re dike yek. Lê di heman demê de alternatîfên wan jî datîne holê. Serkeftinê ferz dike. Ji bilî vê jî ti derî venake. Di nava vê de jî hemû qonaxên dibin çavkaniya lewaziyan digere, lê texrîbatan nake. Xweseriyan paşguh nake. Her tiştî kirêt nake, kirêtî û bedewiyê, rastî û şaşiyê, bi xetên sitûr ve ji hev cihê dike. Hest, hezkirin û girêdanan pênase dike. Girêdanê van bi siyaset, şer û rêxistinê ve, bi serkeftin û

zaferê ve saz dike. Diyar dike ku, ev şer çawa hatiye meşandin, di vê mijarê de çawa bi ser xwe de diçe û çawa ser xistiye. Hemûyan jî bi mînakan vedibêje.

Hestên heyîn bi serê xwe lîstokek şer bû. Bi wan re bidestxistina serkeftinê, dihat wateya ku hemû şaneyên pêşketinê ji şoreşê re vedibin û diherikin. Dema Rêbertiyê vedigot, mirov dikariya van mijaran bi xetên giştî ve jî fêm bike. Pêvajoyên ku min jiyan kirine, di nava pevçûnên tevlîhev ên têkîliyên hest û hezkirinê de derbas bibûn. Lê Rêbertiyê girêdana pratîka hatiye jiyîn wisa baş bi siyaset, rêxistin, şer û dijmin re çêdikir, hem fêmkirina wê zehmet bû, hem jî gelek tişt hînî me dikir. Nûnertiya dewletê di kesatekê de çawa tê jiyîn, Rêbertiyek dijber a çanda Kemalîst ve teşe girtiye û nûnertiya Rêbertiya jinekê çawa dibû? Astek ku bername, plan û amadekariyên hatiye çêkirin çawa dibû? Gelo Kesîre di vê astê de bû? Nirxandinên ku Rêbertiyê di salên berê de kirine, hemû nêzîkbûnên Kesîrê yên tên bîra min û sekna wê tînim cem hev û dihizirim. Ew jî reviyabû. Rêbertiyê ew qas sal şerek çawa dabû meşandin. Ev sebrek çawa bû? Hewl didim van mijaran tevan fêm bikim. Di heman demê de dixwazim rêbazê girêdanên wan bi hev re çêkim bibînim. An jî divê ez bûyera heyî berovajî çawa binirxînim? Divê ez ji kîjan xalê û ji kur ve bînim berhev.

Platformên rexnedanê yên Konferansê pir giran û bi êş derbas bûn. Di rexnedanên pêvajoya dawiyê li zindanê de jî dihatin pêşxistin de rexne zêde giran bûn. Her çendî me zêde berfireh û giran dinirxand jî, li derve di nava yekbûna rastiya şerê me de, kesayet û destgirtina pirsgirêkan cuda bûn. Pêvajoya rexnedanê li hinek girtîgehan bi mehan berdewam kiribû.

Nexasim di girtîgeha Ceyhanê de tenê rexnedana Selîm çend hefteyan berdewam kiribû. Hevalan di nameyan de rewşa heyî diyar dikirin. Lê ev nayê wê wateyê ku gelekî kûr li ser pirsgirêkan rawestiyane û her tişt rast û encamgir bûye. Ya rastî rewşek berovajî hebû. Ji ber wî karîbû uslubê xwe yê demogojîk bide axaftin, zemînê platformê jî kêşaye vê rastiya xwe. Ango şêwazê xwe dabû axaftin. Pêvajoya Çanakkale hinek din hêmanên erênî pêş dixist. Rexneyên ku pêş ketin, şêwazê nirxandina pirsgirêkan, hinek din li gorî rastiya me pêş diket. Lê mixabin, em li wir jî ne di hêza veguhertina radîqalbûna şoreşgerî de bûn.

Belê, her tişt pir cuda bû û hatibû guhertin. Rêbazên Rêbertiyê cuda bûn. Me heta pêvajoya dawî jî bi muhafazakarî cihêtiya qadro û avaniyê çêdikir. Me şêwaza peywendiyên koma pêvajoya destpêkê derbas nedikir. Pirsgirêkên heyîn di nava komek teng ên qadroyan de nîqaşkirin, biryarên heyîn sipartina wan, bi wî şêwazî veşartin û siriyet esas girtin, ji bona quralê herî bingehîn ê rêziknameyê bû. Lê belê, vê jî rêxistin zêde teng dikir. Dema mirov kargeriya demokratîk di zemînek teng de bigire, tenê bi wir ve girê bide, rê ji nêzîkbûn û şêwazên dogmatîk, hişk û çewsîner re vedike. Di nava şert û mercên zindanê de di aliyekê de çewsîneriya dijmin ku ferz dike heye, ji aliyek din ve jî ev şêwaz di nava avaniyê de jî zehmetiyek dida avakirin. Nîqaşên ku li Çanakkaleyê li ser van mijaran hatin destpêkirin, zêde di nava giştî de nehatibûn diyarkirin. Tenê di asta hinek rexneyên diyarker de hatine destnîşankirin. Dema ez derketim derve, min dît ku em gelek tiştan û mijaran zêde ji paşve dişopîninn, em dûrî pêşketinan ketine.

Ev jî ji aliyekê ve xwezayî bûn. Dûrbûnek salan hatibû jiyîn. Ji bilî hinek pêşketinên ku ji me re dihatin ragihandin, avakirina guhertina ku hewce dike, ew berfirehkirin û kûrkirinê de nebesiyên cidî hebûn. Zehmetiyên me jî çavkaniya xwe ji vir digirtin. Me jî zehmetî didan avakirin. Me jî fêrbûnên ku di girtîgehê de girtine û xisletên kesane yên berê ve hene didan der. Ev jî bi serê xwe dibû sedem ku em lihev nekin û ahengek neyê avakirin. Zemînê pevçûnan ava dikir. Pirsgirêka bingehîn jî li ser bingehek rast çareserkirina van rewşan bû. Ev baş şopandin û fêmkirina derve ve girêdayî bû.

Şêweya nivîsandina raporên me jî ecêb in. Bûyerên hatine jiyîn, diyardeyên ku bandor kirine, şêweya êrîşên dijmin, amûrên berxwedaniya têkoşînê û hwd her tiştê me cuda ye. Merc û pirsgirêkên qadan ên xweser û nêzîkbûnên bingehîn, wê çawa li cem hev bihatan nirxandin? Ne mirov dikare rewşa qadan a xweser red bike, ne jî mirov dikare ji ber van nêzîkbûna bingehîn jî piştguh bike. Di dahûrînên ku me dixwendin de pirsgirêkên heyîn pir zelal hatibûn destnîşankirin. Lê dîsa jî heta ku mirov her bûyerê şênber jiyan neke, mirov nikare weke tê jiyîn her bûyerê fêm bike. Mînak di nava gerîla de bêçalakî, weke mirinê tê nirxandin. Her wiha li hinek qadan hêza gerîla bi mehan bê ku yek çalakiyê bikin, didin rawestandin û di bendewariyê de tên hiştin. Dîsa ji bona şêwaza hinek çalakiyan jî, rexneya şêwazê kontra tê kirin. Hinek pêvajo bi navê hinek kesan tên pênasekirin. Weke pêvajoya Semîr, pêvajoya Dawut, Baqî, pratîka Lolanê, Pratîka Kor Cemal, Hogir, bûyera Fatmayê û provakasyona Hisên Yildirim. Her çendî mirov di wateyên teorîk û pênaseyên siyasî de hinek encaman bigire jî, ji ber ziraviyên van nayên zanîn,

dibin sedem ku nirxandin jî kêm bimînin. Ev jî vekirî tê dîtin. Gelek bûyerên weke; "ji bona erzak windahî hene. Ji ber cixareyekê xwe bi gundan ve girê didin. Bi çetegeriyê re lihevkirinek heye. Bi dijmin re lihevkirinek zimmî heye. Di pratîka pêkanîna tevlêkirinên qanuna leşkerî de, tiştên li ser gel hatine pêkan…" û gelek bûyerên weke van hene. Dîsa gelek kesên ku pêl mayînê kirine û şehîd ketine, her carê heman xetên rê bikaranîn, di nava berfê de rûniştin û bûna sedema şehîdbûnê, ji ber veşartina gerîla pêk ne anîne gelek windahiyên ku hatine jiyîn û hwd. Dema min ev bûyer û mijar di nav belgeyên Kongreyê de xwendin, zêdetir bandor li min kirin. Lê dema di nîqaşên dersan de, ast û rewşa pratîkan dihat nirxandin û vekirin, hem ji bona min zêdetir ecêb dihat, hem jî min baştir fêm dikir ku, ev bûyer çawa hatine jiyîn.

Di van mijaran de warê ku herî zêde bûyerên wisa ecêb lê têne jiyîn zindan e. Mirov yekser di bin venêrîna dijmin de ye. Ne çek, ne narîncok, ne parçeyek erazî, ne şkeftek, ne jî rêyek amade ku mirov tê re bimeşe heye. Ango tiştek mirov tine ye. Ji hêla taktîk ve dijmin xwedî hemû derfetane. Pêş de ye. Piçek hewaya ku mirov dikişîne hinavê xwe jî, dibe amûrek êşkencyê. Dema mirov li hember bêhewabûnê bin bikeve, rêya îxanetê ji mirov re vedibe. Belê, mirina hêsan jî, di vir de pêş dikeve. Ger qelsiya mirov a cixareyê hebe, dê mirov li hember qedexeya cixarê ya bi mehan têk biçe. Di wir de jî ji mirov re rêya îxanetê vedibe. Mirin di vir de jî hêsan e. Mirov dikare ji bona lalîkek şorbe jî îxanetê bike. Di vir de jî mirinek din a hêsan pêş dikeve. Mirov li hember gefek dijmin têk diçe, ji bo sozek dijmin têk diçe, hêviyekê têk diçe û li hember lîstokek ku bi gotinan tê kirin têk diçe. Yek gotin dikare mirov bibe

îxanetê. Şêweyên mirinê jî cuda dibin. Carna bi yek nêrînekê, awirekê mirov hêvî û cesaretê dide dijmin. Mirov kêmekê bêmoral, westiyayî, bêhal, bêhêvî bijî, tê wateya ku çav li dijmin şikandiye û rê jê re vekiriye. Di wir de jî mirov ji leşkerê dijmin zêdetir seknek bipergal raber dike. Mirov bi qasî ku têlên deng biqetin diqîre, ji leşkerên dûjîna ji mirov re dikin dibêjî; "fermo fermandarê min." Di van nêzîkbûnan tevan de hêmanên binkeftin û teslîmiyetê hene. Ji vir û şûn de divê mirov di her kêliya ku henaseyê dikişîne de, hesabê dijmin bike. Ji ber dema mirov bi dijmin re rû bi rû ye, ew henase jî li nav rûyê wî dikeve. Divê mirov wê jî bo ku têk biçe û teslîm bibe, bikişîne hinavê xwe.

Ev rewş bi kesayetan re çiqas hatibûn jiyîn, an jî bê van çiqas hatibû jiyîn? Divê mirov vê cewaziyê çawa diyar bike? Polîtîkaya giştî çiqas jîndar bibû û li hember wê çi hatibû kirin? Lewma xwezayî bersiva van jî, hinekê di nava van rastiyan de veşartiye. Yek bi yek kesan çawa jiyan kir? Ji ber polîtîkaya heyî di qadên xwe yên pêkanê de, xwe di kesayetan de zelal diyar dikir. Dijmin her carê di encama kesayetan de ava kiriye re, polîtîkayên nû û taktîkên nû pêş dixist. Ji ber hedefên wî hebûn û dixwest xwe bi van pêvanan gav bi gav bigihîne hedefên xwe.

Lewma dema mirov zindanê dinirxîne, divê mirov vî aliyê wê yê xweser baş bibîne. Çalakiya Mezin a Rojiya Mirinê, an jî çalakiyên din tev ên herî zehmet bûn. Ji ber vê çalakiyên herî zêde fedekarî hewce dikir, zanebûn, girêdan û mezinbûna armancê hewce dikir bûn. Li gorî vê hemû zehmetî û dijwariyên ku di rêya armancê de hatine pêkanîn, gelekî girîng in. Lê belê, ev dîsa jî wate û girîngiya van xisletên ji hev cuda,

zehmetiyên her qadê yên li gorî xwe xweser, peywirên ku divê werin kirin û bi cihanînan naguherîne. Cihêtiyekê jî nade avakirin.

Em jî bi bertekên ku di zindanê de hîn bûne û şêweya fikirandina heyî ve, yek bi yek sedem û encamên bûyer û diyardeyan ve mijûl dibûn. Dema me di raporên xwe de behsa xwe û pêvajoyan dikir, me giranî dida bûyerên ku herî zêde bandor li me kirine. Me her tişt ji wir dida destpêkirin û xilas dikir. Ev mantiqê me jî dibû sedem ku pirsgirêkên heyîn baş neyên fêmkirin. Di têgihiştinê de astengî ava dikir.

Hevalan ji bona rapora min gotin roman, an jî çîrok e! Rast bû. Ji ber bûyerên ku hatibûn nivîsandin, ancex mirov dikare bi zimanek romanê binivisîne. Mirov dikare ragihandina agahiyan, asta xebat û peywendiyan bi nivîsek din bigire dest. Mirov dikariya bike mijarên nîqaşan. Lê me berovajî destpêkiribû. Encamek derketî wir hebû. Mirov dikariya ji wir bigire ku pêvajoyan, di nava wan de bûyer û diyardeyên din û kesan lêpirsînê re derbas bike. Dê vê rêbazê baştir hinek tişt çareser bikiran. Lê mixabin, me gelek bûyer û mijarên ku di rewşên herî asayî de zehmet in werin nirxandin, kiribûn rojeva xwe. Em li ser wan disekinîn.

Li ser bingeha rexneyên ku pêş ketîn biryar hat girtin. Her kesî ji nû ve dest bi nivîsandina rapora xwe kir. Ji nû ve nivîsandina raporan, dihat wateya lêhûrbûnek nû. Hinekê jî Rêbertiyê dixwest ku lêhûrbûnên me tim domdar bin. Lê em jî tiştên pêk tên wisa hêsan qebûl nakin. Hinek bertekên me hene. Nivîsandina raporan nehêsane, em zehmetiyê dijîn. Em jî îsyana xwe bi gotinên; "ma weke din çi ji me dixwaze, em her tiştên xwe vedikin, vedibêjin. Tiştek me veşartî tine ye" ve

diyar dikin. Lê em nikarin xwe bighînin cewhera pirsgirêkên heyîn. Pirsgirêk ne ew e ku mirov tiştên ku jiyan kirine ji serî heta dawiyê bilêv bike. Ya me jiyan dikir derûniya xwe parastinê bû. Mekanîzmayên me yên xwe parastinê zêde pêş ketibûn. Êdî weke rêbazekê bû. Ev şêwaza parastinê, dibû sedem ku em hemû xisletên me bidest xistine, di nava xwe de muhafaza bikin.

Di nivîsandina rapora min de, bandora fêrbûnek salan hebû. Ji zimanê raporan zêdetir, zimanê bîranîn û belgeyan bû. Çi hatibe jiyîn, çawa hatiye jiyîn weke heyî dinivisînim. Ez jî li gorî xwe dibêjim ku, divê her tişt weke bûye were zanîn. Ne ku weke hinek kesên din xwestine, ji ber ez bi xwe pêdiviya vê dibînim wisa dinivisînim. Tenê ji aliyê xwe ve lê dinêrim. Ango bi gelemperî pêdivî bi çi hebû û çi hewce dikir? Min zêde mijarên weke asta provakasyonê ya di zindanê de çawa bû, xwe disparta çi, çima em neketin ferqa wê, nedidît. Li gel van jî hîs, tiştên ku hatine bihîstin, guman û gotin hene. Çima bi şêwazek rast kesî guhê xwe nedabû wan? Polîtîkayên dijmin di kesayetan de rê ji çi re vekiribûn? Peywendiya wan bi encamên derketin holê re çibû? Diviya min ev hemû derxistan zanebûnê. Ango dahûrînek kesayet a pir bihêz dihat xwestin. Divê em bi nêrînek siyasî ku bikarin lîstokên dijmin vala derbixin xwe bidin diyarkirin, xisletên xwe yên bi pîvanên rêxistinê û şêwazên wê re nabin yek û lihev nakin re, rast şer bikin. Ancex ev dikare yekparebûnê ava bike. Ancex ev dikare me bi zemînê partiyê re bike yek.

Bi vê mebestê dahûrînên têkildarî jinê de zêdetir tên vekirin. Rêbertiyê dida diyarkirin ku, çawa di kesayeta xwe de zilamê kevnar derbas kiriye, çawa bêbiniya ferasata namûsê ya

Kurd derxistiye holê û çawa di nava şer de bi jinekê re rêxistin pêş xistiye, çawa dîsa jin ji nû ve ava kiriye, bi hêmanên zanistî, civakî, siyasî û derûnî yê herî zelal ve datîne holê û dide fêmkirin. Hewl dide bi hevpeyvînan ve avaniya heyî perwerde bike. Lê weke Rêbertî dibêje; "her kes weke qutiyek girtiye."

Bi taybet bi vekirin û nîqaşkirina asta têkîliyên ku min jiyan kirine re, xisleta provakasyonan a bikaranîna zemînê jinê û hewldanê provakatorê dawî jî ya valaderxistina xebatên jinê yên partî dimeşîne û berovajîkirina vê xebatê, pîvanên têkîliyên burjuvaziya biçûk ên lîberal, sixte, zimandirêj, bi temamî koletiya jinê rewa dike, van jî bi navê azadî, hezkirin û hestan li ser her naverastê ferz dike û xebatên vê dimeşîne, berfirehtir hat destgirtin û nirxandin.

Ji ber ev jî baş nehatibûn fêmkirin, hinek kes gelekî tirsiyane û xwe di nava xwe de girtiye. Heta hinek kesan xwe vedişart. Hinek hevalên ku bi hev re zewicîne û di heman demê de li heman dewreya perwerdeyê jî bi hev re ne, hebûn. Hinek hevalên bi hev re nîşankirî, an jî heta wê rojê têkîliyê xwe ji partiyê veşartine hebûn. Hinek ji wan jî ji bona şaş neyên fêmkirin, silav jî nedidan hev. Dûrî hev disekinîn. Hinek ji wan jî bi gumana dibe ku rewşa wan jî eşkere bibe, bêdeng diman. Hinek kesan jî bi nirxandinên tûj ve, rastiya ku jiyan kirine vedişartin. Mirov ev rastî pir hêsan di nava jiyanê de didîtin û ferq dikirin.

Şova herî ecêb jî, dîsa ya Selîm bû. Tewşî, bêpîvaniya bi Aysel re, ji rastiya xwe rev, dihişt ku rastiya Selîm jî derkeve holê. Di vir de rolek tehrîkar dilîst. Ya rastî dahûrînên ku hatin

pêşxistin, bi gelemperî serûbinbûnek ava kirin. Rexneyên ku pêş diketin rewşa her kesî rave dikir. Nêzîkbûnên xwe dixapînin û sixte zû derdiketin holê. Ji ber Selîm zêde aciz bibû ku, Aysel nabe yara wî, "ji hemû jinan nefret dikir." Li ber çavan dilxwede li hember bêsedaqetiya jinê bertek raber dike, ji ber bi zilam ve girêdayî namîne li hember bêbaweriyekê jiyan dike. Bi hinek mînakan ve hewl dida ku bide diyarkirin, jina çawa dixapîne. Lê di cewhera mantiqê wî de, îsyana mantiqê milkiyetperest hebû. Wî di kesateya xwe de mafê her tiştî didît. Weke ku zêde li dijî jinê ye xwe dide nîşan, lê lewaziya herî mezin jî li hember jinê jiyan dike. Qelsiya xwe zêde dida der. Ev rewş di heman demê de cewhera nêzîkbûna wî ya ji siyaset û rêxistinê re jî, rave dikir. Di xalên herî dijber dixuya de, herî zêde jî ew dikir. Di nava rêxisitinê de seknek ji rêzê û sivîl, uslubek demogog, her tiştî şêlo dike, ji bilî xisletên şoreşgerî, rê dide her cure xisletên xirab dike, xwedî koma ferasetên xirab bû.

Gelekî girîng bû. Ji hêlekê ve jinek ku bi têkoşîna li dijî dijmin Fatmayê re tê avakirin heye; hewldanê wê, tevî ku Rêbertiyê gavên wê yên pratîkî zêde zelal jiyan kir, ti caran ji ber Fatma ji jinê nefret nekir. Xisletên wê yên kevnar û ji jina kole nefret kir. Lê belê, avakirina jina azad jî, weke karê şoreşê yê herî xweşik girt dest. Nêzîkbûnên Rêbertiyê yên ji jinê re, di serî de jî wisa bûn. Lê mixabin li gorî Selîm, dema ji wî re nabin 'yar' hemû jin xirab bûn, divê nefret jê were kirin. Di vê mijarê de bi rêgez nebû. Jina ku herî zêde xirab pênase dikir, bû parçeyek jiyana dev jê nayê berdan.

Me nîqaş kir, min got; “ma ji ber Şener îxanet kiriye, divê ez nefretê ji zilaman bikim? Ez nefretê ji zilamê sixte dikim. Ango nêzîkbûna ku dema nebe ya min ez nefretê jê bikim, zêde çeloxwariye.” Lê, min vala bi Selîm re nîqaş dikir. Ji ber her carê mirov ber bi bêçaretiyê ve dibir.

Min wate dida bertekên hinek kesan. Di rexneyên ku ji bona min dikirin de, ramanek siyasî tine bû. Bertek bûn, hêrs bû. Ger min rewşek wisa jiyan nekiribûya, evqas rexneyên partiyê jî ji bona min pêş nediketin. Pirsgirêka jin û zilam jî evqas nediket rojevê. Ji ber ev têkîlî wisa bi encam bû, peywendiyên din jî dixist xeteriyê. Hest û hezkirin dihatin rexnekirin. Dihat gotin ku, ew ne hest û hezkirinên rasteqînin, nirxan ava nakin, serkeftinê bidest naxein Weke ku derfetên jiyana wan heye, lê min ew pûç kirine! Bêşansiya herî mezin jî, ez weke ku min weke sedema van didin nîşan! Lê belê, ger ev hevalên min hinekê hewl bidin ku rastiya Kurdistanê fêm bikin, hinekê jî hestên xwe bipîvin, wê pir baş bibînin ku ew li kurin û çiqasî xwe dixapînin.

Îdîa min jî zêde bû. Min ji xwe re digot; “berî her tiştî ezê têkîliya azad û mînak bidest bixim. Ezê bidim diyarkirin ku hezkirin çawa têkoşînê mezin dike û moral dide. Îxaneta kesên ku ev têkîlî û têkoşîn ji hev qut kirin re jiyane tê zanîn. Evîna min jî TÊKOŞÎNA min e.” Min ev gotin jî çiqas bi niyetek baş gotibûn. Birastî jî ez di van gotinên xwe de pir samîmî bûm, bi xwestek bûm û durist bûm. Lê mixabin, min dît ku provakatorekî hezkirin, evîn û hestên min biriye çûye û diziye! Di heman demê de her tişt di kêliyekê de pêk hatibû! Lê ez dikirim xwedawend! Hezkirina min pîroz dikir! Weke Mazlum ji min hez kiribû! Evîndarê Apo’geriya min bû! Li aliyekê ev

gotin hebûn, aliyê din jî îxaneta bi çavreşî dikuşt hebû! Tevî van hemûyan hêj ji bona min dawiya her tiştî nehatibû. Min ti caran wisa nenirxand. Ez bi partiya xwe re bûm. Di nava partiyê de bûm. Hêza têkoşîna vê dozê, rakêşweriya mezin a şoreşê û îdîa min a meşa di şoreşê de mezin û kûr bû. Ger ev têkîlî nebûya jî, dê ev îxanet bihata jiyîn. Ne ku vê têkîliyê Şener ava kir. Lê wî xwest di vê mijarê de li me bixe. Hewl da tola xwe jî di vê mijara lewaz de bigire. Min jî ev eniya xwe saxlem nekiribû. Ji êrîşan re vekirî mabû.

D vir de tişta herî girîng, di demek herî zû de zelalkirina provakasyonekî û rast fêmkirina wê bû. Lê hêj ez di vê mijara têkîliyê de asê mame. Binkeftina di vê mijarê de qebûl nakim û nikarim xwe jî ji bandorên wê rizgar bikim. Jixwe tişta dijmin jî dixwest ev bû. Dijmin jî ne li bendê bû ku, ez doza xwe bikim qurbana vê têkîliyê. Ji ber rastiyek evqasî zelal hebû. Lê ev bandorên ku min dijiya, ev têkoşîn, îsyanên min ên bi min û partiyê re, hêza xwe di vir de tinekirin, ji bona dijmin ji serkeftinek bû. Min bertek, înad û hêrsên xwe tev weke geravekê fetisandibûn. Lê belê, ez bi xwe ketibûm wê geravê û diperpitîm. Min kesek jî nêzî xwe nedikir. Diviyabû ez di demek zû de ji wê rewşê derketam. Her kêliya ku ez di vê rewşê de dimam, dibû kêliya berdewamkirina bandora provakasyonê û zerar dida. Min ev jî ferq dikir. Her rêbaza min diceriband, dibû sedem ku bertek pêş bikevin.

Her ku dem derbas dibû, ez jî bêdeng dibûm. Ji ber min nedikariya her nîqaş û rexneyê rakim. Ger çareseriyek nebûya jî, min xwe sînordar dikir. Ji ber dema bibandor jî bûma, cuda dihat fêmkirin. Min nedikariya wê jî bi hostane bimeşînim. Dihat gotin; “dixwaze serwer bibe. Çavên wê di Rêbertiyê de

ye. Dixwaze bidest bixe…” Ev gotin jî dibûn sedem ku ez gav paşve bavêjim. Di wê pêvajoyê de Rêbertiyê bi mebesta ceribandinê, Yekîtiya Jinê damezirandibû. Ji bilî xebatên giştî, rêveberiyek yekîtiya xweser hatibû sazkirin. Ez, meral, Hacer, Aysel û Azîme di nav de cih digirin. Rêveberiyek ji pênc kesan ava dibe. Civînên me yên xweser çêdibûn. Rêbertiyê civînên cuda çêdikir. Tevlîbûna min di asta herî jêr de ye. Ez fêr nebûme. Ez ji karkirinê hez dikim, lê bi zorê jî be xwe sînordar dikim. Min ev jî di rapora xwe de nivîsandibû. Bes dîsa jî bêbaldarî û bê eleqeder nêz nabim. Bertekên min ên di vê mijarê de jî bibandor in.

Mirov di şoreşê de bi bazaran nameşe

Êdî dewreya duyem e. Rêveberî hatiye guhertin. Doxtor, Serhat ew çûne welat. Dema kom diçûn welat xweşbîneyek cuda didan avakirin. Zêde bandor dikir. Dema me kom birê xist, ez giriyam. Min jî dixwest ku beriya kêliyekê biçim welat. Hem bêrîkirina çiyan hebû, hem jî min dixwest rasterast bi dijmin re rû bi rû werim. Bi dijmin re şer bikim. Ji ber şerê hundirîn ez dikuştim. Bê wate bû, ez dihincirandim.

Komên nû hatine. Di nava wan de yên ku nû ji girtîgehê derketine hene. Lê dîsa jî pêşdarezîn weke yên berê nediyarkerin. Ji ber konferansê jî têgihiştinek kamil ava kiriye. Ew nirxandin û biryarên ku derketine esas tên girtin. Heta naveroka hevpeyvînên bi hevalên nû hatine re jî cuda bûne. Êdî pêvajoya herî zêde bi êş û jan derbas dibe. Rêbertiyê di vê mijarê de jî got; "tişt nabe, we zêde zehmetî jiyan kir. Em jî herî zêde bi ser we de hatin. Jixwe ger min bizaniya hûn ranakin, ez jî bi ser we de nedihatim. Ger hûn encamên rast derbixin, hûnê bihêz bin. Me ev têkoşîn ji zindanê re jî diyar kir. Li wan deran jî konferans tên lidarxistn. Hêvîdar im wê nûbûnek were jiyîn. Yeqîn dikim dema Karesu ew werin, dê evqasî zehmetiyan nejîn. Em dikarin bêjin ku ew zêdetir xwedî şans in. Na, me serxist. PKK'ê bi serxist. Me lîstokên dijmin vala derxistin." Bi vî rengî pêvajo bi dahûrînên nû ve berdewam kir.

Ji ber bernameya dersên din bi encam bûne, êdî tenê dersên leşkerî tên dayîn. Hemû hêz di nav amadekariya pratîkî de ye. Ez jî bi vî rengî perwerdeya leşkerî ya her du dewreyan jî dibînim. Lê perwerdeya yekemîn xurtir bû. Ji ber hevalên ku ji

pratîkê hatibûn, di wê dewreyê de zêdetir bûn. Me nêzî mehekê perwerdeya leşkerî dît. Hemû taktîkên leşkerî hem teorîk û hem pratîkî hatin dîtin. Min wer dizaniya ku qey ez li welat im. Hem planên çalakiyan, hem çalakiyên ku dihatin lidarxistin, heman hewaya rewşa şerek rastî dida diyarkirin. Min di yek ji wan de jî zehmetî jiyan nekir. Avêtina fîşekan de jî baş im. Hedefa xwe dibînim. Ya rastî ji ber min nedikariya çavê xwe yê çapê bigirim, min paç lê girê dida. Ev jî dibû mijara henekan. Lê dîsa jî nîşana min baş bû. Ez jî di pêvajoya perwerdeya leşkerî de zindî bibûm.

Dema em vegeriyan wargehê, pê hesiyam ku Cahîde Şener hatiye girtin. Dihat gotin ku xwe tevlî jiyanê û perwerdeyê nake û fermanên ku tê dayîn pêk nayîne. Li gorî min nehêcetek mirov yeqîn bike bû. Min ev ji Mesudê Zaza re jî got. Ew jî di rêveberiyê de cih digire. Di heman demê de endamê komîsyona lêpirsînê bû.

Carê min û Cahîdê di derbarê çûna welat de nîqaş dikir. Baweriya wê bi wê nedihat. Bêxwestek bû. Yeqîn dikir ku fîzîkiya wê têra çiyan nake. Bes hesab û kîtabên wê cuda bûn. Di nêzîkbûnê wê de hesabê her tiştî hebû. Li hember rêxistinê jî, li hember dijmin jî hesabên wê hebûn. Ez bawer im mantiqê bazirganiyê bû. Ji ber kesayeta wê di temenek biçûk de firotina şirînahiyê û pembû ve mezin bibû û hînî bazariyê bibû. Kesateya wê jî li ser vê bazariyê saz bibû. Siyaseta wê têra şerkirinek bihêz û bûna raqîbek bihêz nedikir. Gelo ev jî hinek xisletên din bûn? Dema em li Amasya bûn, me di vê mijarê de zêde nîqaş kiribû. Tirsa mirinê pê re hebû. Jixwe tirsa mirinê jî, nahêle ku mirov li hember zehmetiyan li ber xwe bide, xisletên

mirov ên xurt pêş naxe. Heta cihekê xeternakiyan berçav digire. Kesayetên bi vî rengî di jiyanê de bihesab in. Kesayet li hember xwe bêbawer dikeve û ti caran rehet nabe.

Jixwe di vir de pirsgirêk ne ew bû ku Cahîde biçe çiyê an na. Ji destpêkê ve xwesteka wê ya bajar û metrepolan hebû. Xwe jî li gorî vê amade dikir. Ev jî ecêb bû. Tiştek xwezayî ye ku mirov tişta ku bikare pêşniyar bike. Gelek hevalan pêşniyar dikir. Lê dema Cahîdê ji bona xwe metrepol ferz dikir û çûna çiya jî ji bona xwe weke têkçûnekê dinirxand, dema digot; "nikarim bikim", hemû meyîl û derûniya wê rave dikir. Ya rastî bajar zehmetir bûn. Ji ber kesayetên ku ji girtîgehê derketine, nikarin xwe demek dirêj veşêrin. Zû eşkere dibûn. Ev jî xeternakî bûn.

Lewma ev nêzîkbûna wê jî nedihat qebûlkirin. Weke din jî ji girtîgehê derketibû. Hinek pêşdarezîn jî hebûn. Dibe ku di nav hevalan de pir hêsan deqa 'reva ji şer, ango 'tirsonekiyê' bijî. Jixwe dihat gotin jî. Di dema vegera me ya wargehê de min bihîst hatiye girtin, tiştên ku bibin sedem yekemîn hatin bîra min ev bûn.

Min ji Mesud re got; "wer yeqîn dikim ev nêzîkbûnên wê bûn sedem ku bertekên mezin pêş bikevin. Dibe ku bi armanca zelalkirinê be. Lê we baş nekir, we dikariya hûn bi şêwazek din jî zelal bikin. Ma şert bû hûn bigirin. Li gorî min şaş e. Me jî di mijara çiyê de bi hev re nîqaş kir. Ji bona wê cihê herî baş çiya ne. Ger nekare tiştekê jî bike, dikare li biryargehan perwerdeyê bide. Di vê mijarê de jêhatiye. Li ber bayê metrepolan ketiye. Yan dê biçe cardin were girtin, an jî ez vekirî bêjim ger xwe bihêz birêxistin neke, hinek xisletên kesayeta xwe neguherîne, dê zû bikeve û biherime. Ji ber ew neylên wê hene."

Mesud jî got; “hinek tiştên ku tu nizanî jî hene.” Dema wisa got, ez zêdetir mat bûm.

Min jî pirsî; “çi ne, ma çi heye? Tiştek nîne ku ji min re negotiye. Li gorî ez wê nas dikim, vekiriye. Li hember rêxistinê negirtiye.”

Mesud; “na, na. Nexwe ev jî tişta yekê ye ku ji te re negotiye. Ev jî di rapora xwe de ji Rêbertiyê re gotiye. Ji me re rapor nenivîsand. Ji Rêbertiyê re nivîsandiye. Nexwestiye ku were xwendin û zanîn.” Piştî ev gotin, min zêdetir mereq kir.

Got; “piştî Amasya bi Ahmed re têkîliyek hestiyarî jiyan kiriye. Nerehetiya wê jiyan kiriye. Şerim kiriye ku rabe wê veke. Rexneyên ku ji bona te pêş ketine û bertekên ji bo rewşa te pêş ketine ew tirsandiye. Lewma venekiriye. Niha jî di rapora xwe de ji Rêbertiyê re vekiriye. Rêbertî jî aciz bûye gotiye; “me eleqeder nake. Bi hestiyarî kî ve hatibe girêdan bila be. Ma qey me jê pirs kiriye? Çima li ser bingeha pirsgirêkê raneweste? Bila xwe veke û çareser bike.” Ew jî bi me re na-axive. Me muxatap nagire. Protesto kiriye.”

Vêca Ahmed Nîtelîk ji kur derketibû? Hewl didim giyan û nêzîkbûnên Cahîdê yên ji Amasya ve bînim bîra xwe. Ecêb, çawa ev tişt kirine. Temam, wê demê çima qet venekir? Ji ber sedema bûyera Ahmet û Fuat Çavgun wan ketibû tecrîdê. Herî dawî ji Dîlokê hatibû Amasya. Destpêkê li qoxuşên cuda bû. Dema pêvajoya çalakiya rojiya birçîbûnê de pêşniyar dike, hevalan jî wisa dikirin qoxuşên xwe. Bi Muzaffer wan re dima. Me jî rapora rexnedanê jê xwestibû. Heta demek dirêj jî peywendiyên wê yên rêxistinî nebûn. Me jî jê xwest ku wê pêvajoyê binirxîne û dema bi tecrîdê derbas bûye binivisîne.

Raporek dirêj nivîsand. Me ew jî şand derve, ango Awrûpa. Pêvajoya jiyan kiriye berfirehî vekiriye. Di wê demê de kî zemînê van guruban saz dike, rola Fuat û rewşa xwe berfireh vekiribû. Biryar hat girtin destpêkê tevlî peywendiyên civakî be, piştî raporê jî tevlî karên giştî bibe. Ji ber di girtîgehê de demek dirêj di tecrîdê de jî mabû, bandor lê kiribû. Di vê mijarê de nêzîkbûnek hişk lê hat kirin. Ya rastî me di sala 88'an de xwest em pêwendiya xwe bi hinek kesan re çêkin. Ez bi xwe çûm qoxuşên wan û min diyar kir ku em ji bona ji nû ve pêşxistina peywendiyan amade ne. Xwarziyê Rêbertiyê Mistefa Keser got; "heta ku îtîrafkar û zilamên îdarê li ser kar bin, em ji bona tiştekî ne amade ne." Nêzîkbûnek zêde bibertek hebû. Deriyek vekirî nedihiştin. Ahmet, beriya me ji Amedê şandibûn. Hêj tam nerehete, girtiye û kêm di-axive. Piştî ku ez û Mistefa ji Amasya hatin sûrgûnkirin, heta demekê Saît Korkmaz berpirsê hevalên xort bû. Piştre Ahmet dibe berpirs. Cahîde jî berpirs e. Peywendiyên van hem li Ceyhanê bi Karasu, hem li Dîlokê bi Muzaffer wan re heye. Weke din peywendiya wan bi Çanakkale re jî heye. Me ji hev re dinivîsand.

Şevekê Rêbertiyê bangî min û Selîm kir. Li ser rewşa Cahîdê axivî. Got:

"Em herî zêde bi ser te de hatin. Me hinekê jî hewl da di kesayeta te de zindanê dahûrînin. Em bi ser Cahîdê û yên din de neçûn. Me bi zanebûn kir, ji ber nikarin rakin. Lê kesayetek ecêb e. Weke ku tiştek pir hewce û girîng e, ji min re raporek nivîsand. Kesî di vê mijarê de ti pirsek jî nekiriye. Dîsa jî ew destpêkê vê dinivisîne. Gotiye; "min her tiştê xwe ji Sakînê re digot. Min heta niha tiştek xwe jê neveşartiye. Lê min ev jê

veşart. Ji ber haya min ji helwestên wê yên derbarê van mijaran de heye, min şerim kir. Ji ber wê destûra tiştek wisa nedida." Kesayetek ecêb e. Nizanim ji ber bêçaretiya xwe bi Ahmet ve hatiye girêdan. Ez çi bikim ji vî halê te. Ev naxwazin me fêm bikin. Em niha çi bikin?"

Selîm cardin kesayeta xwe ya ecêb da der û got;

"Cahîde demek dirêj li cem Sakînê ma. Zêde pê ve girêdayî ye. Teqlîda wê dike. Dixwaze weke wê be. Ev têkîlî jî bi vî mejiyê xwe ve pêş xistiye."

Mîmîkên rûyê Rêbertiyê hatin guhertin û got;

"Çawa, tu behsa çi dikî? Çi eleqeya xwe heye? Sakîna çi? Tu baş nas jî nakî wisa di-axivî." Hinekê jî aciz bû.

Nirxandinên Selîm her tim ji yên her kesî cudatir bûn. Wî her carê cewaziya xwe datanî holê. Bêhna min jî teng dikir. Jixwe di pêvajoya ku Cahîde herî zêde bi min ve hatibû girêdan de, ez jê veqetiyabûm. Lê ew çûbû Sîwerekê û nîşana xwe pêk anîbû. Gelek xisletên min hene. Ma çi ji wan hinek negirtibû? Ji ber van nêzîkbûnan gelekî tengav dibûm. Hinekê jî ji ber axaftinên Rêbertiyê rehet bûm. Rêbertiyê ji min re got;

"Ger tu dixwazî hinekê bi wê re bi-axive. Xêre, derdê wê çiye? Bila ji me re behsa tiştên din bike. Bila xwe rast dahûrîne. Xêre behsa Ahmet dike, ew ji me re nehewce ne."

Em derketin, min di rê de hinek din bi Selîm re nîqaş kir.

Cardin dubare got; "ez rast dibêjim."

Min jî got; "wê demê hûn jî demek dirêj li cem Şener û hinek kesên din man. Bila haya we ji we hebe. Carek din jî tiştên wisa hewce nake bilêv nekin. Cahîdê hinek pêvajo jiyan

kirine. Hemû jî bi hev ve girêdayî ne. Hinek tişt jî ji ber xisletên kesayeta wê derketine. Sebra te nayê ku tu hinek tiştan neyînî û bi min ve girê nedî. Ez bawerim tişta zora te jî diçe, çima bi Silêman ve nehatiye girêdane. Çima bi wî ve girêdayî nemaye. Ferasetên namûsa feodal te didin axaftin, nexwe berovajiyên Cahîdê nexema te de ne. Bes ewder te eleqeder nake, ji ber rêxistinê eleqeder dike! Tu tenê dikarî hekemtiyê bikî. Tenê rolên hekem û muxalîfiye te eleqeder dikin." Pişt van axaftinan derbasî qoxuşê bûm.

Piştî demekê platforma Cahîdê hat çêkirin. Ji girtîgehê derket. Em hinek din berfireh axivîn. Got;

"Piştî ku tu û Muzaffer çûn, min xwe di valahiyekê de dît. Baldariya min a li hember Ahmet jî di vê pêvajoyê de pêş ket. Ev jî bi şêwazek xwe sipartinê çêbû. Ez bi te û Muzaffer ve hatibûm girêdan. Çûna we bandorek giran li ser min kir. Min demekê xwest ku min sewkî Dîlok, an jî Çanakkale bikin. Hevalan jî guncav nedît. Min jî hewl da wê valahî û tenêbûnê têkîliya bi Ahmet re derbas bikim. Em her du jî di rêveberiyê de bûn. Dema me li wir hev dît, min nekarî vê rewşê vekim. Ji ber dergistiya Silêman bûm. Ew jî di vê mijarê de aciz bû. Jixwe têkîliya min a bi Silêman re ji 88'an ve qediyabû. Min di nameyên xwe de jî diyar dikir. Lê ti caran min nekarî bi temamî qut bikim. Pişt re Ahmet derket holê. Pişt re me name ji hev re nivîsandin. Min wê demê jî pir vekirî nivîsand. Piştî ku ez derketim me hev dît. Em demekê li Riha û Tarsûsê bi hev re man. Paşê hatin Stenbûlê. Dema em li bûroyê liqay hev hatin, min xwest ku ji te re bêjim. Lê min nekarî. Ez wê demê ji bona vê giriyabûm."

Ez jî wê guhdar dikim û min jê re got; “zêde negirîng e ku tu ji min re bêjî, an jî nebêjî. Lê diyare te tiştek ne baş kiriye. Tu deh salan dergistiya Silêman bûyî. Hinek mabû ku ew têkîlî te ber bi îxanetê ve bibe. Te pirsgirêkên di wê mijarê de derketin holê jî, weke doza xwînê nirxand û girte dest. Te kir pirsgirêkek namûsê. Di heman demê de tu ji ber wê nêzîkbûna xwe ketî zindanê. Tu her tim ketî û rabûyî. Te hemû lewazî û binkeftinên xwe ji demê re hiştin. Kêmek mabû tu bibî sedema jiyana xwe. Piştre jî bê ku tu têkîliya xwe ya heyî biqedinî, te xwe bi cihek din ve girê da. Wê demê dema em li Amasya bûn sedema xwesteka te ya qedandina wê têkîliyê jî Ahmet bû. Tu vekirî nedi-axivî.”

Got; “na.” Di vir de sond xwar û got; “piştre ev tişt pêş ket. Ne hezkirinek bû. Tenê bêçaretiyek bû. Te rexne li min dikir. Te ji min re digot; ‘li ser lingê xwe bisekine.’ Lê min jî nekarî wisa bijîm. Min sernexist.” Bi girî axaftinên xwe berdewam kir; “piştî ku ez derketim derve, çûm serdana Silêman. Min xwest gustîlka xwe derbêxim. Dema mi dît ew bandor dibe, min cardin kir destê xwe. Di vê mijarê de ya tewanbar ez im. Hem min soz da, hem jî pê ve girêdayî nemam. Min rast negot.”

Çi tiştek ecêb bû! Ji ber bêçaretiyê xwe disparte yeke din. Dema min ew li Stenbûlê dît, min hîs kir ku hinek tiştên ecêb hene. Nêzîkbûn, axaftin û her tiştên wê hatibûn guhertin. Nerehet bû. Dema Ahmet jî hat, destpêkê bi Elî Îhsan re hevdîtinek kir. Ew jî weke berpirsyar şandibûn Rihayê. Wê biçûya cezayê sîxûrekê pêk baniya û cardin di demek kin de vegeriya. Lê dema çû, demek dirêj venegerî. Çalakî jî pêk ne

anîbû. Bi Cahîdê re çûbûn Tarsûsê. Dema vegeriya jî bi dehan hêcet rêz kiribûn. Lê belê, wê demê tiştek din nedihat bîra ti kesî.

Belê, xeyal û fantaziyên Cahîdê yên derketina derve cuda bûn. Wê her tişt zêde asayî û hêsan dinirxand. Digot; "ger ez derkevim, ezê biçim kêleka deryayekê bi şerefa vê derketinê qedehek şarab vexwim!" Ji nişka ve nîqaşek derket û min jê re got ku, ger hinek taybetmendiyên xwe derbas neke, dê wê bibin heta îxanetê. Zora wê çû û giriya. Gelek kesên ku ji girtîgehê derdiketin digotin; "em hinekê ji xwe re jiyan bikim." Çi jiyan dikirin û wê çi bijiyan? Heta ku daxwaza xebat û karkirinê hebe û her kes li benda vê be, wê çi bihata jiyîn? Wê rojê bi gurubek ji girtîgehê derketî re ji bona gerê û seyranê diçin nav daristanên Belgratê. Ji min re jî gotin; "tu muhafazakar î" û dilxwede ez nizanim kêfa vê jiyanê bijîm, gelek gotin ji min re kirin. Ez jî bi Ferda wan re di nava karên qada legal de bûm. Berîtan jî ji girtîgehê derketibû. Xebatên me yên Komaleya Jinên Welatparêz (YKD) ber bi xilasbûnê ve diçûn. Ez bawerim kêfxweşiya wê jî, hezar carî zêdetir ji dîtina daristanên Belgratê kelecan ava dikir û besî min bû. Ger ev jî muhafazakarî be, bila be!

Ez û Cahîde li Akademiyê li hember hev biyanîbûn. Em demek dirêj di girtîgehê de bi hev re man. Lê di heman demê de her tim me bi hev re şer dikir. Rastiyek me jî wisa hebû. Bandora wan salan hêj hebû. Li Akademiyê jî wisa bû, nexasim bûyerên dawî jî sarbûnek tam ava kir. Helwesta Cahîdê ya ji bona xwe dana jiyîn, sipartin û bêçaretiya xwe bi sipartina hinek kesan ve bikare derbas bike, gelekî xeter bû. Gumanên min jî hebûn. Lewma min nedixwest ku biçe metrepolan.

Xisletên wê yên jiyana burjuvaziya biçûk, bêrîkirinên wê pir diyarker nebin jî, di kesateya wê de berbiçav in. Weke din jî ew çelexwariya di hezkirin û hest de dijiya, kesayeta wê zêde xirab kiribû. Ez tevlî nedibûm, bê ku xwe veguherîne biçe. Min nekarî wê qane bikim. Bêbaweriya wê jî ew dida dest. Di encamê de çûbû metrepolan. Çûbû cihên ew xilas kirî.

Mirov nikare di şoreşê de bi bazaran hinek tiştan ve bimeşe. Ger mirov şoreşê bi zewqek mezin, qinyatek mezin, evîna têkoşînek mezin ve hemêz bike, dê kesayet bikare bimeşe. Bêrîkirin, azwerî, hirs, hestên tolhildanê yên kesane mirov dibin asta herî ketî. Kesên çav bernedin xweşikbûna têkoşînê, wê her tim hebûna xwe bifiroşin îxanetê û nikarin xwe ji vê rizgar bikin.

Rêxistina Yekîtiya Jinên Welatparêz, ceribandinek pêşî bû. Piştre Rêbertiyê got; "ya rastî em dikarin konferansek jinê lidar bixin. Pêkhateya me jî guncav e." Plana xebatek wisa bi min re jî kêfxweşî ava kir. Di nava têkoşîna me de girîngiyek mezin dida pirsgirêka jinê. Dahûrînên li ser jinê jî bandor dikir. Herî zêde jî axaftinên Rêbertiyê yên Adara 87'an zêde bandor kiribû. Plana xebatên xweser û zelalkirina wê zêde girîng bû. Lê hêj di nêzîkbûna ji pirsgirêkê re seresertî hebû. Ji eniya hevalên jin jî, ji eniya hevalên zilam jî nêzîkbûnên wisa hebûn. Nîqaşên di dersan de jî dibûn sedem ku rê ji şîroveyên cuda re vekin. Weke tabu nêz dibûn ku, kes dest nede. Lê heta pirsgirêka heyî di kesayetan de neyê dahûrîn jî, nayê fêmkirin. Nêzîkbûnên ku weke li Rêbertiyê guhdar dike, lê mixabin di cewherê xwe de jî ti guhertinekê nake, her tişt paşve dikişand.

Di nava civînên me de jî heta cihekê nîqaş tên kirin û ji wê jî derbas nakin. Axaftinên Rêbertiyê tên dubarekirin. Ew axaftin jî kûr nayên şîrovekirin. Nêzîkbûnek lewaz heye. Lewma wê Konferans mîsoger pêşketinekê ava bike. Bi hevalên jin re zanebûna yekîtiya cinsî û hewldana pêşxistina wê lewaz e. Rêveberiyên heyî jî sembolîk dimînin. Nikarin bibin hêza biryarê ya gotin û bibandor. Gurubek hevalên ji Tirkiyê jî heye. Wê ew jî ji bona xebatên Tirkiyê amadekariyan bikin. Di heman demê de Meral jî dahûrînên Rêbertiyê yên têkildarî jinê berhev dike. Ji akademiyê veqetiyaye. Ji bona Mizgîn û çend hevalên din jî dibêjin ku, dê biçin Tirkiyê. Lê zêde daxwaza wan a ji vî alî ve tine ye. Ew jî ecêb lê dinêrin. Mizgîn Botanê ferz dike. Li Tirkiyê pêdiviyek mezin heye. Rêbertî jî zêdetir dixwaze komekê ji hevalên jin amade bike. Wer bawer dike ku, dê hevalên jin zêdetir derkefên xebatê bibînin. Ger şêwaza xebatek rast were esasgirtin, dikarin demek dirêj kar bikin.

Lewma axaftina min a herî dawî bi Meral re, ya rastî di axaftina xatir xwestinê jî pir ecêb bû. Ji bona wê şansek xweş û firsendek bû. Lê wê hêj weke keçên Tirk hesabê çûna Botanê dikir. Dixwest keçên Tirk bişîne Botanê. Digot; "wê tu bibînî. Ez dikarim pênc sed keç bişînim Botanê." Min jî got; "tu pênc keçan bişîne Behra Reş bes e û têrê dike. Berdêla hemûyane." Belê li Behra Reş pêşxistina têkoşînê bendewariya me tevan bû. Lê diyar dibû ku biçûka me hêj wê giyana xweseriya wir najî.

Mizgîn dema hatî qadê, bi Botanê re derbas bibû. Sê mehan geriyabû, wisa hatibû. Ne hindike ku mirov sê mehan li çiyê bimîne. Mizgîn pratîkek jiyan kiribû. Ecêb bû. Dixwest

biçe qada destpêkê gêrîlatî lê kiriye. Dilketiyê wir bû. Dema hîn bû wê neçe wir, giriya. Ew Tirkmen bû. Tirkmen, ji Elewiyên Tokatê bû. Bi zindîbûn, dilgermî, sadebûn û kenê xwe yên tije hêvî ve, bandor li min kiribû. Carê min bela xwe lê dida; "ez bawerim dîsa xwîna te ya Elewî dikele." Ya bi wê re jî germahiya hevbeşbûna bawerî û têkoşînê bû.

Ez û Meral di dewrê de pir kêm bi hev re di-axivîn. Pêvajoya herî zêde bi êş bû. Gotin û nîqaşên me yên di platformên fermî de teng diman. Rexne û hinek pîvanên nirxandinan derbas nedikirin. Vê jî têrê nedikir. Me nedikariya em wan yek bi yek di nava hev de vekin û bigihînin xisletên hevûdû temam dikin. Hinekê jî şerimbûnek hebû. Me dikariya em hinek din nîqaş û axaftinên bi cesaret ava bikin, hevpeyvînên ku em bikarin hevûdû baştir fêm bikin pêş bixin û wisa êşên pêvajoyê jî kêm bikin. An jî ew pêvajo bi êşên kêm ve derbas bibe. Lê me nedikariya em vê bikin. Helwestên me yên ziwa, rasterast, yek alî û li gorî xwe dibûn sedem ku, nêvengên hevpeyvînan jî tengaviyê bijîn.

Lê carekê min bi Meral re nîqaşek bingehîn kir. Di encamê de şerek me yê hevaltî û erênî çêbû. Pêdiviya min jî zêde bi vê hebû. Bê ku ez bihizirim, "gelo wê çi bibe? Nîqaşên me bigihin kîjan astê, dê çawa were fêmkirin?" Û wê gumanê bijîm pê re axivîm. Lê em herî zêde jî li ser gustîlkê axivîn. Ma min ji kur dizaniya dê cuda were fêmkirin? Ger min hinekê jî bizaniya, hesasiyeta nêvenga heyî bida ber çavan, min bizaniya ji eniyek din ve hesabê wê bikim, dê min di rojên destpêkê de, yekser piştî ku bi Rêbertiyê re axivîm, derbixista. Jixwe min derxistibû û cardin kiribû tiliya xwe. Ez jî dihizirîm ku derxistina wê veşartina hinek tiştan û ew têkîlî dana pêş bû.

Ger tenê têkîliyek wisa bûya, min dikariya pir baş veşêrim, li hember pêşketinên din bêdeng bimînim û bihesab tevbigerim. Qet neyê bîra min. Çalakiya derxistina gustilkê, di wê kêliya min îxanet û rev bihîstî de, ji bona min di hiş de tinekirina wê têkîliyê bû.

Êdî ti tiştek ayîdê wî ji bona min wateyek xwe tine bû. Kirêt bû. Lenet bû. Lê gustîlîk hinek din cuda bû. Agahiya wî tine bû. Rêbertiyê jî di destê min de dîtibû. Lê niha bê ku tiştekê ji Rêbertiyê re bêjim wê derbixim, ezê wî jî bixapînim. Hesasiyeta min jî di vê mijarê de bû. Min jî ev mijar û hemû xalên din dirêjahî bi Meral re nîqaş kir. Min ew jî ji bona li Almanya rewşa heyî ji min re negotiye rexne kir. Min hêj îsyan dikir ku, "we çima ji min re negot?" Hatibû gotin ku, "biryara rêxistinê ye. Divê jê re neyê gotin." Lê min hêj hesaba, "ma baweriya we bi min tine bû" dikir.

Mijara baweriyê zêde bandor li ser min kir. Min digot; "qet nebe, wê ez û Rêbertî wisa rû bi rû nehatiban." Rêbertî jî her tim helwesta min a wê rojê di dahûrînan de tîne bîra min. Dibêje; "giriya, hesab pirsî, îsyan kir." Her ku ev digot, ez ji qehran dimirîm. Ger min jî bigota; "na Rêberê min, ez ji ber vê û vê giriyam." Dê bihata fêmkirin ku ez wan rexneyan qebûl nakim û ew jî ji bona min bêşansiyek mezin dibû. Lewma ger min destpêkê bibihîsta, bêpîvaniyek di vê astê de jî pêş nediket. Dîsa hestên min ên "xweziya" derdiketin pêş. "xweziya dema ez di girtîgehê de bûm, pê bihesiyam…" "Xweziya dema ez li Stenbûlê bûm… Xweziya dema ez li Almanya bûm… Xweziya… Xweziya…!" Lê dîsa tişta bû jî derbas bû! Her ku ez vedigerîm û li ser wan dihizirîm, zêde dihincirîm. Ji ber min êdî dizaniya ku şaş bûn. Ez di ferqa vê rastiyê de bûm.

Çapemeniya KT zêde li ser me disekine. Cardin kovara 2000 Dogru berdevkiya xwe didomîne. Nivîsandine ku partiyê ez û Selîm Çûrûkkaya ceza kirine. Dilxwede behs dikin ku PKK di nava xwe de çiqasî bêrehme û terorê dibarîne.

Çend caran mirin hatiye kêleka min, nêzî min bû, çend caran jî min ew girtibû nizanim. Ya rastî nezehmet bû. Ez jî amade bûm. Lê min nekarî, ji ber di vê mijarê de nejêhatî bûm. Ez ti caran ji mirinê netirsiyam. Mirin ji min tirsiya. Dibe ku me lihev jî kiribe. Min digot; "heta ku serxwebûna Kurdistanê nebînim, ezê nemirim." Ev înadek bû. Ev jî li dijî mirinê serî rakirin bû. Daketina meydanê bû. Dibe ku carê em rojane bi sedên caran bi mirinê ve liqay hev hatibin. Me ti caran xwe ji mirinê jî nedida paş. Ew mirinek bi bela bû. Dibe ku ji bona wê jî em negirtin. Mirina herî xweş a di wextê de ye. Yê ev xweş biser xistin jî hebûn.

Agahiyên min girtin cardin înada min a li hember mirinê mezin kir. Min digot; "ger dijmin vê dixwaze, li benda vê ye, ez qetiyen nakim." Van lîstokan dihişt ez zêdetir hişyar nêz bibim. Min ji xwe re digot; "her çendî bêrêbaziyên bibin sedema binkeftinên min jî, ezê ji bona her gotina ku ji bona min dikin wan poşman bikim." Hêrsek mezin di dilê min de ye. Divê ez li şûna ku bi xwe re biteqim, sebra di çiyan û dijmin de biteqim jiyan bikim. Zêde bi ser xwe de diçim. Tenê ezê bikarim bikim, çûna çiya û çûna gerîla ye. Di vê mijarê de hinek gumanên min jî hebûn. Gelo Rêbertî ne şîne ezê çi bikim? Ez nikarim zêde li van deran bimînim. Nêvengên her tim bi nîqaş û pevçûn mirov dihincirînin. Min got; "tam wextê wê ye ku ez kîn û hêrsa xwe bi ser dijmin de bibarînim. Madem

dijminê min li benda mirina min e, ger ez bimirim jî ezê bi fîşeka dijminê xwe bimirim. Ezê ti caran dijminê xwe kêfxweş nekim.”

Ez ji hêla fîzîkî ve jî zêde zindî me. Ez di dewreya yekê de jî ji bona çûnê amade bûm. Jixwe dema dawiya dewrê sozên guruban hat girtin, Rêbertî cardin pratîka Dêrsimê nirxand. Berê Serhad li qadê bû, niha jî Dr. Baran diçe. Hevpeyvînên ku bi wan re pêş dixist de gelek rexne dikir. Du hevalên jin ên li Dêrsimê mayîn hebûn. Ji wir hatibûn. Navê wan Çîçek û Saadet bûn. Saadet bi girî di-axivî û rexne dikir. Derbarê nêzîkbûnên ji jinê re, xirabûnên di nêzîkbûnên hevalbendiyê de, ferasetên dijî Partiyê, bi şêwazê herî balkêş şîrove dikir. Her tişt li wir hatibû jiyîn. Qetilkirina hevalan, weke kole bikaranîna jinan, bê îradekirin, tenê weke amûreke çors bikaranîn û dîtin mijarên wehşetê bûn.

Rêbertiyê tam di nava van nîqaşan de ez jî rakirim. Got; “ma tu dibînî Sara. Li Dêrsimê çi li jinê kirine?” Her du hevalên jin ên gerîla şanî min kir û got; “ev belangaz jî bi zorê ji nav lepên wan rizgar bûne. Em çi bikin? Wê ev mijar li Dêrsimê çawa werin guhertin? Ma tu dixwazî biçî?” Min jî got;

“Dixwazim biçim Rêberê min. Lê dixwazim destpêkê biçim Amedê. Ji bona wir sozek min heye. Weke din jî vekirî bêjim li Dêrsimê, cem wan hevalan…” berî ku bi dawî bikim, Rêbertiyê ji Dr. Baran pirsî;

“Ma tu dixwazî Sara bi xwe re bibî? Dr. Baran berî her tiştî weke her carê ser berçavkên xwe re temaşe kir, hinekê daqurtand û paşê got;

“Bila bê Rêbertê min. Ez fermandarê leşkerî, ew jî bibe fermandara siyasî.” Rêbertî keniya, cardin vegeriya min û got;

“Baran dixwaze, hem jî weke fermandarek siyasî dixwaze.” Min jî got;

“Na Rêberê min. Ezê hinek din xwe bihêz bikim. Hînî leşkertiyê bibim, wisa biçim. Nexwe nediyare dibe ku min ‘binteht’ bikin. Li vir jî…” gotina min dawî nebû, Rêbertiyê bi dengê bilind kenek kir û got;

“Ne wisa? Pir xirab e! Doxtor ka binêre te tirsandiye. Wê demê dê çi bibe? Na, nabe, ma tiştek wisa dibe? Diyar kir ku divê mirov bi çûnek weke Seyît Rizayê nû, şêwazê derbasbûnek ku bikaribe li Dêrsimê netewbûnê pêş bixe, gerîlatiyek hêjayî Dêrsimê ava bike, binesaziya ku îxanet û Kemalîzmê ava kiriye ji bingeh ve biguherîne biçe. Ez jî di wê dewrê de neçûm. Ji ber Rêbertiyê ‘zû’ dît û neşand.

Lê ez vê carê hîs dikim. Bêrîkirin, xwest û hîs çiqas diyardeyên xweşik in. Ez jî beriya ku biçim kelecan û heza wê dijîm. Beka jî weke parçeyek ji welat e. Ez ji wir jî pir hez dikim. Bi sedan heval perwerdeya xwe li wir dîtin û derbasî welat bûn. Hinek ji wan şehîd ketine, hinek ji wan jî hêj li çiya nin.

Evîna kesayetek polîtîk ji serî heta dawî şer û têkoşîn e

Dîroka wê tam nayê bîra min, lê meha Îlûnê bû. Wê rojê Kanî tê heta ber konên me. Hewa xweş e. Tevî ku payîz e, hêj germe. Dema Kanî bangî min kir, xofek ket dilê min. Min tiştek hîs kiribû. Jixwe hestên min jî tevlîhev bûn. Ez di kêliyên

wisa de bendewariyan dijîm. Gelek kêfxweş dibim. Lê paşê jî dilê min dişikê. Lewma xemginiya wê min bendewar dike, pişt re agahiyek bêhna min teng bike digirim, an jî agahiyek qet ne li bendê me digirim. Ne wisa jî bû. Ez hinekê jî di ferqa pêşketin û bûyerên ku rû bidin de bûm. Di konferansê de biryar derketibû, dê Şener bihata cezakirin. Dê îro an jî sibe berdêla îxaneta ku kiriye bida. Jixwe êdî hebûn û tinebûna wî ya fîzîkî jî tiştek rave nedikir. Ji ber min ev rasterast jiyan dikir, ji bona min jî agahiyên ku werin zêde negirîng bûn. Ger jiyan û mirina mirov bi heman hêcetê ve girêdayî be, temam mirov dihizire. Ger mirov bi onur bijî, dê mirin jî bi onur be. Lê ger mirov bê-onurî weke jiyanê hilbijartibe, li wir mirov diqede û miriye.

Min li girtîgehê her du diyardeyên jiyan û mirinê jî jiyan kirin. Ez herî zêde nêz ve bûm şahida wan bûm şahidê wan. Her ku min ew dîmenên kirêt ên miriyên ku dijiyan didît, min zêdetir berê xwe da onurê û hemêz kir. Her tim li ber wê keda ku di jiyana hatiye kirêtkirin de hatiye pûçkirin diketim. Min ti caran hezim nekir ku ew ked di bin piyan de were tinekirin.

Kanî got; “de ka were em hinekê ji xwe re bigerin û sohbet bikin.” Min heta wê rojê yek carê tenê jî bi wî re sohbet nekiribû û pê re negeriyabûm. Ji ber hinek xisletên wî dibûn sedem ku bi min re bertek ava bibin. Ez jê dûr diketim. Min uslubê wî her tim dişiband uslup û şêwazê peywendiya bazirganan. Bazirganiya siyasetê hêj xirabtire. Şert û mercên lihevhatin û pevçûnê girîng in. Ji ber bingeha çînî ya her duyan jî heye. Nêrîn û berjewendiyên li hember hev, hem lihev tînin û hem didin şerkirin. Dema li gorî quralê wê were meşandin, dê teqez ber bi encamê ve jî bibe.

Hevdîtina min a bi hevalê Kanî re li girtîgehê jî ji dûr ve çend caran çêbû, lê ji bilî wê me hev nedîtibû. Ew zû ji girtîgehê derket. Piştî ku hevalê Kanî derket qartek ji min re şandibû. Dema min li girtîgehê dibîhîst ku yên derketine xwe gihandine partiyê, ez pir şahnaz dibûm. Hevalên min jî dizaniyan ku baldarî, hezkirin û şahnaziyên min bi çi pêk tên, lewma dixwestin min kêfxweş bikin.

Niha jî cuda nêzî min dibûn. Li gorî wan êdî ya yeke din bûm. Ev jî tam nêzîkbûnek bextreşiyê bû. Heman weke nêzîkbûnên paşverû û kevneşop ên dema keça malbatekê dane mêrekê û êdî ti girêdana wê bi malbatê re nemaye tîne bîra mirov. Li gorî hinekan kesayeta min xilas bibû û ti nemabû. An jî teqez ezê biçûma! Lê wan ne dizaniya ez di nava têkoşîna xwe de me. Di nava partiya xwe de me. Hem jî di nava navenda wê de me. Ez ferdek vê dozê û keça vê dozê bûm. Ez ne keça kesek din bûm. Dema bi zorê ez dikirim ayîdê hinek din, ji qehran dimirim. Dîsa jî min her carê digot; "na, ez ne ya kesek dime. Ez mirova vê partiyê me. Ez neçûm. Ev têkîlî jî nikare min bibe ti dojehê!"

Belê, min ew rast bi hev ve girê nedabû. Evîna kesayetek polîtîk jî, ji serî heta dawî şer û têkoşîn e. Ez di vê mijarê de ne bê têkoşîn bûm. Lê min xwe bi hêz nekiribû û têk jî neçûbûm. Hewce dikir ku li şûna her carê wê têkçûnê weke mijarek divê li xwe vegerim û serî girê bidim, ji bona jê rizgar bim û veguherînim hewldanek serkeftinê piştewaniyek mezin heba. Gelek tiştên ku bandor li min dikir hebûn…

Lê weke tişta ku bandor li min dike Şener e, dê min daqurtîne, bigire bibe îxanetê temaşekirin, moralê min dixist û ez dêşandim. Ev nêzîkbûn kêrî tiştekê nedihat. Min derew

nedikir. Min nedikariya bi seknek sixte ve diyar bikim ku, ji tiştekê bandor nebûme. Min nedikariya bi gotinên tûj, her serê xulekê lenetê li îxanetê bînim û helwesta "partiyiye baş" raber bikim. Ev jî ne nêzîkbûnek durist bû. Ne pêdiviya partiyê bi vê hebû û ne jî kesayeta min xwedî xisletek vê bike bû. Ez pê bandor bûm, hem jî zêde bandor bûm. Min ti caran weke bûyerek ji rêzê lê nenêrî. Ne ku ajoyên (gûdû) min, ketîbûna min a jiyanê, bêçaretiya min û lewaziya min a zêde hebû, ez ber bi vê têkîliyê ve birim. Ne ku hestên min hedê xwe derbas kiribûn ev têkîlî pêş ket. Berovajî vê dema karyera min a rêxistinî erênî bû, pêvajoya ku baweriya min li hember min zêde bû, min xebat bi zewqek mezin dimeşand û kar dikir bû.

Kesê ku di rewşek lewaz û di nîqaşê de, Şener bû. Ev xal gelekî girîng e. Ji ber mebesta şerekî bû. Lê mixabin, min tenê aliyek vê didît. Di heman demê de Şener xwedî hêz bû, lê xwe disparta çi, nîtelîka wî çibû û çi dikariya bike? Min zêde ev mijar baş û zanebûn nenirxandibûn. Lê ez ne di rewşek wisa saf, hatiye xapandin, reslîmî wî bûme û her tişt ji bextê wî re hiştî de bûm. Her çendî Şener di vî şerî de hêz be, kar bikira jî dê di bin venêrîna rêxistinê de bikira. Ez jî hêz bûm. Baweriya min bi rêxistinê hebû. Rehetî û baweriya girêdana bi rêxistinê ve besî min bû. Min jî jixwe xwe di vê mijarê de dixapand. Ango ji bona şerek wisa van jî têrê nedikir.

Li meydanê bi Kanî re yek-du caran çûmûhatim. Nûman jî hat cem me. Diyar bû Kanî nedizaniya ku wê çawa mijarê veke. Ez amade dikirim, da ku wê agahiya 'xebera reş' ji min re bêje. Min jî êdî nekarî xwe û jê re got;

“Tişta di devê xwe de derbêxe. Ez texmîn dikim. Bêje. Hêza min heye ku ez her agahiyê pêşwazî bikim. Ez ne kesayetek ewqas bêçare û lewaz im. Rewşa min ne di vê astê de ye. Bêje.”

Kanî got; “ser xêrê hat kuştin. Em jî xilas bûn, tu jî xilas bûyî. Li mala wî hinek jinên din jî hebûne. Di heman demê de ji yekê zêdetir bûne. Hevalan yek ji wan sax girtine. Ya din jî miriye.” Em demekê bi hev re bêdeng meşiyan. Ew jî min dişopînîn. Gelo ez çiqas bandor bûme û ezê çi bêjim! Bêdengiya min berdewam dike. Ez neneçar im ku bi-axivim.

Kanî got; “ne baş e ku tu bi şêweyek din bibîhîsî. Ya herî baş bangî kirin û ji te re gotin bû. Rêbertiyê got; “biçe pê re bi-axive.” Hêj Heval nizanin. Min hêj ji rêveberiyê re jî negotiye.”

Min jî bersiva wî da; “ hûn min nas nakin. Ger we nas bikiram, hûn wisa ne di-axivîn. Ez nabêjim hûn çima hatine agahiyê didin min. Lê ger bi şêweyek din hîn bibam jî, ji bona min ferq nedikir. Ji bona min dema Şener, revî û îxanet kir mir. Diyardeyên hezkirin û nefretê ne hêsan in. Ew jiyîn û li hev veguhertin jî qet nehêsan e. Ez di wê baweriyê de me ku min ev mijar ser xistiye. Lê dîsa jî ez di wê baweriyê de me ku, hûn ne li bendê ne ez helehelên kêfxweşiyê bikim, destên xwe li hev bidim û bireqisim. Ji ber hewl tê dayîn gelek bertekên wisa ecêb weke wêrekî û şoreşgeriya herî baş werin destnîşankirin. Temam, ji bona we wisa agahî da min we spas dikim. Ger tiştek din nebe, dixwazim biçim komîna xwe.” Paşê ji wir çûm.

Piştî demek kin dengê çekan hat. Dengê qîran, tilitiyan, govendê, her tişt têkilhev bû. Em hemû ji cihê xwe rabûn. Kî derdiket çeka xwe digirt û fîşek direşand. Em hemû bi çekên xwe ve derketine. Asîman tarî bûye. Ditirsim ku di nava vê hengameyê de heval li hev bixin. An jî hinek kesên dil xirab hebin di nava me de pir rehetî dikarin vê navendê proveke bikin.

Min ji wan re got; "hevalno! Her kes ji xweber fîşekan nevêjin. Ma çi heye? De ka rawestin? Wê kêliyê de çavên min li endamê rêveberiyê Salih ket. Min jê re got; "heval bê ser û ber fîşekan davêjin. Destwerdin. Ne baş e ku tiştek bibe."

Got; "na, tiştek nabe. Ma tu çima sekinî? Tu jî fîşekan bavêje. Şener hatiye kuştin. Ez keniyam. Her kesî tam xwe winda kiriye. Ev jî min ditirsîne. Reşandina evqas fîşekan ve pîrozkirina kuştina provakatorekê çi qîmet bû. Bertekek çawa bû. Ez ti wateyê nadim vê bertekê. Xweziya hemû bertek û hêrsan wisa zû cihê xwe bigirtan. Ti giraniya vê bertekê ya siyasî tine bû. Her kes hedê xwe derbas kiriye. Weke ku asta şerê heta wê rojê hatiye kirin kêm bûye, nû kêfxweş dibin. Rêbertiyê bi mehan bê navber ponijî û da ponijandin, nirxand, rexne kir û hejand. Dîroka têkoşîna me ji gelek aliyan ve ji nû ve vekir û nirxand. Planên dijmin serûbin kir. Li welat bi ferzkirina gerîla, berfirehkirin û pêşxistina serhildanan ve bersiva herî baş da. Merasîma cenazeyê Vedat Aydin tam di astek raperîna gel de bû. Li her qadê tevdîrên rêxistinî girtin, hemû binyata partiyê li dijî provakasyonên dijmin ên dawî hişyarkirin, şêwaza jiyan û şerê rast ferzkirin bersiva herî bibandor bû.

Dema ku tiştên bi vî şêwazî hatine jiyîn, bi helwestên tolhildanê yên erzaniyek çors ve tînim berhev, matmayî dimînim. Bi taybet hinek heval jî gelekî xam nêz dibin. Nexasim tên li konê ku ez lê me govendê digirin. Tevî ku dizanin ez di rewşên asayî de jî govendê nizanim, min vedixwînin govendê. Pîvana wê şevê gerandina govendê û valakirina şarjoran bû. Her kes di vê mijarê de di nav pêşbaziyê de bû.

Ez dîsa tevî hemû sergermiyan, bêdeng bi xwe re mam û lêpirsîna xwe dikim. Di rastiya heyî de provakasyonek ku partiya me tehdît dikir hebû. Lê tişta esasî berjewendiya şoreşa me bû. Tenê ev alî bes bû ku ez weke kesek partiyî vê erê bikim û di vê mijarê de qane bibim. Dîsa jî nedihat wê wateyê ku dê hest û bertekên cuda neyên raberkirin, an jî ew red nedikir. Weke hevalê min Kanî got; "em jî, tu jî xilas bûn", rizgarbûn jî ewqas hêsan nedibû.

Nîtelîka provakasyona helwestek wisa ferz dikir. Lê di cewherê de hebûn û tinebûna wî ya fîzîkî, xisleta şerê min nedida guhertin. Gelo xisleta têkoşîna çîna navxweyî bi me re çawa dihat jiyîn, çima meyil û feraset carekê de ber bi îxanetê ve diçûn? An jî çawa dikariya meylên xwe dem dirêj bidin jiyîn û xwe dispartin çi? Ji ber dema ev rewş derdiketin holê, piştî wê di nava me de pêvajoyek jandariyek mezin tê jiyîn. Dema nîtelîk û sipartekên provakasyonan rast neyên peyîtîn, an jî qadro, binyata giştî rast tênegihêjin, gelek nêzîkbûnên ku provakator nekarîne bikin, dibin sedem rê ji texrîbatan re veke. Xeternakiya van jî nekêm e. Di nava partiyê de jî rêbaza herî zêde texrîbatê dide avakirin, bandora pravokasyonê bi her kesî re dîtin, her kes weke sipartekek xwezayî dîtin û her kes alîgirê

wê nîşankirine. Ji ber ev nêzîkbûn sipartek û meylên esasî dinixumîne û vedişêre. Hemû meylên xeta têkoşînê şêlû û berevajî dike, bi vî rêbazî nayên derbaskirin. Esasgirtina xetê, tevgerek li gorî şêwaza şerê wê ferman dide pêk anîn, di van xalan de, asta herî jêr de jî be, xisleta wê ya hevgihînê bi qasî hostaniyek bikare hemû jêhatiyên hêz bidin hev anîna cem hev dana raberkirin û ev kirina hêzek rêxistinî, wisa ber bi hedefê de çûyîn, tişta herî zêde hewce ye û herî rast e.

Yê herî zêde vê rêbazî hostane pêk tîne Rêbertî ye. Ji ber bi ser xala bingehîn de diçe. Dema xalek herî biçûk a erênî dibîne, heta dawî wê bikar tîne. Lê bi gelemperî rewşa şêwaza bi binyata hevalan de tê jiyîn, şêwaza ku qadro pêk tîne, hewldana karê ku tê kirin jî asteng dike. Mirov digire beramberî xwe û bi temamî neyênî destnîşan dike. Ev ne şêwaza şer e. Nexasim dema vê dike tasarufek raye, rêxistin dike tasarufa xwe ev tê kirin, mirov ji amûrên rêxistina beramber mehrûm dihêle û wisa neçarî şer dike. Mirov nikare li vir li benda qezenckirina ferd be. Ji ber bi temamî şerek ku hevsengiya wê tine ye û tenê encama yê beramberî xwe winda bike dimîne.

Wê demê divê em çawa şer bikin? Şêwaza min jî her der gur dikir. Şêwaza ku ez qal dikim xwe disparta zemînê min. Dibû gavek pêşveçûnê. Heta demekê ez jî weke ji xwe tolê rakim bi nêzîkbûnek, ‘çawa fêm dikin bila be’ weke textê polîgonê (textê nîşan girtinê), min xwe jî danî naverastê. Vê înadê jî zerar da min. Ti xisleta kesayeta min a vî şerî bide rawestandin jî tine ye. Hinek xisletên min jî li gorî min hene, tevî ku bi hinek xisletên din re zû hevdibînin û bi wan re kar dikim, dîsa jî lihev nakin û nêzî hev jî nabin. Ev şêwaza her kesî û her tiştî li dijî xwe derdixe, gelek tişt dida windakirin.

Belê, roja paştir berdêla cewaziya wê şevê derket holê. Rêveberiyê bangî min kir axivî. Numan got; “tu xemgîn bûyî, te xwe daye kêlekê û bi tena xwe hizirî, heta te xwe bi ser hevalan de aciz kiriye. Te gotiye, ‘hûn çima fîşekan diteqînin? Hûn çima govendê digirin?...” Her wiha gelek tiştên din rêz kirin. Aciz û bi hêrs, bê ku guhdar bike di-axivî.

Yekem car bû min bi Nûman re wisa nîqaş dikir. Min Nûman li Çanakkalê nas kir. Zêde li Amedê neman. Xwedî xisletên têgihiştî û pêşketî bû. Me derbarê gelek mijaran de nîqaş kiribû. Piştî min di sala 91’ê de derketibû. Bi zagona nû hatî derxistin re, ew jî hatibû berdan. Demek kin li Stenbûlê ma. Paşê em bi hev re çûn Amedê. Zêde li wir jî nema derket. Dîsa hevalê ku min di pêvajoya Konferansê de herî zêde pê re nîqaş dikir, ew bû. Wî ji gelek hêlan ve kesayeta min nas dikir. Şahidê bertek û hestewariyên min bû. Her çendî hinek kesên din, hinek mijarên din ragihandibin, hêza wî hebû ku hemûyan rast binirxîne û dikariya fêm bike. Tevî van rastiyan, dema ew qas tişt li ser hev, bê navber ji min re got bandor li min kir.

Hevalên rêveberiyê piranî nû ji zindanê derketibûn. Bi taybet hinek hevalan zorî dida xwe, da ku bi ser min de werin. Wer dizaniyan ku çiqas bikarin xwe bi ser min de aciz û hişk bikin, ewqas dibin xwedî helwestên rast. Li şûna ku divê quralên heyîn pêk bînin, dervî wan tevdigeriyan, zehmetî ava dikirin û nêzîkbûnên tund raber dikirin. Lewma ez li hember wan mat dimam. Derûniya gelek kesên ku ji zindanê derketine wisa ye. Nûman heta wê rojê gelekî baldar nêz dibû. Lê, nizanim ji bo çi bû. Wê rojê bi hêrs bû. Em li hember hev bi bertek û hêrs axivîn. Ez pir aciz bûm û min destpê kir;

“Êdî bes e! Bila hinekê bextê we hebe. Ti mafê we tine ye ku ji bona her tiştê hûn dibihîsin, bangî min bikin û hemû bertekên xwe ve êrîşî min bikin. Çima hûn bê ku min guhdar bikin, yekser darezînin? Çima dixwazin bûyeran çeloxwarî bikin? Çima hemû nîqaş û peywendî tên tengkirin û paş ve dikişînin? Dîsa dibêjim, ne rast e ku ew çek wisa bên teqandin. Ezê vê mijarê ji Rêbertiyê re jî ragihînim. Em çi û kîjan serkeftina xwe pîroz dikin? Gelo bi rastî jî ev kesên ku evqas fîşek teqandine, di ferqa asta provakasyonê de ne. Fêm kirine gelo? Biryara konferansê bû. Ev biryara Partiyê bû. Ne tiştek nû bû. Weke din jî gumana min ne ji ber tiştek din bû, gumana min ji ber weke dîna fîşek dihatin reşandin. Ji bona ti qeza çênebe, min helwest raber kir. An jî kesayetek xwedî niyetek cuda heba, dikariya pir rehet provakasyonekê bike. Dikariya hinek bikuştan. Ma we dikariya hûn pêşiya vî tiştî bigirin? Ger niha tiştek nebûye jî, ev jî rastê nehatiye. Ji ber ti venêrînek tine bû. Di serî de jî rêveberî har bibû. Govend jî bi heman şêweyî bû. Bi zanebûn hatin cihê ez lê rûdinim govend gerandin. Tevî ku her kesî derve govend digerand, hinek kes bi taybet zanebûn hatin di hundirê kon de govend gerandin. Ev nêzîkbûnek zaroktî ye. Ma ez dijmin im? Hinek nêzîkbûnên ku, mirov ‘dijmin ji qehran biteqîne’ hatin kirin. Weke din jî ji min re dibêjin, ‘tu jî were bireqise.’ We kengê dîtiye ku ez tevlî govendan bûme? Di rastiyê de tiştên ku rû dane jî ev in.”

Nûman hinek din hedirî got; “were em hinekê derkevin derve.” Dema em derketin, êdî min xwe negirt û giriyam.

Min got; “nêzîkbûnên we min lewaz dixin, hêz nadin min. Hûn nikarin her tim min wisa tewanbar bikin. Min jî ev heq nekiriye. Ma hûn dizanin ez çiqas pê bandor bûm? Hêrsên bi

me re weke pifdankê (balonê) ne. Carekê de diteqin. Lê bingeha wê nesaxlem û netêgihiştiye. Ger bingehek wan a bîrdozî û bihêz hebe, jixwe em jî wisa li hember hev nateqînin. Tiştek xwezayî ye, min pêvajoyek jiyan kir. Di nava vê pêvajoyê de jî ne tenê Şener, an jî ne tenê ev têkîlî hebû, hûn hemû jî di nav de bûn. Her tişta ku mirov di têkoşînê de qur dike û davêje, êş jî dide jiyîn. Min jî hinek tişt qut kirin û avêtin. Lewma ez nikarim ji êş û bandora wê birevim. Mîsoger ezê bijîm. Hevalên min her tiştî hêsan digirin dest. Min van rojan janên gelekî giran jiyan kirin. Lê yeqîn bike, çi dibe bila bibe, ezê li hember her tiştî li ber xwe bidim û hêza min a derbaskirinê jî heye. Tişta ez jî ji we dixwazim, hinekê ji min bawerkirine. Yan jî qet nebe, vê pirsgirêkê evqasî kûr nekin û tiştên ku, min bişkînin nebêjin."

Numan her min guhdar kir û ji min re got; "hinekê polîtîk be. Vê polîtîkayê hîn bibe. Hinek jî be hestên xwe ji xwe re bihêle. Dê wê demê hêza te jî têra her tiştî bike. Baweriya min bi re heye." Nîqaşa me ya bi şer û pevçûn destpê kirî, wisa bi hevalbendî û xweş bi encam bû. Lê min dîsa jî, nekarî wê êş û xemginiyê li ser xwe bavêjim.

Rûniştim û min ji Rêbertiyê re nivîsî. Em nêzî dawiya dewrê dibin. Nivîsek hem weke rapor, hem name û hem bîranîne. Min hemû bûyerên bandor kirine, hestên xwe, mijarên min xwe xapandine û rexneyên xwe nivîsand. Ya rastî min ti caran nivîsên xwe yên ji bo Rêbertiyê dereng nexistin. Ji serî ve gelek raporên agahdarkirinê, raporên rexnedanê û raporên xwe yên mehane nivîsandin. Hemû dirêj û hûr û kûr bûn. Min ji bilî van jî di mijarên ku zehmetiyan dijîm, şaş dibînim û pêdivî dibînim de nameyên cur be cur nivîsandin.

Nêzîkbûnên ku tengezarî ava dikirin, di dewreya yekemîn de zêdetir bûn. Rexneyên Rêbertiyê, li gel rexneyên binyata hevalên din û rojevên sûnî yên rêveberiyê ava dikir, gelekî giran bû. Lê min tevî van hewce didît ku ji Rêbertiyê re binivisînim. Her çendî naveroka wan bi bertek, gazin û rexneyan ve dagirtî bin, baweriya min hebû ku dê Rêbertî fêm bike. Her wisa bendawariyên min û lêkolîna min a çareserkirina pirsgirêkan ez zindî dihiştim.

Rojekê Rêbertiyê li mêvanxaneyê bi komek hevalên jin re hevdîtin kir. Di hevpeyvînan de pirsa min jî dike û nirxandinên cur be cur tên kirin. Nirxandinên di vê mijarê de gelekî nepixandî û sûbjektîf tên pêşxistin. Di platformande jî diyar dibû. Rexneyên Rêbertiyê jî hebûn. Nîqaş kirine ku, pîvanê nêzîkbûnên min ên ji Rêbertiyê re yên burjuvaziya biçûk in. Dilxwede ev rastî ji cil û bergên min heta nêzîkbûnên min diyar dibin. Dane diyarkirin ku, herî zêde pirsgirêka jinê nîqaş dikim, nirxandinên min ên di vê mijarê de heman weke yên Şener in. Ango min xwestiye bandor li binyata hevalan bikim. Hwd, hinek tiştên din hatine gotin. Kesek ku tevlî wê civînê bûyî ev nêrîn ji min re got. Di heman demê de ji min re dibêje ku, divê ji min re jî ne ragihîne.

Ez gelekî hêrs bûm û min got; "madem Rêbertî bi we re axivî, te çima ji min re got? Carek din jî tiştên wisa ji min re nebêje." Min xwe bi ser de aciz kir, lê yekser rûniştim û min ji Rêbertiyê re nameyek nivîsand. Min qebûl nekir û bi tundî rexne kir ku, qebûl nakim nêzîkbûnên min ên ji Rêbertiyê re wisa werin nirxandin. Di heman demê de min diyar kir ku, neraste wisa were nîqaşkirin, ji ber bandor li min dike.

Weke din jî min rexne kir ku, Rêbertî çima rexneyên xwe yên ji bona min dike bi hinek kesên din re parve dike. Ango min gazincên xwe ji Rêbertiyê kir. Li hember Rêbertiyê îsyan kir.

Nêzîkbûnên min ên herî xwezayî cuda tên nirxandin. Her axaftina min bi Şener re yek tê nirxandin. Min xwest ku destûra vê neyê dayîn. Hinek mijarên din ên weke vê jî min nivîsand.

Bi rastî hinek tiştên ecêb pêş diketin. Wan jî tehrîk dikir. Her çendî di encama van de gazincên min hebin, ji ber ez bi çareseriya wan bawer bûm, her tim min jî serlêdana Rêbertiyê dikir. Hêza min têrê nedikir, an jî min derfetek din a bi nîqaşan çareserkirinê nedidît. Min hewl dida vê derfetê ava bikim, min dixwest nîqaş bikim, min hewl dida bi hevalan re çareser bikim, lê min ti carî rêbaza vê nedît. Gotinek herî biçûk a miqabilî min, nêzîkbûnek herî biçûk a şaş, dibû sedem ku ez bê rêbaziyek nû pêş bixim. Vê hem çavkaniya xwe ji şêwaza min a nirxandina bûyeran digirt, hem jî uslubê me yê mijar ravekirinê ji hev cuda bû. Di heman demê de bandora pêşdarezînan jî hebû. Lê carê ti mijarek berovajî û cewazî nebe jî, teqez hinek tişt dihatin dîtin û hêjayî min dihat dîtin. Derfetên em bikarin hevûdû fêm bikin, fêrbûn û taybetmeniyên navendên cuda ava kirine berçav girtin û wisa nêzî hev bûnê de, pirsgirêk dihatin jiyîn. Ger her taybetmendî û her fêrbûn biyanî be, cuda be, teqez ew xirab bû, şaş bû û li dijî partiyê bû! Ango nêzîkbûnên evqasî ji seriyekê ve dihat destgirtin û şîrovekirin.

Dema ez ji Awrûpa hatim min hinek cil û ber anîbûn. Min ji ber rengê leşkerî yê kesk pantolek û tunik kirîbû. Cilek sade û ji cilên me yên leşkerî asayîtir bi xetên hêsan ve hatine

dûritin bû. Dema min li malê li ber xwe kir û çûm akademiyê, Rêbertiyê bela xwe li min da û got; "xêre te cilên serbazan li ber xwe kiriye. Destpêkê bibe leşker." Min ev nêrîn weke rexneyekê fêm kir. Ango divê ez despêkê bibim leşkerek baş, çavdêrek baş, şagirtek baş. Lê ji ber ew cil rehet bûn min li ber xwe kiribû. Heta Rêbertiyê ji min re got; "ger tu bikarî li hember êrîşên Dr. Baran li ber xwe bidî, bi cilên xwe ve biçe. Keçên me xwe ji aliyê şêwe ve jî kirine zilam. Porên xwe kurt dikin, dema bi ser de pantol û gomlek jî li ber xwe dikin, tam dibin xort. Favoriyên wan jî hene. Ango ewqasî dixwazin bişibin wan."

Min piranî cilên daw (etek) li ber xwe dikir. Min pantol cilek fermî nedidît. Dibe ku ev jî rexne, an jî hişyariyek be. Wê demê nedihat bîra min ku dê li ser van mijaran jî nêrîn werin dayîn û girîng werin dîtin. Jixwe min li Awrûpa jî heval ji ber vê rexne jî kiribûn. peywendiyên wan bi gel re hebûn. Tevî vê jî hinek hevalan zêde jihevdeketî li ber xwe dikir. Paşê jî wan ji ber cilên ku min li ber xwe dikir, rexneya burjuvaziya biçûk li min kirin.

Her panzdeh rojan carekê li dibistanê karên weke serşûştin, paqijî û xebatên weke civîna wargehê, rapor û moral dihat kirin. Hemû jî di rojekê de dihatin lidarxistin. Li vê wargehê tişta min herî zêde jê hez dikir jî ev bû. Pergal û sazûmanî hatibû rûniştandin. Hem ji ber giraniya rojê sê dana sibehê, nîvro û êvarî perwerde hebû, hem jî rojane werzîş û nîqaşên êvarî hebûn, mirov her tim zindî dima. Di vê wateyê de roja civînê jî, roja herî giran bû. Mijarên weke rexne, pêşniyar û nirxandina xebatan, berpirsyariya hevbeş û hêza biryarê ya hevbaş ava dikir.

Av bi tankêran dihat wargehê. Ji bona serşûştinê jî cihek hinekê ji konan dûr hatibû destnîşankirin. Hinek warîlên mezin ên bi musluk hebûn. Ew jî bi tekelên maşînan dihatin gerimkirin. Rêbertî destûr nedida ku, kes dest bide daristanê. Çiqek jî nedihat jêkirin. Ew çiqilên darên ku bejna wan kin û bi stirî (dara bodur makî: bejna wan kin, li ber derya spî şîn dibin.) Pir bi qîmet bûn. Her kes bi îhtîmam nêz dibû. Em di heman demê de derdorparêz bûn! Hevalên ku ji qada pratîkê tên diyar dikin, li çiyê neçar in ku daran jê bikin. Dema li vir dûyê lastîkan derdor gemar dikir, kesî nedikariya bisekine. Me av bi bîdonê naylon ve dikişand. Me ji rêya panzdeh-bîst xolekan danî û pê serê xwe dişûşt. Me cilên zêde yên leşkerî li cem xwe ranedikirin. Lewma her carê hinek heval dawiyê diman û ji ber cilên wan ziwa nedibûn, neçar diman cilên sivîl li ber xwe bikin. Wê rojê jî ji ber cilên min ziwa nebibûn, ez neçar mam min jî roja destpêkê hatîm akademiyê cilên xwe yên kesk ku jê re digotin cilên Hindiya ne li ber xwe kir. Rêveberiyê piştî civînê bangî min kir. Dr. Baran destpêkê ser berçavkên xwe re awirek da min. Rûyê wî dişibiya wan "kalên xirab" ên bi ser nevî û zarokên xwe de aciz dibin. Dema piştî demekê min di nîqaşan de ev nêrîna xwe pê re parve kir, keniya. Axaftina xwe ya destpêkê de got; "evder akademî ye. Ev çi cil in te wisa li ber xwe kiriye? Wisa nabe. Tu nikarî pîrektiya xwe li vir ferz bikî. Em bi van tiştan nayên xapandin. Tu bi van rêbazan hewl didî hevalan bandor bikî…" Pey re gelek gotinên din rêz kir û hewl dida min aciz bike û bişkîne.

Min jî got; "xêre, çi dibe? Ma hûn dizanin, hûn çi dibêjin? Êdî bes e. Rast bêjin, hûn dixwazin çi bikin? Gelo hûn heval in, an jî hinek kesên dinin? Ez di nava sedan leşkerî de bûm. Bi

salan di nava dijmin de mam. Êşkenceyên herî hovane li min kirin. Dîsa jî cesaret nekirin van gotinên bê wate ku tu ji min re rêz dikî bêjin. Êdî nikarim van heqeretên we qebûl bikim. Ez bawer im, hûn min weke jinek ku pîrektiya xwe li hemberî we bikar tînê ve tevlîhev dikin. An jî li gorî we her hevalek jin, parçeyek pîrek e. Ne şoreşger e, ne mirov e, xirabeke. Baş bizane di nava PKK'ê de pênaseya jina xirab tine ye. Jixwe cihê jina xirab jî li nava PKK'ê de tine ye. Her jina ku tê vir xwedî onur e. Ji bona şer bike hatiye. Min jî salên xwe da vê şoreşê, lê kesekî ji min re negot 'tu pîrektiya xwe ferz dikî.' Nahêlim kes jî bêje, nadim gotin. Mafê te tine ku tu van tiştan ji min re bêjî. Heqê te nîne…" Ez jî navberê nadim axaftinên xwe, tije bûme û xwe vala dikim. Îske îsk digirîm. Dengê min rêveberiyê derbas dike. Vê carê jî Dr. tirsiya û hewl dide min bêdeng bike.

Got; "ka bêdeng be, bihedire. Min tiştek negot. Hatin wisa ji min re gotin. Gotin hişyar bikin. Min jî ji bona wê got. Ger min bizaniya wê tu wisa bandor bibî, min nedigot." Ez jî rabûm û çûm.

Min jî got; "ez şoreşger im. Tu dikarî bi min re şer bikî, têbikoş î. Tu dikarî her cure dûjînên siyasî ji min re bikî. Dê wê demê hinek tiştên ku ez jî ji we re bêjim hebin. Lê ji kerema xwe re lîstokên wisa kirêt nelîzin. Nexwe ez nikarim we heval qebûl bikim. Tiştên ku ez ji we re jî bêjim tine ye. Ezê van mijaran ji Rêbertiyê re jî ragihînim. Gelo hûn rêveberiya vir in, an jî hinek kesên ku ji bona moralê mirovan xirab bikin lîstokan dilîzin? Hedê xwe bizanin û hinekê jî rêzdar bin." Paşê jî derketim. Neketim hundirê kon. Dîsa heta neqeba jorîn çûm, heta ku westiyam li nav darên wir geriyam û heta taqeta min nema giriyam.

Wê rojê ez ji ber pantorek kesk, qurişkî (pîlelî), fireh û kirasek kesk û dirêj kembera wê heyî (tunîk), bûm “jina xirab.” Ger min tiştên gelekî nayên pejirandin li ber xwe bikira, dê min jî maf bida wan. Lê pirsgirêk ne cilên min bûn. Zîndewariya min a di werzîşê, meşên rêyan, waneyên leşkerî yên pratîkî û xurtbûna min a fîzîkî de jî, wateyek din digeriyan û cuda şîrove dikirin. Li gorî wan ez çima evqasî zînde, tevkar bûm, teqez hinek hesabên min ên ferdî hene!

Nîqaşa min û Doxtor jî bû sedem ku, ez cardin binivisînim. Min cardin ji Dr. Baran destûr girt û çûm li mêvanxaneyê ji Rêbertiyê re name nivîsand. Dr. Wê rojê dîsa hilhilî li derdorê min diçû dihat, dixwest bi-axive. Ji ber her cara ku, dihat didît ez digirîm, zêdetir mereq dikir. Êdî ji ber min nedikariya, dema min dinivîsand jî digiriyam. Herî dawî nizanim ji ber ew ketibû ferqê, an jî wî texmîn kiribû, hat mijar vekir, rexnedana xwe da û lêborîna xwe xwest. Got; “ya rastî ez te fêm dikim. Lê sedan heval li vê dibistanê hene. Wê rojê hinekê jî wan ez tehrîk kirim. Hevalek ji rêveberiyê got. Dema min ji te re got, ez jî tengav dibûm. Lê çi bikim, derbas bû. Tu jî serê xwe zêde bi van mijaran têşînî. Ev tiştên biçûk in. Em dikarin bi-axivin û çareser bikin. Hêvîdar im tu nahizirî ji Rêbertiyê re ragihînî. Ji ber nerast e. Hewce nake ku, mirov Rêbertiyê bi tiştan re mijûl bike.”

Min jî tenê guhdar kir û qet ne-axivîm. Ez di wê kêliyê de nehizirîm ku, gelo dê nameya min bidin Rêbertî yan na. Lê piştre gumanê min çêbûn. Ji ber ji bona raporek ku min nivîsandî gotin; “em nikarin bi wî rêbazî ji Rêbertiyê re ragihînin. Te bi bertek nivîsandiye. Te rexne li Rêbertiyê kirine. Tu dikarî carek din binivisînî.” Min wê demê fêm kir ku, raporek ku min

ji Rêbertiyê re nivîsandî hatiye xwendin. Çawa vî mafî bi xwe re dibînin ku raporên ji Rêbertiyê re hatine nivîsandin werin xwedin. Ez mat mam.

Di nava me de bi rastî jî jin gelekî tê hezkirin. Weke nirx tê dîtin. Her çendî di pêvajoyên destpêkê de pîvanên heyîn pir pêşketî nebin jî, têgihiştî û giranbiha bûn. Tevlîbûna jinê ji şoreşê re, bi jinê re kar meşandin û bûna rêheval, nirxa herî xweş û bedew bû. Bi rastî jî şaşî, kêmasî û pîvanên kevneşop dihatin rexnekirin û ti qîmeta wan jî tine bû. Lê dema ez niha li pîvanan temaşe dikim, nêzîkbûnên wê biçûk û ketî dibîne hene. Dema di nîqaşên dersan de ji pratîkên derbasbûyî hinek mînak tên dayîn, ez mat dimînim. Her tiştê jinê weke pîrektî şîrovekirin û dîtin, an jî di wê mijarê de êrîş kirin çawa dibû rexne, dibû hevalbendiyek çawa û ev şerek çawa bû?

Carekê jî nîqaşek me wisa bi Serhed re çêbû. Rêbertî hatibû dibistanê. Her cara ku, Rêbertî dihat dibistanê min moralek mezin digirt. Lê weke din jî her tiştê ku di derheqê me de dihat ragihandin bêhna me teng dikir. Ji kur peyda dikirin, ji kur derdixistin, çima dikirin, gelo ev taktîkek bû, an jî tehrîk bû, gelo hinek kesan dixwestin hinek xirabiyan bikin? Min tiştek fêm nedikir û wate nedida van mijaran. Ya rastî dema hinek din rehet û xwînsar dihizirîm, min pê derdixist ku ev bûyer ji kur derdikevin û çavkaniya xwe ji çi digirin. Lê belê, dema bi ser min de dihatin, min nedikariya wê xwînsariyê ve nêz bibim. Li pey hêrs û bertekên xwe diçûm. Ez jî di wan kêliyan de tam dibûm agirek. Hinde ez bandor dibûm, weke dîn û haran diketim rewşek wisa de ku bikarim tiştek xirab li xwe bikim. Min ji xwe re digot; “ezê fîşekekê li serê xwe bidim, baştire ku van gotinan bibihîsim.” Ev jî di mejiyê min de hatibû kolan.

Dema Rêbertî tê destpêkê bi rêveberiyê re di-axive. Bi kordîneya wê rojê re hevpeyvîn dikir. Mîsoger beriya bikeve dersê jî di-axivî. Ango Rêbertî her tim bi plan bû. Dizaniya ku dê li ser çi dahûrînan bike, dê çi bi-axive û wisa dest bi rojê dikir. Lê her carê jî hinek tişt dikir mebest û ji mijarekê destpê dikir. Wê rojê jî rewşa dibistanê pirsî.

Mîsoger rêveberiyê pêşde amade kiribû. Îhtîmalek mezin jî pêşî bi Rêbertiyê re axivî ne. Derbarê me de gelek tişt dihatin ragihandin. Her kesî jî li gorî xwe agahî didan. Rêbertiyê gelek caran got; "de ka hevalên xwe binêrin. Ên herî nêzî we ne. Dibêjin ku; 'em wan bikujin, darve bikin.' Ma ez çi bikim?" Ecêb bû. Dijmin jî her carê propagandeya "li hev xistin, hevûdû kuştin" dikir. Ên me jî digotin; "xeter in, em bikujin."

Ez bawerim dijmin baş dişopand ku nêzîkbûnên me yên ji bûyeran re xwe dispêrin kîjan meylan. Di nava pratîka eyaletan de nêzîkbûnên ji hevalên ku bi salan li çiyê mane re, di bin navê 'sîxûr e' de girtin û êşkence kirin, înfaz kirin, gel dana revandin û çewsîner hatine raberkirin. Dema min ev rewş di rapora Kongreya 4. de derbas dibûn xwedin, min qet bawer nekir. Negengez e ku dijmin van rastiyan nezane. Ji ber îtîrafkar van tiştan ji dijmin re gelekî dibêjin.

Wê rojê jî Mahmut tekmîl da. Ew jî ji zindanê derketiye. Li girtîgehê di tecrîdê de bû. Peywendiyên wî yên civakî jî tine bûn. Derheqê wî de îddîaya fesadî kiriye hebû. Ez nizanim li akademiyê xwe çiqas çareser kiribû, xwe çiqas ji partiyê re vekiribû û sucên xwe çiqasî dabûn efûkirin. Lê her carê jî çeloxwarî di-axivî. Gotinên weke; "Rêberê min, nizanim Selîm çi dike, li ser Medya jî ferz dike. Rêberê min, Sara jî çavên xwe jê re digire. Nizanim filankesê çi kir." Rêbertî tehrîk dikir.

Rêbertî bihêrs bû got; “xwe ferzkirinek çawa ye?” Ew dîsa nedisekinî. Pêcnsed, şeşsed heval guhdar dikin. Rêbertiyê Aysel û Selîm ji dersê derxistin. Bi rastî jî nîqaşa di navbera her duyan de mirov aciz dikir. Bê pîvan û durû nêzîk dibûn. Bi zorê xwe dixistin rojevê. Lê Aysel jî endama rêveberiyê bû. Erka wê ya bi her kesî re axaftin û nîqaşkirinê hebû. Na, ger ji vê zêdetir tiştek hebe, em jî wê nizanin. Gelo vî kesî çima ez têkil van mijaran kiribûm? Ma min ji çi re çavên xwe girtibû! Zêde şêlû û berevajî dike û wisa vedibêje. Serê her kesî tevlîhev dike. Tam mirovan diberde hev. Rêbertiyê got; “ bila Sara jî derbikeve.” Min jî got; “Rêberê min, ez dixwazim bi-axivim” û yekser rabûm ser piyan.

Min got; “Rêberê min, ez dixwazim çi dibe hinekê vebêjim. Temam ezê dîsa derbikevim. Lê ez dixwazim bê zanîn ku tiştên ku tên gotin nerast in.”

Çiqas evdalek bûm, min çawa xwe ferz dikir. Min hem li hember ewqas heval, hem jî li hember Rêbertiyê xwe ferz kiribû. Diyar bû çi lîstok dihatin meşandin. Rêbertiyê jî ev dizanîn û fêm dikir. Rêbertiyê jî dixwest me nas bike û zelal bike. Ti qîmeta axaftinên bêbingeh û nepixandî tine bû. Dilxwede min jî kiribû serê xwe ezê tiştên rast û şaş jihev cuda bikim. Rêbertiyê nehişt ez bi-axivim. Got; “na ez guhdar nakim.” Ez derketim. Lê heta ku gihiştim cihê rêveberiyê bi dengê bilind giriyam. Derspêkê Cahîde, pişt re jî Gezgor li pey min hatin.

Ji ber Gezgor dibêje; “ezê fîşekê li serê xwe bidim, baştire ku van axaftinan guhdar bikim.” Rêbertî wî jî derdixe derve. Serhet li cihê rêveberiyê li ser kursî rûniştiye, her du destên xwe kêlekê de berdane, kena xwe bi me dikir. Ez di ber xwe de

di-axivîm wisa ketim hundir. Min bi qîr digot; “ev lîstok e. Hinek kes dilîzin.” Serhed jî got; “dev ji van giriyên xwe yên pîrektî berde! Ya ku rol dilîze tu yî. Ma tu dikarî bi giriyên xwe, xwe veşêrî. Em te baş nas dikin. Tu nikarî bi giriyên xwe, dilê me bi xwe bişewitînî. Em nayên xapandin.” Ez di wê kêliyê de dîn bûm. Çavên min vebûn. Zêde tirsnak bûn. Lê her tiştî hedê xwe derbas kiribû.

Min got; “ev bênamûsî ye. Tu ne heval î. De min bikuje. De çeka xwe bigire û min bikuje. Bes wan gotinan ji min re nebêje. Ma ezê dilê xwe bidim şewitandin? Ma ez xwe vedişêrim? Te ev cesaret ji kur aniye ku, heta tu van tiştan ji min re dibêjî? Pir baş diyar dibe ku kî xwe vedişêre. Hûn her roj senaryoyek nû ji Rêbertiyê re radigihînin. Binyata partiyê li dijî me birêxistin dikin. Gelo armanca we çiye? Devrede jî bi dehan xayîn derketin, hûn hemû jî hatin darezandin. Min hemû xwendin, ez dizanim we jî çi kiriye. Ma hûnê niha jî bi tewanbarkirina kesayeta me ve, pirsgirêkên xwe çareser bikin? Ma hûnê tola xwe ya li dijî Şener ji min bigirin? Biçin min ji dijminê min bipirsin. Diyar e ku, kî çiye, her kes li holê ye.” Serhed diçe van axaftinên min jî di platformek dersê de ji Rêbertiyê re radigihîne.

Gotiye; “Rêberê min, Sara pir vekirî dûjînan ji me re dike. Ji me re dibêje hûn bênamûs in.” Ez, Cahîde û Aysel kirin tecrîdê. Qoxuşek hevalan vala kiribûn. Ez dê wan sê rojên tecrîdê de bê navber giriyam. Tişta herî ecêb jî min bê navber bi sedan rûpel nivîsand. Her rapora min çil-pêncî rûpel bûn. Min di wê rapora xwe de diyar kiribû ku ezê weke “Harakîrî” (di nav Japonan de bi kêrê qelaştina zik û xwe pê kuştin) bikim. Min di wê raporê de girêdana bi rêbertiyê re çawa dibe

nivîsandibû. Di heman demê de min diyar kiribû ku, ezê girêdana xwe weke kesên ku girêdana xwe sixte ne rave nekim, weke wan nebim, ji ber bi sala ne ez bi vê girêdanê dijîm. Dîsa min Rêbertî jî, ji ber bê ku me guhdar bike tiştên ku hatine gotin bawer kiriye rexne kir. Min dabû diyarkirin ku hevalan jî ji vê nêzîkbûnê sûd wergirtine û derheqê me de her tişt gotine û cesaret girtine ku her tiştî bêjin. Ango çi ji dilê min hat, min ji Rêbertiyê re nivîsand.

Ji bilî van jî çi hat bîra min, bi nêzîkbûnên çawa re rû bi rû hatime hemû şîrove kirin. Min hemû jî bi heve girêdan. Min qinyat û baweriya xwe ya bi partî û Rêbertiyê re destnîşan kir. Di heman demê de her cara ku ev mijar dikeve nîqaşê û li ser tê axaftin çiqas min bandor û xemgîn dike rave kiribû. Nivîsek weke wesiyetnameyê bû. Dr. li ser vê nivîsê hat bi min re axivî. Raporek din xwestin, min ew jî nivîsand. Zêdetir nêzîkbûna min a ji Rêbertiyê re û dilxwede ez çawa dinirxînim dipirsîn. Herî zêde jî ev li zora min diçû. Gelo ji min yeqîn nedikirin? Dixwestin bi nêzîkbûnên min ên bi Rêbertiyê re çi rave bikin û çi fêm dikirin? Ma nizanin ku ez çima tevlî vê şoreşê, dozê bûme û çima bi vê re dimeşim?

Ji bona min Rêbertî şoreş bi xwe bû. Doza min û têkoşîna min bû. Gelo çima wisa ji hev cihê dikirin û dipirsîn? Min bi wan re nîqaş kir û got; "tiştên wisa ji min pirs nekin. Ji ber gelekî beredayî ne." Her ku min wisa digot, hevalan zêdetir didan pey axaftinên min. Min nedikariya bidim fêmkirin. Min ji wan re digot; "hûn min fêm nakin. Hûn min nas nakin. Hûn nizanin ku min çawa xwe li piyan girtiye. Ger we bizaniya we ev pirsên beredayî jî nedikirin." Weke ku mirov ji mirovek xwedê bawer dike re, pê ve girêdayî re pirsin; "xwedê heye,

yan jî tine ye" bike. Li gorî min guneh bû, wan tiştên wisa guneh dikirin. Wan jî ez dipîvam, bê ka ez çiqas girêdayî me. Min jî diqîra ku di nav gunehek çawa de dijîn. Ey xwedêyo! Ma te ev roj jî anîn ber çavên min? Serê min zêde dêşe. Ti wateyê jî nadim van bûyeran.

Her peyv pir hêsan tên gotin. Heval jî mafê xwe dibînin ku, her tiştî wisa hêsan bêjin. Wisa jî xwe kesê herî zêde partiyê ve girêdayî û Rêbertiyê ve girêdayî destnîşan dikin. Li gorî ez, an jî hevalên ku ji girtîgehê derketine, alîgirên provakatora ne. Li gorî wan em riziyên rehabîlîtê ne. Dijberê partiyê ne. Em dijberên Rêbertiyê ne. Kesên sosret in. Me jî ji hevalan re got; "ev kî ne? Çi mafê wan heye ku van tiştan ji me re bêjin? Kes nikare girêdan û partîbûna me nîqaş bike." Me jî evqasî hevûdû fêm kiribû! Têkoşîna me jî evqasî ji eniyan dihat meşandin. Evqasî ji rastiya PKK'ê dûr bû. Me bi vî rêbazî tenê dikariya li hev bixin. Me hêz nedida hev.

Her wiha min ev mijar tev ji Rêbertiyê re jî nivîsandibûn. Dema min dinivîsî jî, min şer dikir. Hinde ez jî di şerkirin û têkoşeriyê de çalak bûm! Lê mixabin, min destpêkê jî li xwe dixist. Min her tiştê ku derdixist zanebûnê, di raporên xwe yên di wê demê de nivîsandîn de bin av dikir û dinirxand. Min wateya 'di çepera xwe de li xwe dayîn' baştir fêm dikir.

Belê, di têkoşîna min de hemû ferman hest, bertek û înada min didan. Lê ev fermanan jî xwe li ser bingehek mantiq, xwînsarî û ramanek polîtîk nedabû rûniştandin.

Herî zêde jî dema ez wisa bi Rêbertiyê re rû bi rû dihatim bandor dibûm. Çi bê gorin bila be, kîjan hêcetan bidin pêş bila be, çi lîstokan plan bikin bila be, bes bila bi vî rengî ji

Rêbertiyê re diyar nekin. Ji ber min di wan kêliyan de nedikariya bi-axivim. Ez jî dîn dibûm. An ez digiriyam, bêçare nêz dibûm û min nedikariya tiştên ku dixwazim bêjim, an jî min her tişt di heman kêliyê de gur dikir. Min digot; "ma çawa dibe, hûn nikarin van tiştan ji min re bêjin, hûn nikarin wisa bikin." Min her diyardeyek bi uslubê xwe ronî dikir û şîrove dikir. Her çendî tiştên ku min vedigot sedî sed rast bûya, mafdar jî bim, min bi hêrs û bertekên xwe ve tevlîhev dikir ku, tiştek neyê fêmkirin. Ji ber min ji aliyên cuda ve digirt dest. Tenê aliyên ku bandor li min dikir didît û aliyên ku her kesî eleqeder dike nedinirxand. Vê carê jî beriya xwe bigihînim wê astê, hinek bertekên din rû didan. Ango têkoşînên nîvçe, pênaseyên nîvçe û bertekên nîvçe mane… Min nedikariya van mijarên nîvçe mane temam bikim.

Nameya min ji Rêbertiyê re nivîsandî henek din cuda bû. Ya rastî cardin min çi hîs kiribe, ji çi bandor bûme û kîjan bûyeran rû daye tev nivîsandin. Bes hevpeyvîn tev newisa bûn. Gelek hevpeyvînên me yên hedirî û dirêj jî çêbûn. Bi taybet di dewreya duyem de ev ast baştir hatibû pêşxistin. Lê dîsa ji bona min nivîsandin zêdetir rehet dikir. Ji ber ez di wan kêliyan de ji hemû tiştên ku bandor bikin dûr dimam. Ez hîn zêdetir sade û bê astengî digiham Rêbertiyê.

Rêbertiyê naveroka vê nameyê jî di platforma hevalan de vekiribû. Amadekariyên dawî dihatin kirin. Her çendî çûna min a welat nezelal jî be, her tiştê dida diyarkirin ku ezê biçim. Her tiştî wisa dida hîskirin. Lê Rêbertiyê çûna min hêj zû didît. Got; "demek din jî bimîne. Tu dikarî li Rojava, di nava girseya gel de kar bikî. Wê tu hînî Kurmancî jî bibî. Ya rastî tu dikarî binivisînî. Em zêde li ser jinê rawestiyan û me vekir. Tu jî

dibînî, azadbûna jinê nehêsane. Dilxwede kesayeta me ya herî pêşketî tu yî. Te jî dît ku, tu çawa ji hev silikî (çarpilma). Jinek xwe bi civakî neke, mirov nikare behsa azadbûna wê jî bike. Jixwe nerast e mirov bêje azad bûye. Lîstokên heskirin û hestan çawa tên lîstin? Me ew çawa veguhertin şoreş û şer. Ya rastî divê tu van binivisînî. Dijmin çawa xwest van lîstokên tolhildanê bilîze. Lê me çawa vala derxistin? Ger em nebûna, dê hundir de jî hûn bixwaran û devrede jî heman tişt bihatan jiyîn. Lewma şêwaza me baş fêm bikin." Lê, tevî van min israr kir ku, derbasî welat bibim. Ji ber vê Rêbertiyê cardin ez di mijara şêweya min a lezkirnê de rexne kirim. Herî dawî rêbazek ji bona kesî nehatî kirin, ceriband.

Ya rastî Rêbertî her tim li hember pêşniyar û israran zêde hesas bû. Ev jî weke baldariyek balkêş bi Rêbertiyê re derdiket holê. Ji ber girîngî dida xwestekên kesan. Ger guncav nedîtibe jî, teqez baldar nêz dibû û li ser dihizirî. Jixwe meyla piranî hevalan jî pîva bû. Ji hevalan re got; "Sara xwe ferz dike da ku biçe welat. Hûn çi dibêjin. Ma bila biçe? Ma amade ye, dikare bike? Ya rastî ew ji çiyan hez dike, zehmetiyan jî najî. Zindî ye û liv û tevgera wê zêde ye. Belê, hûn çi dibêjin?" Tenê hevalekê got zûye, neguncav e. Gumanên xwe bilêv kiribû. Weke din hevalên din hemûyan destên xwe rakiribûn. Rêbertiyê jî got; "çi nabe, madem hûn hemû dibêjin temam, bila wisa be. Ma te dît, min ji bona te dengdanek demokratîk pêk anî. Ez wisa tevlî koma Botanê bûm.

Beriya ez biçim, Rêbertiyê axaftinek têlsizê ya bi Hevalê Cuma re jî amade kir. Ez pê re axivîm. Heval Cuma wê demê li Gabarê bû. Got; "ez li cihê Egîd im." Min jî diyar kir ku, pêvajoya me jiyan kirî zêde bi êş derbas bû. Ji ber nêzîkbûnên

me yên li hemberî hev, ev pêvajo giran derbas bû, hevûdû neyênî bandor kir. Min got; “serdehatin giran bûn. Hêza min tine bû ez yekser di heman kêliyê de wan qebûl bikim, an jî çareser bikim. Ji ber bêrêbaziyên min, rola aliyên min ên dijî partiyê zêde bû. Lê dîsa jî ez neberpirsa her tiştê girtîgehê me. Nabe ku gunehê danzdeh salan hemûyê para min bikeve. Vê jî hişt ez hinekê zehmetiyan bijîm. Nexwe ne wisa bûya, min dikariya ez neyêniyên heyîn zû derbas bikim. Lê niha baş im. Min di astek girîng de xwe komî ser hev kiriye. Ez amade me, ku werim welat. Ancex çiya dikarin hemû êşên min sivik bikin.”

Kêfa min zêde xweş bû. Moralek mezin bû. Ji ber hevalê Cuma cuda bû. Ger li vir buma, an jî hevalek din bûya, min jî evqasî zehmetî jiyan nedikir. Ez bawerim ev jî hêviyek bi niyetek baş bû. Lê rastiyek jî bû. Ji ber Rêbertiyê jî her tim digot; “ger şansê we hebûya, hûn liqayî van zilamên ku çiyan ew kirine wehşî nedihatin.”

Heta ku serxwebûna Kurdistanê nebînim namirim. Emê nemirin temam?

Piştî şer û têkoşînek pênc û nîv-şeş mehan a dijwar derbasî welat dibim! Dixwazim kîn û hêrsa xwe yekser bi ser dijmin de berdim. Ancex wisa dikarim hemû nelihevhatin, bêrêbazî û dûrbûnan ji holê rakim û bigirim. Xweziya ti astengî nebûna. Xweziya bê ku têkoşînên bi vî awayî bijîm, ew xislet, şaşî û kêmasiyên ku hêz û enerjiya min dihincirînin, parçe dikin, lez û giraniya wê dadixin nebûna, belê dê wê demê tola min gelekî dijwar ba. Weke ku ev aliyê min şeht bûye. Di dilê min de beşa birîna ji dost û rêhevalan vebûye, zêde dêşe. Kesê provakator îxanet li hezkirina min kiribû. Bila! Dijmin her roj hinek tiştên nû digot, ew jî bila be! Bila dehê caran, sedê caran min bikujin! Hêza min hebû ez hemûyan jî derbas bikim. Bes, min dixwest

ku hemû hevalên min jî vê yeqîn bikin. Ez dixwarim qîre qîr bêjim ku, "yeqîn bikin û bawer bikin." Lê gelek nêzîkbûnên pêşdarezîn, şik, bi provakatoran re girêdan û gumanên heyî ez birîndar kiribûm. Zehmet bû ez dewsa wan zû jê bibim. Ji bona min bextreşiyek bû. Ev tiştên ku hatin jiyîn, min ti caran nedixwest bibihîsim û bibînim. Min hesaba van nekiribû. Ji ber têkoşîna min tev her tim rasterast, her tim vekirî û her tim tazî bû. Min çawa jiyan dikir, çi dihizirîm, çawa hîs dikir, çawa xeyal dikir, têkoşîna min jî ew bû. Di nava vê têkoşînê de ji tiştek din re jî cih tine bû.

Her çendî li Akademiya Mahsûm Korkmaz di nava dewreya Şehîd Ahmet Gûler de, mijarên zehmetî dijîn û didin jiyîn hebin, lê dîsa jî rastiya şagirtên bidest dixe, ser dixe, yên dixwazin di mijarên winda kirine de cardin bidest bixin, şikestî û fihêtkar hebin, şahnaziyek mezin a şagirtên bi çoş û daxwaziyek bilind ku ber bi welat, axa me, çiyayên me, ber bi warên azadiyê yên bêhempa ve diçin hebû.

Li meydana dibistana ku hem merasîm her tim xweş û watedar bû de, cara dawî xatirê xwe ji hevalan dixwazim. Gezgor ji Barlîesê, ji nexweşxaneyê hatibû, da ku min bibîne. Wî jî zêde dixwest ku biçe welat. Herî zêde jî planên wî di derbarê çalakiyên fedaî û suîkastan de hebûn. Ev jî bê ku ji kesî re bêje, di rapora xwe de ji Rêbertiyê re ragihandibû. Lê Rêbertiyê jî eşkere kiribû! Pir xweş bû, Rêbertiyê jî nepeniyên Zamanî eşkere kiribû. Rêbertiyê di heman demê de got; "weke din jî te gotiye bila kes pê nehese. Weke ku nepeniyek pir veşartiye. Di nava me de tiştên wisa veşartî û nepenî tine ne." Gezgor destpêkê mat ma, paşê jî keniya. Wan rojan lingê wî hatibû emeliyatkirin. Ji ber hêrs bû, dû şekam li lingê xwe dan.

Got; “rewşa lingê min ne wisa ba, ezê jî bihatam. Ez li vir nedimam.” Pir ruh sivik bû. Bi rastî jî di cihê xwe de nedisekinî. Lê rewşa wî gumanên min zêde dikir û tirs dida avakirin. Min gumanên xwe yên derheqê wî de, ji wî re jî digot. Dema ez jê veqetiyam, min jê re got; “tu weke dînayî. Tika dikim zû nemire! Sondê me mezin in. Tenê ji bona wan jî be, divê em zû nemirin. Jixwe min peymanek bi mirinê re çêkiriye. Ew ji min ditirse. Heta ku serxwebûna Kurdistanê nebînim, namirim. Divê em nemirin temam.” Min ew hevalbendiya wî ya bedew cara dawî hemêz kir, di hemêza xwe de şidand…

Rêbertî heta cadeya nêzî wargehê bi me re meşiya. Dîsa ew kêliyên bisemyan bi axaftinê nirxand û her yek ji tiştek da me. Ez jî ji her alî ve dagirtî bûm. Min nedixwest zêde tiştekê bêjim. Jixwe hewceyî gotinan jî nedikir. Perçeya canê min a bi êş di raperînê de bû. Lewma di wê kêliyê de min nedikariya yek peyvê jî bêjim. Tenê min rondikên di qirika xwe de dadiqurtandin. Gelo mirov dikariya wextê derbasbûyî paşve vegerîne, weke nehatiye jiyîn bihesibîne û ji nû ve destpê bike? An jî neçar bû were jiyîn. Gelo min neheqî li demê dikir? Ma şoreşgerî û APO’geriyek pak, bê kêmasî ya herî xweşik, bi jiyanê dagirtî û devjênayê berdan, ne xeyal, daxwaz, hêvî û bendewariya min bû? Madem wisa bû, wê demê çima evqas nîqaş hatin kirin, evqas pênase pêş ketin û evqas bêbawerî pêş ket? Dema ez di wê kêliyê de dimeşiyam ji tiştek din nedihizirîm. Hinde van mijaran di guhê min de deng vedidan, êdî dengê Rêbertiyê jî nedihat min! Peyva; “dê her tiştî wext diyar bike” ger mirov ji xwe re weke hêviyekê bibîne jî, pir yeman û bê wate ye. Bila wextê heyî gelek tiştên bedew jî bide

jiyîn, lê êdî tiştên hatine jiyîn derbas bûn. Dê ew jî weke parçeyek rastiya ku hatiye jiyîn biman. Hêj min nedizaniya ku, wê ev mijar çiqas din bandor li min bike, min mijûl bike û zerarê bide. Ne di ferqa vê de bûm. Dîsa jî di heman demê de hemû şer û têkoşînên ku min jiyan kirine, her yek ji wan lîstokek, tradejiyek, dramek bû. Weke lîstokek li ser dikê hatiye lîstin, ez bi ti şêwazî jibîr nakim.

Rêbertiyê got; "de Sakîne, tu ji çiyan hez dikî. Êdî ez bawerim dê tu li çiyan bixî û wisa pê re bibî yek. Ez li benda agahiyên te yên serkeftî me."

Min jî tenê got; "Rêberê min, ezê her tim we şad bikim." Ez ji wê ervaziya ku dadiket Şamê, bazdanê daketim. Destên Rêbertiyê demek dirêj li hewa man û ji me re dihejand.

Min carek din şehnaziya APO'gerî jiyan kir. Ew kêlî çiqas xweş bûn. Bê ku tişteke din bihizirim, hesab bikim ku heye, min APO'gerî hemêz kiribû! Tiştek ji vê xweştir tine ye.

Jiyan ev bû, TÊKOŞÎN jî ev bû!

Bedewiya evîna TÊKOŞÎNÊ li vir bû.

Şam

Gotina dawî

Ez giham dawiya xebata nivîsandinek ku, pêvajoyek hêcet, wext, şert û mercên nivîsandin û dana nivîsandinê ji gelek hêlan ve ji hev cuda bûn. Bêguman, ev di wateya dawî li tiştên hatine jiyîn anîn de ‘dawî’ nîne. Min hewl da bûyerên ku ji demê re mane, têkoşînên min ên parçe bûne di zemînê wan ên rast de bigihînim hev. Çi tiştek hebe wan ber bi roja îro ve bîne, wan bigirim. Min hewl da hêza wê bi kesayeta xwe re ava bikim. Ji ber dê hinekê jî gelek tişt di vî zemînî de ji hev cuda û dê her tişt bibe ya xwe.

Belê, ger jiyan têkoşîn e, ger dê di hemû çavikên şaneyên wê de biherike û wateya xwe ya herî pak bibîne, tê wê wateyê ku, TÊKOŞÎN hêj jî didome. Dema Rêbertiyê behsa pirtûkên min ên bi têkoşerî dikir, got; “dê tu, ji vir û şûnde romana

serkeftinê binivisînî.” Dibe ku derfetên min ên nivîsandina ‘romana serkeftinê’ çênebe. Dibe ku vî derfetî nebînim. Lê, ez bi biryar im ku, di têkoşîna xwe de şêwaza serkeftinê bidest bixim. Bi taybet piştî ku ez ferasetên têkoşîna min rê jê re vekirine bi hemû êşa wan ve dihesim û dibînim, pir giran pê dihesim ku divê ez teqez vî şêwazî bidest bixim. Ev niha baştir tê fêmkirin.

Min di pirtûkên xwe de panorameyek zêde giştî û çors rêz kir. Min hewl da diyar bikim ku, min bi têkoşîna xwe ve çawa jiyan kir, çi kir, çi winda kir û gihiştim çi, hemûyan bi tiştên hatine jiyîn ve vebêjim. Ji ber dema min dinivîsî, min ew roj û paşeroj zêde jiyan kirin. Lê min ti caran nexwest tiştekê bi zorî bi roja îro re bikim yek û binirxînim.

Min di pirtûka destpêkê de, bi şerên lêgerînên xwe re baz da. Min malbat, pergal, derdor, çi tiştên ku min kevin û şaş didît, dijber derketim û meşiyam. Her tişt li dijî min sekinî. Bi taybet jî ez qet nehizirîm ku ezê çawa û bi çi biçim kuderê. Ji ber tiştek ne li xema min bû. Ango ne li gorî berfirehiya vê çûnê, têgihiştinek guncav hebû, ne jî rewşek min a bikare şervantiya wê bihêz bimeşîne hebû. Weke şerkerek bê henase, bêhedar, lezgîn, nezan, hestiyar û îsyankar im. Li her derî dikevim. Meşek bê hesab e. Lê dîsa jî nasekinim.

Di pirtûka duyem de jî têkoşîna xwe ya li dijî dijmin tazî û bi şerkeriyek çors ve dimeşînim. Ji bona radestî dijmin nebim, bi çavsorî şer dikim. Lê mixabin ev şer jî ne bi zanebûn û rêxistinbûna vî şerî li gorî çi, çi wextê û kîjan amûr hewce dikin dimeşînim! Di vî şerî de, warên ku hêza heyî tine bikin û mercên ku rêxistinbûnê ava bikin û kêliyên hewce dikin baş nayên hilbijartin. Îsyankariyek heye, lê belê rastiyek ji her cure darbeyan re jî vekirî ye.

Min di pirtûka xwe ya dawî de jî, şêwaza têkoşîna min çawa ez bi sedemên hebûna min ve rû bi rû anî me vegotiye. Ez bi her kesî re têdikoş im. Tam rewşek îsyanê ye! Min, bê ku rastiya heyî bihizirim bi bertekên salên dirêj bidest xistine û nêzîkbûnên bi pîvanên li gorî xwe raber kirine û bi her gotina ji devê min derketî ve hem xwe xist nava tengezariyan, hem jî min tengav kir.

Ez vê jî bi ser ve bikim. Min gelek pêkanên dijmin û bûyerên hatine jiyîn nenivîsandin. Ji ber ew bi serê xwe romanekin. Mijarên wêje û hunerê ne. Dê rojekê teqez nivîskarên romanan ên hotsa van rastiyan binivisînin.

Lewma, ez ti caran îddîa nakim ku min heqê rastiyên min nivîsandine û hatine jiyîn dabe. Berovajî vê, gumana ‘dibe, bê ku ez di ferqê de bim, min neheqî gelek bûyerên ku nekariye rave bikim û bîranînan kiribe’ dijîm. Gelek caran min digot; “xwezî hinek kesên din binivîsîya.” Bi taybet, rastiya AMEDê nivîsandin ne hêsan bû. Lê ez yeqîn dikim hewceyiyek mezine ku ew tiştên hatine jiyîn bibin dîrokek nivîskî. Dê teqez werin nivîsandin. Di vê mijarê de jî carê ne di destên me de ye ku, mirov hinek gumana nejî. Ji ber divê mirov wê giyana li wir hatiye jiyîn, di hemû çavikên şaneyên xwe de bijî û wisa vebêje. Ya girîng jî ev e!

Belê, rastiya gelek ji me, bi bûyerên wisa nayê hejmartin, li gorî xweseriya xwe bi aloziyan ve dagirtiye. Her tişta ku bi min û me re derketiye holê û diyar bûye tev, rastiya me, ango encama yekparebûna heyî ye. Lê dîsa jî rastiya APO’geriyê tevî van û di heman demê de bi hemûyan re şerek dijwar kir û ev pêşketina bê hempa ava kir.

Wateya xisleta têkoşîna APO'gerî û xweseriya wê, di vir de tê bidestxistin. Ji ber heta niha di cewhera ti şerî de dewlemendiyek wisa derneketiye holê. Heta niha di nava ti şeroşê de, yek bi yek bi her mirovî/ê re şer û şerên wisa dem dirêj, bi êş, lê serkeftî pêk nehatine. Belê, ewlehiya serkeftinê jî di vir de ye. Hewldan, ked û tebata sosyalîzmê daxe asta mirovan, di şaneya her zindiyekê de zelal berbiçavkirin, di vê têkoşîna bilind û bêhempa de ronî û zelal bûye. Lewma têkoşîna me dijwar, balkêş e û yekpare dike. Ez evîndara vê têkoşînê me. Ez her tim bi qinyata ku hemû hestên min, heskirinên min, bêrîkirinên min û xeyalên min ber bi vê ve herikîne meşiyam. Dê ji vir û şûn ve aliyên min ên ku naherikin bi têkoşîna min a şoreşgerî ve, min di bedewiya têkoşîna APO'yî de, bi coşek mezintir bidin meşandin.

Ez dilê xwe, zanebûna xwe û hemû hêza xwe ber bi têkoşîna serkeftinê ve berdidim…

Bi Rêzdarî

Sara

“Pêşdarezînek Mirov Parçekirin,
Ji Parçekirina Atomê Zehmetire.”

Einstein